BERGA 1

JIYANA MIN HER TIM ŞER BÛ

SAKÎNE CANSIZ

Weşanên Akademıya Jına Azad A Zeynep Kınacı

BERGA 1

JIYANA MIN HER TIM ŞER BÛ

SAKÎNE CANSIZ

Weşanên Akademıya Jına Azad

A

Zeynep Kınacı

Çapa Yekemîn:

Çapxaneya Azadî - Cotmehê 2015

Çapa Duyemîn:

Weşanxana Şilêr - Qamişlo 2017

Mîzanpaj û Bergê Pirtûkê:

Rêvan Mehmûd

weshanashiler@gmail.com

weje.vejin@gmail.com

DI DERBARÊ WERGERÊ DE

Dema biryara wergera pirtûka Xwedawenda me Hevala Sara hat dayîn û jî min hat xwestin ku ez vî karî bikim, dilê min lerizî. Kelecana min di asta herî jor de, ez ji hiş birim. Ji ber di rojên hînbûna xwendin û nivîsandinê de ya herî zêde li ser perwerdeya min û pêşketina şoreşgeriya min rawestiya, hevala Sara bû. Nexasim ya ku hînbûna wergerê jî li ser min ferz kir, dîsa hevala Sara û hevala Azîme bûn. Sala 1992'yê bû. Beriya şerê Başûr ê dijwar bi berdêlên giranbiha encam bûyî mehekê, heyva çardeşevî bû. Em li serê çiyayê Xantûrê bi hevalê Hisên Çelebî re rûniştîbûn. Min rojnivîsên xwe ji hevalên Hisên Çelebî re dixwend. Hevala Sara hat cem me. Beşek ji nivîsa min xwend. Pişt re ji min re got; "divê tu zû hînî wergerê bibî, da ku dahûrînên Rêbertiyê yên di derbarê jinê de hatin, tu ji hevalên jin re wergerînî. Nexwe dê hevalên jin baş Rêbertiyê fêm nekin."Ji bona min serkeftinek xeyalî bû. Lewma di vê pêvajoyê de pirtûka hevala Sara wergerandin, ji bo hemû hevalên jin û şoreşgerên tevgera azadiyê fêm bikin, nas bikin amadekirin, ji bona min rûmeta herî pîroz û nirxa herî bilind e.

Her kêliya nivîsandina vê pirtûkê, bi hevala Sara re jiyîn, bi ruhê Mazluman, Xeyriyan, Pîran şoreşgeriya xwe ji nû ve ber bi çavan re derbaskirin gelekî girîng bû. Her kêliya wan jiyan kiriye hîskirin, di hemû şaneyên xwe de jiyîn û zînde kirin, ne hêsan bû. Janek giran dide mirov. Min hewl da her kêliya hevala Sara jiyan kiriye, hîs bikim, wate bidimê, da ku weke wê jî gotiye, hem bizanim rast bijîm, hem jî bizanim rast bidim jiyîn. Ji bona vê jî, tişta ji hevala Sara hîn bûm, di her

kêliya jiyanê de bi rastiya Rêbertiyê û Şehîdan bawerkirin û bi armanca wan ve girêdan bû. Ji ber vê rastiyê hiştiye ku, hevala Sara di her kêliya xwe ya jiyanê de li hember her kesî û her tiştî hem şer bike, hem bijî, hem bide jiyîn.

Baş dizanim, her çiqas navê pirtûkê **"JIYANA MIN HER TIM ŞER BÛ"** ye, rastiya nivîsandiye tam rave nake. Ji ber her kêliya hevala Sara tije şer, pevçûn û têkoşînê derbas bûye. Lewma ez hizirîm ku, di rastiyê de navê pirtûkê; "Jiyana Min Her Tim Şer, Pevçûn û Têkoşîn Bû"ye. Ji ber rastiya hatiye jiyîn, van her sê têgehan digire nava xwe. Lê dîsa jî bi reseniya wê ve hiştin girîng bû. Her wiha dibe ku, di wergerê de hinek kêm û kurtî hebin. Heta ji destên min hat, min hewlda bi hemû hêza xwe di wateya wergerê de berhemek rast û binirx derbêxim holê. Ji ber pêdivî hebû bi kurmancî lez derkeve, min hewl da zû xilas bikim. Lewma dibe ku di warê wergerê de kêmasî derketibin. Ji niha ve ger kêmasî hebin, ji hemû xwendevanan lêborîna xwe dixwazim.

Weke din, dibe ku hinek peyvên bi zimanê Tirkî di nav de hebin, ji ber bersiva wan a zimanê Kurdî tam nebû û ji bo baştir were fêmkirin, min xwest wekî xwe bimînin û ev guncavtir dît. Her wiha gelek navên partiyên cur be cur hebûn, hinek ji wan jî bi reseniya wan rave kirin rastir bû. Lewma weke heyî hatine nivîsandin.

Her wiha ji ber li kêleka karên xwe yên zêde, ji bo vê xebatê wext veqetand û di redekteya pirtûkê de alîkarî da min, ez spasiyên xwe arasteyî hevala Nûgiyan Derya dikim.

Silav û Rêz

Sozdar Serbilind

“Em, di dîtina, rûyê hundurîn ê rasteqînî ya mirovek ku di kêliyekê de gelek kesayetên xwe hene de zehmetî dijîn. Ya rastî ev esasên ku bi hev ve ne girêdayî ne, di nava nakokiyan de veşartî ne.

Em hewl didin kesayeta leheng a cêwî ye bi du xetên bingehîn ên weke çavek kor, çavek saxlem, aliyek rû ciwan, aliyê din pîr, aliyek hiş li paşerojê, aliyê din jî girêdayî pêşerojê ji hev cuda bikin.

Dema me hewl da dîmenên te piştî mirina te carek din bi mozaîkê ve ava bikin, min dît ku her tevger û bertekên te yên min û yên din weke bê pîvanî bi nav dikir, tev manîdar bûn.”

Orianna Fallacı

Berdêla azadiyê giran e

Em wê roja reş bi şokek mezin û dilê me bi êşek giran şiyar bûn… tevî ku komkujiya 9'Çile sal a xwe temam kir, êşa me kêm nebû û hêrsa me mezin bû! Lêgerîna me ya edaletê her tim berdewam kir… li Awrûpa 'huquq' û 'demokrasî' ji bona Kurdan nayê bikaranîn, berfewendiya hêzên hegemonîk diparêze. Lewma gavek pêşketin çênebû û zêdetir derfetên çareserkirinê biçûk bû… ew dengê jinên Kurd her roja çarşemê bi duruşmeya 'Em Edaletê Dixwazin' dimeşiyan û diqêriyan nehat bihîstin.. Bêdengiya dewletên rola sê meymûnan dilîstin xirab nebû… bersiva lêgerîna edaleta gelê Kurd nedan… nêzîkbûna dijberî dîroka Fransa ya 'ma bêdengiya we ji ber hevkariya we ye?' ku ne hêjayî dîroka wan e, her tim hat lêpirsîn… wê her tim jî were lêpirsîn!..

Belê, ma Jeanne d'arc ji bo çi hat kuştin? Rosa Luxemburg çi jiyan kir? Clara Zetkin têkoşîna çi meşand.? Rosa'ya Kurdan, Sara û hevalbendê wê çima hatin kuştin? Ev girêka pirsan hêjî li bersivê xwe digere û dê vê lêgerîna xwe berdewam bike… wê ev pirs hemû bi lêpirsîna hişmendiya zilamê serdest a dibêje, 'destpêkê jinê bikujin' ve bersiva xwe bibîne. Dê wê demê tarîtiya heyî jî ronî bibe. Em ê qetilkirina Sara xwe, Fîdana xwe û Leyla xwe ya di kûraniya dilê me de cih girtine û veguherîne êşek pîroz jibîr nekin!

Sê jinên Kurd: rêheval Sara, Fîdan û Leyla, tarîtî li pey xwe hiştin û ber bi ronahiyê ve bazdan. Ew bûn navê aştî û her tiştê bedew. Rastiya ku kevokên aştiyê nayên kuştin, dema li asîmanên Franseyê difiriyan, carek din leneta hêzên di tarîtiyê de ji wan re hiştin û wisa çûn… hevgihîna xwe bi giyanweriya

Rojhilat re pêk anîn. Serî li hember wê nêzîkbûna Rojava (Awrûpa) natebite rakirin, ber bi Amed, Nurhaq û Dêrsimê ve firiyan… li hember tarîtiya heyî înad, bazdana ber bi ronahiyê ve hînî Kurdên li Awrûpa mane û Jinên Kurd kirin. Bi qasî dersê bidin huquq û demokrasiya têra Rojava (Awrûpa) nake, ew bi ezmûnek mezin ve rû bi rû hiştin. Êdî bila mirovahî pile bide Rojavaya k udi dersa huquq û demokrasiyê de, di refê de mane bide. Bila ew jî erka wan be… aliyê dîrokê yê bedew jî, bila aîdê afirîneriya civaka exlaqî û polîtîk be. Ji ber tarîtî ancex wisa dikare ronî bibe. Dê wê demê giyana Sakîneyan şad bibe!

Wan silav da warê hîlala zêrîn

Gelek sedemên qetilkirina xwedawenda me Sakîne Cansiz hene. Tanrıçamız Sakine Cansız'ın, katledilişinin birçok boyutu vardır. Sakîne, li warên Zagrosan ku Îskenderan nekarîn fetih bikin, Çanda Xwedawenda Dayîk derxistiye holê, hêza bûna şopdarê wê raber kiriye, li hember pergala zilamê serdest serî rakiriye, Çanda Xwedawenda Dayîk ber bi Rojava ve biriye û fêlbaziya Rojava ji xwe re nekirine xem bi Rosa'yan, Clara Zetkîn'an re hevgihîna jinê pêk anî. Lewma sembola aştî û biratiyê bû. Lewma her fîşeka ji bona wê tê teqîn, li hember nepeniya dîrokê hat teqîn… ew madeya sar a medeniyeta sixte ava kiriye, nekarî wê nepenî û rastiya dijwar a ji kûraniya dîrokê bilind bûye û derketiye bibîne… tirsiya! Wan kujeran pergala li ser bingeha kuştinê xwe saz kiriye kir nav liv û tevgerê. Ma ew kujer mezinbûna Sakîne ji kur dizanin?.. Ji bona vê ne hêza wan û nejî zanebûna wan têrê nedikir… ji ber SAKÎNE, FÎDAN û RONAHÎ nirxên civakî yên Çanda

Xwedawenda Dayîk jiyan dikir, hêza wan ji kûraniya dîrokê derdiket. Çeteyên mirin vedireşîn, weke şevşevokên (yarasa) ji tarîtiyê hez dikin, ketin valahiya tarîtiyê de û têk çûn. Kevokên Aştiyê yên li Asîmanan bilind dibûn, dema gihiştin Amed'ê gotin; "me serxist." Bi girasên xwe yên sor ve, silav dan Zagros'an û warên Hîlala Zêrîn!

Dîroka jinê ya nehatiye nivîsandin, neqş bi neqş Sakîneyan ve tê nivîsandin. Ger çîroka derketina wê ya ji Dêrsimê bi pênûsa xwe ve sade û zelal di romana xwe ya bi 'Jiyana Min Her Tim Têkoşîn Bû' de nivîsandiye, rastiyên veşartî yên di çîroka Rojbîn de ku hêj du saliya wê de ji Nurhaqan hat veqetîn û giyan û nepeniya rûyê bi Ronahî re ronî bûye, jina ciwan a ber bi azadiyê ve baz dide û radestî pergalê nabe neyê fêmkirin, ev komkujî jî nayê fêmkirin.

Ji hêza jinan tirsiyan

Kîjan rastî, di giyana serdestan de tirs û xof ava kir? Kîjan rastî "DESTPÊKÊ JINÊ BIKUJIN" da gotin? Belê, nepeniya di dîrokê de vaşartî jî di vir de ye!.. Ji hêza jinan tirsiyan. Ji têkoşîna jinan a bi berxwedaniyê mezin bûyî tirsiyan… ji wê sekna bêhempa û giyana têkoşer a Sakîne tirsiyan. Ji ber ew xwediya nirxên civakî yên dîrokê yên veşartî û nepenî bû! Jê tirsiyan û êrîşî sekin û giyana jina li hember jina kole û paşverû ya ku pergala zilamê serdest ava kiriye kirin. Ne hêsan e ku mirov vê rastiyê wisa bixwîne û binivisîne, lê belê ev jî hesabxwestinek dîrokî bû…

Hêza wan a sereke, girêdana wan a bi çanda dayîka xwedawend û nirxên komînal ve bû. Hêzdar bûn. Ji ber xwe ji

çavkaniyê xwedî dikirin û bi fersefeya APO'gerî mezin kiribûn. Hêza wan a bin nediket jî bi nirxên mirovî, azad û civakî di nav hev de jiyîn bû. Ji ber wateyek mezin dan vê jiyanê hatin kuştin. Wan; li ser bingeha hevpeymana civakî têkoşiya. Wan bi wateya bûna jin ve girêdayî kokên xwe jiyan kirin. Wan felsefeya APO'yî ya bersiva pirsa "çawa bijîn?" Xwendibû. Ew jinên wisa bûn, dizaniya ku zanist û teknîk ji bona berjewendiya hêzên hegemonîk tê bikaranîn, li hember wê înad tişta herî xweş bi xwe re dan jiyîn. Ew fîşeka kirêt a teknîkê hilberandiye, çawa dikare li ser bedena wan bicih bibe!.. Ji ber ew nûnerê edalet û bedewiyê ne… lewma edaletê ji wan hêvî nakin û naxwazin. Em li şûna wê bi berxwedaniya nûnerên edaletê ve hêviya avakirin û jîndarkirina cîhanek nû mezin dikin. Em ê doza Sakîneyan ser bixin!

Ev komkujî netesadufî ye

Salek a komkujiya 9'ê Çile tije bû. Her wiha bi dehan pirsên bêbersiv jî li pey xwe de hiştin… ji kijan hêlê ve were temaşekirin bila be, ev rastî wisa ye û nayê nîqaşkirin. Gelek tiştên ji hêla bîrdozî, ji hêla siyasî û polîtîk û huquqa kor bûye ve were gotin hene… bêguman sekin û têkoşîna Sakîne bi van ve girêdayî ye. Rêber APO ji dîroka mirovahî ya serbijêr ve diçû re got, "raweste." Mirov û civak di nav yekparebûnê de dest girt, nirxand, girêdayî felsefeya jiyana nû, rastiya mirov û civakek nû ya li ser kokên xwe şîn dibe esas girt û ev parast. Lewma ev êrîş pêş dikevin! Belê, ji ber bangawaziya gelên Rojhilata Navîn bi hev re jiyan bikin, hêzên demokratîk bibin hêzên alternatîf, hêzên tarî ketine liv û tevgerê û sê jinên Kurd qetil kirine. Ev jî ne tesadufiye. Ev komkujî, êrîşek li dijî jiyana mirovahî û aştiyê ye.

Dema polîtîkayên çewsandin, girtin û bêdengkirinê encam neda, karên xwe heta ber bi êrîşên tinekirina fîzîkî ve birin. Em ê êdî pirsên weke, gelo hişmendiya ku ji Kurdê Azad ditirse çima tiştek wisa kir? Çima ev qasî ji hêla bîrdozî û polîtîk ve êrîşî Kurd dike, nekin? Dê destê me jî di qiriqa wan ve be… mijarên divê em lêpirsîna wan bikin û lêpirsînê dikin, kanî feraseta we ya demokrasî? Parazvantiya we ya mafê mirovan? Çima dema mijar dibe Kurd tine ye? Demokrasiya ku têra wan bi xwe nake, dê çiqasî bikar bînin? Em bawerin, dê li qada mafê mirovan û azadiyan de yên ku di refê de bimînin ne Kurd bin… wê Kurd têkoşîna demokrasî û azadiyê bi pêngava, " rizgariya demokratîk û avakirina jiyana azad" ve li Kurdistanê pêş bixin û bibin bersiv. Em ê bi gelan, hemû bindestan, dostên Awrûpî û kesên li cem me tevan re bi soza ku me daye Sakîne, Fîdan û Ronahî ve girêdayî bimînin, li hember hêzên ku li qadên azadiyê di refê de mane înad, li welatê xwe jiyana azad saz bikin.

Em ê ji bilî serkeftinê şansê tiştek din nedin xwe

Fêmkirina PKK'ê, fêmkirina Sara ye. Sara, jinek wisa ye têkoşîna zehmet a salên dirêj jî nekariyê… çoş û kelecana jiyanê her tim di asta herî berz de jiyan kir. Ew çavên wê yên her tim diçirisîn û ji me re rave dikir em ê serbikevin, her tim bawerî da û bihêvî temaşe kir.

Ew wêneyên we yên her roja çarşemê di destê jinên Kurd de bilind dibin, zêde mehsûm û watedar dinêrin. Lewma mirov ji xwe re dibêje; "ma kî karî van hûriyan bikuje?" Wijdanê mirov dilerizîne. Helbet em ê her tim lêpirsîn û lenetkirina "ev qatil kî ne?" Bidomînin… her çendî zilm û hovîtiya welatê me

tê jiyîn li Parîsê em dorpêçkirî em mar kiribin, em ê dîsa bizanibin wê êşê beguherînên hêz û îradeyê û bizanibin xweşikbûnên bûna jin jîndar bikin. Em ê bi kenê Rojbîn ê bedew jiyînê û mezinkirina hezkirina hevalbendiyê esas bigirin. Em ê sekna Sakîne ya îradî ku di nava têkoşînê de têk naçe, israra jiyana azad mezin bikin û bibin şopdarên xeyalên wê yên mezin. Em ê weke Leyla ciwan û meşa xwe bi serkeftinê ve girê dide esas bigirin, ji bilî serkeftinê şansê tiştek din nedin xwe.

Sakîne Qarakoçan

ÇEND GOTIN

Pêvajoya min notên xwe yên beriya salekê nivîsandibûn, dema min ji bona bibe pirtûk derbasî nivîsê kirin jî, kêm bi têkoşîn derbas nebû. Ji ber dema min ew dinivisîn, min qet hêvî nedikir ku wan bi vî şêwazî çap bikim. Berî her tiştî min nivîsandin zû didît. Her wiha ne pêvajoyek xwezayî ya nivîsandinê bû. Navendek bi nîqaş, rexne û ji her hêlê ve bi êş bû.

Ger hêza ji pêvajoya heyî destpê bikim û wisa ber bi paşerojê ve biçûma bi min re hebûya, bêguman wê berhemek baştir derbiketiya holê. Bes her du destpêkirin jî zehmet bûn. Ez bawer im, min zora ku hêsan e hilbijart!

Beşên ku min demek dirêje nivîsandine weke 'barekê' man. Di wan rojên Zap'ê yên liv û tevger û rakêşwer de carina di çenteyê li pişta min de bûn, carina jî di çenteyê biraziyê(yexen) min Ferda de bûn. Min nivîsên xwe tenê dabûn Ferda bixwîne. Ew jî, ji bona nirx dida kedê. Hinekê jî min ferz kiribû, di nava ewqas alavên çapemeniyê de bi mehan li ser pişta xwe gerandibû. Ger lê mukur werim em di nava şer de bûn. Lewma min digot ger tiştek awarte çêbe, dê tiştên ku min nivîsandine biparêze û di demek guncav de binirxîne. Lewma min hiştibû cem wî. Lê ew hizirîbû ku ez fêlbaziyekê dikim û ji bona ez nivîsên xwe bigirim, li pey hev agahî ji min re dişand.

Her wiha di meha Îlûna 96'an de lênûsên min li pişta min derbasî Qada Rêbertiyê bûm. Şîroveya Rêbertiyê ya "jiyan dide nivîsîn" û her carê ravekirina girîngiya nivîsandinê û nirx dayîna karê nivîsê, ji min re weke deynika nivîsandinê bû, lewma min nivî.

Ji min re gelekî zehmet bû ku, tiştên min nivîsandine cardin bigirim dest. Min qet yên heyî ne ecibandin. Hêjî na-ecibînim! Lê belê kedek bûn, li gorî şert û mercên di nav de hatine nivîsandin, wateyek girîng rave dikirin. Her wiha ne wêrektiya min a ji nû ve nivîsandinê hebû û ne jî daxwaz hebû.

Şer û têkoşînên min jiya ne û bandorên wan ji nû ve cardin jiyîn zehmetiyek mezin dan min. Lê dîsa jî min hewl da tiştên bûne, weke xwe û bi qasî hatin bîra min binivîsim. Dîsa jî tiştên hatîn nivîsîn, tiştên hatîn jiyîn baş rave nekirin.

Pêvajoya ku tiştên min nivîsandine bûn encamek, pirtûk di nava xebatek hevbeş de pêş ket. Rêhevaltiya mala Rêbertiyê gelekî xweş bû. Lewma ez spasiya hemû hevalên li wir dikim.

Me di nava têkoşîna kedê de ***JIYANA MIN HER TIM ŞER BÛ*** kir pirtûk.

Nirxandinên derbarê Pirtûkê de tev ji xwendekaran re dihêlim û ya herî bi nirx jî wê ev be.

Bi Rêzdarî

Cotmeh 97

SARA

Di çileya zivistana tarî de ji dayîkbûn

Tam di sala nû de, girêdayî Dêrsimê, li gundê Tahti Xelîl di sala 1958'an de ji dayîk bûm. Dema ez ji dayîk bûme, bavê min li leşkeriyê ye. Di Sibatê de destûr digire û tê serdana malê, min li nifûsê qeyd dike! Lewma dîroka ji dayîkbûna min a fermî 12'ê Sibata 1958' e. Gelo di zemheriyê de ji dayîkbûn şansek cuda ye? Herî baş ez ji vir û pê ve bi şansê bawer kim û destpê bikim. Li gorî min tam di sala nû û nîvê zivistanê de, li erdnîgariyek zêde berf lê heyî ji dayîkbûn şanseke.

Gundê me bîst xanî bûn. Ew jî li her du kêlekên rêya li nav malan re derbas dibû hatibûn çêkirin. Herî jor Kocademîran, herî jêr jî Duymaziyan diman. Her du malbat qelebalixbûn û li gund dihatin hezkirin. Mala me jî li naverasta gund, li kêleka kaniyê bû. Li gund cîranên me yên herî nêz, Apê Birahîm û malbata wî bû. Di nava gund de kesê ku herî zêde henek dikir, sohbetên wî şox û şeng û mirovê herî wêrek ew bû. Gundiyan tim behsa wî dikir. Dema li aliyê gund ê li hember gundê Gomenan zeviyê cot dike, ew û hirç li hev dixin, hirç rûviyên wî derdixe derve, ew cardin rûviyên xwe dixe hundur û heta gund dimeşe. Ev bîranîn herî zêde jî bi wî didan gotin. Ger mirov pênase bike, apê Birahîm wekî Nisredîn Xoceyê gundê me bû. Gelek caran hemû gundî li naverasta gund, li binya kaniyê cihê bênderê diciviyan. Li wir sohbetên herî xweş dihatin kirin, kesên kal bela xwe li hev didan, henek dikirin û dengê kenên wan kêm nedibû.

Kaniya gund nû hatibû çêkirin. Av di rêyek çend demjimêran paleya çiyayê li hember Mazgêrtê anîbûn. Çavkanî jî di nava rezên gundek din de bû. Ev av berdêla pereyan de

hatibû girtin. Zilamên gund karê çêkirina coka ku av tê re were û raxistina boriyan kiribûn. Dema me boriyên hesin dişopand, em diçûn serê kaniyê. Carê dema em biçûk bûn diçûn ser kaniyê, weke ku me tiştek nû kifş kiriye, kelecana me zêde dibû. Kaniyek mezin bi betonê hatibû çêkirin. Li pêş jî çalek weke sitilê da ku av bikeviyê piçekê dirêj çar koşe hebû. Pêpilkek wê ya ji her du aliyan ve du gavî bilind hebû. Vê jî dîmenek gelekî xweş dida derdor. Kanî û derdora wê jî pir paqij bû.

Herî zêde jina bi navê Xezal, ya egîda Kocademîran dihat nasîn serkanî paqij digirt. Jinek gir û bilind bû. Biriyên wê sitûr, rûyê wê mezin, difina wê mezin, kunên difina wê fireh, kofiya li serê wê xweşik pêçayî, xavika wê bi morkên gir ve neqişandî û her tim spî bû. Her tim serê dawên wê fir fir, fîstan, pêşmalk û zendên wê bi qasî destên wê binixumîne li ber xwe dikir. Ew delingên ku me bi dimilkî jê re digot ‘namis’ derpiyên ku delingên wan lastîk kirîne ve, dema sitilên mezin radikir û jor de dadiket ser avê, bêhempa dixuya. Piştî ku li her derê kaniyê av direşand û paqij dikir, dest, ling û rûyê xwe dişûşt, sitilên xwe yên avê jî dadigirt. Ev jî fêrbûnek bû. Dibe ku ji ber vê bû min Xezal her tim bi baldarî dişopand. Bê ku li ber sar û germê bikeve ev paqijî dikir. Lewma bi qasî ez jê bandor dibûm, her kes jî bandor dibû. Bi gelemperî hemû malên gund paqij bûn. Lêbelê, jina bi navê Xezal û mala wê gelekî cuda bû. Zendên dest û qeydên lingên wê pir sitûr bûn. Di qeydên lingên wê de xalxalên ji morikan hebûn.

Jinên mala Duymazan tam berovajî wê bûn. Jina bi navê Xeyzan xwedî dengek nizim û binyatek nerim bû. Jinek hejar, xwedî fîzîkiyek zirav û dirêj bû. Xezal, ji Xeyzan zêdetir xwedî

otorîte bû. Otorîteya wê ya li mal, di derve de jî diyar dibû. Pêywendiyên jinên kal ên li gund pir rehet bûn. Rêzdariyek wan a xwezayî û bandora ku wê ava kiribû, hinek din cuda bû. Di pêywendiyên xwe de zêde hişyar û sînordar bû. Jinên ciwan ên zewicî di vê mijarê de zêdetir kevneşopiyên heyî pêk danîn. Bi giştî jî nêzîkbûnek hişk, kevneperest û çewsandin tine bû. Lê bûkên ciwan neçar bûn ku li hember jin û zilamên gund ên kal û pîr xwedî nêzîkbûnek rêzdar bin û hişyar nêzî pîvanên xwe bin. Dema bi kalan re di-axivîn, an jî didîtin, xavikên xwe weke rûyê wan ji nivî ve bigere dipêçan, ev jî pîvanek rêzgirtinê bû. Bi dengê bilind axaftin, qêrîn, an ne di cih de bangkirin ne pîvanek wan bû. Ev weke fêrbûnê bû û ti caran ne dikirin. Li her derî şîr nedidan zarokên xwe, memikên xwe bi xavikên xwe dinixumandin û wisa şîr didan zarokan. Lêbelê, jinên temenê wan hinekê mezin û nîvemir hinek din rehet nêz dibûn.

Zarokên ji komkujiya dêrsimê mane: dayîk û bavê min

Di rêza mala me de, aliyê din ê kaniyê malek din hebû. Jina li vê malê bi navê Emoş jinebî û jinek zêde cewaz bû. Şeş zarokên wê hebûn. Bes jinek ciwan û jinebî bû. Her nêzîkbûna wê bal dikişand û şaş dihat şîrovekirin. Jinên gund zêde jê hez nedikirin. Ji ber jinebî bû, her kesî gazindên xwe ji têkîliyên wê dikir. Ev jî zû dihatin ferqkirin. Jinan bi hesûdî û guman lê dinêriyan. Di vê mijarê de fesadiyên cur be cur dihatin kirin. Lêbelê, gelemperî jî gundek bi aheng, di pêywendiyên xwe de

gerim, rêzdar û kêm şer dikir bû gundê me. Ti bûyerên ku van têkîliyên bi rêk û pêk xirab bike, çênedibûn.

Apê Birahîm her tim ji radyoya xwe ya me jê re digot "cureyên kevin" ji zaravayên Kurdî Kurmancî ku me jî, jê re digot Kirdaskî kilam guhdar dikir. Ez qet wan kêliyan jibîr nakim. Ew mewalên Eyşe Şanê wisa bûn, ku bi mirov "tew tew" dida gotin. Dengê wê bilind dikir û bi her kesî dida guhdarkirin. Gundê nêzî me yê bi navê Şekerman jî dikariyan guhdar bikin. Carê me jî ji gundê Şekermanê dengê radyoyê dibihîst. Dîsa gelek caran bi mereqek mezin nûçe guhdar dikirin. Di wan kêliyan de her kesî digot qey tiştek pir cidî heye û lê guhdar dikir. Me zarokan jî tevî tiştek fêm nedikir, bi heman cidiyetê çav li wan dikir. Lê me ti wate jî ne dida û fêm nedikir.

Dayîk û bavê min zarokên ji komkujiya Dêrsimê mane. Wan salan ji dayîk bûne. Dayîka min çend salan ji bavê min biçûktir e. Bavê min heta niha jî zehmetî û zordariyên piştî komkujiyê hatine jiyîn, bibîr tîne û vedibêje. Dayîka min keça Hesenê Hemedê Kalikî yê ji Eşîra Kureyşan e. Kalikê min pêşiyê eşîrê ye. Di wan salan de gelek gund, aş û dikanên wî hene. Dayîka min weke keça malbatek dewlemend tê nasîn. Bavê min ew dîtiye, ecibandiye, xwestine û wisa zewicîne. Di zewaca wan de ti taybetmendiyek ku kevneşopiyên heyî derbas bike tine ye. Malbata bavê min xizanin. Dayîka bavê min du caran zewiciye. Piştî ku bi kalkê min re dizewice tenê bavê min ji dayîk dibe. Kalkê min yeke bejin dirêj û zirav e. Ez bawer im ji ber vê paşnavê Cansiz dane wan.

Her du kalkê min jî nayên bîra min. Zû çûne ser dilovaniya xwe. Malbata bavê min jî ji baskek eşîreta Kureyşan, ji bavikê

Silêman e. Bi dimilkî jî ‘Silamaniz’ tê gotin. Ji ber peywendiyê her du kalkên min bi hev re baş in, rola her duyan di zewaca dayîk û bavê min de mezin e. Lê, dayîka min şeva dawetê cardin ji mala bavê min direve. Diçe mala xwe ya gund. Jiyana mala bavê min a xizantî û ji rêzê na-ecibîne û qebûl nake. Lêbelê, bavê wê vê helwesta wê rast nabîne, dike rik û sê salan bi kesek din re na zewicîne. Her wiha dayîka min weke ‘bûka wê malê’ binav dike, xatirê dostaniyên xwe baş dizane û naxwaze vê dostaniyê xirab bike. Tevî ku gelek kes dayîka min dixwazin, dibêje; “tu bûka wê malê yî, ez te nadim ti kesî.” Wisa bi soza xwe ve girêdayî dimîne, herî dawî qane dike û cardin dayîka min tê cem bavê min. Bes ev bûyer bavê min dêşîne, dilê wî dişkîne, aciz dibe. Tevî vê bi dilnizmî, kamil û aramî nêz dibe û li bendê dimîne. Piştî salên dirêj bavê min bi vê mînakê dida diyarkirin ku dayîka me "çiqasjinek bêwijdan e.” Û behsa wê dikir.

Dema komkujiyê dayîka min di derguşê de ye. Dapîra min, bi bûk, zarokên din û neviyên xwe re li nava daristaneke tarî ya nêzî qiraxên Munzurê xwe vedişêrin. Pîrika min firsendê nabîne şîr bide zarokên xwe. Dayîka min ji nêza digirî. Bi tirsa ku dê dengê wê cihê wan eşkere bike, xalê min hewl dide dayîka min bi dergûşa wê ve bavêje Munzurê. Li hember ava Munzurê rêyek wesayîtê ya nû hatî çêkirin hebû. Ji ber her tim wesayîtên leşkerî di wir re derbas dibûn û navber didan, dibiya ku dengê girî baş bihîstan. Lewma xalê min dayîka min ji hemêza pîrika min digire û dixwaze bavêje avê. Lê pîrika min bi qîre qîr xwe davêje xalê min û dayîka min ji nav lepên xalê min derdixe û xwe davêje ser. Tika ji xalê min dike û dibêje; “temam ezê wê bêdeng bikim, wê kesek dengê wê nebihîse.”

Wisa pêşî lê digire ku ne-avêje avê. Lewma dema dayîka min hêrs dibû û jiyan jê re giran dihat, bi acizbûn digot; “xweziya wê kêliyê ez bavêtam avê. Ez jî xilas bam.”

Gelek caran xalên min bîranînên di derbarê wan rojan de vedigot.

Bîranînên bavê min ên di derbarê wan rojan de zêdetir bandor li me dikir. Ji ber bûyerên ku jiyîne, berfirehtir û bi êş bûne. Her carê weke ji nû ve dijiya, ji me re vedigot. Hişek wî yê zêde zindî hebû û tiştên jiyayî danî bîra wî. Van bîranînan di salên pey re li nav saz, helbest û kilamên wî de jî xwe dabûn der û vegotin.

Komkujiya Dêrsimê ya sala 1938’an heta piştî salên 40’î jî dirêj didome. Heta salên 40-45’an jî bi ser gundan de digirin, li gundan li Demenaniyan digerin, zilamên gundan kom dikin û dibin qerekolan. Her çendî temenê wî yê wê demê neyê bîrê jî, her tişt di hişê bavê min de zindî mabû. Xweziya her tiştên wî vegotî bihata bîra min. Ji ber di bîra min de gelekî kêm maye.

Digot; “Baş tê bîra min. Wê rojê leşker ser pira Pax’ê re hatibûn gund. Gelek kes bavê min jî di nava wan de li meydana gund kom kirin û girê dan. Demek dirêj ew birçî û bê av li ber tavê hiştin. Gerimbûnek weke şewatê hebû. Paşê hemû birin qerekola pira Pax’ê. Min xwe avêt ber wan û min xwest bi wan re biçim, lê ne hiştin. Ez digiriyam. Dayîka min û jinên gund ên din jî digiriyan. Roja paştir komek ji bona rewşa wan bizane ketin rê û çûn. Ez jî bi wan re çûm. Em li hewşê dan rawestandin. Kesî berê xwe neda me. Carekê çawîşê qerekolê, ji bekçiyê qerekolê yê Kurdê nişteciheê wir re got; “biçe ji gundê Şekermanê ewraqan bigire û bîne.” Bekçî jî “avrat” fêm

dike û diçe hemû jinên gund kom dike, tîne. Dema çawîş dît bekçî bi komek jin re vegeriyaye, got; “aqilmendê me li şûna ewraqan, jinên gund kom kirine û anîne” û bi dengek bilind dest bi ken kir. Got; “wê tu yekser wan paşde bibî.” Ez wê kêliyê hinek jî be rehet bûm. Lê dema destpêkê anîn ez gelekî tirsiyam. Ez hizirîm ku wê wan jî weke bavê min wan girê bidin û bavêjin hundur.”

Her cara behsa bûyerên ku jiyane dikir, çavên wî tije rondik dibûn. Her carê ji bona em jî êş û zehmetiyên wî jiyane nejîn, em baş fêm bikin û wate bidinê, aqil dida û şîret li me dikir. Her tim dixwest ku em rast tevbigerin û bijîn. Digot; “ma qey we çi dîtiye û jiyan kiriye. Hûnê wateya jiyanê ji kû bizanin. Binêrin me çi jiyan kirine.”

Ev pêkan tev, bi guman û hêceta ku Demenanî xwe li nava gund veşartine, dihat kirin. Tenê bi gumanên heyî mirov dihatin komkirin, dibirin qerekolan û êşkence li wan dikirin. Weke din jî gelo bi rastî jî ger Demenanî li gund bûna, dê çi bikiran. Jixwe hewce nake mirov bêje jî. Her tişt diyar dibe.

“Bila jan bı hestiyên bavê min bikeve, ez nedam xwendin.”

Ji nava gund kesê ku xwendibû yek jê jî bavê min bû. Dibistana seretayî qedandibû. Hevalên wî yên dibistanê jî Elî Gûltekîn, Kemal Burkay, Hisên Yildirim û her wiha bûn… Dema behsa wan deman dikir, her tim navê van derbas dibû. Bi taybet ji ber ew û Elî Gûltekîn gundiyên hev bûn, heman şert û mercên jiyanê bi hev re parve dikirin, nêzî hev bûn.

Dayîka min qet nexwendiye. Lewma her dibû behsa xwendinê digot; “bila jan bi hestiyên bavê min bikeve, ez nedam xwendin” û jana xwe wisa dida der. Ev jî, ji dil digot. Tevî bavê min bêdeng, nerim, gerim û ne kevneperest, mirovek dil bi rehim bû, dayîka min berovajî wî esabî, şerker, sar û zêde muhafazakar bû. Ji ber keça malbatek dewlemend bû, otorîteya wê jî hebû. Lê, bandora çanda Elewî li ser bavê min hebû, nirx dida jinê, rêz digirt û bi pîvanên dayîka min nêzî wê dibû. Dema ev nêzîkbûn bi yên dayîka min re dibûn yek, otorîteya wê asayî dibû. Ji xweber pêş diket.

Di nava civakê de bi gelemperî malbat, zarok, mal-milk bi navê zilam-bav tê nasîn. Ev bûye zagonek xwezayî û kes jî vê cuda nanirxîne. Pir kêm navê jinê derbas dibe. Tiştên ku navê wê li ser kêm in û bi hejmarên tiliya ne. Lê li cem me hem bi navê Zeynep û hem bi navê Simaîl dihat nasîn. Xizmên dayîkê, dayîk derdixistin pêş, xwezayî bû û weke ku divê wisa be hatibû qebûlkirin. Bi heman şêweyî pîrika min jî di nava eşîrê û malbatê de bi otorîte û bi bandor bû. Lê, ev rewşa pîrika min ji ya dayîka min cudatir bû. Ji ber di otorîteya wê de baweriyek cewherî û ked hebû.

Navê pîrika min Xetîce bû. Lê her kesî jê re digot Ezê. Bejin dirêj, gir, spî û çavşîn bû. Ya rastî ez bêjim şîn bû, ezê neheqiyê li keskê bikim. Bêjim keske jî ezê neheqiyê li şînê bikim. Ji ber çavên wê her du reng jî di nav xwe de dihewand. Çavên wê zêde bedew bûn. Jinek bedew û narîn bû. Jêhatî, narîntî û serweriya wê ya li ser her tiştî bandor li peywendiyên wê jî dikir. Di peywendî û jiyana xwe de ne teng bû. Hemû nevî, zarok, bûk, zava, cîran, xizim, gundiyên nêz û dûr, hemû

mirovên ew nas dikirin, jê re digotin Ezê. Rêzdariya wê ji aliyê her kesî ve pir vekirî diyar dibû.

Piştî mirina kalkê min otorîte û rêzdariya beramber pîrika min zêdetir bû. Berpirsyariya malbatek qelebalix û xizmên malbatê yên berfireh li ser milê wê bû. Çareseriya ti pirsgirêkên weke xwestin û dana keçan, lihev nekirinek, nehevsengiyek, bê wê ne dibû. Jixwe bê erêkirin û destûra wê ti kar ne dihat kirin. Jinek dilê wê mezin bû. Her tim ji yên pêdiviyên wan hene re alîkarî dikir. Mîsoger alîkariya wê ji her kesî re dibû. Di alîkariyan de jî parvekirin û edalet esas digirt. Dilê kesî ne dihişt. Lê mixabin, tevî vê jî hesûdî, hevûdû ne-ecibandin dihat jiyîn. Bi taybet keçên wê û xizmên wê yên nêz cewaziyên herî biçûk mezin dikirin û pîrika min bi cihekariyê tewanbar dikirin. Wer bawer dikirin ku wan jî weke yên din hez nake. Vê hesûdiyê pîrika min jî dixist nava tengezariyan. Ji ber wê jî taybet nêzî kesî nebû û dest negirt. Tenê yên pêdiviyên wan heban, yên nû dizewicîn, yên hilberîna xwe winda kirine û hinekên xweseriya wan hene, kî ba, alîkariya wan dikir.

Çi dema hesûdî û hevûdû ne-ecibandin dibû aloziyek, wê demê her çendî ne jiya jî ba, kalkê min diket navberê. Li herêma Dêrsimê piranî li ser navê 'Dûzgûn Baba' sond dihat dayîn. Lê di malbata me de gotin 'serê kalkê min sax be' sonda herî mezin bû. Pîrika min jî bi navê kalkê min li pêşiya van mijarên ne rast û ne di cih de digirt û şaş fêmkirinên heyî asteng dikir. Piştî vê sondê jî her kesî bi tiştên hatine gotin bawer dikir!

Pîrika min jinek pir bi hêz bû. Di her mijarê de jêhatî û serwer bû. Bi taybet nîvê şevê bi tena serê xwe digeriya, derdor

kontrol dikir. Dema gur, an jî hinek lawirên din ên biyanî nêzî govan dibûn, bi dengê xwe yê xurt ve li ser wan de diqêriya û diberda wan. Ger nexweşek, an jî şerek heba, ew mîsoger pê dihesiya û hewce bikira dest werdida. Ev baldariya wê bandor li her kesî dikir û dibû sedem ku beramber wê jî rêzdarî zêde be.

Li mala pîrika min her tim çaya nû çêkirî hebû. Ew çaydana mezin qet ji ser agir danediket. Gundê me tam li ser rê bû. Dema hinek diçûn gundên din, bi neçarî di gundê me re derbas dibûn. Gelek mirovên westiyayî ên ku diçûn gundên xwe, dema navber didan li mala pîrika min diman. Li vir xwarina xwe dixwarin û çaya xwe vedixwarin. Lewma gelek dostaniyên xweş ava kiribûn û mirovên ew nas dikirin zêde bûn.

Xisletên pîrika min her tim bala min dikişand. Dilê min ser bû û min her nêzîkbûneke wê dişopand. Bi taybet dema berbanga sibehê radibû, li ser piyan hilatina rojê temaşe dikir, rûyê xwe dida rojê û dua dikir. Dema dua dikir, destên xwe bi rûyê xwe ve danî û duaya xwe xilas dikir. Ez jî zêde jê bandor dibûm û min bi dil û can lê temaşe dikir. Di hilatina heyvê de jî heman tişt dikir. Di hilatin û avabûna her duyan de jî dua dikir. Lê herî zêde di avabûna wan de rûyê wê xemgîn dibû. Bi taybet girtina roj û heyvê çêdibû dua dikir, digirî û hawarên wê ji serî heta binî ez dihejandim û direcifîm. Di wan kêliyan de hewa bi keder dibû. Tarîtiyê em ditirsandin. Rewşek weke ku hinek tişt di tengasiyê de ne, tengezarî û êş heye derdiket holê. Pîrika min dixwest ew tarîtî zû biqede, ji bona wê jî xwe diperpitand. Yekser ew nanê bi nivişkê tê çêkirin, ku em jê re dibêjin Niyaz çêdikir.

Xisletek wê ya din berbiçav hebû, qet agir ne ditefand. Şevê pelên agirê di kuçkê de di bin xweliyê de vedişart û di berbanga rojê de jî agir pê dixist. Lewma dar zû pêdiketin. Ji ber ji malek din agir girtin, an jî dayîna agir guneh bû. Yên dixwestin jî xwe bi ser wan de aciz dikir, ji wan re digot êvarî agir veşêrin. Ezê, çanda Zerdeştî dida jiyîn. Ew jî bi Ezê re jiyan, veşartina agir, hawara heyv û rojê re û girêdana bi axê re bû.

Hînbûna zimanê tirkî bi serê xwe êşkence bû

Ez kêm bi dayîka bavê xwe re mam. Hinekê tê bîra min. Dayîka min zêde jê hez nedikir. Lewma li mala me ne dima. Piranî li cem zarokên xwe yên din dima. Min herî dawî di sala 1973'an de dît. Êdî pîr bû. Ji bilî qermîçûkên dest û rûyê wê, laşê wê li ser xwe bû. Spî bû. Ew çermê wê yê spî û tenik bûyî, li ser destên wê yên çîl de xet bi xet disekinî. Jinek zêde paqij bû. Doşekek ji paçek tenik çêkiribû û bi xwe re digerand. Dema li ser dîwanê rûdinişt, destpêkê doşeka xwe rast dikir, dawa xwe kom dikir û paşê rûdinişt.

Piştî ku bavê min leşkertiya xwe diqedîne, dibe karmend. Ezmûna li Dibistana Hunerê ya Yapi ser dixe û dest bi katîbiyê dike. Lewma ez hêj di wê demê de hînî peyvên Tirkî yên weke 'dayîk, bav' û hinek tiştên din bûm. Dema ez hînî peyvên Tirkî yên destpêkê bûm, min di nava gund de baz dida, pesnê xwe ji kesên di temenê xwe re dida. Bi qîr ew peyv dûbare dikir. Der barê jiyana min a gund de bîranîna zindî ya zarokatiya min di hişê min de maye, têkildarî hînbûna wan peyvên Tirkî ye. Di wan deman de kesî ez neçarî hînbûnê nekirim.

Mezinê malê zilam bû. Keça di navbera min û wî de ji dayîk bûye, hêj şeş mehî jiyana xwe ji dest daye. Birayê min berî min dest bi dibistanê kiribû. Dema min xwe li dibistanê nivîsand û dest bi xwendinê kir min bajar dît. Ez ji gund diçûm bajêr, pola yekê ya dibistana seretayî dixwend. Dema havînê me li robarê Harçik dida, em wisa diçûn û dihatin. Ji ber rêya me kin dibû. Di dema bavê min wan de pira hilawistî jî nebû. Havîn û zivistanê li avê didan. Dema derbas dibin ew cilên ji paçê Emerîka yê spî hatibû dirûtin, di nava xwînê de dimîne. Digot; "qeşaya di nava avê de weke camê lingê min dibiriyan." Her tim behsa çûna xwe ya dibistanê dikir. Li gorî wan şansê me zêdetir bû. Bes, ger em ji vê re jî bêjin şanse! Em weke zarokên civakek zimanê xwe yê dayîkê naxwîne, zimanê wê qedexe ye, komkujiyê re derbas bûne, çûn û hatinên dibistanên mêtîngeran, li gorî demên berê hêsan bû. Ya rastî ji bona em hêsantir werin bişaftin her tişt bi hêsan dikirin.

Zivistana berf zêde diket. Lewma zivistanê em bi ser pirê re derbas dibûn. Min ew şevên bi berf qet jibîr nekirine. Ji ber em biçûk bûn, em dixistin navbera xwe, yên mezin jî diketin pêş û paş rêz dibûn. Ji ber barîna berfa zêde xeteriya windabûnê hebû. Weke din jî xeteriya herî mezin, carê em bi keriyên gur û çeqelan re rû bi rû diman. Lewma her tim destpêkê hinek pêşeng diçûn, hem rê vedikirin, hem jî dema xeteriyek heba, agahî didan me. Di şevên wisa de hinek zilam jî ji gund dihatin pêşiya me. Dengê ku bera guran bidin, derdixistin. Me hemûyan bi hev re stran digot. Paşê ez hîn bûm ku, ev rêbaz hem nahêle mirov bitirse, hem mirovan gerim dike û hem jî xeteriya qerisandinê kêm dike.

Ya herî xirab jî piştî em ji dibistanê vedigerîn, dema em li derdora sobeyên diciviyan û me xwe gerim û ziwa dikir, jan diket destên me. Ji ber me yekser dida ber sobê, gelekî jan didan. Ji ber vê mamosteyên me rêbazên gerimkirina destan şanî me dikir. Me destên xwe dikir bin çengên xwe, diferikand, bi henasa xwe gerim dikir, an jî me bi porê xwe ve danîn, da ku gerim bibin. Bi vî rengî destên me zûtir gerim dibûn û jana wan jî kêm dibû.

Mamosteya min a pola yekê jinek zerik, Tirk, navê wê Gonûl bû. Heta pola sê jî ew mamosteya min bû. Hînbûna zimanê Tirkî bi serê xwe êşkenceyek bû. Me zêde zehmetî dijiya. Lê xwesteka hînbûnê jî hebû. Em bi lez peyvên nû hîn dibûn. Mamosteya me digot, ji derveyî dibistanê jî tim bi zimanê Tirkî bi-axivin, da ku hûn zû hîn bibin. Digot; "ger hûn ki Kurdî bi-axivin, hûnê lêdanê bixwin." Ji ber vê gefê û hinek hevalên me yên erkdar kirine me bişopînin û hîn bikin, em zû hîn dibûn.

Ji ber bavê min karmend bû, bixwazî nexwazî jiyana me ji hinek hêlan ve bandor û cuda dikir. Nanê me ji ardê spî bû. Pêlavên me jî yên îskarpîn bûn. Dema hevalên min berdêla du nanê ceh de, yek nanê ardê spî dixwestin, min şerim dikir û yekser dida wan. Lê belê, min ji wan re digot ez nanê ceh û garis pir hez dikim û min tenê nanek digirt. Heta carê bê ku ew bixwazin, min dixwest ku em nanê xwe li hev biguherin. Carê me nanê bajaran ên somon dixist navbera nanê me yên şikeva û me wisa dixwar.

Paşê em li bajêr bicih bûn. Me zivistanê li bajêr, havîna jî li gund jiyan dikir. Vê rêbazî jiyana me jî guhertibû. Derfetên me yên zû hînbûna zimanê Tirkî jî zêde dibûn. Mala me ya

destpêkê li kolana Dax'ê bû. Mala me dîsa ji axê bû. Tenê binê wê beton bû. Her wiha tişta ji gund cuda jî heyîna elektirîka wê bû.

Şerên li gundê text hatine jiyîn

Şevek havînê bû, em li gund bi gengeşeyek mezin re şiyar bûn. Me dît ku pîrika min, diya diya min darek di destê wê de diqîre û dixwaze hemû zilamên gund li meydana gund bicivin. Min ti caran ew bi vê hêrsê ve ne dîtibû. Me jî gengeşeyên beriya wê fêm nekiribûn. Ji ber liv û tevgerek ecêb hebû. Hinek çav li xew bûn, nû şiyar bibûn, ne dizaniyan ku çi bûye. Pîrika min dipirsiya ku kî xaltîka min revandiye û li kure. Dûjîn ji yên ew revandine re dikir. Bavê min jî ne amade bû. Hevjînê xaltîka min Mistefa Çalli jî, weke ku agahiya xwe ji tiştekê tine ye nêz dibû. Hem jî bi fêlbaziyek mezin ve dikir! Weke ku nû ji xew rabûye fenekî dikir. Hat cem pîrika min got;

"Yadê xêre vê nîvê şevê, çi bû, ma tiştek heye?

Lewma darê yekem jî wî xwar. Gelek kesên din jî heman fenekî ceribandibûn. Me ne dikariya di heman kêliyê de bûyerên ku rû didin fêm bikin. Dîsa jî her ku wext ser ve diçû, hinek tişt hatin fêmkirin. Xaltîka min Melek hatibû revandin. Tiştên ku dibûn weke filmekê bûn. Di nav de gelek tiştên weke tirs, kelecan û macera hebûn. Ger xalê min navbeynkarî ne kiriba, dê veguheriya doza xwînê. Kesek ji eşîreta Rayberan xaltîka min a navîn Melek ji xwe re xwestibû. Lê derdora malbata wê jî naxwazin. Dixwazin bi kesek ji nav malbatê re bizewice. Pîrika min jî malbatê guhdar nake û ji bona xaltîka min soz dide ciwanek Rayber'iyan. Lewma biryar digirin ku

xaltîka min birevînin. Kesên ku di vê revandinê de rol jî dilîzin, kesên ku herî zêde kar dikin û ronakbîr in. Çalakiyek revandinê ya pir ecêb tê kirin. Her du gund jî ji hev dûr in. Di navbera wan de hinek gundên din hene. Pîrika min weke her carê dîsa xwedî tevdîr e. Mal mezin e, derî jî ji hundur ve bi çengilê miftekiriye. Ew jî li ser dîwana text a derve radiza. Yên ku dixwazin xaltîka min birevînin, ji çend baskan ve serde digirin. Mîsoger ên ku ji heman gundî alîkarî jî kirîn hene. Lewma serkeftina çalakiya revandinê girîng e. Nexwe wê xaltîka min bidin eşîrek din. Ji ber zehmete ku pîrika min were qanekirin, neçar dimînin ku planek wisa çêkin. Ji nava komê yek-du kes ber bi gova havînê ve çûn û bi rengê ku 'gur ket nav keriyê' rewşek derxistin holê, panîk ava kirin da ku pîrika min ji ber derî dûr bixin. Dê wisa koma din jî vê weke firsendekê binirxîne û bikeve hundur, xaltîka min bigire û ji gund dûr bikevin. Lêbelê, karê herî bela jî mijûlkirina pîrika min e. Ango di vê bûyera revandinê de erka her kesî diyar bû.

Dema di nava kerî de dengê bare bara pez destpê dike, pîrika min darê xwe digire û berê xwe dide wir. Koma ku xaltîka min jî bigire firsendê dibîne û yekser berê xwe dide hundur. Demekê li xaltîka min digerin. Herî dawî di bin selika mezin a ku ji çiqlên dara biyê hatiye hunan û xwarinên weke mast û şîr tê de diparêzin de dibînin. Lez devê wê girê didin û dikevin rê. Pîrika min ji rewşa heyî şik dibe. Yekser ên din dikevin navberê. Nêzî pîrika min dibin, dixwazin destên wê ramûs in û bi axaftinê hinek wext bidest bixin. Xwe weke mêvanên asayî didin diyarkirin. Pîrika min jî bi darî bersiva wan dide. Serê hinek ji wan dişkê. Lêbelê, dikarin hinekê pîrika min mijûl bikin. Ev ji bona koma din wext dida avakirin.

Pîrika min jî bi dûjîn û qîre qîr bangî xaltîka min dike. Dema dibîne deng jê dernakeve, dizane ku hatiye revand in û dikeve pey wan.

Tenê du rêyên gund hene. Koma xaltîka min direvînin, naçin gundê Elî. Plan dikin, ji gundê Kavun biçin, bibin gundê Tahtixelîl, ango gundê me. Ji ber evder rêyek derfetên xwe baştire. Pîrka min jî yekser diçe gundê Elî ya bi navê Hopûk. Çawa dikeve nava gund, qîre qîr dike. Hemu gundî li meydana gund dicivin. Pîrika min bi israr dibêje; "zû keça min bînin." Gundî dibêjin Elî jî û Keç jî ne li gund in. Herî dawî pîrika min jî pê bawer dike ku ne li gund in û diçe. Dîsa yekser berê xwe dide gundê me.

Xaltîka min li gundê me, di nava bejahiyê de vedişêrin. Kesên ku têkil vî karê revandinê dibin, weke ku haya wan ji tiştekê tine ye, tên li mala xwe radizin. Ji aliyekê ve ev bûyera revandinê biser ketibû. Lê her tişt xilas ne bûbû. Ji ber dema pîrika min ji gund derdikeve, bi dengê bilind diqîre û vê agahiyê dide gundê Rayber'an ku nêzî wê ne. Ew jî giliyê vê bûyerê dikin. Bes kes texmîn nake ku vê agahiyê bidin dewletê.

Roja paştir cendirmeyan bi ser gund de girtin û geriyan. Ev lêgerîn heta çolterên gund jî belaf û berfireh bû. Ji ber gilî hatibû kirin, bi biryar bûn ku xaltîka min mîsoger bibînin û bibin. Vê jî her tişt tevlîhev kir. Pîrika min kiribû rik. Ne dihat payîn ku rewş bigihe vê astê, cendirme û dewlet têkil bibin. Vê jî peywendî tev xirab kirin û hişt ku bertek zêde bibin. Heta cendirmeyan ev bûyer kirine hêcet û bi dîpçikan li gelek gundiyan dan. Gundiyan jî xalê min ê tehsîldarî dikir Hesen tewanbar dikirin. Lê hinekan jî texmîn dikir ku, Rayber'iyan gilî kirine. Dema rewş cidî dibe komek ji gund dikevin navberê

û hewl didin pîrika min qane bikin. Pîrika min jî ji bûyerên ku rû dane ne kêfxweşe. Dema hêrs û acizbûna wê ya destpêkê kêm dibe, qane dikin û giliyê xwe vedikişîne. Ya rastî dide diyarkirin ku ti gazincê wê tine ne. Piştî vê cendirme ji navberê derdikevin.

Bixwazî nexwazî piştî vê bûyerê rêzdariya li hember pîrika min lewaz ket û sî hat ser. Pîrka min ji ber keça xwe her kes girtibû li hemberî xwe, dûjîn, heqaretên kirîn, bûyerên din tev bûn sedem ku xemgînî, xeyîdandin û şikestinek pêş bikeve. Lê, di encamê de xaltîka min Melek û Elî li gundê Hokê bi dawetekê gihan mirada xwe! Ji wir jî derbasî gundê Millî yê ku Elî li wir mamostetî dikir dibin. Lewma pîrika min demek dirêj ji wan dixeyîde, lê paşê êdî xwe nagire, rojekê diçe serdana wan û li hev tên.

Di vê bûyerê de rêzdariya pîrika min lewaz ketibû. Ji ber dema cendirme ketin gund û cendirmeyan li gundiyan xistin, bandorek zêde neyênî ava kir. Nêzîkbûnek pîrika min yek din ku zêde ez mat kirim û hêjî dewsa wê bi min re maye çêbû. Min ti caran ev nêzîkbûna wê jibîr nekir û efû nekir. Ji ber vê bûyerê hezkirina min a li hember gundê Tahtixelîl û Ezê birîndar kiribû. Lê bû bingeha min a yekemîn a bertekên min ên li dijî neheqî, şer û pevçûnên ne heq.

Her tim ez ji şer û pevçûnên gundan tirsame. Lê tişta herî zêde tirs û şopa wê bi min re mayî, ew şerê li gundê Taxta dijwar bû. Di çend bêhnvedanên havînên pey hev me li gundê Hopûk jiya bû, bi sedemên pir biçûk şer hatibûn jiyîn. Ji ber vê mirovan li hev xisitibû û ji hev xeyîdîbûn. Ji ber nêzîkbûnên hinek jinan ên diberdan hev, bertekên bê hesab û hestiyar ên bûyerên herî biçûk mezin dikirin, gelek serî şikestin û rû di nav

xwînê de mabûn. Jinên bi vî rengî li mal û gund jî dibûn sedema bê aramiyê. Lewma kesî ji wan hez nedikir. Min jî ji wan hez nedikir û ji dûr ve li dijî wan hêrs dibûm. Min ti caran wate nedida wê hêrs û harbûna wan.

Belê, lewma ew havîn çûna gundê pîrika min ji bona me ya dawî bû. Jixwe em wê salê jî zû çûbûn gund. Beriya dibistan bikevin bêhnvedanê mehekê, me xwe li dibistana gundê Kavun dabû nivîsîn. Ji ber havînan li bajaran nedihat jiyîn. Germahiya wê em dixeniqandin. Her wiha dayîka min jî dixwest ji derfetên ên hene sûd werbigire. Bostan dihatin çandin, ji şîrê pez û çêlekên ku pîrika min dida rûn û keşk dihat çêkirin. Weke din jî pêdiviyên weke av û dar jî bê pere bûn. Ji ber li bajêr her tişt bi pere dihat kirîn. Lewma ev berhemên gund jî ji bona mûçeya bavê min sûdmendiyek mezin bû.

Her sal xal û xaltîkên min jî dihatin gund. Nêzîkbûna pîrika min a ji malbata me re girêdayî diya min bû. Ji ber diya min keça malê ya mezin bû. Navber dixist neqeba xwe û xwîşk û birayên xwe de. Di vê mijarê de peywendiyên bavê min jî hinekê li gorî wê xweser bûn. Peywendiyên malbatî ne li ser her tiştî re bûn. Giranî nirx dida peywendiyên mirovahî û ew girîng bûn. Lewma ti caran tengav nedibû. Weke karmendek biçûk, bi gelemperî kesek xwedî xisletek ku ‘di nava rûnê xwe de diqele’ de dijiya. Kesayetek girîngî nedida fêlbaziyan, xwe dana qebûlkirin û madiyatê. Ger rast be dikarim bêjim ku, dilê wî têr û tije bû.

Diya min jî nêzîkbûna pîrika min a hinek zarokên xwe taybet digirt dest, ji xwe re dikir derd û kul. Ev rewş dibû sedem hinek bûyerên nexweş rû bidin. Di heman demê de di navbera wan de sarbûn ava dibû. Wê rojê jî di navbera diya

min û xaltîka min Sakîne de nîqaşek zêde xirab rû da. Ev nîqaş jî vekirî çêbû û her kesî jî bihîst. Lê zêde mezin bû û heta giha bavê min û hevjînê xaltîka min ku wan di navbera xwe de nîqaş dikir. Vê berdana hev, sorkirin û harkirinê her der tevlîhev kir. Tevî ku diya min çû şîr bidoşe, bûyer xilas nebûbû û berdewam dikir.

Xeleka dawî jî dema xaltîka min dûjîn ji bavê min re kirin, bû. Bavê min jî heta wê kêliyê tenê bi gotin destwerdana bûyerê dikir. Piştî vê nêzîkbûnê bi hêrs bû, çawa ji cihê xwe rabû, me nezanî bûyer çawa rû da. Min ji nişka di nava xwînê de ketina erdê ya bavê xwe dît. Xal, xaltîk, pîrika min û her kesî li bavê min didan. Zêde bêrehim bûn. Min jî qîr didan û digiriyam. Kekê min zêde ciwan bû. Carê qîr dida, kevir davêt û digot; "nekin." Lê ne xema kesê bû. Paşê yariciyên pîrika min Mehmet û hevjîna wî Fatma ketin navberê û bavê min rizgar kirin. Ew halê bavê min ê di nava xwînê de mayî em tirsandin. Yekser rakirin ji bona bibin nexweşxaneyê û ketin rê.

Bûyerek zêde dijwar bû. Her kesê têkil vê bûyerê bûyî xizmên hev bûn. Ev çi kar bû? Ma mirov ji bona tiştek vala, heta ku bikuje li mirovekê dixe? Dema diya min jî bûyerê dihese kevirekê digire destê xwe û tê. Lê heta hat her tişt qediyabû. Dema bavê min di nava xwînê de dibîne, her derî têkilhev dike.

Her cara ev bûyer tê bîra min, cavên min tije dibin û janê dijîm. Dema ku her kesî xwe kir yek û li bavê min dan, janek mezin bi min re ava kir. Ew jan di dilê min de ma. Di hundurê xwe de jî hem ji dayîka xwe aciz dibûm û hem jî dilê min pê dişewitî. Lê acizbûna min zêdetir bû. Ji ber a şer dayî

destpêkirin ew bû. Lê yê lêdan xwarî bavê min bû. Yên ku lê dayîn hemû jî xizmên dayîka min bûn.

Piştî wê bûyerê me nedikarî em zêdetir li gund bimînin. Em yekser vegeriyan bajêr. Bavê min ji serî û eniya xwe darbe xwaribû. Pir xemgîn bû û zayîf ketibû. Ji diya min pir aciz bû. Her çendî zêde ne axivî ba, ev dida der. Diya min jî dizaniya ku sucdar e, her carê lêborîna xwe dixwest û hewl dida xwe bide efûkirin. Bavê min ne kîndar bû. Her çendî bandora vê bûyerê kûranî dijiya jî, bi demê re her kes efû kir. Heta bi gelek ji wan re jî li hev hatin. Xalê min ê biçûk û hemû xizmên me bêşermî û bêwatebûna vê bûyerê hesiyabûn û poşmanî jiyan kiribûn.

Rola jinê ya di wê bûyerê de zêde bandor li min kir û ez dam hizrandin. Hişt ku ez dersên cidî ji xwe re bigirim.

Şîreta diya min: “ji kurdîniya xwe şerim neke!..”

Di encama hewldanên bavê min ya li kişlaya lojmanên ji karmendan re hatine cudakirin de, em jî bibûn xwediyê malek bê kirê. Ji bilî pereyên av û elektirîkê tiştek nedihat dayîn. Me perê kirê jî ne dida. Lojman piranî didan personelên ku li avahiyên dewletê kar dikin. Malên fireh û xweştir didan kesên bi torpîl û karmendên xwedî karyerên mezin. Mala ma jî li qeta dawî ya banî bû. Tenê du ode û cihê daran hebû. Em sê malbatên cuda li heman korîdorê diman.

Dema li Dêrsimê behsa lojmanên karmendan dihat kirin, dihat wateya nêzî dewletê bûyînê û di saziyên wî de kar kirinê. Ango yekser rengê dewletê dida der. Hinek malbatên ku kêmekê hînî zimanê Tirkî bûne, hinek karmendên ku Tirk in û di nava malbatên polîsan de cih girtin, Tirkbûn zêde lez pêş dixist. Ji ber evder ji bona me jî weke berdewamiya dibistanê bû. Me jî ev ji xwe re weke derfetekê dinirxand. Ji ber em zû hînî zimanê Tirkî dibûn. Di heman demê de destpêkirina rastiyek bi êş a ku diya min li rûyê min dayî û wê min jî piştî salên dirêj ev êş bi kûranî hîs bikira. Weke gotî; “***Ji Kurdewariyê Şerim Neke!”***

Min diya xwe jî neçarî axaftina zimanê Tirkî dikir. Min li malê hewl dida zû hîn bibe, ji ber dema bi cîranan re daxivî, kes kenê xwe pê neke. Gelek caran min jê re digot; “dema tu di-axivî, şaş di-axivî, lewma ez şerim dikim.” Belê, jixwe wê demê gotin ji min re kiribû. Ango divê ez ji Kurdiniyê şerim nekim. Piştî salên dirêj kêm be jî dema zanebûna Kurdinî û Kurdistanî pêş ket, ev dihatin bîra min. Êdî min ji xwe şerim

dikir ku min çawa ji Kurdiniya xwe şerim kiriye. Min fêm kir ku ez çiqasî ji zimanê xwe yê dayîkê dûr ketime.

Dema berê ev kişla ku em lê dimînin, kişlaya leşkerî bûye. Bavê min behsa wan pêvajoyan dikir. Ew ji gund hatine dibistana seretayî xwendine. Di rojên kur ê ji berfê hatine girtin de, şevan li qetên binî yên avahiyên vê kişlayê dimînin. Dema avahiya leşkerî ya nû tê çêkirin, van lojmanan jî didin karmendan. Ji bilî rengê dîwarên risasî, ti dewsên leşkerî nemabûn. Hawuzên avê yên li hewşa navîn tev bi axê hatibûn dagirtin. Li hewşê yek dar tine bû.

Bloka kişlayê ya li navenda bajêr dinêriya sê qat bû, aliyên din jî tev du qat bûn. Weke qutiyekê çar koşe bû. Hema li ser şikêrên jorî Munzurê hatibûn lê kirin. Di hundur de jî zêde korîdor û pêpilk hebûn. Rê diçû her cihî. Lê tişta herî zêde kêfa min jê re dihat di hewşa navîn re çûnûhatin bû. Li ber girê nêzî lojmanan xwaringehek Tepebaşi, di dawiya wê de jî sînemayek havînê hebû. Her kes ji xweber ne diçû wê xwaringehê. Kesên mêvanên wan ên girîng û dewlemend diçûn wê xwaringehê. Manzareya wê pir xweş bû. Ava Munzurê tam li kêleka wê xwe ba dida û diherikî. Malên kolana jêrîn ên wisa rêzê û hewşên wan ên şîn ji jor ve pir xweş xwiya dikirin. Rêyên vê kolanê pir xweş û mîmariya wê pir cuda bû. Mala Walî tam li qiraxê avê bû.

Li wê kolanê mala tenê du qet ew mal bû. Li malên din jî karmendên jorîn ên di saziyên dewletê de kar dikirin diman. Wê derê weke navberekê dewlet û Dêrsim ji hev cihê dikir. Gelek karmend û bûrokratên dewletê yên weke Walî, qeymeqam, mudurê emniyetan li wir diman. Weke ku ewder ne aîdê Dêrsimê bû. Kolan hema li qiraxê avê bû û baxçeyê hemû

malan hebû. Ger evder ji aliyê nîştecihên herêmê ve bihata bikaranîn, bêguman wê wateya wê zêdetir ba. Lê evder bi vî rengî her tim sar, dûr û biyanî bû. Zarok, jin, zilam, ziman û çanda wan gelekî cuda bû. Ketina hundurê wir, weke ketina hundurê kişlayek leşkerî, an jî ketina hundurê qereqolekê bû. Hewaya wir tirs ava dikir.

Weke din jî lojmanên serbazan jî cihê diman. Aliyê kişlayê yê li pira Elezîzê dinêre di rengê leşkerî de avahiyên mezin û zêde qet ser hev çêkiribûn.

Bajar, hema di bin girê Dûldûl de weke qevdekê hatibû çêkirin. Girê Dûldûl ê li pişt dirêj dibû, berfirehkirina wî asteng dikir. Lê qontarên wê jî tije şevdanî bûn. Kolana Dax jî weke biçûka girê Dûldûl ber bi girekê ve hatibû lêkirin. Kolanên Demiroluk û Nexweşxaneyê di ketina hundurê bajêr de li qadek fireh hatibûn çêkirin. Li bajêr nexweşxaneyek, dibistanek amadeyî, hema biniya wan re Dibistana Pîşeyî ya Keçan, biniya wê re jî Dibistana Hunerê ya Yapi ya Xortan hebû. Dêrsim bajarek ku dibistanê xwe zêde bûn.

Aliyê kişlayê yê li rojava dinêre, ku binavê herêma daristanê dihat nasîn, kolana daristana xwedî tije mal û saziyên fermî hebûn. Avahiya herî zêde bal dikişand muduriyeta Daristanê û tabura leşkerî bû. Dibistana Mamosteyan li qontarê Munzur ê miqabil bû. Li qada Kalan-Mamikî hatibû sazkirin. Avahiya herî balkêş a miqabil ev dibistan bû. Kolana Gazî jî hema li kêleka wê bû.

Munzur, bajar kiribû du beş. Hema weke robarê Ren bû. Ji cihê bi çemê Xarçikê re dibû yek re digotin gola Xizir. Ewder weke ziyaretê dihat bikaranîn. Her roja çarşemê diçûn serdana

wir, hema bêje hemû bajar diçû wir. Dema em zarok bûn sondek ku em hîn bûyîn jî ‘xizirvo’ bû. Ev gola bi yekbûna her du avan pêk hatî, bi gerên xwe yên avê ve tirsek mezin dida avakirin. Gelek ciwan di nava van geran de xeniqî bûn. Dibe ku ji bona van bûyeran evder kiribin ziyaret. Jixwe bawerî jî li hember mijarên ku mirovan giranî wate ne didan, hêza wan têrê nedikir, an jî sira wê nedizaniyan pêş ketibû. Lewma ya rastî her çarşemê pêxistina findan, serjêkirina qurbanan û belavkirin xêran raveya van nêzîkbûn û bê çaretiya heyî bû.

Li cihê find pê dixistin qetek rûnê çêbibû. Kevir, an jî pere bi wir ve dikirin. Ev jî miradek xwe digirtin û wisa pê ve dikirin. Dema ev kevir, an jî pere diket, ew mirada hatî girtin jî, ango pêk nedihat. Lê ji ber ew zemîn jî nerim û bi hev ve dima, xwezayî mirad wan pêk dihat! Ez pir diçûm wê ziyaretê. Min carekê 25 quruş pê ve kir û min ji Xizir xwest ku ezmûna min a nivîskî baş derbas bibe. Dema pere pê ve ma kêfa min pir xweş bû. Ez bi wê moralê ve tevlî ezmûna nivîskî bûm û min di radeyek baş de encam girt.

Bandorên baweriyê yên bi min re dihat jiyîn jî di vê çarçoveyê de bû. Em zêde di wî temenî de ne di zanebûna çand û cewhera Elewiyîtiyê de bûn. Lê li mala me jî wêneyek Hz. Elî yê mezin û çarçovekirî hebû. Ji ber di heman demê de bavê min jî ‘pîr’ bû, di domandina kevneşopiya eşîreta Kureyşiyan de bandorker bû. Pîrê me jî hebû. Tê bîra min, dema pîr dihat malê, di serî de bavê min, em hemû li gorî rêza temen diketin rêzê û li ser piyan disekinîn. Me destê xwe li pêş dida ser hev û li bendê diman. Piştî ku li ser dîwana rûniştî duayên xwe xilas dikir, me destpêkê cihê wî paşê lingê Pîr û herî dawî jî destê wî

radimûsan. Lê ti caran kêfa min ji vê merasîmê re nedihat. Lewma ez pir kêm tevlî vê merasîmê dibûm.

Bavê min ne Pîr'ê weke wan bû. Ne diçû cem talibên xwe. Talib, eşîret û klanên li derdora Pîr ên bi wî ve girêdayî ne. Ji Pîr re dua dikirin û çi xeleta ku dixwestin didan Pîr. Li cem me jî ev hemû berovajî bibûn. Talîb dihatin serdana mala me û ji bavê min alîkarî dixwestin. Tişta ku wan ji gund jî danî tenê sitilek biçûk a mast û piyanek biçûk nivişk bû. Lê bersiva van jî zêdetir di asta ku bikaribin hemû pêdiviyên xwe pêşwazî bikin dihat dayîn. Ji bona kesên ku li gund dijiyan zêdetir pêdiviyên weke şekir, sabûn û hinek tiştên din ên bingehîn hewce bûn. Carê li gorî derfetan pere jî didan wan. Ev şêwaza peywendiyên ku pêş diket, hezkirina min a li hember bavê min zêde dikir. Ez her tim di wê baweriyê de bûm ku gelek tiştên baş û xweşik dikir. Ev xisleta wî ya alîkariya mirovan dikir ez hestewar dikirim. Dem bi dem diya min ji bavê min aciz dibû, digot ne baş e ku wan hînî şêwazê wisa dike.

Li gel vê bavê min jî li dijî hinek tiştan derdiket. Gelek caran rexneyên xwe li Pîrên ku tevî derfetên wan hene her sal çi xelat û pereyên ji xwe re dixwestin dikir. Ev jî dema ji Almanya dihat, di serdanên xwe yên cem Pîran de gotibû. Rojekê dema Pîr û komek mêvanên din amade bûne, ji dilê xwe got; "ezê pirsekê ji Pîrê xwe bikim, lê bila dilê xwe negire. Ez li welatê gawuran weke karkerekê kar dikim. Ev jî ji bona çend quruşan kom bikim û ji zarokên xwe re bişînim dikim. Dibe ku di vê mijarê de di zehmetiyê de nemane, lê zarokên min tev xwendekar in, diçin dibistanê û bavê wan ne li mal e. Pêdiviya wan bi eleqederiyê heye. Gelo we rojekê pirsa zarokê min kir? Ma Pîrtî ev e? Giyanweriya wê girîng e. Divê Pîrtî

tenê dema ez ji Almanya têm neyê bîra we?" Gelek mijarên weke vê dan pey hev û rêz kirin.

Wê demê hinek lêgerînan bi me re jî destpê kir. Di heman demê de em di wê temenê de bûn, me dikariya em lêpirsîna gelek tiştan bikin. Ji ber gelek nîqaş û bûyerên rû didan ji aliyê me ve jî dihatin dîtin. Ev rewşên ku bavê me rexne dikir, li gor kêfa me jî bûn. Piştî vê carek din Pîr nehat mala me.

Serdanên ji bo dûzgûn baba

Girêdana bavê min a bi ol re jî ecêb bû. Em her sal diçûn serdana Dûzgûn Baba. Salên destpêkê em jî dibirin. Zêdetir em ji gund diçûn. Em di wan havînên gerim de bi piyan diçûn û sê rojan dimeşiyan. Her û piyan mezî, bi taybet jî bêpêlav, xas çûyîn xêr bû. Baweriya ji Dûzgûn Baba re wisa bû. Ji ber qaşo mirov nikare hêsan bigihêje wî. Hinekan jî rojî digirt. Ango bi hezin diçûn. Hinek ji bona 'nexweşiyek xwe bê derman heyî baş bike' diçûn, hinek jî 'ji bona dergeha xwe şîn bike' û hinek jî 'bi bendewarî û miradên cur be cur ve' diçûn.

Dûzgûn Baba lutkeya çiyayek pir bilind e. Berî ku mirov bigihêje ser gorê gundên ku li wan deran tije darên behîvan, bexçeyên xweşik û kanî hene. Destpêka wê 'Xiniyî Xaskar' (Kaniya Haskar) hebû. Ev kanî çalek li nav kevirek biçûke û ji nav tehtan derdikeve. Ava ku ji tehtan tê di vê çalikê de kom dibe. Tê gotin ku ev av li ber gunehkaran zuha dibe. Lewma tişta herî girîng derûniya kesên ku ji vê avê vedixwin bû. Lê nezehmet bû ku mirov siriyeta vê fêm bike. Lê dîsa guneh bû ku di vê mijarê de şîrove werin kirin. Ji ber av li ser tehtan kêm diherikî, dema li pey hev zêde bihata vexwarin, xwaziyî av

kêm dibû, an jî xilas dibû. Jixwe dema mirov ervaziyan dihilkişe pir tî dibe. Lewma dema mirov li şûna qurtekê, gelekî vexwe, av namîne.

Ya duyem jî; gelek caran av nediherikî. Dema çavkaniya berfê ziwa dibû, yekser herikîna wê bandor dikir. Lê ev kêmbûn di wextekê de çêba, bê moraliyek mezin çêdibû. Dihişt ku lêpirsîna xwe bike. Dihizirî ku di kîjan mijarê de gunehek kiriye. Xewnên xirab didît, ew serdan vediguherî kausekê. Paşê ev dibûn gotin û heta gundan belav dibûn. Êdî li hember Dûzgûn Baba dibû 'gunehkarek', giyanweriya wî dirûxiya. Êdî demek dirêj jî derûniya wî baş nedibû.

Ez bûm şahidê tiştên ecêbtir jî. Girêdana bavê min ji toteman re nakokiyek bi serê xwe bû. Lê rasteqîniya wê jî zêde bû. Xwedî xelekek materyalîzma çors bû. Salekê dîsa li ser gora Dûzgûn Baba komek qelebalix hatibû serdanê. Malbatek ji nav wan bala min kişandibû. Zêde ciwan tevlî van serdanan nedibûn. Zêdetir kesên kal û pîr, nîvemir, an jî zarokên di temenê me de hebûn. Weke din jî temenmezinên ku dikariyan bimeşin, ji bêhna çiyan hezdikirin dihatin. Dibe ku di demê ez diçûm de ciwan kêm dihatin. Malbata ku ez dixwazim behs bikim ji Stenbûlê hatibûn. Di heman demê de Tirk bûn. Bavê min jî rêyek dîtibû û ew ciwan nas kiribûn. Paşê jî nîqaşek gerim meşandin. Bavê min weke ku şîretan li wan bike, bi wan re di-axivî;

"Belê, lawê min, em bi mejiyê kevin rabûne û hatine. Bi sala ne jî tên. Tu ciwanî. Her wiha zanîngehê jî dixwînî. Tu çima ji Stenbûlê heta vir hatî?"

Lê wî ciwanî bawer kiribû û wisa hatibû. Ji ber salek berê nexweşiyek jiya bû, çûbû gelek doxtoran. Lê ti doxtorî/ê ew baş nekiribû. Cîranek wan ê ji Dêrsimê pêşniyar kiriye ku serdana gora Dûzgûn Baba bike. Ew jî hatine. Piştî ku ew ciwan vegeriya ye, pir baş bûye! Ji bona vê jî malbatê soz daye ku her sal were serdana gorê.

Piştî ku bavê min ew ciwan guhdar kir, kenek xweş kir û nîqaşên xwe berdewam kir. Nîqaşek wisa bû ku, yên zimanê Tirkî fêm dikir, hatibûn ew nîqaş guhdar dikirin. Bavê min jî behsa zarokatiya xwe û gundê Taxtixelîl, tiştên ku jiyane dikir;

"Ez wê demê di neh saliya xwe de bûm. Ketibûm tayê, weke ku di nava agir de bûm. Ji ber zarokê malê tenê bûm, dê û bavê min digiriyan. Hemû gundî civiyabûn, her kesê ku dihat weke wan digiriyan. Bêçare diqêriyan û li ber min diketin. Digotin; "Aaax ev zarok dimire!" Her ku min jî ew dibîhîstin ez zêdetir xirab dibûm û ji aliyê derûnî ve bandor dibûm. Hinek jî ji gundê Şekermanê hatibûn. Kalek ji nav wan, ji nav qelebalixê derket, hat destê xwe danî ser serê min û germahiya laşê min pîva. Got; "zû vî zarokî bibin. Ji gora Hisên a li goristana Sogayîk hinek ax bidin xwarin û bi ava kaniyê bişûn. Dê zarok baş bibe, tiştek wî nemîne." Vê jî bi min re hezkirina jiyanê û baweriya ku ezê nemirim ava kir. Dema ez di nava germahiyê de dişewitîm, wan ez zêdetir li nav lihêfan dipêçam û hewl didan min baş bikin. Lê wan nedizaniya ku ketime tayê. Ava di kaniya goristanê de, ji bo min baş bû. Taya min kêm kiribû. Ez ji goristanê heta malê bi lîstok û reqis hatim malê."

Dema qala van dikir, qinyata li ser xeta di navbera jiyan û mirinê de ji aliyê jiyanê ve biryara xwe zelal dike û bi wê giyanê dijî. Li dijî bilindbûna germahiya taya di laşê mirov de

bilind dibe, dema ava cemidî bi mirovan de dikin, reaksiyona ava cemidî di laşê mirov de ava dike û çawa ev dibin sedema başiyan, hemû aliyên zanistî ve rave dikir. Êdî ciwanê Stenbûlî jî bi derûniya ku dê baş bibe hatibû. Ya duyem jî, av û hewaya Dûzgûn Baba xweş bû. Qurban dihatin serjêkirin, goştên teze û mast dihat xwarin. Ev tev hêmanên başbûnê bûn.

Çûna Almanya jî bandor li ser baweriyên bavê min nekiribû. Berovajî, hiştibû ku zêdetir bibe. Heta ji ber hesreta welat gelek helbest û awaz li Almanya nivîsandibû. Her wisa serdanên li ser gora Dûzgûn Baba jî jibîr nekiribûn.

Bavê min di sala 1969'an de çûbû Almanya. Ne gengaz bû ku zêdetir li lojmanên Kişlayê bimînin. Lê ji ber di heman demê de hevalê heman karê wî Elî wê li heman malê bicih biba, ne dixwest ku malbata xwe zû ji gund bîne. Em heta ku ew hatin li heman malê man. Em wê havînê cardin çûn gund bêhnvedanê, piştî demekê man cardin vegeriyan. Tam di wê pêvajoyê de bûyerek ku hat jiyîn, bandorek giran li ser min kir.

Rojek germ û dirêj a ji havînên Dêrsimê bû. Wê sînemaya havînê ne filmek ji rêzê, bûyerek rastî ku hatiye jiyîn û balkêş bi Dêrsimiyan bidaya temaşekirin. Navê lîstokê jî Pîr Siltan Abdal bû û wê ji aliyê Koma Şano ya Hemdem a Enqereyê ve bihata pêşkêşkirin. Hêj zû ve biletên wê hatibûn firotin. Afîş hatibûn daleqandin û propagandeya wê hatibû kirin. Çanda me ya Şanoyê tinebû. Min jî heta wê demê qet şano temaşe nekiribû. Min digot qey weke dibistanan lîstokek piyes, sikeç e. Lê min Pîr Siltan Abdal jî ji kilamên dihatin gotin û çîrokan dizaniya. Bavê min kilamên Pîr Siltan bi sazê re pir xweş digot.

Ji êvarê re kêmek mabû. Yên ku li lîstokê temaşe bikin, li ser cadeyan ber bi sînemayê ve diçûn. Di demek kin de pêşiya sînemayê qelebalix bû. Min gelek ji wan nas dikir. Dîsa hinek ciwanên ku dibistana bilind li Enqereyê dixwendin jî hatibûn. Ev jî hemû kesên ku me ji wan re digot, 'kekê me yên çepgir' bûn. Dema min ew dîtin mereqa min zêdetir bû. Heta wê kêliyê jî wesayîtek bi pilekaya 06 kolan bi kolan digeriya û bangawazî dikir. Pênaseya lîstokê dikir û dida nasîn. Derbarê naveroka wê de bi daxwiyaniyên propagandeyên balkêş ve her kes vedixwend. Qelebalix jî zêde dibû. Hinek kesan jî xwe dabûn dervî cihê sînemayê û dimeşiyan. Êdî hêdî hêdî her kes derbasî hundur dibû. Di carekê de teksiyek bi markaya Renault a reş bi lez ket nava qadê, ber bi aliyê qelebalix ve hat. Hemû şibakeyên Kişlayê bi mirovan dagirtî bûn û li kolanê temaşe dikirin. Me zarokan jî piranî li derveyî qelebalixê, nîv çemberek ava kiribû, em li benda dora xwe bûn ku derbasî hundur bibin. Li pêş sînemayê tevlîheviyek mezin hebû. Ji bona her kes derbasî hundur bibe, hevûdû dehf didan, nîqaş derdiket û bi ser hev de qîr didan. Kêfa me jî ji vê tevlîheviyê re dihat. Mereqa me ya zarokatiyê jî zêde dikir. Ji ber gelek dayîk ji bûyerên ku rû didan ditirsiyan, hewl didan zarokên xwe bibin malê. Lê tevî ku hevalê min ferz dikirin û digotin; "em biçin malê", min ne dixwest biçim. Ez wê demê di temenê yanzde salî bûm.

Dema teksî bi lez û bi deng hat, bi her kesî re tirs û xof ava bû. Li pey wê yekser agahdariyek hat kirin;

"Baldar bin! Baldar bin! Lîstoka Pîr Siltan ji aliyê walî ve hatiye qedexekirin. Bila yekser her kes belav bibe!.."

Hêj gotina xwe temam ne kiribû;

Tevahî girseyê bi dengê “Yuuuuh! Yuuuuh!” Re wesayît da ber keviran. Pey re jî diruşmayên “bila walî îstîfa xwe bide” destpê kirin. Kevir weke baranê dibariyan. Carekê de her der tevlîhev bû. Paşê jî hejmara polîsan zêde bû. Dest bi binçavkirinan kirin û ji nava girseyê hinek girtin. Destê her kesî li banî, diruşma jî pir gerim dihatin qêrîn. Tiştek din jî ya bal dikişand, şerê nêz ê bi polîsan re bû. Çavên min jî bi wir ketibûn. Tirs û kelecan zêde dibû. Ez hinek din nêzîk bûm. Dengê qîrên jin û zarokan têkilhev bibûn. Ne xema min bû. Min hewl dida ez wî kesê ku ew û polîs bi kulman li hev didin bibînim. Min ji dûr ve şibandibû yekê. Ez ne şaşbûm. Apê Elî bû. Ango Elî Gûltekîn bû. Dema li hev didan carekê polîs, carekê jî Elî Gûltekîn diket erdê. Weke ku her duyan Perûçengî (Güreş) dikir. Êdî navbera polês û girseyê de pevçûn dihat jiyîn. Paşê çend polîs din jî çûn, bi zorê Elî Gûltekîn girtin û li wesayîta polîsan siwar kirin, birin. Di wê kêliyê de birayê wî Welî jî hewl dida birayê xwe ji nav lepên polîsan rizgar bike. Vê carê jî polîsan êrîşî wî kirin. Lê ew zilamek yeman bû. Bi her du destên xwe singa xwe vekirîbû û diqêriya;

“Kuro de lêxin! Kesê li min nexê zaroyê qehbika ye. De lê xin.!”

Polîsan bi cop û qontaxê çekan ve dest bi lêdanê kiribûn. Polîsekê got;

“Kuro pîçê Moskoviyan! Komînîstê sor! Tu nikarî xwe xilas bikî. Bila Moskovî werin te rizgar bikin!” Û lê dixistin. Paşê ew jî birin. Welî gundiyek egîd bû. Dibe qet haya wî ji Moskoviyan jî tine bû û ne dizaniya ku çiye jî. Ne bihîstibû. Ger bigotan Rusî dibe ku fêm bikira. Lê ji Moskoviyan çi fêm dikir! Lê kêm-zêde Welî jî û her kesî jî dizaniya ku

Moskovîbûn û Komînîstbûn weke dûjîn dihat gotin û di vir de polîs jî qet tiştek ne baş gotiye.

Pevçûn berfireh bibû. Diruşma û avêtina keviran ne rawestiyabû. Êrîş û tundiya polîsan jî berdewam dikir. Ev bûyer pir zû li Dêrsimê tevê belav bû. Polîsan kî digirt, derbasî wesayîtên xwe dikirin û dibirin. Ew qelebalix derbasî meşê bû. Komên ku belav bûn, ji nişka ve weke ku ferman hatî dayîn li ser rê ketin rêzê, kulmên wan ên çepê li hewa, weke ku bi diruşmayên wan re dihejiya derbasî nav meşa bi hêrs û hişk bûn. Dilê min bi apê Elî û Welî êşiyabû û giriyam. Lê di wê kêliyê de îsyan û hêrsa wê qelebalixê bandor li min jî kir. Tirsa min jî hêdî hêdî derbas bû. Ne tenê polîs bi hêz bûn. Ew mirovên hemû nas bûn û dihatin zanîn zêde bûn û tirsa wan tinebû. Demekê bi wê qelebalixê re beziyam. Kesayeta min a ku beriya niha ji ber qîra diya min bi israra xwe neçûm, min wê kêliyê qeta şibakeyê şikand û derbasî hundur bûm. Tişta yekem dihat bîra min, ew polîsê ku li apê Elî xistibû! Ew polîsê ku hema kêleka mala me rûniştibû! Ango cîranên me bûn. Min ew nas kiribû. Çawa ev kiribû? Ez tim diçûm mala wan, cem zarokên wî. Em hevalê hev ên dibistanê bûn. Diya min jî bi jinê re samîmî bû. Carê diçû mala wan. Peywendiyek pir gerim a cîrantiyê tine bû, bi tirs nêz dibû, bawerî bi me ne danî. Ji ber bi gelemperî ji aliyê gelê xwecihî ve polîs nedihatin hezkirin. Lê her çendî navberek hebe jî, peywendiyên me yên cîrantiyê baş bûn.

Min rewş ji diya xwe re got. Destpêkê nexwest yeqîn bike. Paşê jî bi ser guhê xwe re avêt. Min jî ji xwe re sond xwar ku, ezê êdî neçim wê malê.

Bûyera hatî jiyîn, bi taybet piştî li apê Elî, Welî û mirovên din xistin, berxwedaniya girseya bi yek dengî, ji ber çavên min nediçû. Apê Elî û Welî biribûn qereqolê. Hêj Welî li wir, polîsan bi simbêlê wî re girtibûn û gotibûn; "emê van têl bi têl rakin, ey pîçê Moskoviyan!" Singa wî jî hemû bi mû bû. Nexwe wê ew jî rakiran! Dema ez li ser wateya wê gefê û kêliya êşa rakirina wan mûyan hizirîm, gelekê xemgîn dibûm.

Hevjîna polîsê ku cîranê me bû, wê rojê heta êvarî derî mifte kiribû. Kes ji wan derneketibû derve. Ji tirsan giriyabûn. Diya min ji ber xatirê cîrantiyê cardin li deriyê wan xistibû û ji wan re gotibû; "netirsin, tiştek tine ye." Min wate nedida vê jî. Min hestek bi nakok jiyan dikir. Gelo hewceyî bi nêzîkbûnek wisa hebû? Gelo suc bû mirov zarok, an jî hevjîna polîsan be? Lê wî polîsî li apê Elî, Welî û yên din xistibû. Dûjîn ji her kesî re kiribûn. Hemû polîs û malbatên wan jî yek bûn.

Wê rojê dengê diruşmaya qelebalixê qet kêm nebû. Qaraqol li kolana Demîroluk û nêzî avahiya MÎT'ê bû. Dengê çekan zêdetir ji wî alî ve dihat. Ev jî zêdetir dibû sedema tirs û xofê. Diya min bi jinên cîran re di-axivî. Hevjînê kesek ji wan ne li mal bûn. Kekê min û xalê min Hisên jî nehatibû malê. Lê piştî demekê agahiyek hat, hemû Kişla xist nav liv û tevgerê. Mehmet Kilan hatibû kuştin!

Mehmet Kilan birayê Emîneya, hevjîna xalê min Hesen bû. Em yekser çûn mala wan. Li malê her kes bi qêrîn digiriya û diloriya. Xalê min digot ku beriya niha demek kin bi Mehmet Kilan re bûne, bi hev re ereq vexwarine. Lewma yeqîn nedikir ku hatiye kuştin. Mehmet Kilan mirovek temenê wî navîn bû. Gelo çima û ji bona çi hatibû kuştin? Mirovek zerara wî li kesî nedibû, di halê xwe de dijiya. Ev agahî zû belav bû.

Li gorî hatî gotin, bûyerê wisa rû dabû: Li pêş qereqolê qelebalixek mezin kom dibe. Bi armanca berdana hevalên hatine binçavkirin diruşme qêriyane. Paşê ji nav ciwanên gundê me ciwanê bi navê Hesen Kûçûkoba, ala Tirkan dişewitîne. Polîs jî vê dike hêcet û li derdor berbelav guleyan direşîne. Dîsa jî qelebalix ji pêş qerekolê naçe. Ji ber vê bûyer mezin dibe û li her derî belav dibe. Gelek mirov li nav kolanan çeper digirin ku xwe ji pîşekan biparêzin.

Paşê diyar dibe ku Mehmet Kilan çawa tê kuştin. Mehmet zêde vexwariye û mest bûye. Dema dibîhîse lîstoka Pîr Siltan Abdal ne hatiye pêşkêşkirin û hinek hatine binçavkirin, dema bûyer jî destpê dikin, diçe da ku bûyerên rû dane rawestîne û her kesî bihedirîne. Di destê wî de desmalek spî, derdikeve, wer dizane ku dê wisa bûyer rawestin. Li gorî wî, ji ber lîstok nehatiye temaşekirin lewra ciwan aciz bûne û nasekinin. Li gorî wî nerast bû ku ji bona vê bertekek wisa raber bikin. Xweziya ew lîstok bihata pêşkêşkirin, da ku bûyerên wisa jî rû nedaban. Mafê ciwanan hebû ku aciz bibin. Bîlet hatibûn girtin. Hatibûn pêşiya sînemayê. Çawa dibû ku di kêliya dawî de temaşekirina filma sînemayê hatibû qedexekirin! Her wiha lîstokvan jî, ji Enqereyê hatibûn. Destûra fermî hebû. Ev lîstok li her derî hatibû lîstin, ma çima wê li vir nehatibûya lîstin? Mehmet Kilan di ber xwe de van di-axive û ber bi wan ve diçe. Ma ji kur dizaniya ku Wê şehîdê wê rojê be?

Dema ew di cadê de dimeşe, polîs jî ji şibakeya biqabil berê namluyê zivirandiye û sekiniye. Dema hinek din nêz dibe, kêliya ku destê xwe dibe berîka xwe desmalê derbixe, lê didin. Kuştinek evqasî ji rêzê û bêwate pêk tê!

Ev bûyer jî herî zêde hêrsa koma ku li derdora qereqolê li ber xwe dide mezin dike. Ji nişkê ve diruşmayên "Mehmet Kilan namire!" Tên qêrîn û li tevahiya Dêrsimê belav dibin. Dema min diruşmaya "Mehmet Kilan namirin" bihîst pirsek di serê min de çêbû! Ji bona kesek ku miriye, dihat gotin ku namire. Gelo wateya vê çibû? Çima Şehîd nedimirin!?

Paşê ji Elezîz û Erzîncanê takwiye tê xwestin û li Dêrsimê demek dirêj derketina kolanê qedexe bû. Heta sibehê her kes li nava bendewariyek tirsnak de bû. Tirsa dibe ku her kêlî agahiyên mirinê werin dihat jiyîn. Ketin û derketina navenda bajarê Dêrsimê hatibû qedexekirin, koçe û kolan ji cendirme û polîsan tije bibû. Ev dorpêça bi vî şêwazî hatibû avakirin, heta sibehê zêdetir teng dibû. Her der yek bi yek dihat gerîn, kesên ku têkil bûyerê bûne dihatin binçavkirin. Gelek ciwanên ku berê xwe dayîn çolteran û xwestin ji Dêrsimê derkevin, di rêyan de hatibûn girtin. Diketin kemîna polîsan.

Ew şev weke kabûsekê bû. Me sibehê bi berbangê re, şêwaza pêkanîna qedexeya derketina derve, ji nêz ve û zelal dît. Di demjimêrên zû de leşkeran derdora Kişlayê jî girtibûn. Dema perdeyên şibakeyê hatin vekirin, ew dîmenên leşkeran ên berên namluya çekên xwe çend metreyan wir de li ser cadeyê dane şibakeyan, diya min tirsandibûn. Dema wê got; "weeeyy!" Û xwe bi paşde da, me mereq kir. Diya min pir tirsiyabû. Ji bona bala leşkeran belav bike û şika ji me nebin, dest bi paqijiyê kir. Dema min di camê re temaşe kir, min dît ku her der tije leşker e. Her du gavan leşker hatibûn rêzkirin. Çek di destên wan de, tiliyên wan jî li ser tetîkê bûn. Kesek tenê jî sivîl li kolan û cadeyan diyar nedibû. Kî derketa

kolanan, bêyî ku kesî guhdar bikin, biçûk-mezin her kes digirtin. Paşê bi tundî li deriyê me xistin.

Dengek sitûr digot; “zû derî vekin, emê li malê bigerin! Bila kes nêzîkbûnek cuda neke, nexwe emê guleyan bireşînin.!”

Mala me di ketina hundurê Kişlayê de ji aliyê rastê ve deriyê sêyemîn bû. Diyar bû li mala yekê ne geriyabûn, polîsan ew mal qevastibû, yekser hatibûn mala me. Çawa derî hat vekirin, bi pêlavên xwe ve, weke guran êrîş kirin û ketin malê. Destpêkê pirsa bavê min kirin. Diya min jî got; “li Almanya ye.” Li malê xortek mezin ku bala wan bikişîne tine bû. Kekê min hêj biçûk bû. Zêde bal nekişand. Lê ger bizaniyan ku nîvê şevê hatiye malê, misoger wê ew jî bigirtiyan. Diya min got;

“Ma hûn bi pêlavên xwe dikevin malê. Min nû paqij kiribû.”

Bi vê gotina wê re fermandarê leşkeran bi dengek aciz û fermanî got;

“Belê, xatunê em wisa dikevin her derî!” Û bersiva wê da. Ango xwestibû bêje, ‘em wisa dikevin her malê, ti cudahiya mala we tine ye.’Ev gotinên wî jî gef bûn. Di wateya ku, ‘weke din tiştekê nebêje û nepirse!’ de bû. Lez li her derî geriyan. Her der berbelav kirin. Ne diyar bû ku li çi digeriyan. Heta mehfûr, berikên li binê malê rakirin û li bin wan digeriyan. Paçên dîwaneyan, balgî, selikên cilan her der vala kirin. Bi pêlavên xwe pêl her cihî û her tiştî kirin. Her kêliyê jî fermana, “de lawê min, zû bikin” dihat dayîn. Lêgerîna mala me xilas kirin û bi qelebalixek mezin derî girtin û çûn. Vê lêgerîn bi saetan li Kişlayê berdewam kir. Qelebalixa korîdoran, qêrîn, dengê

lingan û bazdana leşkeran kêm nebû. Wê rojê jiyan ji hemû rojan cudatir bû.

Piştî demjimêrên dirêj agahî li nav korîdoran belav bû. Gundiyê Kemal Burkay Elî Ekber ê ji Mazgîrtê, Metîn Gûngormûş, Riza û Erdal hatin girtin û birin. Gelo çi eleqeya wan bi bûyerê re hebû? Nexwe wan jî di pevçûna bi polîsan re cih girtibû û diruşma qêrîbûn. Ew jî ciwanên li dijî dewletê derketibûn! Baldarî û sempatiya li hember wan zêde dibû. Bi mereqek mezin dipirsîn, gelo weke din kî hatibû girtin? Weke din kî bi van bûyer û karan re mijûl dibû? Her kesî derbarê wan de texmîn dikir. Pirsên bi tije tirs û guman demdirêj hatin kirin.

Ciwanên ku hatibûn girtin, kekên me yên her kesî ji wan hez dikir, pîroz dikirin û ew di-ecibandin bûn. Hemû jî şoreşgerên gerim ên wî demî bûn. Êdî gotinên pir zêde bal dikişand, xeternak, lê kêm dihatin bikaranîn belav dibûn. 'Komînîst, çepgir û şoreşger.' Ev jî peyvên ku nû têkil jiyana me dibûn. Li ser hinek lewhan hinek diruşmeyên bi îmzeya Partiya Karkeran a Tirkî (TÎP) hebûn. Lelê, tiştek din jî hebû. Li ser lingê beton a pira hilawistî ya li gundê me jî, bi tîpên mezin û boyaxa sor 'Ji Rojên AK-PAK re' nivîsên Partiya Karkerên Tirkî hebûn. Min ti wate ne dida van. Lê her cara ku ez di wir re derbas dibûm, min ew nivîs dixwendin. Êdî di hişê min de lêpirsînekê destpê dikir.

Qereqol li kolana Demîroluk bû. Malên li wan derdoran dengê êşkenceyê dibîhîstin. Kesên ku di bûyera Pîr Siltan Abdal de hatine girtin, demek dirêj li wir girtine û êşkence dîtine. Bi rastî jî simbêlên Welî yên sor hatibûn kişandin. Dihat gotin ku cixare jî li ser singa wî hatiye tefandin. Lê piştî ew hat berdan cardin simbêlên xwe yên sor dirêj kiribû, cardin dîmenê

xwe yê berê ku ‘moskov’ dihat gotin bidest xistibû. Zêdetir bi gurur û li hember her tiştî bi baldar bû. Êdî ew Welî yê li gundê xwe, di halê xwe de dijiya hewl dida komînîstî û Moskovayê hîn bibe. Girêdana wî ya li hember kekê wî Elî zêdetir bibû. Ne karê her egîdiye ku li dijî dewletê serî hilde û kulman li wan bixe.

Dihat gotin ku perda guhê Elî Ekber ê ji Pîlvenk’ê di êşkenceyê de qetiyaye. Bi rastî jî her carê pembû dixist guhê xwe û dereng dibîhîst. Hinek ji wan binê lingê wan ji ber falakayê deqiyabûn, kesên ku cixare li ser ling û laşê wan hatine tefandin bi rojan, mehan di rojeva Dêrsimiyan de bûn. Ev mirov gelek caran ji ber êşa ku jiya ne, gelek caran jî ji ber egîdiya wan di rojevê de bûn û dihatin bi bîranîn.

Bûyerên ku rû didan bandor li malbatan dikir. Dewlet, ji bona kesên Dêrsimê bûyera 38 bû. Ji ber li wir dewlet nas kiribûn! Wateya vê jî; komkujî, çewsîneriyên hovane û sûrgûn bû. Ne bawerî bi dewletê dibû, ne jî hinek din. Ji ber şahidê îxanetan bûn. Rayberî derketibûn, kesên herî nêzî xwe û dostanî qirêj kiribûn. Eşîretan pişta xwe nedabûn hev. Kesên li pêş rû dikeniyan, paşve xençer lê didan. Kesên soz dayîn, pêk ne anîbûn. Weke ku radestbûn û têkçûn çarenûsek bû. Her tişt di 38’an de hatibû windakirin. Egîdî jî, qeleştî jî di wê demê de hatibû jiyîn û xilas bibû. Qonaxek mezin li wir hatibû dayîn.

Gelo ji nû ve Dêrsim e? “Ya rebbî, bila Dûzgûn Baba me biparêze, carek din ew roj neyên serê me!..” Li kêleka serê wê Elezîz, Çewlik û Erzîncan heye. Hemû jî dîtibûn. Bawerî bi wan nedibû! Dêrsim di nav êşên xwe de mabû. Ev di lorînên wan de jî diyar dibû. Ma Şêx Seît çi kiribû, heta hinek din jî bikin? Wî jî nekarîbû tiştekê bike! Elîşêr’an, Besê’yan efsane

bûn. Lê niha ne dixwestin ku cardin heman êşê bijîn. Dewet bi her tiştên xwe ve, birêxistinkirî bû. Mêtîngeriyê xwe bi sazî kiribû. Li Dêrsimê cewher hatibû siwakirin. Hinek ciwan, bi hewayên ciwantiyê tevdigeriyan. Cahilbûn. Wê bi xwîngermiya xwe, hinek bela baniyan serê xwe! Ev dewlet, dewletek xayîn bû. Ti caran ji bona Dêrsimiyan ne bû yar û pê bawer nekir. Kesên ku di asta herî ketî de îxanet jî kirin, hatin kuştin, li sêdaran hatin daleqandin. Dihat zanîn ku ti xêra kesên ku di vê astê de pişta xwe dane bingeha hebûna xwe, kesên ku hebûnên herî nêzî xwe kuştine, ji dewletê re nebûye û nabe jî. Dewletê kesên Dêrsimî baş nas kiribû. Ji ber Kurdewarî cara dawî û di asta herî kirêt de, di kesayeta Dêrsimiyan de hatibû binaxkirin.

Bûyerên nû hemû Dêrsimî ber bi bûyerên Dêrsimê yên beriya niha 30-35 salan ve dibir. Gelo Wê dewletê bûyerek 38'an pêk baniya? Gelo ciwan dihatin xapandin? Di şîroveyên piştî bûyerên li Kişlayê rû dayîn de, gelo kî bû ên dixapandin, serkêşî dikir û kî bû kesek din nahizire û van tiştan dike? Êdî li pey hev pirs dihatin kirin. Sê-çar ciwanên Demîrcî'yan hebûn. Zarokê wan ê mezin Haşim jî li Enqereyê zanîngeh dixwend. Metîn Gûngormûş jî dibistana bilind dixwend. Herî zêde ev ji derve bandor dibûn. Çavên wan vebibû. Lê zarokên Soylemez'an zêdetir bêdeng bûn. Di bin bandora dê û bavê xwe de bûn. Ew ne diketin çavên kesî. Bavê wan ji zarokên xwe yemantir bû. Çetîn'an jî wisa bûn. Kesên wan ên xwedî bejin, cindî, rêzdar û dibistana bilind dixwendin jî hebûn. Lê weke zarokên Tirkan hatibûn mezinkirin. Ji ber diya wan Tirk û bavê wan jî ji diya wan Tirk'tir bû. Zêde ti îhtîmalek ji bona wan dihat gotin. Ger pir veşartî nekin, tişta dixuya pir bêdeng û

nerim bûn. Zarokên Osman Mutlu rastger bûn. Osman Mutlu zilamê dewletê yê herî di çav de bû. Ew malbat bi jin û zilamên xwe ve, ji aliyê hemû malbatên ku li Kişlayê diman parçeyek ji dewletê dihatin dîtin. Peywendiyên bi wan re sînordar bûn. Her kes baldar nêzî wan dibû. Di peyendiyên cîrantiyê de ne xwezayîbûn û samîmiyet tine bû. Ji ber nêzîkbûnên wan ên berjewendîperest hebûn. Kesên ku bi wan re zêde samîmî jî weke kesên nêzî dewletê dihatin nasîn. Peywendiyên bi malbatên polîsan û hinek malbatên ku nêzî xwe dibînin re û peywendiyên wan ên bi malbatên xwecihî re pir cuda bûn û cewaziyek hebû. Hinek malbatan ji ber xatirê cîrantiyê û an jî di bin vî navî de peywendiyên xwe sînordar kiribûn. Lê hinekan jî xwe bi wan didan qebûlkirin. Belê, ev malbatên xwecihî yên xwe didan qebûlkirin jî zêde nedihatin hezkirin. Baweriya van malbatan dişkest. Li dijî van jî bertek zêde dibûn. Ev bertek bêdeng, lê mezin bûn.

Bûyera dawî hatî jiyîn, rûyê her kesî derxistibû holê. Êdî rengê her kesî dihat nasîn. Bûyera hatî jiyîn di rola qaxida turnosal de lîst. Êdî li Dêrsimê cudabûnek dihat jiyîn. Êdî her kesî refên xwe diyar dikir. Êdî ev di peywendiyên rojane, heta mêvandarî, belavkirina qurbanan, aşûre û niyazê de jî diyar dibû. Helwestek herî dawî bû. Dema ev dihatin belavkirin mafê wan kêm dikirin, ango nirxek zêde nedidan wan. Di dawet, ji dayîkbûn û merasîman de weke berê xelat ne dibirin. Di serdanan de jî diyar dibû. Ev hemû her yek helwest bûn. Di nava van helwestan de yên li hev dikirin, zêdetir nêzî hev bûn. Êdî keça Osman Mutlu Şenay jî weke berê nedigirtin nav lîstoka xwe bi ser werîs re avêtinê. Tevlî lîstokên ‘ateşlîm’ û çavgirtinê ne dikirin. Ji zarokên polîsan pir kêm di nava van

lîstokan de cih digirtin. Ew jî zarokên ‘polîsên baş’ bûn! Weke din jî jixwe malbatan destûr nedida.

‘Ax lawê min hisên, cewahîr hat kuştin!’

Ji dibistana seretayî pola 3. Û pê ve mamosteya min Edîbe Abacioxlu bû. Jinek esmer, hinekê qelew, berçavka wê hebû, lê pir sivik bû. Nîvê wê Ereb bû. Zêde cixare dikişand. Lêvên wê şîn û reş bûn. Kenê wê xweş bû. Min pir jê hez dikir, min ti caran ev mamosteya xwe jibîr nekir. Nivîsa min wê demê xweş bû. Bê kêmahî bî û dihat xwendin. Lewma her tim lênûska plansazî û ya hejmarê bi min dida nivîsandin. Ez wê salê berpirsa polê bûm. Dema mamoste neamade ba, plansaziya rojane min li ser textî dinivî. Jixwe bejna min jî hinekê dirêj bû. Min ji serê textî destpê dikir, wisa dinivîsand. Mudurê me jî cîranê me yê Kişlayê Mazlum Kaya bû. Heta demekê jî Mistefa Soylemez mudur bû. Min her tim weke bavê xwe jê hez dikir. Hinek xisletên bavê min bi wî re jî hebûn. Mamosteyê pola birayê min ê mezin bû. Her wiha malbatî, hemşehrî û dostaniyên wan pir bûn. Hevjîna wî ‘Eyşe Xanim’ karmenda tenduristiyê bû. Hemşîre-ebeya Kişlayê bû. Jinek pir şirîn bû û dihat hezkirin. Jêhatî, zindî û jîr bû. Apê Mistefa Soylemez zêdetir bêdeng û nerim bû. Lê baldar bû. Mamosteya pola me li kolana jêrîn dima. Hevjînê wê jî li qonaxa hukumetê karmend bû. Du zarokên wan ên kur hebûn. Kurê mezin Kamil diçû dibistana navîn. Yê biçûk jî dibistana seretayî dixwend. Pola jêrîn bû. Diyar dibû ku zêde bêriya zarokên keç dikin. Hevalên min ên heman polê Nesîbe û Ferîde jî li kolana ku mamosteya me lê diman bûn. Tenê ew Tirk bûn. Lewma zêdetir xwe nêzî

mamosteyê me didîtin. Min, ji wan jî pir hez dikir. Peywendiyên me baş bûn. Nesîbe bêdeng bû, Ferîde har bû.

Mamosteya min otorîter bû. Pir baş hîn dikir. Di mijara hînkirinê de hewildanek girîng raber dikir. Lê di heman demê de pir bi hêrs dibû, riko bû. Kesên ku dersên xwe yên malê çênedikirin, neynok, desmal û destên xwe paqij nedigirtin, bi guhê wan re digirt û dikişand. Carê jî bi cetvelê li wan dida. Lê kêm caran wisa dikir. Dema ku zêde bi hêrs ba, wisa dikir.

Li Dêrsimê ava vexwarinê di hinek roj û demjimêrên diyar de diherikî. Weke din ava heyî ne paqij bû. Lewma ji bona vexwarinê nedihat bikaranîn. Ava vexwarinê zêdetir di demjimêrên sibehê de diherikî. Li malên kolana jêrê piranî xizmetkar hebûn ku karên xwe bi wan didan kirin, karê rojane bi jinan didan kirin. Jinên wisa kêm bûn. Kes zû bi zû nediçû wan malan, xizmetkarî nedikir. Nedihat ecibandin. Ew jinên ku ev kar dikirin jî diyar bûn, li derdor dihatin nasîn. Mamosteya min jî, bi taybet di karê paqijiya giştî û şûştina cilan de bangî wan dikir. Êdî ez jî hînî jiyan û cîhana mamosteya xwe ya malê û dibistanê dibûm.

Rojekê em di dersê de bûn, li saeta xwe nêrî û ji nişkê ve got;

“Aaa. Keça min Sakîne ka were cem min.”

Ji ber wê gotina wê ya ‘aaa’ her kes ket kelecanê. Ez jî bi lez çûm cem. Ji pêşmalka xwe komek mifte derxistin. Yek ji wan hilbijart û bi baldarî şanî min kir û got;

“Tu vê miftê dibînî. Vê têkil ên din neke. Li ser ‘T’ nivîsandiye. Vê mifteyê bigire, yekser biçe malê. Tu malê nas dikî. Ew mala ku hûn hatin we cejin lê pîroz kirî. Derî veke,

dema tu ketî hundur, aliyê rastê cihê serşûştinê heye. Di qazana serşûştinê de xortom heye. Wê qazanê dagire, lê hişyar be bila bi ser de neçe. Nexwe wê sobe zingar bigire. Paşê wan bîdonên li xwaringehê, sirahiyan dagire û were. Ji ber Kamil jî ne li mal e, bila em bê av nemînin.”

Ez bi bazdanê çûm kolana jêr, weke hatî gotin min derî vekir, sîtil û bîdonên avê dagirtin. Lê min di wê navberê de hinek karên din jî kirin. Ji ber derdor pir belav bû. Hinde firaxên kirêj hebûn, mirov ne dikariya bikeve cihê xwaringehê. Lalîkek paqij nemabû. Odeyên din jî bi heman şêwazî tevlîhev bûn. Cilên xwe yên şevê û derpiyên wê hema çawa derxistine, li wê erdê bûn. Xwelîdank ji binkê cixareyan tije bûn. Destpêkê dudilî bûm, gelo têkil malê bibim an na. Gelo Wê çiqas rast ba ku bê destûr têkil malê bam? Ger cuda bihata fêmkirin, wê çiba? Bes hem îxtiyar bû û hem zarokên wê yên keç jî tine bûn. Dilê min pê şewitî, ne dibû ku malê di wî halî de bihêlim. Dilê min ne rehet bû. Paşê min biryar da. Min destpêkê bi lez firax şûştin û ji bona tahirkirinê danî nav sîniyê. Min her tişt li gorî wan rêz kir. Lalîk, kevçî û qedeh cuda rêzkirin. Min ji aliyekê ve bîdonê avê dadigirtin, ji aliyê din ve jî paqijiya malê dikir. Bi tena xwe bûm, lê min her tişt di nava lezê de paqij kir û mal komî ser hev kir. Dema ez cardin bi bazdanê çûm dibistanê, wext nîvî bibû. Min mifte da mamosteya xwe û derbasî cihê xwe bûm. Spasiya min kir. Destê xwe bi ser serê min re jî anî. Min jî wê kêliyê dilxweşî û kelecana ku mamosteya min di vegera xwe ya malê de bijî, hîs kir û kêfxweş bûm. Kêfa min jî dihat ku mamosteya xwe dilxweş bikim. Hêj haya wê ji tiştekê tine bû, min ew kêfxweşî dijiya. Dema ez çûm malê min ji diya

xwe re jî got. Diya min zêde pê kêfxweş nebû, lê zêde aciz jî nebû.

Roja paştir dema ez çûm dibistanê mamosteya min ji dûr ve bi şahnazî û watedar dikeniya û li min temaşe dikir. Dema ez çûm cem serê min danî ser singa xwe, bi destê xwe milê min girt û şidand û got;

"Keça min ew hemû karê malê te kirin? Te çawa zû ew qas kar kir? Te çiqas paqij kiriye. Teqez min ne dikariya ew qasî paqij bikim. Ez nikarim wan firaxan wisa rêz bikim. Ma tu li malê jî kar dikî? Diya te jinek çawa ye? Ezê mîsoger werim wê diya te bibînim, wê pîroz bikim, ku tu çawa xweşik mezin kirî."

Gelek tişt digot û hema bi xwe re di-axivî. Hem min pir şerim kir, hem jî bi qasî wî kêfa min ji dilxweşiya wê re hat. Êdî ez bawer bûm ku min tiştek baş kiriye.

Mamosteya min li odeya mamosteyan ji her kesî re behsa vê nêzîkbûna min kiribû. Ji mêvanê mala xwe re behsa min kiribû. Şanî hevjîn û zarokên xwe kiribû. Weke ku min karek pir mezin kiriye, pesinên min dabû. Bi taybet jî ji bona min şanî jinên taxê bike û bide nasîn, ez vexwandibûm mala xwe wê rojê. Ez jî bi hevala xwe ya dibistanê, hevala xwe ya me di heman polê de bi hev re dixwend Aysel Axircan re çûn mala wê. Beriya her kesî wê em ramûsîn, paşê mêvanên din. Hinekan jî tenê bi destê xwe silav dan me. Em jî di nava ewqas jin de dan rûniştin û xizmeta me kir. Lê min dîsa jî xwe negirt, ez rabûm me çay bi hev re belav kir. Bi israr ji min re got ku ez mêvana wê me, lewma divê ez têkil ti karek din nebim. Min mantiya bi mast çêkiribû, bi şermik mezin dixwar. Lê her kesê

li derdora min ji rûniştin, vexwarina min a çayê, heta xwarin xwarina min ez dişopandim. Her ku min ew wisa didîtin, bêhna min teng dibû. Lê dîsa jî min bi baldarî dixwar û vedixwar. Dîsa jî min karî ez lalîka mantiya dayîn min bi kevçiyê biçûk û kekê jî bi çetel bê ku birijînim, an jî nêzîkûnên ecêb bikim bixwim. Ji ber ez ji vî alî ve û di hinek karên din de jêhatî bûm, bi min re ji xwe bawerbûn û rehet axaftin jî pêş dixist. Hêdî hêdî şerimkirin û bêhn tengiya min jî derbas dibû.

Di pêvajoyên pey re jî, ji bona avê dagirim çend caran çûm. Lê ez vê carê bi Aysel Axircan re çûm. Ew ji kar zêdetir bi derdor û tiştên ku merek dikir ve mijûl bû. Wextek dirêj bi kotîka cixareyê ya li odeya mêvanan ve mijûl bû. Ji ber dema mirov devê wê vedikir bîbloya jinê ya li ser devê wê bi muzîkê ve dizivirî û demekê wisa dima. Weke din jî Aysel, hêj di wî temenî de çav li cixareyê dikir. Cixare dixist devê xwe, dîsa bi çeqmeka girêdayî kotîka cixareyê ew cixare pê xist û di kêşana yekem de dest bi koxikê kir. Min jî hem erza wê da, hem kena xwe pê kir. Ji ber min rast ne didît ku ne bêdestûr titekê bigire û ne jî cixareyê bikişîne. Lê Aysel ne tenê ev kir, şorbeşîra di dolaba cemedê de xwar û ji bona cihê ku jê xwariye diyar nebe, şûna wê av lê zêde kiribû. Ev jî sucek cuda bû. Ger mamoste biketa ferqa vê, êdî baweriya xwe bi me nedanî. Weke ku ferq jî kiriye, ez ji şerman di nav xwêdanê de mam. Her çendî bê dilê min jî be, min ji kaseya şekiran a mêvanan di destê Aysel de dirêjî min kirî, hinek girt û xwar.

Rojekê dema ez bi tenê çûm, hevjînê mamosteya min jî li malê bû. Nû ji xew rabibû. Piştî ku min av girt, min xwest bê ku rawestim derbikevim. Lê ez dam rawestandin. Xwest 2,5 quruşan bixe berîka min. Min negirt û pir jî ji vê nêzîkûnê aciz

bûm. Weke ku ji bona min alîkarî kiriye, ev heq daye min. Lewma ez piştî wê hinekê bêdeng bûm. Li zora min çû. Ez ne xizmetkarek ku diçûm malan min kar dikir. Ji ber min ji mamosteya xwe hez dikir, min xwest ku alîkariya wê bikim. Ev jî jixweber pêş diket. Jixwe êdî mamosteya min jî carek din av ji min nexwest. Carê li wextê li kolanan belavkirina avê dihat guhertin.

Min di meha Aşûreyê de, di sitilek biçûk a destan de Aşûre bir ji wan re. Roja paştir dema ez çûm sitilê bigirim, min dît ku Aşûre rijandine. Ez jî di hundurê xwe de aciz bûm. Diyar bû Aşûreya me çêkirî ne ecibandibûn! Rijandin guneh bû! Mamosteya min çawa tiştek wisa kiribû. Min nedixwest bawer bikim.

Her cêwiyên ji min biçûktir jî keç bûn. Me ji bona şîr bidin wan çêlekek li cihên daran xwedî dikir. Lê mamosteya me jî nîv kîlo bi pere ji wî şîrî digirt. Ji ber peydakirina şîr zehmet bû. Dema pê hesiya çêleka me heye, gotibû ku dikare bi pere bikire. Bi israr jî gotibû ku bê pere qebûl nake. Min şîr dibir ji wan re.

Rojekê mamosteya me hat mala me ya li Kişlayê. Diya min hemêz kir û ramûsa.

Got; “te Sakîne çawa mezin kiriye, min mereq kir, min behsa wê ji her kesî re kiriye.”

Diya min jî bi wê Tirkiya xwe ya xirab ve di-axivî. Dema nedikariya tam bersivê bide, ez diketim navberê. Min hêj jî ji ber diya min baş bi zimanê Tirkî ne di-axivî şerim dikir. Min ne dizaniya ji bona çi jî şerim dikim, lê min şerim dikir. Mamosteya min çavderiya malê dikir. Xwerûbûna odeya me ya

mezin û xizaniya me dît. Jixwe wê jî li jiyanek pir rehet nedigeriya. Ji ber mala wan jî xwerû bû. Her wiha malbatek karkeran û paqij bû. Ez bawerim rewşa herî zêde jî pê bandor bûyî ev bû. Ev serdana wê hişt ku ez zêdetir jê hez bikim.

Ez di pola pêncemîn a dibistana seretayî re hînî hinek tiştên nû dibûm. Gelek bûyerên ku hêj min wate nedida wan, an jî ne di ferqa wan de bûn hatin jiyîn. Carê min nûçeyên radyoyê guhdar dikir. Dihat gotin ku; "di pevçûnên bi terorîstan re hatiye jiyîn de" destpê dikir, an behsa birîndaran, an jî behsa kuştinan û girtinan dikir. Pêşkêşvanan jî ev bi zimanek gelekî balkêş digot. Gelek caran nasname û navnîşanên kesên ku li wan digeriyan pir vekirî dihat diyarkirin.

Li malê kesek ku rêk û pêk li radyoyê guhdar bike, an jî rojnameyê bikire tine bû. Min gelek caran rojnameyên ku me ji bona refan ji dikanan, an jî cîranan digirt, bi baldariyek mezin dixwend. Carê min bi saetan ew rojname li ser refan bicih dikir. Kêfa diya min jî ji vê re nedihat û di ber xwe di-axivî. Di rojnameyekê de wêneyê rengdar a Sîbel Erkan ku di wan rojan de hatibû revandin zêde cih digirt. Aliyê derve yê avahiya ku hatiye dorpêşkirin, '*terorîstên'* ku kêm di şibakeyê de tên dîtin û gelek şîroveyên din, beşek rojnameyê yên girîng bûn.

Keçek ciwan rehîn, hatibû revandin. Lê min ne dizaniya ku hem sedema wê çiye û hem wê encamek çawa ava bike. Ev bûyer herî zêde jî di mijara çepgir û rastgiran de dihat nirxandin. Kesên ku ew revandine, çepgir, weke di bûyera Pîr Siltan Abdal de derketî holê, kesên li dijî dewletê derketine dihatin şîrovekirin. Nûçeyên weke, 'mal hatiye dorpêçkirin, bangawaziya teslîmbûnê hatiye kirin, kêmek maye werin girtin' bi gştî ez xemgîn dikirim û hestek dil şewitî bi min re

ava dikir. Min dikariya hemû pêşketinên ku rû didin, di çarçoveya li gorî bûyerên li Dêrsimê min dîtine û jiyane û encamên derketine holê binirxînim. Min tenê bi aliyên wê yên çors ve dinirxand.

Ez rojekê çûm mala mamosteya xwe û em ji wir jî bi hev re çûn dibistanê. Berî em rê bikevin li rojnameyê nêrî û qîrek da.

Got; "Ax, ax! Lawê min! Çawa bû! Kamil ka binêre çi bûye, ka were binêre çawa li vî zarokî dane û kuştine. Hisên Cewahîr kuştine."

Dema min navê "Hisên Cewahir!" Bihîst ku kuştine, tirsek bi min re ava kir. Polîsan ew kuştibû. Miribû. Mamosteya min pirsî bê ka ez Heyder Koçlar'an nas dikim an na. Ji min re got; "ew jî ji eşîra we ye, ne wisa?" Heyder Koç ji Mazgîrt'ê bû. Ji gundê Kavun'ê bû. An jî ji nêzî wir bû. Heyder Koç ji pêşengên Kureyşiyan bû. Lê kesayetek nêzî dewletê bû. Kesek sîxûr û hevkarê dewletê dihat nasîn bû. Nedihat hezkirin. Ciwanan jê hez nedikir. Tenê Cewahîran baş bûn. Hisên Cewahir miribû, hatibû kuştin. Mamosteya min jî hewl dida ez baş fêm bikim.

Cardin got; "kesên Sîber Erkan revandî ew bûn. Li qeta jorîn a avahiyekê diman. Pevçûnekê dijîn. Heyf bû, ciwan bûn."

Wê rojê heta ku ez çûm malê jî ew jana ku di dilê mamosteya min de, di bîra min de bû. Bi taybet ew gotinên wê yên digot; "Hisên Cewahir hat kuştin!" Ji hişê min dernediket. Li Enqereyê ciwanek ji Dêrsimê, lawê malbatek ku dihat nasîn hatibû kuştin.

Dema ez çûm Kişlayê her kesî agahî girtibû. Vala nabêjin; “xebera reş zû tê bihîstin.” Agahiya hatiye kuştin zû hatibû bihîstin. Dihat gotin ku wê cenazeyê wî bînin. Hinek zû çûbûn sersaxiyê. Malên xizmên malbatê yên li bajaran dimînin, bi rojan ji teziyê re vekirî mabû.

Êdî zehmet bû ku em li Kişlayê bimînin. Bavê min ji mêj ve çûbû Almanya. Hevalê wî Musa yê li heman avahiyê dima, wê mala xwe bar bikira. Ji ber wê mal û malbata xwe ji gund baniya, diviya em jî derketan. Em jî weke kirêdar çûn kolana Dax, avahiyek ku nû hatiye çêkirin.

Zilamê li deryayan digere?

Min li kolana Dax’ê dest bi dibistana Navîn kir. Beşa navîn a dibistana amadeyî ya Dêrsimê hebû. Heşek heman avahiyê ji bona xwendekarên navîn bûn. Sitûnên bi bûyer ên radyo û televîzyonan zêde bûne. Nûçeyên wê zêde bibûn. Vê carê herî zêde navê Denîz Gezmîş’an dihat bikaranîn. Di nava gelek navan de, yê herî zêde dihat bikaranîn û bal dikişand, Denîz Gezmîş bû. Min destpêkê weke ‘kesê li deryayan geriyayî’ fêm dikir. Ji ber min hêj fêm nedikir ku çima ewqasî behsa wî dikin. Lê her diçû dibû xwedî xisletek sereke ya rojev tije dikir.

Afîşên wêne û nasnameyên kesên ku li wan digeriyan bi komî li cadeyan, serê koçe û kolanên zêde hatinûçûyîn lê hene hatibûn daleqandin. Ên ku bi mereq lêkolîn dikirin û li wan dinêriyan, di navbera xwe de digotin, ‘çi mirovên egîd, lawê bavê xwe ne’ û di-axivîn. Bi rastî jî xwedî awir û seknek egîdî bûn. Di nava çavên wan mirovên her yekê xwedî xweşikbûnek cuda bûn de, tîrêj, hêvî û têkoşîn hebû. Di rûyên wan de

rastiyek ku ji her kesî re serî radikirin hebû. Bi zanebûn, bêzanebûn her kes ji wan bandor dibû. Zêde nedihat zanîn ku çi kirine. Ji hemûyan re jî 'terorîst' dihat gotin. An jî ji wan re 'revokên komînîst' dihat gotin. Weke kesê desteser dikin, qatil in û suc kirine, dihatin teşhîrkirin. Bangawaziyek sozê mezin dabûn ji kesê ku îxbara wan bike û wan bide dest. Kesên ku ew bidan dest, wê bihatan xelatkirin! Gelo kîjan wijdan razî bû ku wan bide dest? Gelo hê jî kesên ku wijdana wan xilas bûne û ji mirohiyê dûr ketine mane?

Dema ez çûm dibistanê li ser dîrekên elektirîkê yên çaryanê afîşên daleqandîne bala min kişandin. Min jî bi mereq li wan temaşe kir. Piştî ku min peyvên ku nivîsandibûn, "ên îxbar bikin wê werin xelatkirin" xwend, min li qelebalixa li hev civiyayî nêrî. Min yek bi yek ew lêkolîn kirin. Weke ku ger kesek wisa hebe wê di rûyê wan de diyar be, min li wan temaşe dikir. Rûyê hinekan ji jana dilê wan qermiçî dixuya. Hinekan jî bi dilxweşî temaşe dikir. Hinek jî di navbera xwe de bi pisepis di-axivîn, ji hev re digotin, bê çi qas ciwan in, çawa egîd in! Min kir serê xwe ku, ez di navbera dersê de werim, wan qaxezan biqetînim. Minê ev jî bi hinek hevalên xwe re bikiriya. Ger me nekariya em hemûyan biqetînin jî, lê cihê ku destên me bigihijinê û em bikarin biqetînin hebûn. Dihat gotin ku di deriyê nexweşxaneya nêzî wir de jî ev afîş hatine daleqandin. Ya herî hêsan jî nexweşxane ye. Ketin û derketina korîdora jêr hêsan bû. Tenê mirov ne dikariya biçe qetên jor.

Tişta min kir serê xwe, min bi hevalên xwe re pêk anî. Me di navbera dersan de bi qasî karî qetandin. Hinek cih bilindbûn, bejna me derbaz dikir. Hinek jî bi lezqeyên saxlem pêve leziqandibûn. Me hêsan ên li pêşiya nexweşxaneyê qetandibûn.

Lê her tişt jî ne ev bû. Me wer dizaniya ku wê êdî kesek heman afîşan bi wan deran ve neke û kesên li wan digerin jî neyên dîtin. Hizrek tam zaroktî bû.

Lê na! Di rastiyê de di zarokariya me de îsyan ava dikirin. Pêşketinên ku dihatin jiyîn herst û ramanên me ser û bin dikirin û bandor li me dikir. Tiştên cuda hînî me dikirin. Hêj di pêvajoya destpêkê ya dibistana navîn de, di rojên destpêkê de, min xwe di nava boykotekê de dît. Wê rojê baranek nerim dibariya. Yên ku li hewşa dibistana amadeyî civiyabûn, di nava kelecanê de baz didan her alî. 'Kekên' ku komên belav dicivandin û her kesî ew nas dikirin, ji wan hez dikirin jî, dem bi dem derveyî civatê li hev diciviyan, li ser piyan şêwazek ku kes nebîhîse bi hev re di-axivîn û cardin ji hev cuda dibûn. Ji nişka ve naverast bû agir. Navên weke Elî Yeşîl, Hesen û Metîn li naverastê digeriyan. Hemû jî xwendekarên dibistana amadeyî yên pola dawî bûn. Dihat gotin ku ji aliyê polîsan ve hatine girtin. Şînasî Eskîçirak bi hêrsek mezin di-axivî, diqêriya û bang dikir. Polîs ji nişka ve ketin hewşê û navbera me. Mamosteyê me Şînasî Eskîçirak ku alîgirê mudur bû, lê dema mudur ne amade ba, wî yekser berpirsyariya mudur dikir, bênavber qîr dikir. Di wê qelebalixê de dengê wî tam nedihat fêmkirin. Carekê ji polîs re got;

"Kanî Elî'yê min. Kanî Hesen'ê min? Ez xwendekarên xwe dixwazim. Hûn bi çi mafî xwendekarên min dibin qereqolê? Kî ferman dabe, bila dabe! Ew xwendekarin, wan ti karê di asta suc de nekirine!"

Qelebalixa heyî pêl bi pêl zêde bû. Her kesî bi mereq dişopand. Kesî jî ne dipirsiya ku çi dibe! Ji ber di wê kêliyê de jî kes ne di wê rewşê de bû bersiva pirsan bide. Hêrsa heyî bibû

bersiva hevbeş. Mamosteyê me Şînasî jî bi egîdî û serbilindî diqêriya û got; “wê demê min jî bigirin, bibin!”

Ev hêrs û serhildan bi qasî polîs aciz dikirin, ewqas jî cesareta wan dişikand. Derve jî xwendekar di hewaya boykotê de ne. Mudur jî di îsyanê de bû. Lewma zêde ne bi însiyatîf bûn. Tenê li benda fermanan bûn. Li firsendan digeriyan, dihizirîn ku wê çi bikin û li benda teqîna wê qelebalixê bûn. Tirsa wan di nêzîkbûnên wan de, diyar dibû. Hinekan di rewşek bê xem de, ji dûr ve dişopandin.

Dema polîsan ferman girt, mamoste Şînasî jî hat binçavkirin. Dema binçavkirin çêbû, dixwestin ji her du aliyan ve jî bigirin. Wî red dikir, her du milên xwe jî dihejand û nedihişt ku polîs wî bigirin. Dîsa behsa hinek tiştan kir û bi serbilindî di-axivî û ber bi wesayîtê ve çû. Çawa wesayît ket rê, hemû qelebalix ber bi deriyê hewşê ve çû. Me jî baz da. Wan çi dikir, min jî heman tişt dikir. Destpêkê Sebrî Cengîz di deriyê derketina ji hewşê de hinek tişt got, her kes vexwend rêzgirtinê. Kulmên çepê hemû li hewa bûn. Paşê em hemû bi hev re ji cadeyê ber bi jêr ve meşiyan. Her kes heta cihekê bi hev re meşiya. Paşê li çaryanê em kom bi kom li nav kolanan belav bûn. Ji bona polîs bi hemû hêza xwe ve êrîş li koman neke, kom bi kom cuda belav bibûn. Ev jî tevdîrek bû.

Mamosteya me ya wêjeyê, hevjîna Kemal Burkay a Tirk Xalîde Burkay bû. Dersên wê her tim cuda bûn. Gelek caran helbest ji me re dixwend. Rojekê cardin helbestek xwend û got helbesta Kemal Burkay e. Kemal Burkay jî wê demê girtî bû. Di roja boykotê ya duyem de, hat gotin ku gelek mamosteyên me hatine sûrgûnkirin. Di nava sûrgûnan de xwendekarên

dibistana amadeyî jî hebûn. Kekê min jî sûrgûnû Dibistana Amadeyî ya Turan Emeksîz a Meletiyê kiribûn.

Dihat zanîn ku ev dibistan weke “navenda faşîsta” ye. Xalîde Burkay jî sûrgûnû Dibistana Amadeyî ya Elezîzê kiribûn. Ew der jî cihek ku faşîst lê bandor bûn. Mamosteyek me zêde bejin dirêj hebû, ew jî hatibû sûrgûnkirin. Hemû jî mamosteyên me yên ‘çepgir û pêşverû’ bûn. Mamoste û xwendekarên ku hatibûn hilbijartin, weke ‘serkêş’ dihatin dîtin. Xalîde Burkay neçû. Hinek ji wan îstîfa xwe dan. Her tişt bi temamî tevlîhev bû.

Di pola 2. A dibistana navîn de mamosteyê me Yusuf Kenan Denîz tevlî dersa me ya wêjeyê dibû. Rojekê tiştên pir cuda ji me re digot. Li ser texteya reş sêkoşeyek du aliyên wê berfireh xêz kir. Li ser xeta sêkoşê ya jor, xetek kişand û sêkoşeyek biçûk a din xêz kir. Sêkoşeya biçûk a jor weke çîna serdest û mêtîngeran destnîşan kir. Sêkoşeya mezin a jêr jî weke çîna karker, gel, karmend û bindestan rave dike binav kir. Bi pênaseyek pir hêsan mêtîngerî û serdestiya heyî bi me dida fêmkirin. Dida diyarkirin ku divê gelê bindest hêza xwe birêxistin bike, mîsoger li dijî serdestan têbikoşe. Diyar dikir ku, di vê têkoşînê de jî hêza pêşeng wê ‘Ciwanên Şoreşger (Dev-Genç)’ be. Ango di têkoşînek bi pêşengiya wan, em dikarin ji mêtîngeriyê rizgar bibin.

Ev vegotinên Yusuf Kenan Denîz, dihişt ku em zêdetir jê hez bikin. Mamosteyê me yê ‘herî zêde çepgir’ bû. Ji me re behsa serdest û bindestan dikir. Di heman demê de, ji me re li ser texte xêz kir û bi tarîfan dida fêmkirin. Çawa navber ket dersê, gelek ji me tevî ku nedizanî wateya wê çiye, rêxistin e, kes e, çiye ne çiye, bê ku em di ferqê de bin, me “(Ciwanên

Şoreşger Dev-Genç)” qêriya. Me heta demekê di nava ahengê de dubare kir. Lê di dersa duyem de mamosteyê me em hişyar kirin, got ku nabe em li heer cihî wisa biqîrin û tiştên em li vir di-axivin li her cihî werin gotin. Di wir de mirov çawa veşarî tevdigere, ew hînî me kir. Got; “hinek tiş hene, li her wextê û her cihî nayên axaftin!”

Cardin dîsa hema her tişt şanî me dikir û ev hînkirin didomand.

Bûyerên Kizildere ‘çepgiriya zaroktî’ ya di dilê min de gur dikir. Di rojnameyan de rewşa gund û malan ên piştî pevçûnan şewitîne, rûxiyane, wêneyê Ertuxrul Kûrkçû yê di kadînê de hatiye dîlgirtin û wêneyên kesên hatine kuştin hebûn. Pir mezin û rengdar dabûn ev wêne. Rûyê Mahîr Çayan ê wekî heyvê, ew çavên wî yên bedew û mezin axîn li dilê mirov dixist. Deh giyan hatibûn kuştin. Ax! Aax! Kizildere te çawa li ber xwe da! Geh min li rojnameyê dinêriya, geh jî dihizirîm. Çavên min ez ber bi lêgerînê ve dibirim. Ji bûyera Pîr Siltan Abdal zêdetir xwîn hatibû rijandin. Ji bona têkoşîna gerîla ji çolterê bidin destpêkirin, dixwestin ber bi Derya Reş ve vebin. Lê mixabin tam di vê demê de darvekirina Denîz Gezmîş û hevalên wî ketibû rojevê. Lewma ji baregeha Nato hinek erkdar rehîn hatibûn girtin. Armanca wan jî astengkirina darvekirina Denîz Gezmîş û hevalên wî bû. Lê ev bûyer jî wisa nebû.

Paşê di 6’ê Adarê de Denîz ew hatin darvekirin. Na, êdî min jî weke ‘mirovên li deryaya digeriyan’ fêm nedikir. Ew şoreşger bû. Ew milîtan bû. Hem jî ji bona dewletê Komînîstek xeternak bû. Vala, ji xweber biryara darvekirinê nedabûn. Min hewl dida sêdarê bînim hişê xwe. Min ti caran nedîtibû.

Her kes li ser darvekirinan di-axivî. Rojnameyan nûçeyên fermî dagirtîbûn. Cîranan rojname dikiriyan. Herî zêde jî apê Elî Ataman dikirî. Di rewşên wisa de, min digot, ‘xweziya li mala me jî hinek kesên ku rojname dikirîn hebûyan û li ber diketim. Me hinek caran bi heqê xwe yê rojane, rojnameya Gunaydin an jî rojnameya ew roj girtiye dest û gelek wêneyên wê rojê hene dikirî. Lê belê diya min li dijî kirîna rojnameyan derdiket. Hêj di wê demê de xwendina rojnameyê jî xeter didît. Wê jî li gorî xwe nedixwest ku em hînî tiştên xeter bibin. Ango li gorî wê, ‘jixwe ez keç bûm, ma wê çi eleqeya min bi tiştên wisa re hebûya û ezê çima mijûl bibam!’ Lê mixabin nêzîkbûna wê ya pêşxistina qedexeyan, helwestên wê yên hînbûna min asteng dikirin, dihişt ku ez hêj zêdetir gelek tiştan hîn bibin. Diya min ne di ferqê de bû, lê qenciyek li min dikir. Dihişt ku ez tiştên nû hîn bibim.

Malbata apê Elî Ataman, malbatek qelebalix bû. Keça wan Fethiye li Dibistana Hunerê ya Keçan dixwend. Ez û Perîhan bi hev re li heman Dibistana Navîn bûn. Yên din biçûktir bûn. Li malê bandora dayîka Emîne zêdetir bû. Her kar jinan dikir. Çewsîneriyek li ser keçan tine bû. Hemûyan bi hev re rojname dixwend. Radyo guhdar dikirin. Ez her tim ji wan û diya wan dihesidîm. Min ji xwe re digot, xweziya diya min jî wisa ba. Lewma herî zêde peywendiyên min bi wan re hebûn.

Denîz, Yusuf, Huseyîn.

Êdî ev her sê nav, di devê her kesî de bûn. Bi rojan li ser wan dihat axaftin. Dema hatine darvekirin, li ser sifreyan xwarin ne hatiye xwarin, lalîk nîv dagirtî mane. Hinek ji êşê, hinek jî ji ber nasên xwe yên dûr û nêz û zarokên xwe yên li bajarên din bi fikarbûne, ti caran tam ji xwarinê ne girtine.

Dema Fethiye ew jî girîn tê bîra min. Me wêneyên wan ên di rojnameyan de jêkirin û veşartin. Hinek kesan jî wêneyên wan li dîwarên mala xwe dabûn. Hinek rojname hebûn, rûpela destpêkê tev bi wêne û nûçeyên ser wan ve dagirtîbûn. Denîz ew wisa ketibûn her malê. "Ew tenê li deryayan negeriyabûn." Dema wan dibin sêdarê diruşmayên diqîrin û nameyên ku ji malbatên xwe re nivîsandine parçe parçe di rojnameyan de derdiketin. Ew dihatin xwendin û şîrovekirin. Di navbera rûpelên lênûsên me de navên wan hebû. Me li ser wan helbest dinivîsand. Tîpa destpêkê ya her rêzê, tîpek ji navê wan bû. Heta me navê her sêyan derdixist, em bi helbestan ve mijûl dibûn. Dibe ku me bi wî mejiyê xwe yê zaroktiyê ve teşeyek derdixist, lê hemû jî hestên me yên di derbarê wan de bûn û rastî bûn. Bi cewherî, saf û pak bûn. Di heman demê de bertekek li dijî dewleta Tirk rave dikir.

Li hember çepgeriya îhtîlal, alternatîfa herî baş çepgeriya ecewît bû!

Li hewşa pêşiya avahiya ku em lê diman malek banê wê ax hebû. Ji du odeyan pêk dihat. Zivistanê, ya rastî di mehên ku dibistan vekirîbûn de, mal peydakirin, bi taybet jî 'malên xwendekaran' peydakirin, gelekî zehmet bû. Her kesî dixwest li cem xizim, gundî, an jî hinek nasên xwe malê kirê bike. Ev jî bertekek hundurîn a kesên ji çolterê hatibûn. Dihizirîn ku cihên ku lê ne, ger xizmên wan hebin, wê xwedî li wan derkevin. Mafdar jî bûn. Ji ber bajar qelebalix û tevlîhev bûn. Lewma yên ji çolterê dihatin ditirsiyan.

Xwediyê mala me, ev xaniyên li bostan hemû ji bo kirê dabû xwendekarên ji gundê xwe û gundên nêzîk ên nas. Piranî xwendekarên kur bûn. Car caran kitûmatên keçan ên xizmên wan jî lê diman. Ji ber qelebalix bû, mayîna yek du keçên xwendekar tengasî çêdikir. Bes di destpêkê de her çiqas jimara yên mal kirê kirîn kêm bû, her ku diçû ev jimar zêde dibû. Û piraniya wan xwendekarên dibistana amadeyî û navîn bûn.

Zarokên xwediyê malê jî, li qeta yekê ya avahiyê diman. Me şoreşgerek li vê malê nas kir. Di pêvajoyên ku bûyerên gerim rû didan de, wî jî behsa Denîz'an kiribû, krawata ku li ber xwe kiribû şanî me dabû û gotibû, diyariya Mahîr Çayan e. Navê hinek kesên ku hatîn kuştin jimart û got; komek ji wan pêk tê çûne gundê wan û bi wan re axivîne. Gotibû li gindên Halborî, Çukur û gundên derdor jî hinek xwendekarên şoreşger hene û li zanîngehan dixwînin. Birayek Velî Tayhan jî li Enqereyê dixwend. Ew Ermenî bûn. Vê xisleta wan jî her tim bala me dikişand. Şevekê di demjimêrên dereng de li deriyê me hat xistin, kesek zêde gir û qelew pirsa birayê min kir. Ew jî li malê amade bû. Weke ku agahî daye hinekan, li benda hinek tiştan bû. Li odeyek cuda man, weke ku bi hinek tiştan mijûl dibin tevdigeriyan. Kesê hatî derbasî hundur nebû. Got ku wê di demek kin de ji bajêr derkevin û divê lez vegerin. Ez paşê hîn bûm ku ev kes birayê mezin ê Welî bûye. Min ew bihîstibûn.

Demanceyek mezin a beriya hingê radestî birayê min kiribû, girt û çû. Birayê min jî dizîve dayê. Ne dizaniyan ku ez li eywanê me. Elektirîka eywanê pê nexistibûn, ez bawer im ji ber şewqa odeyan jî xumam bû, lewma ferq nekirin. Ez wê

demê kêfxweş bûm û min wer dizaniya ku birayê min jî bi tiştên dizîve mijûl dibe û min li ser vê hestên cuda jiyan.

Li mala me pirtûkên me kêm bûn. Ên heyîn jî birayên min anîbûn. Romanên Fakîr Baykurt, Yaşar Kemal, Kemal Tahîr û pirtûka helbestên Tevfîk Fîkret tên bîra min. Dema carê bi deng helbestên wî dixwend, min pir hez dikir ku lê guhdar bikim. Dengê birayê min xweş û tije bû. Herî zêde dema kilama 'Alli Turnam' digot min ji dengê wî hez dikir. Dema paşê gotin ew kilama faşîstane, ez pir aciz bûm. Lê min her tim ji wê kilamê hez kir û min di nav lêvên xwe de digot. Heta niha jî pir bi hezkirin hem guhdar dikim û hem jî dibêjim.

Êdî diyardeyên weke şoreşgerî û çepgiriyê di wateyek teng de be jî, di hişê her kesî de wateya wê dihat fêmkirin. Êdî stranên me digotin jî hatibûn guhertin. Denîz'an û Mahîr'an di nava stranên me de cih digirtin. Vebijêrkên sînema, stran û pirtûkan û pîvanên dihat gerîn hatibûn guhertin. Filmên Yilmaz Gûney vebijêrkên sereke bûn. Rojên filmên wî hebûyan bilêt nediman. Pêş de pêşbirka girtina bilêtan destpê dikir. Tevî ku li ser piyan bimîne jî, her kes diçû. Dema filîm dihat temaşekirin, her kesî tezahurat diqêriya. Di filma Murad Soydan de beşek darvekirinê hebû. Gelek temaşevan di wê beşê de giriyan. Lê her kesî bertekên xwe bi şêwaza lingê xwe li erdê danê ve (yuhalama) raber kir. Mahsunî û Zamanî dihat guhdarkirin. Ji ber kilamên wan bandor li me hemûyan dikir. Coşa me hemûyan zêde dibû.

Ancex, hêj ev ne berhemên pêşketinek li ser bingehek zanebûn û zanistî bûn. Dibe ku hinek bandorbûn bin. Jixwe di hemû teşe girtinên pey wê re van bondoran rola xwe jî lîst. Bes aliyê din jî bandorên Ecevîtbûnê hebûn. 'Karaoxlan' weke

rizgarvanekî dihat fêmkirin. Çepgirî neveguherîbû rêxistinbûnek milîtaniya şoreşgerî, di vê manê de domdariya xwe saz nekir. Herî zêde koma îhtîlalê bandor kiribû. Ger çepgirî li ser vî bingehî weke rêxistinek pêşeng û xebatên wê yên zelal ve bihata veguhertin, wê ti caran çepgiriya Ecevît jîndar nebûya, an jî wê di wê pîvanê de bandor nekiriba. Potansiyela ciwanên li Dêrsimê, bi gelemperî jî gel, zêde di bin bandora bişaftinê de bûn. Di heman demê de Ecevît jî xîtabî wan dikir. Bersiva xwe jî digirt. Di hilbijartinan de vebijêrka sereke Ecevît bû, alîgirên wî zêde bûn. Partiya wî CHP bû. Di nava partiyên pergalê de ya herî baş gerîn, yê ku herî zêde nûnertiya dewletê dike, weke rizgarvan dîtin, çiqas tiştek çeloxwarî bû. Di navbera çepgiriya şoreşger a li dijî dewletê muxalefetê dike û çepgiriya dewleta Kemalîst de cewaziya heyî nedîtin, her du jî bi Ecevîtperestiyê re komkirin, lêgerînek bû. Vê jî dûrbûna ji cewher, bi şêweyek cuda kûr dikir.

Çalakvantiya bingehîn a derdorên nezan ku xwe çepgir didîtin, gomlekên rengê şîn ê Ecevît jê hez dikirin, posterên Ecevît, di demên hilbijartinan de bi dilxwazî propagandeya Ecevît kirin, tevlîbûna xwe pêşandanan bûyîn bû. Kesên ku hêza wan jî têrê nedikir çepgiriya îllegal bimeşînin, hewl didan bi çepgiriya CHP'ê ve muxalîftiya dewletê bikin. Ecevît ji bona wan weke rizgarvanekî bû. Ango qet nebe, ji Demîrel û yên din baştir bû! Bes aliyek din hebû, dewletê hewl dida bi Ecevît çepgirên radîkal bixe bin venêrîne. Çepgiriya îhtîlalger jî weke alternatîf pêşkêş dikir. Ango rizgarvaniya Karaoxlan pir vekirî dihat bikaranîn. Bi taybet li Dêrsimê hewldana muxalîftiya çors a li dijî dewletê, bûyera herî rasteqînî ya dewletperestiya CHP'ê de komkirin û ew baş pê dana qebûlkirin bû!

Belê, Ecevît di wan pêvajoyan de hatibû Dêrsim'ê. Dawiya 73'yan bû. Pêşwaziyek bê hempa jê re hatibû amadekirin. Hemû dolmuş, otobûs û heta qamyon jî, ji bona wî di liv û tevgerê de bûn. Ji Kovanci heta pira Mazgîrt û Sihenk'ê her der tije bibû. Ji ber min ne karîbû ez ji navenda bajêr wirdetir biçim, ez pir aciz bibûm. Bavê min em li şaneşîna otelekê dabûn rawestandin. Her kesî şînê Ecevît li ber xwe kiribû û me wêneyê wî bi aliyê çepê yê singê xwe ve kiribû. Lê ev jî ne bes bû. Me bi boyaxa sor li ser sitûnên beton ên qeta şaneşînê diruşmeyên:

"Karaoxlan tê! Karaoxlan desthilatdar e!" Nivîsandibûn.

Em li ser şaneşîna avahiya otela miqabilî, nêzî avahiya şaredariyê bûn. Qad hemû ji me ve dixuya. Banê hemû avahiyan beriya hatina Ecevît tije bibûn.

Paşê Ecevît xwiya kir. Li cem wî jî Rahşan Ecevît hebû. Destê xwe dihejand. Qelebalixa heyî di nava coşek mezin de bû. Her der bi diruşma û tezahuratên bi hev re dihatin gotin ve dihejiya. Piştre li ser şaneşîna avahiya şaredariyê dest bi axaftinê kir; "Tunceliyên birêz!.." Lê ne gengaz bû, kes qelebalixê bêdeng bike. Dengê diruşma û fîtikan nediqediyan. Ecevît tevî vê axaftina xwe berdewam kir. Behsa tiştên biha, bihayên (zam) zêde dibin û fekiriyê kir.

Her wiha pir soz dan.

Dema dayîka min ez asî dikirim şerkirin jî hînî min kir!

Wê salê bavê min biryar dabû ku min û kekê min jî bi xwe re bibe Elmanya. Min ne dixwest ku dev ji dibistanê bedrim. Min dibistana navîn qedandibû û dixwest berdewam bikim. Heta meyla min a bûyîna hemşîre jî hebû û min xwesteka xwe ya çûyîna dibistana tenduristiyê dabû pêş. Haya min zêde ji taybetmendiyên dibistanên Yatili nebû. Lê hinek keçên xizmên me yên li wan deran dixwendin hebûn. Keça xalê min li Dibistana Amadeyî ya Pîşeya Keçan a Elezîzê dixwend. Keça apê min jî li Akçadax'ê dixwend. Kêfa min zêdetir bi şêwaza girêdana wan a malbatê re dihat. Min dixwest dûr bim, dibe ku wisa zêdetir ji aliyê diya xwe ve werim hezkirin. Nêzîkbûnên diya min dibûn sedem ku ez di hundurê xwe de li hember wê dûrbûnek wisa bijîm. Biçûkên me her du keçên cêwî bûn. Navê wan, navên hevalên min ên dibistana seretayî Ferîde û Nesîbe bûn. Mezinkirina wan pir zehmet bû. Lewma dayîka min her carê digot;

"Ma qey min karî yekê, heta xwedê du dan min!" Wisa hawara digihand xwedê. Min di hundurê xwe de digot; "baş e ku çêbûne" û pê kêfxweş dibûm. Heta tê bîra min, dema dayîka min ducanî bû erza min da, aciz bû ku ez çima keç çêbûme, min jî jê re digot; "xweziya du jî çêbûna." Jixwe dema min ev digot, min cêwî nedixwestin! Min di wateya bila jimara me zêde be de digot. Dema cêwî jî çêbûn, weke ku xwedê nifrînên min bihîstine û qebûl kiriye, kêfxweş bûm. Bes ji ber mezinkirina wan nehêsan bû, carê min jî zehmetî dijiya.

Piranî min Nesîbe xwedî dikir. Dayîka min zêdetir bi Ferîdê re mijûl dibû. Me her duyan bi hev re ew dikirin derguşê û şîr (mama) dida wan. Lewma cîranan ji bo Nesîbê digotin; "keça Sakînê ye." Ferîde zerik, Nesîbe esmer bû. Cêwiyên hêkên cuda bûn. Ji ber piştî bûyîna wan, yekser emeliyata apandîsîtê ya dayîka min hat kirin. Ji neçarî hemû kar man ser milên min û vê jî karê min zehmet kir. Karê malê, xwedîkirina her du cêwiyan, hêj di wî temenî de berpirayariya malê girtin, ez diçewisandim. Lewma neçar mam ku her karî di temenek biçûk de hîn bibim.

Em wê demê heft xwîşk û bira bûn. Keça malê ya mezin ez bûm. Ji bilî kekê min, hemû ji min biçûktirbûn û pêdiviya wan xwedîkirinê hebû. Tevî ku min hemû karên weke şûştina cilan, çêkirina xwarinê û pahtina nan, pêkanîna pêdiviyên malê û hwd dikir, dîsa jî diya min ji min nerazî bû. Tevî ku cîranên me jêhatina min a li malê, tevî temenê min ê biçûk hemû karî pêk tînim ji keçên xwe re mînak didan, diya min berovajî wan ne di-eciband û teqez qusurek didît. Jinek zêde har bû. Ji ber zarok zêdebûn û bavê min jî ne li malê bû, tenê mabû, tengav bibû. Barê malbatê jê re giran bû. Nedikarî wî barî rake. Weke din jî, ji ber mirovek zêde asabî bû, di her tiştî de tengezarî ava dikir. Vê yekê jî ew bêrehim dikir.

Ji ber peywendiyên wê yên li malê, otorîteriya çors, bêrehmiya wê û hinekê jî ji aliyê fîzîkî ve dişibiya Margaret Thatcher, çend salên din min jê re digot Thatcher. Ez bawerim hêjî ew nav li malê jî tê gotin. Min bavê xwe jî şibandibû Willy Brandt. "Demîr Leydî" dewlet birêve biribû. Lê diya min Zeynep jî malbat kiribû dewletek biçûk. Wê jî bi ziman dizaniya û fêm dikir, bi rê û rêzikan bi rêve dibir. Diya min,

kesayetek herî zêde bandor li jiyanê dikir bû. Lewma ezê zêde behsa wê bikim. Dema diya min ez asî dikirim, di heman demê de şerkirin jî hînî min kir. Lewma ez di gelek tiştan de deyndara wê me.

Bavê min ez û kekê min qane kirin û birin Berlîn'ê. Ez cara yekê bû wisa ji Dêrsim, malbatê û diya xwe Zeynep cuda dibûm. Lê her ku dûr diketim, bêrîkirin jî zêde dibû, poşmanî pêş diket, xemgîn dibûm û digiriyam.

Piştî Dêrsimê bajarê yekem car min dîtî, bajarê Elezîzê bû. Lê otobûs yekser derbasî Stenbûlê bibû. Ev nasîn jî di kêliyên bêhnvedanê de pêş ketibûn. Em şev bi hinek cihan re derbas bûn. Min ewder nedîtin. Rêwitiya otobûsê ez hejar kiribûm. Dilê min dixeliya, di hemû kêliyên rêwîtiyê de vereşiyabûm. Bav û birayê min hînî rêwîtiyên wisa bibûn. Li Kovanci, di ketin û derketinên Elezîzê de, li ser lewhan û keviran nivîsên MHP'ê bala min kişandin. Dihat zanîn ku li van deran faşîst zêde ne. Jixwe nivîsên heyîn jî, ev yek piştrast dikirin. Li cihên weke Qeyserî, Yozgat û Bolu'yêî MHP, AP û gelek kêm jî CHP'yî hebûn.

Herî dawî em gihiştin Stenbûlê. Zêde mezin bû. Pira neqebê (Boxaz Koprûsû) wê salê hatibû çêkirin. Hêjî xilas nebibû. Pirek dirêj û mezin li ser deryayê bû. Zêde bala min kişandibû. Hinek xizmên me yên li Stenbûlê jî diman hebûn. Lê dîsa jî em neçûn cem kesî, li otelê man. Bîletên me jî, bi bîletên bavê min ên vegerê re kiribûn yek. Lewma diviya me ew dîrok jibîr nekira û em di wextê de bigihiştiyan. Xwediyê Riyên Balefirgehên Tirkî (THY) Bavê Fexrî hemşerî bû. Di heman demê de dostê bavê min ê nêz bû. Bi riya telefonê ji wî re amade kiribûn. Min jî Bavê Fexrî mereq dikir. Di destpêkê

de ‘Bavê Fexrî’ heybetekî ya zilamê karsaz bi min re dabû avakirin. Min paşê ew li Berlînê dît. Lê bi rastî jî apek dilxweş, kêfxweş û bi heybet bû.

Cara yekê bû li firokê siwar dibûm. Pir xweş bû. Bi taybet dema em di nava ewran re derbas dibûn, ez ji xweşikbûna wê têr nedibûm. Weke ku min xwe li ser komek pembû hildavêt hestek bi min re ava dibû. Dîmenek ecêb bû, lê dîsa jî tiştek ji bona min ne ecêb bû. Min yekem car didît û yekem car jiyan dikir. Di heman demê de zû hîn bûm û tiştek ji bona min ne biyanî bû. Min derbarê tiştên ku nedizaniya de jî li derdor, bav û birayê xwe dinêrî û wisa hîn dibûm. Min bikaranîna tabldotên di firokê de dan me zehmetî ne jiya. Min yekser ew jî jêhatî bikar anîn. Firok li Sofya daket ku sotemeniyê bigire. Weke ku bêjim; “em li welatek Komînîst in!”, me di dersa dîrokê de Bulgarîstan cuda xwendibû. Xwedî rejîmek sosyalîst bû. Lewma dema em derbas bûn, bala min kişand. Bes em tenê li balefirgehê daketin. Gelo mirovên wan, peywendiyên mirovan çawa bûn? Dema min ew dişopandin jî, min hewl dida wê cudahiya wan bibînim. Lê, tenê polîsên wan cuda bûn. Min ew hestên ku dema li ber polîsên Tirkan re derbas dibûm, jiyan nekir.

Almanya mezin bû. Stuttgart, Frankfurt, Berlîn hw. Paşê em hatin Rojhilatê Berlîn’ê. Bavê min got; “lê binêrin Rojhilatê Berlînê ev dere.” Pişt re da diyarkirin ku paşê bûne du, ji hev cihe bûne. Di navbera wan de dîwar hatiye hunan. Em dîsa di dersê de hînî xisletên rejîma Rojhilatê Almanya bibûn. Bêguman, bi jiyan û erdnîgariya wê bi şêwazek berbiçev dîtin, cudatir bû. Lê em tenê derbas dibûn.

Em li balefirgeha Berlîn'ê daketin û di deriyê mezin ê kolana Johanniterstraße 10 nivîsandî re derbasî hundur bûn. Piştî ku em ji gelek avahiyan derbas bûn, em derbasî malek du qet a hinek din li cihek bêdeng û ber bi dawiya avahiyên bilind de bûn. Tişta herî zêde kêfa min jê re hat, xwerûbûna malê û wisa bi tena serê xwe li cihekê bûyîna wê bû. Ji ber ew qelebalixiya avahiyên bilind, ser hev de ne xweş bûn. Bavê min digot, ji ber malek din nedîtiye, lewma ev girtiye. Weke din jî li Almanya guncav nabînin ku hejmarek zêde kes li cihên wisa biçûk bimînin. Qedexe ye! Lê emê li cihê ku divê yek kes bimîne, sê kes biman. Odeyek, holek biçûk, xwaringeh û cihê serşo hebû.

Gelo bavê min çima ez û birayê min anîbûn? Tevî ku her carê digot, 'cihê gawira ye.' Behsa zehmetiya mercên kar dikir, ya herî girîng jî, ji ber ji malbat û zarokên xwe dûr dikeve ku ji vir hez nedikir, niha jî em anîbûn. Her wiha me her duyan jî navber dabû dibistanê. Armancê wî ya me bide karkirin jî tine bû. Ez di 14 saliya xwe de bûm. Birayê min jî 17 salî bû. Nêzîkbûna ji wî re pir ecêb bû. Mezinê malê bû. Ji ber zarokê destpêkê jî bû, her tim taybet nêzî wî dibûn. Dayîka min ev nêzîkbûna taybet ti caran qebûl nekir. Birayê min li mal jî cuda bû. Her tiştê wî taybet bû. Pak bû, cilên wî her tim pak û ûtû kirîbûn. Rojê du-sê caran cilên xwe diguhert. Ti caran yek gomlek û goreyên wî yên qirêj ne diman. Ji ber tufan radikir. Li malê herî dereng jî ew ji xew dirabû. Sifreya wî dihat amadekirin. Ne dizaniya qedeha xwe ya avê ji sirahiya li ser masê jî dagire. Ne dikir. Gelek caran xwarinên malê ne di-eciband û diçû li xwaringehên derve dixwar. Lewma dayîka min jî ji ber van nêzîkbûnên wî gelekî xemgîn dibû û nifir (bêduayî) lê dikir.

Jê re digot; “tu diçî wan şorbeyên xwaringehên qirêj dixwî, lê xwarina paqij a li malê naxwî. Ma wê ji lawek weke te çi bê hêvîkirin?” Li gorî wê lawê herî bê xêr bû.

Dayîka min jî xwarinên xweş û pak çêdikir. Ew fêrbûnên bi wî re nedihatin fêmkirin. Carê havînê diçû Stenbûl, an jî Enqere û Antalya. Bavê min ji wî re cuda pere dişandin. Lê tevî vê jî, wî hem dayîka min dixist zehmetiyan û pere jê disitand. Hem jî dema deyndar dibû ji bavê min dixwest. Her cara ku dihat serdanê, tonek deynên wî dihat dayîn. Her çendî bavê min jê re bigota; “ji xwedê bitirse!” Jî cardin xwe aciz nedikir.

Zilamek zêde mulayîm bû. Nêzîkbûnek bibû sedema ku kekê min li ser pişta hinek din bijî û nexebite. Lê belê, ew jî di vê mijarê de zêde bêwijdan bû û qet dilê wî pê ne dişewitî. Ev rewşa wî qet nedihat guhertin. Hinek pîvanên wî yên xweser hebûn. Di her mijarê de jî şêwazên li gorî xweseriya xwe pêk danîn. Lewma ji bona wî guhertina qad û welatan ferq nedikir. Gelek caran pesnê xweseriya wî ya di jiyanê de dihat dayîn û bi xweşbînî dihat pêşwazîkirin. Hêza dayîka min jî li hember wî têrê nedikir. Ne karîbû hinek xisletên wî biguherîne! Jixwe bavê min jî zêde xweşbîn bû. Ji ber ew tenê weke kurê xwe nedidît, weke hevalê hev bûn. Nirx dida, her tim kurek di temenek ciwan, lawek ciwan û cindî ew şahnaz dikir. Derdor û cîranên me yên Alman jî bawer nedikirin ku em zarokên wî ne. Em her du jî di serdema xwe ya kamilbûnê de bûn. Bejna me ji temenê me mezintir dixuya. Bavê min jî ciwan, zindî û dînamîk bû.

Peywendiyên bavê min neteng û girtî bûn. Weke ku her kes dost û hevalên wî bûn. Ew xisleta Dêrsimiyan a li hev digerin, peywendiyê tenê bi xwe re sînordar dikin, bi wî re tinebû.

Gelek dost û hevalên wî yên ji Sîwas, Qeyserî, Sitenbûl û Qers'ê hebûn. Kesên ku dihatin serdana me, her yek ji cihekê bû. Hinek hevalên wî yên Alman, Afrîkî û Lîbyayî jî hebûn. Dihat hezkirin. Peywendiyên wî gerim û xwezayî bûn. Bi malbat û zarokên xwe ve jî zêde girêdayî bû. Min li wir bavê xwe zêdetir ji nêz ve didît û ji bavê xwe pir hez dikir.

Ya rast, her tim hest û ramanên wî bi me re bûne. Sedema serdanên wî yên zêde, kilam, helbest û nesîhetên wî, azweriya ku li hember me dijiya bû. Dema me qaseta bi navê, "nesîhetên min ên ji zarokên min re" guhdar kir, em hemû hestewar bûn. Ji ber rastiyên jiyanê bi me dida hînkirin. Xal bi xal axivî bû. Me demek dirêj ew qaset veşartibû. Dilê min dixwaze "xweziya niha li vir ba û min cardin ew guhdar bikira." Ev xislet di Zerdeştiyê de pir xweşik e. Ji ber şîret û nesîhet raveya girêdanê ye. Her wiha rexneyan di xwe de dihewîne û mirov hişyar dike. Lewma di wateyekê de cîhana bavê min em bûn. Ji bavên din cuda bû. Gelek ji wan tevî salên dirêj derbas bibûn, nedihatin serdana malên xwe. Tevî ku zewicîbûn, li Almanya jî dizewicîn û hînî fêrbûnên kirêt ên jiyanê dibûn. Ereq, xumar, an jî bi jinên din re pêşxistina têkîliyan, fêrbûnên herî xirab ên jiyan ser û bin dikirin bûn. Gelek caran ev taybetmendiyên xirab dibûn sedem malbat belav bibin. Dema em li Dêrsimê bûn, navê gelek kesan dihat dayîn ku, bi jinê Alman re zewicîne. Heta hinek ji wan bi xwe re danîn Dêrsimê. Ev jî dibûn çavkaniya jiyana bê aramî. Hinekan jî qaşo fêlbazî dikir. Digotin ku ji bona sermiyana wan desteser bikin, bi jinên Alman re zewicîne.

Ji aliyê derdor ve jî xisleta bavê min a herî zêde dihat nasîn, ku ti caran wisa nêzî jinê nedibû. Cîranan herî zêde bi wî bawer dikir. Gelek caran dema karên wan heba, hevjînên xwe emanetî bavê min dikirin. Di avahiya mala me ve jinek bejin dirêj a bi navê Înga hebû. Navê hevjînê wê jî Vîllî bû. Yek jî keça wan hebû. Baldariya wê jinê li hember bavê min hebû, an jî dibe ku baldariya bavê min li hember wê hebe. Asta têkîliya xwe ji dayîka min re jî gotibû. Dirust bû. Digot; "zarokên min bi qasî min in. Şerme. Nabe ku piştî vî temenî jiyanek min a din çêbe." Her wiha ji dayîka min jî zêde hez dikir. Me jî di vê mijarê de piştevaniya diya xwe dikir. Carê dema bi henekî di-axivî, birayê min digot;

"Bi xwedê ezê te bikujim!"

Ya rastî kêfa bavê min jî ji vê re dihat. Dizaniya ku em pê bawer in. Lê dîsa jî baldar tevdigeriya. Gelemperî bi me re digeriya, an jî cihê xwe ji me re digot. Dema dereng ji kar bihata, an jî bê agahî biçûya cihekê telefon dikir û digot. Kesên ku bi wî re jî çûne ser telefonê dida axaftin. Ji nêzîkbûnek herî biçûk a baweriyê bişkîne dûr disekinî. Ev jî şêwaza jiyana wî bû. Lewma ev xisletên wî bandor li me jî dikir û bi me re jî ava dibûn. Ancex, kekê min hinek din fenek bû. Carê derew jî dikir. Lê yekser ev derewên wî dihatin fêmkirin. Ji ber bi rastî jî gelek zehmet bû, ku mirov li hember nêzîkbûnên bavê min derewan bike. Nerehet bû, ku ji mirovek dilê wî pak re derewan bike. Mirov yekser xwe dida dest.

Fêrbûnên bavê min ên weke cixare, vexwarina ereqê û lîtina xumarê tine bûn. Cixare ne dikişand. Ereq jî, dema mêvandarî, an jî mêvanek dihat, bi qasî ji ser hişê xwe neçe vedixwar. Li hember ereqê li ber xwe nedida. Zû ji ser hişê

xwe diçû û teqez saz lê dixist û kilam digotin. Pê re jî digiriya. Her tim di kilamên wî de, ji hev qutbûn û bêrîkirin hebûn. Em du zarokên wî li cem bûn. Lê dîsa jî ew nerehet bû. Gelek caran çavên wî bi rondik ji ser sifreyê radibû.

Diqehirî û digot; "gelo zarokên min çi dixwin. Gelo pere gihan wan. Gelo pereyên wan ên ji xwe re xerç bikin hene? Gelo Zeynebê cardin dest tengî kiriye?"

Kekê min jî her tim li hember vê rewşa wî aciz dibû û bi armanca dilê wî rehet bike, bi ser wî de diçû. Axaftinên wî dilê bavê min rehet dikir. Lê belê, ez li şûna ku dilê wî rehet bikin, an pê re, an jî dema ew ne li mal bûna ji xwe re digiriyam. Herî zêde jî ji bona bavê xwe xemgîn dibûm. Dema ez li Dêrsimê bûm, "bûna zarokê kesek li Almanya" cuda dihat fêmkirin. Li Almanya bûyîn, dewlemendî bû. Pereyên zêde û xelatên zêde bûn. Her cara bavê me dihat serdana me, her cure pêdiviyên me pêk danîn. Gelek tiştên xweşik bi xwe re danîn. Ji bona em baş tîmar, xwedî bibin, bîst rojan, an jî mehekê tiştek ji me kêm nedikir. Lê diya min pir ji vê nêzîkbûna wî aciz dibû. Ew weke, 'dest vekirî, kesê zêde belav dike' pênase dikir û dilê xwe bi xwe dişewitand ku em çima hêj ne bûne xwedî mal. Kesên ku bi bavê min re çûbûn Almanya, li cihên weke Stenbûl û Elezîzê otêl û avahiyên wan hebûn. Li Dêrsimê malên wan hebûn. Lê mixabin em hêjî di malên kirê de bûn û me hêj nekarîbû em li ser erdê xwe malekê jî çêkin. Dema dayîka min wisa di-axivî, bavê min jî, ji bona wê qane bike digot;

"Malê cîhanê, ji cîhanê re dimîne. Bila zarokên min xweş jiyan bikin, muhtacî kesî nebin, ev besî min e. Ez ti mal û otelan naxwazim."

Carekê daxwaza diya min a ji Dêrsimê derketin û çûna cihek din kir dengdana me. Ji xeynî dayîk û kekê min, me hemûyan pişteva niya bavê min kir. Ji ber ti daxwaza me ya çûna bajarek din tine bû. Ji me re balkêş nedihat. Lê ji bona kekê min jî ferq nedikir, ji ber ew her tim digeriya. Tam gerokek bû. Carê dihizirîm ku ew xwedî şansê zêde ye. Pir paqij bû. Ez gelek fêrbûnên di vê mijarê de ji wî hîn bûme. Heta rojê sê caran firçekirina diranan, bi taybet şevê beriya razanê firçekirina diranan, min li wî temaşe dikir û wisa hîn bûm.

Kekê min rojekê li ser taştê ji min re got;

"Rabe, gomlekê ku min ji ber xwe kiriye bişo, paşê were taştê bixwe." Gomlekê xwe jî hêj nû derxistibû û jixwe minê bişûşta. Em nû rûniştibûn ser taştê. Dema ji nişka ve erza min kişand û hewl da min rake, bavê min zêde hêrs bû. Bavê min bi vardiya kar dikir. Tenê me hefteyekê dikarî em bi hev re taştê bixwin. Ji ber li hefteyên din demjimêrên rabûna sibehê dihatin guhertin. Em her sê gelek kêm bi hev re diman. Ya rastî hinek pirsgirêkên wî yên din jî hebûn. Bavê min ji ber şêwaza jiyana wî aciz dibû. Hêj yekser li rûyê wî ne dida, lê bi hinek nêzîkbûnên xwe dida hîskirin. Kekê min jî dizaniya ku çi dike. Her tim dereng hatina malê, carina qet nehatina wî, pereyên heqê xwe zû xilaskirin, baldar nêz nebûn û fêrbûnên wî yên din, sebra bavê min jî derbas dikir. Belê, wê rojê jî wisa teqiya.

Li ser gotina birayê min, bavê min xwelîdanka cam a li ser maseyê avêt û got;

"ker kurê keran. Ma qet bi te re wijdan tine ye. Hemû karê malê ew dike. Xizmetê ji hemû hevalên te û min re dike. Yek

xolekê jî vala nasekine. Ma çi leza te heye, te nû derxistiye, bisekine bila taştiya xwe bixwe, paşê bişû.” Paşê jîi ji ser sifreyê rabû.

Xwelîdank li ber serê birayê min re pekî, çû li dîwar ket û parçe bû. Ger pir sivik serê xwe netewandiba, wê teqez serê wî bişkanda. Birayê min qet ne li benda helwestek wisa bû. Zêde bandor bû. Wî jî iske isk dest bi girî kir. Rabû ji ser sifreyê çû. Tenê ez mam. Min dikir nedikir ew pariyê di devê min de, di qirika min re nediçû xarê. Paşê min jî dev ji taştê berda. Bes wê niha çi bibe. Bavê min ji malê derketibû û çû. Min nedikarî biçim cem birayê xwe jî. Ez sebeba vê bûyerê bûm. Ez di wê kêliyê de zêde perçiqîm, xemgînbûm. Min giriyê birayê xwe jî ranedikir. Dema ez çûm min jê re got negirî, qet xwe bi ser min de aciz nekir. Ez jî ecêb mam. Min dizaniya ku ji bona çi digirî, bavê min mafdar bû, ku xwe pê re aciz kiribû. Lê dîsa jî, min ji xwe re digot; “avêtina wê xwelîdankê neba, wê baştir ba.” Birayê min mereq kir bê ka bavê min çûye kuderê. Lewma xwest ez biçim li parka neqeba li kolanê binêrim. Dema aciz dibû ji bavê min re digot; “moruk.”

Bi guman bû û got; “Dê moruk biçe cihekê belayekê bîne serê xwe.”

Bavê min hesas bû. Helwesta ku li dijî lawê xwe yê herî zêde jê hez dikir raber kirî ranedikir. Ez jî bi lez derketim ber bi parkê ve çûm. Dema min li parkê li ser kursiyekê bavê xwe rûniştî dît, gelekê kêfxweş bûm. Piştî ku em hinekê geriyan, ez ketim milê wî û min ew anî malê. Birayê min ramûsand û xwest lihev werin. Birayê min jî lêborîna xwe jê xwest û her tişt erênî çû serî. Herî zêde jî ez kêfxweş bûm. Min yekser bi wê kêfxweşiyê ve zend û bendên xwe rakirin û gomlekê wî

şûşt. Careke din li malê ti cilek neşûştî nediman. Tişta herî zêde jê ditirsiyam pevçûnên li malê bûn. Ji ber ez pir ditirsandim. Dayîka min her tim bi birayê min re şer dikir. Her lê dixist. Belê, li wî lawê mezin jî dixist. Carê birayê min xwe baş dida ber û digot;

"Ha, ji te re, baş e, ger wê tu rehet bibî baş li min bixe."

Dema didît dayîka min zêde bi hêrs bûye, hewl dida xwe nêzî neke. Lê carê jî bi milê wê digirt û dehf dida. Dayîka min jî ev ji bîr nedikir, bi mehan çawa birayê min li dijî wê derketiye dubare dikir. Piraniya nîqaşan jî li ser pereyan bû. Lewma birayê min jî digot;

"Soz, ger rojekê bibim xwedî pîşe, ezê mûçeya xwe ya destpêkê hemûyê bikim pênc-deh quruş li ser serê dayîka xwe bireşînim. Bila ew di nava pereyan de melevaniyê bike."

Dema pere dida pêş, peywendiyên me xirab dibûn. Lewma ez ji pereyan pir acizbûm. Lê dîsa jî, ji ber di mijara pereyan de bawerî bi min danîn, hemû kirînên pêdiviyên malê bi min dida kirin. Li Almanya jî dema birayê min em di nîvê mehê de bê pere hiştin, bavê min qaseya pereyan radestî min kir. Mûçeyên xwe jî danî radestî min dikir û digot;

"Ha, ji te re, tu çi dikî bike, lê weke Heyder neke!"

Min jî bi taybet dişand Dêrsimê, malê. Wê demê herî zêde me 300 mark dişand. Me pir kêm 500 mark dişand. Ew jî heta pereyên zêde ji bona zarokan didan, an jî dema bavê min zêde demjimêran kar dikir pere zêde dibûn. Min heqê bav û birayê xwe jî dida wan. Min alavên heftane hewce dikiriyan. Weke din jî min xwe diceriband di kumbereyan de pere kom bikim. Ji ber min hişyar xerç dikir, feyde jî li me dibû. Lê mixabin

mêvanê me zêde dihatin malê. Hevalên me her sêyan jî yên cuda hebûn. Hinek jî, ji ber ez û birayê xwe tim li malê bûn, sûd werdigirtin û her tim dihatin mala me. Derdorek me ya hevalan a gelekî fereh hebû. Lewma xerçkirin jî zêde dibû. Em li bendê bûn ên miqabilî me ferasetek rast û baldar raber bikin. Lê kesekî zêde nedihizirî. Ji ber vê jî em kêmtir diçûn gerê. Herî zêde jî birayên Gûngoran ên ji Nazmiyê mêvanê me yên her roj bûn. Hinek dest girtî bûn. Gelek caran li mala xwe ne diman. Birayek wan bi yekî Alman re zewicîbû. Du zarokên wan jî hebûn.

Ez di sala nû de ketim 15 saliya xwe. Bavê min ez û birayê min li qursa ziman nivîsandin. Li dibistana navîn zimanê biyanî yê min dixwend jî Almanî bû. Lê yê birayê min Îngîlîzî bû. Lewma pêdiviya wî zêdetir hebû. Lê dîsa jî ew di jiyana rojane de hîn dibû. Hevalên wî yên Alman hebûn. Her tim diçû Rojhilatê Almanya û Berlînê. Hevalên me yên dibistanê têkilhev bûn. Ji Stenbûl, Çanakkale, Kayserî, Siwas û Dêrsimê hevalên me hebûn. Ji aliyê temen ve jî ya herî biçûk ez bûm. Birayê min ê herî balkêş bû. Keçên ciwan jî, ji ber birayê min zêde bi min re hevaltî dikirin. Hinek ji wan jî di serî de dibêjin qey hevala wî me, lewma ji min hez nakin. Dema hîn dibûn ez xwîşka wî me, ji nû ve bi min re eleqeder dibûn.

Hinek hevalên birayê min çepgir, şoreşger bûn. Dema dihatin cem me zêdetir bi min re eleqeder dibûn. Dema behsa sosyalîzmê, diyardeyên çîna serdest û bindest dikirin, bala min jî dikişand. Ez hînî sirûdan dikirim. Sirûda yekem ez hîn bûyîm ev bû;

“Cendirme em sosyalîst in

Lê em dostê te ne

Rizgariya te bi me re ye

De ka destên xwe dirêj bike”

Yê ku ev sirûd hînî min kir, ciwanek ji Elezîzê bû. Temenê wî ji yê birayê min mezintir bû. Li gorî wî gotî ji TKP’ê bû. Birayê min diçû komaleyên wir jî.

Ber bi êvarekê li taxa ku em lê diman, min dengê diruşmayan bihîst. Ez çûbûm sûkê û ji kirîna tiştan vedigeriyam. Ez bi torbeyên di destên xwe de ve bi lez reviyam, min dixwest wan bibînim. Min keça cîranê me ya li cem xwe jî paş de hişt û bi kelecanek mezin çûm. Min digot qey teqez şoreşger in. Ji ber tiştek din nedihat bîra min. Dema ez nêzî wan bûm, sirûda faşîstan a “Dema Behra Reş Li Ala Tirk Dinêre Diperpite” dihat xwendin. (Çırpınırdı Karadeniz bakıp Türkün bayrağına)Ez zêde aciz û bi hêrs bûm.

Di destê kesê ku li pêşiyê bû de, postera guran hebû. Bi destê xwe jî şêweyek devê gur û sekna gura çêdikirin. Ez poşman bûm ku min ew qasî baz daye. Min jî bi dengek nizim ji wan re got, ‘ketîno’ û paşve vegeriyam. Dema ez çûm malê jî, min ji bavê xwe re behsa meşa Tûrkeşiyan kir. Wî jî, ji min re got ku komaleyên wan hene û dewlet rasterast alîkariya wan dike.

Me ji nameyên ku ji Dêrsimê dihatin hinek agahî digirtin. Lê ev agahî zêde nevekirîbûn. Dem bi dem di rojnameyên Hûriyet û Yenî Asir'ê yên me dikirîn de behsa pevçûnan dihat kirin. Li Dêrsim-Vartînîk’êpevçûn hatine jiyîn, hinek hatine kuştin û hinek jî sax hatine girtin. Li wir kesên ku li dibistana

amadeyî û dibistana mamosteyan xwendingeha şevinî (yatili) dixwendin bi gelemperî faşîst bûn. Hemû xwendekarên ku ji Erzirom û Elezîzê hatibûn. Li dibistanan şer û pevşûn hebûn. Lewma, bavê min jî behsa birayê min dikir û digot; "başe ku lawê min li cem min e." Ji ber ên din biçûk bûn. Li gorî wî ew zêde têkil van karan nedibûn.

Dema mirov ji dûr ve Dêrsimê dişopîne mereqa mirov zêde dibe. Zehmete ku mirov bersiva mijarên 'gelo' bigire. Kêm tişt di nameyan de dihat gotin. Ciwan li Dêrsimê zêde bûn û weke agir bûn. Navê Dêrsimê pênaseya navê şoreşgerên pêşverû bû. Bes bû ku mirov bêje 'ji Dêrsimê me.' Bi gelemperî jî nêrînek ku dikare zû bidest bixe hebû. Vê jî bi me re şoreşgerî û çepgiriya xwezayî pêş dixist. Lewma em neçar bûn ku çepgirên şoreşger bin. Nexwe ji Dêrsimê bûyîn û tiştek din hilbijartin ne dibû.

Komeleyekê li Berlînê şevek şahiyê lidarxistibû. Hevalên birayê min agahî dabûn me jî. Ez, bav û birayê xwe çûn wê şevê. Eywan tije bû. Hinek kesên biyanî jî hebûn. Ji ber ji netewên Alman, an jî hinek gelên din hatibûn vê şevê, baldariya her kesî jî zêde bû. Birayê min jî carê diçû cem hevalên xwe yên ku li naverastê digeriyan û li ber deriya disekinîn. Min her tim ji xwe re digot; "birayê min jî di nav van karan de ye, lê veşartî dike. Bi me nade hesîn." Ez jî zêdetir bi vê kêfxweş dibûm.

Wê şevê şanoyek hatibû amadekirin. Di şanoyê de ciwanek destê wî bi zincîran girêdayî, bi lêdanê danîn ser dikê. Yê ku lê dida û dida ber qontaxeyan leşkerê Tirk bû. Ew ciwan di nava xwînê de mabû, dinaliya, lê wan dîsa jî lê dida. Ez jî di wê kêliyê de hinde bandor bûm, rabûm ser xwe û min got;

“Lêxin, kuro de lêxin ez hêsan namirim

Pizûtê min di kuçikê de bûye xwelî

Di zikê min de gotin heye, ji yên rewşê dizanin re

Pêtê agirê di koçika min de

Sonda min ji bo min e, ji yê halê min dizane re.”

Her kes zivirî û temaşeyî min kirin. Destpêkê kesekî tiştek fêm nekir. Xwendina min a helbestê jî weke beşek xwezayî ya berdewamiya lîstokê dîtin. Lê tiştek wisa nebû. Bav û birayê min jî mat man. Weke ku bêjin çibû li min temaşe dikirin. Di heman demê de jî dikeniyan. Bavê min destê xwe di ser û porê min de danî. Carê jî bela xwe li min didan; “gelo te bê xebera me hinek tişt vexwariye?” Dema navber hat dayîn hinek hevalên birayê min hatin cem min û ez pîroz kirim. Navnîşana komeleyê dan min û gotin divê misoger tu bêyî komeleyê. Lê dîsa jî nêzîkbûnên wan zêde ne balkêş bûn. Nêzîkbûna wan şêwazek weke ku ji agir parçeyekê rizgar bikin bû. Nêzîkbûnek hêsan hebû. Weke ku bêjin; “temam, me dît.”

Ez li hember cewhera şoreşgerî, asta wê ya teorî û bîrdozî û kargeriya pratîkî ya rêxistinî biyanî bûm. Ango dûr bûm. Tenê ji hinek rastiyên giştî bandor bibûm. Ji aliyê zanebûn û serwextbûnê ve xizan bûm. Lewma min ji xwe re digot; “heta ku ez qane nebim, tenê bi daxwaza hinekan nabim şoreşger. An jî tevlî ti fraksiyonek din nabim.” Ev jî ne nêzîkbûnek pir bi zanebûn, an jî bi plan bû. Lê ji serî ve, ev meyla min hebû. Vê baweriya min bi min zêde dikir.

Malbat û derdora min jî, ji xebat û vekirinên wisa re ne girtîbûn. Ya rastî zemînek xwezayî ya amade hebû. Li gel vê di jiyana civakî de jî girtîbûnek tine ye. Hem di navbera xwe de bi

hev ve zêde girêdayî ne, hem jî rêk û pêkî, dîsîplîn û rêxistinek malbatî heye. Di heman demê de şêwazek peywendiyên xweser jî tê dîtin. Di vir de jî rola bavê min a di kesayeta wî de pêş dikeve, demokratîkbûna çors û kesayetek hûmanîst a mezin heye. Ji ber kekê min jî zarokê destpêkê û xort bû, dikariya bi serê xwe biryar bide. Ji xwe re derdoran ava bike. Pirsgirêka wî ya pêşxistina pêwendiyan tine bû. Li hember min jî, ji bona ku zaroka keç bûm, ti nêzîkbûnên cuda, yên çewsîner, çors û qedexeyan tine bû. Bavê min berovajî dayîka min ez didam pêş, hezkirina xwe dida nîşan û nirx dida min. Min jî ev ji kûranî hîs dikir.

Her çendî jiyana Ewrûpa rehetî dida avakirin, ti caran bala min nekişand. Ew bajarên mezin û malên mezin, bi her tiştê xwe ve gelek cuda bûn. Di serî de hinek tişt ji min re ecêb bûn. Mînak hêj em nû ji balafirgehê daketibûn, dema em li rawestgehê sekinîbûn, hinek kesên bi hev re li naverastê hevûdû diramûsandin. Dema min ev dît ji şerma min serê xwe tewand. Di heman demê de bav û birayê min jî li kêleka min bûn. Dîsa li ser rêya em diçûn dikana Tirkan jî xwaringehek a kuçikan hebû. Her ku ez diçûm dikanê û dihatim, min jin û zilamên îxtiyar ên kum li serê wan, bi kurk, xwe soravkirî, kupal û sêwan di destê wan de, kuçikê wan jî di destên wan de diçûn wir temaşe dikir. Ez pir bi hêrs dibûm. Mala îxtiyaran û xwedîderketina li wan tiştek pir baş û bedew bû. Li cem me kes naxwaze îxtiyar bibe. Bê ku bikeve nav dest û piyan ji Dûzgûn Baba kulmek axa bi xêr hêvî dike.

Ez di serdema ciwantiyê de me. Zêdetir bi dilê xwe tevdigerim. Çavlêkirinek ji her tiştî re tine ye. Tam berovajî wê ez nixwazim tiştên ku her kes dike bikim, dixwazim cuda bim,

tiştê ku ez pê qane me û kêfa min jê re tê ez wan dikim. Her çendî dilê hinekan nehêlim û ji ber xatirê hinekan girîngiyê bidim ecibandinên wan, dîsa jî min a dilê xwe esas digirt. Heta ez di vê mijarê de jî zêde bi rikbûm Bala min li ser xwe xemilandin û zêde li ber xwe kirinê tine bû. Lê ji ber min ti caran ji porê xwe yê xelek hez ne dikir, min carê perûkek hilû dida serê xwe. Roja destpêkê dema min perûk da serê xwe, bavê min ez nas nekirim û pirsî;

"Keça min tu bi xêr hatî. Ma Sakîne li kure?"

Dema ferq kir ku ez im, ji kena ket. Lê bavê min, birayê min û gelek hevalên min jî ji porê min ê xelek hez dikirin. Digotin xwezaya wê xweşiktire. Dîsa jî ez bi wê perûkê çûm heta Dêrsimê.

Kurdewarî û şoregerî li cem hev watedar bûn

Ez bi bavê xwe re çûm şevek din a hatibû rêxistinkirin. Weke ku hêzek me ji dizîve birêxistin bike hebû. Bes her tişt ji xweber pêş diket. Rewşek ji guhertin û nûbûnê re vekirî heye. Girtîbûn tine ye. Bê ku em bikevin ferqê, vê rewşê em bi gelek tiştan re liqay hev danîn. Şevek KDP-î'yê birêxistin kiribû. Bavê min zêde naveroka vê şevê fêm ne kiribû. Bawer im zêde ne xwedî agahî jî bû. Tenê ji bona şevek Kurdan birêxistin kiribû, lewma bes bû. Lê em hêjî di mijara Kurdewariyê de ji xwe biyanî bûn. Me digot; "em Elewî ne." Di nava pasaport, nasnama kes, li nav pirtûkên cihên kar, an jî saziyên dewletê yên fermî de Kurd tine bûn. Çi ji Dêrsimê, çi ji Qeyserî, çi jî ji Trakya be, tev hemwelatiyên KT, ango bi têgeha Tirk dihatin nasîn. Jixwe ev jî zêde negirîng bû. Kes li bingeha Mîlliyeta

kesê nedigeriya. Di çepgirî û şoreşgeriya heyî de jî ev cihetî tine bû! Lê Elî Gûltekîn û Kemal Burkay li Dêrsimê Kurd dihatin nasîn. Weke dûjînekê ji wan re digotin 'Kurd in!' Li cem wan pirtûk pir bûn. Pirtûka Îsmaîl Cem a bi navê Pirsgirêka Rojhilat jî hebû. Ji ber em ji Rojhilat bûn, lewma bal dikişand. Weke din jî kesî behsa Kurdiniyê nedikir. Gelo tişta hişt bavê min biçe wê şevê çibû û ji kur peyda kiribû? Ew karkerek bû. Zarok û malbata wî hebû. Zêde Girêdayî wan bû. Lê ji wan kesên dibistana kevin xwendibû. Dibistan seretayî jî ba, ji bona ronakbûna wî têrê dikir. Li gel vê bandora cewhera Elewîtiyê hebû. Lewma ber bi nêzîkbûnên teng ve ne diçû. Di vê mijarê de ji birayê min jêhatîtir bû. Birayê min bêdeng bû. Baldarî û helwestên wî zêde ne dihatin ferqkirin.

Dîsa em her sê çûbûn wê şevê. Dema em çûyîn wir perûk li serê min bû. Min dawek dirêj û gomlekek li ber xwe kiribû. Lê ew şev pir cuda bû. Hemû mêvanên şevê bi cil û bergên xwe yên gelêrî ve hatibûn. Ên biyanî jî cilên me yên gelêrî li ber xwe kiribûn. Tam şevek rengdan bû. Eywan zêde ne mezin bû. Zêdetir bi qasî xwaringehekê bû. Bi kurmancî û Almanî dihat axaftin. Pêşkêşvan jî şalwar û gomlekek li ber xwe kiribû û desmalek jî dabû serê xwe. Hinek peyvên Kurmancî dihat fêmkirin. Lê me zêde fêm nekir. Dema werdigerandin zimanê Almanî bavê min hinekê fêm dikir.

Piştî vê ji bi vîdeoyê di derbarê tevgera Barzanî û derbarê Mahabatê de hinek dîmen dan temaşekirin. Behsa Atatirk, Dêrsimê, Şêx Seît, Qoçgirî dikirin. Dema behsa Dêrsim û Komkujiya wê dihat kirin, mirovên ku porên wan heta binî hatine jêkirin û bi hev ve hatine girêdan didan temaşekirin. Paşê jî bi gelemperî behsa pêşmereyan dikirin. Filmê hatibû

amadekirin, piranî derbarê şer û pevçûnan de bû. Sala 1974'an bû û peşmergeyan li dijî rejîma Iraqê li ber xwe didan. Carê dîmenê faşîstê Saddam jî didan temaşekirin. Lê herî zêde Mistefa Barzanî didan nîşan. Ew jî li çiyan bû. Bi cilên pêşmergeyan ve, li navtenga wî şûtik û rext hebû.

Wê şevê tişta herî zêde bandor li min kir û demek dirêj çend rêzên wê ji devê min derneket, kilama "Bîrnakim ha bîrnakim, riya Lenîn bîrnakim" bû. Hemûyan bi hev re ev kilam got. Her wiha gelek kilamên Kurdî yên din jî bi sazbendan re gotin. Herî dawî jî hemûyan bi hev re govend gerandin. Di vir de bavê min xwe negirt! Jixwe dema li cem keç û korê wî jî yê ciwan hebe, qet xwe nagire. Lê min nexwest govendê bigerînim. Min bi girî bertek raber kir. Ji ber cilên min ên gelêrî tine bûn, pir xemgîn bûm. Bavê min jî kenê xwe bi rewşa min dikir û got;

"Ma min ji kur dizaniya her kes bi cilên xwe yên gelêrî hatiye. Ger min bizaniya jî, wê min di şevekê de çawa ji te re cil bida dirûtin. Fîstanê te jî dirêj û bedew e. Were em bireqisin."

Nekarî rika min bişkîne. Bi rastî jî şerimbûna min di wê kêliyê de dijiya, şerimbûna çi bû! Ji ber min beriya niha jî ji Kurdewariyê şerim dikir. Dema me baş Tirkî nedizanî û dayîka min baş bi Tirkî ne di-axivî bandor li min dikir. Niha jî, ji bona min kiras û xiftanên Kurdî li ber xwe nekirine, ew cilên reng û reng ên Kurdîniyê rave dikin li ber xwe nekirine, di nava wan mirovan de weke kesek biyanî disekinîm şerim dikim. Dibe ku tiştek pir erzan be. Lê ji bona min tişta di wê şerimbûnê de derdiket holê, hestek lêgerîna Kurdewariyê û xwedîderketina li wê bû. Her wiha Kurdewarî û Şoreşgerî li cem hev zêdetir watedar bûn.

Xwediya mala me nexweş bû û rewşa wê jî xeter bû. Min heta wê demê dizanî ku tenê keç û kurek wê heye. Ez hîn bûm ku keçek wê jî li Rojhılatê Berlînê ye. Ew jî zaroka wan a herî mezin e. Parçeyek malbatê li Rojhilatê Berlînê, parçeyek din jî li Rojavayê Berlînê ye. Li her du beşan rejîma heyî ji hev cuda bû. Gelo dema mirov li welatek Soyalîst dijiya, tam û cewhera wê çawa dibû? Birayê min her tim diçû wir û dihat. Lê zêde behsa tiştekê nedikir. Min bi dûrbûn û bircên ser dîwaran re bajar temaşe kiribû. Min ferqa heyî ne dîtibû. Avahiyên li wir wêran bûne ji nû ve dihatin sazkirin û ji dîwar ber bi hundur ve xetek dirêj valahiyê de bû, ev der jî weke cihê xeter didan nîşan. Bi îşaretên xeternakî bal dikişand. Li ser dîwaran jî têlên hatîn hunandin hebûn, ev jî têlên bi elektirîkbûn. Sînorê du dewletên ji hev cuda wisa bû.

Keça xwediyê malê bi navbeynkariya konsolosan hatibû xwestin û dabûn. Kesek di nava pergala sosyalîst de dijî dîtin tiştek çawa bû? Bi min re kelecan û mereq dabû avakirin. Paşê me ew vexwend mêvandariya mala xwe. Me di sohbetan de ew di nava barana pirsan de hiştibû. Wekhevî û azadî çi bû? Jiyana wê çawa bû, cihekariya xizan û dewlemendan çawa ji holê rabibû. Me di van mijaran tevan de pirs kiribûn. Wê jî bersiva me dida. Digot mal û wesayîta wê bi xwe heye. Her kes kar dike. Ne hêsane ku ew wêraneyên şer zû ji holê rabin. Jixwe mirov jî ev rastî didît. Ji ber ji xwîşk û birayê xwe cuda bû. Kesayetek kamil, gihayî û zane bû. Ji ber aqilê yên din li hewa bû.

Peder jî bela xwe li aliyên henek dida. Berî niha jî gelek caran henekên bi vî rengî dikir. Dema dibû behsa Kurdperwerî, sosyalîstî û Komînîstiya Elî Gûltekîn, her tim apê Birahîm ê li

gundê Tahtihalîl danî bîra xwe û digot; “dema we dewleta Kurdan saz kir, hûnê apê Birahîm jî bikin reîsê komarê.” Wê rojê jî têr kenê xwe bi halê me, pirsên me û baldariya me ya li hember sosyalîzmê kir û got;

“Ma çiye, ezê jî her yek ji we re wesayîtekê bikirim. Ger sosyalîzm ev be, pir hêsane!” Û ji baldariya me ya li hember vê mijarê jî aciz bû.

Sosyalîzma ku em kêm li ser axivî ne, me nîqaş kiriye, stran ser gotine, ji devê yên jiyakirne guhdarkirin û hînbûn, tiştek pir xweş bû. Derdiket holê nexeyal bû, ger mirov di vê rê de têbikoşe, dikare pêk bîne. Hê min pirtûkên wisa ji nêz ve têkildar nexwendibûn. Lê mînakek berbiçav hebû. Rojhilatê Almanya li kêleka serê me bû. Ger me bixwesta, ger xwestek heba me dikarî bi destûr biçin û werin. Ya rastî min pir dixwest, lê her carê birayê min ez dixapandim. Texmîn nedikir ku ez li ser dîwar re li Rojhilatê Almanya dinêrim. Rojhilatê Almanya jî ji bona min nepeniyek bû. Teqez aliyên wê yên cuda hebûn, min jî dixwest wan aliyan bibînim. Tevî ku di xwe gihandina vê de ti bêderfetî tine bûn, pêk nehat. Lê dîsa jî xwe gihandina sosyalîzmê, xwesteka ew weke pêşerojekê dîtin her tim zîndî hişt.

Bavê min zêde diwestiya. Sê danan kar dikir. Lewma bandor li tenduristiya wî jî dikir. Nexweş ketibû, me rakiribû nexweşxaneyê. Yek kesî kar dikir, neh kesan jî dixwar. Ev jî neheqî bû! Carê min ne dikariya xwe digiriyam. Piştî ku bavê min ji kar vedigerî, bi zorê pêpilkên malê dihilkişiya. Dema berbangê zengila saetê lê dida, min lanet li her tiştî danî. Ji ber gelek caran bê ku xwarin bixwe diçû. Carê xwarina ku min di lalîkan de amade dikir, bi xwe re dibir. Dema dibir ez jî bi

aram dibûm. Bi taybet dema min xwarinên ku hez dikir çêdikir, weke ku min jî tevkariyek ji bavê xwe re kiriye, ewqas kêfxweş dibûm. Lê aliyê din de jî min qebûl nedikir tenê karê xwarin û paqijiya malê bikim. Têr nedibûm. Carekê min jî bi acizbûn got; "ma ez xulamê we me" û tengezariya xwe anî ser ziman. Lê bi kêrî tiştekê nehat. Bêguman, dema min ev digot ne ku min nedixqwest xizmeta bav û birayê xwe bikim. Hatin û çûn pir bû. Gelek ji wan ji bavê min wan sûd werdigirt û tevî ku karê wan tine bû, tim dihatin. Her wiha dema min dixwest li cihekê kar bikim, bavê min karkirina min yekser red kir û heta weke tiştek eyb didît, ez ji vê hêrs dibûm. Bavê min digot:

"Wê paşê çi bêjin. Wê bêjin Simaîl keçek biçûk bir da karkirin! Ger belayek were serê te ezê çi bikim? Welatê gawira ne. Tu jî dibînî serseriyên kolanan pir in. Berdoş in, na! Qetiyen nabe!"

Qursa ziman a em diçûnê jî zêde kêr nedihat. Dersên bingehîn ên ez di pêvajoya dibistana navîn de hîn bûyîm ew bûn. Her wiha me di dersan de sohbeta xwe bi zimanê Tirkî dikir. Bi taybet hinek keç jî bê armanc ji xweber dihatin dibistanê. Birayê min jî bela xwe li wan dida û bi wan re diçû. Carê ez bi tenê dihatim malê. Dema bavê min ev ferq dikir, aciz dibû. Birayê min demekê bi keçek ji Îranê re hevaltî kir. Ji Kurdên Îranê bû. Kêfa bavê min jî ji wê keçê re dihat. Jê hez kiribû. Lê belê hevaltiya wan dirêj nekir. Ne dixwest bizewice. Pîvanên wî hebûn, her tişt hildibijart. Lê tevî ne rast bû ku bela xwe li gelek keçan bide û ji xwe re hevalan çêke. Ew hevaltiyên dikir jî, bihurdar, dixapandin û ti sûd ne didanê. Dema min carekê jê re got; "xwe têkil van tiştan neke!" Û dûjîn ji min re kir. Carina jî ew dûjînên wî "gotinên hezkirinê

bûn.” Bavê min jî carê bi şêwazên cur be cur gumanên xwe diyar dikir. Hevaltiyên ku dixistin û didan xistin hebûn. Ewrûpa bû. Mirov pir hêsan diheland û xirab dikir.

Navbera me û hevjîna Elî yê ji Mazgîrt’ê ya Alman, baş bû. Hinekê zimanê Tirkî jî dizaniya. Min jî zimanê Almanî nîvçe dizanî. Me li hev dikir. Bêkarî û vala mayîn bêwate bû. Lewma min ti wate ne dida hatina me ya Almanya. Ji min re balkêş ne dihat. Ya rastî Berlîn bajarek xweş bû. Lê park û sûkên wê yên mezin bala min nedikişandin. Av û girên di wan parkan de paşê hatibûn çêkirin. Rê çêkirî, gir çêkirî û robar çêkirî, ango ne xwezayî bûn! Min bêriya daristan û gundên Dêrsimê û Munzurê dikir.

Her wiha hinek cihên Berlîn’ê yên xweş jî hebûn. Herî zêde jî kêfa min dihat ku taxa me nêzî parkê bû. Her du aliyên coka avê park bû. Dema li ser wan çîmenan û axa paqij digeriyam kêfa min pir li cih bû.

Min ji cîrana me ya Alman re got ku dixwazim kar bikim. Lewma ji derveyî demjimêrên dibistanê karek pêwîst bû. Ji bona karekê bibînim, min alîkarî jê xwest. Wê jî qebûl kir û ji bona em karekê bibînin, em çûn serdana gelek kargehan. Herî dawî me li cihek kirîn û firotinê karek dît. Ne karek zehmet bû. Ezê heftiyê rojekê biçûma, wê min her der lihev bida, siyilên heyî rast bikiran û tiştên belav kom bikiran. Belgeya min a çûna dibistanê jî hebû. Hemû belgeyên weke nasname, wêne û cihê rûniştinê jî tev amade bûn. Tenê destûra bavê min hewce dikir. Gelo bê ku ew destûr bide, min dikarî çi qasî kar bikim?

Di heman rojan de ji nameyên hatine em pê hesiyan ku dayîka min du canî ye. Ez pir aciz bûm. Min bi hêrsek mezin ji

bavê xwe re got; “êdî bes e. Wê tu çi ji evqas arokan bikî?” Birayê min jî aciz dibû. Bavê min hinekê bi şermok, hinkê jî hejar digot hûn mafdarin. Bes êdî her tişt bibû.

Bavê min qebûl nekir ez kar bikim. Lewma min nekarî rojekê tenê jî biçim kar. Min jî bi acizbûn got; “wê demê min bişîne, ez naxwazim li vir bimînim.” Bavê min ji bona min qane bike gelekî mijûl bû. Her carê digot, dema tê malê xwarinek gerim dixwe, zarokê xwe dibîne çi qas kêfxweş dibe û ev ji bona wî çi qasî girîng in. Lê belê herî dawî qane bû ku tişta herî baş me paşve vegerîne ye.

Vegera li Dêrsimê

Bi biryara vegera Dêrsimê re kêfa min tam li cih bû. Zêdetir ji bona alîkariya diya xwe bikim ez dişandim. Lê min êdî ne dixwest zarokên biçûk xwedî bikim û paçê wan bişûm. Me bi zorê cêwî mezin kirin. Em dibûn heşt xwîşk û bira. Hem dayîk û bavê min ji ber çêbûna zarokan aciz dibûn û hem jî bê navber zarok danîn. Ez jî bi vê hêrs dibûm. Lê weke din jî ji bo vedigeriyam Dêrsimê jî pir kêfxweş bûm. Wê êdî min dibistana xwe jî berdewam bikira. Yanzdeh mehan dûr ketibûm.

Ez di navbera salekê de mezin bibûm. Fîzîka min jî hatibû guhertin. Weke din jî, min gelek tişt jiya û dît. Dibe ku min salekê navber dabû dibistanê, lê ew sala min jî vala derbas nebû.

Dema em gihan Dêrdimê, heyecanê ez girtim. Ez qet wisa dem dirêj ji Dêrsimê dûr neketibûm. Lê birayê min fêr bibû. Dema em ji otobûsê daketin, her kesî li me temaşe dikir. Ez di wê kêliyê de ne di ferqê de bûm. Min perûka zer dabû serê xwe

û pantorek delingê wê fereh li ber xwe kiribû. Wer zanîbûn ez yeke Alman im. Min qet nedizaniya wê wisa bê gotin. Nexwe ji bona vê gelek ji wan sar û dûr nêzî min dibûn. Min jî fêm nekir bê ka çima xizmên me wisa nêzî min bûne û aciz bibûm.

Yên ku pêş de çûne agahiyê bidin dayîka min gotine; "Heyder û keçek Alman jî pê re tên." Dema em nêzî kolana me bûn zarokên cîranan, jinên nêzî me û dayîka min ber bi me ve dihatin. Heta dayîka min nêzî min jî bû ez nas nekiribûm. Heta min negot; "dayê, ez im ma te min nas nekir?" Mat li min dinêriya. Kes nedihizirî ku min perûk daye serê xwe, yan jî bidim serê xwe. Kes ne li benda Sakîneyek ku di navbera yanzdeh mehan de ser û cil û fîzîka wê were guhertin bû. Min jî weke rewşek pir asayî û xwezayî ye digirt dest û tevdigeriyam. Di demek kin de her kesî hînî halê min ê bi perûk bû. Jixwe min jî her tim neda serê xwe û paşê bi temamî ji serê xwe derxist.

Ji dema ez ji Dêrsimê derketîm ve gelek guhertin hatibûn kirin. Piştî Denîz'an û Mahîr'an niha jî bûyera Birahîm Kaypakkaya wan di rojevê de bû. Birîndar li pişt cîpê girêdayî xirikandin, ji bona gel bitirse cesedên wan şanî gel kirin û êşkenceyên hatîn kirin dihatin axaftin. Elî Heyder Yildiz hatibû kuştin. Birahîm Kaypakkaya jî birîndar diçe mala muxtarek ku mamosteye jî, ji hêla wî ve tê gilîkirin û girtin. Li girtîgeha Amedî jî bi êşkenceyê tê qetilkirin. Dihat gotin, neynokên wî hatine kişandin, tiliyên wî hatine jêkirin. Ev jî bi êş û hêrsek mezin ve dihatin gotin. Lê navê wî jî; "egîdê serî dide, lê sir nade" hat nasîn. Bi navê Elî Heyder Yildiz stran hatin gotin.

Li dibistana mamosteyan a Dêrsimê jî hinek bûyer hatibûn jiyîn. Di navbera faşîstên li pansiyonê dirazin û şoreşgeran de

pevçûnan rû dabû. Heta digotin êrîşî kolana jêrîn jî kirine û şekamek jî li walî xistine. Li Dêrsimê sala 1974'an bi bûyeran derbas bû.

Min heta demekê li malê derfetên ku nû ji Almanya hatime bikar anî. Dayîka min zêde nêzî min nabe. Weke berê her ku bi hêrs dibû, yan jî şaşiyek didît, lêdan û dûjîn nedikir. Hinekê xwe digirt. Bûna keça ciwan û kamilbûna min kêrî tiştekê hatibû. Peywendiyên dayîkan ên bi keçên xwe yên ciwan re pir cuda bûn. Dayîkên wan di her mijarê de hukum li vîna keçên xwe nekirin. Di gelek mijaran de wan biryara xwe dida. Êdî neçariya gera bi hev re jî nemabû. Keçên ciwan bi hevalên xwe re diçûn gerê, an jî hevalên xwe danîn mêvandariya mala xwe. Perîhan, Cemîle û Nîmet di temenê min de bûn.

Dayîka min jî ez keçek mezin didîtim. Dema derdor ez di-ecibandim hem kêfxweş dibû û hem zêdetir hewl dida min biparêze. Hinekê nerim dibû, lê mîsoger destwerdanên xwe dikir. Di cil û berg, heta şêwaza şehkirina pora min her tîşt li gorî xwe dixwest. Her çendî encam nehatibû guhertin jî, me zêde şer dikir. Gelek tişt digot, em dûrî xwe dixistin, bêzar dikirin. Di cih de, ne cih de be, hewce, ne hewce qet ferq nedikir, ya xwe dikir, ji bona wê weke din ne girîng bû.

Her ku wê ev nêzîkbûn raber dikirin, ez jî asî dibûm û rika min zêde dibû. Ev helwestên wê dibûn sedem ku bi kesayeta min re jî berovajî wê xisletek asî, rik, tiştê ew dibêje qet nake pêş bikeve. Carina jî tevî gelekî bê dilê xwe bûm, min daxwaza wê pêk danî û zerar dida xwe, bi vî rengî dilê wê rehet dikir. Na. Mixabin ew dîsa rehet nedibû. Ew nêzîkbûna min zêdetir di dilê wê de dima. Mînak; piştî israr û tika kirinek dem dirêj min destûr bigirta bi hevalên xwe re biçam sînema, an jî cihek

din, ev destwerdanên wê destpê dikirin. Min jî beramber wê devjê diberda û nediçûm. Ji bona ez ne diçûm jî, hevalên min hem aciz, hem xemgîn dibûn. Dayîka wan jî li ber neçûna min diketin. Bi ser dayîka min de diçûn. Dema wisa dibû wê jî tika ji min dikir û ez neçarî çûnê dikirim. Lê nedikariya min qane bke. Dema me her duyan li dijî hev rik digirt, me her duyan jî hev dişikand û dilê hev dihişt.

Têkîliya di navbera me de şêwazek ecêb bû. Her tim şer û pevçûn bû. Wê wer dizaniya ku weke dayîkekê hez dike û dihizire. Dibe ku xwe weke ji dayîkên din zêdetir hez dike û dihizire didît. Temam, bes bi rastî jî her tişt li gorî daxwazên xwe ferzkirin, dibe hezkirin? Ji ber van rêbazan bertekên me tevan pêş diket, ev jî çi bi wê dida qezenckirin. Li şûna hezkirina dayîk û girêdana bi wê ve, xisletên îsyankar û asî pêş dixist.

Ji ber bav ne li mal bû, hemû berpirsyarî ya wê bû. Ew jî di bin barek giran de bû. Lewma diviya hem bav û hem dayîk ba. Pirsgirêka malê ya madî, çûna dibistanê, bûyerên derdor û bandorên wan, dihişt ku dayîka me zêdetir hişk me venêrîne, diparêze û helwestên ku me ji 'fêrbûnên xirab!' dûr bigire pêş ketibûn. Jinek zêde bi hêrs, aciz û her tim şer dikir derketibû holê. Bê tebat bû. Wê jî didît ku di vê têkîliyê de tiştek berovajî heye û di ferqa vê de bû. Li hember bertekên me digot; "ez dayîka we me. Ma qey dijminê we me? Hûn çima wisa nêzî min dibin?", xemginî û bêçaretiya xwe nîşan dida. Dîsa jî ez ji ber vê rewşa wê xembar dibûm û dêşiyam. Ger hinekê xwedî feraset ba, xwe têkil her tiştê me ne kiriba, wê ew bi xwe jî bi aram ba, pişgirî ji me bigirta û wê pirsgirêkek cidî jî rû ne daba.

Em bi zarokê dawî re bûn heşt kes. Xwedîkirina heşt zarokan û pirsgirêkên malê ve mijûlbûn, ew tengav dikir. Peywendiyên wê bi xizmên me re jî sînordar bûn. Dema nameyên bavê min dihat û an jî bavê min dihat serdana malê, zêde kêfxweş dibû. Bavê min ew nerim dikir. Bi wê re di-axivî, nîqaş dikir û nêzîkbûnên wê yên ne di cih de asteng dikir û dida rawestandin. Bavê min tim nêzîkbûnên dayîka min ên li hember min jî rexne dikir. Digot; "keça te ye, keçek ciwan e. Divê tu alîkariya wê bikî. Bihêle bila hinek tiştan jî ew bike. Destwerdana her tiştê wê neke. Em nikarin bêjin bila mîsoger zarok jî weke me bihizirin û û bişibin me. Ev ne rast e. Şikir tiştek xirab jî nakin. Divê em bi wan şahnaz bin." Gelek tişt jê re digot û hewl dida wê qane bike. Ev nêzîkbûn ji bona demek kin jî be, di peywendiyên me de dibûn alîkar. Dema ez her sibeh zû radibûm, min karê malê dikir û paşê diçûm dibistanê, gelekî xemgîn dibû. Bi taybet dema tevî her karê min dikir dayîka min li hember keda min ne razî ba, ber xwe de bi-axiviya, aciz dibû û digot;

"Ji xwedê bitirse! Radibe hemû karî dike û diçe dibistanê, keça kesekî wisa nake. Tu hêjî li qusureke wê digerî!" Lê mixabin dayîka min dîsa jî ne di-eciband û li qusurekê digeriya.

Kes li dîjî xwesteka min a berdewamkirina dibistanê dernediket. Her kesî dixwest bixwînim û bigihim dibistanên asta herî bilind. Heta wê rojê mijara zewacê ne ketibû rojeva malê. Kesê cidî ne digirt. Tevî ku birayê min mezinê malê bû, têkildarî wî jî qet ne hatibû axaftin. Ew jî di vê mijarê de xwedî rêgez bû. Ti caran firsend ne dida pirsgirêkek wisa bikeve rojevê. Tevî ku hinek hevaltiyên wî hebûn, li gorî wî zewac ne

karek wisa hêsan û erzan bû. Girêdana cihekê ve bû. Ma kî dizane dibe ku pergala malê û peywendiyên derdor, zewac li ber çavên wî reş û bê wate kiribe.

Bi taybet şêwaza zewaca xaltîka min Sakîne gelekî ecêb bû. Carê me bela xwe lê dida. Bi rêya dîtin û xwestinê zewicî bû. Carekê dixwaze zilamê ku ew xwestiye bibîne. Lê ji ber derfet tine ye ji malê derkeve, neçar maye ji şibakeya malê dûr ve lê binêre. Derketiye ser tankêra avê û hewl daye wî bibîne. Di wê kêliyê de tankêra avê qulibiye. Dema ew dikeve, hemû av jî dirije. Bi vî rengî xaltîka min bê ku zilamê ew xwestiye ji dûr ve jî bibîne, bi wî re dizewice. Êdî heft-heşt zarokên wê hebûn. Hevjînê wê jî ajokerê wesayîtê bû. Ew li heman malê cem hev dîtin jî bi serê xwe tehemulek dixwest. Weke du biyaniyan dijiyan. Di têkîliyên wan de ji hev dûrbûn û paşverûtiyek hebû. Ji mirov re pir bê wate bû. Zêde bi hev re ne di-axivîn. Lê dîsa jî ew qas zarokên wan çêbûne. Tê bîra min, em gelek caran bi vê rewşa wan dêşiyan û me kena xwe jî bi wan dikir. Li gorî wan peywendiyên dayîk û bavê min baştir bûn. Di mijarekê de biryar bihata girtin, lê nêrîna dayîka min tine ba û wê erê ne kiriba, qiyamet radibû. Dayîka min ew dikir pirsgirêk û demek dirêj li ser nîqaş dikir. Bes xaltîka min Sakîne ne wisa bû. Xaltîkên min ên din xurtir bûn. Hema weke kevneşopiya di malbatê de didomandin. Pîrika min ji bona her kesî pîvanek bû. Her kêm ger wê tu ‘keça wê ba’ diviya hinek xisletên wê bi te re heban. Nexwe digotin; “qet naşibe Ezê.”



Hest û coşên min ên zarokatiyê li zincîran xistibûn

Şert û merc hinekê hatibûn guhertin. Her çendî pîvan û qalibên kevneşop pir ne li pêş bin, rûxandinek dijiya. Êdî keç û xortên ciwan di pêvajoya hev nasînê de bûn. Dikariyan hev bibînin û bi-axivin. Xaltîka min a biçûk Gûneş bi vî şêwazî zewicî bû. Dîsa keça cîrana me Feyziye jî dîtibû, nasîbû, lihev kiribûn û bi dergistî bûn. Li derdor jî ev şêwaz zêde bû. Digotin dema xort çûye mêvandariya mala wan, dîtiye, ecibandiye û keça malê xwestiye. Carina dema bi hev re digeriyan, dibûn mijara fesadiyan.

Êdî qelen jî ji holê radibûn. Ji ber ciwanên Dêrsimê 'çepgir û şoreşger bûn' hewce dikir ku nûnertiya adetên nû bikin. Gelek ji vê razî bûn. Heta pir xwezayî bû ku yên li dibistanên bajarên mezin dixwendin, bi keçên Tirk û Çerkez, an jî ji gelên din re bizewicin. Berê zêdetir zewacên xizman dihat kirin. Êdî ew jî kêm dibû. Êdî zewaca bi zorê û ferzkirinê ji holê radibû. Her wiha mahra ji derguşê ve derbas ne dibû. Belê, ma ev çarenûsa heyî diguhertin? Ya girîng ew bû ku, kevneşopî çiqas dihat derbaskirin. Ên ku hê di wan deman de dihizirîn min bikin bûka xwe hebûn.

Peywendiyên me bi apê min wan re bi sînor bûn. Tenê dema bavê min dihat serdana malê, kêm caran dihatin. Zarokên sê apên min ên di temenê min de hebûn. Ji ber me zêde hev nas nedikir, zêde kesî nedizanî em xizmên hev in. Em dûrî hev disekinîn. Ev ber bi çav bû. Dema hê ez di temenek biçûk de nêzîkbûnên apên min ên digotin; "evê bibe bûka me" zêdetir ji aliyê dayîka min ve ne dihat pejirandin û bertek raber dikir. Dayîka min û apê min wan lihev nedikir, dayîka min ji wan hez

nedikir. Herî zêdetir jî wan biçûk didît. Dayîka min kîndar bû. Qet ji bîr nekiribû, dema bavê min ne li mal bû, wan qet alîkariya diya min nekiribû. Her carê ew gotina; "dost jî, dijmin jî di rojên teng de diyar dibe" digot. Carina mantiqê; "xerîbî baştire' heta cihekê baştir bû. Lê di cewhera van nêzîkbûnan de jî pîvanên wê tenê hebûn. Ew esas digirt. Nexwe ne bertekek li dijî kevneşopiyek paşverû bû. Xalên min di vê mijarê de zêdetir baldar bûn. Rastiya zarokên xwe baştir didîtin. Berî her tiştî nedixwendin, dev ji dibistanê berdabûn û bê kar bûn. Ma kî kar dida zarokên wisa! Ji min hez dikirin û ji bona min dixwend, ew hêjayî min ne didîtin.

Dema li derdora me dawet çêdibûn, bavê min bi çoş dibû û digot; "xweziya miradê min jî bicih bihata!" Difikirî ku me bizewicîne, lê ferz nedikir, an jî nedixist rojevê. Helwesta birayê min zêdetir bi bandor bû. Ev jî dihişt bandor li ser nêzîkbûna wan a li hember me jî bike. Digot;

"Ez nikarim li cem diya xwe li ber xwe bidim, ger ez bizewicim wê bûka malê keça xerîban çawa bikare?"

Daxwaz û nêrînên dayîk û bavê me der barê me de ev çarçove derbas nedikir. Dayîka min cihaz bi min dida çêkirin. Li kuderê mînakek neqşên herî zehmet û bedew ên qenewîç û dantêlan hebûya, danî hem wê çêdikir û hem bi min dida çêkirin. Ji bona hinek keçên ciwan çêkirina cihazan azweriyek bû. Ji dil û bi xwestek çêdikirin. Xeyalê keçên ciwan tev xwe ji zewacê re amadekirin û xwe ji wê re endamek amade dîtin bû. Lê min ti caran bi dilê xwe cihêz çênedikirin. Dema ez ji Almanya hatim, min cihêz bi xwe re ne anîn. Xelatên ku min anîbûn cuda bûn. Têkîliyên zewac û yên madî ne li gorî min bûn. Dûrî min bûn. Felsefeya jiyanê ya bavê min zêdetir bi me

re hebû. Ji ber aliyê jiyanê yê madî her tim, raveya berjewendî, bêmafî, pevçûn û nehezkirinê bû. Dema di nava tiştekî de madiyat heba, bavê min lenet lê danî. Lê dîsa jî cîhana em di nav de dijîn bi gelemperî pîvan li gorî madiyatê dihat sazkirin.

Çawa ku ez ji Almanya vegeriyam, axaftinên têkildarî van mijaran di nava malbatê de ketin rojevê. Cîranên miqabilî mala me, apê Xidir wan mêvanê mala me yên her roj bûn. Apê Xidir zêde dirêj, gir û teqawît bû. Lê hêjî mirovek zînde bû. Hevjîna wî Tirk bû. Miqabilî wî jinek bejin kin û qelew bû. Ev her du îxtiyarên ji derve de li gorî hev ne dihatin dîtin, ji hêla derdor ve zêde dihatin hezkirin. Diçûn mêvandariya her kesî. Tenêbûna xwe bi wî şêweyî zêde dikirin. Di wê demê de keça wan a li Enqereyê zewicî û zaroyên wê jî heyî, hatibû.

Dema em ji Almanya dihatin gelek kes dihatin mêvandarî û xêrhatina me. Lê dema ew dihatin, herî dawî jî ew diçûn mala xwe. Her tiştê min ber çavan re derbas dikirin. Taybetmendiya min a herî zêde kêfa wan jê re dihat, jêhatiya min a di karê malê de bû. Dema keçek ciwan di karên xwe de kêrhatî ba, ew zêde dihat ecibandin! Ji bona min çi qas tiştek ecêb bû ku li şûna kesê min bi-ecibîne, hinek din ez di-ecibandim. Bêguman, baldarî û hezkirina mirovan girîng bû. Hezkirina xoy û bedena xweşik, mijarên her tim hebûn. Ev ji bûna hevrebûnê û hev re jiyînê bandorker û tiştên lê têne gerînin. Kesî nedixwest bi kesek wê dûrî xwe dike re bizewice. Lê dîsa jî pirsgirêk ji rastiyan zêdetir, pir cuda dihat destgirtin.

Em li Kişlayê jî weke cîran bûn. Her çendî peywendiyên me zêde ne nêzî hev bin, kêm ji wan tên bîra min. Ji zarokên wan Doxan û Metîn têne bîra min. Wê demê jî binesaziya malbata wan bala min dikişand. Metîn piranî bi bejna xwe ya

dirêj û meşa xwe ya lez ve bal dikişand. Weke zarokek bi malbatê ve girêdayî dihat zanîn. Em hê biçûk bûn. Ma kî dizane dibe ku dema me li hewşê gok dilîst, em li gorî wan zarokên nesekinî û çilmuyî bûn. Acizbûnên xwe yên li hember kesayeta me ya nesekinî bi şêwaza destê xwe bi serê me de danîn didan fêmkirin. Gelek caran me weke "kekê Metîn, kekê Metîn jî bang kiriye." Ji ber ji bona em balê bikişînin nêzîkbûnên me yên zarokatî bi şêweyên gelekî cuda bûn.

Niha jî ez mezinbûm. Êdî dema em liqay hev dihatin, an jî me hev didît, me awirên xwe dizivirand û weke me hev nedîtiye, em nêzî hev dibûn. Ew jî heman wextê hatibû bêhnvedanê. Min ew tenê çend caran li eywanê û li ser rê dît. Metîn kekê Kişlayê yê mezin bû. Dihat nasîn. Hebûna wî ji bilî vê bandorek din ava ne kiribû. Lê dema bav, dayîk û xwîşka wî zêde bi min re eleqeder dibûn, bala min dikişand.

Di vê demê de apên min ew jî diketin navberê. Xisletên her yek zarokên apên min cuda bûn. Celal li dibistana amadeyî dixwend. Lawê apê min Mistefa bû. Heyder li Yapi Hunerê (Yapi sanat) bû. Lawê apê min ê din bû. Birahîm, M. Elî û Baqî jî lawên apê min Mehmet bûn. M. Elî li Enqereyê rûdinişt. Ew jî demek dirêj bû ji TKP'ê bû. Ew lî Erzînganê bi şerê xwe yê bi faşîstan re dihat nasîn. Baqî û Birahîm jî weke agir bûn. Me herî zêde ji Birahîm hez dikir. Bi me re eleqeder dibû. Peywendiyên me yên bi wî re zêdetir gerim û xwezayî bûn. Baqî dibistana amadeyî jî xwendibû. Lê peywendiyên me pir bi sînor bûn. Ji ber rêzdariyê her çendî temenê kêmek ji me mezintir bû, me weke kekê û xwîşkê xîtabî hev dikir. Me bi gelemperî ji lawên apên xwe re jî digot kekê. Ji ber hemû jî ji me mezintir bûn. Baqî beriya demekê carekê hatibû mala me.

Ez bawer im serdanek asayî bû. Lê hatina wî ya vê carê cuda bû. Dayîk û birayê min ji rewşê agahdar bûn. Birayê min ji bona min gotibû;

“Tu pê re bi-axive, lê hê zêde biçûk û ciwan e. Baştire ku hûn vê mijarê nekin rojevê.”

Cardin birayê min derketibû derve. Dema çûyî jî dayîka min hişyar dike û dibêje fêmkar nêzî bibe û xwestibû me bi tenê bihêle. Dema yek bi yek ji malê derketin, min fêm kir. Ez bi derdor re mijûl dibûm û min derdor kom dikir, da ku wext derbas bibe. Lê ji aliyek din ve jî ji bona min ecêb bû. Ez ji xwe bawer bûm û kêfxweş dibûm ku ezê bi navê xwe biryarê bidim. Êdî keçek ciwan bûm û dayîka min derbarê mijarekê de mafê biryarê dabû min. Demek başiyên vê jî hebûn. Min bi lawê apê xwe re di sohbetek çayê de axivî û daxwaza wî ya zewacê red kiribû. Diyar kir ku baldariya wî hêj di dema dibistana navîn de pêş ketiye. Me axaftinek beramber hev bi kamil kir. Min jê re got, ez zewacê nafikirim û dixwazim bixwînim. Wî yekser got ew jî naxwaze hema zewacek pêş bikeve, ji ber ew jî dixwîne. Lê dikarin pêvajoyek sozdanê û dergistîbûnê bijîn, ku heta dibistan diqedin. Bes min bi zimanek mîsoger diyar kir ku beramber wî ti hest û baldariyek min tine ye. Piştî min wisa got, zêde xemgîn bû û bi çavên tije rondik çû. Dayîka min li hewşê mereq dikir. Ji ber dîtibû Baqî xemgîn û zû rabûye, çûye, helwesta min jî fêm kiribû.

Êvarî kêfa birayê min jî ji biryara min re hatibû û gotibû;

“Baş e! Em çi bikin, te bi xwe biryara xwe daye.”

Pirsgirêk jî wisa hat girtin. Hevalên min keçên ciwan ku bihîstin jî mereq kiribûn. Dixwestin sedema ku min ew red

kiriye bizanin. Ji ber min lawek li zanîngehê dixwîne û nexasim lawê apê xwe red kiribû. Ti wate ne didanê.

Vê helwestê baweriya min a li beramber min zêde kiribû. Bandor li dayîka min jî kiribû. Wer dihizirîm ku êdî nikare daxwazên xwe wisa hêsan ferz bike. Wê salê bavê min jî hatibû serdanê. Dema bavê min hatî, apên min wan cardin ketibûn navberê û ev mijar nîqaş kiribûn. Ji ber bavê min dihizirî ku dibe bandora dayîka min di vê biryara min de hebe, hewl dida min qane bike. Lê ev hewldana wî ne di şêwazek çors de bû.

Apê Xidir û hevjîna wî dayîka Tonton bi hatina bavê min re qet ji mala me dernediketin. Wan jî pariya di devê xwe de derxistibûn. Min dest bi dibistanê kiribû. Ez diçûm pola yek a dibistana amadeyî. Hinek xizmên xwe jî kiribûn navberê û hewl didan bavê min qane bikin. Dema rojekê behs kirin, min got; "çawa ez ji bona kesek nas nakim û bi wî re ne axivîm biryar nadim, hûn jî nikarin biryarê bidin" û min bertekek tund raber kir. Bavê min zêde aciz bû ku ez bi vî uslubû li cem wan axivî me. Ev helwesta min weke nêzîkbûnek şimarik nirxandibû. Tiştek ecêb bû, ji ber bavê min li hember bertekek wisa xwezayî aciz bû. Weke ku min bi van gotinan sucek kiribû. Çawa ew çûn dayîka min hewl da min qane bike. Lewma tundî bi bavê min re nîqaş kiribû. Ji ber dayîka min yeke biyanî hilbijartibû, bavê min zêde aciz bû. Ev nîqaş bi rojan doma. Dem bi dem ji hev jî dixeyîdîn. Vê rewêş bi me re jî acizbûn ava dikir. Piştî demekê zilaman cardin kir rojevê. Apê Xidir kiribû serê xwe. Her cara ku ez li sûkê û di rê de didîtim, dipirsî, mijûl dibû û dişopand. Ango fermî xwedî li min derdiket.

Rojekê birayê min ji ber dayîka min zorî li min dikir teqiya û bertek raber kir û gotibû;

“Hûn çi dikin. Ma temenê wê çend e. Ma hûn zêde bêçare ne. Ma hûn zêdahî xwe dibînin, hûn nikarin xwedî bikin? Madem wisa hûn çima zorê lê dikin? Aciz bû û zivirî ji min re got;

“Tu jî di bin bandora van de nemîne. Li şûna ku bigirî û binalî, biryarek tu rast dibînî bide. Zewac ne karê zaroka ne!”

Kêfa min zêde ji helwesta wî re hat. Lê di rojên paştir ji ber ferzên derdor jî dixwestin biryarekê bidin. Rojeke ku ez li dibistanê bûm, soz dabûn hev. Ji ber helwesta min zêde negirîng bû. Ya rastî min jî zêde red nekiribû. Ji ber helwesta min ne weke ya min beramber kurê apê xwe raber kiribû. Bandora nesîhetên weke; “Metîn zaroyek baş e. Ma tu dînî. Li zanîngehê dixwîne. Jixwe zewaca xizman ne baş e. Li şûna ku bi wan re bizewicî, vê malbatê hilbijêre.” Li min kir. Min bê biryarî dijiya. Lê dîsa jî şûna min dayîka min biryar dabû. Peder jî neçarî vê kiribû. Mîsoger Peder bi acizbûn ev qebûl kiribû. Ji ber wî zêdetir dixwest ev zewac bi biraziyên wî re pêk were. Dema ez ji dibistanê vegeriyam, ji min re gotin biryar hatiye girtin, wê yekser merasîma dergistîbûnê pêk were. Beriya ku Metîn biçe dibistanê, wê ev merasîma dergistibûnê pêk bihata. Êdî ti wate tinebû ku ez bi acizî gotina bikim. Keça xalê min Cemîle got; xwe vala aciz neke, ji ber her tişt ketiye meriyetê.

Belê, tişta pêk dihat ez bi kesek qet nas nakim, min ew ne dîtiye, pê re ne axivîme û ti xisletên wî nas nakim re dizewicim. Wî jî, ez ji nêz ve nas nedikirim. Teqez dayîk, bav

û xwîşka wî bandor lê kiribûn. Tişta ku ji dûr ve dîtî, tenê keçek por sor bû!

Apê Xidir zêde pêş de çû û got; “em yekser dawetê bikin û bila bi Metîn re biçe Enqereyê. Yên me jî ne dixwestin were lezkirin. Ji ber Wê herî kêm heta qedandina dibistana amadeyî li bendê ban.

Gelo ev xewnek, an jî lîstokek bû. Ez mat mabûm. Wê min kêfxweşî û kelecana çi bijiya? Ger kesek ku min dîtiba û baldar bam û min jê hez bikira, min halek wisa ve ev agahî pêşwazî nedikir. Ji ber li şûna min biryar dabûn, ez ji bo wê jî mat mabûm. Ez zarokek keç bûm û dayîk û bavê min mafê xwe dîtin ku li şûna min biryar bidin. Belê ew çi bû? Ew xortek bû û asta çandî ya dayîk û bavê wî jî cuda bû. Êdî ew jî xwendekarek zanîngehê bû. Gelo çima wî qet di vê mijarê de gav ne avêtibû? Me qet hev ne dîtibû. Her pesnê Metîn dida; “nizanim fêrbûnên wî yên xirab tine ne. Yeke bedew û cindî ye. Bala min jî dikişand. Jixwe êdî soz hatibû dayîn.

Lê min ji xwe re digot dibe ku baştir be. Gelo dergistî tiştek çawa bû? Ez tevahiya şevê li ser vê hizirîm. Min ji xwe re xeyal dikir. Bes min tiştek jiyan nekiribû, ku ez bikaribim tiştekê hîs bikim. Tenê min kelecana ku hinek kêliyên em hev bibînin dijiya. Roja paştir zû bav û dayîka min, xaltîka Medîne, ez û Metîn bi taksiyê çûn Elezîzê da ku gustîlkan bikirin.

Dema me di wesayîtê de hev dît, me silav da hev. Tenê ew qas bû. Carê me bi şermok li hev dinêriya. Em her du jî li beramber hev biyanî bûn. Ev ji halê me jî diyar dibû. Em Elezîzê li otêlekê man. Gustîlk, cil û hinek xelat hatibûn kirîn. Di kirîna tiştan de tenê me tiştên ku ecibandî digot û wan jî

dikiriya. Wê şevê, ji dayîka min destûr xwestibû ku em bi hev re biçin sînemayê. Lê dayîka min destûr nedabû. Sînema hêcet bû. Dixwest em bi hev re bi-axivin, nîqaş bikin û hev binasin. Bes ez ew qasî ne dihizirîm. Wî daxwaz dikir, ji ber ew zêdetir kêrhatî bû.

Dema em vegeriyan Dêrsimê, ez çûm cem berberê jinan, min pora xwe çêkir. Hinekê jî sorav û sipiyav li rûyê xwe da. Paşê min kirasê xwe yê dergistîbûnê li ber xwe kir û çûm malê cem mêvana rûniştim. Bi çepkan gustîlkên me kirin tiliyên me. Pey wê re şahiyê destpê kir. Hemû kolan, cîran, xizim bi hev re di merasîma min de bi çoş bûn. Têra xwe wêne kişandin. Merasîm heta nîvê şevê domiya. Piştî ku her kes belav bû, min kirasê xwe ji ber xwe kir û rûniştim. Ez di valahiyekê de bûm. Min fêm ne dikir ku çi dibe. Weke ku me lîstikek lîstibû û piştî lîstok xilas bû her kes çûbû malên xwe. Lê ferqa di vir de, gustîlka di tiliya min de bû. Êdî ez keçek dergistî bûm. Min gustîlik derxist û nivîsa di hundurê wê de xwend. 'Metîn Çetîn' û dîrok nivîsandîbû. Min li ber eynikê li xwe nêrî. Porê min hêjî weke destpêkê çêkiriye. Xemla rûyê min jî hê weke xwe ye. Weke ku mezin bibûm. Min hewl da wê sorav û sipiyava li rûyê xwe paqij bikim. Lê ji ber min nedizaniya çawa jê diçe, her ku min jê dibir zêdetir li rûyê min belav dibû. Paşê min zanî ku diviyabû ez an bi qremê, an jî bi avek paqijkirinê jê bibim. Ez paşê hînî van jî bûm.

Dayîk û bavê min jî di hundur de li ser mijarekê nîqaş dikirin. Min guhê xwe da wan. Bavê min dibêje tiştek ji îşareta dayîka min fêm nekiriye û ji bona vê sond dixwe. Qaşo dayîka min xwestiye me di odeyê de bi tenê bihêle, tevî ku îşaret daye bavê min, ew derneketiye! Ango ez û Metîn wê şevê bi tenê ne

man û ne axivîn. Me gotinek jî ji hev re nekir. Tenê dema em rûniştibûn, ji şerman bi destên xwe dilîstim û min kirasê xwe dikişand. Metîn hêdîka ez hişyar kirim, da ku wisa bi kirasê xwe nelîzim. Ji ber bi wî şêwazî kiras ve lîstin hemû laşê min derdixist derve. Her wiha em bi israra mamoste Aysel rabûn govendê. Me di wê odeya teng de govend gerand. Wê jî ez aciz kirim, lewma zû rûniştim. Min nekarî bi dilê xwe govendê jî bigirim. Weke ku ew hest û coşên min ên pak û zaroktî bi zincîrê xistibûn. Rihek aciz serwer bû. Heman weke tiştek min bişidîne (mengene) bû.

Roja paştir Metîn ji bona xatirê xwe bixwaze hat malê. Piştî piştî xwarin û çay vexwarinê, wî û bavê min sohbet kirin. Dayîka min dîsa ew çavên xwe yên tûj berdabûn ser çavên bavê min û dixwest tiştekê ji wî re bêje. Bavê min dîsa fêm nedikir. Sohbeta wisa hemû bi hev re zêdetir hez dikir. Me vê carê jî nekarî bi hev re bi-axivin. Tenê carê em li hev dinêrin. Em hevûdû mereq dikin û dişopînin. Em ti caran wisa nêzî hev nebûn. Em her du li heman maseyê rûniştibûn. Tenê tiştek hevbeş hebû, ew jî gustîlka di tiliyên me de bû. Paşê xatirê xwe ji her kesî xwest. Herî dawî xatir ji min xwest. Di wê kêliyê de tiştek ji dilê min hilpekî. Ev ji hev qutbûn jî, ji kur derketibû. Bes min ne karî vê jê re bêjim. Lamên rûyê min ramûsî û bi lez derket.

Piştî ku Metîn çû min dibistana xwe berdewam kir. Hemû hevalên min ez pîroz kirim. Êdî ji ber ez dergistî bûm, keçek kamil bûm. Zêdetir baldar tevdigeriyam. Êdî weke berê nerehet bûm. Ji xwe dayîka min sax be qet nedida jibîrkirin. Di serê her gotinê de digot; “tu bi dergistî yî” ez dixistim nava pençek teng û difetisand.

Min û Metîn ji hev re dinivîsand. Nameya destpêkê wî şand. Min bersiva wî hemû rewşa ku dijiya, bi hemû ziraviyan ve jê re vegot. Nameya min ecibandibû. Ji ber min nêrînên xwe tev vekirî nivîsandibûn, kêfxweş bû.

Min name dişand ji malbata wî re, wan jî ji min re dişand. Min jî ji navnîşana wî dayî re dişand. Em, dayîk û bavê wî weke malbatekê bûn. Şev û roj li cem me bûn. Lewma ez di navbera dû pençeyan de bûm. Ez hem di bin kontrola dayîka xwe û hem ya malbata Metîn de bûm. Sînor ji min re datînan. Lê min her du pençe jî qebûl nedikir û bi wan re têdikoşiyam. Carina ji vê nîqaşên min bi dayîka min re tund dibûn û min bi avêtina gustîlkê ve gef lê dixwar. Wê ez nas dikirim. Min dikariya vê bikim. Lewma heta demekê nerim nêzî min bû. Herî zêde jî ditirsiya ku van ji dayîk û bavê Metîn re bêjim. Ji ber vê gumanê hişyar nêz dibû.

Di bêhnvedana somestirê de Metîn hat Dêrsimê. Dikarim bêjim hevûdû naskirin di vê pêvajoyê de çêbû. Her çendî nameyan em nêzî hev kiribin, parçe û kêm diman. Di pêvajoya bêhnvedana somestirê de, me her duyan jî nakokiyên ku dijiyan bi hev re nîqaş kirin. Vê jî hişt ku em zêdetir nêzî hev bibin.

Metîn di peywendiyên xwe de jêhatî bû. Xwedî kesayetek gerim bû. Lewma dayîka min ecibandibû û hez kiribû. Hema bêje dayîka min ji me tevan zêdetir ji wî hez dikir. Lewra nêzîkbûna wê ya beramber min jî nerim dibû.

Bi demê re min û Metîn hev nas kir. Metîn heşt salan ji min mezintir bû. Carina min xwe li cem wî weke zarokekê didît. Carina jî min ew weke zarokekê dinirxand. Nêrîna me li jiyanê teng bû û kevneşopî derbas nedikir. Ji ber bala me her

duyan jî li hember siyasetê hebû, me pêşketinên di wan deman de rû didan nîqaş û şîrove dikir. Me her duyan jî nedixwest em zû bizewicin. Hedefa me ya destpêkê qedandina dibistanan bû. Lewma me girîngî jî ne dida daxwaz û ferzên malbatan jî. Dikarim bêjim pêvajoya somestir, dergistîbûn ji aliyê me ve fermî bû, me hev nas kir û heta em bi hev ve hatin girêdan. Me wê demê soza eslî da hev. Paşê dîsa em ji hev qut bûn. Ew cardin çû Enqereyê, min jî dibistana xwe domand. Di vê pêvajoyê de baweriya min li beramber min xurt bû. Ji ber min berpirsyariya tiştên dihat jiyîn girt ser xwe.

Dibistan hê zêdetir di liv û tevgerê de bû. Cewaziya ‘mamosteyên faşîst û mamosteyên şoreşger’ diyar bû. Mamosteyek me yê perwerdeya bedenê ku berê boksortî kiribû hebû. Rojekê ji ber bi boksoriya xwe bawer e, kabadayîtiyê dike, gef li hinek hevalan dixwe, heval jî lê didin. Vê bûyerê mamosteyên din ên faşîst tirsandibû. Hevalên min ên pola me piranî ji Hacerî, Çukur û gundên derdorê bûn. Piraniya wan ji PDA bûn. Kêmek ji TÎKKO bûn. Navên koman her demê, li her cihî nedihat gotin. Lê di nîqaşan de baş dihat fêmkirin ku, kî girêdayî kîjan komê ye û parastina kîjan komê dike. Bi gelemperî li dijî mamosteyên faşîst bi xwezayî eniyek hatibû avakirin. Di rewşên wisa de em tev li nava vê eniyê bûn. Li kêleka vê şert û mercên xwendinê jî zehmet dibûn. Li pansiyona dibistanên Yatili faşîst nemabûn. Lê derfetên jiyanê jî gelekî xirab bûn. Dîsa piraniya dersan vala derbas dibû. Valahiya mamosteyan nedihat dagirtin. Giraniya mamosteyên faşîst digirtin dibistanan. Hinekan dixwestin cihê karê wan warek din be û xwestekên xwe pêş dixistin. Dema hinek ji Dêrsimê ban, qet nedihatin. Şibakeyên dibistanan şikestî û

kalorîfer pê nediketin. Ango rewşa heyî ji her alîve zehmet bû. Hewl didan meyla li dibistanan pêş dikeve û dînamîzma ciwanan bi van rêbazan asteng bikin.

Dersa zimanê Almanî ya mamoste Mesud, ji bona Zilfo ‘dibû dersa şahiyê. Ji ber di zimanê Almanî de ‘Herr’ tê wateya ‘bay’, di zimanê dimilkî de jî di wateya ‘Ker’ de bû. Zilfo jî bênavber di wê dersê tevê de kena xwe bi mamoste dikir û jê re digot ‘Herr Mesud’. Gelek peyvên dimilkî li pey hev rêz dikir û çend peyvên Almanî dikir navberê. Mamoste tehrîk dikir. Dîsa jî Bay Mesud bi înad bû. Dersa min a zimanê Almanî piranî di navbera 9-10 de bû. Ji ber ez salekê li Almanya mam, baldariya min li hember zimanê Almanî pêş ket. Min ji dersê hez dikir. Lewma carina ew helwestên Zilfo bi min re acizbûn ava dikir. Min bê wate didît. Ji ber wî hema di her dersê de heman nêzîkbûn raber dikir. Ji ber li dijî çepgirî, şoreşgerî, xwendin û hînbûnê bertekên xwe hebûn wisa nêz dibû.

Di dersa Tirkî ya mamoste Birahîm Polat de jî Zûlfî li maseyên pişt dengên ecêb derdixist. Dema mamoste pişta xwe dida, wî wisa dikir. Mamoste jî ferq kiribû, bes dixwest wî di wê şêwazê de bigire, lê nekarî. Dîsa tam dema li xwe zivirî Zûlfî dengên ecêb derxist. Min di wê kêliyê de bertek raber kir û bi îşaretan jê re got wisa neke. Lê mamoste bi wî şêwazî dîtim. Ji hemû polê pirsî bê ka kiye deng derdixe. Dema kesî deng nekir, çend kes rakirin ber texte. Xwest binase bê ka kiye wisa deng derdixe. Nav dayîn weke nêzîkbûnek duristbûnê şîrove dikir. Jixwe em jî li gora wî xwendekarên polê yên durist û bi aqil bûn!

Ma me çima xwediyê nêzîkbûna şaş ne dida dest? Me li ber xwe da ku em nebêjin. Me giştî ji mamosteyê xwe hez dikir.

Ew jî ji Dêrsimê bû û weke şoreşgerek pêşveçûyî dihat nasîn. Gelek caran me di dersê û navberê de nîqaş dikir. Lê belê, ew mamoste bû, erkdarek dewletê bû. Em xwendekar jî heval bûn, li eniyekê bûn, ger me nav bida, wê me ji eniya xwe li ser yekê bida, ev jî tiştek şaş bû. Lewma mamoste weke ceza bi cetwelê li destêb me xist. Em di pola 1 a dibistana amadeyî ne û me lêdan dixwar! Gelekî zora min bir û giriyam. Di navbera dersê de jî min bi Zûlfî re nîqaş kir, min jê re got ti wateya nêzîkbûnên wî tine ye, divê dev ji nêzîkbûnên xwe yên çeloxwarî berde û xwe aciz kir. Wî jî wer dizaniya ku ji ber me lêdan xwariye, em bi ser de diçin û xwe aciz dikin. Ango weke nêzîkbûn û helwestên wî ne şaş in. Paşê mamoste Birahîm xemgîniya xwe bilêv kir û lêborîna xwe xwest. Lê em jî şikandibûn.

Piştî salan dema me li Îzmîrê hev dît, bêdeng, di navbera axaftinan de, bi tiliya xwe îşaret dikir bê ka çawa li me xistiye. Bes ji bona wî êş bû û gelekî mehcup bû. Xwest ku ez wî efû bikim. Mirovek zêde hêja bû. Jixwe min jî ew ji mêjve efû kiribû. Lê Zilfo piştî demekê refên xwe guhertibû. Hemû xisletên wî kesayeta wî dida der. Her xisletek raveyek kesayeta wî bû. Lewma me ne ew bi rastiyê ve di-eciband û ne jî hez kiribû. Lewma di vê manê de gelek caran rêyên kesan ji hev cuda dibûn.

Dibistana me di çalakiya boykotê de bû. Li ser daxwaza şert û mercên jiyanê werin sererastkirin, me boykot kir. Boykotek birêxistinkirî bû. Kêm zêde yên birêve dibirin jî dihatin zanîn. Ji bona min zêde negirîng bû kî pêşengiya vê boykotê dike. Ji ber boykot çalakiyek di cih de bû. Berxwedaniyek bû. Tevlîbûna wê jî erkek bû. Em ji dibistanê

heta ber Qonaxa Hukumetê meşiyan. Hê em di rêya nexweşxaneyê de bûn, polîsan em asteng kirin. Me jî polîs dan ber keviran. Berî wê, ji me re gotibûn ger polîs guleyan bireşînin, emê li dijî wan çi bikin. Polîsan jî bi israr destpêkê gule reşandin. Me jî li pişt dîwar û wesayîtan çeper girtin. Em dev jê bernadin. Em bi qêrînên diruşmayan ve meşa xwe berdewam dikin.

Di kêliya meşê de hinek xwendekar hatin girtin û binçav kirin. Vê bertekên me zêdetir kir. Dema em nêzî sûkê bûn derdor qelebalix bû. Kom bi kom ji gel mirovan ji dûr ve em dişopandin. Yekser me diruşmaya 'bila gelê me were refan!' qêriya. Hinekan got divê em baş diruşmayan hilbijêrin û em hişyar kirin. Her carê dibêjin a herî baş em diruşmayên daxwazên me yên weke "em ji bona dibistanê şibake, derî û kalorîfer dixwazin. Dersên me yên vala zêde ne, em mamoste dixwazin!" Werin qêrîn. Lê paşê diruşmaya "ne Emerîka, ne Rusya, Tirkiya serbixwe!" Hat qêrîn. Ji ber her kesî ev diruşma nediqêriya, lewma ez jî qederekê dudilî mam. Min jî nedizaniya bê ka çi qas rast e, yan na. Lê dîsa jî, min ji xwe re digot ger neqîrim dê ne baş be. Min jî bê ku dudilî dijîm diruşmaya "Bimire Faşîzm!" Qêriya. Dengê min jî herî zêde di vê diruşmayê de derket pêş. Diruşmaya "em hevalên xwe dixwazin!" Jî bi ser diruşmayan ve zêde bû.

Me ev diruşme li pêş Konaxa Hukumetê diqêriya. Carê serdozger derdiket eywana li ber pacê, weke ku dixwaze navbeynkariyê bike nêzîkbûnek raber dikir. Dixwest me nerim bike û digot; "Wê hevalên we di demek herî kin de werin berdan." Lê tevî ku katjimêr derbas dibûn, kes nedihat berdan. Carekê de boykot li tevahiya Dêrsimê belav bû û her kes di

tevgerê de bû. Ji dibistana mamosteyan jî xwendekar hatibûn. Polîsan hewl dida li ser pira kolana jêr tevlîbûnan asteng bike. Yên dikariyan derbas dibûn, ên diman jî ji wir piştevaniya çalakiyê dikirin. Carekê helîkopter jî li ser serê me geriyan. Walî bi telefonê ji Fermandariya Cendirmeyan a Hozat û Pûlûmûrê Yekîne dixwestin. Digot; "zû bikin li vir îsyan heye. Kurd rabûne îsyanê." Ji ber vê hemû polîs ketin alarimê.

Vê rewşê bi malbatê û gel re guman avakiribû. Min carekê dît ku bavê min di nava komê de li tiştina digere. Ji bo serdanê destûra salê girtibû. Bes şansê wî bû, piştî ku ew hatiye heta niha bûyer rû didin. Ti demî serdaneke bi rehet derbas nekir. Niha jî li min digeriya. Taximek cil li ber xwe kiriye, simbêl xwe kur kiriye. Hema dişibiya polêsên sivîl. Yên ku nas nedikirin, jê şik dibirin. Ji ber berî meşê hinekan em hişyar kiribûn, lewra em baldar nêz dibûn. Polîsên sivîl dikariyan bikevin nava me provakasyon ava bikin û yek bi yek me bigirin. Ji ber vê yekê her kesî derdora xwe baş kontrol dikir. Dema bavê min ez dîtim, hat cem min. Hinek xwendekar jî, ji vê rewşê baş ketibûn şik û gumanan.

Jê re gotin; "birêz raweste, tu diçî ku derê?"

Bavê min jî dibêje; "ez hatim cem keça xwe. Ezê wê bibim, dayîka wê nexweşe, ji ser hiş çûye!" Lê dema nîqaşên wan hişk bûn, min destwerda. Piştî ku bavê min demekê li wir, li cem min ma, bi şermok ji min re got; "de em biçin malê! Dayîka te nexweşe. Ger tu neyê wê bimire. Biçe xwe carekê şanî bike û cardin were." Tam dema em di-axivîn cardin dengê qêrîna diruşmayan bilind bû. Vê carê jî, ji hevalên derdora xwe re got;

“Keça min, kurê min nabe, hûn xwendekarin. Li şûna wan diruşmayen, diruşmeyên ku daxwazên we rave dikin biqêrin. Da ku ev bênamûs tiştekê nekin. Binêrin ji navçeyên derdor leşker xwestine! Ew kuçik kurê kuçikan nabêjin ev ciwanin, xwendekarin û daxwazên xwe yên mafdar bilêv dikin. Ji kerema xwe hişyar bin! Ev Emerîka û Rusya ji kur derket, çi eleqeya wan bi vir ve heye? Kurê min, ji xwe re bi aqil bin!” Û hewl dida hevalan qane bike.

Dema naverast hinekê bêdeng bû, hat cem min. Hewl dida min qane bike da ku ez ji bona demek kin biçim malê û cardin vegerim. Ev israra wî ez bi hêrs kirim. Min heta wê kêliyê nêzîkbûnên wî xwezayî dîtin, kamil nêz dibûm û min hewl dida wî neşikînim. Bes dema israr kir, di nava wê qiyametê de xemgînya diya min da pêş û ji bona vê hewldana wî ya min ji hevalên min veqetîne, ez tam bi hêrs kirim. Min ne dikariya hewldana wî ya dixwest min ji qada çalakiyê derbixe razî bim. Min jê re got;

“Yabo tu çi dikî. Ez bi van hevalên xwe re di nava çalekî û boykotê de me. Me bi hev re destpê kir. Dayîk û bavê her kesî heye. Ez nikarim ji bona dayîka xwe vê qadê berdim. Ez nikarim hevalên xwe di nîvê rê de bihêlim û werim.”

Ez pir hêrs bûm. Her tişt ji min re berovajî diyar dibû. Min ne dizaniya bê ka çima ev qasî israr dike. Min ew weke kesayetek xwedî feraset û hişyar nas dikir. Ma qey nedizaniya gelekî xirab e, ez hevalên xwe berdim, biçim? Bavê min xemgîn ji cem min çû.

Rewş zêdetir tengav dibû. Li hinek cihan tevlîhevî jî hebû. Em tam li pêşiya Qonaxa Hukumetê di nava çemberekê de ne.

Rê ji her alî ve hatiye girtin. Polîs û leşker di navbera wan de yek metre ve li ser piyan, di destê wan de çek, tiliya wan li ser tetîkê rawestiyane. Carekê li ber çavê min ket ku li ber şibakeya avahiyê gengeşeyek heye. Kêliyekê walî hewl dida demanceya xwe bi şibakê re li ser kesên derve de bigire û bireşîne.

Hat gotin; "dibe ku provakasyon were kirin. Ger fîşekan bavêjin jî, divê em bi komî rawestin. Bila kesek belav nebe.!"

Ev gotin bêdeng, pêl bi pêl belav bû. Di wê navberê de hinek xwendekarên ji dibistana mamosteyan jî hatibûn tevlî me bûn. Hem bi cilên xwe û hem bi diruşmeyên xwe ve zû bal kişandin.

Ger bi şaşitî yek fîşek tenê were avêtin, wê hemû polîs û leşker her derî bireşînin. Ew qasî her kes aciz e û nêvengek provakasyonê heye. Tam di wê kêliyê de serdozger destwerdana demanceya di destê walî de kir:

"Birêz walî! Birêz walî! Ma hûn dîn bûne. Ev ne îsyankarên Kurd in. Ev zarok, xwendekar in, pirsgirêkên dibistanê rave dikin! Ger hûn bireşînin, ya rast dê wê demê îsyan destpê bike!" Bi zorê demanceya di destê wî de derxist.

Tevlîhevî ji ber wê derket. Serdozger piştî demek kin cardin vegeriya eywanê û di-axivî.

"Ciwanino! Zarokên hêja! Min guhdar bikin! Hinekê bêdeng bin! Ez we fêm dikim. Li ser şeref û namûsa xwe soz dikim ku, emê di nava yek demjimêrê de hevalên we tevan berdin. Berpirsyariyê ez digirim. Ger neyên berdan ezê dev ji karê xwe berdim! Ez di huzura her kesî de van dibêjim!"

Her kesî bi diruşmeyan bersiva wî da. Bes bê ku zêde belav bibe û were dubarekirin deng qut bûn. Dixwazin em bi aramî û bêdeng rawestin. Em hemû bêdeng dimînin. Carê şîrove jî tên kirin. Dibêjin; "serdozger jî zilamê dewletê ye. Mijûl dike, pê bawerî nabe. De ka em bi meş biçin qerekolê." Em pir vekirî diyar dikin ku, pê bawer nakin. Bêguman, di vê mijarê de tişta herî girîng xwe ji provakasyona parastin bû. Me tam çi dixwest, ger daxwazên me tam nehatiban pêkanîn, wê me çi bikira û wê me helwestek çawa raber bikira. Em di van mijaran de ne zelal bûn. Çalakî bê plan û ji nişka ve pêş ketibû. Lewma me biryara tiştekê nedabû. Di encamê de biryar hat girtin; "em demjimêrekê rawestin, ger hevalên me neyên berdan, emê bi meş biçûna heta qerekolê." Ev biryar ji her kesî re hat ragihandin.

Piştî ku demjimêrek tije bû û hevalên me nehatin berdan, em cardin ketin tevgerê. Çi bû piştî wê çêbû. Dengek xurt hat bihîstin. Me fêm nekir bê ka top bû, yan jî tiştek din bû teqiya. Ev jî bû sedem ku hêrsên her kesî biteqin. Em hemû weke lehiyekê bi diruşmeyan ve ber bi aliyê sûkê ve herikîn. Dema em ketin tevgerê, polîs û leşker jî ketin tevgerê. Pevçûnê destpê kir. Leşkeran kî didît dida ber qontaxê çekan û li wan dixist. Polîsan jî bi copên xwe êrîş dikir. Me jî kevir davêtin wan. Kolan bi kolan, koçe bi koçe pevçûn berdewam dikin. Gel eleqeya xwe bi tiştekê ne danî. Tenê ji dûr ve li bûyeran temaşe dikir. Jixwe polîs û leşkeran di navbera me û gel de dîwarek ji laşan ava kiribûn. Her çendî me ewqas diruşmeya "bila gelê me were refê" hat qêrî, ne gel hat refên me û ne jî me karî em bazdin nava gel. Carekê diruşmeya "artêş û ciwan dest bidin hev" hat qêrîn. Leşkeran ew kom jî da ber kontaxên çekan. Ez

jî qêriyam û min got; “qenc li we kirin. Hûn çima diruşmeyên bê wate diqêrin. Ev çi diruşmeya artêş û ciwan dest bidin hev e. Ma hûn nabînin artêş çi ji we dike?” Wê diruşmeyê ez zêde aciz kirim. Me ji sibehê ve diruşme diqêriya û di nava me de yên bertek jî beramber xwe kom dikirin hebûn. Bes ev diruşma ji kur derketibû. Ev diruşmeya PDA’yan bû. Ji dibistana mamosteyan hatibûn û tevlî çalakiyê bibûn.

Hem me meş û pevçûn berdewam dikir û hem me diruşma diqêriyan. Xeta meşê belav e. Serî û dawî ne diyare. Em gihan quncuka li pêşiya Kişlayê. Hinekan digot; “em biçin edliyê, yên hatine girtin birine wê derê.” Hinek jî alîgerê çûna qerekolê bûn. Pêşengiya meşê tine ye. Însiyatîf ji dest derketibû. Em hemû ji vê rewşê aciz bûn. Ne dibû ku em di nîvê cadê de jî nîqaş bikin. Ji ber ev tam li gor kêfa polîsan bû. Li derdor her kesî li me dinêriya. Şibakeyên Kişlayê tev dagirtîbûn. Zarokan diqêriyan. Diruşme nîv bi nîv diqêriyan.

Hem rewşa nediyar û hem bêhedefiya heyî her kes aciz dikir. Ya herî girîng jî, hevalên me nehatibûn berdan û hinek din nû hatibûn girtin. Boykota ku sibehê destpê kiribû, heta êvarî wisa doma bû. Herî dawî jî cihê ku em lê civiyan qet neguncav bû. Ger em di navbera kolanan de ban, me dikariya em pir hêsan belav bibin. Ger em niha cihê em lêne yekser belav bibin, wê polîs ji nişka ve pir hêsan ji xweber kom bike, agahiya kesekê ji kesî jî çênabe.

Gumana her kesî bi dengê bilind dihat bilêvkirin. Di encamê de em ketin ser rêya sûkê ya ber bi dibistanê ve diçe. Bê ku em bigihin dibistanê her kes di navbera kolan, nexweşxane û her wiha de belav bû. Gotin; “bila her kes bi lez bikeve nava koçeyan û bila hay ji xwe hebe da ku neyê girtin!”

Wê roja paştir her kes cardin bihata dibistanê. .wê her kes şiyar nêzî hatina xwe jî ba. Dibe ku polîs ketina hundurê dibistanê jî kontrol bike û dikariya dest bi girtinê bike.

Lêpirsîna yên wê rojê hatibûn binçavkirin, li Qonaxa Hikumetê hat kirin. Piraniya wan ji dibistana mamosteyan hatibûn. Ji aliyekê ve baş bû mirov xwendekarê dibistana amadeyî be. Endamên amadeyî boykot dabûn destpêkirin. Ji ber van hêcetan polîsan hêsantir êrîşî endamên dibistanên din, an jî yên ji derve de hatine dikir. Lêpirsînek bi lêdan, dûjîn û gefan hatibû meşandin. Hinek hevalên jin heman şevê hatin berdan. Lê hêjî Tirkan, Nurheyat û hinek din di bin çavan de bûn. Ew jî taktîkek bû. Yekser hinek şîroveyên cuda pêş ketibûn.

Yên wê şevê yekser hatin berdan, dibe ku li ser ên din nêrîn dabin. Dihat gotin ku gelekî xirab û kirêt nêzî yên li hundur mane bûne. Bi taybet dihat gotin ku dest avêtine jinan, bi copan tecawûz kirine. Agahiyên bi vî rengî zû belav dibûn. Piştî çar- pênc rojan her kes hat berdan.

‘Keçên yaman in!’

Her tim li ser keçên ku di roja boykot de hatine girtin û paşê berdane tê axaftin û nîqaşkirin. Derdora malbata wan ji van axaftinan aciz dibûn. Ji ber hatibû bihîstin ku polîs xirab nêzî van keçên hatine girtin bûne, malbata ne dixwest li ser vê mijarê bi-axivin. Weke mijareke namûsê lê dinêriyan. Lê bi gelemperî di nava civakê de dilsozên wan zêde bûn. Her kesî ew weke ‘Keçên Yeman’ dinirxand.

Bûyerên rojane bandor li jiyana min dikir û jiyana min diguherand. Ev guhertina bi dilê min bû, di peywendiyên min ên bi dayîk û derdora min re jî diyar dibû. Êdî her tişt bi çepgirî, şoreşgerî, komên zêde, fraksiyonên cuda yên giştî ve zêdetir zelal dibû. Nêrînên ku nêzî hev in û yên hêdî hêdî li derdora heman pênase û ramanan dicivin zelal dibin û derdikevin holê. Her wiha diruşma jî diguherîn. Nêzîkbûnên ji bûyeran re diguherîn. Dibe ku her tişt tam ne zelal bû, lê êdî her çalakî û pênaseyên teorîk û helwestên pratîkî her tişt ji hev cihe dikir.

Wateya dibistan û dersan kêm dibû. Her çendî ne bi plankirî be, dibistan tenê weke amûrekî dihat bikaranîn. Tenê derbaskirina dersan û nemana polê de esas dihat girtin. Ji bilî vê bi reêk û pêk ketina dersan, di çarçoveya dersan de nîqaşkirin û hînbûnê zêdetir, armanc pêşketinên heyî derbasî polan kirin û nîqaş dana pêş bû. Êdî me dikariya em hêsantir di dersên mamosteyên şoreşger an jî pêşveçûyî de nîqaş bikin. Lê me di dersên mamosteyên faşîst de jî wisa dikir, ku ew ders neyên guhdarkirin. Ne dixwestin nîqaş bikin. Lê ne dikariyan ders jî bidin. Endamên polê li gorî her dersê dihat guhertin. Lê mîsoger di dersa dawî de me fîş weke ku her kes amade ye dida îmzekirin. Jixwe ne girîng bû bê ka her kes amade ye an na. Dê yên ne hatîn jî, weke amade ne bidan diyarkirin! Bes di vê navberê de yên zêde kêfî jî nêz dibûn hebûn. Lê belê, dê wextên ne ketiban dersan de, xizmeta ji şoreşgeriyê re esas bihata girtin. Ango dê dibistan li pêşiya karên din û jiyanê neba asteng. Berovajî vê divê biketa xizmeta wan de. Hêjî her kes tam ne di zanebûna vê de bû. Bi giranî jî nêzîkbûnên ji rêzê û ji xweber hebûn. Dema hinek malbatan ev rastî didît, bertekên

wan zêde dibûn. Lewm hewce bû ku em baldar nêz bibin. Hem nêzîkbûnên zêde ne di cihde dikariya encamên neyênî jî ava bikin. Her ku wext derbas dibû, dibistan dibû zemînê hevdîtina tiştên din.

Lewma ji bona mirov bizanibe pêşketinan rast fêm bike û refek rast hilbijêre, divê mirov baş hîn bibe. Gelek tişt di bin gelek nav û pênaseyan de dihat kirin. Ev jî bi navê şoreşgeriyê bûn. Lê ji lêgerînên min re nedibûn bersiv. Yên weke min zêde bûn. Şoreşgerî ne karê xatiran bû. Yên nas dikirin bi taybet mijûl dibûn û dixwestin min qezenc bikin. Rojname, kovar, an jî daxwiyaniyên ku siyaseta wan şîrove dike didan min û heqê wê yê alîkariyê dixwest. Di roja destpêkê de kêfa min ji diruşma, helwest û nêzîkbûnên PDA re nehat. Bala min nekişand. Lê tevî vê min heqê alîkariyê dida wan jî. Min rojnameyên wan digirt. Min ji kî rojname, kovar û daxwiyanî bigirta, ez ji xwe didîtim! Di pêvajoya destpêkê de nêzîkbûnên wisa zêde bûn. Armanc jî her kesê ku hatiye qezenckirin li ser xwe binivisînin, bikin malê xwe û xwe bi hinekan bidin qebûlkirin bû. Ev nêzîkbûn min dûrî wan dixist. Yekser hema dixwestin desteser bikin.

Li malê xwendina pirtûkan ji destpêkê ve karê herî xeter û gelek caran dibû mijara nîqaşan. Bala diya min jî kişandibû ku şêwaza min a xebata dersan hatiye guhertin. Bertek çawa li dijî pirtûkan pêş ketibû? Ew bi xwe jî gelekî hişyar bû. Didît ku em li hember pêşketinan gelekî vekirîne. Xeyalên min ên keçiniya ciwan hejiyabûn. Roj bi roj xwestek û daxwaz dihatin guhertin. Hevalên min jî diguherîn. Mêvanperî û rojên çayê tev hêcet bûn. Êdî armancê mey ê hatine cem hev hatibû guhertin. Êdî li şûna pêxistina teyban, reksan, axaftinên li ser cil bûr, cihazan,

nêzîkbûnên erzan, me lêgerîn zînde dihişt, hewl dida pêşketinên siyasî fêm bikin û me di sohbetan de çîrokên şoreşgerên leheng ên navê wan derketine nîqaş dikir. Ev jî rewşek erênî bû. Ev peywendiyên beriya niha teng dima, bi hevaltiya kolan û dibistanê ve sînordar dime, zêdetir berfireh dibûn. Di vê demê de derfetê hevdîtinê bi kesên ku li dibistana mamosteyan an jî dibistana Hunerê ya Keçan dixwendin re jî çêdibûn. Heman hest û raman em tanîn cem hev. Dayîka min jî ecêbmayî ez dişopandim. Di astek wisa de dişopand, pir baş didît ku pîvanên mêvanperweriya kevin li kuderê maye û bi kîjan nêzîkbûnan ve xirab bûye fêm dikir. Di van deman de taybetmendiya herî berbiçav jî keçên ciwan zû dest bi cixareyê dikirin. Ev jî weke azadiyê dihesibandin. Weke dema ku cixare dikişandin, azad dibûn. Di heman demê de ev di nava her kesî de pêk anîn, pîvanek azadiyê bû. Lê min ti caran ev rêbaz ji xwe re qebûl nekir.

Dayîka min hema weke siya min bû. Her tim ez dişopandim. Hewl dida fêm bike, bê ka ez çi dikim. Dema piştî hevdîtina me ya keçan ez vedigerîm malê, min ne dikariya helwestên wê qebûl bikim. Ez bihên dikirim, bê ka min cixare kêşaye an na. Dîsa neqşên min kontrol dikir, bê ka min çi qas çêkirine. Ji ber şik jî dibir, carê ji dizî ve cihek neqşê îşaret dikir, ka ez neqiş an jî dantêlê çêdikim an na. Belê ez van rastiyan di kêliya nîqaşên me de hîn dibûm. Ew li xwe mikur dihat. Bes min bê destûra wê tiştek jî nedikir. Ne diçûm cihekê. Derew nedikir. Bes di peywendiyên nû de ne baş bû ku ez her tiştî zêde vekirî jê re bêjim. Ger ferasetek rast nêzî min biba, dê min her tişt ji wê re bigota û paşê bikira. Lê fêm nedikir. Lewma min her tişt jê re nedigot. Bes ji ber hisên wê pir

xurtbûn, fêm dikir û texmîn dikir. Kar û barê wê şopandin, venêrîn û astengkirina min bû. Kekê min ê mezin ne li malê bû. Gelek caran li metrepolan bû. Lewma ez ya malê ya mezin bûm û her wiha keç bûm. Her çendî li naverastê karek li gorî vê nebe jî, ji ber ez bi israr û înad bûm, min weke meylekê şoreşgerî hilbijartibû û lêgerîna vê her roj zêdetir pêşxistin, bi wê re guman dida avakirin. Li ser ên ji min biçûktir jî dihizirî. Ji ber hemû ji min bandor dibûn.

Pirtûka yekem a min xwendî pirtûka Julius Fucik a bi navê ‘Notên Ji Sêdarê” bû. Paşê min pirtûka Gorkî ya bi navê ‘Dayîk’ xwend. Her du pirtûkan jî bandor li min kir. Ev pirtûk li ser destan digeriyan. Kî dixwend, dixwest beşên ku jê bandor bûne nîqaş bikin. Wisa weke ku me gelek cara dixwend. Her wiha me dipîva bê ka me çi qasî ji pirtûkê fêm kiriye û em çi qasî rast têgihiştine. Li kolana me hevalên min ên weke Perîhan, Cemîle, Nîmet û Fethiye tev pirtûkên naveroka wan wisa dixwendin. Her ku diçû xwendin li kolana me berfireh dibû. Zû dihat bihîstin bê ka li cem kî kîjan pirtûk hene. Gelekan pirtûk li mala xwe kom dikirin. Ez û Tirkan Çakmak hevalê hev ê dibistanê bûn. Wê paşê dibistana mamosteyan berdewam kir. Ya ku herî zêde rehet digeriya û ti astengî li pêş tine, ew tenê bû. Lewma dikariya biçe her derî û bikeve her derê.

Elî Aydin mamosteyê me yê dersa bedenê bû. Li Dêrsimê xwendibû. Piştî ku dibistana amadeyî diqedîne, diçe zanîngehê. Vê carê jî mamoste vegeriyabû heman dibistanê. Lewma dihat hezkirin. Mamostetiya wî jî weke xizmetek ji cihê lê ji dayîk bûye û derdora cihê wî re dihat fêmkirin. Her wiha baldariya wî li hember beşên werzîşê yên weke qerete, tekvando, cîrît,

xwe avêtinê hebû. Ji bona şoreşger bikaribin xwe biparêzên divê ji hêla fîzîkî ve jî jêhatî bin. Dizaniya ku faşîst girîngiyê didin qarete. Wê demê çima ev derfeta li dibistana amadeyî ya Tuncelî ne hatiba bikaranîn? Beriya niha li hember qerete û tegvandoya ku digotin 'karê faşîstane' baldarî pêş ketibû û nêrîna din hatibû şikandin. Her wiha mamosteyê wan jî şoreşger bû û ji Dêrsimê bû. Lewma balkêştir bû. Weke din jî qursên sazê hatibûn vekirin. Keç û xortên ku diçûn qursê zêde bûn. Karek wisa ji bona hatina cem hev weke firsendekê dihat nirxandin. Her çendî hinekê ji xweber pêş ket, ji ber bertekên malbatan li djî xebatên wisa tine bûn û xeter ne dihat dîtin, çûna li van navendan jî zêde dibû. Hemû malbatan jî di heman mijarî de zarokên xwe hişyar dikirin. Digotin, nebin şoreşger, bi polîtîkayê ve mijûl nebin. Ev felaketin. Ev tirs û gumana hemûyan a hevbeş bû.

Ez dilsozê Ecewît im. Lê ev jî bi helwesta Ecewît a di mîtîngê de raber kirî re hat guhertin. Ecewît pir baş kiribû! Belê, diruşmaya 'Azadiya Gelan' pêl rayê wî yê Kemalîst kiribû. Ecewît carekê de got; " pir netew ne, yek netew heye. Ev qevdek dijminê gel in. Provakator in. Li Kovanci MHP'yan ez dam ber keviran. Li vir jî van dijminên gel wisa kirin. Ew ne zarokên we ne. Wan baş nas bikin! Wan di nava xwe de ne hewînin" û gel berda hev, naverast sor kir û bi rastî jî Ecewît her der proveke kir. Çi qas baş kiribû!

Jixwe min jî di wê mîtîngê de helwestên dilsoziya bi Ecewît re rabar nekir. Min li ser dîwaran nivîs jî ne nivîsandin. Lê ez bi gomlekê şînê Ecewîtî li ber xwe kiribû û min bi şêwazê ku bikaribim wî bibînim ref girtibû. Ez hêjî dilsozê Ecewît bûm. Lê ev Ecewîtperestiya min bi şoreşgeriya min a

gişti re ne diket nakokiyê. Lê nizanim çi bû, bes dizanim her tişt wê rojê pêk hat. Wê rohê Ecewîtperestiya min jî qediya. Gotina; "Gelan tine ye, gel heye" di carekê de Ecewît di çavên min û yên weke min çavê gelek mirovan de qedand. Di heman demê de vê gotinê çavên me hemûyan jî ji nû ve vekir. Ya rastî me wê demê fêm kir ti ferqa çepgiriya Ecewît ji ya rastgeran tine ye. Ecewît versiyonek pergalê yê cuda bû. Her wiha nûnerê Kemalîzmê yê rasteqîn bû. Parazvan û nobedarê wî bû.

Rojek xweş û tav bû. Li pêşiya şaredarî bi qasî derzî nekeve erdê tije dibû, her kes dihat. Dema Ecewît dest bi axaftinê kir; komek pankart û dowîzên nivîsandî yên cuda vekirin û diruşmaya "Azadiya Gelan!" Diqêriyan. Gelan çi bû! Ma gelan çima ev qasî Qereoxlan bi hêrs kiribû? Heta wê kêliyê jî Qereoxlan ew qasî kêrêt nebû? Berê tîkên wî jî ji me re xweşik bûn. Lê niha hemû rûyê wû j ime re biyanî bû û ji mirovatiyê dûr dihat. Min her tiştê wî wê rojê ferq kir. Di wê kêliyê de her tiştê wî yê berê xweşik bû, berovajî qulipî bû. Kesekê tiştek din negot.

Wê rojê xwedayên din ji dayîk nebûn. Qereoxlan di mejiyan de xweda û rizgarvan bû. Ew jî ji nişkê ve rûxiyabû. Weke kevirê mîhenk yê her tiştî peyva 'Gelan' bû. Gotina "gelan tine ne, tenê gel heye. Tenê gelê Tirk heye." Pir vekirî bangawaziyek nijatperestiyê bû. Di heman demê de înkara Kurdan û gelên din bû! Wê demê ew gelê ku li wir civiyabû, bi sala ne ji wî re digot 'Qereoxlan' û diqêriya kî bûn. Ew gel kî bû? Ma Tirk bûn? Na. Belê ew maskeya li rûyê Qereoxlan dket erdê, nijatperestek ku xwe çepgir bi nav dikir derket holê. Êdî ti wateya xwe tine bû ku gotinan ji MHP'ê re bêje, an jî Tûrkêşan xirab bide nîşan. Bi salan ev şer û pevçûnên berdana

hev ji bona em li hember rastiya xwe biyanî bin pêk anîn. Her kesî dizaniya ku yên diruşmaya diqçrin ne dijminê gel in. Lawên wan bûn. Hemû jî nas bûn.

Polîsan fermana Ecewît girtibû û êrîş kir. Bi darê pankarta li her kesî didan. Rewşek wisa derket holê yên hatin provakasyonan jî bi daran li lawên xwe didan. Yên êrîş dibirin ser wan ‘ne gurên Tûrkeş bûn”, zarokên wan bi xwe bûn. Li gorî wan pankart her tişt xirab dikir. Diviyabû ew bihatan daxistin, ji ber ên tevlîhevî derdixist ew dowîzên nivîsandî bûn. Li gorî wan hewce ne dikir li dijî dewletê gavên zêde bihata avêtin.

Êdî tehemûla min ji wêneyê ecewît re jî nemabû

Wê mîtîngê bi min re veguhertinek ava kir. Min weke karê yekem wêneyê Ecewît ê li mala me çerçeve kiribû daxist û li erdê da. Dayîka min qîrek da û got; “ma tu dîn bûyî?” Belê ez dîn dibûm. Heta wê rojê ez weke dînan bi Ecewît ve hatibûm girêdan. Wê rojê fermana lêdana ciwan û şoreşgerên min nas dikir dabû. Bi taybet ji bona diruşmaya ‘Azadiya Gelan’ qêriyabûn! Bi şikandina wêneyê wî re, ketibûm rêyek nû. Ev di jiyana min de destpêkek nû bû. Her çendî j xweber jî be, şert û mêrcên wê dabûn avakirin hebûn û ev hemû ez bi rastiya min a cewherî ve anîbûm beramber hev û xelekek cirîng ava kiribû. Her pirsa di serê min de ez ber bi lêgerînek nû ve dibirim.

Çewsandina li malê ev zêdetir ferz dikir. Otorîte, ango dayîka min a li malê, an go jina li malê li hember nûbûnan gelekî girtîbû. Quralên wê hebûn. Ew ferz dikir. Dixwest zarokên wê yên bê îrade hebin. Keçek ciwan a bêdeng ji gotina

diya xwe dernakeve dixwest. Çarenûsek keçek ciwan a diçe dibistana xwe û tê, endama zewacê ye, cîhana wê keçê dişibe ya wê, ava dikir. Lê belê divê ev dayîk, ev jin, di nava pîvanên civakê de jî nêzî zaroka xwe ya keç be û hewl bide wê fêm bike. Lê na, ne bi hedar bû, ne dixwest fêm bike û ditirsiya! Tirsa wê jî redkirina sazûmaniya wê bû. Ji ber xeyalên wê yên cuda hebûn. Ger min ew xeyal vala derxistan dê çi ba! Gelek caran çûn û hatina min a li dibistanê jî di bin kontrola wê de bû. Rojekê ez bê destûr çûm mala xaltîka xwe ya li kolana nêzî dibistanê bû. Bes bi rojan li ser vê axivî û dilê min hişt. Ya rastî rewşa pêş diket ferq dikir. Ji meylên min dizaniya ku ez bi tiştên xeter ve mijûl dibim. Di vê mijarê de ne dixapiya.

Birayên min ên biçûk piranî erênî nêz dibûn. Lê birayê min ê biçûk Elî nerim bû û bi dayîka min ve girêdayî bû. Dayîka min jî ji vê rewşa wî feyde digirt û tembîh dikir. Dem bi dem jî dida pey min. Dixwest kontrol bike bê ka ez diçim kur û têm. Ji ber ger zelal bikira ez diçim kuderê, dê zêdetir bi ser min de bihata. Ji ber ez jî bi van dihesiyam, hişyar tevdigerîm. Lê carina jî min her tişt dida ber çavan. Em li dijî hev şerek dijwar dimeşînin. Ne ew tawîz dide, ne jî ez! Hewl dide min bi tiştê madî ve bikişîne. Vê bi zanebûn diceribîne. Cilên baş û xweşik li ber xwe kirinê, weke hunerekê dihesibîne. Cilên nû mode derketine sûkê weke amûrên min ji tiştên din dûr bixe didît. Ger çavlêkirin û daxwazên min li gorî dilê wê bin, dê hinekê bihedire û bi hêvî be. Lê ez hêjî di cîhana wê de bûm.

Helwest û lêgerînên min hêjî ji rêzê û bê zanebûnin. Êdî ez ber bi zemînê ku min dikişînê ve diçim. Ti tiştek dixwaze bibe asteng nikare min rawestîne. Bes di wê kêliyê de dayîka kin ji polîs û leşkerên dewletê bandortire. Li malê weke saziyek

birêxistinkirî ye. Hêmanên pêhesînê yên laşê wê tev ji bona min hişyar kar dikin. Wê digot bila em têkil siyasetê nebin, em çi dikin bila bikin! Lê di holê de tiştek jî nebû. Em ji bilî xwendina yek du pirtûkan, tevlîbûn, an jî şopandina hinek nîqaşan tiştek din nakin. Ma çi hewce bû ji rewşek evqas ji rêzê bitarsa? Na. Diyar bû ku wê ev qas jî ji rêzê û erzan ne digirt dest. Jîr bû û hisên wê xurt bûn. Em dinasiyan û kêm mabû min winda bike. Lewra hewl dida min rizgar bike. Li gorî wê ger min ji serê tiştekê ve bigirta û bi wê ve bihatam girêdan, êdî nedikariya min jê dûr bixe. Ji ber ne dergistîbûn, ne zewac û ne jî dibistan yek ji wan jî ne asteng bûn. Tişta balkêş jî di rastiyê ev hemû wê hînî min dikir. Şerê bi min re dikir, bi min re şerkerî pêş dixist.

Min têkoşîna xwe bi jinekê, bi dayîkekê re dimeşand. Ango hem cinsê min bû û hem jinek herî nêzî min bû. Lê tevî van jî min ti caran negot; "xweziya ez ne keç bam." Her cara wê digot; "xweziya tu ne keç ba", min zêdetir ji jinbûnê hez dikir. Şêwaza şerê wê, ez ber bi şerek hê ez jê re ne amade ve dehf dida. Ew ne di ferqa vê de bû, an jî ne dizaniya ku dê encam çibe.

Weke ku bavê min haya xwe ji van pevçûnên me yên kûr dibûn hebû. Ma kî dizane dibe ku wî jî bizanebûn kiribe. An jî şansek bû. Bavê min wê salê jî biryar dabû ku dayîka min jî bibe Almanya. Dema dayîka min diçe, li Enqereyê Metîn jî dibîne. Ez nizanim çi dike, wî tembîh dike, diçewsîne, an jî gef lê dixwe nizanim, bes ji aliyê xwe ve wî bi ewle dike, eniya wî asê dike! Dibêje; "lawê min em di vê pêvajoyê de ne li mal in. Tu di vê demê de neçe Dêrsimê, soz paşê emê bi hev re di vegerê de biçin." Hukmê li her kesî dike. Ji ber dixwaze hukum

bike. Çi qas jinek ecêb e! Ma kî dizane, di be ku dihizire ez bandor li Metîn jî bikim û tevlî siyasetê bikim. Nexwe parastina namûsê ne wisa bû. Em dergistî bûn, dayîk û bavê wî hebû û malbata wî li Dêrsimê bû. Pir vekirî dor (ambargo)li me girtibû.

Metîn kesayetek bi qural û kevneşopiyan ve girêdayî bû. Her çendî ne li kêfa wî bû, gotinên diya min esas digirt. Bi rastî jî wê salê di bêhnvedanê de jî Metîn nehat Dêrsimê. Lê di vê pêvajoya navberê de gelek tişt çêbûn. Êdî tiştên ku ji min re dinivîsand, biyanî bûn. Weke din jî her çendî di wateya çors jî be, min şoreşgerî hilbijartibû. Ji ber ez di nava lêgerînên bi vî rengî de bûm, asta têkîliya heyî dernediket pêş. Bes ev rastî ji xweber pêş diket.

Ez di nameyên xwe de diyar dikim ku ez hatime guhertin û ne Sakîneya berê me. Lê bi rastî jî tişta hatî guhertin çibû û ez li çi digeriyam. An jî min dixwest çi bidim diyarkirin. Ev jî qet ne zelal bû. Weke ku gelek tiştan hîn bûme, min serî li her tiştî radikir. Pir lez dikir. Bê ku bertekên xwe li ser zemînên rast bidim avakirin, ez bi hestên xwe tevdigeriyam. Metîn zêdetir hedar û kamil nêz dibû. Hewl dida fêm bike û di nameyên xwe de jî hinekê nesîhat didan. Digot ku divê ez hevalên xwe baş hilbijêrim. Zêde serê xwe bi hinek kesan ne êşînim. Bi taybet jî navê hinek hevalên min ên keç dida û wisa hişyar dikir. Dihizirî ku ewê peywendiyên me xirab bikin. Bes kêfa min nebû ku aqil bide min û derbarê hevalên min de tiştên wisa bêje. Ez aciz dibûm ku hinek ji xwe bawer dikin û min bandor bikin. Min diyar kir ku ez ne zarok im. Ya rastî ez bandor dibûm. Di heman demê de tiştên ku derbarê wan keçan de digot jî rast bûn. Diviyabû ez vê rastiyê bipejirînim. Ya ne rast

redkirina vê bû. Ji min re weke rêbazê dayîka min a her tim ez bi hinek kesên din re tanîm berhev bû. Aliyê ku ez aciz dikirim jî ev bû.

Ji ber vê li şûna ku nakokiyan bi şêwazek rast çareser bikim, min bi nêzîkbûnên xwe zêdetir kûr dikir. Weke ku min nameya Metîn a hişyarî dikir û behsa hinek keçan tê de dikir ji Nîmet re xwend. Ango tiştên ku Metîn nivsandinbûn, min ji wê re xwend. Pir zelal bû, ez di vê mijarê de zêde erzan nêz dibûm. Dibe ku hevalbendiya me girîng bû û hezkirin û rêzdariya me jî li hember hev hebe. Lê hewce nedikir ku ez her tiştî jê re vebêjim û parve bikim. Ji ber Nîmet ew name li gorî xwe bikar anî. Nakokiyên ji dûrve di navbera têkîliyên min û Metîn de derketin holê, zêdetir kûr kir.

Hêjî em di serdema xwe ya ciwantiyek delodîn de bûn. Lewma li şûna ku hîn bibin bi yên kevin re şer bikin, amûrên wê bikar bînin, me ji çep û rastê xwe re bertek raber dikir, nêzîkbûnek her tişt qut dikir û îsyankariyek şaş derdixist holê. Di şerê min ên bi dayîka min re jî bandorê van hebûn. Şerê min ê bi wê re neçarî û hewce bû. Gelek tişt jî bi min dida hînkirin. Bi lez ez ber bi şoreşgeriyê ve dehif dabûm. Hezkirina jin û jinbûnê hînî min kir. Her çendî şoreşgeriya cinsê xwe xwestin, kêfxweşiya wê û bertekên şahnaziya wê b imin re kêm jî bûn, di kesayeta min re pêş ketibûn. Tişta herî zêde bandor li min dikir, jina şoreşger bû. Ez her tim li dijî jina ku ji cinsê xwe hez nedikir û neheqî li cindê xwe dikir derketim, hêrs bûm û helwest raber kir. Lewma keçên weke Aysel Doxanan, Saîme Aşkinan, Tirkan Çakmakan, Nurheyatan û her wiha weke wan ên li dibistana mamosteyan dixwendin, ku ji şoreşgerî bandor dibûn, ji komên cur be cur bandor dibûn, bala min jî dikişandin.

Malbata min hê destpêkê qet ji Qiymetê hez nekirin. Ew jî mamoste bû. Keçên ku xwediyê pîşeyên wisa di nava gel de "keça bi xêr" dihat pênasekirin. Her wisa bi siyasetê re jî mijûl dibû. Lê dîsa jî dayîka min ew hem ji hêla nêzîkbûn û hem ji hêla fîzîk ve helwestên wê yên zilamtî ne ecivandibû. Weke din jî ji bona zêde serbest bû, kêfa dayîka min jê re ne dihat. Lê zêdetir ji ber siyasetê ve mijûl dibû kêfa dayîka min jê re ne hatibû. Van pîvanên dayîka min bandor li min ne dikir. Her çendî nêzîkbûnên Qiymetê ji bona min balkêş bûn, ji ber siyasetmedar bû bala min dikişand. Ya rastî bi şoşergeriyê ve mijûl dibû û li hember şoreşgeriyê baldar ba, min dixwest wan nas bikim, ev jî dihişt ez zû tevlî wê derdorê bibim. Ji ber hevalbendiyên hetî teşe diguhertin. Pîvanên hevalbendî yên li kolanê dihatin guhertin. Peywendî û pîvanên ku zêdetir bi nêrînek siyasî hatine sazkirin derdiket pêş. Her çendî ne diyarker bin, hinek peywendiyên nû şîn dibûn û dijiyan. Lê yên herî zêde bal dikişand, ên herî zêde bandor dikir, tam li kêleka serê me bûn. Lewma bê ku wext ser ve biçe me xwe jî di nava vê başkêşiya bedew de dît. Me dilê xwe jî ber bi herîkîna wê ve berda.

Heta ku cih hebû, çima kadîn dihat hilbijartin?

Bi gelemperî dihat texmînkirin ku kî endamê kîjan komê ye û dilxwazê kîjan xetê ye. Ji axaftina kesan heta meşa wan, ji gotinên bikar tanîn heta diruşmayên diqêriyan, her nêzîkbûnek meylek û xisleta çînekê rave dikir. Dibe ku me ne dikariya em van tevan tam zelalî pênase bikin. Bes nêrînên teorîk û bîrdozî di jiyanê kesan de diyar dibû. Lewma ne zehmet bû ku mirov hinek xisletên hevbeş bibîne. Mînak yên TÎKKO ji hev re

digotin kirîb û xwîşkê. Tenê seresere bûn. Çakêtên wan ên leşkerî, potîn, por û sihên wan tev dişiban hev. Bi qirêj û gemariya xwe pesin didan. Li şûna ku jiyanê nû û bedew bikin, bedewî û kûraniya giyan a dikare her zehmetî berçav bigire ava bikin, çandek ku ji wan hez dike, bêşaretiyê di-ecibîne û di nava wan de dixeniqe hebû. Baş bû ku lê hember pergalê û derfetên madî yên dihat dayîn bi bertek bûn. Di cewhera hinek nêzîkbûnan de ev hebû.

Bertekên destpêkê bûn. Lewma mirov dikare hinek tiştên seresere asayî bibîne. Lê ne baş bû ku ew bibin şêwe û rêgezên jiyanekê. Ji ber baldarî ava nedikir. Mirov dûr ji xwe dûr dixist. Şoreşgerî şaş dida fêmkirin û hînkirin. Gelek caran dema lawê apê min Îbo dihat mala me dayîka min li hember vî aliyên wî bertek raber dikir. Lawek ciwan û cindî bû. Lê ser û cilê wî di nava qirêjê de bû. Her tim bêhna xwêdanê jê dihat. Ne ku derfetên wan tinebû. Ev nêzîkbûnek bû. Bi hinek tiştên ku ji Mao jiber kirine, dixwestin bi van nêzîkbûnan ve jiyana xwe mafdar bidan qebûlkirin. Lê belê, li hember her şert û mercî li ber xwe dan û zehmetî derbaskirin cuda bû. Mao jî wisa li gorî xwe, teng, seresere şîrovekirin û danasîn jî cuda bû. Mirov digot, bes e êdî hûn çawa Maoparêziyê dikin amûrê kêm û kurtiyên xwe.

Ya herî girînng çavdêriya gel bû. Ji ber bal dida her tiştî. Hemû bala wan li ser ciwanan bû. Ji ber hinekan li gorî fêmkirina xwe jîndar dikir, gelek serî û xirabûn jî rû didan. Yên weke me di nava lêgerînê de jî, hinekê ev alî dişopandin. Tişta yekem berçav diket gotin û nêzîkbûnên dihat kirin bûn. Ji ber yekbûna gotin û nêzîkbûnan di pêwendiyan de jî diyar dibû. Diyarker bû. Carina yek gotin, gelek wate rave dikir. Lê di

wateya gişti de şoreşgerî: bi têgehên wêrekî, fedekarî, pêşveçûyî, zehmetiyan nasnake, li hember wan nakeve û hw ve dagirtî bû. Şoreşgerî berdêla wê çi dibe bila bibe, li dijî her neheqiyê disekinî, ev jî rêgeza bingehîn bû. Di vê demê de diyardeya k udi afirîneriyê de dihat ravekirin ên weke ked, jêhatîbûn û kêrhatî, di kesayet de rast diyarkirin û pênasekirn gelekî girîng bû. Ji ber destpêkê tu çawa hatibe nasîn, te bandorek çawa ava kiribe, demek dirêj jî ya te dida diyarkirin ew rastî bûn. Ji ber ji bilî vê ti jiyanek zelal û berbiçav tinebû. Her kesî hinek teorî û rastiyên giştî şîrove dikir. Lê her kesî carekê de pê bawer ne dikir, pê ve ne dihat girêdan û xwedî lêdernediket ne digot 'ev ya min e', ev rih bi her kesî re diyar nedibû.

Tişta ku bi gelekan re dihat jiyîn coş û kelecana ciwantî bû. Kêm mirov, xwedî zanebûnek kûr bûn. Hê pîvanên sosyalîstî û şoreşgerî ne hatibûn rûniştandin. Hinekan bertek raber dikir, li hinek cihan agir pê ketibû. Daxwaz û fedekariyên ji vê hêlê ve gerim û zindî bûn. Mercên jiyanê zehmet bûn, ev jî qanunek diyalektîkê bû. Neçar bû ku pêşketin û guhertinek çêba. Lê dîsa jî gelek tişt parçe parçe, belav, bê îstîkrar û giştî dima. Şoreşgerî û siyasetmedariya heyî di cewher de ne dihat dawerivandin. Serî heta binî em ne dihejandin. An jî aliyên ku bandor li mirov dikir baş dernediket holê. Hêjî lêgerîn û bendewariyek heye.

Ez hêjî tevî çewsandin û qedexeyên dayîka xwe ji wê mala me ya kolana Dax hez dikim. Min li wê malê hemû bedewiyên ku her serdemê jiyane, zindî jiya, bibîr anî û qet jibîr nekir. Bîranînên herî biçûk û ji rêzê kêfxweşiyê dide min. Min gelek tişt têkilhev jiya. Ez nikarim yekê ji ya din veqetînim. Her tişta

ku naskirina jiyanê, çewsîneriya kevneşopiyan û îsyana li dijî wan tev. Ji aliyekê ve bi pîvanê jiyana heyî ve girêdanek û têrbûnek heye, ji aliyê din ve lêgerînên nû, daxwaza bedewî, kêfxweşî, bêrîkirinên wê yên li nava salan dirêj dibin, xwe gihadina wan û di nava wan de mezinbûnê pêş dikeve. Dema ez niha cardin paşerojê vedigerim û bibîr tînim ez 'AXÎNEK!' mezin dikişînim.

Min di wê pêvajoyê de gelek pirtûk dixwend. Xwendin û hînbûn keyf dida min. Li hember dersan azweriyek min tine bû. Ji ber wê pergala dibistanan a bi rêbazê jiberkirinê dihat rêvebirin, ez tengav dibûm. Lê min xwendina pirtûkên têkildarî pirsgirêkên civakî, bîrdozî, polîtîk û wêjeyî de hez dikir. Ji bona min tişta herî zehmet, li dibistanê derketina ser texte û vegotina desrê bû. Lê ez di nîqaşek xweber de gelekî rehet bûm. Min di wan deman de nêrînên xwe baştir rave dikir. Min jî di romanên ku xwendine de mijarên bandor li min dikir vedigot. Lê bandora hestewarî zêdetir bû. Dîsa jî min hinek mijarên girîng ên esasî digirt. Carina jî li şûna mijara esasî bi ziraviyekê ve asê dimam. Min bi wê diyardeya biçûk ve, bûyer digirta dest û şîrove dikir.

Em şeş kes li malê mabûn. Hemû ji min biçûktir bûn. Êdî berpirsyariya malê ya min bû. Piştî ku dayîka min çûbû, jiyana me jî cuda bû. Me hemû karên jiyanê yên pratîkî bi hev re dikir. Kî li malê ba, wî/wê karê malê dikir. Ji bona di çêkirina xwarinê de pirsgirêk rû nede, me rêbazê çêkirina xwarinan dinivîsand û dîwarê xwaringehê ve dikir. Pirsgirêka xwerinê jî wisa çareser dibû. Min ji birayê xwe yê biçûk Metîn re digot Meto. Wî j imin xweştir xwarin çêdikir. Bes zêde jî diwestiya.

Wê salê nexweşiyek gurûbûnê ya giran belav bû. Nizanim gelo ji ber li ava Munzurê melevanî dihat kirin, an jî ji hewayê hatibû ne diyar bû. Her ji kur hatibe li malê jî ji bilî min her kes gurî bû. Nexweşiyek pir xirab bû. Ji ber xwurê dest û mil di nava birînan de mabûn. Birînên bi elem çêdibûn. Pêwîst bû her yek ji wan cuda bişû, cuda bidî razandin, cilên wan cuda bişû, her roj bikelînî û her 24 demjimêran carekê serê wan bişû. Were vê carê karê malê, dibistanê ne bes bû û pênc biçûkan jî binêre! Ya herî zehmet dermanê wan bû. Zêdahiya pereyan bi dermana diçû. Ji bo pêçanê paç û pembû têrê nedikir. Dema min paçê cihê wan dikeland, baş dişûşt û derman dikir, min ew weke paçê li birîna pêçanê bikar tanî. Ji ber ez tim di nava dermanan de bûm, girûbûn li min neket. Ev nexweşî heta mehekê berdewam kir. Ji aliyê derûnî ve bandorek giran li ser xwîş û birayên min kir. Hemû jî kêm kiribûn. Ez jî ji ber vê xembar dibûm. Dayîk û bav tinebûn. Rewşa xwîşk û birayê min ne radeyek erênî de bû. Dê wisa bihizîrîn ku min ew baş xwedî nekirine. Cîranên nêzî me rewşa heyî dizaniyan. Ji ber halê me û min xemgîn dibûn. Dixwestin alîkariyê bikin.

Jixwe lêgerîna min a di şoreşgeriyê de ez hestiyar kiribûm. Êş, dert û kulên şoreşgeriyê hevbeş parvekirin, ew derbaskirin bû. Her wiha tevlîheviya li malê û berpirsyariya wê hebû. Ev rastî ji aliyekê ve ez diwestandim, lê ji aliyê din ve bi hêz dikir. Her çendî hêza min derbas jî dikir, min xwe neçar didît u divê pêk bînim. Di heman demê de rewşa heyî bi min re hestê berpirsyariyî pêş dixist.

Li kêleka van tevan mijara dergistî hebû. Hem apê Xidir û dayîka Tonton ne dixwestin ez têkil şoreşgeriyê bibim û hevalên min zêde bibin, ji v aciz dibûn, hem ne dixwestin hemû karê malê ez bikim û bin de biperçiqim. Li ber min

diketan. Dayîk û bavê min tewanbar dikirin. Lewma carina dayîka Tonton li bendê dima heta ez ji dibistanê vedigeriyam, dema ez dihatim xwarina çêkiriye j ime re tanî. Ji vî alîve weke jinek extiyar hizir û xizmeta wê bandor li min dikir, hestewar dibûm. Zêdetir jî beramber mehcup dibûm. Lê her roj kontrola wan êdetir dibû. Her rim tenêbûna me û tenêbûna xwe bi me re derbas dikirin, da ku em bi tenê nemînin.

Her çendî yekser dest wernedidan û bi sînor ne dikirin, dîsa jî ez di vê mijarê de firsendê nadim wan. Dizaniyan ku ger zêde li jiyana min dest werdin, dê bertekên min çibin. Dema dayîka min amade ba, ji hev cesaret digirtin û hinek tişt digotin. Lê êdî cesareta wê jî nemabû. Bes li dor diziviriîn, bikaranîna navê Metîn re rexne li min dikirin. Dêrsim cihek biçûk bû. Polîsan pir hêsan her kes dişopand. Dema carê bi nerim û carê hişt digotin divê mirov tiştên ku balê dikişîne neke, ji xweber bi her kesî re hevalbendiyê neke, xeteriyên vê hene, dibû sedem ku ez jî carê bi wan re nîqaşên ne baş bikim. Ji ber ger min hê di serî de li pêşiya van destwerdanan ne girtiba, dê dema pêş xwe têkil her tiştî bikiran. Ji ber ez bi vê rastiyê dihesiyam, min zû bertek raber dikir.

Mijarek zêde hesas bû. Min ne dikariya hê ez li mala bavê xwe wisa xwedîderketina wan û nêzîkbûna wan a malêxwe dibînin qebûl bikim. Ev dihişt ku ez zêdetir tehemûl nekim. Ti mafê wan jî tne bû. Ji ber hê em di pêvajoya dergistî de bûn. Her tişt teqez destnîşankirin jî bê wate bû. Di wê kêliyê de zexta dayîkê tine bû. Lê vê carê jî mantiqê çewsandin û qedexeya nêzîkbûna du mirovên pîr ên xwesû û xwezûr derdiket holê. Ez ji vê jî aciz dibûm. Di heman demê de ji xwe jî aciz dibûm. Min hewl da rewşê ji Metîn re bêjim. Lê wî bi nêzîkbûnên îdarekirinê ve derbas dikir.

Sirek heye û em jî dixwazin bigihijin wê

Ew malên ax ên li hewşa avahiya em lê diman, weke hêzek îlahî bala me dikişand. Peywendiyên ku di serî de hebûn, di vê pêvajoyê de bi nîtelîkek din pêş diket. Êdî peywendiyên me bi girtin û dayîna pirtûkan ve sînordar nedima. Me gelek tişt parve dikir. Şeva ser salê Metî cilên min li ber xwe kiribû, perûk jî dabû serê xwe û çûbû mala xwendekarên li baxçeyê. Hem sala wan a nû pîroz kiribû û hem şahiya wê şevê bi wan re parve kiribû. Êdî min çav li hinek cilan û perûkan ne dikir. Hemû ji bona min parçeyek ên lîstokan bû. Ev di heman demê de guhertinek şêwe jî bû. Rexnekirina şêweya berê û berteka li hember wê bû. Pêvajoyek guhertinê ya bêdeng bû. Ji bona min ketina nava cîhana xwendekarên li wan malan, ew ji nêz ve nasîn û daxwaza hevpeyvînê bi vî şêwazî derdiket holê.

Hinek tiştên ku li wê malê ez dikişandim xwe hebûn. Sir'ek hebû. Min û me dixwest em xwe bigihînin vê sir'ê. Car caran sazbendî, şahî û girtina pirtûkan tev dibûn hêcet. Birayê Welî yê biçûk Neco pir xweş li sazê dida. Gelekan li sazê dixist. Me şêwaza lêdanê bê ka dizane an nizane ji dengê ku sazê derdixist fêm dikir. Ew mal û 'kekên' li wir ji bona birayên min pir cuda bûn. Ne dişibiyan ma û kekên din. Çûn û hatinên wê derê, girêdanek ava dikir. Mercên wir ên bi sînor û zehmetiyên jiyanê bandor li me hemûyan dikir. Me zêdetir ji xizaniya wan, lê baldarî û dewlemendiya dilê wan hez dikir. Her tişta ku bi wan re tine lê b ime re heye, dihişt ku em wan jî jibîr nekin. Nêzîkbûnên weke, 'ev bi wan re tine ye, ew nikarin bixwin' her çendî weke bertekek ji rêzê derbikeve holê jî, di rastiya cewher de ya pêş diket hestek parvekirinê bû. Parvekirinên me binêzîkbûnên 'em bidin wan jî' zelal dibûn.

Zivistan gelekî zehmet bû. Wê salê berf zêde barî bû. Firinên li bajêr ne dişixwilîn. Gelek ji dikanan girtîbûn. Li bajêr cîran Elezîzê jî derfetê kirîna amûran zehmet bû. Me ne dikariya em pêdiviyên xwe yên esasî pêk bînin. Herî zêde jî xwendekar ji vê rewşê bandor dibûn. Bi gelemperî malbatan alav û pêdiviyên xwe yên zivistanê ji Elezîzê komî pêk tanîn. Li mala me jî beriya diya min biçe her tişt bi komîser hev hatibû kirîn. Pêdiviyên weke: Şekir, rûn, ard, gaz û gelek tiştên pêdivî hebûn. Her wiha dema dayîka min çûyî em tembîh kirin û gotibû; "her tiştî îdare bikar bînin!" Lê em di vê mijarê de baldar nêz ne dibûn.

Me destpêkê bi rêya kablo kehrebe da malên xwendekaran ên ax bûn. Me kablo ji hêla odeya mêvanan ku me zêde bikar ne tanî ve ji wan re kişand. Ji bona bal jî nekişîne, me bi ser çiqlên darên tûyê yên hewşê re kişandibû. Ger zêde baldarî lê temaşe ne kiriban, kesî ne didît. Lê mixabin cîranan zû ferq kriibû. Zêde ne girîng bû ku xaltîka ji Şavakê ya serê kolanê bibîne. Ew jî xwedî niyetek baş bû. Ji xwendekaran jî hez dikir. Zarokên wê Mazlum, Xelîl û Fazil jî xwendibûn. Li cihên cuda karê mamosteyî kiribûn. Dizaniya ku dê pêdiviyên wan çibin. Her wiha dizaniya ku dê karên wisa veşartî bihatan kirin û yên bi siyasetê ve mijûl dibin wisa hêsan najîn. Lewma alîkariya bi wan re jî weke erkek mirovî didît. Heta kêfa wê ji nêzîkbûnê me re jî hatibû. Watedar didît û dikeniya. Di heman demê de ji bona dayîka me ne amade bû ku me ev kar dikir, ew jî weke cesaretê dinirxand. Alîkariyên wisa yên asta pêwendiya hevalbendiya xwendekaran rave dikir, berpirsyariya me zêdetir dikir.

Ne diyar bû ku kî dikeve vê malê û derdikeve. Her çendî roj hişyar nêz dibûn, ji aliyê derdor ve dihat dîtin. Ji ber her çendî xwendekarên dibistana navîn ev mal kirê kiribin, bi demê re xortên mezin dihatin malê û diçûn. Nêrîna cîranan erênî bû. Aciz nedibûn. Gelek caran derbarê wan de digotin; "xortên weke keça ne.' Carê jî ji bona mereqa xwe têr bikin, pirsên cur be cur ji me dikirin. Bi taybet ên zarokên wan şoreşger bûn, bi hezkirî û dilsozî temaşe dikirin.

Lê dîsa jî ev malên li hewşê xwedî yek banbûn, nepeniyek rave dikir. İ teqez ew cuda bûn. Asta peywendiyên me yên bi wan re, bi taybet di pêvajoyek dayîk, bav û bira ne li mal bûn de, pêwendiya keçek bi dergistî bi van ciwanan re di kîjan astê de dibû? Ev pirs ji bona hemû cîranan li benda bersivê bûn. Wan min nas dikir, baweriya wan jî hebû. Lê dîsa jî li gorî wan ev qas zêde dibû. Em hemû xwendekar bûn. Valahiya dayîka me jî carê xaltîka ji Şavakê dadigirt.

Şavakî zêdetir li Dêrsimê eşîretek penaber ji Çemîsşgezekê ya mezin e. Ev tenê weke malbat li bajêr bicih bûne. Ji ber keçên wan tinebûn, weke keça xwe j imin hez dikirin. Her zêde xaltîka ji Şavakê li dijî şerê min û dayîka min derdiket. Di van şeran de her tim alîgirê min bû. Parastina min dikir. Ew jî nû fêrî zimanê Tirkî dibû. Piştî demekê wê jî kirasên xwe yên gelêrî guhert û bû bajarî! Lê mixabin kirasên wê bedewtir bûn. Gelekî lê dihat. Ew jî fêrî fêrbûnên bajaran ne dibû. Gelek caran ji ber vê gazinc dikir. Kurê wê Mazlum mirovek bêdeng bû. Dema me dît ew jî bi şoreşgeriyê ve mijûl dibe, me jî hêdî hêdî xwe nêzî kir û xwest heveyvînan pêş bixin. Lê ew bi keçên ciwan re ne di-axivîn, girtîbûn. Em pir kêm di-axivîn. Bandora şerimbûnê jî hebû.

Her roj kesên weke Metîn Gûngoze, Hisên Gûngoze, Hesen Taş, Wwlî-Necatî Tayanî, Yilmaz û her wiha dihatin. Her roj jî diguherîn. Tevî vê me bi van hevalan re hevdîtin pêk tanî. Yên herî zêde dihatin malê û li mal diman ew bûn. Me her tim pirtûk ji wan digirt, dixwend û cardin dida wan. Kesî ev cuda şîrove nedikir. Pirtûk didan me, lê dixwestin em bixwînin û cardin li wan vegerînin. Weke din jî di helwestên wan de tiştek diyar nedibû. Zêdetir razî bûn. Ji ber hevalên ku min ji dibistanê û ji mêjve dinasiyan ti pirsgirêk dernediket. Di navbera me de rehetiyek jî hebû. Lê dema yên ne nas liqay min dihatin, bixwazî nexwazî min şerim dikir. Ji bere w jî hîn ne bûn, mat diman. Heta rojekê di navbera xwe de axivîbûn; "ev kesek burjuvaziya biçûk e. Pirtûkan dixwaze, lê bê ku bixwîne vedigerîne. Tenê dixwaze xwe bide nîşan!" Û şîroveyên wisa derbarê min de kiribûn. Carekê dema hevalê Mazlum Doxan vê axaftinê dibihîse dibêje; "dev ji burjuvaziya biçûk bedrin. Pê re mijûl dibin, dê bibe şoreşgerç" pişt re wan bi xwe ev nêrîn ji min re gotin.

Ji ber zivistan zehmet bû, bandor li jiyana wan jî dikir. Li bajêr tengezariya nan hebû. Ji ber baldariya me dikariyan werin van pêdiviyên xwe ji me bixwazin. Yekem car Welî hat got. Mêvanê wan hene, ji ber firina wan naşixwile, ger ard hebe dê ew bistirin û di kuzînê de bipêjin. Ev xwesteka ji aliyê wan hatî têra her tiştî dikir. Beriya wê tevî ku em gelek caran hizirîbûn, me ne zanî em çawa pêdiviyan bidin wan. Min çend caran dît ku xwe bi çend lib zeytûn, an jî helawê û parîk nan ve têr kirine. Dema min ev didît ez dihatim digiriyam. Dîsa birayê min Metîn gelek caran behsa wê sifreya wan a xizan kiribû. İsrar dikir ku em alîkariya wan bikin. Lê em dihizirîn ku ev

nêzîkbûna me wan bişkîne, lewma me ne dikir. Bi gumana em nizanin dê çawa şîrove bikin, me pêkanîna pêdiviyan talok-kiribû.

Lê niha jî daxwaz ji wan hatibû. Wê şevê em hemû li ser piyan bûn. Her yek ji me karek dikir. Me hemû karê xwarin, sitrandina hevîr, amadekirin û pêxistina kuzîneyê tev bi hev re kir. Zîndewariyek balkêş bû. Weke ku ferman hatibû û bi xwestek û kelecana wê ve, kar zû dihat kirin û ferman dihat bicihanîn. Di navberê de jî dihatin pirs dikirin. Diyar bû zêde birçî bûn. Ev dihişt em zêdetir mijûl bibin. Tevî ku derengiya şevê bû, kesî ne dixwest raze. Heta kum e her tişt amade kir û da wan. Wan tenê nan xwestibû, me jî xwarin çêkir, lalîkên mezin dagirt û bi sêniyekê şand ji wan re.

Êdî piştî wê rojê me her şev şîv bi hev re dixwar. Carina me tenê xwarinên taştê dixwar û xwarina gerim ji wan re dişand. Me ev jî zewqek mezin dikir. Dema me ev dikir jî em hişyar nêzî derdor dibûn. Dema hewa tarî dibû birayê min ê biçûk Metîn sêniya xwarinê dida wan û dihat. Ne me dixwest dayîka tonton û ne jî cîranên me yên qeta jorîn ên ji Pertek'ê bizanin. Bi qasî ji destêdayîka tonton dihat alîkariya me dikir. Dixwest zêdetir jî bike. Ji ber min hemû barê malê radikir û zehmetî dijiya, kêfa wan jî nebûç ne dixwestin ez hincirim.

Ji bilî vê wer bawer dikirin ku ji ber dayîk û bavê min ne amade ne, ezê bi her kesî re peywendî pêş nexim. Jixwe tiştên didît û texmîn dikirin têra xwe ew aciz dikir. Bes ger ev peywendiyên ku me her tiştên xwe bi wan re parve dikir bihesiyan, dê ne baş ba. Ji ber her şev dihatin serdana me, em jî tengav dibûn. Lê me xwe wisa birêxistin kiribû, me ji nişkê ve xwarin çêdikir û ji wan re dibir. Dema ew li mal ban, hinek

bihatan, bê ku me şanî wan bikira ew dibirin odeya piştê. An jî hinek di bin navê hevalên malê û xizimtiyê de hinekê rûdinişt û diçûn.

Haşimê ji Pertek'ê, bi sala ne li YSE karkerê kehrebê bû. Ya rastî li Dêrsimê weke karkerê kehrebeya hemû saziyan dihat nasîn. Di vê mijarê de jêhatî bû. Ji bilî Hademe û Kehrebê jî pîşeya wî hebû. Giranî yên polîs û hevjînên karmendên ji derve de hatine dihatin mêvandariya wê malê. Peywendiyên wî bi cîranên din re sînordar û fermî bûn. Ev rewş bi me tevan re şik ava dikir. Hevjîna wî ciwan bû. Di peywendiyên xwe yên cîrantî de baş bû. Wê û dayîka min li hev dikir. Her wiha Haşim nêçîrvanî jî dikir. Lê ji ber em Elewî bûn, me kêvroşk ne dixwar. Bes me carê goştê kewa dixwar. Dema Metîn jî masî tanîn, wê şevê li mala sê-çar cîranan masî dihat xwarin. Masiyên bi qasî bejna xwe digirt û tanî. Me jî weke parçeyên qurbanê li cîrana belav dikir. Peywendiyên bi vî rengî girêdanek û domdar bûn. Ev jî dibû sedem ku em hevûdû zûtir nas bikin.

Beşek ji Pertekiyan Tirkên ku piştî sûrgûna Dêrsimê yên ji 38'an anîbûn herêmê. Pêkhateya li Çemîşgezek û Pertekê wisa bû. Lewma giranî çanda xwe dijiyan. Girêdanê wan bi dewletê re hebû, lê aliyên wan ên ji Kurdewarî bandor bûyîn jî hebûn. Mînak di meha aşûrê de wan jî sê rojan rojî digirt û aşûre çêdikirin. Di mijarên sinet û dawetan de jî ji çanda me bandor bibûn. Li van deman hevalkarî girîng bû. Dihat wateya xwîşk û biratî. Wan jî bi yên xwecihî re hevalkarî dikir. Cihên ku faşîstan herî zêde xwe lê birêxistin dikirin Çemîşgezek û Pertek bû. Li bajarokên din faşîstiyek vekirî tine bû. Kesên weke sîxûr hebûn. Li Dêrsimê gelekî xeter bû ku yek bi nasnameya vekirî

ya sîxûrtî tevbigeriya. Dibe ku mirov dizîve bihata kuştin. Faşîstan li dibistana mamosteyan û pansiyona dibistana amadeyî dersa xwe girtibûn. Yek du kesên mayîn jî tengezariyê de bûn, ji ber li wan dixistin. Ji mamosteyan hêjî yên faşîst hebûn. Xwe vedişartin.

Cîranê mey ê ji Pertekê bi guman bû. Piraniya polîsên sivîl dihat zanîn û texmînkirin. Li kolanan polîsên sivîl û bi cilên fermî û yên xayîn îxbar dikirin diyarbûn. Lewma weke berê ne dikariyan malan kirê bikin. Berê hinekan bi taybet kirê didan polîsan. Di salên dawî de kesî malê xwe ne dida polîsan. Êdî refên her kesî zelal dibû. Lê belê, ji bona dewlet jî ket zanebûna vê, sîxûrên xwe li her derî belav dikir.

Bi ciwanên cîran re parvekirina xwarin, dar, kehrebe, girtin û dayîna pirtûkan û zemînê hevpeyvîna ku van da avakirin, girêdanek pak, paqij, tije hezkirin û rçzdarî ava kiribû. Her kesî behsa hevaltiya derdora xwe dikir, hinek navên ku derketine pêş dida û nêzîkbûna xwe ya lu hember wan destnîşan dikir. Di vê manê de kesek bê meyîl ne mabû. Baldarî û dilsoziya me jî ji hêlekê ve bêdeng û ji dil bû. Ji ahêla din ve bi qasî em serî li hinekan rakin bawerî û hêz dida me. Em wer dihesiyan her tişt bi wan re veşartiye. Ji kêfa em di cihê xwe de ne disekinîn, hestên me yên tije kelecan gav bi gav ber bi rastiyekê ve diherikî. Dudilî tine ye, şerimbûn tine ye, guman tineye. Pirsên gelo dê heta kur biçe û çi bibe jî tine ne. Pirsên weke ev kî ne, rastiyên wan çawa ne jî tine bûn. Ji ber bersiva van pirsan tevan di bawerî, hezkirin û rêzdariya wan bi şêwazê jiyana xwe ava kirî de veşartî bû. Dê her kesî yek bi yek xwe bigihanda wan û bersiva xwe bigirta.

Jixwe ne hêdan bû mirov vebêje. Heta neyê jiyîn zehmete ku mirov fêm jî bike. Têrê nake ku mirov pakî, xwezabûn, bedewî û hemû hestên wan dane avakirine tevê binivisîne. Dema ez niha dinivisînim jî ji serî heta neynokên xwe bi dil û serwextiya xwe ve dijîm. Tişta herî bedew ev qas xwezayî, pak û daxwaz, di nava têkoşînan û nakokiyan ve girêdana bi rastiyekê ve bû. Lewma ez her tim xwe 'xwedî şans' dibînim. Ez carek din bi dengê bilind dibêjim: ji ber ez di nava vî şer û têkoşînê de me, xwe mirova cîhanê ya herî bi şans dibînim.

Şevek ji şevên zivistanê yên dirêj mêvanek me hatibû. Meto fasîleyên ku çêkiribû, şewitandibû. Çi bê şansî bû! Wê şevê bêhna şewatê ji xwarina me dihat. Min bi şermek mezin hewl dida rewşa heyî bidim fêmkirin. Ji bona ser wê kêmasiyê bigirim, min tirşî jî danî sifrê. Hewl didim çayê xweş çêkim. Yek ji me di cihê xwe de nasekine.

Zêdetir Welî wan dihat malê û diçûn. Serdana vê carê ne ji rêzê bû. Hisek wisa bi min re pêş ketibû, dê hinek tiştan bêje û agahiyên nû bide. Bendewariyek hebû.

Piştî xwarinê em hemû li nêzî wî rûniştibûn, bi mereq li bendê bûn bê ka dê çi bi-axive. Baş bû ku wê şevê apê Xidir û dayîka Tonton ne hatibûn mala me. Lê mêvanê me di sohbeta xwe ya destpêkê de pirsa wan jî kiribû. Hewl dida nêzîkbûnê min hîn bibe. Bi xwe jî texmîn dikir. Ji ber ji hatin û çûnên wan ên şev û roj dihat fêmkirin ku çi qas xwe xwediyê min dibînin û venêrînin. Dîtina vê ne zehmet bû.

Got; "Hûn ev qas kes in, kes nikare we biçewsîne. Ger hûn bixwazin dikarin pir hêsan bin bixin. Ew mirovên extiyar in.

Qudreta wan a bikaribin hukmê her tiştî bikin tine ye. Jixwe şaş e ku dixwazin hukmê her tiştî bikin.”

Dîsa dixwazê fêm bike bê ka dema dayîka min ne li mal e bandorek çawa ava dike. Ji ber dema ew li mal ba, peywendiyên min sînordar bûn. Em dûr disekinîn. Şinga çûyî ve rewş hatibû guhertin. Ev jî dihat ferqkirin. Li hember gilî û gazincên me yên li dijî dayîka me wî got:

“Dayîka we jinek qenc e. Jinên din zêde bi me re ne di-axivîn. Lê wê her tim silav dida me û pirs me dikir. Silava me jî digirt.” Di vir de dixwest nêzîkbûnên me yên erzan bide nasîn.

Me yekser xwe têkil kir û got rast e. Kesî dor ne dida hev; “baş e ku bavê me ew bir Almanya. Ji ber zêde xirab bû. Her tişt asteng dikir.”

Meto:

“Herî zêde jî xwîşka min diçewsand. Hûn nizanin! Zêde tiştek li me ne dikir. Em sibehê diçûn û êvarî dihatin. Baş e ku ew ne li vir e! M qey ew li vir bat e dikariya wisa hêsan werî malê?”

Ew bi van gotinên me dikeniya. Êde aramî, hedar û rehet bû. Bersiva me tevan dida. Em jî dihedirandin. Ya rastî bê me aciz bike, şaşiyên me b ime dida fêmkirin. Herî zêde bi mînakên herî hêsan dida diyarkirin ku çareseriya her pirsgirêkê heye. Ev jî encamên ku bi pêşketinên zelal ve hatine afirandin ve destnîşan dikir. Di navberê de jî mijar tanî ser romanên kum e ji bona xwendinê ji wan girtine. Dipîva ka me çi qas xwendiye û fêm kiriye.

Beriya vê hinek nirxandin û şîroveyên cuda hatibûn kirin. Dixwaze vê jî bi van mebestan zelal bike. Behsa romana Çîmento ya me xwendî kir. Aliyên wê yên herî zêde bandor l ime kirî dipirse. Ew jî cih bi cih bûyeran vedike û baldar nêz dibe da ku em nezanin me diceribîne. Em jî aliyên wê yên herî zêde bandor dike vedibêjin. Em di vir de jî dor nadin hev! Bes me pirtûk bi nêrînek rexnegir ne xwendibû. Ji me re girêdana asta têkîliya wir a bi nêzîkbûna sosyalîst ve vekir û diyar kir ku dema me pirtûk xwendin, divê em rexnegir nêz bibin.

Dema min fêm kir min pirtûk weke wî bi baldarî ne xwendiye û fêm nekiriye, min şerim kir û li ber ketim. Bes pîvanê diyarkirina rastiyan çi bû? Divê me ev bizaniya. Pirtûka Çîmento xwedî naverokek civakî bû. Nivîskarên şoreşger neçarbûn ku di hemû romanên xwe de jî rastiyê binivisînin. Ji ber pîvanên nêzîkbûnên me wisa bûn, me ne dikariya em cewhera bûyeran binasin. Dîsa jî min wê şevê baş fêm kir, pirtûka em dixwînin a kî dibe bila bibe, divê em baldarî û fêhma bixwînin. Ev heman weke li Dêrsimê nêzîkbûnên me yên ji koman re divê çawa be dida diyarkirin. Wan jî digot; "em şoreşger in." Lê hema bêje hemû jî xwedî meylên xisletên çînî yên cuda bûn. Di heman demê de têkoşînek bîrdozî û çînî ne didan. Yên digot em têdikoşin jî, zêdetir bi çors û seresere dikir. Her kes îdîa dikir ku ew mafdar û rast e. Gelo diber her kes rast be? Ne gengaz e. Ya tenê rast Sosyalîzm bû. Her kesî îdîa dikir ku sosyalîst e. Lê belê, gelo li gorî vê dijiyan? Belê nepeniya esasî jî di vê pirsê de veşartî bû. Ji ber li gorî sosyalîzmê û nirxên mirov pê bawer e jiyîn, pîvanê bingehîn bû.

Mêvanê me dixwest fêm bike, li dibistan, pol, kolan û derdora xizmên me kîjan meyil zêde serwer e. Di heman demê de dixwest fêm bike bê ka em di van mijaran de çi qas hişyar û baldar in. Ev jî bi pirsan ve dikir. Bi vî rengî hem em ji nêz ve nas dikirin û hem jî dihişt em hîn zêdetir baldar tevbiger in.

Zarokên apên me her yek ji siyasetek cuda bûn. Ji TÎKKO, PDA, HK, TKP bûn. Hema bêje di wê demê de her yek ji siyasetên çepên Tirkan tev li derdora malbat û xizmên me hebûn. Cîran jî bi heman şêwazî têkilhev bûn. Li pola me zêdetir PDA hebûn. Lê me jî got, em hêjî ne ji ti komê ne.

Wî jî li Perwerdeya Gazî ya Enqereyê dixwend. Lê zû vegeriyabû. Tevî ku dibistan ne di bêhnvedanê de bûn, ew li Dêrsimê bû. Diyar bû ku erkê şoreşgerî li pêş bû. Metîn jî li wê dibistanê dixwend. Hevûdû dinasiyan. Lê dema behsa wî dikir, min ferq kir ku zêde jê ne razî ye. Pir vekirî got; "Ez Metîn nas dikim. Bêdeng û kêrî ti karî naye. Hêjî bi derdora xwe ya CHP re têkildar e."

Her çendî zêde ne vekir, dîsa jî ez bi tiştên ku min bihîst xemgîn bûm. Diyar bû dixwest bertekên min fêm bike. Min jî hewl dida zêde tiştekê nedim der. Lê min dîsa jî nekarî bertekên xwe veşêrim.

Wisa piştî gelek mijaran dest bi mijara esasî kir. Me hemûyan hişyar lê guhdar dikir. Hêdî hêdî, tene tene di şêwazek em fêm bikin de vedigot. Têgehên gel û netew şîrove dikir. Behsa Vîetnam, Angola û Kûba dikir. Behsa têkoşîna wan a rizgariya netewî û rêberên wan dikir. Mînakên balkêş dida. Vegotinên xwe ji nêrînên Ho Chî Mînh, Castro, Cabral, Lenîn û Stalîn didomand. Hewl dida nêrînên xwe piştrast bike. Ne diyar bû bê ka ji me re çîrokan dibêje, an jî pirtûkan dixwîne. An jî weke dersa dîrokê bû.

Digot; Kurd ji eslê Arî ne, cihên lê cih bûne, Mezopotamya, dagirkeriya Mîsak-i Mîllî, bi dîrok, sedem û encamên wan hemûyan ve dirêjahî vedigot. Herî zêde jî Îsyana Dêrsimê ya 38'an şîrove kir. Ew berfirehtir nirxand. Min ne dikariya ez van nirxandinan bi vegotinên dayîk, bav, xal an jî pîrika xwe bidim ber hev. Rastiya komkujî, dîroka tinebûna gelekê û netewekê bi mînakên balkêş û şêwazên mirovan bihejîne radixist ber çavan. Aliyên van bûyeran ên êş didan cuda bûn. Her yek destavêtin, kuştinên komî, sûrgûn û îxanetên hatine jiyîn bi serê xwe êş bûn. Ez heta şaneyên xwe direcifîm. Em hemû melûl bûn. Çawa heta niha hebûna gelekê tine hatiye diyarkirin? Di nava ti pirtûkên dîrokê de Kurdistan tine bû. Navê welatê me Kurdistan bû û salan bû digot Komara Tirkî ye. Wî hê berdewam dikir. Çawa Kurdistan bûye çar parçe, Sewr, Lozan û Îsyanên Kurdan çawa pêk hatine, tev vedigot. Xilas nedibû. Hinde mijar herikbar û bandorker bûn e ne dixwest xilas bibe. Belê me di pirtûkên dersan de hevpemanên Sewr û Lozanê xwendibû. Di hinek xalên wê de peyvên Kurd û Kurdistan jî derbas dibû. Lê ev gotin tenê di wan pirtûkan de mabûn. Me niha dizaniya welatê me Kurdistan e. Di heman demê de her tim di bin statûya mêtînger a kevnar de tê girtin. Pênase di nava axaftinan de baştir zelal dibûn.

Kurdistan Mêtîngerkirî û nîv feodal bû. Weke ku mafê destnîşankirina çarenûsa xwe ya netewan ji bona her gelî derbasdare, ji bona gelê Kurdistanê jî derbasdare. Lewma divê li gorî şert û mercên Kurdistanê yên zelal, rêxistin û têkoşînek were meşandin. Dema ev mijar vedigot, her tim ji Vîetnamê mînak dida. Ev jî dibû sedem ku bala me jî li hember Vîetnamê pêş bikeve. Digot Vîetnam jî weke Bakur û Başûr ji hev hatine

cudakirin, destpêkê Bakur şoreşa xwe pêk aniye, piştre Başûr jî di nava vê pêvajoyê de li dijî mêtîngeria nû têkoşa ye û bi daxwaza xwe li ser bingeha demokratîk bi Bakur re bûye yek. Li Afrîka welatên weke Gîne, Angola û Mozambîk ên mêtînkirî heman pêvajo jiyane û hêjî li hinek ji wan têkoşîna rizgariya netewî didome. Ev çîrok hê zêdetir dirêj dibin. Lê ez di hişê xwe de hewl Didim mijara Kurdistanê fêm bikim. Li Almanya şevek ku ez beşdar bûmê de, min neqşeyek Kurdistanê ya rengîn dîtibû. Niha jî ez fêm dikim ku Kurdistan welatê min û hemû Kurda ye. Her ku ez fêm jî dikim, ji wan re dibêjim "ew" û rave dikim.

Ew komek mirovên ku mereq ava dikirin!

Weke ku tişta lê digeriyam dîtibû. Hêj di wê kêliyê de hinek dîrok û ziravî hatibûn jibîrkirin. Lê danasînên weke 'Kurdistan Mêtîngehe. Dê gelê Kurd bi hêza xwe ya cewherî ve girêdayî, bi rêxistin û rêbertiya xwe ya cewherî ve, têkoşîna rizgariya netewî bimeşîne, dê Kurdistana serbixwe, yekbûyî ya demokratîk, azad û aram were sazkirin' di serê min dubare dibûn. Dê lawên gelê Kurd ên eslî vê dozê bimeşînin. Ango; "lawên cewherî, hêza cewherî, rêxistina cewher." Heta niha kesî gotinên bi vî rengî bikar ne anîbûn.

Dibêje; "Tirk ne dijminê me ne. Gelê Tirk bira û dostê me ne. Dê têkoşîna me bi wan re hevbeş pêş bikeve, lê belê emê li gorî mercên xweseriya xwe birêxistin bin. Mînak mirov nikare nexweşek mîdê û nexweşek dil bi heman rêbazî tedawî bike. Ji bo wan rêbazên cuda hewce ne." Di vê mijarê de hewl dida enternasyonalîzmê û welatparêziyê bide fêmkirin. Dîsa dema behsa Kurdistanê dikir, behsa lehengiya Leyla Qasim û Besê ya 38'an li Dêrsimê dikir. Diyar dikir ku, şoreşgerî ne tenê karê

zilam e. Dê jin û zilam têkoşîna xwe ya mil bi mil ve, serkeftina rizgariya netewî were bidestxistin. Di berdewamiya axaftina xwe de digot, jin jî bindeste, nezan tê dîtin, di vê manê de herî zêde pêdiviya wê bi şoreşgeriyê heye. Ev jî bi taybet destnîşan dikir. Herî zêde jî li min dinêrî û vedigot.

Ev mijar tev di şevekê de, weke di hênaseyekê de hatibûn gotin. Saet dirêj bibûn. Heta wî bi xwe got, "niha ev qas bes e!", me hemûyan ji dil û can guhdar dikir. Hestên me ser û bin bûn. Me ji ber ne dizaniya em çima Kurd û Kurdistanî ne, ji xwe gelekî şerim kir. Ya rastî bi vî rêbazî zanîn û hînbûna me jî kêfxweşiyek cuda dida me. Em Kurd bûn. Êdî hewce bû em ji bona welat û gelê xwe têbikoşiyan. Diviya me bi hemû gelên din ên bindest re hevbeş nexşeyek têkoşînê destnîşan bikira. Hestek pir xweşik bû. Di heman demê de em pir kêfxweş bûn. Me ji hev re got; "baş e ku em ne ketina bin bandora hinek din."

Lê belê hinek mijarê ku di serê me de ne zelal hebûn. Mînak ew bi navê kî di-axivî. Navê tevgera wan, an jî bîrdoziya wan çibû. Dê me xwe çawa bida nasîn? Jixwe gotibû; "dê şoreşgerên Kurdistanê vê dozê hemêz bikin." Ma nav girîng bû? Piştî ku ew rabû çû, ev pirs hat bîra me. Lê ya herî girîng jî nirxandinên ku em bi hinek din re bikin, em bikaribin bêjin ku ev nêrînên me ne. Bi qasî me ew fêm dikir, me jî dubare dikir. Der barê nav de jî, me şîroveya "dibe ku ji bona ewlekarî ne hat gotin" kir.

Dê me ev ji xwe re esas bigirta. Ji bona em bikaribin têkoşîna bîrdozî bi hêz bimeşînin, diviya em Marksîzm-Lenînîzmê baş têbigihijin û têkoşînên rizgariya netewî baş lêkolîn bikin. Ji ber şoreşgerî hînbûn, fêmkirin û zanîn bû.

Êdî min li pol û kolanê çi tiştê nû hîn bûme, bi germahî nîqaş dikir. Ên destpêkê min bi wan re nîqaş kir, Tirkan, Ayten û Fîdan bûn. Lê min ne karî bi axaftinên xwe wan bandor bikim. Lewma mine ew vexwendin malê, wer hizirîm dê wisa baştir be. Paşê jî min bangî wî mêvanê me û Welî kir werin malê. Nîqaşek demdirêj pêş ket. Tirkan wan hinekê nerim bûn. Lê belê, dema bi min re nîqaş kirin di nêrînên xwe de zêde bi îdîa bûn û êrîşî min dikirin. Ew ji aliyê teorîk ve baştir bûn, demogojî dikirin. Li dibistana mamosteyan derfetê nîqaşan zêdetir bû. Ev jî kesayet pêş dixist û dihişt ku mirov lêkolîna bike. Her wiha ne dikariyan li malê biçewsînin. Serbest digeriyan. Gotin dê hinek mijaran lêbikolin û divê ji wan re hinek dem were dayîn, da ku paşê cardin nîqaş bikin.

Lê Fîdan zêdetir bi tevdîr nêz dibû. Ayten û Tirkan xwestin di hnek mijarên nû û ecêb dibînin de lêkolîn û nîqaşan bikin. Ev jî erênî bû. Ev jî dihat wateya qezenckirina du kesan. Mîsoger her nîqaş û axaftinê bandor li hinekan dikir. Ji ber ev nêrîn rast bûn, bi rastî jî yên dixwestin şorelgeriyê bikin, dê bi van nêrînan re rû bir û bihata. Ev ne miradek an jî xwestekek hestewarî bû. Me ji xwe jî dizaniya. Ji ber em jî ji van rastiyan bandor bûn.

Bîrdozî nû dihat ragihandin û vegotin. Lê kesê ne bihîstî ne mabû. Dihat gotin, ‘Kurtparêz’, ‘Netewparêz’ derketine. Bes komên din kena xwe dikirin. Her kesî ‘Kurdparêz’ mereq dikir. Dema nîqaşê destpê dikir, pirsa sereke navê rêxistinê bû. Tiştên dihatin vegotin ji mijarên tim komên çep digotin cudatir bûn. Şoreşgeriya me bi temamî li dijî şêwazê nav û dengbûna bi nav û rojnameyan, peywendiyên ji rêzê esas (kafa kol ilişkisi) digire, rastiyên giştî bi rêbazên dogmatîk û propagande diyar

dike bû. Kesên parastina vê bîrdoziyê dikirin, ne ji rêzê bûn. ‘komek mirovên’ ji her hêlê ve bandor dikir, mereq didan avakirin bûn. Nêzîkbûnên wan ên bi îdîa, ji xwe bawer, kamil, durist û axaftinên wan ên biryardar û mîsoger rave dikirin, dibûn navenda rakêşwerî. Her çendî ciwanan refên xwe diyar kiribin jî, her tişt destpêka kar bû û asta bandorbûna teorîk ne kûr bû. Êdî bertekên li dijî peralê, girêdana li hember Denîzan, Mahîran û Birahîm Kaypakkayan ku lehengên her kesî ne, şehîdên din ên ji bona azadî canê xwe dane, bayê çepgiriya hem cîhan, hem li Tirkî û Kurdistanê bandor bûye, ciwan gihandibûn astek rêxistinkirinê. Bi taybet hemû ciwanên li Dêrsimê, weke navenda pêşbaziya çepgiran a bidestxistina mirovan bû.

Lê herî zêde dibistana mamosteyan bal dikişand. Hinek komên çepgir, di nava gel de rastiya bûyerên li wê derê berovajî dikirin û propagandeya reşkirinê pêş dixistin. Dema çalakî li dijî faşîstên li dibistanê û nêzîkbûnên HK ên êrîşkar û tehrîk dikir pêş ketin, digotin; “ev komek kiroyên ji Rihayê hatine. Li Dêrsimê tevlîheviyê ava dikin. Ev ne çepgir û ne şoreşger in! Tûrkeşî ne! Ev jî xwe Kurd didin nasîn! Di rastiyê de yên ku divê ji dibistanê werin avêtin ev in.” Gel jî diberdan wan. Qadroyên wan ên rêvebir, di van dibistanan de mamoste bûn. Bi vê riyê hewl didan dilxwaz û sempatîzanên xwe, bi xwe ve girê bidin û lêgerînên wan ên cuda asteng bikin, pêşiya wan digirtin. Propagandeyên wisa reşkirin û teşîrkirinê, bi gelek kesan re rewşek berovajî ava dikir. Baldariya li hember şoreşgerên Kurdistanê zêdetir dikir.

Li dibistana amadeyî komên çepên Tirk zêdetir bûn. Lewma gelek caran nîqaş tund dibûn û vediguherî pevçûnê. Di pola me de ji xeynî min kes tine bû. Weke din hinekê Zilfo baldar nêz dibû. Ji ber birayê wî Kamer Ozkan jî, bi komê re eleqeder dibû, hinek din gerim, li şûna nêrînên teorîk, rêbazek qut dike û şerker esas digirt. Kesayeta xwe wisa dida axaftin. Nîqaşên me bi yên din re jî di navbera dersan de gur dibû. Min çend nêrînên ku dizaniya ji xwe re esas digirt û heta dawî bi înat nîqaş dikir. Min ti caran tehemulê tewanbariya 'Netewperestî' nekir. Yên ku ji min re digotin netewperest, min jî digot; "hûn înkara netewî dikin, hûn heliyane, we xwe winda kiriye. Hûn ji Kurdîniya xwe şerim dikin" û parastina xwe dikir.

Mamosteyê me Abdullahê endamê DDKO, ji Muşê bû. Nîqaşên me yên bi wî re zêdetir erênî bûn. Kurdinî û Kurdistanî weke aliyên hevbeş dihat dîtin. Ji ber mamoste bû, ne dixwest nîqaşan pêşdetir bibe. Lê ji dil û can kêfa wî ji Kurdiniya min re dihat. Êdetir eleqeder dibû. Jixwe bi gelemperî hemû dersan de nîqaş pêş diket. Lê bi taybet hinek dersan de nîqaş gerimtir dibû. Mamoste jî tevlî van nîqaşan dibûn. Dîsa mamosteyê me yê fîzîkê wate ne dida bertekên me yên em aciz dibûn ku li laboratuwarê ders dihat dayîn. Her tim rexne dikir.

Digot; "hûn şoreşgeriyê şaş fêm dikin. Dersa fîzîk zanist e. Hûn jê sûd nagirin. Bi gotina, 'perwerdeya burjuva ye em naxwazin' ve hûn xwe dixapînin. Derfetên gelek ceribandinan heye. Heta gelek derfet hene ku hem teorîk û hem pratîkî hûn fêrî çêkirina teqemeniya bibin. Ev firsend ji dest we diçe. Bes dê ev ji we re gelekî hewce bikin."

Me di vê mijarê de ew mafdar didît. Heta carê dema ceribandinan em jî diketin hundur. Lê mixabin dîsa jî bê baldarî serwer bû.

Êdî li malê rewşek ku xebatan asteng bike tine bû. Ger di nîqaşan de tiştek nêzî me hebe ew me, dibe civînên biçûk ên nîqaşan û hinek malên ku tên cem hev. Di vê mijarê de mala herî guncav mala me bû. Ji ber çûna malên din dibû pirsgirêk. Yên dihatin û diçûn zêde dibûn. Kesên weke Tirkan, Ayten, Nurheyat, Qiymet, Cemîle, Kabîre Merkît wan dihatin. Em piştî demekê bûn komek. Me yekser dest bi xebata perwerdeyê kir. Em di hefteyê de du rojan, çend demjimêran dihatin cem hev. Ev bi bername û plan dihatin kirin. Ji bona ewlekariyê ya herî baş her carê li malek cuda xebata perwerdeyê meşandin bû. Em jî wisa dikin. Em di perwerdeyê de bi giranî pirtûkên kevnar ên derbarê mijarên weke Rêgezên Felsefeyê yên Bingehîn, Materyalîzma Diyalektîk û Dîrokî, dîroka civakan de dixwînin û nîqaş dikin.

Dêrsimê cara yekê di 12'ê Adara 1975'an de, şoreşgerên Kurdistanê nas kir. Cara yekê qadro, dilsoz û sempatîzanê wê di meşekê de hatibûn cem hev. Meşa ku ji dibistana amadeyî destpê kir, pêşiya konaxa hukumetê re derbas bû, ber bi kolana jêr ve, pirê re borî, heta dibistana mamosteyan berdewam kir. Hemû polîs û leşker hawarê de bûn. Weke ku wê rojê hemû Dêrsim li ser piyan bû. Pêşiya meşê li ser pirê, dawiya wê jî li cadeya biniya konaxa hukumetê bû. Pir bê hempa bû. Darbeya faşîst a leşkerî ya 12'ê Adarê dihat lenetkirin. Diruşmeya 'Bimire 12'ê Adarê' hevbeş dihat qêrîn. Ev diruşma, ya herî aheng û bi hêrs dihat qêrîn bû.

Her wiha cara yekê diruşmaya ‘ji Kurdan re azadî’ dihat qêrîn. Komek heval ev diruşma dabûn destpêkirin. Desmalên xwe girtibûn dest û dihejandin. Ev kom piranî ji Rihayê bûn. Min ew desmalên ku navnîşana berxwedanî û serhildanê ne, cara yekê li cem Fîlîstîniyan dîtibû. Di televîzyonan û çalakiyên revandina firokan de ji bona pêçana rûyê xwe, weke amûrek xwe veşartinê bikar tanîn. Her wiha sembol bû. Van hevalan zêde bê hempa, bi dengek gur, bi biryar her tim ‘ji Kurdan re azadî’ diqêriyan.

Me jî heman diruşma diqêriya. Ev diruşma cihê me jî yê di koma meşê de diyar kiribû. Me ji diruşmayên dihatin qêrîn dizaniya ku kî hevalên me ne. Li kêleka min Cemîle Merkît hebû. Me bi hev re diruşma diqêriya. Lê her cara me diruşma diqêriya, komek ên li dibistana mamosteyan dixwendin, duruçmeyên naveroka wan şoven ên diruşmayên me biçewsînin diqêriyan. Qet jibîr nakim, keçek ji PDA bi qasî guhê min biteqîne, weke ku devê xwe bide ber guhê min, bi diruşmaya ‘Bimire Netewperest’ heta jê dikariya qêriya. Heta demekê jî ew deng di guhê min de vedida. Min jî diruşmayên weke “Hûn duviki in! Înkara Netewî dikin! Hûn şerim nakin êrîş dikin” qêriya. Û cardin got; “Ji Kurdan re Azadî!” Li derdor polîs hebûn. Ger guncav ba, dibiya ku hinek tişt jî pêş biketa. Min di wê kêliyê de xwest kumla xwe li nîvê rûyê wan bidim. Helwestên kesên wisa şoven gelekî zora min diçû. Ew qas înkar û xwe redkirin ji kur derketibû? Lê min got; “ezê vê ji te re nehêlim” û min bi xatirê vê çalakiya hevbeş tiştek nekir. Jixwe wan jî ne dizaniya ku nûnertiya kî û çi dikin. Tişta bi êş jî ev bû. Min fêm ne dikir çima ev qas bi hêrs e û aciz dibû.

Dema diruşma dihat qêrîn asta hejmara koman baştir diyar dibû. Em bi yên me re li cem hev in. Lê hinek jî li navberan belav bûne. Bawer im ev jî bi zanebûn hatibû kirin. Ji ber her tişt ne meş tenê bû. Ne hewce bû ku her kes eşkere bibe. Baskên komên çepên Tirkan, ên înkara netewî dikirin, zêde girîngî didan hejmara kesan. Hemû hebûn û tinebûna xwe di meşan de datînan holê. Çi qas qelebalix ban, xwe ew qasî bi hêz û mafdar dihesibandin.

Dê meşa li dibistana Mamosteyan dawî biba. Rêzgirtin û der barê girîngiya rojê de axaftin hat kirin. Ehmet jî bi navê me axaftinek kin, bi Kurdî di navberekê de kir. Kom belav bûn. Em jî bi rêbazek ku qet bal nekişîne derbasî odeyên pandiyonê bûn.

Mazlum Doxan, li wir bû. Min cara yekê ew ji nêz ve dît. Min qet ew li mala kolana Dax nedît. Dema me hev nas kir, derfetên axaftinê jî çêbû. Min hinek pirs kirin û dixwest bersiva wan bigirim. Min bi taybet der barê binyata nîv feodal a li Kurdistanê, revîzyonîzma nûjen û 'ji Kurdistanê re azadî' pirs kirin. Heval Mazlum jî got:

Diruşmaya 'Ji kurdan re azadî' ne şaş e. Dikare were qêrîn. Lê xwedî xisletek teng û netewperest e. Tenê ji Kurdan re azadî têrê nake! Divê hemû gelên li kurdistanê werin hemêzkirin!"

Ev daxwiyanî nîqaş û nêrînên me yên ne zelal ên derbarê vê diruşmayê de ronî kir. Her wiha diruşmayên weke " ne Emerîka ne Rusya", emperyalîzma Rusya Sovyet!" Hişt ku em nêrînên komê yên der barê Sovyetê de hîn bibin. Hevalê Mazlum got, "em dikarin pergala Sovyetê weke revîzyonîzma Nûjen pênase bikin" û gelek mijarên kul i wir hatine jiyîn bi

mînakan destnîşan kir. Piştî meşek wisa ev hêza bîrdozî, em hemû zînde kirin. Me heta şevê ev mijar di navbera xwe de berfirehtir nîqaş kirin. Di vê navberê de me gelek hevalên weke Nurheyat, hinek hevalên ji Riha'yê Ehmed, Cuma Tak, Silêman Gûnyelî û gelek hevalên din nas kirin. Wê rojê gelek hevalên ji gelek cihên Kurdistanê li cem hev dîtin, hêz û moralek mzin da min.

Êdî zengilên xeternakî lê diket!

Dema ez ji meşê vegeriyam, ez liqayî apê Xidir û dayîka Tonton hatim, mereqa min kiribûn. Her duyan jî bi rûyek tirş û hêrs pêşwazî kirim. Ez jî berovajî wan bi moral bûm. Lewma min qet girîng î neda gorinên wan. Moral û kelecana meşê ava kirî, naskirina hevalên li dibistana mamosteyan, kêfa min xweş kiribûn. Min wê rojê di jiyana xwe de gavek din a girîng jiya bû. Di wê salê de li gel gelek gavên girîng, dê ev jî jiyan û kesayeta min bi tamamî biguherta. Êdî ji bona tiştek weke berê ne dibû.

Êdî çavlêkirinên min ên berê nemabûn. Mînak min dest bi li xwe kirina sola 'cizlavît' kiribû. Cilên min hatibûn guhertin. Min cilên xwerû û ji rêzê li ber xwe dikir.

Ev jî apê Xidir û dayîka Tonton aciz kiribûn. Êdî xizmên me ên derdor û cîran jî ji guhertina b imin re mat diman. Ya rastî ne guhertinek wisa bi zanebûn û plankirî bû. Ev jî bandora koma ku e tevlî wan bûm. Xwerûbûna wan bandor li min jî dikir.

Min di wateya cidî de xwe ber bi jiyanek nû ve berdabû. Wateya wê ji her hêlê ve têra min dikir. Bê ku di ferqê de bim, li hember her tiştên kevin bertekên min pêş diket. Ev jî bi min re guhertin ava dikir. Tişta ecêb jî ji bilî malbat xizim û derdora me, kesekî ji min re ne digot vê li ber xwe bike, yan jî neke. Ahengek ji xweber a şêwaza cil û bergên koma ez tevlî bûyîm çêdibû. Ast, baldarî û lêgerînên peywendiyên heyî jî, giyana min a hundurîn ji nû ve rêk û pêk kiribûn. Ango di her tiştî de guhertinek bi temamî dihat jiyîn. Her ku peywendiyên min bi hevalan re zêde pêş diket, her tişt leztir dibû. Xêra wan jî jiyana min rêk û pêk dibû.

Êdî ji bona me xebatên perwerdeyê, xebata herî pîroz bû. Hevrebûna herî watedar bû. Diviya em di roj û demjimêra hatî destnîşankirin de amade bûna. Ev peywirek bû. Hêsan jî nebû. Pêdivî bi hewldan, fedekarî, baldarî û berpirsyarî hebû. Heta demekê Hamilî Yildirim koma me ya perwerdeyê birêve bir. Di perwerdeyê de destpêkê beşek ji pirtûkê ya hatî diyarkirin dihat xwendin, paşê me nîqaş dikir. Ji bilî Hamilî, hemû jinên ciwan bûn. Piranî jî ez, Kabîre, Cemîle, Tirkan, Ayten û Nurheyat amade bûn. Xwendin û vegotina Hamilî jî ne zindî bû. Ji ber perwerde dida komek jin teng dibû û şerim dikir. Carê komên me têkilhev jî dibûn. Lê ne hewce bû her kom mîsoger jin û zilam têkilhev bin. Ji bona bala derdor jî nekişîne wisa guncav dihat dîtin. Bes carê têkilhev jî baş bû. Ji ber nîqaş dewlemendtir dibûn. Weke din jî asta hevalên jin a teorîk baş bû, heta hinek pêşketî bûn. Hamilî serê xwe li ser pirtûkê ranedikir. Tenê dema mafê axaftinê dihat xwestin, an jî dihat dayîn dinêriya. Ev şerimkirina wî di nava me de bibû mijara henekan. Carê me di nava xebatê de jî ew rewşa wî bi îşaretan

şanî hev dikir. Herî zêde jî em piştî xebatê serbest di-axivîn û me şîrove dikir. Bê guman nîqaşên xebata me jî erênî derbas dibûn. Heta ku baş ne dihat fêmkirin, em derbasî mijarek din ne dibûn. Hewldan û berpirsyariya mereq, xwestek, hînbûn, serwextî û zanîna di vê mijarê de balkêş û xala herî bedew bû. Di rêhevaltiya wan koman de serwextiya hînbûn û hînkirinê, şoreşgeriya kamil û biryardar, bedewiya ruhek hevbeş ava dikir. Ango bi zanebûn hatina cem hev, di zanebûnê de kûrbûn hebû. Mezinbûn û giraniya dozê rakirin, aliyên wê yên zehmet bi vê bedewî û biryardariya ruh ve hemêzkirin, xislet, xweserî û hewcedariya şoreşgeriyek wisa bû. Bingeha şoreşgeriya welatparêz jî wisa ava dibû.

Li mala me çend caran xebatên me yên perwerdeyê fişkilî. Neçarbûm ên werin malê, ez pêşwazî bikim. Dema hinek jî mal bûna, yekser bal dikişand. Deriyê malê li ser cadê bû. Ketin û derketinên malê ji aliyê derdor ve baş dihat dîtin. Herî zêde jî bala dayîka Tonton dikişand. Lewma herî zêde jî ew rehet dihatin, dixwestin bizanin bê kaç çi heye. Dema ew dihatin me karê mêvanperwerî dikir! Ev jî bêhna me teng dikir. Me bi zorê hinek derfet ji xwe re ava kiribûn ku em binirxînin, ev jî vala derdiket. Me jî tehemula vê nedikir. Weke din jî her çendî me nêzîkbûnek cuda raber bikira, ew dîsa jî di ferqa karên me de bûn. Çend caran gotin mal bûye weke komaleyekê, ne diyare dî tê û diçe. Acizbûnên xwe jî diyar kiribûn. Ji ber êdî min weke berê ji Metîn re jî name ne dinivîsand bala wan dikişand. Weke dibêjin; “êdî zengilê xeternakiyê lê didan!” “tehlike çanları çalıyordu artık!”

Piştî çend xebatên perwerdeyê, vê carê berpirsê perwerdeyê, yeke ku bavê wê li Dêrsimê dewlemend bû. Zarokên wan zêde û malbat qelebalix bû. Çend kes bi mamoste re, hinek jî bi komî ji PDA derbasî nava me bibûn. Kesayeta her yeke ji wan cuda bû. Dema mala me zêde eşkere bû, me zêdetir xebatên perwerdeyê li mala wan dimeşand. Ji ber kolana ew lê diman, kolanek çîna navîn ên Dêrsimê bûn, bêdeng bû. Piranî malbatên mutahît û xwediyên maxazan li wir diman. Weke din jî ji ber sê-çar keçên ciwan ên malê hebûn, kombûna ew qas keçan jî zêde bal ne dikişand. Dîsîplîna xebata me zêde bû. Di demjimêra wê de destpê dikir. Dema navber dihat dayîn, cixare dihat kêşan. Pêvajoya destpêkê di navberan de çay jî dihat vexwarin. Paşê ev rabû. Ji ber wextê me winda dikir. Rêk û pêkbûna vê xebatê jiyana me ya din jî bandor dikir. Ev jî terbiyek bû. Em fermî rûdiniştin. Me mafê axaftinê digirt, em wisa di-axivîn. Kesî xwe ferz nedikir, an jî axaftin û nîqaşa bi wî rêbazî nedibû. Sazûmaniya me hewcedariyek, lêwaza jiyanekê, giraniya xebat û girîngiya xebatekê rave dikir.

Kom her diçû qelebalix dibû. Koma me her roj bi hêz û zane dibû û digiha astek girîng. Di heman demê de em koma yekem a jinê bûn. Bi demê re em ser kêmasiyên xwe yên rojane derdiketin de çûn, me rexne dikir û destwerdana şaşiyan dikir. Serwextiya komê ava dibû. Di nîqaşên me yên bi komên çep ên din re de, her tim ji bona peywendiyên me yên bi wan re hişyariya nêzîkbûnên ku divê em raber bikin dihat kirin. Diviyabû em nêzîkbûnên tehrîk dike, dûr dixe raber nekin, nebin lîstoka hewldanên wan ên tehrîk û provakator, ji bona em

mirovan qane bikin, divê em pêwendiyek qezenckirinê esas bigirin. Her carê jî hişyariyên bi vî rengî dihat kirin.

Lê komên din rêbazek ecêb hilbijartibûn. Ev jî rêbazek ji şoregerî dûr bû. Qedexe kiribûn ku kesên dilxwaz û sempatîzanê wan in, bi me re nîqaş bikin. An jî qedexe kiribûn ku hevalên me yên bi bandor di-axivin û nîqaş dikin guhdar bikin. Asteng dikirin. Li gorî xwe nêvengên ku bikaribin nîqaş bikin hêza xwe ya demogojî raber bikin dihilbijartin. Hewl didan derdorên wisa bi xwe ve girê bidin. Dixwestin naverastên nîqaşên wisa xirab bikin, ev jî pir kirêt bû. Lê ti rêbazî ne dikariya ku berfirehbûna bîrdoziya me asteng bike. Biryardariya komê, bê ku ti astengiya binase ketina nav, baweriya bi xwe, coşa heyî, her tişta şaş, kevin û neyênî dişikand û derbas dikir. Şer jî heba, provakatorî jî heba, bê tehemulî jî heba, ne dikariyan me asteng bikin. Kesî ne dikariya li dijî vê bawerî û vînê raweste û asteng bike. Em bi vê bawer bûn û me jî li ser vî bingehî têkoşîna xwe dimeşand.

Bi rastî jî weke hêzek îlahî bû. Dilxwaz û sempatîzanê vê komê yên herî ji rêzê jî, bê tirs û bi eşqek mezin diketin nava her derê û dikariyan bi her kesî re nîqaş bikin. A ku her mat jî dikir ev bû. Ne navek hebû, ne rojname, an jî kovar û ne jî komaleyek xwe hebû! Lê helwest û nêzîkbûnên tevan yekpare bû. Li ku derê bê mafî heba, li ku derê şerek hewce ba, li ku derê xwedîderketinek hewce ba, parastinek hewce ba, li wir xwe dida der, ev jî giyanek cuda dida avakirin. Destpêkê digotin; "sê-pênc Kurd in" û bi wan dikeniyan.

Paşê gotin şoreşgerên Kurdistan û Apo'yî.

Her ku pêşve diçû, hejmara me jî zêde dibû. Zanebûna Kurdewarî û netewî pêş diket. Pîvanên şoreşgerî, rastiya welat-netew-gel dihat lêpirsîn. Ya din jî gelo dijmin kî bû? Kî bûn? Dê li dijî wan têkoşînek çawa bihata meşandin? Dê me bi kîjan partî, artêş û eniyê ev pêk baniya? Dê ev pirs bi şêwazek zelal, di şoreşgeriya mezin a vê koma biçûk de raveya xwe ya rastî diyar bikira. Yê bi vê dihesiyan, kêm jî ber ev rastî û xweseriya destpêkê ferq dikir, lez ber bi vê zemînê ve dihat.

Min hêvî, bêrîkirin û rastî kirin para rêwîtiya xwe

Di vê pêvajoyê de jin û keçên ciwanan zêde tevlî dibûn. Dibistan, dibin dibistanên şoreşgeriyê. Tevlîbûn jî ji vir destpê dikin û her diçe berfireh dibin. Ji ber ji destpêkê ve tevlîbûna jinan hebû, xerîb nayê dîtin. Bi taybet li Dêrsimê di vê mijarê de ti pirsgirêk tine bû. Li ser jinê çewsandin û ew ji zilam cihekirin tine bû. Heta zarokên keç zêdetir dihatin hezkirin. Lê ev kar cuda bû. Ji ber tevlîbûna siyasetê ji bona zilam jî xeterî bû. Lewma şoreşgeriya jinê qet ne dihat hizirîn. Di vê mijarê de nirxên kevneşopiya civakî de guhertinên cidî rû didan. Girêk vedibû û her tişt ji hev vedibû. Bes vê carê jî xwîşk û bira, hevjîn, dergistî, evîndar tev bi hev re di nava komên heman bîrdoziyê de li hev kom dibûn, peywendiyên feodal ên heyî jî têkil nava tevgeran jî dibû. Kesî jî hewldanek ji bona sererastkirina van ne dikir. Tenê koma me peywendiyên feodalî ne dipejirand û bi wan re têdikoşiya. Her ku bandorên wisa bi girêdanên şoreşa nû pêş dikevê ve dibûn yek, weke xirabûnê ne dihat dîtin. Lê belê, ger di navê de pîvanek neba, zêde xeternak dibû.

Koma me ya şoreşger ku bi navên ‘Netewparêz,’ ‘Rizgarvanên Netewî’ an jî bi kurte nav ‘UKO’ dihat nasîn, hê di wan deman de bala dijmin kişandibû. Êdî gel jî xewaziya heyî didît. Dilsozî û baldariya gel li hember koma bedew û bi coş a li hember polîsan helwestên şoreşgerane û radîkal derdikeve, di têkoşîna xwe ya bîrdozî de bi biryar e, di cihê xwe de nasekine, zêde dibû. Nav û dengiya wê ne girîng bû. Lewma gelek caran dema dijûn jî ji wan re dikirin bal dikişand bê ka çima li hember wan nêzîkbûnek wisa heye. Heta gelek tevger û derdorên xwe şoreşger bin av dikirin, UKO ‘ji Tûrkêşan xirabtir’ pênase dikirin. Propagandeya reşkirinê didan pêş. Ma çi qas rast bû welatparêziya şoreşger bi çeteyên kujêr ên nirxên herî bilind ên mirovahî û gel bi polîtîkayên paşverû û nijadî ve tine dike, ji bilî vê ti armanca wan tine, di nava înkarkirinek reşbînî de ne, yek digirin dest? Heta gelek ji wan ji gotinê xwe jî ne bawer bûn. Êrîşên wisa bingeha xwe ya teorî û bîrdozî tine, ne li gorî şoreşgerî û çepgiriyê ne, rastiya nîtelîka komên heyî baştir û zûtir derdixist holê.

Van koman di hinek pênaseyên teorîk de hinek tiştên cuda digotin tev, li dijî bîrdoziya netewî û parazvanên wê zû dibûn yek. Lê di nava wan de jî yekbûnek bi rêgez tine bû. Heta dawî bê rêgez û bê pîvan bûn. Rojane dijiyan û peywendiyên wan li ser kêliyan bûn. Lewma pir hêsazn jî êrîşî hev dikirin. Di rastiya cewhera pêşbaziya li ser navên Denîzan, Mahîran û Brahîm Kaypakkaya dikirin de, êrîşek li dijî kevneşopiya wan jî hebû. Ji wan rastiyan dûrbûn, parçekirina nirxên şoreşgerî û belavkirinek hebû.

Di 6’ê Gulana Denîzan hatî darvekirin de li dibistanan from hatibûn kirin. Li dibistana amadeyî em hemû tevlî bûn. Ji ber me ne dikariya em bipejirînin ku ew kom van mirovên mezin û egîdiya wan tenê ew xwedî derdikevin xwe bidin nîşan û wê rojê bixin bin yekdestdariya xwe de. Girêdana bi wan ve, xwedîderketina rastiya gel, nirxên şoreşgerî, têkoşîna wan bû. Bersiva herî manîdar a ji diruşmaya “Bijî Têkoşîna Gelên Tirk û Kurd!” Re, Şoreşgerên Kurdistanê bi binesaziya xwe ya teorîk û bîrdozî, rêxistinbûn û pêngavên dîrokî ve dan. Jixwe fêmkirin, bîranîn û pêkanîna wan jî bi vî rêbazî dibû.

Piştî em tevlî forma li dibistana amadeyî bûn, rêzgirtin pêk hat û axaftinan destpê kir. Piştî axaftinan diruşmayên “em 6’ê Gulanê jibîr nakin! Denîz, Hisên, Yusuf bêmirinin! Bimire dîktatoriya faşîzan! Hat qêrîn û em belav bûn. Lê Rizgariya Gel dixwest xwepêşandanê bikin. Lewma dilsozên xwe li kolana Daxê civandibûn. Çalakiyên li vê kolanê yên wan bûn. Heta digotin; “kolana Dax ya me ye.” Ji ber piştî forma dibistanê formek din ava kiribûn, her kesî bertek raber kir. Ji ber kolanên Dêrsimê ji navendê ne dûrin, dema komek qelebalix diqîre ji her derî ve tê bihîstin. Lewma dema mîtînga li kolana Dax jî diruşma hatine qêrîn, deng bihîstine û polîsan kolan dorpêç kiriye. Lê mixabin dema polîs hatine, yên pêwîst bû pêşengiya gel bikin revîne, jin û arok li holê mane. Polîsan têra xwe li wan daye û belav kirine. Herî zêde jî li pey ciwanan diketin. Di kêliyek polîs li pey ciwanekî diketin de, liqay me hatin. Ji bona em jî rewşa heyî fêm bikin, derketibûn ser cadeya jorîn. Hinek jinên cîran û mitirb jî bûyer temaşe dikirin. Dîsa hinek mirov jî li ser şaneşînan û şibakeyan re temaşe dikir.

Hinek jin bi ser ciwanan de diçûn xwe aciz dikirin. Hinek ser polîsan de diçûn û dûjîn dikirin. Lewma polîsan êrîşî jinan kir. Jinek girtibûn dixwestin bi darê zorê bibin. Min ew nas dikir. Cîrana me bû. Navê wê Elîf bû. Min yekser destwerda. Hewl da xaltîka Elîf ji nav destê polîsan derbixim. Vê carê jî polîsan êrîşî min kir. Ji her alî ve xaltîka Elîf, jinên mitirb û her du xwîşkên min ên cêwî ez girtibûm, ne dihiştin polîs min bigirin. Ji aliyekê ve jî xwîşkên min digiriyan. Xaltîka Elîf ji aliyekê ve ez dikişandim, ji aliyek din ve jî diqêriya; "werin min bibin, ma hûn ji vê keçê çi dixwazin. Ti eleqeya vê keçê bi tiştekî re tine ye."

Ez jî bi xwîşkên xwe yên digiriyan ve mijûl dibûm. Bi hêceta ku wan bêdeng bikim, paşve diçim. Polîs li hember bertekên xaltîka Elîf û mitirban mat mabûn.

Xaltîka Elîf, jinek jinebî bû. Zarokên wê yên mezin li Almanya kar dikirin. Jinek yeman bû. Piştî ku pey polîsan ket, vê carê jî bela xwe li min da. Got; "zû biçe mala xwe, tu keçek bi dergistî yî, vê saetê li derve negere." Paşê jî çû mala xwe. Ez jî li ser daxwaza mitirban bi xwîşkên xwe têkve çûn cem wan. Mitirban sifreyek li erdê amade kirin, piştî me xwarina xwe xwar, demek dirêj em axivîn. Gotin; 'di pevçûnên navbera şoreşger û polîsan ên li Erzêromê de jî şoreşgerên li kolanên xwe parastine.' Lê ji zilman aciz in.

"Zilamên ku ji şaneşînan temaşe dikin tirsonekin. Ma ev kuçik kî ne, dibêjin emê cardin 38'an bînin serê we.' Ji tirsonekiya zilaman cesaretê digirin. Me biryar girtibû ger êrîşî te bikiran û tu bigirtan, dê me êrîşî wan bikira tu ji nav lepên wan rizgar bikira. Baş e ku tu nebirin."

Paşê mijar hat ser şoreşgeriya jinan, me got ger jin bikaribe kîna xwe li dijî dijmin baş birêxistin bike, dikare gelek tiştan bike. Me behsa yemantî û jêhatiya jinên mitirba kir. Ji kevin de heyrana mitirba me. Ew jî dihatin cihek nêzî gundê pîrka min wan, konê xwe vedidan. Konê xwe li qiraxên Munzurê, li nav darên sipîndar û biyan, li nav wê şînkahiya bedew vedidan. Zilamên wan piranî karê destan (kalaycilik) dikirin. Hemû gundên derdor firaxên xwe yên çingo tanîn wir, rast dikirin. Heta karê firaxan diqediya li wir diman, paşê konê xwe dibirin cihek din.

Jinên wan jî tişt kom dikirin. Zarokên wan li nav tûrik pişta wan, biçûk mezin digeriyan, tiştên weke ard, rûn, genim û her wiha kom dikirin. Li gorî rewşa madî ya cihê lê digeriyan tişt dixwestin. Debara xwe jî bi van tiştên ku kom dibû dikirin. Carê pîrka min zivistanê malên kul i gund vala bûn dida wan û ew diparastin. Pîrka min bi vî rengî hejmara gund jî zêde dikir. Jixwe biharê jî xwezayî gund qelebalix dibû. Yên li bajaran jî diman, di pêvajoya havînê de wextê xwe li gund derbas dikirin. Jiyana mitirban ji bona min weke jiyanek azad bû. Li gorî dilê xwe digeriyan. Ne xwecihî bûn. Her tim dilê min bi xizanî û biçûk dîtina wan dêşiya, lewma min her tim ew dibirin malê mêvandarî.

Rojekê min cardin komel mitirb qelebalix biribû malê û sifreyek mezin raxistibû. Hêj ew li ser sifrê bûn, dayîka min jî ji mêvandariyê vegerî. Çawa ew hat qiyamet rabû. Li pêş wan ti nema j imin re negotî. Bi vî rengî bikaranîna malê, weke dijminatiya malê nirxandibû. Heta zêdegavî kir û got; “ger tu pir dixwazî ez te bidim wan biçe!” Hem ji acizbûn got, hem jî di pêvajoya pey re her tim weke pêkenok dubare dikir. Min jî

digot; “ezê biçim, ma çiye.” Me hinek nas kiribûn, lewma her tim dihatin. Vê carê jî ji ber dayîka min ne li mal bû, min hinek ji cilên dayîka xwe, xwîşkên xwe û yên xwe jî da wan û birêkirin.

Jin û keçên mitirban gelekî xweşik bûn. Bedewiya hinekan a di nava wan kirasên qetiyayî û xizaniyê de mayî, mirov mest dikir. Bi taybet keçên ciwan baştir li xwe dinêriyan. Her du aliyên biskên xwe bi dehan toqeyên rengdar dixemilandin. Biskên xwe ba didan û xemlek xweşik ava dikirin. Laşê wan esmerek bedew bûn. Carina jî hinarkên rûyê wan ji sermaya hişk qalik girtibûn. Lê dîsa jî rakêşwer bûn. Bes bi her tiştê xwe ve xwezayî bûn. Jixwe xisleta wan a baldariyek ava dikir jî ev bû. Gotibûn; “em her tim li pişta we ne.” Lê belê berjewendiyê wan jî hebûn. Ne çarenûsek bû. Ma heta dawiya jiyana xwe ne dikariyan ji xwe re tiştan kom bikin. Dibe ku ji bona demê pêş ev qas ne dihizirîn, lê dê wan jî li nav Kurdistana Serbixwe azad cih bigirta. Hem ev ne dişibiyan mitirbên din. Min li Almanya jî mitirb dîtibûn. Ew jî cuda bûn. Rewşa jiyana wan û nêzîkbûnên civakê yên ji wan re ne ev qas paşverû bû. Jiyanek li gorî wan xweser hebû. Lewma bi van xweseriyan ve naskirina wan ne ehmet bû. Min ji wan jî hez dikir. Ya rastî mitirb ne azad bûn. Ma dê çawa azad ban? Bes ji derveyî quralên civakê bûn. Qîma xwe bi prala heyî ne tanîn. Quralên wan habûn û ew pêk tanîn. Tişta ku bala min kişandî jî ev rastî bû. Sazûmaniya ku pergal, an jî malbatê saz kiriye, bertekên min ên beramber aliyên ku mirov dixist tengezariyê, dihişt ku ez heyrana ‘azadiya’mitirban a li gorî wan bim. Tenê ji vî alîve jî be, ez hêjî di jiyana wan de bedewiyê dibînim.

Li vir parantêzek nû vedikim

Min rojê tev qet ne nivîsand. Nikarî binivisînim. Min ne karî wê xwestek û zewka tê xwestin bijîm, da ku bikaribim binivisînim. Ez dixwazim paşerojê di tama wê û xwezaya wê de bijîm. Divê ew bedewiya ruh hebe, da ku ez binivisînim. Nexwe dê bibe karê zorê û wê ti naverok dernekeve. Ger bi bedewiya ruhê roja îro, bi hmû çoşa wê ya watedar ve ber bi paşerojê ve biherikim, dê nivîsa min de jî aqilmendiyê pêş bixe. Ez dîsa îdîa dikim, ku ji bona nivîsandinê wext gelekî girîng e. Her wiha ji bona ez bikaribim demek wisa dirêj binivisînim jî, hê zû ye. Diviyabû min ev roj bi ruhek dil şikestî ne nivîsandiba. Bi rastî jî ez çima paşeroja yeke ku ew qas bûye muxatabê nîqaş, gotin û pênaseyan, dinivisînim? Gelo dê hinek din çi bikin tiştên min jiya ne? Jixwe îro têra xwe li ser min di-axivin. Hem jî di asta herî xirab de behsa min dikin!

Gelo wê ti wateya ku pêşerojê min cuda bibîr bînin hebe? Na. Ev e tişta ku ez qet qebûl nakim jî ev e. Jixwe dîroka min hatiye nivîsandin û axaftin. Dibe ku piştî vê, an jî roja paştir gelek tiştên xweşik û erênî jî werin gotin û axaftin. Lê mixabin, dê ev tiştekî ne guhere. Ji ber gelo dê îro bandora tiştên ku min jiya ne û êşa wê ya herî kûr were derbaskirin? Dê min rehet bike? Gelo çi qas rasteqînî ye ku mirov bêje, ‘bila giyana min ji dojehê re be, hinek din ji xwe re ders derbixin bes e!’?

Ango niha, Ey Mirovahî! Ey Dîrok! Ey Rêhevalên Min Ên Bedew! E ev im. Dîroka min di nava vê dîroka mezin û bêhempa de ye. Ez ji wê cuda nebûm. Her çi qas kêm û kurtî û şaşiyên min hebin, ez bi vê şoreşê re dimeşim. Ez nabêjim ‘ min ev qas tiştên xweşik jiyan kir, min wisa fêm bikin’. Lê

divê rastiyên heyî neyên erzankirin. Ma çi qas raste ez xwe derve de bigirim û wisa hinek din kêfxweş bikim û bi coş bikim, wisa xwe bigihînim hinek encaman? Ma çi qas rast e, ez xwe soyut bikim? Ger ez her tiştê tê gotin erê bikim û her tiştê hêjayî min tê dîtin qebûl bikim, dê hinek din çi qasî kêfxweş bike? Dê ev bibe sedemek xwe paqijkirinê? An jî weke tê gotin dê bibe 'derketinek' nû? Tam berovajî vê ti tiştek ku min jiyan ne kiriye, hîs nekiriye û hez nekiriye, ne xwezayî dibe û ne jî dikare bibe çavkaniya rastiyan!

Wê demê ma dibe dîroka kes ji tiştên hatine nivîsandin û vegotin wirdetir be? Ger wisa be, ji ber gelek tiştên fermî û derveyî fermiyetê hatine gotin û nivîsandin hene. Di vê manê de rast e. Dîrokek min a zêde ecêb û dewlemend heye. Lê ev ne hemû tiştên ku hatine jiyînin. Ne ew bi xwe ne. Her çendî di van nivîsan de gelek rastî, erênî, an jî xwe gihandina zimanek baş û tiştên neyênî hebin, lê dîsa ne rastiyên hatine jiyîn bi xwe ne.

Evder pir girîng e. Dibe ku di nava yekbûnê de ziraviya parçe, an jî jiyana kes bi tena serê xwe tiştekê rave neke. Lê ger bi wê yekbûnê re di nava girdanekê de be û sedema wê hebûnê ew yekbûn bi xwe be, divê weke heyî di nava wê yekbûnê de were destgirtin. Her wiha divê xweserî û taybetbûna wê jî rast were parastin. Divê di nava parçê de jî, yekbûn mîsoger esas were girtin. Ger dê girêdanek diyalektîk were sazkirin, divê ev her du nêrîn jî werin destgirtin. Ger dê tiştên hatine jiyîn bibin mijareke wêjeyê û dê jiyan bi hostatiyek hunerî ve were watedarkirin, divê mirov ji her alî ve bikar bîne. Bê guman divê ji bona vê jî nêrînek çînî hebe. Ger ji vê were qutkirin, dê bûyerên civakî jî rast neyên nirxandin. Her wiha divê rastiya

civakî jî di nava çembera siyasî de were nirxandin, da ku realîta kes jî bikaribe rol bilîze. Nexwe dê berovajî vê xwe redkirinek derbikeve holê.

Ezê hewl bidim tiştên ku min jiya ne binivisînim. Lê belê, aliyê min ê jiya ye, paramparçe ye û bi nakokiyan ve dagirtiye. Dîrokek têkilhev e! Belê, niha ev şer li dijî kî ye, dijî çi ye û di encamê de tişta hatiye rizgarkirin çi bû? Gelo ev cewazî hat kirin? Di qonaxek wisa de derket holê ku êdî min bi xwe jî nikarî erdemtiya rizgarkirina hinek tiştan bidim raberkirin. Kevneşopiyek Samurayên Japonî heye: ew jî di parastin û bilindkirina wê erdemtiyê şansek e. Min ne karî wê şansê jî bikar bînim. Ya rastî mafê kirinê, kêliya rizgarkiirna onura wê rast, di wextê û demê wê de esas girtin gelekî girîng bû. Ji ber ez bi sedemên hebûna xwe ve rû bir û hatibûm hiştin. Her sedemek ez wisa bi şer û doza ez ava kirim û hêza jiyanê dayî min re ji eniyek dijber ve rû bir û anîm, weke xençerekê bûn. Ya girîng jî min xwe pir hêsan dibû bin wan darbeyan. Hinek nirxên bingehîn zêde hatin hincirîn. Zêde bê teşe ketin. Min ne karî hatina vê astê asteng bikim. Belê lewma fêm kir ku piştî vê qonaxê min kevneşopiyek nêzîkbûnek bi onur dimeşîne heq ne kiriye.

Niha jî tam berovajî vê, ruhek bi baweriya divê ez di nava şerê li hember kevneşopiyek ecêb a di nava me de nû pêş dikeve, bi pîvanên şêwaza partî re nabe yek re, çeka xwe rakim heye. Ji ber jiyan bi xwe jî şerek herî mezin e, zîndewariyê ava dike. Lewma li kêleka vê ew nêrînên kum in tevlî tiştekê nake, dema dibêje min; “roman binivisîne, jiyana xwe binivisîne, dewlemendiya jiyana xwe ragihîne!” Bi êşek kûr min dide kenîn.

Dîsa jî reşbînî nanêrim. Zêde bi ser aliyên zînde dijî ve diçim. Tevî her tiştî, min dil, mejî, zanebûn û xeyalên xwe ji mezinbûn û bedewiya jiyanê re vekiriye û ji dil hemêz kiriye. Ji ber a min dide jiyîn ev e. Ez dev ji cîhana xwe ya xeyalan bernadim. Berovajî zêdetir pêş dikeve. Heta ez îro ketim nava gera cîhanî. Dema min ji hevalan re vedigot, bi dengê bilind dikeniyan. Ji ber hinde bawer kiribûn, pirs jî ji min kirin. Ez jî heyfa êşa ku nikarim binivisînim, ji ger û jiyînê derdixim. Ya rastî ev jî daxwaz û bêrîkirinek bû. Min berî wê gelek caran di hişê xwe de xeyal kiribû. Bes dîsa di asta zeyalû fikir û hest de ma. Li hemû cîhanê gerîn, bi tevgerên jinê re girêdanek ava kirin, ew nivisadinê ve, xeyalên min ber bi jinên Efrîka, Zellanda û amazon ve dirêj dibe.

Mizgîn:

“Gelo, cilên ku jinên Amazon li ber xwe dikir çawa bûn?”

Min jî got;

“Jinên Amazonî zêde bedew in. Bi gelmperî gewr in û di rengê genimî de ne. Laşê wan pir zînde û esmer (bronz)in. Laşê wan ji nîvî ve tazî ye. Paçên ji rêzê, heta paçên bi şax, gul û xwe berdayî ve, bi her paçê xwe dinixwimînin. Hinek ji wan heta noqê, hinek ji wan heta ser memikan, hinek ji wan jî milek xwe dipêçin. Ango cihên din tazî dimînin. Memikê gelek ji wan tazî ne. Li gorî hinek din dîmenek zêde erotîk e! Bes di rastiyê de memik pîroz in. Ew weke amûrek cînseltî lê nanêrin, an jî wisa fêm nakin. Xisletek zêde rehet, xwezayî û bedewî, hilberîna jinê rave dike bidest xistiye.”

Min ne karî nêrînên xwe temam bikim. Ji nişkê ve Bahar xwe avêt nav û got; “li gundê me jî jinan li naverastê zarokên xwe şîr didan, kesî cuda li wan temaşe nedikir.”

Min domand; “jinên Amazonî afirîner in. Her karî dikin. Kêrhatina wê ya di nava civakê de wisa derketiye holê. Rêz tê girtin û tê hezkirin.”

Ew zîndewariya lezgînî ya Mizgîn di her nêzîkbûnê wê de diyar dibe. Ew jî aliyên jiyanê yên tengav dide der.

“Di naveroka dahûrînên Rêbertiyê de jî gelek caran derbas dibe. Behsa jinên Amazonî dike. Gelek caran digot, ‘qet nebe bi qasî jinên Amazonî bin’, nexwe ji bona vê ev gotin dikir.”

Paşê jî weke dengek ji germahiyê bêhna wê teng bûye got;

“Ez wî-wê nizanim. Bes xweziya me jî weke wan cil li ber xwe bikira. Cilên wan çi qas rehet in. Ev cil me dixeniqînin. Çi qas xweş bû em jî azad ban, em çi bikin, gelo em jî bibin Amazonî? Ev jî sohbeta me rengdar kir.

Min jî tam xwe di nav de winda kiriye û vegotinên xwe berdewam dikim. Weke kum in her tişt zindî jiya ye dibêjim. Weke ku ez bi wan jinan re li nava çîtên bi navê bambo yên xweser li wê herêmê şîn tên, li nav daristanên tarî, qiraxên behrê, li nav xweşikbûna darên Palmiye de bi lingê tazî, an jî bi sendelan ve digerim vedibêjim. Paşê dewam kir;

“Min hê ji we re behsa jinên Hindîstan û Pakîstanê ne kiriye. Hinek tiştên me û wan dişibe hev. Ji aliyê fîzîkî ve gelekî dişibin jinên Kurdistanê. Dibe ku em dibin wan. Lê bi rastî jî min ji Îndra Gandî zêde hez dikir. Heta niha jî rêzdar im û heyrana wê me. Herî zêde bi hêz wê rêzdariya dîmenê jina polîtîk b imin re da avakirin. Di nava Bloka Baxlantisizan de

ya herî zêde polîtîkaya têrkar meşandî ew bû. Sîmgeyek bû. Nûnera jina Asya Rojhilat bû. Cil, axaftin û rêgezên wê kevneşopiyek ava kir. Bes herî dawî jî bi mirinek trajîk jiyana xwe jidest da. Mirina wê jî bandorek giran li ser min kir. Benazîr Butto hinek cuda ye. Her çendî ji aliyê şêwe ve nûnertiya hinek tiştan bike jî, ekolek hevkar bû. Hûn dizanin ku jina hev kar jî zêde naye hezkirin. Mizgîn dîsa ne sekinî got;

"Leyla Zana hinekê dişibe Benazîr Butto, ne wisa?"

Zelal:

"Ger PKK neba, Leyla Zana ew qas dernediket pêş. Kesê jî ew nas nedikir. Temam xweseriya wê heye. Lê têkoşîna me ew kir nirxek."

Ya rastî Mizgîn bê ku aliyê siyasî bihizire şibandibû. Hinekê jî behsa libandina fîzîkî kiribû. Lê em zêde wê mijarê ve mijûl nabin. Her kes mereq dike bê ka dê ev gera min a xeyalî li kur xilas bibe. Didomînim.

"Ez çûm Kûba û Havana jî. Min Castro jî dît. Min ew îxtiyarê weke dêwekê bedew jî hemêz kir. Min ji rihên wî ramûsî. Evîna wî ya sosyalîzmê, zelalî û bedewiya dil û mejiyê wî, di fîzîka wî de jî diyar dibû. Hêjî zînde li ser piyan, hêjî xwedî enerjî ye." Bi vê gotina min re cardin Bihar ket navberê;

"Ma ne Castro zilamek zêde tolaz e!" Çawa ev gotin ji devê wê derket em hemû bi dengê bilind keniyan.

Min got; "çi eleqeya gera min bi tolaziya wî re heye?"

Bihar hinekê jî tengav bû û got;

"Hiii. Ma ez çi dizanim, min wisa fêm kir."

Dibêjin ‘kerr nabîhîse, ji ber xwe nav lê dike’, ji ber guhên Bihara me jî nibihîse, her carê bi hinek gotinên dibêje ve lihev dixe. Herî zêde jî Mizgîn bi kelecan û acizbûnê ve bersiva wê dide:

“Madem guhên te giran dibihîse, hewl bide fêm bike, paşê bi-axive. Nexwe dê tu her carê şaşiyek din bikî.”

Belê, xeyalek rêwîtiyek xweşik bû. Ger wisa bibe, tiştên bedew ku gengez in pêk were hizirîn û xeyal kirin, hêz dide. Xeyal û rastiya di wateya jiyan û di wateya azadiyê de xwe gihadina her tiştî, tê hezkirin. Her du jî bi hev re jiyîn hîn xweşiktire. Dibe ku ev ji bona hinekan bê wate ye. Dibe ku ji bona hinekan weke xirabûnek ruhî ye, an jî weke rewşek pêxirtengî were binavkirin. Lê na! Ne yek ji wan e jî. Li şûna ku xwe di nava êşan de bifetisînim, kelecan, coş û herikbariya jiyanê pir xirab bidim rawestandin, her çendî hest û xeyalên ji rêzê û hêsan bin jî ezê êşan veguherînim bedewiya jiyanê û di jiyan esas girtin û ferzkirin vebijêrka sereke ye. Lewma hinekê jî sira min a jiyanê di vir de ye.

Bedewiyên wê zêde ne. Tije ne. Kes nikare ji bona hemûyan ambargo dane. Li dijî her cure nêvengên pîvanên paşve dikişînin, şêwazên gelekî xeternak ên şêlû dikin û li ber hev didin û nêvengên tên têkilhevkirin înat, hêza jiyan û hêza li ser piyan mayînê gelekî girîng e. Bi teqez ez ji ciheke wê ve digirim. Xwe bi wir girtinê ve dixwazim bigihînim. Dibe ku ez di astek teng û takekesî de dimînim, bes dilsoziya vê ya bi qasî misqalekê jî mirovan pir xurt dike, daku bikaribe li ber xwe bide. Ev jî têkoşînek e. Lê divê mirov hevsengiya vê baş saz bike. Ji ber carina jî êş ser dikeve. Bes dema mirov yek kêliyê ber bi wê ve diherike, zerarê mezin dide. Ser û çavên min

diteqin! Bes dê êdî wisa nebe, ji ber min rêbazê wê dît. Hevala Zelal jî dixwaze hînî sirê vê bibe. Ez jî nabêjim û delaliya xwe dikim. Ji xwe re çûm meşê, bi hişkayî pêl axê dikim. Hêvî û bêrîkirinê tevlî rêwitiya xwe dikim û hewl Didim xeyal û rastiyan bînim cem hev. Ger şer û têkoşîn bû şêwaza jiyanê, dê teqez li wir a herî rast û herî bedew ser bikeve.

Parantêzê digirim û berdewam dikim.

Min hêrsa li dijî şaşiyên hinek din bi xwe re diteqand

Pirsgirêka xwirtûkan derdikeve. Zehmet bû mirov li Dêrsimê her pirtûkê bibîne. Hevalan ji bona xebatên perwerdeyê, an jî xebatên perwerdeya kesane rêbazek nû dîtin. Xeter bû ku mirov van pirtûkan li her malê jî bicih bike. Ji ber parastina malan tine bû. Jiber di serî de malbatan pirtûk qedexe dikirin. Polîsan yekser qedexe nedikir. Lê her tim navarastek wan bike hêcet jî ava dikir. Bawerim herî zêde jî pirsgirêka pereyan hebû. Ji ber carê sibehê zû didît hevalan kofteyên savarê bi çend çiqilê bexdanozan xemilandine, dixistin nava nan û difiroşin. Ev ji aliyekê ve kedkariya proleterya rave dikir. Di heman demê de rêzdariyek mezin jî pêş dixist.

Milek din ve jî pirsgirêka pereyan zêde bû. Diviyabû pêdiviyên bingehîn bihatan pêşwazîkirin. Hisên Gûngoz cixareya wî di dev de, di demek kin de kofteya nav nan amade dikir û li ser tepsiyan rêz dikir. Ev şêwaza jiyana hevalan ji bona me tevan peyam bû. Ji birayên min Hesen û Elî jî av difiroştin. Meto jî masî digirt û difiroşt. Alabalik masiyek pir xweş û biha bû. Meto hem difiroşt û hem ji bo xwarina me jî zêde tanî. Her wiha bi karê kehrebê ve jî mijûl dibû. Karê

temîrê dikir. Hemaltî dikir. Bi taybet di firotinên li kamyonan û daxistina baran de kar dikir. Pereyên ku li van deran dihat bidestxistin, dida hevalan. An jî pêsiviyên hevalan dihat kirîn. Ev kar û tevkarî bi dilxwazî dihat kirin. Her tişt bi hev re parvekirin, an jî bi pergal, her çendî bi quralek fermî nebe jîtevlî şêwaza jiyana komê bûyîn û xwe parçeyek ji jiyana komê dîtin pêş diket. Qîmeta her hevalê/a ku dihat wê malê û diçû hebû. Hemû cîhana me û baldariya me ew bûn.

Rojekê dema ez ji dibistanê vedigerîm min li kolan û malê tiştên ecêb dît. Di destpêka kolanê de ji her du cêwiyên me Nesîbe bi kelecanekê got;

"Dê polîs bikevin wê malê. Birayê min Metîn em erkdar kirine, ger kî ji kekê Elî wan werin emê vegerînin."

Min zêde fêm nekir. Polîs ji kur derketin, ma çawa dibe? Herî dawî tişta ez jê ditirsiyam hat serê min. Dema di rojên dawî de Haşimê ji Pertekê li ser eywana xwe ew mal dişopand û hevjîna wî jî pirsên ecêb ji xwîşk û birayên min kir, gumanên min çêbûn. Jorî mala me, malek polîsek sivîl hebû. Wî polîsî jî bi hêceta ku zaroka xwe digerînê bi katjimêran xwe li ser cadê mijûl dikir û çavdêriya aliyê mala me dikir.

Dayîka Tonton di vê mijarê de hişyar e. Me çend caran li malê ser hev hinek beş ji pirtûkan bi dakdîlo nivîsandibû. Ji ber pêdiviyek lezgîn bû, ez û Meto heta berbangê bi dorê, me bi du tiliyan dinivîsand. Dema me dakdîlo bikar tanî bal dikişand. Ji ber mal nêzî cadê bû û dengek herî biçûk dihat bihîstin. Lewma me tiştên nerim dixist bin dakdîlo. Me şibake jî asê digirt. Carina jî tevî ku odeya li paş bê sobe bû, me li wir dinivîst. Ji ber ji wê odê deng ne dida der. Dayîka Tonton ev xebatên me

texmîn dikir, ji ber gelek caran hişyar dikir. Digot me, bi tiştên xeter ve mijûl nebin. Ji ber dakdîlo ya me bû, me jî pir hêsan weke xebatên me yên dibistanêne dida nîşan. Lê belê, wê jî bawer ne dikir.

Min gavên xwe sivik kir. Ji ber agahiya heyî ji bona min girîng bû. Ev ne şopandinek ji rêzê bû. Min tiştek ji gotinên Nesîbe jî fêm nekir. Bê ka serdegirtin çêbûye, an jî dê çêbe. Bes ferq nedikir. Rastiyek hebû ew jî dijmin şik kiribû û dişopand.

Gelo ev rewş ji ber çi derketibû? Gelek kes dihat malê û diçû. Piranî jî şev dihatin malê. Dîsa jî di mijarekê de deriyek hatiye vekirin. Dibe ku ji bona mala me jî wisa dihat bikaranîn, bal kişandibe. Karê dakdîlo û şev û roj hatin çûnên hevalan bal kişandibû. Ma kî dizane, dibe ku xwarina me şev dida wan jî dîtibin. Me bi rêka kablo kehrebe dabû wan. Dibe ku yên ji Pertekê ew jî dîtibin. Ji ber gelek ên ji çepên Tirkan jî hevalan eşkere dikin, hene. Li kehwexanê, dibistanê û her cihî nav didan û bi gotina "Netewparêz" biçûk didîtin, bi vê mebestê zanebûn an jî bê zanebûn di astê navan de jî pênasekirin dibû îxbar.

Nişkê ve li ser van hizirîm û min hemû şîroveyên xwe di vê çarçoveyê de kirin. Li malê perteyên tûl baş hatibûn girtin û nixwumandin. Elî bi dizî ve ji şibakeyê çavderiya malên li nava baxçeyê dikir. Meto jî li aliyê cadê dinêriya. Hesen jî şandine li ser patîka li binya mizgeftê. Ji bona ger hinek ji wî alî ve werin, hevalan hişyar bike da ku paşde vegerin.

Zivistan bû, berf heye. Dê heval ji bilî wê malê biçin kuderê? Meto yekser pêşketinên heyî ragihand. Ji pacê rêya

ceda jorîn şanî min kir. Got ew zilamê li ser cadê rawestiyaye, zêde baldar temaşe dike ‘polîsê sivîl e.’ berdewam kir.

“sibehê sê kes bûn. Ew mal didan nîşan. Di nav bera xwe de di-axivîn. Heta demekê bi hev re rawestiyan. Malên li derdor jî nîşan didan. Malî me jî. Paşê hatin bi vê cadê re derbas bûn. Dixwazin fêm bikin ka ev mal bi rastî jî vala ne, an na. Dixwazin dema heval di malê de ne, ser wan de bigirin. Ji ber me jî şik bir, piştî ew çûn, em jî yekser derbasî malê bûn. Me hinek heval şandin. Tiştên heyî jî me tev eywanê re derxist.”

Paçên li ser dîwanê rakir û şanî min da. Yek, du û sê valîz û hinek kîs hene. Hinek kîs jî danîne eywanê. Ji bona bal nekişîne, danîne cem koma daran. Di heman demê de bi kelecanek mezin axaftinê xwe didomand;

“me nekarî em kabloyan jê bikin. Ji ber berî niha jî kablo li vir bû. Ger me yekser jê bikira, dê zêdetir bal kişanda. Dê paşê li ser mala me jî rawestiyan, lewma me jê nekir. Min Nesîbe şand ser rêya dibistanê û Elî jî şand ser rêya mizgeftê. Ez bawer im agahiya hevalan çêbûye, êdî nayên. Lê yek du kes li malê man. Elî û Necat in. Her du jî xwedevanên dibistana navîn in. Mal jî ya wan e. Wan kirê kiriye. Dê wisa bêjin. Li malê jî tiştek ne maye.”

Min êdî ne zanî çi bêjim û çi bikim. Destpêkê min ji germahiya dilê xwe hemêz kir. Kêfa min ji wê hizra wan û nêzîkbûna wan a baldar re hat. Lê ji ber bi gumanim jî, min pirsî gelo bi hişyarî anîne an na. Ger polîsan dîtibe, dê mîsoger ser vê malê de jî bigirin. Meto got pir bi ewle anîne, ji aliyê pêş eywanê re anîne, ew der jî ji ti alî ve naxwiyê. Tevî vê jî ne

rehet im. Min valîz ber xwe ve kişand in û li wan nêrî. Pirtûk, nasname, şarjorên demanceyan, zincîr, kêrek tûj, nexşeya Kurdistanê û hinek nivîsên teksîrê din ava wan de hebûn. Her wiha sê mekîneyên teksîrê, dakdîlo û hinek parçeyên demanceyê hebûn. Dema çavê min li wan ket, hişê min nema. Divê em çareseriyekê bibînin. Em nikarin wê katjimêrê bibin cem dayîka Tonton. Rojê ne baş e. Li qeta jêr cihek ji bona dara tê bikaranîn heye. Meto mifteyên odeyan girt û bi eywanê re daket jêrê ewder jî ceriband. Mifte lê hat. Di hundur de hinek alavên avahîsaziyan û komek texte hene. Ji ber ên xwediyê malê bûn, bal ne dikişand.

Hê em li ser dihizirîn, wesayîta polîsan li cadeyê rawestiya. Hinek polîs jê daketin, hem derdorê xwe kontrol dikirin, hem berbi malê ve diçûn. Di wê kêliyê de komek polîsên din jî di rêya jêr re hatin. Ji bîst kesan zêdetir bûn. Hinekan derve digeriyan. Bi lingê xwe şopên ser berfê kontrol dikirin û gav bi gav digeriyan. Cihên daran û tuwaletan kontrol dikirin. Yek jî bi kabloya dara tûyê ve mijûl dibû. Carekê de bangî yên din kir. Paşê çû li cem polîsê ku telsiz di dest de û mala me şanî wî da. Dixwestin fêm bikin bê ka ew mala kablo ji şibakeya wan derdikeve kîjan e. Ev rewş ez zêdetir tengav kirim. Yekser me planek çêkir:

“ezê derkevim bidim diyarkirin ku weke ez keçan dibim sînemayê. Meto tu jî li hundur veşartî wan bişopîne. Dema li xistin, veneke. Emê bidin nîaşn ku kes li mal tine ye. Bila Elî jî biçe sûkê. Bila rewşa heyî ji hevalan re bêje. Jixwe Hesen jî ser rê ye. Ger heval ferq bikin dê neyên.”Meto jî got, “temam.”

“ger ketin malê û geriyan, bidest wan ket, emê bêjin em nizanin. Emê bêjin ji me re gotine em diçin gund, ji ber mal

dilop dike, bila pirtûkên me li cem we bimîne. Em nizanin di nava van de çi heye. Me lê ne nêriye.”

Min jî yekser cilên xweş û xemilî li ber xwe kir. Peruk jî da serê xwe. Çakêtê kurk û pantorê delingê wê fireh bal dikişîne. Piştî min ew li ber xwe kirin û derketim eywanê. Min li ser eywanê re bangî keça cîranê me Perxanê kir.

“were em amade ne, em di kîjan rê de biçin. Dê Nîmet jî bihata. Filmek xweş e. Zû bikin dê cih nemîne. Were em vir e biçin.”

Çawa ez derketim eywanê hemû polîsan li min nêrî. Nêrîna wan jî ne xema min bû. Weke ku qet bala min nakişînin nêz dibûm. Perîxanê bersiva min da:

“were em di vî alî de biçin, bila rêya me dirêj nebe.”

Min jî got; “temam” û min Nesîbe û Ferîde bi xwe re birin, derî jî derve de girt û di navbera wan re derbas bûm. Polîsan matmayî li min temaşe dikir. Piştî ez diçim ji xwediyê malê dipirsin, “ev mala kî ye?” Ew jî dibêjin “mala Simaîl Cansiz e. Dayîk û bavê wan li Almanya ne. Birayê wan ê mezin li Stanbûl e. Ew jî xwendekar in.” Polîs; “temam, ev çi kablo ye?” Zilam hinekê li nav devê xwe digerîne paşê dibêje; “ew jî xwendekar in, li heman dibistanê hev re ne. Bi pere kehrebe dane wan.” Ev bersiva wî baş bû. Paşê polîsan hinekê di navbera xwe de nîqaş kir. Lê dîsa jî plana me ya di kêliya dawî de bala wan dikişîne. Di wê kêliyê de nîqaşa kontrola malê tê girtin.

Polîsek ji nava wan got; “ka halê wan binêre, di hewayê xwe de ne. Qey tu wan nabînî?”

Belê, yên kul i Dêrsimê bi şoreşgerî ve mijûl dibûn, şêweya cil û bergên wan cuda bûn. Lewma zehmet bû bawer bikin em şoreşger in! Bi taybet keçên ji TÎKKO û HK pir ecêb cil li ber xwe dikirin. Di bin dawan de pantor li ber xwe dikirin. Her wiha yazma didan serê xwe. Ango navê wê dibû cil û bergên proleterî(!). Lê yên j ime zêdetir xwerû li ber xwe dikirin. Asayî weke pantor, gomlek, daw û kiras li ber xwe dikirin. Ev şêwaz hem ji bona nêzîkbûna gel erênî bû, hem jî zêde bal ne dikişand.

Ma ez di wê têvlîheviyê de diçim sînemayê? Ji ber hemû hişê min li wir bû. Piştî ku hinekê meşiyam, derbasî malek cîranê me ya ne li ber çav bûm. Bi mereq li benda agahiyan bûm. Carin amin zarok dişandin û agahî ji wan digirt. Gotin; “du xwendekar girtin birin.” Nizanin li malê çi bûye û ne bûye. Lê hê li wir wan didin ber şeqeman. Ji wan dipirsin; “weke din kî li cem we hebû. Kî tê û diçe. Dê îro kes were?” Wan jî gotiye tenê ew dimînin. Hinek polîsan li ber malan şêwazê qerekol ava kirin. Piştî ku ewder tev vala bûn, ez çûm malê. Meto jî bi kelecanek mezin behsa nêzîkbûnên polîsan dikir. Li malê hinek parçeyên qaxidan dibînin. Ew jî bi dakdîlo hatibûn nivîsandin. Li ser wan qaxidan serenavên weke ‘Ji Bo Gelê me! Ji Bo Gelê Me Yê Egîd! En daxwiyaniyan nivîsandî, hatibûn girtin. Tenê çend hevok hatine nivîsandin. Lê ji bona polîsan qanetek baş bû. Ji ber di nava qaxidan de dibînin. Çend parçe qaxidên karbon jî tên dîtin. Pê bawer in ku ew mal ji bona hinek malan tê bikaranîn. Lê li holê jî tiştek din tine bû. Baş bû wê rojê jî kes nehat mal. Hemû îstîxbarat û çavderiyên

wan vala derketibûn. Digotin; “çawa dibe, ma kî agahî daye wan, kes ji wan nehat. Zêde hişyar in. Ferq kirine, lewma kes nehat. Ev zilamên yeman in. Ev UKO cuda ne.” Rewşa derket holê hinekê polîs tirsand. Ew di nava gumanan de hiştin.

Ber bi êvarî ye, hêdî hêdî hewa tarî dibe. Zivistane û roj kin in. Ev baş e. Elî di kêliya dawî de hat. Got; “heval dibêjin dibe ku polîs bi ser malan de bigirin, bekçî wisa agahî şandiye, hişyar bin û malê paqij bikin.” Ma emê tiştan di wê demjimêrê de bibin kuderê? Cardin mejiyê Meto şixwilî. Di vê mijarê de sivik û pratîk dihizirî. Yekser ji eywanê daket jêr. Carekê de valîz û kîs bir cihê daran. Ez jî li pey wî daketim. Me bi fenera destan ew valîz bi ser daran re bir heta dawî avêt pişt daran. Komel texte hebûn min xirab kir yek kir bin wan de û min cardin texte li ser wan rêz kir. Dema li wir bicih kir, em hinekê rehet bûn. Lê piştî demekê em zêde pê ne bawer bûn. Ger sibehê lêgerînek çêbe, dê teqez vir jî kontrol bikin. Dayîka Tonton hat bîra min. Min û Meto li sr vê nîqaş kir. Şê Elî got;

“Apê Xidir tirsoneke.” Hêviya Meto jî ji wan tine bû. Ya rastî ez ji wan cuda ne dihizirîm. Lê min digot, ‘em biceribînin.’ Bawerim dê min neşikînin

Madem min weke bûka xwe dibînin û ji min he dikin, dikarin karek wisa xeter bidin ber çavan. Min digot; “li malê ciwan jî tine ne. Du îxtiyarin. Apê Xidir diçû mizgeftê û dihat. Pêwendiya wî bi her kesî re baş bû. Pêwendiya wî bi Pertekiyan re jî baş bû, baş ne dikişand.” Lê dîsa jî cesaret nakim ku yekser wan tiştan bibim mala wan. Dibêjim; “ger qebûl nekin, dê hinek bibînin, eşkere bibin, wê demê jî xirabtir be.” Ya herî baş destpêkê biçim serdana wan û rewşê ji wan re

bêjim. Ez û Meto çûn mala wan. Ji ber çûna me mat man. Ji ber di katjimêrek dereng de mêvandarî nedibû. Dayîka Tonton got;

"Xêre?" Apê Xidir jî bi derpiyê xwe ve hat.

Min got; "li malê hinek pirtûk hene. Îro polîsan bi ser malên xwendekaran de girt. Dibe ku dîsa werin. Me ji şibakeyê kehrebe dabû wan, dibe ku wê kehrebê hinekê şik ava kiribe." Her wiha ji bon ali pêiya rexneyên ku bikin bigirim, axaftinên xwe berdewam dikim.

"Hûn dizanin me bi pereyan kehrebe dabû wan. Ev jî asayî ye. Lê polîs in. Dikarin gelek tiştan bi hev ve girê bidin. Lê malê hinek pirtûk û daktîlo hene. Em dikarin wan bînin vir, bila li eywanê bimînin. Emê sibe an jî rojek din bibin cihek guncav." Destpêkê jinekê bi bertek axivîn.

"Em dibêjin, tu guhdarî me nakî. Ew mal weke komaleyekê ye. Ne diyare kî dikeve û derdikeve. Ma ne hûn xwendekar in hûnê çi bikin pirtûkan, bavêjin sobê bila bişewitin. Bila Marks û Lenîn ji we kêm be. Keça min nabe. Binêre dê û bavê te jî ne li mal in. Metîn jî ne li vir e. Ger tiştek were serê te emê çi bikin?" Bê navber axaftinên xwe didomandin.

Ez cardin ketim navberê. Hinekê jî dixwazim wan qane bikim.

"Bila tenê îşev bimîne. Temam divê ez di mijarên din de hişyar nêz bibim. Lê rewşa niha ne baş e. Divê em tevdîran bigirin. Hûn çi dibêjin, em bînin?"

Bê dil gotin; "temam bînin lê….." Em bi lez û bez hatin me kişand mala wan. Ne li bendê bûn ku em ew qas tiştan bînin. Dema kîs û valîz dîtin tirsiyan û xof ket nava wan. Dayîka

Tonton bê navber di-axivî. Me jî guhê xwe ne dida. Me got; “ şev baş” û em vegeriyan. Me hinekê jî helwestên wan şîrove kir. Elî dîsa bi israr got;

“Baweriya min bi wan naye.” Meto jî henek kir; “hew te dît sibe apê Xidir ew hemû radestî polîsan kiriye. Ne diyare.”

Ez jî ne rehet im. Aciz dibim. Ji ber nêzîkbûnên wan ên ji min re zêde bê pîvan bûn. Dema ne li gotî berjewendiyê wan ba, bûkanî ne dima. Tirsa dewletê ketibû hemû şaneyên wan. Ji Metîn jî aciz dibûm. Malbata xwe qet ne guhertiye. Cîhan xirab bibe, ne di xema wan de ye. Belê, dê min çawa wisa ji wan hez bikira. Dê mi çawa bi wan re bijiya? Li bernda xizmetkarekê bûn. Ne dixwestin ez bibim yeke din. Ger ew wisa nêzî min bibin, ezê jî vê têkîliyê qut bikim. Bi xwe re di nava hesabê de me. Cara yekê ye ev têkîlî min cidî dide fikirandin. Rastî jî ji çiyê min hez dikirin. Bi çiyê min ve hatibûn girêdan? Ezê çiyê wan hez bikim û bi çiyê wan ve werim girêdan? Ji diya xwe aciz dibim. Bes qet nebe wê jinê di rewşên wisa de başdar nêzî me dibû, ev w jî nakin. Dê çawa be! Nikarin ti xeteriyê bidin ber çavan. Naxwazin serê xwe bi-êşînin.

Şevê carek bi heval re agahî şand. “Me merek nekin. Tiştan baş veşêrin. Emê sibe şev hemûyê derxin derve.” Gundiyek xwe yê ciwan şandiye. Ev agahî di heman demê de avakirina girêdanekê bû. Rojek zêde xirab bû. Weke ku her der vala bû. Jiyan raestiyabû. Me xwe di valahiyekê de dihesiya. Rihek wisa bi me re pêş ketibû. Ew agahî baş bû, em kêfxweş kiribûn.

Ez sibehê hinek din rehet çûm dibistanê. Dê Meto wan jî li malê ne maban. Em dixwazin bidin diyarkirin ku em li

dibistanê ne. Ger heta em wan tiştan derxisn derve, ango gundan tiştek nebe, piştî wê her tişt hêsan bû.

Tirsonekiya apê Xidir û gumanên dayîka Tonton dibû yek. Dibêjin divê nîvê rojê ew tişt werin kişandin. Meto hewl dide bide fêmkirin û qane bike. Lê bê encam ma. Neviyê wan jî ji Demîrolukê hatiye. Didin wan û dibin malê. Di nîvê rojê de valîz û kîsê li pişta wan ve çûna wan a malê bala her kesî dikişîne. Meto ji hêrsa digiriya. Tiştek ku bikira nebû. Kîsan datîne nava darên derve. Dibêje; "dema polîsan dît, emê bêjin agahiya me tine ye. Cihê daran vekiriye, li hewşê ye. Em nizanin kî hiştiye vêderê." D ji bona valîzan jî nêrîna destpêkê dubare bike. Emê bêjin; "em nizanin di hundurê wan de jî çi heye."

Ji ber gelekê xeter bû ku em carek din bibin cihê daran ê binê avahiyê. Dê xwediyê malê bidîta. Dema ez ji dibistanê vegeriyam, li hember rewşa min dît, sinirên min ser û bin bûn. Ev çi bû? Mejiyê mirov ne radikir. Nîvê rojê çawa ev qas alav şandibûn malê. Ev pir vekirî îxbar bû. Ji hêrsan dîn bûme. Çi hat ber dev, min got. Weke dîna diqêriyam, min digot; "êdî ez ne bûka w eme. Şaşiya mezin min bi we bawer kir. Hûn xwedî berjewendî ne! Hûnê bi vî halî lawê xwe jî radest bikin. Dê ew careke din neyên vê malê. Ez qebûl nakim." Jixwe çep û rast ji her derî re name dişandin û her kes har dikirin. Ji ber nameya bavê min a dawî ecêb bû. Bi navê dayîka min nivîsandibû û hemû hişyarî bûn. Nameya Metîn jî bi heman şêwazî bû. Tonek nesîhat nivîsandibû. Ma ew morik min çi dihesibînin! Ew dihizirin ku ez li gorî daxwaza wan weke xaniman li malê rûnim û xizmeta wan bikim. Qetiyen vê nakim!

Ez qet nikarim qebûl bikim û ji hêrsa xwe jî digirîm. An ew tişt bikevin dest! Min got; “em hinek ji wan ji nav hev derxin û cuda veşêrin ne baştire.” Herî kêm em wan nasname û nivîsan cuda bikin. Weke din neqşeya Kurdistanê heye. Pirtûk zêde ne girîng in. Me dikariya em fîşek û zincîrê jî veşêrin. Meto hê êdetir bi bêhna fireh, hewl dida min bihedirîne û got;

“Em têkil tiştekê nabin. Di nava malê de naye veşartin. Jixwe devrî malê jî qet nabe. Ya herî baş em ji malê derkevin. Em biçin mêvandariya malekê.”

Fikrek baş bû. Em çûn mala Nîmetê, ew jî li malê bûn. Me ne dixwest rewşa heyî bizanibin. Min rewşa heyî ji Nîmet re got. Şaş nebû. Got ji xwe li bendê bûn ku ew helwestek wisa raber bikin. Ev nêzîkbûna wê helwesta min a li dijî wan jî sor dike.

Ev nêzîkbûn tev hiştin ku ez cardin lêpirsîna pêwendiya di navbera xwe û Metîn de bikim. Piştî ku dayîka min çûyî, metîn qet nehat. Ev jî bala min kişand û serê min de ma. Wî di nameyên xwe de behsa vê mijarê nedikir. Ez bawerim ji ber gurura xwe behs nedikir. Di maneyekê de ji ber dayîka me Zeynep ne li Dêrsimê ye, hatina wî jî ya li Dêrsimê hatiye qedexekirin. Ev rewşa malbatan li şûna ku her du malbatan nêzî hev bike, berovajî dûrî hev dixist. Dîsa jî girêdanek di nava malbat û derdor de fermî bûyî hebû. Dema hinek din dixwest vê têkîliyê xirab bike, bandor dibûm û min bertek raber dikir.

Min gelek caran digot; “xweziya Metîn bihata, me ev mijar nîqaş bikiran. Em biçûna dûrî her du malbatan jî!” Lê min ev bi wî ne dida hîskirin. Tenê bertekên min ên aliyên neyênî xwe

didan der. Dema min bawer dikir dê min ji malbatê dûr bixe, min ji wê têkîliyê hêzek giyanwerî digirt. Lê ji ber min pir zelal ne dizaniya rewşa Metîn çiye, ez di cihê xwe de radiwestiyam. Hevalan ji bona vê têkîlî û Metîn iîtek ne digot. Tenê dema carinan behs dibû, hinek hevalan digot, Metîn ne yek zêde bandorkere, tenê xwendin kiriye armanca xwe. Ev vegotinên wan jî bandor li min ne dikir.

Nêrîna "ger em her du xwedî du nêrînên cda bin, ev rewş nabe" di hişê min de cih digirt. Ji ber ti girêdanek cuda ya min bandor bike tine bû. Ger hevrebûna me hinek din xwezayî û di nava mercên wê de pêş biketa, bê guman dê min ev herî dawî li ser van bifikiriya. Lê ya di jiyanê de bandor li min dikir, rê şanî min dida û ez didam şerkirin, ev bîrdozî bû. Hevrebûna me her duyan ji vê cudatir nedibû. Êdî min jî ew wisa dihizirî û min ji xwe re digot; "xwezî ew jî weke hevalên me ba, me heman tişt bi hev re parve bikira." Nêzîkbûnên malbata wî pêwndiyên me sar kiribûn. Ji nişkê ve her tişt şikandibûn. Min wê rojê gultîlik ji tişiya xwe avêt û got; "ger werin ezê hemû zêrên wan li nav çavên wan bidim!" Dema ez nerim dibûm, min bawer dikir ku divê ez vê rewşê zêdetir bi nêzîkbûnek xwînsar û berfireh bihizirim. Divê ez nêzîkbûnek zêdegavî nekim. Lê dema şev hatin malê min ji wan re got tişta ku kirine gilî kirine, di heman demê de ji bo vê jî bikaranîna biraziyên xwe jî tiştek qet ne rast bû. Weke din jî tiştek din ne axivîm!

Tiştek ji dilê min ne dihat, ji dilê min dihat ku ji wan re bêjim; "rabin biçin." Tehemûla min ji rûniştin û axaftina wan re ne mabû. Di wê kêliyê de li ber çavên min bûn du mirovên cuda. Du mirovên îxtiyar, divê wrin hezkirin û rêz bê girtin, ne weke 'dê û bav', j imin re weke du mirovên fêlbaz û qelp bûn. Ez aciz dibûm ku Metîn jî zarokê wan bû. Min bawer dikir ku

wî jî nahizirin. Ji bere w nêzîkbûn pîvanek bû û min jî her tişt bi wê ve girê dida.

Hevalan jî wê şevê tişta hatî gortin ne kiribûn. Lê êdî min jî weke roja destpêkê guman ne dijiya. Bi taybet piştî helwesta apê Xidir, ti tirs û xofên min ne mabûn. Heta ger bixwazin bila polîs werin min bigirin. Min ji xwe re digot; "xwezî bihatam girtin, da ku fêm bikin ew nêzîkbûna wan rê j içi re vekir."Fikirek pir ehmekî bû, lê hêrsa min jî ne radiwest. Min jî wisa zerar dida xwe. Ev jî nêzîkbûnek zaroktî bû. Amûr girîng bûn û girtina min a bi wan re jî xirab bû. Dê biba sedem ku demek dirêj girtîgehê de bimînim. Dê nasname û pirtûkên hevalan biketan destê polîsan. Dê bi vî rengî dayîka Tonton û apê Xidir j içi fêm bikiran. Ez ji ber şaşiyya yeke din aciz dibûm, lê min hêrsa xwe di serê xwe de diteqand. Ev taybetmendî jî hê di wan rojan de bi min re hebû. Ev nêzîkbûna zerar û êş dide xwe, çi qas ecêb e!

Ez dixwazim bibim şoreşger, tu nikarî min asteng bikî

Ya rastî wan şaşiyek kiribû. Ma min dikariya li dijî vê şaşiyê weke din çi bikim? Ji ber nakokiyên ku min jiyan dikir, ez zêdetir bi hevalan ve dihatim girêdan. Lewra li dijî destwerdanên wan bi hêz dibûm. Êdî dema ew amade bûn, min xwe girêdayî malê ne didît. Min digot; "karê min heye" û ez derdiketim. An jî dema digotin; "îşev werin mala me xwarinê, em bi hev re biçin vê malê" min yekser red dikir. Lê wan rewşa heyî bi nepixandî ve weke nameyekê ji dayîk û bavê min re ragihandin. Ew jî guman dijîn û biryar didin ji nişkê ve vegerin. Peder ti caran bê agahî ne dihat serdanê. Lê vê carê cuda bû. Ji nişkê ve hatibûn. Hem jî di nîvê şevê de.

Di vê navberê de her du kur apê min ên ji girtîgehê derketibûn Îbo û Baqî jî hatibûn serdana mala me. Dema Îbo li girtîgehê bû ez çend caran çûm serdana wî. Ew ji TÎKKO bû. Di sala 1975'an dema Mistefa Tîmîsî hatibû, tê girtin.

Dîsa li Dêrsimê rojek bi bûyer dihat jiyîn. Li ser pira Elezîzê konvoya wesayîtan hatiye astengkirin. Protesto kirine ne hiştine bikevin Dêrsimê. Serokê Partiya Yekîtî ya Tirkî bû. Hewl dida Elewîperestiyê birêxistin bike û ji vê eniyê jî piştewaniya dewletê bike. Qereoxlan bi salan hewl da li Dêrsimê di bin navê çepgirî û gelêrî de potansiyela heyî birêxistin bike. Niha jî Tîmîs ev dikir! Wî jî dixwest bi Elewiyê cihê qut bûye girêkekê lê bixe. Lê êdî Dêrsim, ne Dêrsima berê bû. Her çendî ne berfireh jî be, muxalefetek hebû. Ciwanan hêrsa xwe vekirî diqêriyan. Di wê xwepêşandana protestokirinê de hinek hevalên me jî hatibûn girtin. Yildirim Merkît jî wê demê hat girtin.

Dema ez çûm serdana Îbo me di mijara Kurdistan mêtîngeh de ye nîqaşên gerim kir. Nîqaş li girtîgehan jî berdewam dikir. Bandorbûn hebû. Digot; "ezê lêkolîn bikim." Wê demê ev gotin jî nêzîkbûnek erênî û berpirsyarî bû. Baqî ji HK'ê bû. Wî jî mijara Mîllî nîqaş dikir. Meylên wî hebûn, an jî di mijara pirsgirêka Kurd de baldar bû. Ev jî kêfa me tanî. Îbo got; "dema ez derketim, ezê werim malê da ku em nîqaş bikin." Hatina Baqî jî erênî bû. Beriya salakê b imin re nîqaş kiribû û min jî ew red kiribû. Wisa diyar dibû ku ew mijar ne dida pêş. Ji ber di şoreşgeriyê de xeyîdan û helwest tine bû. Lewma min zêdetir rêz digirt û di heman demê de dilê min pê dişewitî. Ji ber wan helwesta min weke ku ji ber ew xizanin lewma mine w red kirine fêm kiribûn. Ango qaşo ez wan biçûk dibînim lewma

min ew red kiriye. Min malbatek dewlemend, bajarvan û sosyete hilbijartiye. Lîroveyên wan wisa bûn. Ji vî alî ve şikestin û acizbûna wan diyar dibû. Min hîs dikir. Ji ber carê Îbo bi henek jî be, gotin ber min re tavêjtin.

Wê şevê Welî Tayhanî û Metîn Gûngoz hatibûn, me jî berfireh nîqaş kir. Asta zanebûna hevalan û kamilbûna di nîqaşan de bandor dikir. Baqî jî xwedî zanebûnekê bû. Lê di mijara Kurdistanê de kêm dima. Tezên ku rave dikir, tezên beriya Şoreşa 17'ê Cotmehê bûn. Digot; "rêxistinên bi şêwaza Bolşevîkan, dikare pirsgirêka netewî çareser bike." Herî zêde jî bertekên wan i dijî rêxistinbûna cuda hebû. Tevî ku îdîayên wan ên rêxistinbûna bi hev re û cewaziya mercên Kurdistan û Tirkî yên nakokiyên pir vekirî radixist ber çavan hebûn, cardin ferz dikirin û di vê mijarê de qane ne dibûn. Di encamê de her diyan jî digot; "emê lêbikolin, dibe ku di vê mijarê de em werin xapandin. Lê dîsa jî em bi dostanî nîqaş bikin û carê jî hev bibînin." Paşê çûn.

Min wê şevê guncav ne dît ku li malê bimînin. Wan jî erênî pêşwazî kir. Jixwe zarokên apê min bûn. Her wiha jî du mirovên şoreşger bûn. Lê dîsa jî me îhtîmal datîna ku derdor vê serdanê cuda şîrove bike. Ne baş bû ku em rê ji fesadiyê re vekin. Jixwe apê Xidir ji her tiştî şik dibir. Serdanek wisa mîsoger qebûl nedikir. Min wê şevê ew birin mala xizmek xwe yên nêzî me, bûn mêvanê wan. Ji bona ez bûm dergistiya Metîn, dilê Baqî mabû. Carekê dema me silav da hev got; "belê te em ne ecibandin, lê ezê cardin bêjim keça apê min e." Gundiya me Elîf jî ew gotin weke fitneyekê girt û wê şevê tevê li rûyê min da. Her digot qey ji bona ew xizanin mine w red kirine. Ji ber helwestên dayîka tonton jî li dijî min bikar anîn û ez di nava derûniyek xirab de tewanbar kirim. Kêm mabû e wê

şevê lêborîna xwe ji Baqî bixwazim û jê re bêjim ku min şaşî kiriye. Diyar bû her kes hestewar nêz dibû. Ew jî aliyê min ê herî lewaz bû. Min ti caran apên xwe ji ber xizaniyê red nekirin. Berovajî vê min ji wan hez dikir.

Roja paştir apê Xidir pê hesiya ku hatine mêvandariya me. Bertekên xwe ne didan der. Wê rojê ez jî li hember wan ji her rojê zêdetir rêzdar bûm. Ji ber min dixwest vê mijarê şaş fêm nekin û bertekên min ên berê cuda şîrove nekin. Ji ber bi rastî jî weke kum in suc kiriye di nava derûniyekê de dijiyam. Bes pir asayî jî bû. Zarokên apên min bûn, dikariyan her roj jî werin mala me. Ev jî xwezayî bû. Li şûna ku vê mijarê bi wan bidim fêmkirin, weke ku min suc kiriye rewşek jiyan dikir. Ev jî ji hesasiyeta wan çavkaniya xwe digirt. Dayîk û bavê min li mal ban tiştek nedibû. Lê niha kes li malê tine bû. Ez keçek bi dergistî bûm. Gotinê xwe rehet dikirin. Min jî ji xwe re derdek dîtibû û kiribû serê xwe.

Şevekê di wextek ku ez ne li malê dayîk û bavê min hatin mal. Ez di wê kêliyê de li malek nêz bûm. Çawa min agahî girt yekser çûm malê. Helwestên diya min ecêb bûn. Saleke ji me dûr e. Em li bendê ne ku dema me dît kêfxweş bibe, gerim û bêrîkirî nêzî me bibe. Lê mixabin tiştek wisa nebû. Hişê wê ne li serê wê bû. Çavên wê li malê, carekê diçe xwaringehê, ji wir derket carekê çû odeya mêvanan. Tam di wê kêliyê de qiyamet rabû. Qablo di fîşê de bû. Me jibîr kiribû, ne kişandibû. Me hinek tiştên êde jî li odeyê ser hev kom kiribûn. Heta em neçar neban, me ewder bikar ne tanî. Lewma jorî pacê re qablo kişandibû malê. Qablo ji fîşê derxist û pekand. Xwe aciz kir. Baş bû ku bavê min hewl dida diya min bihedirîne.

Em mat mabûn. Me ne dizaniya em çi bikin. Li ser piyan rawestiyabûn. Bi ser her kesî de diqêriya;

“We çima ev mal aniye vê rewşê. De ka bêjin, kî dihat malê û diçû.” Li oey hev pirs dikir.

Helwestên dayîka min ên lêpirsînî ne qediyan. Wê şevê weke kabusekê bû. Ne me dikariya em biçin cihekê, ne jî hevalek dihat. Carekê de hemû peywendiyên me rawestiyan. Herî zêde jî bela xwe li xil û bergên me dida. Ji ber min weke berê li ber xwe nedikir, cilên min xwerû û ji rêzê bûn. Dîsa çavên wê li poşiya reş a neqişandî min hez dikir û li sitiyê xwe digerand mabû. Carekê bi dengek tund pirsî; “ev çi hale. Ma te şîn girtiye?” Dema apê Xidir û dayîka Tonton jî hatina mala me cilên min dîsa heman şêwaî bûn. Her wiha min ew sar pêşwazî kirin. Ev nêîkbûnên min bala wê kişandibû û tirsiyabû. Lewra ji bavê min re dibêje:

“Tiştek li vê keçê bûye, ev çi cilin, lê binêre ketiye çi halî. Jê re tiştekê bêje. Bi min re na-axive.”

Di navberê de her ku agahî ji cîran û birayên min digirt, bertekên wê jî diguherîn. Jixwe Meto weke her carê piştewanê min ê herî mezin bû. Li malê jî herî zêde ew alîkarî dike. Em gelek caran şer jî dikin. Bi taybet di salên beriya ku dest bi şoreşgerî bikim, me zêde şer dikir. Ez ti caran wê lêdana min li gundê pîrika xwe lê dayî jibîr nakim. Ez pir aciz kiribûm. Lewma min jî da pey û xwest wî bigirim. Lê wî zêde lez baz dida. Ez jî bi înad bûm. Min heta qiraxên ava Munzurê da pey wî. Ez ji xwe mat dimam, çawa ez li nav wan eraziyên bi kevir ne ketime û mine w qas rê baz daye. Meto jî ew lêdan jibîr nekiribû. Carê tanî bîra min, lê ez dêşiyam û li ber diketim.

Êdî Peder ti gotin ne dît ku ji diya min re bêje. Tenê got; “tu zêde zalim î.” Mafdar bû. Pir hêzan li zarokan û li me dixist. Bêhna wê fereh ne dibû. Diranên xwe dişidandin û em didan ber kumlan. Porê me dikişand. Ger tîrê nan, an jî terlik di dest de ba, bê ku bihizire li me dida. Ew lidan kesayeta me tevan dişkand, ji aliyê giyan ve şopên lêdanê yên kûr diman. Lê ew ne di ferqê de bû. Carê li ber dilê me digeriya, lê tiştek bi ser ne dixist.

Em mezin bûn. Lewma bandora gelek tiştan zûtir dihat hesîn. Bes dîsa jî baldar nêz ne dibû, li cem hevalên me, an jî li cihek ku hinek bibînin, li her naverastê li ma dida. Min ti caran heq neda vê nêzîkbûna wê. Min çavlê nekir, her tim bertek raber kir. Tevî vê carê min jî li hinekan dida. Lê ez ji yê lêdan xwariye xirabtir dibûm. Lewma ez qet Meto jibîr nakim. Hêjî dilê min jan dide. Çawa min li nîvê pişta wî xistibû. Tevî vê jî ew rêzdar bû. Tevî ku zora wî biribû, bi çavên tije rondik li min nêrî bû. Li ser hêrsa xwe serwer bû. Ger bixwesta pir hêsan dikariya li min bixe, lê nekir.

Yê li malê herî zêde nêzî dayîka min Elî bû. Dayîka min zêde bi wî re mijûl dibû. Elî jî ji wan nêzîkbûnan feyde digirt, xwe diparast. Di nava me de yê her tişt weke heyî j diya min re radigihand Elî bû. ,li gorî diya min ê ku tiştek venedişart Elî bû. Lewma dema borî jî herî zêde ji Elî dipirsî. Bê ka kî hatiye malê û çûye, hevalên me kî ne, hewl dida ji Elî hîn bibe. Elî jî ne weke berê bû. Tiştên ku zerar ne dida digot. Lê ti caran behsa peywendiyên me yên bi hevalan re ne dikir. Digot; “hinek dihatin, hevalên xwîşka min bûn. Me nas nedikir.” Dayîka min jî tim digot;

“em Sakîne ji dibistanê derxin. Dawetê dikin, çi dikin bila bikin, em bidin, de jê xilas bibin. Nexwe dê wisa belayek were serê wê.” Hewl dida bavê min qane bike.

Dixwest bertekên min fêm bike. Tehdît dikir. Ji ber guhertina bi min re çêbûyîn, bi wê re guman dida avakirin. Nexwe pirsgirêk ne tenê daxwaza min a bûna şoreşgerî û girêdana min a bi hevalan re bû. Ez weke berê ne di hewaya keçîniya ciwan de bûm! Min nêzîkbûn û hestên yeke dergistî ne didan der. Dema pêwendiya di navbera min û Metîn de dipirsiyan, min ji wan re digot derheqê wî de tiştekê pirs nekin û we jî eleqeder nake. Ev nêzîkbûna min zêdetir ew bi hêrs dikir. Ev d içi watê de bû? Wate ne dida, ma çawa ew eleqeder ne dikir.

Carekê xwest armanca xwe ya çima dema çûyî Almanya ne hiştiye Metîn were Dêrsimê bêje. Qaşo fikarê wê ez bûme. Gelo dibe ku bertek ji vê re be? An jî ne baş kiribû? Her tim bi dengê bilind di-axivî û şîrove dikir. Dema hatîn Metîn jî dibînin. Aciz bû, gelo dibe ji vê aciz be? Gelo hinekê Metîn jî aciz bû û helwest raber kir? Dibe ku ew jî li hember vê têkîliyê dar bibe. Tirs û xofa wê ji ber vê bû. Ger ew be sedema van dê çibe?

Dayîka min Zeynep baş dihizirî. Hemû jî rast bûn. Bandora van jî hebû. Ger Metîn di navberê de bihata, dê gerimbûna di navbera me de zêdetir girêdanek ava bikira. Me dikariya em heman bîrdoziyê nîqaş bikin, an jî qonaxên hev berdanê zûtir zelal bikiran. Lê çi bikim, ne hatibû. Fermana dayîka Zeynep tûj bû. Fermana wê hatibû cih. Lê ji bilî vê jî gelek tiştên ji vê bandor bûyîn hatibûn jiyîn.

Bavê min ji dayîka min zêdetir hedar û kamil bû. Di heman demê de rêzdar bû û dixwest fêm bike. Ez bi bavê xwe re vekirî axivîbûm. Min jê re gotibû hê di serî de ev mijara dergistîbûnê bi zorê hat kirin, ez jê re ne amade me û min pêşketinên pêvajoya ku ew ne amade bûn jê re ragihand û got; "tam weke xizmetkarekê nêzî min dibin! Hê ji niha ve min malê xwe dibînin. Destwerdana her tiştê min dikin. Ez nikarim ne li gorî daxwaza we û ne jî li gorî şêwazên wan bijîm. Ev qas pêşketin rû dane. Her kes bi tiştên cuda re mijûl dibe. Ez nikarim ji devrî vê bimînim. Ez dixwazim bibim şoreşger. Ji roja hûn hatine ve we ez weke girtiyekê di malê de girtime. Ne ez dikarim biçim cem hevalên xwe, ne jî hevalên min dikarin werin. Ev ne karek xirab e. Hûn li Ewrûpa ne, divê baştir fêm bikin. Dayîka me xwe têkil her tiştê me dike. Her tiştî qedexe dike. Her wiha zewac kiriye serê xwe. Ger hûn di vê mijarê de dixwazin helwesta min baş bizanibin, ez ji we re dibêjim na, naxwazim. Min çend caran xwest tiştên xwe yên dergistîbûnê kom bikim û li nav çavên wan extiyaran bidim. Bi vî rêbazî nabe." Bavê min jî hewl dida min qane bike û di heman demê de li ber diket û got;

"Baqî jî şoreşger bû, lê we ne eciband." Dema ev digot xwe bi dayîka min re aciz dikir. Berdewam kir; "niha tu dergistiyê wî lawî yî. Dê tu hinek tiştên wan qebûl bikî, ne raste ku tu her tiştî red dikî. Ew jî nikarin têkil her tiştê te bibin. Tu dayîk û bavê wî neke serê xwe. Ew lawik ne yekî xirab e. Rêzdar e, li anîngehê dixwîne, e bawer nakim tiştekê ji bona şoreşgeriya te bêje. Tu ê re bi-axive û jê re binivisîne." Hewl dida pirsgirêka heyî ji aliyê erênî ve çareser bike.

Nêzîkbûna bavê min ji bon amin bû moral. Lê diya min ne wisa bû. Li hember çûn û hatinên min ên dibistanê jî pir şiyar bû. Lê min nêzîkbûnên xwe yên di vê mijarê de bi tirs jî derbas kirine. Ez bê destûra wê ne diçûm derekê. Ez bi pergal û quralên malê ve girêdayî bûm. Lê quralên heyî jiyana min a nû ser û bin dikir. Mafê jiyanê ne dida min. Xebatên perwerdeyê, civîn, hatine cem hev û nîqaş û hemû peywendî hatine cemidandin. Ez ji dibistanê diçim. Tenê wisa dikarim astengiyên li pêş xebatên perwerdeyê hene rakim. An em destûrê digirin, an jî em di dersa dawî de diçin û li fîşê jî her kes amade ye dinivisînin.

Di vê mijarê de pirsgirêk tine bû. Çareserkirina pirsgirêkên bi vî rengî, ji gotinek ku bi dayîka xwe re di-axivîm hêsantir bû. Dîsa jî hevalan qedexe nas ne dikir, dihatin me nîqaş dikir. Dayîka min bi israr digot; “ dev ji keça min berdin.” Nîqaşên hinek heval û dayîka min gelekî cuda bûn. Nerimbûna wan hêrsa dayîka min kêm dikir. Heta carina didan kenîn û rehet dibû. Qet ji Qiymet û Tirkan hez nedikir. Nêzîkbûnên her duyan ên zêde rehet, fermanî weke zilaman, nêzîkbûnên sivik û axaftinên wan qet hez nedikir û dûrî wan disekinî. Lewma dema ew dihatin her der têkilhev dibû. Wê jî gelek caran tehrîk dikir. Dema ne dikariya girêdana min a li hember hevalan asteng bike, vê carê jî di navbera hevalan de cihekarî dikir, ew li gorî çavderî û pîvanên xwe dinirxand. Min jî li dijî van helwestên wê, helwestên tund raber dikir. Min ti caran destûr ne dida ku derheqê yek hevalî/ê de gotinekê bêje. Hinek hevalên ku wê di-eciband û hez dikir jî hebûn. Ew jî vekirî digot. Bi gelemperî hemû heval nas nedikir. Tenê hevalên ku dihatin malê û malên ku li hewşê ne nas dikir.

Me tevî her tiştî xebatên xwe yên perwerdeyê berdewam dikir. Hevalên me li Kişlayê jî hebûn. Malbata Sevîm Kaya jî ew diçewsand. Lewma gelek caran şev ecêb ji mal derdiket. Kasket dixist serê xwe dev û rûyê xwe jî bi keşkolê dipêça, wisa li cadeyên Kişlayê re diçû û dihat. Di tîpên xortan de dihat dîtin. Bê ku mirov xwiya bike li korîdorên Kişlayê re derbasbûn û li ser wê cadeya bêdeng û tenê heta kolana Dax bi tena serê xwe çûyîn gelekî girîng bû. Ev jî danasîna biryardariyê bû. Ma şoreşgerî jî ne derbaskirina her zehmetî û berçav girtina her tiştî bû.

Şêwaza jiyana nûnerên pêşenfiya bîrdoziya Rizgariya Netewî, ev rastî hînî me dikir. Ne qural û biryarek nivîskî hebû, ne jî rêziknameyek û yeke ku ferz bike hebû. Her tişt jiyanê hînî me dikir. Girêdanên bi malbatê, girêdanên bi pergalê ve rave dikir. Her wiha di vê demê de malbat ji saziyên dewletê yên herî bi raye û bandor zêdetir, bi bandor bûn. Şerek dijwar hebû. Ev rewş jî lê pêşiya xwendin, hînbûn û rastiya xwe zanînê dibû asteng. Ev jî rawestandina jiyanê bû. Serxistina vê jî zehmet bû. Ji kûrkirina nakokiyan zêdetir tiştek din nebû.

Êdî rehet diçûm xebatên perwerdeyê û civînan. Min destpêkê destûr digirt digot; "îro karê me heye, divê ez biçim." Dema destûr ne dida, jixwe qet destûr ne dida, dîsa jî ez derdiketim û diçûm. Her wiha çûyîn hebû de, vegera vê jî girîng bû. Rojên ku ez bi şer derdiketim diçûm perwerdeyê moralê min xirab dibû. Her carê ez di vegera malê de nîqaşa ku rû bide dihizirîm. Êdî em vekirî di-axivîn û me vekirî nîqaş dikir. Hewce ne dikir ku em derewan bikin. Şoreşger im. Divê xebatên xwe bimeşînim. Xebatê perwerdeyê jî, erkek bingehîn bû. Kesî ne dikariya çûna perwerdeyê asteng bike. Dayîka min

Zeynep jî ne dikariya wê asteng bike. Me her tim nîqaş dikir. Berê ew ser diket. Gelek tişt asteng dikir. Lê niha ne dikarî asteng bike. Li dijî min eniyek vekirî ava dikir, min jî ew guhdar ne dikir. Wê çi tişt ferz dikir, min jî red dikir û digot:

"Ez dixwazim bibim şoreşger. Tu nikarî min asteng bikî. Gelek malbatên hevalên min ên keç çawa bin, tu jî wisa be. Ez çi dikim diyare. Tiştek xirab nakim. Ger tu di van mijaran de tengezariyê ava nekî, ezê li vê malê bimînim. Ne tu wisa nekî ez li malê namînim."

Ev gefek bû, bawer nedikir. Lê bê guman bû ku ezê bikaribim dînîtiyek wisa bikim.

Digot; "Wê demê bizewice û biçe! Ez nikarim berpirsyariya te rakim."

Pir baş dizaniya ku, dema ez dibêjim 'li malê namînim' ne ku ezê dixwazim biçim malek din. Jixwe gumanê wê ev bû. Wate ne dida. Dixwest sedema bertekên min ên dijwar fêm bike.

Bi rastî çi bû? Di cewhera nakokî û xwevçûnên min dijiya de çi hebû?

Nêvenga malbatê hem tim xwevçûne, hem jî di nava xwe de bi hev ve girêdayî ye. Xwedî xisletek yekpare û berpirsyar e. Ji ber Peder kedkar bû, xisletên ji civakê re girtî, paşverû û feodal ne dijiya û ne dida der. Dihişt ku kes ber bi derve de vebe û bi vîna xwe tevbiger in. Zilam bi rastî jî girêdayî bû hez dikir. Di vê mijarê de berpirsyariyek navxweyî û dewlemendiyek giyanwerî dijiya. Pirsgirêk bi me re nîqaş dikir, hewl dida bi rêya qanekirinê çareser bike. Hûmanîzma bi kesayeta wî re hêmana sereke ya hevsengiyê bû.

Dayîka min jî xwedî xisletek tam berovajî bû. Weke ku her duyan cihê xwe li hev guhertibin! Di nava civakê de jin cinsê bindest bû. Lewma mezinbûna wê ya di nava civakê de bi gelek cureyan bû. Malbata wê eşîretek pêşveçûyû, tên nasîn, dewlemend e. Kalkê min di wê rewşa xwe de peywendiyên xwe yên bi derdor re li ser esasê hevsengî tevdigeriya, rêzdarî û berjewendiyek beramber hev erênî, alîkarî û piştewaniyek ku nêrîna hinek din esas digirt. Lewma bi van rêbazan ji aliyê derdor ve hatiye hezkirin. Wan behsa van mijaran dikir. Bi navê wî sond dixwarin. Hêjî ez sond derbasdare.

Pîrka min jî bi heman rêbazî dijiya. Ev rêbazê peywendî û otorîte hinek tişt rizgar dikir. Di maneyekê de çareser jî dikir. Lê otorîteya dajîka min tenê rê ji şerek dijwar re vedikir. Dibe ku xwedîkirina heşt zarokan, bi wan re li heman malê mayîn, ji bona xisletên wê yên gevneşop karek zehmet bû, lê ked jî bû. Bes kar û hewldanek zêde çors bû. Ji aliyekê ve nêzîkbûna serweriya li ser her tiştî û bûna xwedî maf, hukumkirina îradeyan, poşmanî ji dayîkbûnê kirin, bi me tevan re de li dijî malbat û ‘avakirina malekê’ bertek dabûn avakirin.

Tê bîra min li cem me xeyalên keçîniya û xortanî ya ciwan ji devrî van bûn ya rastî di nava civakê û malê de li zewacê gelekî tê axaftin. Xeyalên wê tên çêkirin û henek tên kirin. Lê tişta bi me re di bin hişê me de tenê bertek bû. El-aman kirinbû! Ev jî şêweyek mezinbûnê bû. Di kesayeta wê de rstiya zewacê bi hinek cihan ve girêdan, di hinek tiştan de tengavbûn, di nava şer, pevçûn nakokiyê de bûyîne. Dema axaftin ser destpê dikir, Birayê min vala vala ne digot; “ma ez dînim bizewicim. Dê ew keçên xelkê jî dîn bike. Ma ne heyfe?” Ango bizewice jî dê keçek din bê bikeve nav vî agirî.

Ne gengaz bû em ji wê dûr û cihe jî bin. Dê teqez dayîka min xwe dirêjî me bikira û destwerda. Weke din jî zewaca keçek ciwan dihat wateya derketina ji malê. Ma qey malên din pir cuda bûn? Dibe ku ji dayîkê rizgarbûn çareseriyek be, lê vê carê jî dayîkên cuda derdiketin. Weke dayîka Tonton!

Na, ger Metîn şoreşgeriya min erê bike, em bikarin vê jiyanê bihev re parve bikin, em dikarin pêvajoya dergistîbûnê veguherînin zewacê. Di wê mijarê de redkirinek hişk tine ye. Lê kes piştewaniya min nake. Berî her tiştî eê hêjî hevûdû nas nakin. Pêvajoyek kin a nasînê çêbû. Bes lêgerînên wê demê cuda bûn. Cîhana me ya hest û ramanan teng û paşverû bû. Ma qey dergistîbûna me çibû. Ew jî baş ne dihat zanîn. Di rewşek wisa de navberek dirêj çêbû. Êdî ti wateya wê girêdana biçûk, erzan û ji rêzê ne mabû. Çi ji wê girêdanê şûnve mabû, ezê l içi bigeriyam û ezê bi çi ve hatibam girêdan?

Peywendiyên bi malbata wî re çewsîneriya dayîka min hişt ez zêdetir li dijî wê girêdanê bertek raber bikim. Gelek caran tevî ku ne rast bû dîsa jî min xwe bi ser Metîn de aciz dikir. Min ew tewanbar dikir. Wê demê pergala malbata heyî çi dida mirov? Hêza qanekirinê jî tine ye. Hêjî pêvajoya şoreşgerî zarok û paşketiye. Nêzîkbûnek bi hedar, kamil û polîtîk jî tine. Lê pêşketin jî gelekî lez in, tiştek herî biçûk bi qasî misqalekê wan pêşketinan bandor bike re tehemûl tine ye. Min dayîk, malbat, derdor, kevneşop tev girtine beramber xwe. Pevçûnekê bi wan re dijîm. Ne hêsane ku bi tena serê xwe jî rizgar bibim. Tevî vê jî ji xwe re dibêjim; “ezê vê pirsgirêkê çareser bikim.” Ma ne şpreşgerî jî hemêzkirina zehmetiyane?

Heval di ferqê de ne. Bi taybet ez gelek bûyeran ji hevalên ku em bi hev re xebatên perwerdeyê dimeşînin re vedibêjim.

Ew jî zêde çareseriyê ava nakin. Ji ber hinek hevalên din jî zehmetî dijiyan. Ger karek weke hatine cem hev, agahî dana cihekê, şandina notekê û xebatê lêkolînê kirin, ango erkek herî biçûk pêkanîn ne hêsan bû. Kesî jî ev înkar ne dikir. Bi taybet jî şoreşgeriya jinê qet ne hêsan bû. Di nava malbatên me digot herî zêde ew baş in de, cur be cur çewsînerî û qedexe hebûn. Ya rastî malbatan ne dixwestin zarokên wan ên xort jî şoreşgeriyê bikin. Ji ber şoreşgerî, li dijî dewletê serî rakirin bû.

Binkeftinên berê di bîra wan de ye. Janên wê hêjî ne hatine jibîrkrin. Dîsa gelek ciwan di vê rê de şehîd ketine. Denîzan hatine darvekirin. Mahîran hatine qetilkirin. Her wiha ciwanên ji Dêrsimê yên ji wê demê mane mînak dihat dayîn. Her yek ji wan li bajarên mezin jiyana xwe kesî saz kiribûn. Ango tiştek ne kiribûn. Ev kar ne hêsan bû. Xeternak bû. Dewlet bi hêz bû. Zalim bû, destûr ne dida. Dê bê rehim hemû ciwan bişewitandan. Belê hemû gumanên reş, tarî û şêlo serwer bûn û ev jî xilas ne dibûn.

‘Wekî ku malbat ji dest pêkê ve bi rêxistinkirî be’...

Peywendiyên min herî zêde bi Cemîle, Kabîre, Sevîm, Nurheyat, Tirkan û bi Qîmet re hebû. Ji ber Qîmet mamoste bû, piranî di bêhin vedanan de derfetên me yên hevdîtinê çêdibûn. Malbata Nîmet, Meneşekçe û Perîxan ê ya qerebalix, tejî keçên ciwan hebûn. Me di semîner û civînan de hemû didît. Malên wan bi temamî ji mere vekirîbû. Mala wan fireh û pir xurfeyên wan hebû. Li kêlekê bû. Herî jor li ser girê gundê Anafatma bû. Xeterî nebû ku em tim û tim biçin. Di heman demê de dayîka wan, Dayîka me ya “Gorkî” bû. Me qasî “Dayîka Pavel” nirx

didayê. Ew jî ji van keç û xortên xwe razî bû! Wekî ku malbat ji dest pêkê ve bi rêxistin kirîbû. Gelo ev çawa pêşketîbû? Me hemûyan bi baldarî li dinêrî. Ji ber ev alî bandor limedikir. Ji xwe di wê pêvajoyê de em bi tiştek din ve mijul nedibûn. Dayîka wan ji her kesî re di got; kurê min, keça min. Xwe dikir heyran û qurbana me tevan. Dem bi dem tevlî nîqaşên sîyasî jî dibû.

Aliyên wan ên ku dişibiyan hev û xisletên wan ên hevbeş hebû. Li gel vê hemû jî ji hinbûna teoriyê re vekirî û baldar bûn. Tenê Elî cûda dima. Nasnavê Elî Çolo bû. Dema min dinivîst, ji bo ev nasnav bê bîra min sê roj derbas bû. Dibe ku ev nasnav ne ew qas giring be. Lê ez dixwazim her tiştê têkildarê vê malbatê de vebêjim. Ji ber malbatek pir cûda bû, her endamek bi serê xwe erkek bû. Di vê watê de malbat ne di bû ku malbatê bêyî Çolo pênase bikim. Ji ber " xwişkên Çolo" ne dixwestin bi nasnavê Çolo werin naskirin. Ev nav rastiyek biçûk dîtinê bû. Çolo an go Elî zarokê malbatê yê " ne sekinî" û " dîn" bû. Malbatê ew pir bi hêsanî yekî xirab û serserî dida nîşan. Hetta gomanek wisa pêşketi bû, ku polîs ji vê serserîtiya wî sûd werdigire. Zêde bawerî pê ne dibû. Navendên ku ew lê bû, her kesî bi dizî kar dikir. Tevî van nêzikbûnan Çolo wekî sirekê ma.

Xwişka Qîmet qîza malê ya herî bi aqîl û bijare bû. Mûsa jî li Enqerê dixwend. Ew jî heval bû. Lê Qîmet derketibû pêş. Ew malbat êdî bi navê Qîmet dihat nasîn. Di malbatê de her helwest û gotina wê esas dihat girtin. Bi giranî ji ber van tiştan me jî nirx dida û girîngî dida nêzikbûnên wê.

Aliyên rakêşwer ên ku endamên malbatê derdixist pêş, tevî ku ne dewlemend bûn mala xwe di her astê de ji xebatên me re

vekiribûn. Weke din ti malbat di vê astê de ne vekiribûn û derfet ava nedikirin. Malbatek endamên wê ev qas ferd-perest û xwe dijî çawa dibû, ev qas weke rêxistin û dewletek biçûk kêr hatîbû. Ya rastî keçên wan di aliyê fizikî de jî ne xweşikbûn. Her yeke ji wa xwedî xisletek, dîtbariyek "Zilamtî" de bû.

Qîmet ji hêla fizikî ve çors, reş û temenê xwe nîşan ne dida. Porê wê kin, birhên wê stur û bi hev ve bûn. Xwedî îfadeyek sar û hêrs bû. Hinde çixare vedixwar lêvên wên şîn bibû. Menekşe jî eynî weke wê bû. Nîmet, Perîxan û yên din ji hêla fizikî ve nêzî hev bûn. Tevî vê rakêşweriyek yê wan ê ecêp hebû. Hemû jî ji hêla teorî ve kesayetên pir daxivîn, tê digiheştin, nîqaş dikir û jîr bûn. Li malê pir xizmet dikirin. Her kesî xizmet dikir û malavaniyekê pir baş dikirin. Qîmet bi sekna xwe ve "Xatuna" malê bû. Weke pêşengê rêxistin an go eşîretê bû. Xisletên wê yên herî ber bi çav, zêde çixare û ça vedixwar û zêde di axivî. Lê li malbatê pir bi bandor bû. Bi rastî jî ew malbat bi çerxa wê digeriya. Her çendî mûçeya emeklîbûnê ya bavê wê hebe jî, mûçeya wê ya mamostetî û siyasetmedariya pergalek bi wê ve girêdayî ava kiribû.

Derve de jî şoreşgertiya jinek wisa bandor dikir. Derfetên çûna her derî û bi her kesî re hevpeyvînê hebû. Her çendî mamosteye, xwedî çanda Kemalîstiyê ye, xisletek rêxistin kirina kesayetan bi dest xisti bû. Asta derdora civakî, siyasetmedarî ferz dikir. Nêvengên malbat û gelemperî yên pêş di ketin şêweya wê ne kêm bû. Ev rewşa wê ew di nava koma me de jî derdixist pêş. Di nava malbatê de komek jin yê wisa amade û çalakgeriya wê ya di nava vê komê de di hişt ku Qîmet " yeke girîng" were dest girtin. Tevlîbûn û çalakgeriya jinê bandor hem li kom ê û hem jî li derdor dikir.

Weke din kesayetên weke Tirkan, Nurheyat, Ayten û Sevîm jî xwedî pêşketin û bandorê bûn. Li ser şoreşgeriya Jinê, jina Kurd, cihê wê di nava têkoşîna Rizgariya Netewî de di hat nîqaş kirin, di semîneran de ev mijar zêdetir di hatin vekirin. Nivîsên lêkolîn û nirxandinên cur be cur di hatin amade kirin. Hevalên jin û zilam bi hev re ev kar rêve dibirin. Her çendî nêzîkbûnên nebes, paşverû, sere sere, bandora xisletên çînî hebin, giyana ku ji girêka kur derketiye, ji serî ve bi pêşketina bîrdoziyê re tevlîbûnek hev beş daye avakirin, bi hev re xwedî li dozê derketiye, pêwistiyên wê tîne cih û hewildanek hev beş pêşketiye.

Nêzikbûnên kevneşop kêm jî be, bi têgihiştina bîrdozî, parêzvaniya wê û bûna endameke alîgir ya bi biryar ve, bi lez dişikin û di roxin. Nîqaşên dû-dirêj, ji xebatên propoxande-ajîtasyon ên di nava pêvajoyê de tên meşandin zêdetir, ji kêliya dest pêkê ve kêlî bi kêlî, roj bi roj bi ferzên jiyana pratîkî ve tevlîbûna nava refên me re zêde dibûn. Bê goman di vir de zanebûn hebû. Têkoşîna bîrdozî her tişt ser û bin dikir.

Fêm kirina rastiyên teorî-bîrdozî, bi wan re ji her alî ve zelalbûnek lêkolîn û xwendin pêşdixist. Pejirandina rastiyên bingehîn û pê bawerbûn gavek girîng bû. Ji xwe yên din ji ber xwe dihat. Nîqaşên di hundir de dihat kirin, girîngiya ji perwerdê re dihat dayîn û weke xebatek girîng dest girtin, nîqaşên hûr û kûr ên bi komên çepgir re pêşketina teorî-bîrdozî bi lez dikir. Nîqaş ne hêsanî bûn, tam şerek bû. Di nava pirtûkan de li Kurd û Kurdistanê digeriyan.

Diviya bû, Markb, Lenîng û Engels ji tirbê derxista û ji nûve bi hata nivîsandin. Ji ber serê xwe pir şêwazek dogmatîk, bi mijarên kevnar re mijûl dikirin. Rastiyên giştî jî li gorî xwe

di nirxandin û şîrov dikirin. Lê welatparêzî, şoreşgerî, sosyalîstî û enternasyonalî bingeha her tiştî bû. Bi van diyardeyan pir dilîstin û xirap berovajî dikirin. Gelek diyarde di xistin şûna hev. Dûrbûna ji rastiya Kurdistanê, asta têkoşîna bîrdozî paş ve dikişand û ber bi zemînên neyênî ve dibir.

Xwedê Kir yên me hemû netewparêz bûn'…

Em rojekê li mala Medîne ya keça meta min a mezîn ku me jêre di got Bibî bûn. Hevjînê wê Xidir gundî û xizmê bavê min bû. Medîne û hevjînê wê ne aligirê ti rêxistinê bû. Zarokên wan jî biçûk bûn. Lê her kes şoreşger ditîtin û hez dikirin. Wekî din alîkariya maddî jî dikir. Divê mijarê de zêde dil vekirî bûn. Malê xwe jî ji mere tim vekirî dihiştin. Di nava xizmên li derdorê de tenê em weke alîgirên bîrdoziya Rizgariya Netewî bi vê malbatê re têkildar bûn. Yên din piranî di nava çepên Tirkan de bûn. Nîqaşên di navbera ciwanan de û helwestên tûj weke malbatên din ev malbat jî xemgîn dikir. Ji ber vê di gotin " Xwezî hûn hemû di nava heman rêxistinêde bûna, ma ev rêxistinên cûda cûda ji ku derketin"? Û bivî rengî bandora neyîniyên heyî diyar dikirin. Heta ji ber li hinek malan helwestên zêde hebûn, tengazarî jî zêde pêş diket. Dayîka min jî li himber vê rewşê xwedî hîn zêdetir bi şand dihesiband û di got "Xwedî kir ku yên met ev Netew-parêz in. Ger ji partiyên cûda bûna wê misoger hev dû bixaran!" Dema wisa di got kêfa min di hat.

Kurê Apê min Mistefa Celal, Aynûra Keça Bibiya min û ez li xwaringehê rûniştibûn, hem me ça vedixwar û hem jî me nîqaş dikir. Mal qelebalix bû, mêvan hebûn û dayîka min jî nava wan de bû. Ez zêdetir bi Celal re nîqaş dikim. Ew bi xwe

kadroyê pêşeng ê PDA bû. Lê ne diyar bû Aynûr çibû. Carna dibû TÎKKO û carna jî dibû HK yî. Wê rojê jî bibû PDA yî. Tim û tim di ket navberî û têkilhev dikir. Nîqaşên me di mijara "Dagirkirina Dagirkeriyê nabê" de xetimî bû. Ji xwe çepê Tirka ev gotin ji ber kiribû. Ev bi şêweyek dogmatîk ji rastiya Kurdistan û Tirkiyê dûr di hat dest girtin. Bi israreke bê dawî ev nêrin di parastin. Ji xwe hinek kesên hinekê ziwa û hinek jî entellektûel bûne ev biz ziman dirêjiyekê ve di xemilandin û pênase dikirin.

Celal jî hewil da vê nîqaşê di vê berfirehiyê de bimeşîne. Paşê jî rêbazê reş kirinê esas girt. Hinek kes li gorî xwe dinirxand û qaşo rexne dikir. Zûlfî Ozkan an jî hevalê me bû. Herî zêde navî wê zikir dikir û peyvên tawanbar bi kar di anî. Bi rastî jî Zûlfî kesek çeloxwarî bû. Di nava me de jî bi pirsgirêkên xwe ve dihat nasîn; lê bi me ve girêdayî bû, wê ev kom kesayet pê bida qezenc kirin. Ev bawerî hebû. Dibe ku nebesiyên xwe hebe, dibe ku kesek xirab be jî, lê veguhertin gengaz bû. Ji xwe armanca vê komê jî rizgar kirin, nû kirin, bûna xwedî kesayet û avakirina nasnameya kesayetiyê bû. Çi dibe bila bibe Zûlfî hevalê me bû, ji ber vê di gotinên heqaret ne dihat pejirandin. Celal di nîqaşên xwe de gotibû helwestên wî yên nîqaşan mirov har dike.

Rast bû, bi rastî jî di nîqaşan de yê miqabilî xwe har dikir. Ev jî bi asta wî ya teorî-bîrdozî ve girêdayî bû. Di heman demê de kesayeta wî jî ne bi pîvan bû. Lê dîsa jî dema Aynûr navê wî û navê çend hevalên din dan û çêrî wan kir û li ser hev dûbare kir, min êdî xwe ne girt ez rabûm ser lingan, cihê ku ew lê runiştiye min ew da ber kulma. Dema Celal kete navberê min got; têkil nebe, yan ezê li te jî bixim. Rêzdar bin. Gel hûnê

nîqaş bikin wekî mirovan nîqaş bikin. Hûn nikarin heqaretê bikin". Min bivî rengê pêşiya destwerdana wî kir. Celal di vir de matmayî ma û zêde wate neda hêrsbûna min. Dîsa jî hewilda min hedar bike. Aynûr jî li aliyê din di qêriya û di got; "Hûn netew-perestin, hûn heman wekî Turkeşçiyanin. Hûn bi kar anîna kolmên xwe û lê xistina masê ve şoreşgeriyê dikin. Em vê ji te re nahêlin". Hem di axivî û hem jî di giriya. Li ser gengeşiya me dayîka min hat. Min carek din got:

" ger bi vî rengî nêz bibin wê lêdanê bixwin!" Û ez ji malê derketim

Aynûr dîsa hêrsa xwe ne girt û li pey min hat eywanê û qêriya:

" Hûn netew-perestin, hûn Turkêşçîne, hûn wer dihesibînin ku bi mêraniya xwe ve tiştekê bikin. Em vê ji were nahêlin!". Cîranan ti wate ne dida vê qîje qîja wê. Ecêp-Ecêp li min dinêriyan.

Rûyê Aynûr ê reş û şîn demeke din demekê berdewam kir. Kîna wê demeke dirêj dewam kir. Kolana ku piranî PDA yî lêbûn kolana Demîroluk bû. Li derdora kolana nexweşxanê jî hebûn. Ji xwe hevalan ez şiyar kiribûm û gotibûn li wan derdora negere, ew kîndarin dibe ku li te bixin. Lê min dîsa jî guhdar nedikir û ez diçûm.

Dibe ku tiştên hêjayî di hatin dîtin pir çors di hatin pênas kirin. Lê rastiyek jî vedigot. Dema di gotin Netew-parêz pevçûn û tundî dihat bîra mirov. Ji dilxwazekî heta alîgirek ji rêze û heta kadro bi her kesî re giyanek hevbeş a şerker hebû. Ev jî giyana şerê şoreşgerî bû. Baweriya li hember bîrdoziya Rizgariya Netewî û şoreşgeriya wê weke agirekê ketibû dilê me.

Belê; ev jî girêdanek balkêş pêşdixist. Berdêla vê çi dibe bila bibe parastin û sekna li dijî her cure êrişan hînî me dikir. Kesekê ne di got, "ev qasî pê bawer be û ev qasî xwedî lê derkeve". Na, ti gotineke zorî û quraleke hişk ne di hat ferz kirin. Her kesî ji heta wê rojê xwedî li welat derneketibû, ji nasnameya xwe dûr ketibû û biyanîbûn dijiya ji xwe şerim dikir. Dema ev ji xwe şerimbûn vediguherî zanebûnê kûraniya ku dihat hîs kirin û hejandina pêş diket, girêdanek hez kirin, giyanek her tiştê xwe datîne holê û bertekên wê pêş diket. Xizletên bîrdoziyê ku derketibûn holê jî ev bûn. Lewma her kes ne dikariya bibe Netew-parêz.

Êdî di nava gelde jî, xizlet û xoy ên jiyanê cûda dîtîn, ecibandin pêş diket. Bes ji aliyê din ve ji ber xeter didîtin zarên xwe dûr dixistin an jî ger zarên wan di nav de bin, her tim bi goman dijiyan. Ya rastî ev tiştek xwezayî bû û di cewher de jî erênî bû. Her çendî wekî nakokiyekê dixuya rastiya wê ya pêşketinê diyar dikir. Ji ber wê diyardeya baweriyê bi demê re pêşbiketa. Ma di rewşa heyî de wê bi çi bawer ban?

Diyardeya Kurd û Kurdistan komkujî, hovîtî, koçberî û îxanet danî bîra wan. Ev ne hatibû ji bîr kirin, di hiş de cih girtibû. Lê diviya bû xwîn ji vê birîna bihata û ev birîn hatiba şiyar kirin. Hatibû rewşa miriyê di nava êşa bêdeng de digevizî. Lê her gotina vegera li cewher vedigot, her gava baweriya li pêşerojê hildigirt, dihejand û bandor dikir. Wekî tîrejek hêviyê bû. Di nava tirsa mezin, dûr bûna ji cewher û di biyanî bûnê de, di nava tarîtiyêde wekî tîrejek hêviyê derketibû.

Şerê bi tirs, tarîtî û biyanî bûnê re dest pêkê di kesayet de di hat jiyîn. Her ku kesayet diket ferqa rastiya xwe, ji qonaxekê digirt, şer di nava malbatê de gur dibû. Paşê derbasî dibistan,

kuçe, kolan û qehwexaneyan dibû. Her ku diçû li dijî saziyên dewletê di tundiyê de vediguherî diyardeyek zelal. Ev jî dibir zelaliya hedef û armancên wê. Her yek bi yên din ve girêdayî, di nava xwede xisletên zehmet û cuda yên xweseriya xwe hebin jî hemû jî pêvajoyên pêwîst ên yekbuna bawerî, zanistî, biryardarî û îradeya wan bû. Lewma bi teqes diviya bihata jiyîn. Ji ber şêweya her pêwendiyekê xisletên jiyanê, bingeha ku ew li ser pêşketine, reda vê rastiyê, dijî wê û dijmin bû. Her pergal û her sazûmanî xirab dibû. Berjewendiyên wan vale derdiket. Ji windabûna nasname û kesayeta ferd, ferd-perestiya di nava malbatê de, parçebûn, dûrbûna ji netewî, girêdanên paşverû, teng, kole yên ku ti hêviya pêşerojê nadin, ji tengazariyên paşve dikişînin rizgar bûn, "sonda ji vê zemînê derketin, biryar û gava pratîkî bi serê xwe şoreşerk bû".

Tekoşîna bîrdozî tundîya şoreşgerî ferz dikir

Jiyan heya wê rojê bi pevçûn û nîqaşan derbas bibû. Girêdana malbatê didoma. Lê şer û pevçûnên esasî nû destpê bikira. Ji ber şoreşgerî bi destûr, tika kirin an jî bi çêr û lêdanê ne dihat meşandin. Destûra ji malê girtin, hesabên quralên dibistanê kirin, kevneşopiyên derdor, hesabên nirxên civakî kirin û hwd ji her alî ve te girê dida, tê bi sînor dikir û te bi asteng dikir. Şoreşgerî hemû jiyana xwe dayîn bû. Rastiya herî zelal em hîn bûn ev bû: Ew jî canên xwe danîna holê, bi hêz û jêhatiya xwe ve tevgerîn û kirina xizmetê bû!

Dibisitan wekî amurekê dihat dîtin. Xeyalên weke daxwaza xwendinê, ji dibistana amadeyî ber bi zango ve çûyîn hildiweşin û namînin. Di vê mijarê de hevalan ti carî ne gotin, " Dev ji dibistanê berdin û dibistanê hez nekin!" Di rastiyê de

dibistan zemînek mezin bû. Ji xwe ev zêde ne dihat nîqaş kirin. Rastiyên heyî te hîn dikir. Jiyan te neçarî vê dikir. Divê mijarê de pirsgirêk tune bûn.

Bi dibistanê re girêdan heye. Cihê ku herî zêde em lê nîqaş bikin jî dibistane. Ciwanên ku dînamîkên civakê bûn li dibistanan bûn. Ew potansiyel bi xwe jî zemînê pevçûnek ji agir bû. Hevalan car bi car şiyarî dikir û di gotin, "di nîqaşan de newin tehrîkan. Ji çêr û lêdanê dûr bisekinin. Bi van nîqaşên neyênî ve cewhera nîqaşan berovajî kirin û bandora wê asteng kirin e. Lewma hîn zêdetir bi kamil û esas girtina zanistiyê ve nîqaş bikin". Me di vê demê de ji klasîkên Pirsgirêkên Newetî, Pirsgirêkên Dagirkerî, Mafê Diyar kirinê ya Netewan û Rêgezên Lenînîzmê sûd werdigirt. Ji ber nîqaşên Pirsgirêkên Netewî bi demogojî û bi nirxandinên tevlîhev kirinê ve berovajî dikirin. Li ku derê tiştek ku rastiya Kurdistanê û Cewhera Sosyalîzmê red dike, wê ser û bin dike hebûya ew didan pêş, bi hinek xemlên teorîk ve demdirêj di rojevê de dihiştin.

Di nava van koman de rastiya herî ber bi çav dûr bûna ji lêkolîn, lêgerîn, xwe gihandina zanebûna dîrokî û ji guhertinê re vekirîbûn bû. Lewma nêrînên bîrdozî di nava wan de her tim bê pîvan bû. Ji ber dahûrînên rast ên teorî-bîrdozî ne dihat kirin, şêweya şoreşgeriya gelemperî ya bi kesayetan re jî her ku diçû bê şêwe dibû û kesayet û xoyên çeloxwarî derdiket. Şoreşgeriya ku li ser cewhera xwe ava nebe çiqas kirêt dibe! Ji ber mantiqê beriya niha heta cihekê diçû. Dagirkeriya Tirk û xisletên wê yên Kemalîst mirovatî û Kurdewarî xilas kiribû. Hewildana derketina ji vê, daxwaza şikandina vî qalikî û biryardarî şeref dida qezenc kirin û xweşik dikir. Lê dema

gelekan bi israr ev qalik di parast û tenê şêweya şoreşgerî û çepgirî didan diyar kirin pir tirnak dibû. Di vê watê de şansê di veguhertinê de tiştê werin bi dest xistin tine dibûn. Ji bilî şiyarbûna netewî û yekitiya ku ew dide avakirin bi navê şoreşgerî asteng kirinê zêdetir tiştek nedikirin. Ev înkar di heman demê de bandorek pir xirab li ser çarenûsa çepê Tirk jî dikir.

Fermandarên komkujiyê yên Komara Tirk gotibûn, “ ên ji gel û yên nêzî xwe re nebe yar ji min re qet nabê yar, lewma ti caran kesên ku xiyanet û hevkarî kirine, pir xirab têkil vêbûne bawerî bi wan ne anîne û ber wan ve neçûne. Lê xweziya çepgirên wan jî ji vê nêzîkbûnê bandor bibûna. Xweziya bigotan, “ hûn nikarin bi vê halê xwe yê kole ve dirustbûna rizgarkarina dû gelan, parastina biratî raber bikin; dest pêkê lanetê li koletiya xwe bînin, hêjayî şerefa ji wê rizgar bûnê bin, dê ev gav biratiyê pêşbixe”. Ez di wê baweriyê deme dê li Tirkiyê şoreşgeriyek bi pîvan pêşbiketa. Çepên Tirkan koletî û nexasim ên koletiya wan rakiriye asîmanan ji xwe re wekî yar hilbijartin. Ji înkarê re gotin enternasyonalîzm û biratî. Ji şovenîzma civakî re gotin, sosyalîstiya herî mezin û demokratbûna herî mezin. Lê encamên van pir xirab bûn û gelek tişt xirab kirin.

Tekoşîna Bîrdozî-polîtik tundiya şoreşgerî ferz dikir. Nêzîkbûn û xebateke biçûk bi gelek zehmetiyan re rûbirû dima. Hedar, kedek kûr, şiyarî û fedekarî dixwest. Tiştek bi hêsanî ne dihat bi destxistin. Zemînê heyî tenê bi nîqaşên bîrdozî û asta têkoşîna polîtîk ve bi sîndor nebû. Ji dest pêkê ve aliyê tundiya xwe ya şoreşgerî hebû. Hemû diyarde û dahûrîn xwedî vê cewherê bû. Bi taybet li Dêrsimê kûr kirina têkoşîna bîrdozî, bi

têkûs û tenduristî avakirina bingehê rêxistinek hêzdar, têkoşîn û şerek pir alî ferz dikir. Lewma kom bi vê taybetmendiya xwe ve dibû hedefa her kes û komên din. Di heman demê de tişta ku pêş diket bûna mûxatabekê bû. Hêzek nûnertiya nûbûnê dikir. Lewma bivê nevê rewşa xwe ya berbiçav wisa bû.

Lê mixabin bingeha van koman a bîrdozî û polîtîk ji ber hebûna xwe bi spartina Kemalîzmê ve di domandin gelek caran li dijî Bîrdoziya Rizgariya Netewî ne di cih de û ji derveyî îradeya me di zemînên ku me ne dixwest de pevçûn ava dikirin û rê ji êrişên tund re vedikirin. Di vê mijarê de tehrîkek mezin hebû û tengav dikirin. Ji ber mercên hebûna wan ji bin piyên wan dixişikî rewşa wan ya rasteqîne roj bi roj baştir derdiket holê, ev kom har dibûn. Lewma di nava girseya xwe de ev tevger weke hedef didan diyar kirin. Di nava navenda propoxandeya wan a dijber de ev tevger hebû. Tevî ku di nava wan de cihetiyek teorîk û bîrdozî tinebû, her tim xwe bi xwe re di nava pevçûnê de bûn û bi hev diketin. Ya rastî ji dest pêkê ve 'Çepgir' bê rêxistinî ferz dikir. Ji ber rêxistinbûn avakirina yekîneyên hêzdar bûn. Di heman demê de lîstina rola yekbûnê bû. Lê mixabin ti xisletên van, ne di nava gel û ne jî di nava ciwanan de ne bû ku yekbûnê ava bikin. Berovajî kûr kirina cihêtî, parçe kirina hêza gel, şêlû kirina hedefên hevbeş, di astek diyar ker de derfetên têkoşîna hevbeş û red kirina bi kar anîna amûrên wê, xisleta van koman a hevbeş bû.

Em dikarin bêjin ku, aliyê wan ê hevbeş û dibûn yek tenê ev bû. Lewma bi tevgerek herî biçuk re û hewildana şoreşgeriya herî biçuk re hemûyan pir hêsanî eniyek dijber ava dikirin. Heta hinek caran hem polîsên dewletê û hem jî ew di heman eniyê de heman rojê û heman kêliyê êriş dikirin.

Êvarekê li kolê polîs li pey hevalan ketibûn. Heval çekdar bûn. Di kêliyek wisa de malbatê HK yi yan hem deriyên xwe ji hevalan re venekirin û hem jî aliyê ku heval pêve çûn nîşanî polîsan dikirin. Malbatên me yên ku wan dibînin jî mat dimînin û dibêjin ‘şoreşger îxbara şoreşgeran nake. Ji ber ev quralê herî bingehîn bû û exlaqê herî bingehîn bû. Her ku gel ev bê exlaqiya wa didît li himber şoreşgeriya wan jî şik dibirin. Jiyan, mercên têkoşînê û amurên wê zelal bûn. Egidî jî û şoreşgerî jî ‘ Di qada mêraniyê de diyar dibû’. Li vir Egidiya ku xwe îspat kiriye rêzdarî ava dikir. Ji bîlî kesayetên ziwa bûne, niyetên wan xirab û bi zanebûn helwest digirit her çendî berbiçav di eniyek dijber de cih bigirin jî gelemperiya gel û ciwan li himber kesên Netew-parêz rêzdar bûn. Ji ber di bingeha rêzdariyê de biryardariya bûna hêz, îddîa bûna xwedî exlaq hebû. Her çendî hinek malbatên di bin bandora wan de dijber bin di gotinên wan de jî rêzdarî hebû. Pîvanek giranbûnê hebû. Ev jî tevger ava kiribû. Ev nêrîn û ev xisletên şoreşgeriyê ku derketine pêş cihê xwe dîtibû. Rewşa li himber hemû binesaziyên ku hene bûna hêzek alternatîf bi vî şêweyî xwe îspat dikirin. Soza şerên pir mezin, hêviyên pir mezin, nirxên madî yên pir mezin ne hatibû dayîn. Bi çend gotinan, bi çend diyardeyan, bi çend kesan û di nava jiyanek pir xizan de destpêkiribû. Lewma ev rastî ew mat dikirin. Yên ku kena xwe dikirin, yên ku baldar nêz ne dibûn, bê hesab diketin nava pevçûnan êdî bi tevdîr nêz dibûn.

Çareseriya dayîka min û ya qîmet ji hev ne cûda bû

Li malê qiyamet berdewam dikir. Dayîka min hewil dida beriya ku Peder ji bêhnvedanê vegerê pirsgirêka min çareser bike. Ne dixwest berpirsyariyê bi tena xwe hilgirê. Ji ber ger bi Peder re parve bikira kesî ne dikarî wê bê maf nîşan bida. Çun û hatinên hevalan ên li malê kêm bibûn, heta kesekê nedikarîn bên. Yên di hatan jî pir vekirî ji wan re di gotin, "biçin têkilî keça nebin, hûn ji zarên me çi dixwazin, ji xwe we mala me şewitand!" Bi vê jî têr ne dibûn li ser rêyan kîjan heval dîtin an jî liqayî di hatin helwestên xwe raber dikirin. Hinek hevalan ne dixwest nêzî malê derbas bibin.

Dibistanên gundan zû hatibûn girtin. Ji ber bêhnvedana Somester Qîmet jî hatibû. Wê rojê di kêliya ku Qîmet jî amade bû de min rewş ji hevalan re vekir. Min ji wan re got, ez êdî nikarim êdî li malê bimînim, şert û mercên vê nemane û tevlîbûn û pêwendiyek bi vî rengî wê min pêş nexe. Heta min ji Qîmetê re got, "Ez dikarim werim gundê ku tu lê dimînî". Wê jî got:

"Em bi hevalan re baxivin, lê bawer nakim malbat qebûl bike. Dibe ku paşê pirsgirêk derbikevin. Ger agahî bigihe Polîsan wê ne baş be".

Paşê di nava komek hevala ya biçûk de çareseriyek weke " Em Sakîne bi endamek komê re bizewicînin" dikeve rojevê. Xwişka me Qîmet li şûna ku çareseriyek din bibîne " ji bo min mêr dibîne". Heta hinek navan jî dide. Dibêje " Ev nebe kesek din dibe" Min helwestek tund raber kir û min got, " ger pirsgirêk zewac be ez ji xwe bi destgirtî me. Dikarim bi Metîn re bizewicim! Derfetên derketina ji Dêrsimê jî çêdibe. Li gorî

min bihîstiye hêjî Metîn di asta CHP ê de çepgiriyê dipejirîne. Xwe bi çepgiriyek ji rêzê ve sînordar kiriye. Heval wisa dibêjin û ti kar jê nayê. Ger rewş wisa be wê pirsgirêk ava bike".

Ez di vir de pir bi zanebûn, bi hizir û bi hesabên her tiştî ve nêz nabim. Lê dîsa jî zewacê çareserî nabînim. Ji ber erkên ku divê beriya têkiliya heyî werin kirin hene. Ez yekser red nakim "zewac min dûr naxe. Lê ez dibêjim ger bingehek bîrdozî-fikir, rêxistin-kom a hevbeş hebe dibe". Li aliyê din ve min hevalên di nava komê de wekî bira didît. Ev gelemperî jî wisa bû. Ji ber têkilî û yekbûnên dest pêkê di vê çarçovê de dihatin fêmkirin û pîroz di hatin dîtin. Ji ber vê divê hevaltiya di nava komê de bi şêwazek din neyê xirab kirin. Nexwe dê weke şerim, guneh û îhlalekê bi hata nirxandin. Her çendî aliyên wê yên bi zanistî û mantik nebe jî rastî ev bû. Her wiha ji ber navên ku dayîn jî ji derveyî van pîvanan bû û her tim bertek dida avakirin. Her çendî her kes heval bûn, hinek dil gerim, hez kirî û rêzdar bûn. Her wiha tenê ji bo hevaltî, girêdan, qebûl kirin û nirxek hebû. Ya duwemînde naveroka van diyar deyan ne dagirtîbû. Lê ji ber min nêzîkbûneke ku dijber didît, ji bon amin ti girîngiya navan nebû.

Belê, di cewher de çareseriya Diya min û Qîmetê ji hev ne cûda bû. Heta dikarim bibêjim ya Diya min hinek din rasteqîn bû. Gelek caran dihizîrim ku, " Ger ez bizewicim biçim Enqere li wir bi hevalan re di nava pêwendiyê de bim û kar bikim wê hîn baştir be!" Û min di got, " Wê Metîn çi bêje? Ger em heman tiştan ne parêzin, ewê vê tiştê ne pejirîne û astengiyek derxe. Wê mafê xwe re bibîne ku xwe xwediyê min bibîne û wê destûrê ne de ku ez li gorî daxwaza xwe tevbigerim". Ez bi van tiştan dihizirîm. Ez ê jî wê demê jê cihe

bibûma ! Dê min li vir de jî hinek tişt winda kiriba û vale derbas bikira. Ger ezê cihe bibim wê demê çima bizewicim. Ma ev tişt ew qas hêsane? Weke keçek ciwan mayîn û hîna dergistî jê cihe bûn hê baştire. Ji ber ya din mijûlî bû. Dê min gelek nirxên heyî bida ber xwe. Dê vê carê jî Dayîkên me yên şirîn her çendî xirab jî bin, wê xemgîn bibana. Ji bo mesrefa dawetê. Wê her tişt li derdor bi hata bihîstin û fermiyeta wê derketa holê. Lewma, paşê ji nişkê ve qut kirin û avêtin zehmet dibû.

Gelo dikariya bandorê li min bike? Na! Min di vê mijarê de îsyan dikir. Ji xwe bawerim! Ji ber kesî di vê mijarê de zorî li min ne dikir. Min ne di got ev asteng e û an go wê bibe asteng. Dema ez dihizirîm qane ne dibûm. Min girêdana têkiliya zewac û şoreşgeriyê bi hev re çênedikir. Guman dijiyam û ne rehet bûm. Ji ber ew têkilî berdewam kirina girêdana du malbatan re bû. Ez niha nikarim rakim. Ezê wê demê çawa bikaribim rakim?. Na na Nakim, qane nabim. Belê ez dikarim çi bikim.

Dihizirim ku demekê biçim gundê Pîrika xwe. Meto jî tevlî min bû. Dayîk û bavê min jî red nakin. Û dibêjin, " Ji xwe ti zeîf bûyî, li wir şîr û mast heye wê ji bo meîdeya te baş be. Heftekê bimîne û were". Tiştên dibin wekî moral bandor li min dike, di nava hestiyariyek kûr deme û xemgînim. Gelek caran bi dizî digiriyam. Ew qas hevalên min ê keç hebûn. Ji çepên Tirkan hebûn. Rewşa kesê ne weke ya min bû. Yên dergistî jî hebûn. Fethiye cîrana mebû. Lê dixwest bixewice û biçe Almanya. Wan ne dixwest ku bi her tiştî ve şoreşgeriyê bikin. Xatuna xwîşka Elî Aydin jî bi dergistî bû. Gûneş jî dergistî bû. Lê neçar bû ku jiyana me ji ya wan cuda ba.

Min ji hevala re got û çûm gund, cardin min got, ‘buhurdar e.’ ez dixwazim pişti çûm wê derê li gund bimînim û peywendiyên xwe bidomînim. Lê pişti çend rojan teng bûm. Heval li bajêr bûn, zehmet bû ku werim gund an jî xebatên heyî li wir bimeşînim. Pirtûkek jî tine bû. Lewma gund ji min re vala û bê wate bû. Ez bi zorê hefteyekê mam û vegeriyam bajêr.

Xisletek min wisa diyarker, an jî rewşek min a li pêş tine ye. Heval jî zê de nakin pirsgirêk, tenê weke çewsandinek malbatê ya xwezayî û rewşa malbatek k dixwaze sînoran deyne dinêrin. Heta di nava koma perwerdeyê d dikin mijara henekan jî. Kena xwe bi çareseriya Qiymetê ya dîtina mêran dikin. Dema digotin bila bêje; “ bila Sakîne paçekê li pêşiya xwe bike, bêje ez mêrek ku min rizgar bike digerim” em hemû bi hev re dengê bilind dikenin. Her çendî ew henek ne bi dilê min bûn ez jî dikeniyam. Dem bi dem jî min bi şansê bawer dikir. Min xwe kesek pir bê şans dinirxand. Bê çaretiyekê dijîm, hêza min têra wan nake, lê bi înad im, bê hedar im û ez naxwazim li wê mengeneyê bimînim.

Ez carek din bi bavê xwe re axivîm. Bavê min guhdar dikir, min jê re got; “ez naxwaim bizewicim. Dixwazim nîşana wan jî vegerînim. Jixwe min ji bilî gustîlkê bikar ne tanî weke din jî hinek zêrên wan hene, em bidin wan. Min tiştek ji vê têkîliyê fêm nekir. Ti cewaziya diya min û wan ji hev tine ye. Hevalên min çi dikin, ez jî wê dikim. Dê tişta ku diya min dibêje nebe.” Bavê min jî hewl dide min qane bike. Got; “temam ger tu naxwazî em zorê te nadin. Lê bêje çima, ma çibû?” Hewl dida min bihedirîne. Dema diya min ferq kir, ew jî hat tevlî me bû. Bi hêrs û hirsek mezin axivî.

"min wê demê jî got. Wan keça min xapandiye. Ji roja Baqî wan hatine vê malê heta niha keça min hezîn dijî. Cîranan jî behs kir. Ji roja ew hatîve ne xilan li ber xwe dike û ne jî xwarin dixwe. Her wiha yazmeya reş girêdaye. Baqî tiştek ji vê kiriye. Rast bêje çi ji te kir. Tu çima dixwazî veqetî, tu çima Metîn naxwazî? Teqez sedemek vê heye. Navbera wan jî xweş bû. Di bêhnvedana Sibatê de Metîn ji mal dernediket. Wê bi xwe jî hez dikir. Îsmaîl ev xapandine. Dev jê bedre, tu pir safî."

Bi qasî karî axivî. Çi qas bê rehim bû. Her gotinek wê zêde giran, mirov dikuşt û gurura min a keçînî dişkand. Lê pir hêsan digot. Qaşo dê wer bikira ku ez dev ji van nêzîkbûnên xwe bedrim û dê sedema ji veqetîna min hîn biba. Pêl rayê min dikir, tehrîk dikir û dihilweşand. Ez çûm odê û giriyam. Carekê çavên min li qabloya teybê ket. Min derxist da ber qirika xwe, bes paşê min dev jê berda. Min danî ser sehpa û hewl da hinekê bi aram bim. Heta demekê bi xwe re di nava pevçûnê de bûm. Şoreşgerî xweş e, hem jî zêde xweş e. Ger ez bixwînim, di perwerdeyan de hîn zêdetir bi zane bibim, biçim hinek cihên din, ezê zêdetir sûd bidim. Xweziya ez di refa dawî ya dibistana amadeyî de bam. Dê min ezmûnên zanîngehê bikiran hêcet û ezê ji malbatê dûr biketam.

Birayê min li Stanbûl bû. Gelo ez biçim cem wî. Lê wî jî her tim dixwest bi tenê bijî. Xwe gihandina wî jî zehmet bû. Gelo ez bi Metîn re bizewicim û biçim Enqereyê. Niha jî ez li vir rawestiyam.

Gelo, hevalan ne dikariya min bişînin cihek dûrtir? Dema çareseriya Qiymetê dihat bîra min bêhna min teng dibû. Çima hevalên din mijûl nedibûn. Tenê Qiymet hebû. Gelo ne dikariyan pirsgirêkên bi vî rengî ve mijûl biban?

Cemîle hat bîra min. Sala 75'ê em bi hev re çûbûn Çewlik'ê. Metîn jî bi me re bû. Lê xalê min di kêliya dawî de hatina wî asteng kir. Bes fermana diya min tûj bû. Ez û Cemîle bi tenê neçûn. Xalê min di kêliya dawî de bi bilêta Metîn ve bi me re hat. Cemîle, Dibistana Hunerê ya Keçan qedandibû û mamoste bû. Erka wê derbasî Çewlikê bû. Dê xalê min bi karên guhertina cihê erka wê ve mijûl ba. Her wiha bi qedirtî cihek qenc dîtiba. Ji ber li navenda bajêr kontenjan tinebû. Meleyek 'yobaz' çûbû gund, ji ber vê wî gundî mamoste ne dixwestin. Gund olperest bû, zaroyên xwe dişandin qursên Quran'ê. Li gund ji Atatûrk re digotin "Atakutik." Gundek li dijî Atatûrk, ti tiştê weke mamoste, navendên tendristî, an jî karmend nedixwest. Nexweşên xwe ti caran nabin nexweşxaneyê.

Mamosteyek min ê ji Wanê di bexçeya Komaleya-Yekîtiya Xwedevanên Tirkî (TÖB-DER) de ji min re vegotibû. Ew jî ji Komaleya Çanda Şoreşgerên Rojhilat (DDKD) bû. Ez jî wê demê pê hesiyam. Rêya Azadî jî hebû. TOP-DER hatibû şewitandin. Hinek bûyer rû dabûn. Mamosteyê min behsa wê bûyerê jî kir. Min li dibistanê fêm kiribû ku nêzî min dibe. Ji ber li gorî wî em "çepgirên Kurd bûn." Kurdînî em zmdetir nêzî hev dikirin. Ev xweayî û hewce bû. Nîqaşên me yên di polê de cardin vekir û behsa rewşa binesaziya giştî siyasî û civakî ya li Çewlikê kir. Wî dinirxand, me jî ghdar dikir.

Cemîle ji binesaziya gund tirsiyabû. Xalê min dîsa bi acizbûnek rûkenî ve digot; "gawir kurê gawiran" tu dîsa nasekinî. Xalê min tim ev dûjîn weke "destnîşankirina hezkirinek mezin" digot. Lê bi rastî jî ji me hez dikir. Ya wî jî hinekê hezkirinek çors bû. Zêdetir jî dema ku sermest bûya ev

gotin dikir. Ew hêjî AP'yî bû. Dema sermest bûya j ime re digot; "heval, ez ji we şoreşgertirim." Di gera ma ya li Çewlik Kovanci tevê de ne rehet bû. Digot; "faşîst cuda ne dê li me bixin." Gelek kesên kum e di otobûs û xwaringehê de dîtin tev singa wan vekirî bû û gerdanên wan nîşana Bozkurt hebûn. Ev jî hê zêdetir ew bê hedar dikir. Weke din jî em keçên ciwan bûn, wî jî li gorî xwe hewl dida me biparêze.

Herî dawî Cemîle jî çû wî gundî û li wir mamostetî kir. Mamostetiya neqş û dirûnê baş bû. Gelek keçên ciwan cihazên xwe çêkiribûn. Hema bêje di navberê de salek derbas bû. Ger ez yekser biçûma wî gundî, minê xwe bigihanda Cemîle. Min Komaleya xwendekarên Tirkî (TOP-DER) jibîr nekiriye, dê bûna alîkar. Lê min di vir de tiştek jibîr dikir. Dê demek nêz de dibistan biketan bêhnvedanê. Lewma dibistanên gundan ji mêjve ketibûn bêhnvedanê. Ev plana min jî pêk nehat. Diba ku çûna heta wir jî xeter ba.

Di kêliya ku min ev mijar bêdeng, bê girî û bi aramî dihiziriya de yekê lez li derî xist. Dayîka min tedîtgîn bû.

"Sakîne Sakîne ka derî veke! Were em bi-axivin, eybe. Were mêvanê me hatine. Eybe. Apê Xidir hatiye, pirsa te dike. Dema xwarinê ye, dê tu çi bixwî. Were bavê te jî pir xemgîne. Serê xwe girt çû. Ew jî hê nehatiye." Bê navber ber xwe de di-axivî. Deng ji min derneket. Carekê qîrek da û got.

"Meto Meto de ka pacêre li xwîşka xwe binê re, gelo vê tiştek ji xwe nekiribe."

Ecêb! Wê jî texmîn kiribû ku ez çi qas bandor bûme. Meto di şibakeya eywanê re li hundur dinêriya. Lê ji ber perdeya tûl tiştek ne dixwiya. Cardin dayîka min bang kir, min dîsa bersiva

wê neda. Meto dixwest destikê şibakeyê bişkîne û bikeve hundur, lê ji ber hemû miftekirîbûn ne karî. Paşê bang kir.

"Xwîşkê xwîşkê!" Dengek bi êş derdixist.

Her ku dubare dikir, min li ber xwe neda. Naxwazim ew xemgîn bibe. Ew hevalê min ê herî nêz û hevalê min ê herî zêde alîkariya min kiriye. Girêdana di navbera me de ji biratî zêdetire. Lewma min bersiva wî da. Vê carê bi aram bû. Dayîka min jî bi aram bû. Min texmîn dikir ku kes li malê tine ye. Nexwe dayîka min tiştek xwe yên veşartî ne dida der. Ne dixwest ku dayîkên tonton bizaniyan.

Qablo li ser sehpa bû. Dema ez ji odê derdikevim, dayîka min wê dibîne û şik dibe. Jixwe min di nîqaşên me yên pey wê re de gotibû ku ez tiştek wisa hizirîme. Ji ber vê heta demekê baldar nêz dibû. Ditirsiya ku ez "dînîtiyekê" bikim. Ma ev jî çare bû? Ger min xwe bikuşta dê çi bihata çareserkirin? Bes dayîka min gotinên zêde giran digot. Min jî hew dikariya.

Madem ev qas heqeret dikir, min kesek ev qas xirab dibîne, çima li cem kesên din dide diyarkirin ku pir ji min hez dike, li ser min difikire. Her wiha dayîka keçek ciwan a xwedî dergistî ye, xwesûya kesek ciwan, cindî, xwedî bejin, xemil û şemal, dibistana bilind dixwîne dê bibe 'zilamek' ye, xwe dide nîşan? Ev nêzîkbûn jî ji min re pir qelp dihat. Min di vir de ji dilbûn, samîmiyet û pakî nedidît. Ez jî di hundurê xwe de dibêjim; " baş e ku birayê min ne zewiciye, ger bûkek li cem hebûya, mîsoger dê nêzîkbûnên ji min re kirine xirabtir beramber wê raber bikira."

Şoreşgerî, azad bikaranîna vînê bû

Divê êdî ez pirsgirêkê çareser bikim. Min vê carê biryara xwe da. Min û Meto serê xwe da hev û dest bi plansaziyan kir. Hevkarê min ê 'kul û derdan' Meto ye. Xembar dibe. Ji ber bala dayîka min tev li ser apên min wan bû, bi destên wan derketina ji malê jî hêsantir dibû. Destpêkê bi Tirkan wan re axivîm. Me dotmama xwe Saîme ji gundê ku lê ye anî. Li Akçadaxê dixwend, dibistana wê Yatili bû. Min bihîstibû ku hatiye bêhnvedanê. Ew jî şoreşger bû. Zêdetir nêzî birayê xwe Baqî bû. Îbo, Mehmet Elî û Baqî! Her yekê siyasetek bi serê xwe bû. Ji TKP, TÎKKO, HK û hw.

Lê ew xwedî niyetek baş û zêde hestewar bû. Di ti mijaran de ne ziwa bû. Dibistana Yatili hinekê jî ew ji pirsgirêkên bi vî rengî dûr girtibû. Li Akçadaxê faşîst hene. Lewma li dibistanê tenê bizaniyan ev ji Dêrsimê ne bes bû. Ji ber xwendekarên bi deqa 'Komînîstî' dihatin nasîn. Bi Saîme dana nasîn dê baş ba. Me dikariya em bi rêya wê bîrdoziya xwe derbasî dibistana Akçadax a Mamosteyan bikin. Em destpêkê di van mijaran de pê re axivîn. Mi li Tirkan hevûdû dît. Agahiya diya min ji vê hevdîtinê tine ye. Paşê min nîqaş bir ser rewşa malbat û ya ez dijîm. Ez zêde nizanim dê Saîme vê mijarê çawa bigire dest, lê ez di wê baweriyê de me ku dê min fêm bike. Min behsa tevî ku em malbatekin, sarbûn û sînora peywendiyên di navbera me de jî kir. Lê min got, ez di wê baweriyê de me ku dê girêdanên şoreşgerî me nêzî hev bike. Piştî li derdora mijarê zivirîm, niha jî derbarê plana esasî de axivîm.

"Binêre Baqî şoreşger e. Berî niha e xwestim, lê ez ji zewacê re ne amade bûm. Ez bi wî re axivîm û min nêrînên xwe jê re gotibû. Ew jî bi kamil nêz bû. Paşê ez bi dergistî

bûm. Ne hewceye ku ez sedema vê mijarê vekim. Ji ber ez çi bêjim hûnê bawer nekin û cuda şîrove bikin. Bi rastî jî ez ji wê re jî ne amade bûm. Lê mixabin çêbû. Ez dixwazim şoreşgeriyê bikim. Dayîka min ji niha ve dawet kiriye rojevê û malbata din jî heman tiştî dixwaze. Heta dibêjin; ‘ Sakîne dikare dibistana xwe bidomîne, dikare qeyda xwe bibe Enqereyê jî.’ Ev demek dirêje Metîn nayê. Ez nizanim bê ka şoreşgeriyê dike an na. Lê ez wer texmîn dikim k udi halê xwe de dimîne. Malbata wî jî dijberê şoreşgeriyê ye. Ez dixwazim jê cihe bibim, bes naxwazim pirsgirêkek were jiyîn. Ewê mîsoger polîsan têkil vê mijarê bikin. Lewma ezê wer bidim diyarkirin ku, ez reviyame û çûme cem Baqî. Dema malbat jî ji vê bawer bû, paşê ezê biçim cihek ku heval guncav bibînin. Emê paşê li ser vê bihizirin. Lê divê em teqez bidin bawerkirin. Divê em nêyîn girtin jî. Ez dixwazim bi bavê te re jî bi-axivim. Apê min qence, dê kamil nêz bibe. Ji ber ew jî yekser nebêjin; “ev mijar temam e, ev bûka me ye” û hema xwedî li min dernekevin. Di vê mijarê de baweriya min bi we tê. Ez di wê baweriyê de me dê Baqî jî kamil nêzî vê pirsgirêkê bibe.”

Saîme mat ma. Destpêkê kêfxweş bû û ez hemêz kirim. Got;

“tu jina birê mey î.”

Em tev bi vê helwesta wê keniyan. Diyar bû ku cidiyeta vê pirsgirêkê fêm nekiriye û zêde hestewar nêz dibû. Me jî ev weke nêzîkbûnek pak didît. Me yekser roj diyar kir. Ezê di nava wê pêvajoyê de nasnameya xwe ji dibistanê bigirim. Min cihê hevdîtinê mala keça Bîbiya xwe ya li Demîrolukê rûdinişt destnîşan kir. Dê ew û bavê xwe bihatan li wir benda min biman.

Min Meto jî baş hişyar kir. Soz da min ku û got dê qet dayîka min wan pê nede hesandin. Min ji dibistanê nasnameya xwe girt. Dema Tirkan wan biryardariya min dîtin mat man. Ji ber destpêkê cidî nedihat dîtin. Her wiha dixwazim ez bi xwe vê pirsgirêkê ji hevalan re ragihînim. Lê niha kesî jî nabînim. Bes ew rewşa min dizanin, dê mayîna min a li wê malê ez ji wan dûr bixistam. Kî çi bêje bila bêje, ezê şoreşgeriyê bikim û kes jî nikare asteng bike. Ev hedef a li pêş min bû. Di nava vê malbatê de şoreşgerî nabe. Dibe ku bi derketina min re birayên min ên biçûk hinekê tengav bibin, lê dê wan hêsantir şoreşgerî bikira. Qet nebê dê kesek wan ev qasî ne çewsîne.

Wê Meto heta demekê tiştekî nebêje. Lê ger tiştên zêde xirab rû bida, dê bigota ez çûma cem apê xwe. Gelo ezê di çend rojan de bigiham Enqereyê? Dê hesaba vê bikira û paşê rastî ji wan re vegota. Dê wî bi xwe wextê mijûlkirinê diyar bikira.

Dema min wê rojê nasnameya xwe ji dibistanê girt, katîbê dibistanê hêcet pirsî, min jî got ez amadekariya zewacê dikim. Destpêkê nexwest bide, got; “divê ez ji mudur re ragihînim.” Min jî bi zimanek pir rehet jê re got dikare jê re bêje, ti pirsgirêk tine ye. Paşê da min û ez hatim malê. Dayîka min çûye gerê. Ez bi vê kêfxweş bûm. Min jî wer da diyarkirin ku diçim mala hevalên xw. Min wê rojê kirasek berî hingê jî li xwe kirî, cardin li ber xwe kir. Demek dirêj bû mine w li xwe nedikir. Dema ez di cadeyê re derbas bûm bala cîranan kişand.

Tam di kêliya ez derketim de bi dayîka tonton re liqay hev hatim. Li ber min rawestiya, serî heta lingê min ber çavan re derbas kirim. Gelo bi min re ecêbûnek hebû? Ne gengaz bû ku fêm bike. Bawer nakim qet hişê wê re jî derbas bibe. Lê min êş

dikişand û ji aliyê wijdanî ve ne rehet bûm. Dê wan mirovên îxtiyar çi bikira, dê teqez pir xemgîn bana. Gelo dê Metîn çi bigot? Dibe ku ez wî li Enqereyê bibînim.

Piştî ku dayîka Tonton qederekê bêdeng l imin temaşe kir, ji min pirsî bê ka ezê biçim ku derê. Min jî got;

“ez diçim cem Emoş wan.”

Naxwazim navê cihek din bidim. Min rast got. Lê wê ne dizaniya ku ez bi çi armancê diçim. Bi tenê diçûm. Ji wê jî mat dima. Bi hezkirî li min dinêriya. Ji dilê min dihat ku wê hemêz bikim û xwatir bixwazim. Tevî hemû aliyên wê yên neyênî min jê hez dikir. Ji ber hinek jî pîr bûn dilê min bi wan dêşiya.

Hêviyên xwe b imin ve girêdabûn. Zarokê wan ê mezin li Enqereyê bû û bûka wan jî ne dixwest bi wan re bimîne. Zaroyê din jî nebûn û keça wan zewicî bû. Yê herî biçûk Metîn bû. Lewma ger bûka wan ji herêmê bûya wê bi tenê nemana. Weke ku dayîka tonton hinek tiştan dihesiya bi xemgînî dikeniya. Ez şêweyek din nêz nedibûm. Min ji xwe re digot, xweziya ez li Enqereyê liqay Metîn werim û em vê pirsgirêkê bi hev re çareser bikin. Gelo ez bi îdealîstî dihizirîm. Min ji xwe re dua dikir. Gelo ez dev jê mijarê berdim? Dibe ku Metîn bihata, ji ber ji bêhnvedana havînê re kêm mabû. Nameyên wî jî tim bê navber dihat. Wêneya min xwestibû. Wê teqez ew jî bişîne. Min rûyê wî jî jibîr kiribû. Di nameya strana Pira Dirama (Drama Koprûsû) nivîsandibû.

“Birê Hesen Pira Dirama tengê nayê derbaskirin.

Avên wê sar in Hesen, zehmete tasek jê nayê vexwarin.

Mirov dikare ev ji dayê bedre, lê nikare dev ji yarê berde…”

("Drama Köprüsü bre Hasan dardır geçilmez.

Soğuktur suları Hasan, zordur bir tas içilmez

Anadan geçilir yardan geçilmez…")

Ev çend riste di bîra min de mane. Gelo dixwest çi bêje, an jî çima nivîsandibû? Qey çi wateya hizirandina van hebû, ez di rê de me û min gav ber bi veqetînê ve avêtiye. Gelo ev xwe sucdar dîtinek bû? Gelo ji bona vê têkîliyê îxanet bû? Bes, ez kesek din hez nakim û bi yeke din re jî nazewicim. Wî jî helwestên min ên li dijî Baqî dizaniya. Min dixwest ji malê derbikevim. Min dixwest şoreşgeriyê bikim. Qirika min dagirtiye, rondik ji çavên min dibarin. Hewl Didim ku kesî pê nedim hesîm. Di rê de liqayî gelek kesan hatim.

Piştî ez qederekê meşiyam ketim ser rêya ku ber goristanê re derbas dibe. Ew rê tenha bû, kes jî nedidît, min lezand. Weke din naxwazim tiştek din bihizirim. Dema ez çûm mala Emoş, apê min û Saime li benda min bûn. Apê min ez hemêz kirim û ramûsand. Zêde kêfxweş bû. Ez di wê kêliyê de mat mam, min ne zanî çi dibe. Gelo Saîme çi jê re gotibû? Belê, apê min ji ber dihizirî ku ez ji bona Baqî direvim, lewra kêfxweş bû. Ez derbarê tiştekî de ne axivîm. Ger ez ji vê demjimêrê şûnde devjê berdim, dê xirabtir bibe. Na, divê ez vê dudiliya xwe bişkînim. Ez êdî nikarim li wê malê bimînim. Taksî jî hatiye amadekirin. Apê min pere da Saime:

“Hûnê biçin Elezîzê mala apê xwe Hesen. Hûnê ji wir telefonî M. Elî bikin û biçin cem wî.”

Di heman demê de wê sibehê telgirafek şandine ji Baqî re. Ez di rê de ji Saîme bi vê hesiyam. Di rê de moralê min pir ketiye. Rêwitiya bi wesayîtê jî min xirab dike. Ez qet na-axivim. Carê Saîme hewl dide min bide axaftin.

“Dê her tişt baş pêk were, xeman nexwe.”

Mirovek çi qas pak û xwedî niyetek baş e! Dibêje; “dê her tişt baş derbas bibe.” Niha li malê qiyamet rabûye. Naxwazim ser bihizirim jî. Lê mixabin ez pê bawer bûm ku tiştên qet nebaş dibûn. Em zêde li Elezîzê neman. Me şev bêhna xwe vekir û sibehê yekser bi otobûsa girêdayî Turîzma Harput çûn Enqere. Dema gihiştin Enqere hêjî hewa tarîbû. Dema em gihiştin Ulus, Îç Cebecî asîman ronî bû. Ji ber Saîme beriya wê jî çûbû, lewra di naskirina navnîşanê de pirsgirêk derneket.

Tax hema serê rêya zanîngeha Siyasalê ye. Dema em wire derbas bûn, Saîme got;

“Evder Zanîngeha Zanistên Siyasî ye.”

Yekser Elî Heyder Kaytan hat bîr min. Gelo Metîn li kîjan Zanîngehê bû? Min dizaniya ku di perwerdeya Gazî de ye. Lê dibistana wan li kur bû? Ger ez lê bigerim, ezê bibînim. Dema min bibîne dibe ku mat bimîne. Lê ez bawer im dê min fêm bike. Piştî em ji wesayîtê daketin panzdeh xolekan meşiyan û Saîme li zengila deriyek qeta binî ya avahiyekê xist. Em hinekê rawestiyan. Jinek temenê xwe nivî derî vekir. Saîme got;

“Ma evder mala M. Elî Polat e.” Jinê bersivand;

“Belê, derbas bibin.”

Em derbasî hundur bûn. Malek biçûke. Eywan û ode di nava hev de ne. Yên razayî şiyar bûn. M. Elî nû ji xew rabû, çavên xwe ferkandin û hat cem me. Mat bû, em her du hemêz kirin û ramîsandin. Me Medîne jî malê dît. Vê carê jî em mat man. Ma ne Medîne çûbû Stanbûl’ê. Her sal diçû cem Gulabiyan. Demek vegeriyane! Medîne jî bi çavê xew ve hat û got;

“Xêre Sakîne ma hûn her du tenê hatine?” Me bi kinasî bersiv da. Ti mane ne dayê. Rûyê xwe şûşt û hat. Her ku yên di malê de şiyar dibûn, mal qelebalix dibû. Medîne cardin pirsî. Ez jî bi rojane tije bûme. Min di rê de zorî da xwe da ku ez negirîm. Lewma bi pirsa wê re ji nişkê ve weke bibare giriyam. Lewma herî zêde M. Elî mat ma û got;

“Sakîne, keça min çibû, hele were em biçin odeya din.” Em çûn odeya din. Min rewşa hetî tev vegot. Hinekê bêdeng ma û got;

“Temam, bes bavê te wan dizanin ku tu hatî vêderê?” Min jî got ez nizanim. Got; “divê em agahî bidin wan, dê xemgîn bibin.” Paşê xwest hewaya herî biguhere û bela xwe li min da.

“Dê herî zêde kêfa Baqî ji vê bûyerê re bê.”

Lê ez di vê mijarê de pir hêrs bûm û got;

“Min rewş ji we re vekir. Hûn li cem min ji xizim zêdetir, şoreşger in. Bi taybet divê hûn vê fêm bikin. Ez di wê baweriyê de me ku Baqî jî rast nêz bibe. Ez nehatime bizewicim. Dixwazim şoreşgeriyê bikim. Ez li benda alîkariya we me.”

M. Elî zêdetir cidî bû û got; “temam keça min, min henek kir, tu mereqan neke. Ger bavê tep ê bihesin tu li vir î, ti pirsgirêk jî dernakeve. Wê demê ti pirsgirêk jî namîne.”

Ez nizanim ew roj çawa derbas bû. Tevî ku westandina rê jî hebû, ez qet nikarim razim. Ez her kêlî ji xwe dipirsim, ‘gelo min şaşiyek kir?’ Dema M. Elî hat got, ji Dêrsimê pirsîne gelo ez li Enqerê me an na. Bavê min pirsî bû. Metîn zêde pirsiye(dîretmîş). Peder wan pir xembar bûne. Du rojan li qiraxê Munzurê li min geriyane. Wer hizirîne ku min xwe avêtiye avê. Heval jî wisa hizirîne. Lê Tirkan wan dizaniya.

Weke din Meto jî dizaniya. Dibe ku ji bona malbata min wan tewanbar neke ne gotibin. Nexwe ne gengaz bû ku bawer bikin. Ne li şûna xwe kuştinê, rizgarî hilbijartibû. Min ev bi hinek hevalan re jî nîqaş kiribû. Meto rola xwe baş lîstibû. Lê mixabin, rola min baş ne dimeşiya.

Mehmet Ekî,

"Em yekser lez û bez mahrekê bikin, ji ber çi dibe çi nabe ne diyare. Malbata te pê hesî ku tu li virî. Dê polîs jî pê bihesin."

Behsa malbata Metîn kir,

"Dibe ku ew ji me gilî bikin. Emê weke şêweyekê bidin diyarkirin. Dema rewş baş bû her kes hedirî, emê cuda çareser bikin."

Min yekser li vir îsyan kir. Ez gelekî li ber nêzîkbûnên xwe yên heta niha min ehmekî kirine ketim. Çareseriya kesek ku ez herî zêde bi wî bawerim û wî şoreşger dibînim ev bû! Min got;

"Na, qetiyen nabe. Ger hûn wisa bikin, ez li vê malê jî namînim. Ezê biçim."

Ez bi wê acizbûnê ji malê derketim.

Bang kirin, "ew diçe ku derê?", tika kirin, çi kirin ez venegeriyam. Min got;

"Ezê biçim hevalan bigerim. Ez dikarim wan li Siyasalê bibînim."

Min bilua keça malê ya bi navê mode pîne kirî li ber xwe kir. Ji ber min cilên xwe şûştibûn, min ev li ber xwe kiribû. Min di rê de ferq kir, lê ne xema min e. Ez hinekê hêdîka meşiyam, min hewl da kes giriyên min nebîne û hinekê bi aramî bibim.

Piştî ku ez hinekê li ser vê bankê rûniştim, di deriyê Siyasalê re ketim hundur. Filmên Tirkan hat bîra min. Halê min heman dişibe keçek Kurd a bajar nedîtine û li kolanên Stanbûlê gundiyê xwe digere. Ez jî li Siyasalê Elî Heyder Kaytan digerim! Ax xwedêyo! Ev çawa dibe ku ez hizirîme bi reva ji malê re dê pirsgirêk were çareserkirin. Ev lêpirsîna min a hundur destpê kiriye. Lê êdî ez jî tevlîhev dikim bê ka çi, çi qas rast dikim. Tenê ez bi bawer im kum in tiştek pir baş nekiriye. Ez di vê mijarê de maf Didim xwe. Gelo sazûmaniya malbatê û şoreşgerî bi hev re dibe! Dê çawa her du bi hev re bimeşin? Her roj bi destûr, tikayan, her carê derewekê meşandina şoreşgerî ji min re berovajî bû.

Şoreşgerî azadî bû, vîna xwe azad bikaranîn û parvekirin bû. Yekîtiya keda hevpar bû. Bi her tiştên xwe ve bedew bû û ez dikişandim xwe. Dibe ku quralên şoreşgeriyê hebûn, lê ji bona min ne zehmet bû ku dilxwazî û hezkirî bi wan ve werim girêdan. Ji ber bê ku em di ferqê de bin, em ketibûn nava wan quralan. Jiyanek bû: hemû xisletên wê bedew bûn. Zehmetiyên wê jî bedew bû. Ew zehmetiyên di malên ax de û hemû bê derfetî beramber şoreşgerî hezkirin û girêdanek zêde balkêş pêş xistibû.

Belê, ez hatibûm Siyasalê, lê ez hatibûm kur û cem kî. Dibistanek mezin e, ez nikarim ji rêzê her kesî bipirsim. Baştir bû ku ez biçim kampûsê, rûnim û çav li derdor bigerînim. Ez çûm ber bi aliyê ku tevger lê heye. Min li wê derê derdora xwe jî nêrî. Ez naxwazim weke yek zêde biyanî û matmayî jî bixwiyêm. Çavên min li rûyek nas geriya. Li bin darên Akasya komek biçûk rûniştibû. Her wiha jinek jî li cem wan heye. Min yekser Mistefa Erdoxan nas kir. Birayê Qiymetê bû, heman

dişibiya wan. Me li Dêrsimê hev dîtibû, bes nizanim gelo dê were bîra wî? Ez rawestiyam. Cardin min li komê nêrî. Rihek min a weke ez li wan digerim û mine w dîtine tê jiyîn. Hevalek ku ezê paşê bizanibim navê wî Yilmaz e, ber bi min ve hat. Min jêre got;

"Ez li hevalê Elî Heyder Kaytan digerim. Ji min re gotin dikarim li vir bibînim."

Pirsî; "hûn çiyê wî ne. Ji kur dinasin?" Min jê re got ez ji Dêrsimê hatime. Yekser got; "yek deqê." Çû cem komê, vê carê Mistefa Erdoxan hat, me silav da hev. Min jê re got; "Sakîne me. Ez we dinasim, hûn birayê Qiymet in. Wî jî got; "temam." Ew jî çû piştî yek deqê cardin hat cem min. Got; "were em wisa cihekê rûnin." Em çûn cihek çîmen û li bin sihekê rûniştin. Cixare dirêjî min kir, min jî girt.

Pirs kir ku ez kengê hatime. Weke ku bêje, 'xêre,çi heye?' b iken di-axivî û dixwest ez rehet bim. Diyarbû ku ez matmayî me, an jî bandora tiştên min jiyane di rûyê min de diyar dibin. Dibe ku ez jî xwe wisa dizanim. Lê ez rehetim û weke kum in tiştek xwe ya hêja winda kirî, ji nû ve dîtibe. Kêfxweşiya êş û xemginiya hinek tiştên windakirî û yên hatine dîtin tev din ava hev de tê jiyîn. Ji aliyekê ve ji malbatê veqetiyabûm, aliyê din ve ji welat û hevalan veqetiyabûm. Ez heta wê kêliyê bi van ne hesiyabûm. Zêdetir bandora balbat, nakokî û pevçûnên dayîkê û giraniya wê hebû. Naaa! Hê ne diyar bû kum in çi winda kiriye û çi bidest xistiye. Ev derketinek bû, dê pêşketinên pey wê re cewhera wê daniya holê.

"Keçek ji malê reviye û dixwaze şoreşgeriyê bike."

Niha li Dêrsimê bi vê di-axivî. Dibe ku ji vir şûn de yên keçên wan dixwazin bibin şoreşger, êdî keçên xwe neçewsînin. Ev jî min rehet (tesellî) dike. Gelo dê bêjin, ‘ reviye, çûye cem zilamekî?’ ji ber min rewşek wisa dabû nîşan.

Kesî ez ne revandibûm, ez ji malê revîm û çûm Enqereyê, mala apê xwe. Her kesî tenê ev qas dizaniya.

Kî çi dibêje bila bêje, “ez dikarim bi şoreşgeriya xwe wan û dayîka xwe jî qane bikim. Xwedeyo ew çi bawerî ye! Hemû tiştên pevçûn, nakokî, tengezarî û yên bê derfet tên dîtin, lewaziyên min, bê çaretiya min, tirsên min, bêzanebûna min hemû hebûn. Lê tevî van min di nava van de ji xwe baweriyek, cesaretek û çirûskek heviyê girtibû û ez diçûm. Her çendî hinek tiştan buhardar bandor jî bikira, min ji xwe digot, ‘ezê derbas bikim.’ez ji kêmasiyan ne ditirsiyam. Her çendî tirsên min hebin, giraniya înada pêkanînê zêdetir bû. Bawerî û girêdanek ez girtibûm û bi xwe re dibirim. Di encamê de min bawer dikir ku ez naçim şaşî û xirabiyan. Ev jî bi min re bawerî dida avakirin û lêgerîna min didomand.

Musa tiştên min digot, guhdar dikir. Carê di navberê de jî xwe ne digirt digot; “ez te pîroz dikim xwîşka min.” Destê xwe li milê min dida, ji bo cesareta min min pîroz dike! Ez hatim mijara derbarê helwesta M. Elî û min got.

“Lê ne raste ku ez li wê malê jî bimînim. Hestiyar nêz dibin. Behsa mahrê dikin, ev jî min tengav dike.”

Got; “temam, emê paşê bi-axivin.”

Jina ku di nava komê de ye bala min dikişîne. Sekin û axaftinên wê jinê, b imin dida hesandin ku dibe ew Kesîre be.

Ji ber hinde malbata Qiymetê behs kiribû, ya yekê hat bîra mine w bû. Musa got:

"Ger tu bixwazî tu dikarî bi hevala Kesîre re bi-axivî, hûnê xwarina nîvro jî bixwin, Yurt nêz e, dibe ku hinek pêdiviyên wê jî hebin." Ez di mijara jinê de şaş nebûm. Ew Kesîre bû!

Ez bi Kesîre re rabûm, got; "were em biçin hundur, dest û rûyê xwe bişûn." Em derbasî Yurdê bûn. Hinek jin hene. Me di lawaboyê de dest û rûyên xwe şûşt. Ji bona em ziwa bikin ji kîsekê xewlî derxist. Di nêzîkbûnên wê de lezî tine ye. Hedar û hişyar tevdigere. Kamilbûn û nêzîkbûnên wê yên yekser pirsan nake bala min kişand. Min ev nêzîkbûna wê jî bi rewşa wê ya di nava komê de girê da. Sade ye. Axaftin û mîmîkên wê cuda ne. Îfadeya rûyê wê hem sarbûn, kamilbûna wê dida diyarkirin. Carina dema dikeniya, rûyê wê min re sevîmlî dihat. Min ji xwe re digot demek ne sar e, ev rûyek esîl e.

Em cardin daketin baxçe. Em li ser çîmenan rûniştin. Navê min pirsî, hinekê dixwaze binase. Rewşa M. Elî pirsî. Min jê re got, ji TKP'ê ye. "hevalê Elî Heyder wî dinase." Ji ber her tim behs dikir û gotibû çûye mala wan. Dema got; "Elî Heyder çûye Dêrsimê, ez li ber ketim." Xweziya me hev bidîta, an jî dema ez li Dêrsimê bihata, dê wî hinek tişt bigota min, dibe ku me li Dêrsimê jî çareser bikira. Kêliyekê van hizirîm û kûr difikirîm. Pirsa wê ez hişyar kirim. Min ji xwe re got, dev jê bedre, carekê çêbû, ez hatime heta vir. Ger şaş be dê ev heval jî bêjin. Kêfa Musa ji vê rewşê re hat. Heta ez pîroz kirim. Ger min kêmasî kiriba, dê ji min re bigota. Heta dê xwe aciz bikira.

Kesîre got; "Musa behsa hinek tiştan kir, min mijar tam fêm nekir, lê ger mirov rastiyê bêje ez jî mat mam. Zêde ji

bona min nê nêzîkbûnek bi aqil e. Te her tişt têkilhev kiriye. Baş e ku tu ji malbatê derketî, lê niha ev jî heman tiştî ferz dikin. Kurê apê te beriya niha jî hatiye xwestina te. Lewra dê ev jî xoşa wî be. Bes, ew li kure. Agahiya wî heye?"

Min got; "Li Îzmîr'ê ye."

Haya min jê nîne ku bangî wî kirine. Saîme di rêde gotibû telgiraf şandiye jê re. Lê tiştek din jî negotibû. Got; "dê ewê çawa nêz bibe?" Ez qet ne hizirîbûm. Lê min ji vê pirsê re jî bersivek amade da.

"kurê apê min baş e. Em beriya niha jî axivîne. Bertekên min xwezayî dît. Min ji wî re gotibû ezê şoreşgeriyê bikim, ji zewacê re ne amade me. Ger ez vê rewşê jî vebêjim, sê asayî bibîne. Li gorî min dê ji M. Elî rastir nêzîk bibe."

Kesîre got, dê vê mijarê de tiştekî nebeje. Lê dîsa min bi israr kir ku ger mijara mahrê ferz bikin, ez nikarim li wê malê bimînim. Dîsa jî tiştek j imin re negot. Lê ez li bendê bûm ku ji min re bêje were cem me, an jî "em te bişînin cihek guncav." Na. Gbêdeng ma, weke ku pêvajoya pey vê re dinêre. Ev nêzîkbûnên wê ez aciz kirim. Lê wê derê giriyam. Pey min re got; "tu navnîşan malê dizanî?" Min jê re got, nizanim, lê hema nêzî Siyasalê ye. Weke din jî 'Îç cebecî' di bîra min de ye, mine w jî got. Numara derî nehat bîra min.

Ez ber bi malê ve meşiyam. Lingê min nedihişt ez biçim. Min pirsgirêk çareser nekiribû. Nêzîkbûnek ku ez li bendê bûm, pêş neket. En jî min rewşa xwe tam negotibû. Gelo pirsgirêk di kur de bû, min di kîjan mijarê de rewş baş rave nekiribû? Belê, dê niha çi bibe? Gelo dibe ku ez cardin bi Medîne re vegerim Dêrsimê? Dê malbata min ji ber van

helwestên min, êdî hişyar nêz bibin, teqez dê êdî bitirsan û ne çewsandan. Lê ne dibû, êdî ez derketibûm, hem jî ez dergistî derketibûm. Dê gelek fesadî bihatan kirin. Ger ez biçim cem Metîn, bi wî re bi-axviyam, dê ew piştî vê revê çawa nêzîk biba? Ez nizanim dê di vê mijarê de jî nêzîkbûnên wî çibin. Dikim nakim navnîşana wî naye bîra min. Ger telefona wî hebûya dê min telefon bikira. Dê di telefonê de nêzîkbûnê wî jî diyar biba. Gelo ez ji M. Elî re bêjim dê alîkariya min bike? Lê dizanim ew qet qebûl nake, dê nexwaze ez Metîn bibînim. Ez di nava kolanan de ji xwe re geriyam. Ji xwe re navê wê jinê dubare dikim. "Kesîre. Kesîre."

Gelo di çi wateyê de bû? Dema Menekşe hat cem Musa û vegeriya behs kiribû. Di nava me de jina yekemîn a tevlî komê bû. Dikariya me min re alîkar be. Gelo min ew fêm nekiribû? Lê tiştek zelal ji min re negot. Ez di vê mijarê de aciz dibim. Ger Elî Heyder ba dê mîsoger ev pirsgirêk çareser bikira. Ji ber M. Elî jî nas dikir.

Heta westiyam ji xwe re geriyam. Paşê çûm malê. Baqî, Îbo, Saîme û hevalê wê yê dibistanê ku ji Hatayê jî li malê bûn. Bêdengiya min zêde bû. Baqî destpêkê fermî, cidî pirsî, lê di navberê de jî dikeniya. Rewş hat guhertin. Îbo bela xwe li min da.

"Me ne karî em keça apê xwe bikin ji TÎKKO, niha gelo dibe em bi hev re derkevin çiya."

Ez ti axaftinê fêm nakim. Hişê min li ser axaftina kul i baxçeyê Siyasalê hatî kirine. Ez bi du helwestên cuda re rû bir û mabûm. Yekê pîroz dikir digot, 'bijî', ya din jî ez mat kirim, dibêje, 'ev kar tevlîheve.' Dixwazim bi Baqî re bi-axivim. Min

got, “ bila M. Elî jî amade be.” Em çûn odeyek din. Kenê Baqî bûye weke tikekê. (tîke). Ez aciz bûm, min wate ne dida bi çi dikene. Gelo bi reva min dikeniya? Belê, dema beriya niha salakê hat b imin re axivî, mine w red kir, zewac zî dît, jê re gotibû ezê şoreşgeriyê bikim. Niha jî min xwe sipartibû wî!” Alîkarî jê dixwazim. Lewma xwezayî bû ku vê rewşê pir cuda binirxîne.

Dema ew wisa dikeniya min ne dikariya rehet bi-axivim. Min ne dizaniya ji kur destpê bikim. Lê belê, dema ez yên din re di-axivîm çi qas rehet bûm. Demekê bêdeng mam û min dest bi axaftinê kir.

“Min ji M. Elî re got. Dayîka min ne dixwest ku ez şoreşgeriyê bikim. Di demê dawî de hemû peywendiyên min qut kir. Dema biryardariya min jî dît, zewac kir rojevê. Metîn li vir dixwîne. Agahiya wî ji tiştekê tineye. Ti ferqa malbata wî jî ji dayîka min tine ye. Naxwazim bizewicem. Hewce bû ku ez ji malê veqetim. Ger ez biçûma cihên din dê pirsgirêk derketa, dibe ku polîs li min bigeriyan. Lewma ez bi Saîme re axivîm û me xwest bi vî dîmenî wisa bizanin.” Ji bona her tişt hê zêdetir bibe, min hinek din jî vekir:

“Binêrin ez beriya niha jî bi we re axivîm. Helwestê min vekiriye û rast e. Ez we weke hevalek şoreşger dibînim. Ev jî pismamî û xizmê min hêjatire. Weke din jî bi we bawer im. Her wiha nîqaşên me jî bi hev re çêbûne. Weke got mirov dikare cudabûna bîrdozî derbas bike. We gotibû hûnê lêkolîn jî bikin. Ew jî zêdetir bawerî da min. Birayê we behsa mahrê dike. Dibêje, ‘dibe ku polîs werin malê.’ Ez vê rast nabînim. Temenê min bû hejdeh. Weke din jî ti hêcet di destê polîsan de tineye. Hûn ximên min in, ez hatime mala we. Bawer nakim

bibe pirsgirêk. Weke din jî ne raste ku hûn pirsgirêkê bi vî rengî digirin dest. Hûn baweriya min dişikînin. Ez li bendê bûm ku hûn alîkariya min bikin.”

Baqî axaftinên min erê kir. Da diyarkirin ku kêfa wî ji biryara min a şoreşgeriyê re hatiye. Got;

Em şoreşger in. Em bi her tiştên xwe ve vekirîne. Ez lî Îzmîrê hem dixwînim û hem kar dikim. Îbo jî b imin re ye. Dê Saîme paşê were. Dema pirsgirêkên dibistanê çareser bike dê were. Tu dikarî pirsgirêkên xwe yên dibistanê çareser bikî û ji wir dibistana xwe jî bidomînî. Derfetên Îzmîrê baştirin. Emê bi hev re alîkar bin û nîqaş jî bikin. Polîs dikare bigere. Karê mahrê ferq nake. Ez nabêjim bila tiştek wisa pêk were. Ger tu bixwazî em bi Îbo re jî bi-axivin.” Banfî Îbo kir. Bi kurt û kurmancî rewş jê re vegot. Wî jî erê kir. Destpêkê M. Elî guncav nedît, paşê weke ku dê xeter be, çûna min ya Îzmîrê erênî dît. Got; “bila dembihur be, cardin vegere vêderê.” Medîne jî ev mijar bihîstin û alîgiriya min kir.

"Emê jî werin Îzmîrê. Emê li wir mal bigirin, min Stanbûl ne eciband.”

Dê Saîme karê xwe yên dibistanê çareser bike û were. Di bbirayên Medîne jî li wir bicih bibin. Hesen li wir mamoste ye. Heyder çûye. Dibe ku Aynur jî yan bi Saîme re were, an jî beriya wê were.

Rewş cuda pêş dikeve. Di hiş de Îzmîr tine ye, lê niha jî her kes behsa ‘Îzmîrê’ dike. Ji bona min jî zêdetir bi mantiq e. Ew mal zêde ne balkêş e. Malbata M. Elî bi hevjîn, du zarok, diş, birayê jina wî û xwesûyê ve tam weke malbata Osmaniyane. Hem mal biçûk e. Hem jî peywendiyên malbatên bi vî rengî ez

tengav dikirim. M. Elî ji TKP'ê bû. Tevî ku Baqî û Îbo jî ji xetên cuda bûn, min zêdetir nêzî xwe dîdît. Ew xwedevan in û kar dikin. Ezê jî kar bikim. Heta ku ji nû ve peywendî bi hevalan re çêkim, ezê îdare bikim. Ezê xwe ji aliyê teorî de pêş bixim û bi zane kim. Ji xwe re dibêjim ezê li wir vala nemînim. Weke kum in ji xwe re çareseriyek dîtiye kêfxweş dibim.

Qutbûna bi êş û rojên karkeriyê

Yekser em ber bi Îzmîrê ve rê ketin. Îbo di kêliya dawî de ma. Got; "ezê serdana hevalan bikim, yek du rojên din werim. Jixwe dema wisa digot, behsa endamên TÎKKO dikir.

Lê mixabin, ez bê ku tiştekê ji hevalê xwe re bêjim diçûm. Gelo dibe ku paşê pê bihesin? Min M. Elî hişyar kiribû, ger hinekan pirsa min kir, da ku ji wan re bêje. Min û Baqî tevahî di rêde nîqaş kir. Porê min dirêj, xelek û xweşik bû. Lê min di rojên dawî de pir kin qut kiribû.

Ji min pirsî; "Te çima kin kiriye."

Dixwest bi-axive. Mijar dibir ser paşerojê. Dema ez li dibistana navîn, ew li ya amadeyî bû. Behsa baldarî û nêzîkbûnên xwe yên wî demî dike. Hatine min a bi vî şêwazî, ji bona xwe weke şansek xweşik dinirxîne. Axaftin û nêzîkbûnên cuda derdikevin holê. Hevaltiya şoreşgerî ya berî rojekê, cidiyeta wê winda dibe, li şûna wê nêzîkbûnek ji keçek ciwan û hezkiriyekê re derdikeve holê. Xeyalên min tev xirab dibin. Min jî di wê kêliyê de xwe weke keçek hatiye xapandin û pir hêsan ketiye xefka yekê dît. Ez hatibûm û min ev anîbû serê xwe, nikarim kesî tewanbar bikim. Jixwe aciz dibûm. Weke ku onura min hatibû perçiqandin. Min hewl dida xwe ji rewşa

derûniya ‘yeke biçûk ketî’ rizgar bikim û bi hêz bisekinim. Ji ber min çi qas bi wê derûniyê bijiya, dê ezê ew qas lewaz ketibam. Dê hinek din jî hewl bidan min hêsan bidest bixin.

Êdî min tiştek ku li ser bi-axivim nedît. Min hewl da bi nêzîkbûnên xwe ve pêwendiyek cidî û mesafe ava bikim. Dema em gihiştin Îzmîrê xwet em bi hev re biçin cihê ku ew lê kar dike. Lê min guncav nedît. Ez birim cem malbatek li Bornova. Em demekê li wir man. Kurê wan Harun jî ji HK’ê bû. Du keçên wan ên ciwan û dayîkek wan a şêrîn hebû. Mal zêde qelebalix bû. Em nêî mehekê li wir man.

Piştî ku Îbo em bi hev re li kar geriyan. Ji ber wisa ne dibû. Li nava malbatekê vala vala jiyîn kêrî min ne dihat. Ez tengav dikirim. Ez û Îbo tevahiya rojê li Konak û Alsancakê li kar geriyan. Li kargehekê ji bona me her duyan jî kar hebû. Lê me guncav nedît, hem mûçeya wê jî kêm bû. Baqî dawiya hefteyê dihat. Îbo jî li cem Hesen wan dima. Malek azip (bekar) girtibûn û rojên xwe li cem ên nas derbas dikir. Herî dawî me biryar da û me malek girt. Li Gûmûşpalayê malbatên ku Baqî wan nas dikir hebûn. Me bi alîkariya wan mal kirê kir. Malek yek ode, salonek û xwaringehek biçûk bû. Hundurê wê jî virt û vala bû.

Îbo û Baqî ji cem hevalên xwe hinek pêdiviyên lezgîn peyda kirin. Hinek alavên kevin ku hatine bikaranîn, merşek kevin, çend dîwan, singer, textek, betanî, çend lalîk û çaydanek biçûk anîbûn. Rewşa me dişiba zarokên ku lîstoka zewacê dilîstin. Me heta demekê bi du kevçikan îdare kir. An jî heta me yek dît, a din Nihat dîtin. Pereyên ku Baqî digirt têra kirya malê û pêdiviyên rojane nedikir. Wî jî li zanîngeha Ege li beşa endezyariya mîmarî dixwend. Li Încîralti jî xwaringeheke

turîzmê kar dikir. Ne dibû ku ew kar bike û em jî bê kar rûnin. Îbo rojane carê di karê çêkirina avahiyan de kar dikir. Heqê rojane ancex têra me dikir.

Min gera xwe ya kar domand. Bes wan nedixwest ez kar bikim. Min xwe ferz dikir. Baqî hewl dida min qane bike, da ku ez di karên cuda de cih bigirim. Bi rêya hevalên xwe yên dibistanê hewl dida karên weke xizmeta nexweşan û sekreterî ji min re bibîne. Lê min dixwest li kargehan de kar bikim. Îzmîr bajarek sermiyanê bû, li hawirdora wê kargeh zêde bû. Lewma li vir bûna karker û di nava têkoşîna sendîka de cih girtin, daxwaza min a sereke bû. Min karê bavê xwe tanî ber çavên xwe. Romana Mîtka ya bi navê Ez Te Bi Navê Gel Mehkumî Mirinê Dikim, zêde bandor l imin kiribû. Ya rastî dema min ew xwendî ez li Dêrsimê bûm. Şansê min a karek wisa jî tine bû. Ne dihat bîra min ku ez kar bikim. Lê niha hewce bû, min ne dixwest ez ji hêla madî ve bi wan ve werim girêdan. Ji ber tişta herî zêde ez aciz dikirim ev bû. Lewma min gera xwe ya ji bona kar domand.

Li Îzmîr-Hatay'ê em çûn malakê. Jin û mêr kar dikin û sê zarokên wan hene. Baqî ji min re got ez dikarim li wan binêrim, ango li ber malê bim. Malbat derdora hevalên wî ne, şoreşgeriyê jî dikin. Pirtûkxaneyek wan a zêde dewlemend heye. Li pirtûkan temaşe dikim. Me wê şevê heta derengî nîqaş kir. Her tişt ji min re ecêb bû. Jiyan û şêwaza têkîliyên wan tev malbatek burjuvaziya biçûk bû. Malbata M. Elî ji vê malbatê baştir bû. Min got; "ez nikarim yek demjimêrê jî li vir bimînim. Tenê em dikarin ji pirtûkên wan sûd werbigirin, bixwînin û cardin radestî wan bikin." Ez li wir nemam. Em cardin vegeriyan mala ku me kirê kiribû. Îbo ji xwe re kar peyda

kiriye, karê torna dike. Tenê ez mame bê kar. Em jî ji derdor dipirsin. Li ser rêya Çîxlî kargeha şekir û çîkolata hene. Li heman qadê çend kargehên din jî yên heman malbatê hene. Min li Kargeha Bener a çîkolata dest bikar kir. Kargeh li destekê, li nava bexçeyek pir xweşike. Beşek ji karkeran a mezin jin in. Ez jî di navê de ji bilî çend kesan, hemû ji Çîxliya jêrîn dihatin kar. Her wiha penaberên Bulgar'ê bûn.

Ez kêfxweş bûm ku min kar dît. Saeta min tine ye, divê ez di demjimêr sê ûnîv, an jî çaran de rabim û bigihijim serwîsê. Ez di hişê xwe de destnîşan dikim ku her sibeh heman demjimêrê rabim. Her sibeh jî bi bazdanê digihijim serwîsê. Em nîvro li kargehê xwarin dixwin. Êvarî jî cardin vedigerin. Yên ku demek zêde (mesaî) kar bikin dimînin. Ger mirov hundurê wê avahiyê nezane û nebîne ewder kargehe, dê mirov bêje qey keçên karker ên têne kargehê komên jinan ên diçin dawetê û rojên taybet in. Jixwe hinek ji wan jî dibê qey ji mala moda derketine! Weke defîleyê bû. Hemû keç her roj bi cilek nû, derman li xwe dayî, porên xwe çêkirî, xemil û şemala wan zindî bûn.

Jinek li beşa kargehê ya qazanên mezin de kar dikir hebû. Jê re digotin, 'Fatma Kurd.' Jinek esmer, bejin kin û hinekê qelew bû. Zêde kar dikir. Beşa qazanê, beşa herî giran bû. Vala rakirina wan qazanan jî gelekî zehmet bû. Çend zilaman li wir kar dikir. Weke ku kargeh a jinan bû. Bavê Bener şefê mezin bû. Pênc zarokên wî jî xwediyê kargehan bûn. Dema me destpêkê dest bi kar kir, sohbetek me biçûk bi kurê wî re pêş ket. Di nasnameya min de cihê ji dayîkbûnê Dêrsim bala wî kişandibû. Dixwest hîn bibe gelo ez çima dixwazim kar bikim. Ji ber ez ji keçên din cuda bûm. Herî zêde jî ji ber cilên min li

ber xwe kirî xwerû bûn bala wî kişandibû. Min jê re got, ez hatime cem xizmên xwe bêhnvedanê, ji ber pirsgirêkên aborî kar dikim. Lê zêde neket serê wî! Karsazên kargehê jî baldarî nêzî girtina karkeran dibûn. Dema min got, min dev ji dibistana amadeyî berdaye, zêde bawer nekir. Ji ber bi gelemperî xwedevanên zanîngehê xwe weke xwendekarên dibistana navîn û amadeyî didin nasîn. Dema wisa dikirin zêde şik nedibirin. Lê her ku li hinek kargehan rêxistina karkeran pêş diket, ev xwendekarên zanîngehê jî eşkere dibûn. Karsaz pir hêsan ew ji kar derdixistin. Di navbera hinek kargehan de jî pêwendiyek derbarê vê mijarê de hebû ku têkildarî kesan agahî didan hev. Heta nasnameya kesên ku ji kar hatine derxistin didan û hevûdû agahdar dikirin.

Destpêkê ev zêde ne diketin çav. Lê her ku çalakiyên karkeran zêde dibû, wan jî tevdîrên bi vî rengî digirtin. Ez jî di vê mijarê de hişyar kirim. Gotin ger e yekser dest bi rêxistinkirinê bikim, dê pir hêsan min ji kar bavêjin. Jixwe dema min rewşa wê kargehê dît, min zanî ku dê hevpeyvîna bi karkeran re ne hêsan be.

Min destpêkê der barê kar kirinê de bawerî da. Her karî jî zû hîn bûm. Dixwazim her karî bê qusur bikim. Zêde bi ser kar de diçim. Hê pêvajoya ceribandinê ye. Karek di cih de tineye. Ev şêwaz kêrî min jî tê. Li her ûnîteyê digerim û karkeran nas dikim. Bi her kesî re hevpeyvînê pêş dixim. Hewl Didim aliyên wan ên balkêş binasim. Lê zêdetir wan didim axaftin. Kî kengê dest bi kar kiryeî çi qas e kar dike û her wiha. Bi taybet ji ber penaberên Bulgar in derbarê pergala wir de pirsan dikim.

Dema di 73’an de çûn Almanya teyareya me li Sofya benzîn (yakit) girtibû. Min jî hinekê ew nepixand û got min jî

Sofya dîtiye. Ez rêyekê digerim ku xwe nêzî wan bikim. Hemû jî ji ber çert û mercên şoreşê revîne. Yên ku piştî şoreşê hatine pir kêm in. Dîsa jî xislta wan a hevbeş; ji bo ji malbatê re alîkariya aborî bikin kar dikin, weke pêdiviyek ferz dibînin, hewl didin pêdiviyên xwe yên kesane pêk bînin, cihazan ji xwe re çêkin û zêran ji xwe re bikirin. Kar tenê ji bona amûrek wisa digirin dest.

Bi rastî jî Çîxliya jêrîn weke tax asta jiyana wir li pêş e. Dewletê, ji penaberên Bulgar re mal çêkirine. Hemû mal jî avahiyên mezinin. Bexçeyên wan hene. Taxek pak, lê dinêrin û bedew e. Dîsa di nava wan de yên bê kar tine. Ji roja hatine ve kar dikin. Hinek ji wan di saziyên dewletê de kar dikin, hinek ji wan jî cihê kar ên taybet ji xwe re vekirine. Malbatên wan jî zêde ne qelebalixin. Lewma kargehên li derdor zanebûn van kesîman dihilbijêrin. Ji ber çanda karkirinê ya Tirkên Bulgar cuda ye. Karên xwe baş dikin. Bi tiştên din ve zû bi zû mijûl nabin. Ev jî ji bona karsazan tişta herî esasî ye.

Yên ji bilî penaberan Kurd bûn. Ya rastî tenê ji jina bi navê Fatma re digotin Kurd. Lê yên din jî Kurd bûn. Li vir pîvanên Kurdinî cuda ne. Pîvanê sereke nizane baş bi Tirkî bi-axive û hinekê jî çorse. Dema zanîn ez jî Kurd im, zêde mat man. Gotin; “tu qet naşibî wan.” Ji ber min zimanê Tirkî baş bikar tanî. Pîvanên wan dihilweşîn. Her ku peywendiyên me gerim dibû, ji Kurdan jî hez kiirn. Bala wan li ser min bû. Êdî gelek ji wan ji xweber dihatin pirsgirêkên xwe bi min re parve dikirin. Tiştên ku mereq dikirin, ji min dipirsîn. Min jî digot; “ev tiştek baş e.” Ji ber bidestxistina hezkirina serbazên kar girîng bû! Yê herî zêde nêzî karsazan ew bûn. Têkildarî rêkûpêkiya kar û pêwendiyan de wan agahî dida. Nêrînên wan diyarker bû.

Ez her roj titşek nû hîn dibûm. Çima hemû keç li ser mekîneyan ew qasî dişibin mankênan û sedema lêhûrbûna wan a di vê mijarê tevê de hîn bûm. Jina bi navê Fatma di navberê de carê bi dengek nivis hinek ji wan şanî min dikir, digot; "aha, ev bi kurê karsaz re dimîne, dilîze, ev keça din di bin navê dema kar a zêde de dereng derdikeve. Piraniya van wisa ye. Biborîne hemû weke kehbika ne. Xwe cuda didin diyarkirin, lê hişyar be, ne wisa ne."

Dibe ku min ew qas jî ne dizaniya, lê min hinek tişt hîs kiribû. Dîsa peywendiyên wan bi zilamên karker re jî baş bû. Her ku firsendek derdiket, diçûn dîtina hev. Bi hev re di-axivîn. Bes ev jî ne peywendî û axaftinên ji rêzê û asayî bûn. Ji ber ez bi hemûyan re di-axivîm. Di vê mijarê de tiştek ecêb tinebû. Jixwe temenê hinek zilaman jî mezin bû. Hinek jî di temenê navîn de bûn. Her wiha karkerên salan bûn. Axaftina bi wan re, hêdî hêdî têkildarî şert û mercên kar û sazûmaniya jiyanê ya giştî de nîqaş pêşxistin hêsan bû. Ji ber guhdar dikirin. Lewma peywendiyên min ên vekirî û rehet dihişt ku ew awir û peywendiyên veşartî zû werin eşkerekirin. Ji bere w diçewsandin. Hinek karkerên keç jî bi min re dihatin, an jî paşê tevlî nîqaşên me dibûn.

Di dema xwarinê de yên taybetmendiyên wan nêzî hev li heman maseyê xwarin dixwarin. Aşvanên ku xwarin belav dikirin, di belavkirinê de cihkarî dikirin. Dema çemçik dibirin ber bi beroşa xwarinê ve li yê miqabilî xwe dinêrîn, wisa dadigirtin. Di wê kêliyê de jî cîlwe li hev dikirin. Ji ew cîlwe bandor li ser radeya xwarinê dikir. Bunlar kaşla goz arasi yapilirdi. Ev tenê parçeyek jiyanê ya biçûk bû. Ev cîlweya ji karsaz û serbazê kar re dihat kirin, heta ajokerên wesayîtan jî didomî. Heta baxçivanê kargehê jî di nava vê çerxê de bûn.

Li vir windabûnek kesayetî ya kûr dihat jiyîn. Qaşo karkerbûn, berdevkê karkeran û proleterî çi qas tiştên pîroz bûn. Ji ber bi rastî ez li hember peyvên ‘ez dixwazim bibim karker, naxwazim karên dikim’ baldar û rêzdar bûm, min digot. Min her tim berxwedaniya karkeran, rêxistinên karkeran ku serî na tewînin xeyal dikir. Çi qas tiştên ku min dijiya cuda bûn. Ez niha pirtûka Mîtka baştir fêm dikim. Her ku ew keçên ji gundan dihatin komkirin û di karên herî xirab de dihatin bikaranîn, pirsgirêkê dijiyan û xebatê Mîtka yên hişyar birêxistinkirinê, dihat bîra min, hewl dida bi hedar nêz bibim û tehemûlê bikim.

Em asayî heşt demjimêran kar dikin. Yên dixwestin mesaî bikin, diman. Bes yên ev dema mesaî cuda bikar tanîn jî hebûn. Karkerên kargehê salê carekê, yan jî dema karek baş dikirin weke odûl ew dibirin bêhnvedana li ser behrê. Ev bêhnvedan sê roj, heftiyek bûne. Yan jî wan dibin fuaran. Ev nêzîkbûna karsazan karker zêdetir bi kar ve didan girêdan. Lewma şert û mercên jiyanê jî ne dibû pirsgirêk. Navbera çayê panzdeh xolek û ya xwarinê jî nîv katjimêr bû. Bi lez û bez xwarin, sîgorta, sendîka, mafê karkeran, rêxistinbûna cewherî û her wiha qet ew eleqeder nedikir. Carê dema rojên cejna û rojên taybet pakêtên şekir û çîkolata yên didan wan, bes bû ku wan kêfxweş bike! Ji bona bi karsazên di bin rûyê bavan de ye û ji kurê wî re cîlwe bikin, xwe bi wan bidin ecibandin, qebûlkirin, her kes di nava pêşbaziyekê de bû. Lê ev pêşbazî gelekî kirêt bû. Heyf, ev qas keç li vir di nava pêşbaziya çi de bûn? Zêde tirsnak bandor dikir û hêrs dibûm. Bi taybet cihên wisa biçûk ên kar, veguherandibûn qasên ketîbûnê. Hêza karê erzan, pêwendiya wan ji pirsgirêkên wan ên cewherî dûr dixe, asta çandî ve, karkerî ji cewher hatibû derxistin.

Êdî ez diçûm mala hinek karkerên ku li kargehê kar dikirin. Ji ber Çîxliya jêrîn pir girîng bû. Taxek penaber li bûn. Min dixwest wan ji nêz ve binasim. Ji wan çend keçên ciwan ji hevpeyvînan re vekirîbûn. Ew jî li hember şert û mercên li kargehê û nêzîkbûnên karsazê li wir aciz bûn. Mirov dikariya ji vê mijarê destpê bike û bi wan re dest bi rêxistinkirinê bike. Mînak sendîka û sîgorte tine bû. Li wê kargehê mil û porê çend keçên ciwan ketibûn ber mekîneyan û jiyana xwe jidest dabûn. Ên xedar birîndar bûyîn û seqet jî hebûn. Ango ti ewlekarî tine bû! Ne tazmînat dihat dayîn, ne jî weke din tevdîr pêş diket. Her tişt ji şansê re dima. Ev rewşên bi vî rengî jî asayî dihat dîtin.

Dîsa tevî ku hinek ji wan ji bona mesaiya şev jî diman di mûçeyên wan de ti guhertin ne dihat kirin. Kar ji dixwaziyê re dihiştin. Em hêdî hêdî ketin nava kirîna hêza kar û bedena keçan. Ew jî di vê mijarê de hinek din kamil bûn. Lewma me dikariya em rehet nîqaş bikin. Bi gelemperî li hember sosyalîzmê bê bawer in. Reva xwe ya ji Bulgarîstanê mafdar dibînin. Ji ber xwe Tirk dihesibînin û Tirkiyê jî welatê xwe dibînin, girtî dimînin. Dihizirin ji ber KT xwedî li wan derketiye, kar û mal daye wan, hemêza xwe ji wan re vekiriye, nabe nankoriyê bikin. Mantiqê li hember her tiştî bêdeng mayîn û bersiva ti tiştî negirtin serwer e. Lewma zehmete ku mirov ji yên di rewşên wisa de ne behsa Kurdan û Kurdistanê bike, da ku bal bikişîne, şiyar bike û fêm bikin. Lê dîsa jî min behsa me, çima em ji wir hatine, parçebûna malbatan, pêvajoya 38'an tev bi hev ve girê Didim û hewl Didim di asta gelemperî de pênase bikim. Min çend caran serdanên xwe domandin. Ev li kargehê jî diyar bû, êdî em di navberên çay û xwarinê de li cem hev rûdinin. Ev şêwaza pêwendiya me bandor li yên din jî dikir.

Hêviyên min zêde dibû. Ez jî ji xwe re dihizirim ku ger ez hinek din bi hedar nêz bibim, dê komel biçûk a pirsgirêkên li kargehê dibîne, çareseriya wan jî em bikaribin bi hev re nîqaş bikin were avakirin. Lê ti rola cihên wisa biçûk ên kar tineye. Dema ku bi gelemperî berxwedaniyek karkeran pêş dikeve, ev bandor dibin. Carina ev jî pir zehmet e.

Cihên kontrolê yên derketinê pir kirêt tên kirin. Jina bi navê Xeyriye ya qelew, xwe dide qebûlkirin û heman dişibe gardiyanên girtîgehan, çante û poşetan zêde çors digere. Ez bê çente diçûm û dihatim. Dema dor dihat min, ji min re digot; "tu derbas bibe kurê min." Ji ber porê min zêde kin bû, wisa bangî min dikir. Dîsa jî ev lêgerîn dihişt ku bertek raber bikim. Ev kontrol jî ji bona ku yên ji kargehê derdikevin bi xwe re şekir û çîkolata nebin dihat kirin. Ez ecêb dimam van karkeran çawa li vê kargehê şekir û çîkolata dixwarin. Ji ber şêwazê çêkirina wan bandor li min kir û dilê min xeland. Lewma min demek dirêj ji wan tiştan qet nexwar. Ji ber ne paqij bûn. Tiştên ku ji erdê kom dikirin, dixistin qazan û mekîneyan û tavêjtin dilê min dixeland. Şêwaza şûştina qazanan, dîsa baldariya wan a li hember dîmenê wan, girîngiya ambalajan hebû, lê şêwazê çêkirinê gelekî xirab bû. Min gelek tişt bi çavên xwe dît.

Paçên ku bi maseyên hevîrên şekir û çîkolata li ser datînin paqij dikirin, bi rastî jî dilê min dixeland. Qaşo kargeha beramber paqijiyê ya herî baldar e! Qaşo şekir û çîkolatayên Bener'ê bi nav û deng in! Ez jî pê dikeniyam. Nexwe hemû kargeh wisa bûn. Qalîte û paqijî ne girîng bû. Ya esasî berhevkirina sermiyan, feydeya zêde, hilberîna zêde bû. Ji bona karsazekî jî ya girîng ev bû. Karkeran jî para xwe ya rojane dinêriyan. Tenduristiya gel ne girîng bû. Ji ber malê karsaz bû. Tenê feydeya xwe dihizirî.

Ker zêde em diwestandin. Di navberan de basdan, demjimêrên kar baş bikaranîn, karek baş kirin û her wiha ez zêde ji hêla fîzîkî ve diwestandim. Piraniya sibehan bê ku taştê bixwim, bi basdanê derdiketim. Ew bazdana rê xwezayî ji bona min weke werzîşa sibehê bû. Her carê jî bi bazdanê digiham serwîsê. Hinek rojan jî dema ne digiham serwîsê, neçar dimam ku bi otobûsê biçim. Bîletek bi heqê sed û pêncî girtin gelek girîng bû.

Ji bona zêde pere neçin carê min otostop dikir. ‘Otostop jî zêde xeternak bûn!’ ji ber hinek ajoker bazirganê jinan bûn. Hinek ji wan li şûna pereyan bedena jinê digirt. Jinan jî bedena xwe difiroşt. Lewma yên li ser cadeya bi tena xwe diman, an jî li benda wesayîtên taybet bûn û otostop dikirin, ji aliyê derdor ve baş ne dihat dîtin. Her ku ez hînî van dibûm, hişyar tevdigeriyam. Lê carina jî ne xema min bû. Ji ber di rewşên wisa de ya diyarker helwesta te ye. Nêzîkbûnên te yê miqabilî te birêve dibe. Her çendî xwedî niyetek xerab jî be, dema ti cidî bî cesareta wî dişike. Dema ez ji kar vegeriyam heta Gûmûşpala dihilkişiyam du caran rûdiniştim û min bêhna xwe vedida. Ez piştî serwîsê li wesayîtan siwar nedibûm. Lewma rêya min ervazî bû û ez diwestiyam. Rojê tev were li ser piyan kar bike û paşê bide wî ervazî, gelekî zehmet bû.

Rojên destpêkê wisa ne. Lê ez her ku çû fêrî bûm û tempoya min leztir bû. Kêfa min jî ji karkeriyê re hat. Bi hezkirî dikim. Ew giyanek bedew bû. Lê mixabin dema dihatim malê, hinek pirsgirêkên din serve dibûn. Ez demekê bi Îbo re li malê mam. Paşê Baqî jî ji karê xwe yê li xwaringehê cihe bû û hat cem me. Wan carê ji xwe re kar didît. Ne dikariyan her demê kar bibînin. Di vê rewşê de ya bi rêk û pêk

kar dikir ez bûm. Ev jî zora wan dibir. Xwe bêzar didîtin. Îbo çend caran got; “wisa nabe, xwîşka me kar dike, em dixwin. Ez nikarim qebûl bikim.” Bertekên xwe diyar dikir. Lê Baqî zêdetir bêdeng bû.

“Ji ber em mirovên armancên wan cuda li heman malê diman.”

Wext hemû bi kar derbas dibû. Ne min dikariya pirtûkekê bixwînim, ne jî min dikariya pêşketinên giştî bişopînim. Min hewl dida bandora helwesta ku min jiyaye bi vê xebatê ve derbas bikim û jibîr bikim. Lê dîsa jî pirsgirêk çareser nedibû. Min heftiyê şeş rojan kar dikir. Tenê roja yekşemê dima. Min ew jî bi naskirina derdor û çûna komaleyan ve derbas dibû. Li Kemeralti komaleyên HK û DDKD’ê hebûn. Li Bornovayê jî komaleya Ciwanên Şoreşger hebû. Hemûyan jî di bin navê Komaleya Çanda Demokratîk de xebat dimeşandin. Kovar û rojnameyan dixwînim. Siyasetên din dişopînim. Nivîsên di kovaran de hatine nivîsandin, dibin sedem ku nîqaşên li malê jî domdar bin. Baqî û Îbo bi soza ku li Dêrsimê dabûn, girêdayî ne man û pêk ne anîn. Her duyan jî xeta xwe di asta herî dijwar de diparastin. Baqî piranî li ser mijara ‘pirsgirêka Netewî’ pirtûk dixwendin û not jê derdixist.

Cewaziya nêrînên me yên derbarê Kurdistan Mêtînkiriye de hêjî berdewam dikir. Carina me bi saetan der barê cudahiya bingehîn a di navbera mêtîngeriya nû û mêtîngeriya kevnar de nîqaş dikir. Nîqaşên me bi hevalên wî yên dihat malê re jî zêde çêdibûn. Ev jî dihişt ez zêdetir bixwînim. Ger em li Dêrsimê ban, dê min mijarê ku zehmetî dijiyan de yekser banî hevalan bikira û bihişta wan bersiv bida. Yan jî ger di nirxandinên min de şaşî û xeletî heban, dê min sererast bikira. Lê mixabin niha

li Îzmîr'ê me. Hêjî li vir kesek ku ji xwe re bêje; "Kurd im, Kurdistanî me" tine ye. Çi qas bi êş e. Piraniya nişтecihên li Çîxliya mezin ji Varto bûn. Piraniya nişтecihan piştî erdheja Xinis û Varto hatibûn. Carina em dem bi dem diçûn wir, min Kurdewarî didît. Her wiha min bêriya Kurdewarî dikir. Tevî kesî ji wan qabul nedikir ku Kurdistan ne Mêtîngeh kiriye. Li wan deran komên çepên Tirkan xwe birêxistin kiribûn. Tevahiya ciwanan di nava çepên Tirkan de cih digirt. Gultepe jî bi heman şêwazî bû. Piraniya Gûmûşpala jî Kurd bûn.

Li malê nêzîkbûnên Baqî dibûn pirsgirêk. Di nîqaşan de dixwest bide diyarkirin ji bona yekîtiya bîrdozî û lihevkirinê di nava hewldanê de ye. Lê min di vir de rêgezek cewherî nedidît. Helwestên wî yên lêkolîn û lêhûrbûnê hebû. Lê nêzî girêdana xwe ya rêxistinî nedibû. Qadroyek milîtanê Komîteya Nanvendî bû. Lewma di peywendiyên xwe de nêrîna yekîtiya bîrdozî û rêxistina xwe esas digire. Peywendiyên wî yên bi min re, ne durist e. Zêdetir hewl dida bi min re têkîliyek li ser bingeha hestiyarî saz bike. Li şert û mercên vê digeriya. Dizane ku ger yekîtiyek bîrdozî û rêxistinî nebe, ezê nêzî vê mijarê nebim. Carina nêrîna xwe ya der barê vê de dikir rojevê. Di dema destpêkê de min bi bertek, qutkirina nîqaşan ve, peymana me tanî bîra wî û helwest raber dikir.

Di nêzîkbûnên min de rev û şêwazek polemîk hebû. Zêde min ne dikariya qane bikim. Paşê ev helwesta min hinek din nerim bû. Ji ber di vir de bandora derûniya reva ji malê hebû. Ji tim ji xwe re digot; 'min li xwe kir. Kî çi bike xwezayî ye. Di vê mijarê de tiştek ku ez bêjim tine ye.' lewma bi vê nêrînê ve min ne dikariya di nêzîkbûnên xwe yên tûj de hevsengiyekê ava bikim. Bes ê ku ji her du rewşan jî sûd werdigirt, dîsa ew

bû. Ji ber di ferqa lewazî û bêçaretiya min de bû. Dîsa jî min hewl dida çi dibe bila bibe têk neçim û li gorî fêmkirin û daxwaza kesek din tevnegerim. Çawa ba min kar dikir. Pirsgirêka malê jî ne dima. Min gelek kes nas kiribûn. Min dikariya buhurdar li hinek malan bimam. Ger ew jî neba, dê min ji xwe re malek bigirta. Baweriya min a beramberî min winda nebû. Min dikariya li dijî wan bi înad rawest im. Min jî xwe bi van fikaran dihedirand.

Ez di Gulan'ê de ji Dêrsimê reviyabûm. Ev rewşa tevlîhev heta meha tebaxê berdewam kir. Ez, kurê Bîbiya min Heyder, xwîşka wî ya berê min lê xistî Aynur, Îbo û Baqî em bûn deh kes. Hê Saîme ne hatibû. Me li heman taxê malek nû girt. Bes nêzî kehwexane û komaleyên ku faşîst diçûn wan deran bû. Ev mal bi zanebûn li wir hat girtin. Ji ber zêde bal nakişîne û di heman demê de em dikarin ji nêz ve faşîstan bişopînin. Baqî ev 'sira rêxistinî' ji min re jî got.

Dema em zêde bûn, pirsgirêka me ya aborî jî zêde bû. Em li malek du ode û salonek xwe heye dimînin. Kirêya wê asayî ye. Heyder û Aynur jî li kar digerin. Aynur li ser rêya Alsancakê kargeheke tirî kar peyda kir. Ewder nêzî malê ye jî. Jiyana me ya li malê hevpar e. Kar jî hatiye dabeşkirin. Yê ku li mal dimîne, karê malê, paqijî û xwarinê amade dike. Şev jî yên ji xwe re dixwînin li odeyekê dimînin. Me biryar girt ku em nîqaşan ji xweber nekin. Ji ber her yek ji me parastina xetekê dikir. Em TÎKKO (Tûrkiye Îşçî Koylû Komînîst Ocaklari), PDA (Proleter devrîmcî Aydinlik), HK (Halkin Kurtuluşu) û Şoreşgerên Kurdistanê bûn. Ew ji me re dibêjin 'Netewparêz.' Lê li Îzmîrê ev nav nayê nasîn. Dema li komaleyên ez lê nîqaş dikim, dipirsin, ez jî dibêjim nav ne girîng e ez 'Şoreşgera Kurdistanê' me.

Yê herî bê xîret Heyder bû. Di mijara karê malê de yê herî ne jêhatî ew bû. Yan xwarin dişewitand, an jî zêde xirab çêdikir. Lewma min lîsteya çêkirina xwarinê rave dike amade dikir û bi dîwar ve dikir. Her kesî cilê xwe dişûşt. Bes me alavên razanê bi hev re dişûşt. Di vê mijarê de jî pirsgirêk dernediket. Lê Îbo qirêjiya xwe didomand, ne lingê xwe û ne jî goreyên xwe ne dişûşt. Ne jî ser û cilên xwe nedişûşt. Germahiya Îzmirê pêxirtengiya me zêde dikir. Carina me ne dikariya em ji bêhna xwêdana giran derbasî malê bibin. Min şerê xwe yê der barê vê de jî berdewam dikir. Min ji wan re digot; "divê em hîn bibin ku her şev gore û lingê xwe bişûn." Min ferz jî dikir. Dema pêk ne tanîn, min ji wan re digot; "ger hûn bê xîretin ka bidin min ezê ji we re bişûm." Wê demê digotin na, tu xwîşka me yî û neçar diman radibûn dişûştin. Jixwe armanca min jî ew bû ku ez wan neçarî şûştinê bikim. Nixwe ma ez dixwazim goreyên wan bişûm. Ji ber ez di wê mijarê de zêde hesas bûm. ,

Dema nêzîkbûna yek ji wan weke nêzîkbûnên li nav malbatî kevneşop derketa, min qiyamet radikir û ti kar ji wan re ne dikir. Lê di wê mijarê d nabera me baş bû û rêzdar bûn. Ev jî bandora erênî li ser peywendiyên me dikir. Tenê di nîqaşan de kesî qural pêk netanî. Dema ji yekê destpê dikir, hemû tevlî dibûn. Di encamê de hemû li dijî min dibûn yek. Nîqaş gerim dibû, nêrînên hişk derdiket û digiha asta ku em hev bişkînin. Heyder her axaftina xwe bi emperyalîzma civakî ya Sovyetê destpê dikir û bi wê diqedand. Kûraniya teorîk tine bû. Ji ber zêde nedixwend. Lewma me xwendina kesî neçar kiribû. Lê wî her carê xwe xilas dikir. Dema min jê dipirsî digot, yan çend

rûpel xwendiye, yan jî nexwendiye. Dema me li ser mijarên ku xwendine nîqaş dikir, derdiket holê ku zêde seresere û jiberkirî nêz bûye.

Îbo di karên pratîkî de baş bû. Zilamê çalakiyan bû. Ji wê hêlê ve bawerî dida mirov. Wî jî ji hinek tiştên ku ji Kaypakkaya wan girtiye destpê dikir û bi wan diqedand. Kaypakkaya weke xweda didît û pê ve girêdayî bû. Girêdan xweş bû, lewma li hember wî rêzdar bûm. Bi çek ve jî zêde girêdayî bû. Dema borî de dema ez çûbûm gundê wan, demance da min da ku bavêjim. Hezkirina min a li hember çekan dizaniya. Digot; " ger tu bibî hevala me, ezê vê demanceyê bidim te." Nêzîkbûnek pir ecêb bû. Weke ku tu şekirekê bidî zarokekê û bixapînî. Niha jî weke hêza sereke ya îhtîlal û şerker ew in, carê bi henekî digot; "ji ber Sakîne îsyankar e, bibe bibe, dê bibe TKKO'yî." Min jî bersiva wî dida; " ya rastî dê tu herî dawî bibî hevalê me, ji ber cewhera şoreşgerî bi te re heye."

Aynur ne weke berê hotzotçu bû, hinekê kamil bibû. Zêde tevlî nîqaşan ne dibû. Navbera wê û Baqî baş bû. Zêde pê re nabe yek jî. Baqî dixwaze hînî wê bike, pirsan jê dike, dixwaze wê şiyar bike. Lê ew qet, nêzî nabe, xwe berdaye nava jiyana bajarên mezin. Di halek keça malê ya rastiya heyî de ye. Naxwaze bixwîne wê tengav dike. Tevî ku dibistana seretayî qedandiye, hêjî di xwendinê de zehmetiyan dijî.

Baqî jî her berdewam dike min bi hevalên xwe bide nasîn. Qadroyên ku min li komaleyê ne dîtine û îllegalin, tanî malê. Baqî her tim digot nakokiya di navbera me de ne di wê astê de ne neyên derbaskirin, em lihev nekin. Wisa li derdorê dizivirî û dixwest bandor bike. Bi vê mebestê zewaca b imin re dikir rojevê.

Dibêje; “cudabûna bîrdozî ya di navbera şoreşgeran de bûhurdar in. Divê nakokî neyên kûrkirin. Têkîliyek wisa dikare me bibe yekbûnek bîrdozî jî, dikare bê lez jî bike.” Min bi tundî red kir û bê rêgeziya di nêzîkbûnên wî de derdiketin holê li rûyê wî da. Heta demekê nîqaşên me di vê astê de doman. Biryardariya min dît. Min jê re diyar kir ku her cara dibêje ‘ez lêkolîn dikim’ di rastiyê de ne samîmî ye. Ez dizanim ku helwesta wî ne duriste. Me biryar girt em nîqaş nekin. Ji ber her ku me nîqaş dikir, nakokî kûr dibûn.

Min nameyek dirêj ji Metîn re nivîsand. Min rewşa ku jiyan kiriye û di nav de met ev nivîsand. Hinekê jî weke rexnedanê bû. Min behsa nêzîkbûna xwe ya ji yek alî ve bê ku bi-axivim, nîqaş bikim, ji hev veqetîna me ne baş e û şert û mercên ez neçarî vê kirim tev dikim. “ Ev têkîliyek bi daxwaziya malbatan ve hat pêşxistin. Bes pişt re em nêzî hev bûn. Bi me her diyan re jî nêzîkbûnek domandina kevneşopiya heyî û girêdana bi wan ve hebû. Ev jî dihişt ku her tişt hêdî hêdî rewa bibe. Hezkirinek bingehê xwe tine bû. Ger pêşketin hinek din ji aliyê erênî ve çêbûna, dibe ku ev têkîliya me bidoma. Lê her tiştî bandora neyênî dikir. Ji hêlekê ve guhertinên ku bi min re çêbûn û ji hêla din ve helwestên her du malbatan ên astengkirinê. Her duyan jî naverastek nakokiyan ava dikir. An dê min serî ji wan re bitewanda, yan jî dê min red bikira. Lewma redkirina vê têkîliyê jî, girêdayî van pêş ket. Te jî alîkarî nekir. Te her tim got; “bibe keçek bi aqil.” Jixwe tişta ku malbatên me jî dixwest ‘keçek bi aqil û bûkek bi aqil’ bû.

Ger derfetê axaftin û nîqaşê heba, dibe ku rewşek cuda pêş keta. Min xwest li Enqereyê l ite bigerim û pir jî xwest. Bêzar (ezîklîk) bûm. Gelek xirab e ku mirov xwe sucdar bibîne. Me

hev nedît. Dibe ku ez tirsiyam rewş were guhertin. Dibe ku ez bandor bama. Yan jî te dikarî tu wisa bikî ez dev ji biryara xwe berdim. Wisa pirsgirêkek cuda jî dernediket. Lê min înada xwe didomand. Ji dayîka xwe aciz bûm. Min digot; "ew nikare şoreşgeriya min asteng bike û wê zewaca zêde dixwaze bi min bide kirin." Ez niha li Îzmîrê me. Li kargehekê kar dikim. Weke din tiştek din cuda nikarim binivisînim. Hinek pirsgirêkên kum in hêjî çareser nekirî hene. Ez bi wan ve mijûl dibim. Ev jjî pirsgirêkên ku min bi xwe ava kirine. Lewma ezê wan çareser bikim. Dîsa jî ger tu dixwazî binivisîne. Em dikarin bi dostanî nîqaş bikin."

Min pirsgirêkên di navbera xwe û Baqî de vekirî nenivîsand. Ji ber wî jî helwestên min ên berê dizaniya. Pir ecêb bû. Ez niha li cem yeke ku wî naxwazim dimînim. Reviyabûm cem wî. Dê min ev rewş çawa rave bikira? Ev nakokiyek mezin û bê pîvanî bû. Aliyê wê yê duristî jî diket nîqaşê. Belê, niha jî ev mijar ez têşandim. Rastiya rewşa heyî ev bû. Dê wisa bihata şîrovekriin, min ne dikariya li pêşiya şîrove û nirxandinên hinek din bigirim.

Baqî jî name xwend. Aciz bû. Got ku qaşo ez hêjî ji Metîn hez dikim. Ew encam ji nameyê derxist. Me li ser hezkirinê nîqaş kir. Ne rast bû k udi vê mijarê de Metîn tewanbar bikim û hinek baran bavêjim ser wî. Rastî çibû min ew got. Naxwaze ez nivîs jê re bişînim. Her çendî yekser vê nebêje jî, bi nêzîkbûnên xwe diyar dike. Ew çawa şîrove dike bila bike, serê xwe pê na êşînim. Navnîşana wî tam naye bîra min. Naxwazim bi rêya hinek navnîşanên din jî bişînim. Name demekê li cem min ma, lê min nekarî bigihînim wî.

Têkîliyên di navbera min û Baqî de ne ji aliyê yên malê û ne jî ji aliyê derdor ve tam naye fêmkirin. Ne em du hevalên heman bîrdoziyê ne û ne jî em zewicîne. Lê em li cem hev in. Her cihê ku em diçinê di encama nîqaşên me de pevçûnek di navbera me de rû dide. Der barê mijarên ku berê nerim nêz dibû û digot, 'emê yekbin' de, berovajî dibû parazvanek herî hişk. Hewl dida ku dijberê rewşa xwe ya di nava rêxistinê de dernekeve û dijî kargeriya hundurîn tevnegere. Ya rastî wî jî nakokî dijiya. Her ku pirsgirêka Netewî dihat nîqaşkirin û wî jî lêdikola, nakokiya hundurîn kûrtir dibû. Bes di heman demê de pir ecêb bi HK'ê ve girêdayî bû. Guhertinê jî dijî wê dibîne. Ji ber wê derûniyê nikare pir vekirî ya rast jî bi cesaret biparêze. Ango rihek kesên burjuvaziya biçûk bû! Xwediyê nêrînên Feodal û burjuvaziya biçûk bû!

Ji ber vê rewşa wan, komê jî ne dikariya di navbera xwe de baş nîqaş bike. Bandor li wan dikir. Qadroyên Kurd ên di nava refên wan de weke mertalekê bûn. Nêzîkbûna înkara Kurdistanê, helwestên di vê mijarê de înkarî kirina dewsa Enternasyonalîzmê de, pêşketinên erênî jî ji serî ve asteng dikir. Xwe dispartin rastiya giştî ya, 'gel birane'û şoreşgerî dikirin. Li gorî wan erdemtiya herî mezin jî ev bû. Lê dihat zanîn ku şoreşgerî bi kîjan pîvanan, bi navê kî, bi navê kîjan gelî dihat kirin. Bandorbûna destpêkê asayî bû. Ji ber her cewanên Kurd ên her zanîngehê dixwendin li her qadê hember kesên navê wan şoreşger, demokrat û her cure pêşketinên pêşveçûyî re vekirîbûn û di nava wan de cih girtibûn. Lê belê, neçar bû dahûrînên bîrdozî û di mijarên şoreşê yên bingehîn de di nêrînan de zelalî û rastiyek heba.

Gelo erka şoreşgerî çi bû, dikariya li ser kîjan bingehan jîndar biba? Kesek lêpirsîna vê nake. Her kesê di nava koman de di her çalakiyên pratîkî de cih digirin. Bi cesaret û çav sor in. Lê zemînê xwe dispêrinê ne dikare vê hêz û kêrhatiya wan di şêwazek rast de pêş bixe û ne jî di nîtelîkek wisa de bû ku bikaribe wan derbixe holê. Di heman demê de ne jî xisletek wan a çînî ku bikaribe wan bike pêşeng hebû. Îhtîlaliya salên 69-70'î û navê qadroyên rêber ên wî demî ji diruşmayan wêdetir tiştek din ava nekir. Her wiha propagandeyek çor û ajîtasyonê jî derbas nekir. Tevî ku koman di navbera xwe de ji bona xwedîderketina wan pêşbaziyek jî dijiyan. Bi rastî jî kî û kîjan komê îhtîlaliya THKO diparast û nûnertiya wê dikir. Kî nûnertiya Suphiyan dikir, an jî kî nûnertiya Kaypakkaya dikir ne diyar bû.

Herî zêde jî li dijî ciwanên Kurd ên di nava van koman de hêrs dibim. Çi karê wan hebû? Na, bi min re dijminatiya Tirk tine ye. Misqalekê jî vê najîm. Di hemû jiyana min de peywendiyên min ên gerim bi hevalên Tirk re çêbûye. Li dibistana seretayî jî hevalên min hebûn. Cîranên me hebûn. Mamosteyê min jî hebû. Min ji hemûyan jî hez dikir. Ev di peywendiyên me de jî diyar dibû. Yên ku em bandor kirin û ber bi şoreşgeriyê ve birin Denîzan û Mahîran bû. Ma dibe ku ez wan jibîr bikim? Bes divê em bizanin erkên şoreşgerên netewa bindest hebûn û erkên netewa serdest hebûn. Kesên ku li welatê xwe şoreşê naxwaze, rast nêzî doza gelê xwe yê eslî neke, ma dikare barê şoreşa kîjan welatî rake? Ez ti caran ne di vê mijarê de qane bûm û ne jî min pê bawer kir.

Min dikariya beramber dahûrînên hevalên ji Tirkiyê yên der barê Kurdistanê de dikirin tehemûl bikim. Lê tehemûla min li hember ti nêzîkbûnên ên ji Kurdistanê tine bû. Lewma di nîqaşan de me hevûdû dişikand. Hemû nîqaşên me bi dûjînên herî giran ên siyasî ve derbas dibû. Ez di vê mijarê de kêrhatî bûm. Ne ku min pir tişt dizaniya û pir baş dikir. Ez dilsozek bûm, zanebûn hê tinebû, asta min a nêzîkbûna polîtîk jî pêşketî bû. Min her tişt bê ku bihizirim ji bona peywendiyên me yên giştî guncav e yan na, navê komê bikar tînim lê min girê dide an na, çi qasî di nav de me, dikir. Ez bi tena xwe me, lê ti dera ku naçimê û lê nîqaş nakim namîne. Ev jî baweriyek mezin dide min. Li kêleka xebatên kargehê ev xebar jî hêz û moral dida min. Min kovar dixwendin, pey wê re yekser diçûm komaleyan û min nîqaş dikir.

Tiştên ku min ji pirtûkên kevnar ên Marksîst xwendîn tev em piştrast dikirin. Jixwe ti girîng î tine bû navê Kurdistanê hebe an jî tine be. Beriya şoreşa 17' Cotmehê pirsgirêka netewî, pêşketinên li pey wê rû dayîn, dîsa gelek pêşketinên ku li gelek welatan rû dayîn û di encamê de serkeftina têkoşînên rizgariya netewî tev ji bona me çavkaniyên girîng bûn. Min dikariya wan di çarçoveya naveroka bîrdoziya min dizanî û fêm dikir de şîrove bikim. Min cewhera wê digirt. Lewma min nebesiyên ji derveyî van weke asteng nedidît. Şerimbûnek jî tine bû. Ji ber bîrdoziya me rast bû û em mafdar bûn! Ev jî besê min bûn. Her kesê ku bi van bawer bû, dikariya li her cihê lê, di bin her çert û mercî de wê biparêze, belav bike û bike malê her kesî. Lewma ji bona wê mîsoger erkek fermî, girêdanek fermî hewce nedikir. Ez dûr bûm û ji pêwendiya rêkûpêk kirî ya herî qut bûm. Lê min ji xwe digot; "ezê dîsa peywendiyên xwe saz bikim."

Yusuf Metînê ku li Dêrsim-Ovacikê rûdinişt tim û tim dihat mala me. Me zêde nîqaş dikir. Mala ku ew jî lê dima, mala rêxistinê bû. Bes tam weke arşîv û depoya pirtûk û kovaran bû. Digot, weke tevger mijara pirsgirêka Mîllî nîqaş kirine û dê demek kin de nêrînên xwe bi fermî di rojnameya Rizgariya Gel de weşînin. Baqî jî ev weke hêcetekê dida pêş û digot; "di vê mijarê de hinek nêrînên me yên ji hev cuda hene. Em nîqaş dikin. Ger nirxandinek cuda derbikeve holê, emê jî helwesta xwe diyar bikin. Di vê mijarê de ez ne bi tenê me. Gelek Kurd hene. Hemû jî di nava bendewariyê de ne. Em ferz dikin." Ev jî rastiyek bû.

Bîrdoziya Rizgariya Netewî bandor dike. Ji Enqereyê û navendên wan destpê dike û bandor dike. Li qadên weke Dêrsim, Qers û Dîlokê nîqaş kûrtir tên meşandin. Têkoşîna bîrdozî û polîtîk her kes dihejand. Her wiha em kom tev jî neçar in ku der barê Kurdistanê de polîtîkaya xwe destnîşan bikin. Ger ew der barê vê mijarê de dahûrîn û helwestekê pêş nexin, dê ber bi şoreşgerên Kurdistanê ve herikandinek çêbe. Gumanên wan ên naxwazin qadroyên Kurd ji dest bedrin jî zêde ne. Ez van nêzîkbûnan di peywendiyên wan ên bi me re pir vekirî dibînin. Baqî jî diparastin. Ji ber bandorek wî jî hebû. Helwestek ku diyar bike, dê derdor tev bandor bike. Levma di nêzîkbûnên xwe de tevdîr nêz dibûn. Her wiha weke berê jî pê ne bawer bûn. Li taxa em lê diman berpirsyar bû. Lê di mijara destnîşankirina polîtîkayê de û mîna vê de dihat sînorkirin.

Yusuf Metîn jî erkek rehet meşandina kar û temamker dimeşand. Ya rastî herî zêde ew li hember pirsgirêka Kurdistanê baldar bû. Ji ber paşerojek wî ya şoreşgeriya kevin hebû. Di temenek biçûk de tê Îzmîrê, kar dike, dixwîne û di

pêvajoya destpêkê ya THKO de cih digire. Di nava koma ji wan re dibêjin ‘Aktaricilar’ de ne. Demekê dixwazin kevneşopiya paşerojê bidomînin. Di nîqaşan de jî kamil nêz dibû û rêzdar bû. Me demekê li mala ew lê dima pirtûk xwendin û nîqaş kir. Ez, Heyder, Aynur û ew bû. Heman weke xebatek perwerdeyê bû. Me piranî pirtûkên mafê netewan a çarenûsa xwe destnîşankirinê û dîroka Partî ya Bolşevîk dixwend û li ser wan nîqaş dikir. Ez zêde tevlî nêzîkbûnên teng ên komî ne dibûm.

Xwesteka min a xwendin, nîqaşkirin û hînbûnê zêde dibû. Ji bona min zêde ne girîng e ku li kurderê û bi kî re bim. Di mijara Mîllî de nîqaş û qonaxên hevbeş tê hedefkirin. Baqî bi xwe ev mijar teşfîk dikir. Ew ne amade jî ba, xebatek wisa sûdwer didît. Lê meyla Yusuf Metîn bi hêtir û ji bona rêxistinê girîngtir bû. Min ev hîs dikir. Dema min ev nakokî ferq dikir, moral dida min. Min ji xwe re digot; “dê mîsoger di nava wan de qutbûn çêbin.” Tiştên di meriyetê de rû dida ev hêvî didan min. Lewma min ji xwe digot, divê ez nêzîkbûnên Baqî zêde mezin nekim. Ya baştir hejmarek zêde û qutbûnek bandorker pêk werê ye. Divê ez di têkîliyên xwe de ne bê hedar bim û vê jî ferz nekim. Ji ber car bi car nêzîkbûnên Baqî yên hestewar, her tim ez di wan mijaran de aciz dikirim, dihişt ku bertekên min pêş bikevin, lez bikim û ya hêsan hilbijêrim. Gelek caran di nêzîkbûnên min de min digot ger wisa nêz bibe ezê li malek cuda bimînim û girêdana xwe ya bî wî re bi temamî qut bikim.

Ji ber a ez diparêzim ger yekbûnek bîrdozî û rêxistinî pêş bikeve, dikare hevrebûnek li ser vî bengehî pêk were. Ez vê vekirî jî dibêjim. Ango helwestek min a ji bingeh ve redkirin û qetiyên nêz nebim tine ye. Ji ber cihetiya nêrînên me jî ti

hêviyê nadin, min dikariya helwestên xwe zelal diyar bikim. Bi rastî jî ya ji bona min girîng avakirina yekbûnek bîrdozî û rêxistinî bû. Ma ezê çima nexwazim reva xwe ya ji malê veguherînim yekbûnek wisa watedar? Dema em li Dêrsimê jî hevalan bi taybet dixwest Îbo û Baqî qezenc bikin. Lewma niha em di biryardariya şoreşgeriyê de nêzî hev deh kes bûn. Dê çi qas xweşba ku em tev bi hev re di nava tevgerekê de cih bigirin. Dê me derdorên din jî bandor bikira.

Her tim Yusuf Metîn ji min re digot, wisa hêsan nêzî şoreşgeriya Baqî nebe. Na, min jî biçûk ne didît. Aliyên wî yên milîtan hebûn. Lewra min dixwest hevaleke me be. Lê ji ber nêzîkbûnên wî yên bê rêgez bawerî ne dida. Wer dihesibandin ku ev zewac dikare ji bona yekbûnek rêxistinî rolek pir bilîze. Her çendî pir vekirî j imin re nebêjin, lê tişta dihat gotin ev bû. Ji ber girêdana min a bi bîrdoziya min ve û biryardariya min a di vê mijarê de dîtibûn. Ew jî zêde ne li dijî bûn. Carekê jî Ertanê Zer hatibû. Di pêvajoya 12'ê Adarê de bi Rêbertî re heman rojê de hatibû binçavkirin. Ew qadroyê pêşeng ê THKO bû. Digot; " em bi Apo re hatin binçavkirin. Ew min nas dikin. Em di van mijaran de nîqaş dikin. Em mijara Mîllî biçûk nabînin. Her wiha em ne li dijî ne. Hûn dikarin cuda xwe birêxistin bikin. Ger sibe têkoşîn li ser bingehek rêxistiniyek rast pêş bikeve û bi rastî jî ji hev cudabûn neçar be, kes nikare kesî bigire. Erka dikeve para mejî piştewaniya vê kirine. Ger ev li ser bingehek netewperest jî pêş bikeve, dê dîsa jî wisa be. Lê ne raste ku tu û Baqî nakokiyên xwe wisa kûr bikin." Ev gotinên xweş bûn û rastî rave dikirin.

Bes bêhna min teng dibû. Ma çima Baqî derdora xwe têkil vê mijarê dikir? Ez dikarim biryara xwe bidim. Çima Yusuf Metîn, an jî Ertan û her wiha têkil vê mijarê dibûn. Rewşa wan û şoreşgeriya wan min eleqeder ne dikir. Di vê navberê de jî M. Elî hat. Ne dixwest ez kar bikim. Hestiyar nêz dibû. Digot; "zehmete, diwestê. Hûn zilamên mezinin, pirsgirêkên xwe yên aborî hûn çareser bikin. Ezê jî alîkarî bikim. Bila Sakîne devji kar bedre." Min qebûl nekir. Her wiha min rast nedît ku vê mijarê bike pirsgirêkek gururê. Cardin zewac kir rojevê.

Got; "ya rastî hûn dizanin. Ne rast e mirov di vê mijarê de quralek hişk jî derxe pêş. Baqî şoreşgerê sala ye. Nêrînên min û wî jî ji hev cuda ne. Em şoreşger in. Ez jê hez dikim. Ger hinek mijarên hûn li hev nekin hebin, ji demê re bihêlin. Ez bawer nakim ku mijarên hûn lihev nekin hebin. Em jî mijara Mîllî lêkolîn dikin. Heta di vê mijarê de nêrînên me jî derketin. Em hemû jî Kurdistanî ne. Ma ne em nikarin biçin cihek din. Pirsgirêk ne tenê ya komekê ye. Kes nikare wisa jî lê binêre. Nêzîkbûnên xwîşka min Sakîne yên di vê der barê de şaş in. Kes jî nikare înkar bike. Ev dijî zanista siyasetê ye." Bi van nêrînan hewl dida min qane bike. Ji dil û durist bû. Lê zêde bi niyetek baş li pirsgirêkê dinêrî û zêde hestewar nêz dibû. Ji ber di serî de heta niha ev nêzîkbûnên wî didomin.

Li naverastek ku pîvanên Şoreşgerî, rêgez û hêza vîn heye de, tiştên bi zorê nabe. Divê beramber îrada heyî rêz bê girtin. Mirov derfetên xebata bi hev re û têkoşîna hevbeş digere. Mirov hewl dide wan derfetan ava bike û bîne cem hev. Ji ber ev hevalbendiyê pêş dixe û derfetên xebatek wekhev û azad saz dike. Her çendî rewş û jiyana niha em di nav de tevkariyek çors û di jiyana civakî de demokratbûnek çors hebe, cewaziya

bîrdozî û xisletên kesayetî dibin sedem, ku pêşxistina şoreşgerî û pîvanên têkîliyên wê werin astengkirin. Ji ber xisletên kesayetî yên şewaz û hêjî bandora pergalê dijîn hene. Nêzîkbûnên zilam ên bandora çîna feodal, burjuvaziya biçûk û binesaiyek bîrdoziya şovenîzma civakî li holê ye. Ez jî bi bîrdozî bawer im û pê ve girêdayî me, di mijara rêxistinê û meşandina têkoşînê ya giştî de gelekî nû, ecemî û amator im. Dîsa di hezkirin û têkîliyan de hem rev û hem lêgerînekê di nav hev de dijîm. Ji ber min bandora kevneşopiyan derbas nekiriye, helwestek min a di vê mijarê de dem dirêj û bi rêgez pêş neketiye, bi hestên xwe jî tevdigerim. Ev rastî tev di nava hev de tê jiyîn. Bi mantiqê çors ê her tişt ji bona têkoşînê ye tevgerek heye û di mijara rêxistinê de rastiyek têgihiştina hewce dike ez çi li kuderê çawa bijîm, yekparebûna nêzîkbûnên hewcedariya rêxistinî ne û yekbûnek rast avakirin tineye.

Gelo tiştên werin fedakirin çi ne? Bê guman ev tev girêdanên kevin û yên paşverû bûn. Lê bê ku war, dem û sînoran binasim, min gelek tişt feda dikir. Ji hêlekê ve girêdanek hişk, di şoreşgeriyê de israr, înat, heta bi çav sorî ketina nav heye. Ji hêla din ve jî ji bona ez jiyanê bi rêgez, pîvan, rêxistinkirî û bê tavîz bimeşînim de, lewazî û qelsiyên ku min dijiyan hebûn. Gelek caran hest û bertek min dimeşînin. Min di armancekê de biryar daye. Tişta ku diparêzim û di wê rê de her tiştî berçav digirim zelal e. Di vê mijarê de Rigariya Netewî îlham dide. Min wisa hemêz kiriye, ti dudilî û şêlûbûn tine ye. Bi her tiştê xwe ve min dikişîne. Lê ez ti caran xwe ji astengiyan rizgar nakim ku, ez di wî zemînî de cih bigirim. Hewl didim yekê derbas bikim, yê din ji wê cudatir dibe.

Hewldana lêgerîn û derketinan rê ji pirsgirêkên nû re vedike. Ez jî di nava vê de li ber xwe didim. Ev ji aliyekê ve şerkirinê hînî min dike, aliyê din ve jî kêmasî û nebesiyek herî ji rêzê li dijî min tê bikaranîn û l imin vedigere, zerar dide. Ya girîng jî ez van bi destê xwe ava dikim. Ez nikarim vî şer î û hewldanê bi encam bikim. Heta cihekê didome, lê ger ez hinek din bi hedar, mantiq û polîtîk nêz bibim; li ser bertek û hestên xwe serwer bim, ez dikarim encamên erênî bidest bixim. Lê ev çênabe. Ji ber ez bi hinek diyardeyan ve girêdayî dimînim û her tiştî ji wê qonaxê ve digirim dest; li cihê ku bidest bixim, xirab winda dikim. Bi kurtasî di nava têkoşînek zehmet, têkilhev de me. Ber bi wê ve gav tavêjim. Lê mixabin ez bê amadekarî me. Ez her tiştî bi jiyînê re hîn dibim.

Ez revîbûm, her kesî jî li gorî xwe şîrove kiribû. Di mercên wan rojan de rewşek pir ecêb bû. Keçek ku dixwaze bibe şoreşger ji malê revî bû! Ji bona komê ne windahiyek bû. Ez dikarim bizewicim, ti astengî jî tine ne. Berovajî vê hemû şert û merx min ber bi wê ve dehf didin. Lê ez naxwazim bi şêwazek wisa werim girêdan. Min girêdanek qut kiribû. Hem jî ji yek alî ve. Bi gelemperî zilam di van mijaran de yek alî biryar dide. Girêdanê qut dike. Vê carê min ev girêdan qut kir. Lê tevî vê jî her cihê ku diçimê heman rewş tê ferzkirin. Weke ku jiyan ji bilî vê nayê meşandin, ger tu têbikoî jî divê teqez tu bi cihekê ve girêdayî bî, mantekek xwe dide jiyîn heye. Ango dibêjin, nabe keçek ciwan bi tena serê xwe be! Êşên vê dihat dîtin. Ma min ev rastî bi temamî red dikir. Na, berovajî min bi aqil û zanebûn ev rastî diparast. Belê, bandora nêrînên kevneşop hene, dikevim bin bandora rêvebirina wan jî. Lê ti caran şoreşgeriya jiyanek di nava malbat, mal û milk û hêlînê de

hatiye girtin û fetisandin, rast nabînim. Ji min re balkêş jî naye. Di xeyal û bêrîkirinên min de meylek bi vî rengî tine ye. Tam ji wê revek heye.

Peywendiyên min ên civakî ne teng in. Min kêm zêde her derdor jî dîtiye. Ez bûm şahidê gelek mercên jiyanê yên cuda jî. Li şûna din ava wan de winda bibim û bihelim, her çendî hinekê bandor û çavlêkirin hebe, min her xwest xweseriya xwe biparêzim. Vebijêrka min ev bû. Ez di vê jiyanê de jî wisa me. Ez bi komek ku her kesek xwedî xisletek cuda re me. Weke din derdora xwe berfireh dikim. Ev min natirsîne, cesareta min naşikîne, her tiştî bi însafa wan nakim û nakevim bin serdestiya wan. Rêgezên min hene, ez wan ferz dikim. Ez ti caran nahêlim min biçûk bibînin, an jî tenê weke jinekê bibînin. Her çendî aliyên min ên kêm û lewaz hebin, li dijî serdestiya wan serî radikim û napejirînim. Têkoşîneke didome. Lê mixabin tevî vê bindikevim.

Têkîlî her çendî ji yek alî ve werin ferzkirin û carina min jî tavîz dabe, serî tewandibe, carina delaliya xwe jî kiribe, dîsa jî ne gihabû asta zewacê. Ji ber bi rastî jî rewşa parvekirina bîrdoziyên cuda bandor dikir. Bi kesek siyasetek biyanî û cuda re zewac, çi tiştek ecêb e! Dê çi tişta me ya hevbeş hebe? Dê hezkirin, eşq û girêdan li ser çi pêş biketa? Tenê malek hevbeş û textek razanê ya hevbeş hebû, ev jî arjeng bû. Ev li dijî bîrdoziya min jî bû. Ji ber yekbûna jiyana hevbeş a bîrdoziya min dixwest, têkoşînek doza hevbeş bû. Bes em li heman malê, mirovên armancên wan cuda bûn. Dema em diçûn cihekê em bi du zimanê cuda di-axivîn. Yek redkarê şoreşa Kurdistanê, ya din jî neçar bû li gorî bîrdoziya wê di-afirîne û exlaqê wê yê rêxistinî ve girêdayî tevbigere. Dibe ku hevberdan hê pir tûj ne

dixwiya. Gelek kesan ev pirsgirêk weke nakokiya çepgiran a navxweyî dinirxand. Lê belê, ev bîrdozî bi her awayî ji çepa kevneşop cuda bû. Tevî vê Baqî digot ku emê bikaribin yekbûnek bîrdozî saz bikin. Wer îdîa dikir ku ez teng û dogmatîk nêzî vê mijarê dibim. Em di pêvajoyeke hê min pê bawer ne kiriye û ne bawerkirinê de jî mafdarim, em zewicîn.

Gelo bêjim ez bê xwesteka xwe, bi ferzek zorê û daxwazek yek alî ve em zewicîn wê ti wateya xwe hebe? Lê rastî jî ev bû. Di nava komek heval û dostan a teng de merasîmek mahirkirinê pêk hat. Kêfa M. Elî xweş bû. Dema ez rakirim govendê giriyam. Ma dê min kêfxweşiya çi bijiya! Girêdanek bê xwesteka min dihat avakirin. Tenê ji bona her kesî dixwest ev dihat kirin. Tenê ji bona Baqî dixwest pêk hat. Ger hinekê derfetên xebata hevbeş û mercên bi hev re têkoşînê bihatan avakirin, di wê mijarê de duristî heba, dê min jî bipejiranda û erê bikira. Lê dudilî ye, ne dev ji yar û ne jî dev ji serî deberda. Ti eleqeya xwe bi nêzîkbûnên min ên lez û bez û teng ve nebû. Ma dê min çi hedar bida raberkirin?

Baweriya min beramber min şikest. Wê rojê li şûna şerkeriya min a berê bêdengî û bê moralî hebû. Tevahiya rojê min ne xwest bi ti kesî re biaxivim. Her li kolanan geriyam. Êdî min ne dixwest cardin biçim wê malê. Her kesî jî min fêm dikir. Para wan jî di vê pirsgirêkê de hebû, hestiyar nêz bûn. Her çendî ez ji siyaset din jî bim, di encamê de ez xwîşka wan bûm. Peywendiyên me xwezayî bûn. Bi taybet Îbo di peywendiyên xwe de zêde gerim û durist bû. Çend caran wî jî dilê Baqî hiştibû. Gotibû;

“ev kar bi darê zorê nabe. Xwîşka me rehet bedre. Bila ew bi daxwaza xwe biryar bide. Her carê nexe rojevê.” Weke din jî

ez bi wî re cuda axivîbûm. Maf dida min. Lê di encamê de ew jî hestiyar nêz dibû. Baweriya wî bi Baqî hebû. Pê bawer bû ku dê ev zewac ji bona em şoreşgeriyê bi hev re bimeşînin ne asteng be.



“Zanebûna çînî li derve tê dayîn…”

Di wan rojan de li kargehê gireva karkeran ketibû rojevê. Ez neçûm kargeha ku min lê kar dikir. Ez çûm tevlî berxwedaniya Kula Mensucat bûm. Şev jî li wir bi karkeran re mam. Dema ez çûm, min ji Îbo re gotibû. Hemû karker tevlî berxwedaniyê bibûn. Li pêş kargehê kon vedabûn. Girevek bi govend, def û zirne ve pêk dihat. Çavderên girevê pêşmalkên spî li ber xwe kiribûn. Li derdor dovîzên nivîsandî hebûn. Yên weke “Bila derfetên kar werin sererastkirin”, “Ji Sendikaya Zer re na!”, maf nayê dayîn, tê girtin!”, “Bila karker bikevin rêveberiya Sendîka!” Bûn.

Gelek kesên kum in beriya niha li komaleyê jî dîtin li wir bûn. Di wê navberê de serokê şaredariya Gûltepe Îhsan Alyanak jî hatibû sedana karkerên ku dev ji kar berdane. ‘jist dike!’ Weke alîkarî wesayîtek şaredariyê tije sewze û fêkî jî anîbûn. Karkeran jî bi çepkan pêşwazî ku û diruşma qêriyan. Komel karkerên ku bê tazmînat ji kar hatine derxistin di girêva birçîbûnê de. Yên di girêva birçîbûnê de ne, bi navber tenê ava şêrîn vedixwin. Em jî xizmeta wan dikin. Ez di wê navberê de bi hinek kesên ku min berê nas kirine re nîqaş dikim. Pir xweşe. Ez tiştên ku malê hatine jiyîn jibîr dikim. Zêde zehmet bû ez kargeha ku min lê kar dikir jî wisa tevlî çalakiya girevê bikim. Me li ser derfetên wê kargehê nîqaş kir. Ji bona rêxistinkirina karkerên li kargehên i wî rengî, bal kişandin li ser hinek mijarên ku divê mirov hişyar nêz bibe. Weke din jî gotin;

“ancex dikarin tevl girevên giştî bibin. Zehmete bi tena xwe çalakiya girevê bikin.” Her wiha li ser ve zêde kirin ku neçar e şoreşgerên derve biçin karkerên li wir birêxistin bikin.

Ango; “zanebûna çînî ji devrede tê dayîn.”

Lenîn jî ev digot û rast bû. Ji ber çîna karker ji xweber zane nedibû. Lê li cihê min kar dikir kes tinebû. Ger hebûya dê mîsoger me hev binasiya.

Ez roja duyem jî li wir mam. Roja sê Saîme û Baqî hatin ez birim. Saîme jî tevlî me dibe. Dema ez hemêz kirim û ramûsam min j imin re got, ‘jin-bira.’ Ez naxwazim wê gotinê bikar bîne. Kesek ecêb e, di serdema xwe ya kamilbûnê de ye. Tim li yatili xwendiye, lewma biyanî bûye. Nêzîkbûn û axastinên wê weke yên zarokan e. Demekê em hemû bi hev re li wê malê man.

Şevekê li heman kolanê, li komaleya ‘Ûlkû-Bîr’ bûyer rû dan. Ser bi komaleya faşîstan de girtin. Baqî wan birêxistin dikin û êrîş dibin ser wan. Piştî wê bûyerê mala em lê diman eşkere bû. Em yekser ji wê malê derketin. Piştî demek ket navberê jî me tiştên xwe birin. Jixwe tiştek me zêde jî tinebû. Êdî em du malan cuda diman. Heyder û xwîşka xwe cuda bûn, em ên din jî li malek din diman. Em vê carê li Bayrakli bûn. Me li kargehek li Alsancakê, li kargeha dokuma dest bi kar kir. Vê carê çend keçên ku li Zanîngeha Bornovayê jî dixwendin li vê kargehê kar dikirin. Me ew keç li komaleyê nasîbûn. Ew jî bi biryara rêxistinê dikevin kargehê. Ji HK’ê ne. Ji bon amin ti ferqa xwe tineye. “dê baştir beî emê bi hev re birêxistin bikin.”

Kargeh mezin e. Beşên wê yên pembû, bobîn û paçan hene. Me di beşa ta de dest bi kar kir. Karek pir xweşe. Rêz bi rêz bobînin, dagirtina wan, hunandina ta, ew xelekên spî gelekî xweşikin, ez her dixwazim li wan temaşe bikim. Lê zêde firsend jî tine bû. Ji ber kîjan ji hev qut bûba, divê mirov yekser girê bida. Bobînên vala yan jî yên nîvî li cihên din dihatin

bicihkirin. Serbazên kar her tim kontrol dikir. Dikariyan li seriyekê rawestin û hemû eywanê temaşe bikin. Ger bobînek qutbûyî heba, yan jî rawestiya be, qiyamet radikirin. Bes li hember her kesî ev nêzîkbûn raber ne dikirin. Dema yên reben û sitû tewandî bidîtan, beramber wan dikirin. Bi giştî jî li hember me bi sixtekarî (kûstah) dikeniyan. Dema bi ser wan de diqêriyan ya rastî weke ku ji me re bêjin; "keça min ji te re dibêjim, bûkê tu guhdar bike." Bû.

Me bi çav li hev dinêriya. Me ji xwe re digot fêm bû û em bi halê wan dikeniyan. Pêdiviyên me yên rojane jî bi xolekan ve hatibû diyarkirin. Gelek ji karkeran ji bona cixarekê bikişînin, tim û tim diçûn tuwaletê. Em jî ji bona ser hinek tiştan bi-axivin diçûn. Lê me hewl dida em balê nekişînin ser xwe. Ji ber qedexe bû em li ser serê mekîneyê bicivin û bi-axivin! Serkêşên kar heman weke polîsan bûn. Li xwaringehê jî heman weke polîsan (hafiye)li ber serê me radiwestin.

Berxwedaniya Kula Mensucat çeng kargehên din dokuma tevlî xwe kiribûn. Girevên kargehên nêzî hev karsaz kiribûn tengezariyê. Di radeyek giştî de mafên ku hatibxwn xwestin, hatin bicihanîn û cardin her kesî dest bi kar kiribû. Bes daxwazên giştî esasî, daxwazên aborî bûn. Sendika hatibû guhertin, ji Sendîkaya zer a girêdayî Tûrk-Îş, hemû bi hev re derbasî Sendîkaya girêdayî DÎSK'ê bûn. Dikariya ev çirûska li kargehan belav bibe. Ji ber tevahiya Îzmîrê kargeh in. Li hinek qadên mezin ên weke Elî axa û Tarîş'ê komên mezin ên karkeran hebûn. Baldariyek bi vî rengî li kargeha şekir tine bû. Li vê kargeha em nû derbasî bûnê de baldar û hişyar nêzî her tiştî dibin. Keça ku em bi hev re derbasî kar bûn Gulnaz hinek daxwiyanî kir dolabên keçan de. Rojnameya Rigariya Gel

belav kiribû. Hinek ji karkeran tirsiyabûn, bê ku bixwînin biribûn radestî serkêşê hostayan kiribûn. Piştî vê rewşê em zêdetir şopandin. Hevalên wê yên zilam jî hebûn. Car bi car di navberan de dihatin cem hev. Ew jî bal dikişand. Hinekê jî ecemî kar dikir. Nêzîkbûnek kar a kevnar derbas nedikir. Min jî ew di mijara ecemîtiyê de hişyar kiribû. Dema nêzîkbûnên wê, ew zû da dest, temenê karkirina wê jî zû qediya. Bê ku hefteyek tije bibe, em ji kar hatin avêtin. Di heman demê de ti hêcet jî destnîşan nekirin. Tenê gotin;

"pêdiviya karkeran tine ye. Yên dawî hatibûn tenê di pêvajoya ceribandinê de bûn. Mafê me heye ku em di vê pêvajoyê de girtina karkeran rawestînin."

Lê me sedema vê baş dizaniya. Me hinekê qêriya; ji wan re diyar kir ku dê nikaribin ev qas kêfî nêzî me bibin, nikarin derfetên girtina karkeran li gorî xwe diyar bikin û me hinekê jî ew tehdît kirin. Dema axaftinên me ew tehrîk kirin, gotin;

Me wêneyên we dane her derê. Êdî hûn nikarin li deriyê ti kargehî re derbasî hundur bibin. Hûn terorîst in, ev jî ji cil û bergên we û nêzîkbûnên we diyar e." Bi rengî jî em qewitandin.

Ez û Gulnaz di tevahiya rê de hem keniyan û hem jî lêgerîn bê ka kêmasiyên me çavkaniya xwe çi digirt û nîqaş kir. Ecemîtiya wê ez jî eşkere kirim. Em bi hev re çûbûn komaleya li Kemeralti. Min wê rojê Haşim Demîr ê hê li Kişlayê cîranê me bû dît. Hinek din jî ji Dêrsimê hebûn. Em çûn odeyek bêdeng û me nîqaş kir.

Wan jî digot; “dê mijara Mîllî derbikeve.” Min jî got ev jî mijûlbûneke. Dê wisa nebe. Ji hemû halên wan diyar dibû kul i nava lêgerînekê de ne. Wan jî got;

“ger em nekarin qane bikin, pêşniyarên me neyên berçav girtin, em jî nikarin bê helwest bimînin. Kêfa min ji vê re hat. Paşê got;

“Em carekê werin cem hev û nîqaş bikin” û çû.

Pêşketinên kur û didan, ez ber bi xelekek peywendiyên dagirtî ve dibirim. Ez jî di cihê xwe de nasekinim. Lê ku derê tiştek hebe ez jî diçim wê derê.

Min bi bangewaziyekê şopa hevalên xwe dît

Mamoste Elî jî li Bayrakli bicih bibû. Li rawestgeha wesayîtan keça wan Aysel rast hatim. Dema ez li Dêrsimê bûm, Aysel li dibistana amadeyî dixwend. Yûksel jî li dibistana mamosteyan bû. Dayîka wan xaltîka hevalê Mazlum wan e. Dema hevalê Mazlum û Delîl li Dêrsimê bûn, dixwestin wê malbatê jî qezenc bikin. Peywendiyên Yûksel bi me re heval bû. Dibistana Mamosteyan a Tuncelî xilas kiribû. Demekê mamostetiya malbatê xwendekaran (vekîl) jî kiribû. Bavê wan jî mamostetî kiribû û emeklî bû. Xwestine ku li Dêrsimê bimînin. Lê ev polîtîkaya mamoste Elî bû, wî hatina Îzmîrê ferz kiribû. Ji ber ger li Dêrsimê biman dê zaroyên xwe winda bikira û biban şoreşger. Piraniya zarokên wî keç bûn û dixwest pîşeya xwe bidomanda. Ecêb bû, yek jê yê ku Kemalîm diparast jî ew bû. Lê di heman demê de xwe jî demokrat dihesibandin. Heman weke xalê min Hesen bû. Dema xalê min serxweş dibû dûjîn ji dewletê re dikir. Dibû demokratê herî baş

û ji me re jî diogt, ‘heval.’ Dema ser hişê xwe jî bû digot; “bi aqil bin, ev dewlet mirovan nahêle” û nêrînên xwe yên esasî diyar dikir.

Ya rastî dûrbûna ji welat û dûrbûna ji hevalan zehmet bû. Herî zêde jî ez bi dîtina Yûlsel kêfxweş bûm. Lewma kêfa min di cih de bû. Ez û Yûksel geriyan û me nîqaş kir. Min gelek pêşketin bihîst û navnîşana wê girt. Min ji Tirkan wan re jî nameyek nivîsand. Min rewşa xwe ji hinek aliyan ve di wê nameyê de nivîsan. Diyar kir ku ger em yekbûnek bîrdozî ava nekin, ezê devjê bedrim û vegerim. Yekser bersiva nameya min hat. Ew jî kêfxweşiyek cuda bû. Ango ji nû ve girêdanek û pêşxistna pêywendî çi qas xweş bû! Tirkan dibêje, name bi hevalan re xwendiye û ew jî bi armanca pištewaniya min, nirxandinan dike.

Yûksel dibêje birayeke hevalê Mazlum wan jî li Îzmîrê, Bornova dimîne.

“Lê belê, ew ji azadîxwaza ye.”

Em jî bê ku wext derbas bikin çûn cem wan, me nîqaş kir. Ew zêde girtîbû. Yekser bû parazvanê Rêya Azadî yê herî esasî. Li hember me jî bi bertek bû. Me jî got em li pêvajoyê binêrin, peywendiyên xwe bidomînin, emê teqez qezenc bikin. Her wiha em ji ber hevalê Mazlum jî zêde bi ser de naçin.

Ez jî di wê demê de vala me, kar digerim. Lê zêdetir derfetên min heye ku ez bi Yûksel re li komaleyan bigerim. Rojekê em her du jî çûn komaleya girêdayî DDKD’ê ya li Kemeralti. Yek bi navê Birahîm ê Yûksel dinasiya li wirbû. Bi yûksel re mijûl bû. Bi gelemperî jî silav dan û pirsa me kirin. Beriya hingê dema me li komaleya HK’ê nîqaş kirî, behsa

netewperestiya DDKD'ê kiribûn. Heta gotibûn li ser deriyê wan nivîsek heye dibêje, "tenê yên Kurd dikarin werin vê komaleyê." Her çendî hatibû zêdekirin, nêzîkbûnek wisa dihat hêvîkirin. Min ji bona wan gotibû 'nêzîkbûnek wisa asayî ye.' ji bona me jî digotin, " hûn cuda ne. Ya rastî zêde navê rêxistina we ne hatiye bihîstin, lê em bawer in naveroka tevgera we heye."

Her çendî din ava van nirxandinên wan de biçûk dîtinek hebe, para xwe ya rastî jî hebû. Ji ber peyva:

"Hûn cuda ne!" Balkêşe.

Belê, bi rastî jî rabûn, helwest, nêzîkbûn û axaftinên xwe ve heman weke komên axayên gundan bûn. Ji derve de ronakbîr bûn, gelemperiya wan jî xwendekarên zanîngehê bûn. Lê di peywendiyên wan de şêweyek feodal û giraniya bandora wan diyar dibû. Hemû jî bi Kurmancî di-axivîn. Berî dem derbas bibe, ji me pirsîn ku em ji kur in. Gelo em Kurd in, an na. Ji bere w kesê bi navê Birahîm Yûksel dinasiya got;

"xwîşkên me Kurd in. Ji Dêrsimê ne." Dema di axaftinên xwe de behsa me her duyan kir, carekê l imin nêrî gelo rast gotiye an na, da ku ez jî erê bikim.

Min jî bi Tirkî got; "Belê, ji Dêrsimê me."

Ji min pirsî; "Ma tu bi Kurdî nizanî?"

Min jî bersivand; "tenê dimilkî dizanim."

Helwdan bi dilnivzî nêz bibin. Tenê jin em hene. Paşê jinek esmer hat. Ew jî bi Kurmancî di-axivî. Me hevûdû nas kir. Ji ber carê em diçin zanîngeha Ege ya Bornova. Em li kampûs û di kêliya xwarinê de liqay hev hatibûn. Zêdetir ez li cem ên ji HK'ê dîtibûm. Dibe ku ez jî ji HK'yan dizaniya.

Demekê dagirkirinên welat bi ser hev de hatibû. Lewma em jî diçûn serdana wan. Dibistan zindî bûn. Lê her tim ên TKP, Rizgarî û DDKD (Doxu Devrîmcî Kûltûr Dernexî) ji hev cuda bûn. Xwe kiribûn nava komên teng de û fetisandibûn. Her wiha yên PDA jî cuda disekinîn. Her tim ev kom bi oportûnîstî dihatin tewanbarkirin. Ew tevlî ti çalakiyan nedibûn. Lewma di pêwendiyan de dûrbûnek hebû.

Bangawaziyek li ser dîwar bala min kişand. Rabûm min ji nêz ve xwend. Wisa nivîsandibû: "dê rewşa du kesên ku ev demeke bi me re tevdigerin, din ava hinek xebatên komaleyê de cih girtine, lê di demên dawî de girêdana wan bi komek navê "Rizgarîxwazê Netewî me" heye û dev ji refên şoreşgerî berdane, were destgirtin. Em vê ji nîqaşê re vedikin û wan vedixwînin rexnedanê."

Carekê min zorê xwe girt û neqêrim. Dixwazin bila dijûnan bikin, çi dikin bila bikin, ji bona min ne girîng bû. Min hevalên xwe dîtibû. Demek li vir jî heval hebûn. Ya girîng jî ew bû. Min ji Yûksel re jî got, wê bangawaziyê bixwîne. Birahîm hinek din vekir. Di wê navberê de navê wan jî got:

"li zanîngehê dixwînin, yek Celalê ji Nîzîp'ê ye, yê din jî Heyderê Zer yê ji Surucê ye." Min ji wan pirsî gelo dikarim çawa hevdîtinê bi wan re bikim. Beşa wan gotin. Texmîn nakin ku werin komaleyê.

Ez bi vê jî kêfxweş bûm. Ma yê bihatan hesabê çi bidan DDKD'ê? Pir vekirî di wê bangawaziyê de jî diyar dibû ku armanca wan reşkirina hevalan bû. Weke din jî armanc şêlûkirina hişê her kesî bû. Dixwestin wisa li pêşiya qutbûnan bigirin.

Pêvajoya erdheja Lîcê ye. Hinek sazî di bin navê cuda de alîkariyê kom dikin. Lê dîsa jî ev ji bin venêrîna dewletê dernakevin. Asta nîtelîk û pîvanên alîkariya madî û propagandeya di her erdhejê de derdikeve holê çiye, ev jî bi heman şêwazî ye. Lê cara yekê ye di vê çûna me ya li DDKD'ê mijar cuda tê nîqaşkirin. Hinek komên din jî diçin qada erdhejê. Ji ber erdhejê yên çûbûn Lîxeyê vegeriyabûn. Lewma di derheqê xebatên xwe de rapor bidan. Ji ber vê tevgerek û hewayek civînê hebû. Min û Yûksel li hev nêrî. "Gelo dê bixwazin em ji vr biçin?" Ji ber di helwestên wan de ev encam derdiket holê. Bes ji Lîcê hatibûn, baş e ku em axaftinên wan guhdar bikin. Yên hatibûn li maseya kêlekê rûnistibûn. Ne bi daxwaziya min jî be, min hinek axaftinên wan guhdar kiribû.

Pênaseyên weke Netewparêz û UKO'yî bikar tanîn. Bi gotinên weke, "wan her der tevlîhev kir, di navbera gel de nakokî ava kirin" bikar tanîn û axaftinên xwe didomandin. Hedara min nema. Çi dibe bila bibe, bila gotinên herî xirab jî bikin, ez serê xwe bi wan na-êşînim. Ez hîn bûm ku xebatên me hene û heval çi karî dikin. Êdî her kes behsa vê tevgerê dike, bi nav dike. Ya herî bedew û watedar jî ev e. Nexwe diyar e xebatên me berfireh dibin.

Birahîm û hinek din bê navber çavdêriya me dikirin. Nikarin yekser ji me pirsin ku em ji kîjan siyasetê ne. Lê bi her awayî diyar bû ku zêde mereq dikirin. Ger bikaribin di civînê de jî vekirî bi-axivin û tewanbariyên xwe diyar bikin dm baş be. Dê derfetê nîqaşê jî derbikeve holê. Ji bere w zilaman tonek agahiyên berovajî û ne rast belav dikirin û dinirxandin. Gelo ev çi qas rast bûn? Tiştek ku ev nêzîkbûn bi wan bide qezenckrin

tinebû. Civînê destpê kir. Yên ji Lîcê hatibûn, di dîwanê de bûn. Bi dorê mafê axaftinê girtin û axivîn. Me jî pêşniyar kir.

"Kerema xwe re hûn bikaribin bi Tirkî bi-axivin."

Di-axivîn, axaftinên beriya hingê di navbera xwe de kirîn, cardin dubare kirin.

"Em destpêkê weke komîte tevgeriyan. Dema belavkirina amûrên alîkariyê ket rojevê, UKO'yan oportonîstî kir. Ew cuda tevgeriyan. Belavkirina amûran li gorî xwe kirin. Di nava gel de cihetî kirin. Gel li hev ket. Em jî destpêkê serwer nebûn. Lê paşê me destwerda. Xebatên me erênî bû. Baldariya gel li hember me zêde bû. Gelê me yên bi zimanê xwe di-axivî û ji bona wan têdikoşiya nas kir. Li dijî wan bertek raber kirin. Bi zimanê gel, zimanê dayîkê ne di-axivîn. Gel beramber wan bê bawer bû."

E di cihê xwe de ne disekinîm. Dixwazim gotinên wî qut bikim û bi-axivim. Bes di roja yekê de jî helwestek wisa ne baş bû. Siyasetek cuda ye. Jixwe dê şoreşgeran reş bikin. Dê hinek din cirab bidin nasîn. Ev jî xwezayî ye. Ji ber xisletê wan wisa bû. Ez jî ji xwe re dibêjim, "baştir e, bila niyet û nêzîkbûnên wan derbikeve holê." Çawa gotinên xwe xilas kir, min jî mafê axaftinê girt.

"Li min biborînin ez bi Kurmancî nizanim. Lewma bi Tirkî bi-axivim. Başe ku mirov pêşketinên li welat ragihîne. Me jî bi baldarî guhdar kir. Me bi van axaftinan agahiyên baştir ji erdheja Lîcê girt. Em ji bona vê tiştekê nabêjim. Lê dema hevalan dest bi axaftina xwe kir, her tim hinek tewanbar û reş kirin. Vegotinek yek alî bû. Lewma şik dibim gelo, çi qasî rast in. Ger yek ji wan hevalan jî li vir hebûya, dê ev pirsgirêk jî

baştir bihata fêmkirin. Ez jî vê mijarê rexne dikim. Weke din jî pirsgirêka ziman derdikeve pêş. Kurmancî zanîn, an jî nezanîn ne pirsgirêkek bingehîne. Dikare şoreşgerî û rastî bi zimanên cuda jî werin ravekirin û pênasekirin. Ne rast e ku ev weke pirsgirêkek diyarker were destnîşankirin û pirsgirêk bi vê ve werê girêdan. Di heman demê de ez bawer nakim ku di kêliya belavkirina alîkariyan de, di nava gel de cihekarî hatibe kirin." Ez li pişti van gotinan li cihê xwe rûniştim.

Axaftinên min hişt ku hinekê bêdeng bimînin. Yê ku civîn birêve dibir aciz bû û bi dengê xwe yê bilind ve dida diyarkirin ku şîrovekirina hinek rastiyan ne tewanbariye. Bersiv da min û ez weke muhatabekê dîtim.

"Ger hinek tiştên ku heval dizane hebin dikare bi-axive. Em dikarin nêrînên UKO'yan jî guhdar bikin. Li nav çavên min dinêriya. Mereqên wan jî wisa derbas bûn. Êdî hewce nema ku em navê siyaseta xwe jî ragihînin. Ji ber em UKO bûn. Em li bendê bûn k udi civînê de rewşa wan her du hevalan jî vekin û nîqaş bikin. Qet behs nekirin. Hat gotin, "ji ber ew her du kes ne amade ne, dê rewşa wan paşê were destgirtin" û hat talokirin. Ecêb, me bernameya wan ser û bin kiribû. Dê çi qas baş ba ger nîqaş bikiran. Lê ev jî ne kêm bû. Em li piştî civînê hinek din jî rûniştin, paşê derketin. Di heman demê de me got, emê cardin werin.

Gotin; "belê, belê komaleya me ji xwîşkên me yên Kurd re jî vekiriye." Weke ku razî bûn nêzîk me bûn. Kî çi dizane dibe ku ji gelek aliyan razî jî bûn. Du jinên Kurdistanî li cihek ji welat dûr û metrepolan dihet Komaleya wan! Wan demek dirêj bû Kurdên wisa û kesên ji siyasetên din li komaleya xwe ne

dîtibûn. Nizanim çi qas rast e, li gorî me bihîstî yên ji çepên Tirk hatîn qewitandibûn.

Carina bi Yûksel, carina bi tenê û carina jî bi Baqî re diçim-dihatim. Baqî nas dikirin. Wî jî hemû dinasîn. Lê tevî vê zêde beramber hev ne baldar bûn. Di bangawaziya li komaleyê hat kirin de navê Celal û Heyder jî derbas bûn. Em jî rabûn li wan geriyan. Baqî navbeynkarî kir. Ji dibistanê pirsî û randevu girt. Rojekê li Kadîfeqaleyê me û Celal hev dît. Bes tevî ku mala wan jî li wê taxê bû, cihê hevdîtina me xwaringeha sûkê bû. Em li vir pê hesiyan ku bi jinek ji Qibrisî re zewiciye. Ew jî li zanîngehê dixwîne. Lê Celal ji Nizipê ye. Got ku berê peywendiyên wî DDKD'ê re hebûye, lê piştî ku heval li Dîlokê nas kirine peywendiyên xwe bi DDKD'yan re qut kiriye.

Got; "Ya rastî ti girêdanek min bi wan re tineye. Komaleyek Kurd bû. Ew jî Kurdistanî bûn. Peywendiyên me gerimbûn. Girêdanek min bi rêxistinî tinebû. Hevalê din jî ji Surucê ye." Me navnîşana mala ku em lê dimînin da û rêya wê tarîf kir. Celal wer dizane ku em her du jî hevalên ji heman rêxistinê ne. Lewma ez ji vê tengav bûm. Jixwe dema Baqî em dan nasîn û got; " ev Sakîne ye. Di heman demê de em zewicîne." Zêdetir tengav bûm. Celal, Baqî ji dibistanê dinase ku ji HK'ê ye. Ji ber zêdetir bi wê derdorê re digeriya. Serê wî tevlîhev bû. Derfetê axaftinê tine bû. Jixwe min jî zêde guncav nedît. Hem ne baş bû ku em zêde li xwaringehê rûnin û bi-axivin.

Min pirsî gelo ji bilî hevalê Heyder weke din kes heye, yan na. Got; " hinek dilsoz hene, em nîqaş dikin." Min jî behsa Yûksel kir. Min her pêşniyar dikir ku bi wê re jî hevdîtinê bikin. Lê got; "dibe ku ez demekê ne li van deran bim." Min di

vê mijarê de zêde pirs nekirin. Em ji hev veqetiyan. Baqî di rê de li Celal axivî, lê ne erênî bû. Şêwaza jiyana wî ya li dibistanê rexne dikir. Got; "li pey keçek ji Qibrisê ye. Ez qet ne dihizirîm ku netewparêz be. Ji ber li cem DDKD'ê bû. Hemû jî zarokên axa ne. Bavê wan jî komprador in. Kesên wisa nikarin doza Kurdistanê biparêz in. Nikarin nûnertiya wê bikin."

Min jî got; "nêrînên te yên der barê DDKD'ê de rast in. Bes tu çima Celal têkil wan dikî, dibe ku berê bi wan re tevgeriya be. Li gorî te her kes burjuvaziya biçûk e. Tenê yên HK'yî şoreşgerên proleter in. Rastiyên bîrdozî ne girîng in, kes ne diyarker in ne wisa. Her wiha nû derbasî nava me bûye." Her wiha min nîqaş hêjî gur kir:

"Hem tu çima naskirna me ya destpêkê de dibêjî em zewicîne. Divê em di vê mijarê de jî ne tişta li got kêfa me, tişta guncav çiye wê bikin û bêjin. Qet ne hewce bû, ne rast bû te behsa zewace kir."

Wî jî got; " Ev rastiyeke. Di gotina min de ti pirsgirêk tine ye. Ma çima ezê nebêjim? Tu çima ji vê rewşê şerim dikî? Ma tu me hêjayî hev nabînî? Ger ne wisa be, nexwe çiye?" Di vir de zêde aciz bû. Me di rê de nîqaş kir heta em çûn malê û domand.

"Ma dema te hevalên xwe dît, dê tu me bavêjî kêlekê? Ecêb ev çi berpirsyariya şoreşgerî ye? Em li hember hev jî berpirsyar in. Bi hev ve girêdayî ne." Li pey van gotinan ez jî teqiyam û min got;

"Na, em bi hev ve ne girêdayî ne. Ez di bingeha yekbûnek bi vî rengî de tiştek ku me bi hev ve bide girêdan nabînim. Heta ku cudabûna me ya bîrdozî û rêxistinî hebe, tu dikarî behsa

kîjan yekbûn û hevjînê bikî? Te ji serî ve ez di vê mijarê de mijûl kirim û tu durist nezîk nebûyî. Te her tim ji bona zewacek wisa got, ‘ez lêkolîn-lêgerînê dikim’, lê meh derbas bûn, rewş heman tişte. Peywendiyên te yên rêxistinî jî dîsa bi HK’ê re didomin. Tu li her cihî endamê HK’ê yî. Tu di asta herî jor de HK diparêzî. Belê, lêkolîna te li kur ma. Ger wisa berdewam bike, dê ti hevrebûna me li holê nemîne. Ev ne çarenûsa me ye, lewma ev jî min bandor dike.”

Ez ji hêrsa weke dîna me, j içi re rê veke bila veke axaftinên xwe berdewam dikim.

Baqi got; “temam, tê fêmkirin.” Bêdeng bû. Naxwaze min zêdetir tehrîk bike. Di berdewamiya gitinên xwe de got; “ma ev qas zû dibe? Tu ne xwe, ne jî kesek din nafikirî. Hewce nake tu nakokiyên ev qas biçûk mezin bikî. Ger tu hinek din xwînsar û bi mantik bihizirî dê baştir be.” Belê ‘çi qas ferq di navbera çareseriyên Şoreşgerî û çareseriyên bûhurdar de’ heye!’

Hîna nîqaş û têkîliyên me di vê astê de em diçin Dêrsimê. Beriya em biçin rojekê, em çûn cem malbatek penaber ên Bulgar ku li Karşiyaka rûdinin. Du keçên wan ên ciwan hebûn. Hevalên Baqî yên zanîngehê bûn. Em jî ji komaleyê hev dinasin. Ji şinga ez hatime ve pantorek û gomlekek li ber minin. Min ne guhertibûn. Min di navberê de gomlek diguhert. Lê ez neçar bûm heman cilan bikar bînim. Ji ber pereyên me digirt, ancex têra pêdiviyên me yên rojane dikir. Gelek caran min cilên xwe dişûşt û hê şile li ber xwe dikir. Cil li ber min ziwa dibûn. Lewma ne dibû ku ez bi wan cilan biçim Dêrsimê. Baqî got baştire ku ez hinek cilên guncav ên hevalên wî bigirim. Em şevekê bûn mêvanê wan. Min hinek cil jî girt û em derketin.

Dema em çûn, em yekser Enqereyê re derbas bûn. Em ne rawestiyan. Dema em gihan Dêrsimê, yekser derbasî gund bûn. Weke din jî em çûn hinek cihên diyar. Meto û Tirkan hatin serdana min. Em dirêj axivîn û me nîqaş kir. Me di vê navberê de pirsgirêkên hevrebûn û zewacê jî nîqaş kirin. Me nêzîkbûnên wan ên destpêkê, nebesiyên hatine jiyîn, bandora wan a di reva min de tev nîqaş kir. Min naveroka nameya ku şandiye vekir. Min diyar kir ku pirsgirêkên di navbera me de hêjî didomin. Dem dirêj bi Baqî re jî axivîn. Baqî zêdetir nerim nêz bû. Hinekê jî di ferqa pêşketinên ku li Dêrsimê rû dayîn de bû. Tevger berfireh bibû, her kesî nîqaş dikir. Hêzek ava bibû. Nîqaşên Tirkan wan erênî bandor dikir. Wan jî çavdêriyên xwe digotin; "mirov dikare pir hêsan qezenc bike." Meto jî di navberê de digot;

"xwîşkê, xwîşkê, ev tenê ji bona devji te bernedê dê derbasî siyaseta we bibe." Henek dikir û em tev didan kenîn. Di henekên wî de jî parek rastiyan hebû. Lê mixabin bira û rêhevalê min ê xweşik pir hêsan nêz dibû. Belê, ji bona devji min bernedê! Temam, evê bi hevrebûnek çawa be? Bihevrebûnek zorê. Tenê ji bona ev hevrebûn xirab nebe, rêhevaltiyek bi zorê. Ev jî dilê min têşand. Min ne dikariya bi aramî bim.

Ez, Tirkan û Meto çûn gundê ku Qiymetê lê mamostetî dikir. Gundê Derexag'ê bû. Em bi meş çûn. Di rê de jî axaftin û nîqaşên me berdewam kirin. Tirkan got;

"Xweziya me Baqî jî bi xwe re baniya. Dê Qiymet'ê ew qane bikira."

Ez naxwazim. Gelo nêzîkbûnên hevalan şaş bû, yan jî yên min? Ji ber pirsgirêkan ew qas li gorî xwe çareser dikin ecêb e! Weke ku tiştek ne bûye digirin dest. Gelo ez ji xwe re zêde dikim dert û kul? Naaa. Ji ber hewce bû ez bikim dert. Ji ber bihevrebûn ne tiştek hêsan bû. Jixwe di vê mijarê de gelek nêzîkbûnên çeloxwarî, teng û seresere hebûn. Tirkan jî pirsî, 'ma bi fermanê zewac dibe?'

Ev jî ji kur derket. Ji şinga ez ji Dêrsimê derketîm ve çi bûye? Di navbera xwe de nîqaş kirine. Min got; "Divê bihevrebûnek dilxwazî esas bê girtin. Ger hezkirin û evîn li ser yekîtiyek xebatê pêş nekeve, jîndar jî nabe." Min xwe û hevrebûna heyî mînak da. Mînakek hê zelaltir derket holê Tirkan got;

"Bê xwedê j imin re bêjin dê tu bi vî hevalî re bizewicî, ezê red bikim."

Min vê carê jî bi dengê bilind pirsî;

" ev jî ji kur derket. Qey çi dibe? Kî anibe rojevê yan henek kiriye, yan jî berovajî kiriye. Ez zêde cidî nagirim." Dema di rê de nîqaş cardin hat ser vê mijarê min got; " kes nikare vê weke nêrînekê diyar bike. Nikare weke biryar ferz bike. Êdî dev ji vê mijarê bedrin."

Heta em çûn gundê Qiymet'ê wan em li ser gelek mijaran axivîn. Dema min behsa Îzmîr û kar kir, bawer nekirin. Pirs kirin ku ma neçar e, her kes li kargehan kar bike, yan na. Hem neçar bû, hem jî berxwedaniya karkeran û têkoşîna sendîka bala min dikişand. Min got;

“ karkirin xweşe. Nexwe mirov nikare weke din qehra bajarên mezin bijî.” Tirkan xwedî giyanek anarşîst bû û got; “nexwe ez jî werim.”

Ti karek ku Tirkan ne kiriba tinebû. Hîn bibû li biskilêt, motor siwar bibe û melevanî bike. Di heman demê de ajokeriya wesayîtan jî dikir. Her wiha asta wê ya teorîk jî ne xirab bû. Her tim xwe ji hêla teorî û bîrdozî ve pêş dixist. Mereq dikir û hîn dibû. Di cihê xwe de ne disekiniya. Dema di-axivî her derê wê liv û tevgerê de bû. Ne dikariya li cihekê rûne. Dema rûdinişt jî ya destê wê, yan jî lingê wê tevdigeriyan. Cih diguhertin. Radibû ser piyan. Zêde ecêb bû. Zêde ne kamil bû. Kesayetek ne rûniltibû. Zêde rehet bû, ti navber û pîvan danetanî holê. Lewma li naverastên ku ew lê bû di pêwendiyan de fermiyet tine bû. Erzan û hêsan nêz dibû. Ne cidî bû. Jixwe ji ber van xisletên wê gelekî dihat rexnekirin.

Nîmet jî bi me re ye. Li şaredariyê kar dikir. Zêde mereq dikir, pirs ser pirsê dikir. Lê pirsên dikir ne bi armanca hînbûn an jî çareserkirina hinek tiştan bû. Dixwest bi şîroveyên erzan û hêsan ve rojevên cuda ava bike. Ev xisletek wê ya berbiçav bû. Li hember nîqaşên min û yê Baqî ku me cidî dikir mat dima. Min ne dixwest derdor jî bizanibe. Ez nû hatibûm Dêrsimê. Ne baş bû ku ez yekser hevberdanê bikim rojevê. Weke din jî dê em hinicirandin. Ya herî baş min di nava komek hevalan a biçûk de nîqaş bikira. Ji bona van mijaran bi Qiymetê re nîqaş bikim û nêrînên xwe bêjim diçim.

Ecêb e. Nizanim çima dev ji Qiymetê bernadim. Beriya niha jî pirsgirêk çareser nekiribû. Ez zêdetir kiribûm nava bêçaretiyê. Çareseriyek wisa ecêb pêşniyar kiribû heta hevalan got; “em diruşmaya ez li mêran digerim binivisînin û li sityuê

Sakîne ve bikin.” Bibû mijara pêkenokan. Jixwe di encamê de tiştek cuda jî nebû. Di heman demê de zewac bi bela bû û ti şêweyî neçariya wê tinebû. Ger hinek din bi mantik û rêyek çareserî ya dem dirêj bihara dîtin, ti hewcedarî bi vê zewacê jî tinebû. Niha jî hê çend meh derbas bûne emê hevberdanê nîqaş bikin. Ger nakokiyên heyî neyên çareserkirin, hevberdan şert e! Ez jî ji xwe re dibêjim; “ dê yên devrî vê pirsgirêkê çawa bi wate bikin? Kî dizane, dibe ku zêde nepejirînin jî. Lê bilanê, ezê vê jî derbas bikim.”

Qiymetê em pêşwazî kirin. Her wiha kêfa wê jî hat. Mala wê başek ji dibistanê ye. Gundek ciwanên wan zêde bûn. Lê mixabin hemû jî ji çepên Tirkan bûn. Pir ecêb ew pênc sal bûn li wî gundî mamoste bû. Mamosteyek, nexwasim ger netewparêz be pir hêsan dikariya wî gundî baş birêxistin bike û bidest bixe. Me nîqar kir.

Dibêje; “ gelek ji wan baldar in, lê hinek jî xwe hişk kirine. Yên din jî ji bona ji min bandor nebin, ji min dûr dixin.” Her wiha rewşa heyî bi hêcetan rave dike. Zûlfî jî êvarî hat. Li wî gundî ciwanê harî baş sazvan ew e. Bi sazê re çend stran got. Ez herî zêde stranên ‘Silo qiz’ ê tê wateya Silêman hez dikim. Carê Silo Qiz tanîn dawed, şevên bûkanî û dawetên sinetan. Min ew zindî guhdar kiribû. Kemana wî gelekî bedew bû. Her demê diheland.

Roja paştir em jî ketin refê. Li dibistanê merasîm tine ye. Ala Tirkan jî ne hatiye bilindkirin. Dema xwendin û nivîsandin hîn dikir, zêdetir peyv û hevokên weke welat, netew, gel, şoreş bi zarokan dida nivîsandin. Ew jî xwendekarên Qiymet’ê bûn! Bes zarok jî xweşik bûn. Çi dida wan ew hîn dibûn. Bawer dikirin ku tiştên gelekî xweşik hîn dibin. Lewma bi hemûyan re hem kêfxweşî û hem jî şerimbûn hebû.

Qiymet hinekê jî bi kurte kurmancî nêzî pirsgirêka zewaca me bû û got; “ di encamê de tu tenê li qezenckirina wî esas bigire. Divê mirov wan derdoran qezenc bike. Ciwanên wan pir in. Hemû Kureşanî çepên Tirkane. Tenê qezençkirina çend kesan jî dê bandor bike.” Paşê em rê kirin û ew vegeriya.

Meto xwest em biçin bajêr.

Got; “werin malê jî temam.”

Min jî got; “gelo dê helwesta dayîka min çawa be?”

Got; “dê destpêkê hinekê delaliyê bike, aciz bibe, bigirî û paşê hûnê li hev werin. Tu li Dêrsimê yî, ger bê ku tu serdana malê bikî vegerî, dê zêde bandor bibe.”

Ez çûm serdana apên xwe yên li gund dimînin. Me li her mala ku em diçûnê nîqaş dikir. Şah Heyder ji Yekîtiya Gel e. Gelo di nava xizmên ev qas siyasetmedar de jiyîn û hebûn şansek bû, yan jî bê şansî bû? Hemû rêxistinên weke “PDA, TÎKKO, HB, HK, TKP” hene. Ger hinek rêxistinên din jî hebûna dê teqez ew jî di vir de heba. Ciwan pir in û hemû jî di bin bandora birayên xwe yên mezin de ne. Min ji Elî Cemal’ê biçûk û zêde di-axivî pirs kir.

Got; “helwesta me jî ji Yekîtiya Gel e.” Em hemû bi dengel bilind keniyan. Belê, zarokekî ev tişt digot. Hinek tiştên bi navê şoreşgerî dihatin hîn kirin hebûn. Lê mixabin ji cewher dûrbû û baş jî dûr dixistin. Dê û bav jî bindest û xemgîn bûn.

Digotin; “kî ev şoreşgerî wisa ava kiriye? Çima her kes siyasetekê nepejirîne? Em ditirsin. Dê rojekê hev û dû bikujin.” Gumanên xwe jî bi vî rengî rave dikirin. Apê min wan jî siyaseta min zêde mereq dikirin.

Gotin; “ me bihîst ku tu Kurdiniyê diparêzî.” Lê dibe ku zarokên wan zêdetir bi propagandeya reşkirinê bandor li wan kiribe.

Axaftinên xwe domandin; “li gorî me dizaniya destpêkê Elî Gûltekîn û Kemal Burkay’an Kurdinî diparast. Niha ew jî tine ne. Her yek çûye cihekê. Niha jî li bajarên mezin rûdinin. Elî Gûltekîn ne karî yên li gundê xwe jî bandor bike. Hesen e, Gûlabî ye, Elî ye. Hemû jî niha li avahiyên dewletê endezyar û mamoste ne. Dev ji karê Kurdinî berdan.”

Dema ev jî pênase dikirin, ne dixwestin bêjin ku tişta zarokên wan dikin di-ecibînin û bi wan bawer in. Berovajî bê baweriya xwe ya li hembet şoreşgeriyê di kesayeta zarokên xwe de rave dikirin. Apê min Mistefa got;

“temam her tişt baş e de, ev Emerîka û Rusya ji kur derket? Ne leşkerek van zilaman heye û ne jî yên li ser serê me Emerîka û Rusya ne. Reîsê komarê Tirk e. Fermandarê giştî Tirk e. Her wiha leşkerê wî Tirk e. Em jî bi zimanê Tirkî di-axivin. Ev zarokên me jî mat mane.”

Li dijî vegotinên min dernakeve. Zêdetir bi aqil dibîne. Le dema digot; “ werin em dewleteke Elewiyan ava bikin, ez her tim ji vê re amade me.” Kar zêdetir zehmet dikir. Ev jî asayî bû! Ji bavê min jî heman tişt digot. Lê ne zehmet bû ku ez di vê mijarê de wan qane bikim.

Bacê Baqî xwe bi wî re aciz dikir. Digot; “ ez ji partiya Sakîne me.” Dayîka wî jî heman tişt digot. Her wiha xwe pê re aciz dikir û digot; “ werin hûn hemû tevlî wê partiyê bibin. Ma dê çi bibe, eybe. Hûn şev û roj şer dikin. Zerar dide, dê ne baş be.” Li gorî xwe jî dê pêşiya ji hev cudabûnek din bigirtan. Ji ber nakokiyên me dizaniyan, gelek caran ferq dikirin.

Em çûn bajêr. Destpêkê em çûn çend malên ku xizmên me bûn. Hinekan em hişyar kirin.

“Mahrekê bikin. Nexwe dê paşê tiştek were serê we.” Me nîqaş kir. Paşê min jî got; “temam.”

Tê wateya vê tine bû, lê dibe ku polîsan hêcetek derxista. Min tenê wêneyên xwe dan. Baqî nasnameya min jî girt. Çû bi navbeynkariya hinek xizmên xwe mahir pêk anî. Yek-du şahid jî birin. Ji ber ên di karmendiya nasnameyê de kar dikirin tev nas û xizmên me bûn, ti pirsgirêk derneket. Mahrek li ser qaxidê bû. Paşnavê min hat guhertin. Cansiz bû Polat.

Min bi rêyekê agahî ji dayîka xwe re şand. Dayîka min destpêkê red dike. Paşê xizmên me wê qane dikin û evm jî şev çûn malê. Destpêkê destê xwe neda min û nêz nebû. Paşê ez hemêz kirim û giriya.

Min jê re got; “ tu bû sedem, te wisa kir.” Lewma zêde emgîn bû.

Dilê xwe kûr kişand û got; “tu rast dibêjî.”

Diyar bû ku zêde êş dijiya. Me li albûman nêrî. Wêneyên min ên şeva dergistîbûnê zêde bûn. Min yek bi yek derxistin û qetandin. Ne nêzîkbûnek bertek bû. Ji ber di rewşa heyî de ti wateya wan tine bû, lewma min qetandin. Ger mirov bixwaze bîranîna tiştekê zindî bihêle, divê mirov bi wê ve girêdayî bimîne. Ez jî niha di rewşek cuda de me. Lewma divê ez li hember bîranînên kevin rêzdar bim. Her çendî ecêbûnek di vê mijarê de heb jî. Veşartin û parastina wan durûtiyek bû. Paşê name anî, di hundurê wê de jî wêne hebû. Demek dirêj nabêjin Metîn ez revîme. Lewma ew jî her tim name dişîne. Wêneyên wî jî hene. Dema min li wêneyê wî nêrî gelekî xemgîn bûm û

min ji xwe şerim kir. Weke ku li hember min bû jê bandor dibûm. Bê nameyan bixwînim, min tev qetandin. Ji ber hemûyan jî êş dida min. Qirika min tije girî bû. Xweziya tiştek wisa qet ne hatiba jiyîn. Rewşek wisa derneketiba holê. Baqî jî bêdeng li min temaşe dikir. Ez bawer dikim ji ber bêrehmiya min ditirsiya. Ji ber peywendiyên min ên bi wî re jî di xeteriyê de bû. Gelo dibe ku qut biba? Dayîka min jî em dilopandin. Ne kêfa wê dihat, ne jî çşa xwe dida der. Cemidîbû.

Pirsî; "çima ser û cilên te wisa ne. Ma çente û tiştek te tine ye?"

Min jî got; "li gund in."

Bes ne wisa bûç min cilên keçên penaber ên ji Bulgarê li ber xwe kiribû û hatibûm. Bêlav jî yên wan bûn. Pirsên tevlîhev ji min dikir. Min jî bersivên kin dida; " rewşa me baş e, em her du jî kar dikin." Wê jî weke karê saziyek dewletê fêm kir. Agahiya wê tine ye ku ez li kargehekê weke karker dişixwilim. Jixwe tiştek wisa qet naye bîrê jî. Ma bavê min jî bi sala ne ne karker bû? Wê bi xwe jî çû dît. Tevî vê ew û derdor jî biçûk û weke eybekê dibînin. Lewma ez jî qet nakevim ziraviyan. Çawa fêm dikir bila wisa be. Ma çi girîngiya vê hebû!

Dolab vekir û hemû valîz daxistin got; "cilên xwe bigire, bibe."

Ew cil j imin re balkeş nehatin. Ji ber e rehet bûm. Min bi yek pantor û gomlekekê sê-çar mehan ber xwe da. Ger min ev cil bi xwe re bibiran, dê ji min re bar bûna. Hinekê jî dudilî mam.

Paşê min ji diya xwe re got; “bila bimînin.” Dayîka min bi dengek bilind desr bi girî kir. Ez jî gelekî xemgîn bûm. Gelo ez zêde serde diçûm? Ya rastî em her du jî dêşiyan. Em her du jî li ber xirabûna rewşa min a dergistî ketibûn. Me wêne û name diqetandin. Cilên kum in di wê demê de li ber xwe kirîn tev derdixist. Dayîka tonton hêjî li mala miqabil diman.

Dayîka min carekê di navberê de ji nişka ve got; “Metîn sond xwariye carek din neyê Dêrsimê. Ji hingê ve qet ne hatiye. Paşê me bihîst ku ew jî ji siyaseta we ye.” Her tim dixwest mijarê bibe ser wî. Lê min ne dixwest zêdetir bi-axive. Vê jinê cardin çi dixwest, ç idi-axivî. Pir vekirî çş dida min.

Min valîzek amade kir û girt. Ji pêdiviyên malê jî hinek tişt amade kirin. Tiştên weke kefçî, kêr û her wiha. Min ne dixwest ti tiştê ku hatiye neqişandin û ji bona cihazan hatiye amadekirin bixe nav tiştan. Bila tev ji wê re bin. Lenet bê! Ez naxwazim wan pêvajoyan ji nû ve bijîm. Pêvajoyek gelekî bi êş û helikandinê bû.

Tenê ji bona adet cihê xwe bigire bi Baqî re di-axivî. Weke din jî ti nirx ne didayê. Jê aciz bû. Baqî dê rê de got;

“dayîka te j imin hez nekir.”

Min jî got; baş e kut e fêm kiriye.”

Cardin weke ku sîtem bike got; “bes wê tu caran ji me hez nekir. Ji ber em xizan bûn, gundî bûn û duristbûn, me nekarî em xwe bi wê bidin qebûlkirin.”

Rast bû. Bi rastî jî dayîka min apên min û derdora wan hez nedikir. Zêde biyanî bû û dixwest dûrî wan bisekine. Pîrka min, ango dayîka bavê min sala em çûyîn Almanya di pêvajoya bavê min destûra malê girtîde hatibû. Salên dirêj derbas bibûn. Tenê

wê salê, ew jî bi israra bavê min hatibû. Nêî panzdeh rojan li cem me ma. Dema li Almanya jî çûbû ser dilovaniya xwe. Xisletên wê yên feodal-arîstokrat û dîsa nêzîkbûnên wê yên siltaniyek hundurê wê vala zêde diyarker bû. Dema bavê min aciz dibû digot; "Zeyneba Xatun." Bi rastî jî ji ber wê Xatuniyê hinek nirxên civakî jî tine dihesiband. Em zêde li malê namînin. Heman şavê ji wir derketin. Ji ber Baqî li dibistanê dixwîne, naxwaze ez jî bimînim. Got; "em bi hev re vegerin." Bê ku pirsgirêkê çareser bikim, ti wateya çûna min jî tine bû. Çi dibe bila bibe, erênî, neyênî divê ez vê pirsgirêkê çareser bikim. Nexwe çareseriya navberê ne dibû. Min ji Qiymetê wan re jî gotibû. Min got; "ezê wextekê bidimê. Ger di nava wê pêvajoyê de helwestên xwe zelal neke, ezê têkîliyên xwe qut bikim." Hinek dersên min ên ji refa duyem a dibistana amadeyî mayîn hebûn. Min dikariya ezmûnan bikim hêcet û bimînim. Min dikariya di vê navberê de jî pirsgirêkê jî bi hevalan re baştir çareser bikim. Ji ber êdî rewşa min Qiymet jî derbas dikir. Qiymetê got, dê heval bi min re hevdîtinê bikin. Peywendiyên me yên bi hevalên li Îzmîrê re jî dizanin. Got; " ger tu pir dixwazî tu dikarî bi hevalên li Enqerê re jî peywendî pêş bixî." Meto jî got; "ezê piştî demek din werim." Ev hemû ji min re bûn moral. Diyare ku dê ji demê re bimîne. Ji ber kesek çareseriyek bi şêwazek din pêşniyar nake.

Tam di wê wextê de hevalê Kema Pîr jî li Dêrsimê ye. Banî min kirin, ez çûm mala jor. Ev mala biçûk ya Qiymet wan bû û hevalan bikar tanî. Yekser çûm wir. Destêkê Çetîn Gûngor (Semîr) axivî. Got; "hevalan rewşa heyî ragihand." Lê wer dixwiyê nizane ji kur destpê bike. Zehmetiyan dijî. Ez jî mat mam. Ji ber ew Çetîn'ê ku min dizanî û dinasiya zêde di-axivî.

Bi taybet di nîqaşên teorî û bîrdozî de kêrhatî û gerim bû. Her tim kêrhatina wî ya di nîqaşan de dihat axaftin. Di wan rojan de li ser revîzyonîzma nûjen a Sovyetê semîner jî dabû. Di wan semîneran de zêde zindî bû. Tevlîbûn zêde bû. Wê demê çima niha di axaftina der barê mijara zewac û hev berdanê de zehmetî dijiya? Heval Kemal carina diket odê û derdiket. Dema rewş ferq kir, yekser destwerda.

Got; “were Sakîne. Em biçin vê eywana kêlekê bi-axivin.” Em derbasî wirbûn û axivîn. Bê ku navberê bide dest bi axaftinê kir. Zêde rehet bû.

Got; destpêkê tu bêje. Nabe ez te guhdar nakim. Te xwestiye devjê berdî. Ya rastî ez vê rewşê baş nizanim. Got min bihîstî cihetiyek bîrdozî heye. Ew zilamê ji HK’ê ye. Belê, çawa bû. Ez tiştên berê nizanim. Çi nabe, li şûna ku em biçin serî, em ji dawî de destpê bikin. Em dikarin çi bikin, ji wir destpê bikin.”

Hem dixwest min guhdar bike û hem axaftina xwe didomand. Ya rastî wisa baştir bû. Diyar bû ku zêdetir dixwest min rehet bide axaftin. Di cewherê xwe de ez zêde tengav nabim, lê ji ber mijarek hinekê tevlîheve vegotina wê zehmet dibe. Dawî nebû. Ew tengavî di halê min de diyar dibû. Baş bû ku hevalê Kemal ev rewşa min ferq kir.

Ez behsa çewsandinên malê, redkirina zewaca û ferz dikirin dikim. Lê paşç çawa ketim nava zewacek nû, bêxwestekiya min a di vê mijarê de, hinekê jî bandora şert û mercên heyî, bi çarenûs nêz nabim û ti bingeha yekbûnê tine ye. Min bi kurtasî bê pîvanî û bê rêgeziya di nêzîkbûnên Baqî de vegot. Heval Kemal piştî van nêrînên min, bê ku bikeve ziraviyan got;

“Temam te biryara xwe daye û ya herî rast jî ev e. Lê bila hinek din di şêwazek baş de be. Dibe kul i vir malbat cardin pirsgirêkan derbixin. Herî baş tu li Enqereyê bi Kesîre wan re jî bi-axive. Tu dikarî heta demekê li wan deran jî bimînî.” Ji min re got, zêde lez neke, hîn zêdetir xwînsar û aqilmend çareser bike. Amadekariyên me zêde dirêj nekir. Ew zêde zindî bû. Weke ku karek wî ya pir lez heye, dê bigihike wê tevdigeriya. Di cihê xwe de ne disekinî. Carina rûdinişt, carina jî li ser çokan dima. Em ji hev cuda bûn.

Weke ku min pirsgirêk çareser kiriye rehet dibim. Jê hêz digirim. Lê dîsa jî ji xwe re dibêjim xweziya zêdetir berfireh bi-axiviyam. An jî destpêkê bi hevalên wisa re hevdîtin bikira. Gelo agahiya wan ji rêbaza çareseriya Qiymetê hebû? Ji ber ew ji min re li mêran geriyabû. Hêrs dibim. Ez ji pakbûn û bê çaretiya xwe aciz dibim. Ji qas ferqa çareseriyên şoreşgerî û ‘çareseriyê navberê’ ji hev cuda ye!

Ez çûm ezmûnên ji refa duyem a ji dibistana amadeyî mane. Mamosteyên min nasin. Dizaniyan ku ez ji bona kar çûma ezmûnan, dixwazim polê derbas bikim, da ku bawernameya xwe weke amûrekê bikar bînim. Fêm dikirin. Derdor jî dizaniya. Bes di vê navberê de jî hewl Didim rewşa xwe jî bi xwînsarî bigirim dest. Êdî her kesî baş dizaniya ku ez zêdetir pirsgirêkên ku hevberdana bîrdozî avakirine ji xwe re dikim dest û kul. Min bele sebep xwe têşand. Ji ber karê lez û bez û bê hedarî her tişt dikir du serî. Lê belê, ez ne di ferqê de bûm. Ji ber min feyde û zerara her tiştê ku min dikir baş hesab nedikir, ne dipîva û tevdigeriyam, di encamê de ez tengav dibûm. Ji ber min her bertekên xwe zû derdor diyar dikir, ev jî

encamek baş ava nedikir. Lewma her kesî her demê her tişt rast ne digot. Ji ber gotinên şaş, seresere û ne di wextê de ketina rê û ji çareseriyan hêvî kirin, ez xapandim.

Belê, êdî hevalan rewş dizaniya. Ez jî weke çarenûs nêz nedibûm. Wê demê divê ez jî her tiştî di vir de nekim girêk û hemû enerjiya xwe tenê ji bona çareseriya vê mijarê bikar neyînim. Baqî dikariya vegerê Îzmîrê. Ez dikarim paşê jî biçim. Dikarim li Enqereyê cardin bi hevalan re nîqaş bikim. Ger hewce bike dikarim hinek din li Îzmîrê bimînim. Êdî tiştek weke berê min tengav nake. Her çendî hinek tiştên tam zelal jî nebin, ez ji aliyê fikir de zelal bibûm û min çareser kiribû. Ev bes bû. Ev jî ji aramiyek diyanî re rê vedikir.

Beriya werim Dêrsimê li Îzmîrê deşta Cuma erd dihat belavkirin. Ji ber valahiya ku nakokiya hilbijartinên şaredariyên nû û partiyên siyasî de ava bûne, yên xwediyê erdan zêde bûn. Lewma li vir Baqî jî bû xwediyê erdekê.

Digot; “emê gecekonduyekê çêkin, dê pirsgirêka kirê jî çareser bibe.” Ev ji bavê xwe re jî gotibû û alîkariya madî xwestibû. Ew çûbû Îzmîrê. Wî û bavê xwe lihev kiribûn kû apê min, min bibe. Ev jî dihat wê wateyê ku divê ez heta Îzmîrê biçim.

Em bi hev re çûn Enqereyê. Baqî jî vegeriya wir. Ji ber derengmayîna me jî dilê xwe girtibû. Me demekê li wir nîqaş kir. Naxwaze ez bi Kesîre re hevdîtinê bikim. Dizane ku ez vê pirsgirêkê kûr dikim. Tevî ku min wext daye, bê ku ez li benda vê bimînim ferzkirina min a hevberdanê weke nêzîkbûnek ne samîmî dinirxîne.

Dibêje; “armanca te ne qezenckirine. Ne yekîtiyek rêxistinî ye. Ger wisa ba, dê tu bi aramî nêz biba. Ev kar wisa ne hêsanin. Ez lêkolînê dikim û di vir de duristim.”

Apê min û M. Elî jî şahidê nîqaşê me bûn. Her carê nîqaş û rojeva hevberdanê bandor li wan jî dikir. Digotin;

“çima hûn ev qasî mezin dikin? Hûn şoreşger in. Hevûdû ev qasî tengav nekin, ne baş e. Hûn me jî xemgîn dikin.”

Ji ber Baqî jî bi koranî bi HK’ê ve girêdayî bû û devjê bernedida rexne kirin, ez jî ji ber min hevberdan dikir rojevê rexne kirim.

Di encamê de em bi hev re çûn Îzmîrê’.

Min got; “ezê bi xwe pirsgirêkê çareser bikim. Mdî zêde nîqaş nakim. Ezê mijûl bibim. Piştî ku min çareser kir, ezê ji hevalan re bêjim ‘ev e min çareser kir û hatim’ û wisa biqedînim.”

Min ji Baqî re jî got; “temam, hinek rexneyên te jî rast in.” Min zêde da diyarkirin kudivê vê carê ew jî cidî û durist nêz bibe. Tenê ji bona em bi hev re bin nehizire. Divê bingehên rêxistinî bihizire. Heta ez naxwazim ev ji hev qutbûn yekîtiya heyî bandor bike. Bi rastî jî ez rêhevaltiyê dixwazim. Paşê em vegeriyan.

Diruşmaya “Kurdistan dagirkiriye”

Şovenîzma civakî rûxand!

Ji nû ve li Îzmîrê li kar digerim. Min li Alsancak li kargehek hêjîran dest bi kar kir. Ewder jî cihek kar ê biçûk e, keçên ciwan lê pir in. Em dixwazin nakokiyên xwe li vê malê jî çareser bikin. Min çareseriyek navberê pêşniyar kir. “em di pêvajoya lêkolîn û biryarê de li malên cuda li malan bimînin.” Îbo piştewaniya min dike. Lê Baqî ne alîgire. Ez jî pir ji dil dibêjim. “ lê belê, em vê rewşê ji derûdor re diyar nakin. Em nû ji Dêrsimê harine. Malbat di vê mijarê de zêde hesas in. Weke din jî tiştên wisa zû belav dibin, dê ne baş be. Dê navbera me de bimîne, hinek hevalên ku dizanin hene.” Jixwe em bi Heyder’ê Surucê re jî axivîne. Wî jî gotibû; “tu çawa dizanî bila wisa be.” Wî jî gotibû dê alîkariya Baqî bike û her tim nîqaş bikin. Ev biryara herî baş bû. Nexwe dê şêwazê din jî tev polemîk bûya.

Edî em her du jî di demên cuda de diçûn cihên cuda û dihatin. Êdî ti wate nemabû ku em li heman malê bimînin. Asta pêwendiya heyî jî xirab û lewaz dikir. Baqî ne bi dilê wî jî be qebûl kiribû. Dê carê me hev bidîta. Ji ber biryara me girtî ji bona hevdîtin, nîqaş û ger mercên xebatê hebê ji bo xebatê û alîkariyê jî ne asteng bû. Dê me ev alî hîn zêdetir xurt bikira.

Ez li malek ku Baqî dinasiya dimam. Li Çîxliyê diman. Malbatek ji Varto bû. Ew jî li cem Heyder û Aynur, îbo jî li cem Saîme dima. Dikariya biçe cem hevalên xwe yên din jî. Di vir de serbest bû.

Rojekê ez cihê kar bûm, navbera nîvro ye. Em xwarina ku me ji Sefertaşiyan birî, li beşa xwaringeha kargehê tê binavkirin li erdê dixwin. Kargeh xwarin nedida. Me jî li xwaringeha li pêş kargehê bi pereyên xwe xwarin dikiriya. Weke dinxwarin weke tost, pîde û lehmecun dihat firotin. Me ça jî heman weke wê ji çayxaneyek derve dikiriya.

Hê me nû dest bi xwarinê kiribû, gotin yek hatiye serdana te. Min ji xwe re got; mîsoger Baqî ye" lewma min hinekê xwe mijûl kir û dûvre çûm. Li serê min yazme hebû min li serê xwe pêçabû. Li ber min jî pêşmalkek kar a kesk heye. Min destê xwe daweşand û wisa ketim hundurê xwarin gehê. Ji ber serbazê kar gotibû li wê derê ye. Dema ez nêz bûm min ji nişkê ve birayê xwe pêşberî xwe dît. Mat mam, me hevûdû hemêz kir, ramûsand. Çavên birayê min tije bûn û got;

"ma tu neçar bû li vir kar bikî. Ev çi hale tu zeyîf bûyî." Min jîg ot;

"belê neçar bû. Dê kî l ime binêre. Hem karkirin xweşike. Ez jê hez dikim. Hinek karên din jî hebûn, lê min ne xwest."

Meto navnîşana me daye birayê min Heyder. Birayên li Stanbûl Huquq dixwend. Hem ji bo bêhnvedanê û hem ji bona serdanê hatibû Îzmîrê. Lê bi giranî ji bona serdanê hatiye. Xwarin xwestiye. Em xwarin dixwin. Axaftin jî parçe parçe didomin. Birayê min naxwaze bide der lê xwarinê naxwe. Pariyê di devê xwe de dirêj diçû. Dema dadiqurtîne jî dengê ecêb derdixist. Pir diyar bû ku ne rehet bû û bêhna wî teng bû. Baqî jî bêdeng bû. Gelo çi dibû? Hinek pirsan jê dikim, bersivê kin dide. Naxwaze sohbetê bibe ser Stanbûl, dibistan û cihên din. Ji ber serê wî li ser tiştek din bû. Berî were kargehê çûye mala ku Baqî ew lê dimînin. Mala ku me berê bi hev re bikar

tanî. Belê, li malek xizan de li erdê merşek kevin, yek du dîwanên kevin ên xewê û çend firax hebûn. Teqez mala wî ya bekar ew lê dima pir xemilandibû. Ez qet nadim br hev jî.

Ma li benda çi bû? Gelo wer dizaniya ez qetek avahiyekê, li malek xemilandî û her tiştê wê heyî de me? Ma ne min nexwestç naxwazim jî. Ger malek wisa heba jî, dê tiştek cuda biba, ma ezê bibûma jinek malê ya şahnaz? Na, na ti wateya yek ji van jî tineye. Ez di vê mijarê de pir rehet im. Ne min titştek wisa xeyal kir, ne jî lêgerînên min çêbû. Niha ezê van çawa ji Heyder re bêjim? Hema ji xwe re dibêjim, "ya herî baş bila bimîne, asayî ye ku bandor bibe, buhurdar e, dê ew jî fêm bike." Lê mixabin ew hêjî ne rehete.

Heyder got; "destûrê bigire em biçin." Bê ku dudilî bijîm min got; "temam." Di wê navberê de jî ji bona derbarê cihê ku em biçinê de xwe zelal bikim, hinek firsendan digerim. Dema birayê min bi dayîna pereyan ve mijûl dibû, min ji Baqî pirsî; wî jî bersivand; "mala Aynur ew lê dimînin baştire, jixwe hatiye wir." Min jî got; "temam." Ti gumanê min tineye ku behsa hinek tiştên din kiribin. Hê min ne dizaniya bê ka dê bertekên wî çibin. Min hewl dida fêm bikim, bêhna wî ji çi teng bibû? Çi nabe, jixwe dê ew bi xwe veke, ya herî baş ez ji vê mijarê dûr bikevim.

Em bi taksiyê çûn heta Îskeleyê. Di mijara heqê rê dayînê de frsendê nade yek j ime. Her çendî bi gotinan îfade neke, di nêîkbûnên wî de ne dihişt em biçin bidin. Baqî li Îskeleyê qelebalixa pêşiya xwe vekir, çû bîletên me girt. Em derketin ser keştiyê. Weke ku birayê min bixwaze em her du bi tenê bimînin, li Baqî temaşe kir, paşê destê xwe danî ser milê min û em geriyan. Ji nişkê ve pirsî; "ma tu kêfxweşî?"

Mat mam, pirsek gelek biyanî û xerîb bû. Gelo behsa çi dikir? Min jî hinek tişt di devê xwe de bir û anî, weke ku min pirs fêm nekiriye nêz dibim.

Kêfxweşî.

Ger di wateya teng de digire dest, engo behsa zewaca min dike, bersiva min na ye! Lê jiyan bi xwe, her çendî pir ji rêzê û kêmasiyan jî be xweşik bû, têkoşîna şoreşgerî şahnaziyek mezin dida min. Min hêza jiyanê û kêfxweşiya wê dijiya. Nexwe di naverastên wisa de, bi tena serê xwe –hinekê tenêbûn jî hebû- ew qelebalixa li Dêrsimê û şêweya peywendiyên wir li vir tinebûn. Lê tevî her tiştî baweriya min mezin bû, di vê mijarê de bêçaretî û şêlûbûnek tinebû. Her kêliyek jiyanê têkoşîn bû. Ew jî hêz dida min, dihişt ku ez li ser piyên xwe rawestim.

Bes dê min çawa behsa zewaca me û pirsgirêkên tine jiyan bikira? Min ne dikariya wî cuda bigirim dest! Ji aliyekê ve jiyana min hêz dide min, ji aliyê din ve jî carina ez dixeniqandim û min hew dikariye. Ger ez di vê naverastê de dev ji tekoşînê berdim ezê weke çarenûs bibînim, an jî ezê bibim jinek bi her tiştên xwe ve teslîm bûye. Birayê min vale vale ev pirs nekiribû. Min ne dikariya derewan lê bikim. Jixwe ew dinase, wê teqez fêm bike û dê ji rihê ku niha dijîm halê min fêm bikira.

Min jê re got; “emê berfirehtir bi-axivin. Rewşa min baş e. Kar dikim. Karkirin titek pir xweş e. Peywendiyên min jî bi hevalan re hene. Hinek ên li zanîngehê dixwînin hene. Carê bi wan re têne cem hev. Dê hevalên li Enqereyê pêwendiyê pêş bixin.”

Dibe ku tiştên min gotin ne bersiva pirsan bûn, ev pir vekirîbû. Ez hêjî li derdorê digeriyam. Min ne dixwest werim mijara esasî. Lê cardin dipirsiya: 'Na ez dipirsim gelo navbera te û Baqî çawa ye. Dê mijarên din de pirsgirêk dernekevin. Jixwe dê tu hevalan bibînî, yê tu di vir de zehmetiyan nejî.'

Min jî got; " Em nîqaş dikin, lê hêjî yekîtiyek bîrdozî tine ye. Tu jî dizanî ew ji HK'ê ye. Qadroyê wan e. Dibêje ez ji 75'an ve lêdikolim. Dema hatî Dêrsimê jî gotibû. Di vê mijarê de pîvanek rast tine ye. Ez cuda, ew jî cuda kar dike. Hevalên derdora me jî ji hev cuda ne. Ev jî xwezayî bandor li peywendiyên me jî dike. Dibe pirsgirêk, lê ez di wê baweriyê de me dê erênî pêş bikeve. Soz da min, dê berfireh lêbikole û zelal bibe."

Got; "temam, ma ev rewş ew qas asteng e?"

Ez jî bêdeng mam. Ev dihat wateya erêkirinê. Got; "ma kar te nahelikîne? Tu zayîf bûyî, were heta demekê em bi hev re li Stanbûlê bin. Mala kum in girtî jî guncav e. Li cem min bimîne. Emê ji xwe re bigerin." Bê ku zêde bisekinim, min got:

"Dibe, dikarim werim."

Yekser got; "Ma tu dikarî vê biryarê bi tena serê xwe bidî. Dê tu ji Baqî pirs nekî?

Min jî got; "ma ezê çawa jê re nebêjim. Tu birayê min ê mezin î. Ti pirsgirêk tineye ku em bi hev re biçin. Ne hewce ye ku ew jî erê bike." Weke ku bêje, "min fêm kir." Hêdîka serê xwe hejand.

Min hinekê mijar fêm kir, li gorî xwe ez diceribandim. Dixwest rewşa heyî tam zelal fêm bike. Ne hewce bû ku ez jî hinek tiştan veşêrim û yan jî cuda bidim diyarkirin. Ew jî ji vê

zêdetir aciz bû. Dibe ku acizbûna wî ji vê be. Dîsa jî bi tevdîr bûm. Me di rêde hinek tiştên xwarinê yên weke goşt, sewze û fêkî kirîn. Em her sê jî di destên me kîs hene diçin. Me tu caran ew qas tişt bi hev re nedikirîn. Me xerckirinên xwe pir hişyarî dikir.

Yekser em çûn mala ku Aynur wan lê diman. Du ode, holek biçûk û xwaringehê zêdetir tiştek din nebû. Malek xizan e. Min yekser milên xwe rakir û berê xwe da xwaringehê. Min wisa pirsên ku werin kirin jî asteng dikir. Min bi zanebûn dikir. Min ji Aynur û Heyder pirsî.

“Ma dema birayê min li vir hûn derbarê rewşa me de axivîn? Ji ber bêhna wî teng e. “

Gotin; “Na.” Piştî demek kin bangî min kir. Girtin û berdana hênaseyên wî jî hatibû guhertin. Kêmek maye biteqe. Min got; “fermo te bangî min kiriye. Ez xwarinê çêdikim. Biborîne kêmek maye.” Hê min gotinê xwe xilas nekirî got;

“Bes e, bes van rolan bike Sakîne. Tu ne Sakîne yî tu hatî guhertin” û şeqamek l imin xist. Çirûsk li ber çavên min barîn. Di cihê xwe de hejiyam. Ez bawer im ev ne jî bo giraniya şeqamê bû, helwestek ez qet ne li bendê bûm. Çi dibû, gelo Heyder dîn dibû? Ecêb bû, ev qas hêrs ji bo çibû?

Her carê digot; “tu ne Sakîneya kevinî. Tu derewan li min dikî. Tu dibêjî qey ez fêm nakim. Ez her tiştî dizanim. Ma te li mala bavê xwe kar dikir? Ma bavê min tu dayî karkirin? Tu niha li kargehê kar dikî. Te çawa xwe xist vê rewşê. Tu ne hewceyî vê yî û ne ku neçarê vê yî.”

Bê navber di-axivî. Weke zarokan îske îsk bi deng digiriya. Mi got; “ raste ez ne Sakîneya kevinim. Tu her tim dixwazî min weke xwîşkekê bibînî. Mafê te tineye tu wisa nêzî min bibî. Min derew ne kirine.”

Min Baqî da nîşan û got; “yê derewker ew e. Li ser soza xwe ne sekinî. Heta ragihand cem we. Ez bawer im her tişt li gorî xwe vegotiye. Dilê we bi xwe daye şewitandin. Dîsa alîkarî ji we xwestiye. Ger ji destpêkê ve durist nêzîk biba dê ev pirsgirêk jî ne hatiban jiyîn. Tenê ji bona em bi hev re bizewicin, di mijarên em ji hev cuda bûn de jî got “temam.” Got, “ez lêdikolim.” Bes her carê jî mijûl kir. Niha jî ji bona em cihe nebin wisa dike. We pirsek ji min kir, dibe ku min di wê kêliyê de nikarî bersivê bidim, lê ez niha dibêjim. Belê, ez ne kêfxweş û şahnazim. Hûn ketibûn ferqa vê. Ez bi kesek ku ji ti alî ve yekîtiya xwe ya bîrdozî û rêxistinî tine ye re zewicî me. Ango em tenê cihê xwe parve dikin. Tenê ew dimîne. Ez jî nikarim vê rakim. Ez neçarî vê nînim. Ew bi xwe jî li vir in, bila durist nêzîk bibin. Wî durûtî kir, ez neçarî vê kirim. Êdî ti pirsgirêk tine ye ku hûn bizanibin. Min tiştek ne veşart. Tenê ji bona malbata min xemgîn nebe, min nexwest tiştek were gotin. Ji ber ti feydeya wê nebû. Hûn jî nîha hîn bûn. Belê em cihe ne, li cihên cuda dimînin. Em her di ji siyasetên cuda ne.” Ez hem digirîm û hem bi qêrîn van dibêjim û ji malê derketim. Demek kin maye ji otobûsa dawî re Baqî li pey min derket hat.

“Sakîne ti dînîtiyan neke, vê şevê otobûs jî tine ye. Were, hinekê sakîn be.”

Ji ne bihîstî ve têm. Giriyê xwe jî didomînim. Kolan bêdeng in. Bi bazdanê çûm heta cadeya gîştî. Giham otobûsa dawî. Otobûs jî bêdenge. Min bîleta xwe ji bona Bûyûk Çîxlî

girt. Dema xwediyê bilêt da min li rûyê min nêrî. Dema perê zêde mayîn da min, cardin li rûyê min nêrî. Serê xwe hejand û çû. Min got teqez di rûyê min de tiştek bala wî kêşayî heye. Min destê xwe li lamê xwe yê şeqam lê xistî gerand. Na xwîn jî tine ye. Min di şibakeya otobûsê de li xwe nêrî. Rûyê min sor bûye, bandora giriyê jî hebû.

Min di otobûsê de hewl dida bûyerên rû dayîn jibîr bikim û li ser nehizirim. Ji ber min ne dikariya rondikên çavên xwe rawestînim. Piştî ku ji otobûsê daketim hinekê meşiyam. Ev jî ez rehet kirim. Min ji xwe re digot xweziya rê dirêj ba. Dema ez çûm malê her kes raza bû. Bes jina malê ecêb li min dinêriya. Min jê re got; "emê pişt re bi-axivin."

Dê sibehê li dijî Dadgehên Ewlekarî yên Dewletê (DGM) mîtîngek mezin were lidarxistin. Divê ez demjimêr heftan de li Konak Kemeralti bim. Ji ona hevdîtina hevalê Heyder û Celal re me cihê hevdîtinê komaleya HK'ê destnîşan kiriye. Dihat gotin ku dê hemû kom beşdar bibin. Her wiha dê girseya her komê jî beşdar bibe. Bawerim dê çalakiyek bê hempa be. Her ku dihizirim ezê sibehê li mitîngê hevalan bibînim bêhna min fereh dibe. Hinekê dihedirim.

Jixwe ew qas girî jî ne di cih de bû. Tiştên wisa dibin. Şer bû, dê şêwazên cuda de jî pêş bikevin. Birayê min hêjî xwe tenê weke bira dibîne. Li malê ne wisa bû. Teqez Baqî ew tije kiribû. Xwe jî yeke pak, bêdeng, girîngiyê dide yekbûnê, dê xwedî li doza Kurdistanê derbikeve, herî dawî yekîtiya bîrdozî ava bike çirûska esasî didît! Dema wisa nerim û tiştên rastî ji birayê min re gotiye ew jî hêrs bûye.

Na, na ne ev jî bû. Ji ber tiştên ku min jiyayî hêrs bû. Min Baqî ne xwestibû û bi yeke din re dergistî bûm. Pişt re cardin revîbûm cem Baqî, zewicîbûm û niha jî ji hev veqetîn di rojevê de bû. Her wiha min li kargehê jî kar dikir. Wê demê çi wateya zewaca bi vî rengî hebû? Wî jî ev rastî ferq kiribû û lewma hêrs bû.

Ez wî nas dikim. Ew naxwaze ez tiştên şaş bikim. Ji ber zêde hez dikir û li ser min dihizirî ev qas har bibû. Dema ew qas gotin ji min re kir, di navberê de ji Baqî re jî axaftinên giran digot.

Jê re gotibû; "di şoreşgeriyê de bênamûsî û durûtî tine ye. Te bi van HK'yan re çi dîtiye? Tu û hûn hemû jî bûne dûvikê wan. Li dibistana me jî hinek wisa hene, weke lîstokê bikar tînin. Welatê te heye, biçe li welatê xwe şoreşgeriyê bike. Yê ku di vê mijarê de pirsgirêkê kûr dike tu yî. Tu ji Sakîne hez nakî, sixtekariyê dikî. Ger tu jê hez dikî, dê tu ji siyaseta wê jî hez bikî. Ez te baş nas dikim. Tu bê rêgezî. Tu dihizirî dê hinek din çi bêjin? Dê HK çi bêje? Wê demê şoreşgeriya te li kur dimîne. Hûn malbat tev wisa ne. Îbo jî û M. Elî jî wisa ye. Hûn, Heyder û Celal tev dane pey şovenîzmên civakî û diçin. Binêrin ez bi ti rêxistinê ve ne girêdayî me. Lê, ' nêrînên netewparêzan rast in, hûn bixwazin û nexwazin jî dê ew pêş bikevin.'"

Ji ber tiştên xweşikbûn lewra ez zêde aciz nabim. Min dev ji xwe berdeya û rewşa wî dihizirim. Dengê giriyên wî di guhên min de ye. Carekê jî dema carekê bavê min li Almanya xwelîdank avêjtiyê bi vî rengî girî bû. Demek zêde zora wî biribû. Zêde bandor bibû. Gelo ew jî ji malê derketibû? Ma dê wê nîvê şevê biçe kuderê? Heta sibehê xew neket çavên min.

Dema sibehê şiyar bûm her kesî li rûyê min nêrî. Bi eynê li xwe nêrî. Li cihê ku şeqam lê ketî sor bibû. Weke din jî tiştek tine bû. Min got; “ ez û birayê xwe boks lîstin. Dema em li mal jî bi hev re pir dilîstin. Ew hêjî dizane ku qey em li mal in.” Hemû keniyan. Hesen bi xemgînî li min temaşe dikir. Haya xwe ji nakokiyên min Baqî hebû. Wer dizaniya ku Baqî li min xistiye. Qet ne axivî. Weke ku ji xwe re bêje, “ezê hedê te bidim te” hênaseyên kûr dikişand. Ji hêrsan lamên wî dihejiyan. Me her duyan jî zû taştê xwar û em derketin. Min got; “xweziya jin-bira jî bihata.” Min dev jê berda, ji ber zaoyên biçûk hebûn. Em bi lez gihan cadeya giştî. Her kêlî jî saeta xwe dinêrin. Ji xwe re dibêjim, “m bigihijin.” Em her du jî na-axivin û dihizirin.

Naxwaze dest bi min bide û min ji wan ramanan dûr bixe. Mirovek xwedî feraset e. Hesen jî mirovek karker, kedkar û rêzdar e. Li Tarîş’ê kar dike. Sê zarokên wî hene. Piştî erdheja Varto hatine. HK li Çîxlî xekatên rêxistinkirinê dimeşîne. Ev mirovên bedew tev têkil xwe kirine. Ew jî ‘şoreşger’ dîtine û her meh pere dane wan. Kovarên wan kirîne. Paşê tevlî heta komîteyên taxan bûne. Xisletên xwe yên Kurdînî winda ne kirine. Dema mirov bi wan re di-axive û nîqaş dike bi baldar guhdar dikin. Peywendiyên me bi wan re baş in. Heval jî carina tên vê malê.

Li meydana Konak’ê tevger zêde ye. Em bi lez û bez ji Îskeleyê ber bi Kemeralti yê ve çûn. Jixwe her tim kolan qelebalix dibûn, lê wê rojê derzî bavêtan ne diket erdê. Tam qada ku mîtîng lê were lidarxistine. Karker

Xwendekar û gel hatiye. Her tim ji Gûltepe, Çîxlî û Kadîfekaleyê tevlîbûn zêde çêdibin. Di nava girseya Kurd de xebatên rêxistinkirinê hene. Her kom pir hêsan dikeve wan kolanan û xebatan dimeşînin.

Weke ku komale derbasî derve bûye. Mirov nikare ji qelebalixê derbas bibe. Min bi zorê xwe gihand qeta jorîn. Ez derbasî odeya randevuyê bûm. Celal û Heyder'ê ji Surucê jî hatine. Yek du ciwanên din jî li cem wan in. Behsa wan kirin gotin; "ew jî dilsozên me ne." Min gor; "divê Yûksel jî were." Ez di-axivim Heyder'ê ji Surucê ecêb ecêb li rûyê min dinêre. Yên ji komaleyê jî dinasin heman matbûnê li rûyê min dinêriyan. Yusuf Metîn bi destê xwe rûyê min destnîşan kir. Bêdeng got; "çi bû?"

Min jî got; "dev jê ber de, tiştek tine ye." Sema'ya ku em çûn Edremîtê mala wan jî li min temaşe kir. Bes min bersiv neda wê jî.

Min got; "zêde qelebalixe, zehmete, ezê paşê bêjim."

Haşim wan hatin, min ew jî bi Heyder wan da naskirin. Haşim pirsî;

" Ma heval jî netewparêz in?" Min erê kir. Bi kêfxweşî temaşe dikir. Çi xweş bû. Em netewparêz jî bûne komek. Yûksel bi hilke hilkê hat, xwîşka wê Aysel jî pê re bû.

Got; "me bi bavê min re şer kir em wisa hatin."

Li Tirkî û li Îzmîrê bûna komek hevalên ku nêzî wî! Zêde hestewar û şahnaz bûm. Min lêdana şevê din ji mêjve jibîr kiriye. Ger wezîr ferq nekin û neyînin bîra min, ne xema min ne.

Em li ser piyan di-axivin. Li komaleyê her kes bi tiştekî ve mijûl dibe. Her der dagirtiye weke roja dê û bava ne. Yên din jî hewl didin karê nivîsandina pankartan biqedînin. Tika kirin ku em rê ji wan re vekin. Em derbasî eywanê bûn. Min ji Celal û Heyder'ê ji Surucê re got;

"Min û birayê xwe hinekê nîqaş kir. Şaş fêm nekin. Ma ez dihêlim ew zilam l imin bixe."

Destpêkê hemû keniya, paşê cidî bûn û pirsîn;

"Birayê te kî ye, kengê hat, ma hevalê me ye?"

Hê sohbeta me berdewam dikir, birayê min, Baqî, kurê Bîbiya min Heyder û xwîşka wî Aynur hemû bi hev re ketin hundur. Birayê min weke li tiştekê bigere çav li derdor digerand. Qelebalix ji hev vekir û hat cem min. Çawa giha min ez hemêz kirin û cihê ku şeqam lê dabû ramûsand.

Got; "xwîşka min lêborîna xwe dixwazim. Min efû bike. Emê paşê bi-axivin."

Ez hinekê teng bûm. Ji ber dibe ku derdor nezane kî ye û çi ye fêm neke gumanan dijîm. Paşê ji bona were fêmkirin û nasîn min got; "temam kekê, ne girîng e kekê." Yên nêzî min fêm kirin ku birayê min e. Min bi Celal wan re da nasîn. Dîsa kenê Baqî girtiye bernade. Ez bawerim kêfa wî ji vî dîmenê aştiyê re hatibû. Ez jî hizirîm ku teqez birayê min berfirehî pê re axiviye. Ew jî hat tevlî komê bû û silav da hevalan. Di wê kêliyê de weke ku koma me tenê li wê eywanê ye, me xelekek ava kiriye û nîqaş dikin. Min got; "emê kîjan diruşmayê biqêrin?"

Heyderê ji Surucê got; “Bimire Mêtîngerî.” Min got; “Em dikarin tevlî hinek diruşmayên gişti jî bibin. Em dikarin diruşmayên dijî faşîzmê û dijî emperyalîzmê biqêrin. Heta em dikarin diruşmaya “Tirkiya Serbixwe” jî biqêrin, ev jî ne şaş e. Lê dê ev zilam li kuderê diruşmayên xwedî naveroka şovenîzmê hebin biqêrin. Yek diruşmayek derbarê Kurdistanê de tineye. Celal got; “komîteya amadekariya mîtîngê heye. Diruşma hevbeş in. Dê destpêkê bi taksiyê li megafonê de diruşma werin qêrîn û yên di meşê de jî dubare vegerînin.” Di vê manê de emê jî diruşmayên ji bilî diruşmayên ku komîteya amadekar destnîşan kirine biqêrin.

DDKD, TKP û Rigarî tevlî vê mîtîngê nebûne. Dê tevlîbûna me bandorek erênî ava bike. Yên dibînin, ferq kirine kêfxweşiya xwe diyar dikin. Hinekê jî mat dimînin. Komek Kurd jî tevlî mîtîngê dibin. Her çendî ferqa di navbera me û DDKD’ê de baş ne hatibe fêmkirin jî, baldariyek pêş dikeve. Min ji endamê desteya rêveberiya komaleyê Xalid re got; “ emê weke şoreşgerên Kurdistanê li her qada ku lê ne, beşdarî hemû çalakiyên dijî mêtîngerî, dijî faşîzmê û dijî emperyalîzmê bibin. Em vê hem were rêgez û hem weke erk dibînin. Dê ev xwepêşandan li Tirkiyê pêk were. Em jî piştewaniyê dikin û tevlî dibin.” Razî bû. Me tiştek din jî nîqaş nekir. Ma em nikarin destûra diruşmayên ku em biqêrin jî ji wan bigirin!

Me bi xwe cihê xwe yê di meşê de destnîşan kir. Li pêş bi girnî karkerên Kula Mensucat cih digirin. Ji dovîzên wan fêm dibe. Ya rastî xetek dirêj tev ya HK’yî yane. Gierseya xwe ji aliyê hejmar ve zêde ye. Em jî di nava xeta wan de ne. Em ji xwe re dibêjin; “ne girîng e.” Meşa esasî ji Basmanê heta qasa Cunhuriyetê ye. Me qelebalix dest bi meşê kir. Hêjî xetên meşê

cihê xwe ne girtine. Di navbera kolanan de komên cuda cuda bi dovîên xwe ve tevlî meşê dibin. Em wisa hatibûn birêxistinkirin. Dê her kes li dihekê kom nebûya. Dibe ku astengiya polîsan heba. Ya rastî destûra mîtîngê hebû, lê polîsan mîtîngek wisa li dijî faşîzmê û bi girseyek qelebalix ve xwepêşandanek siyasî ji rêzê nedidît.

Her der tije polîs in. Weke ku hemû polîsên li Îzmîrê li wê qadê civiyabûn. Ev tenê yên fermî wisa dixwiyan. Her wiha polîsên veşartî yên sivîl û siyasî hebûn. Li nava mîtîngê belav bibûn. Dê di xwepêşandanek wisa de li serkêşan bigeriyan. Ji ber dewletê destûr ne dida muxalefetek herî biçûk re. Xisleta wî ya faşîst û mêtînger li her derê diyar dibû. Evder Îzmîr bû, bajarek sanayî ya mezin bû. Cihek herî zêde xwendekarên zanîngehê lê hebûn. Li vir potansiyelek pêşketinên radîkal ên şoreşgerî ya di nava xwe de dijî heye. Lewma min Îzmîr ji vê hêlê vê pir hez dikir. Her tim ev hest û bawerî dida avakirin. Ew zindî dihişt.

Yek carê de li Basmane hew hat guherin. Her kesî cihê xwe ya di meşê de girtiye. Tevahî pankart û dovîz hatine vekirin. Gelekî balkêş dixwiyên. Dil dixwest ku mirov ji koma meşê derbikeve biçe li ser cihek bilind wê girse û dîmenên bê hempa temaşe bike. Kelecan û coş dida mirov. Bi hev meş, bi karke gelê karker ê xizan, Kurdan ve, Tirkan ve, Lazan ve û i mirovên ji her miletekî li dijî faşîmê bûna yek deng gelekî bedew bû. Ji ber dîmenê wê kêliyê ev rastî dida avakirin.

Her çendî bi gelemperî bandorên hişk ên Şovenîzma civakî, di mijarên bingehîn ên weke sosyalîzm, şoreş û mêtîngerî de cihetî hebin jî, muxalefetên biçûk, bertek û şerên rû didan hevî dida avakirin. Têkoşîna çînî çi qas ecêb bû. Ev kar bi niyet û daxwazan ve nedimeşiya. Min ji xwe re digot;

“xweziya! Xweziya ev pêla mirovan ji aliyê pêşengiyek rast û di bin rêbertiyek şoreşger de bihatan birêxistinkirin.” Lê nedibû. Çepek ku her tim di nava xwe de pêvçûn dijiya hebû. Her yek yê din bi oportînîzmê, reformîzmê û her ku diçû bi şoreşroyê tewanbar dikir hebûn. Di heman demê de rastiya komên çep ên rexneyên herî giran û tewanbarî bikar tanî hebû. Ev jî pir vekirî bû.

Di nêzîkbûnên xwe yên ji şoreşa Kurdistanê re jî, ji hev ne cuda bûn. Ma dê çi feyde di ziravkirina şovenîzma civakî de heba! Ger bikiran dê pêşketin rû bidan. Pirsgirêkek wisa bû ku guhertin çêba dê şoreşa Tirkî re jî deriyek mezin vekira. Dê gavek herî biçûk, piştewaniyek ji rêzê, yek diruşma û yek gotinek di vê mijarê de, rê ji pêşketinên bê hempa re vekira. Ji ber dê ev rastî di hundur de pêşengiya çînî zelal bikira. Di heman demê de dîrok jî bixista riyek rast de. Dê nêzîkbûnek a rast ji rastiya gel re jî daba diyarkirin. Lê mixabin nêzîkbûnek zêde dogmatîk hebû. ‘Yek partiya navendî (Partiya Bolşevîk) ya Sovyetan a şanzdeh partiyên Komarî hebûn’ hebûn. Çîn nîvî mêtîngirî û nîvî feodal bû. Pêşengiya yek partiyê (Partiya Komînîst a Çîn’ê) hebû. Ma ne nîv mêtîngeriya mêtîngerî nedibû, dê nirxandinan xwe dubare bikira.

Dema meş berdewam dikir, demekê din ava xeta HK’ê de diruşmaya ‘bes e ji zilma li ser gelê Kurd tê meşandin re’ hat qêrîn. Heman diruşma li ser pankartan jî hebû. Diruşmayên bi vî rengî yên komên din jî hebûn. Lê mixabin weke pirsgirêkek zêde ji rêzê, pirsgirêkek şoreşê ya biçûk û pirsgirêka hindekiyan naye destgirtin. Hêjî dovîza “divê Milet azad û gel yekbin” heye. Ew zêdetir bala min dikişîne. Em dibêjin dema ew diruşma hat qêrîn emê jî bêjin “ yekîtiya bi dilxwazî” û biqêrin.

Dest bi diruşmayan kirin. Meş bi sazûmankiriye û deng erdê dihejînin. Destpêkê diruşmaya “bila Dadgehên Mîllî ên Dewletê werin girtin” tê qêrîn. Diruşmaya “ne Emerîka, ne Rusya, Tirkiya Serbixwe”, “bila hemû karker girevê bikin” dê ev jî karkeran polîtîze bike. Jixwe herî zêde ew bi coş dibin. Destê her kesî li jor kulim zêde hişk dihejin.

“Bimire Dîktatoriya Faşîst. Bimire Olîgarşî!”

Em jî tevlî wan bûn. Dema hinekê navber danê me jî got:

“Bimire Mêtîngerî!”

Tevî ku hejmara me pir kêm bû, dîsa jî deng pir xurt derket. Rêzên pêş û paş jî tevlî me bûn. Em pir kêfxweş bûn. Me jî her dubare kir. Bazdanekî destpê kir. Erkdarên meşê yên paçên sor bi milên wan ve ne, hewl didan fêm bikin qêrîna van diruşmayan ji kî alî ve tê birêvebirin.

Hat got; “yek deqê, bila ev diruşma neyê qêrîn, kî diqîre” û destwerdan kir. Me jî nîqaş kir.

“ Em şoreşgerên Kurdistanê ne. Em diruşmaya xwe diqîrin. Diruşmayek giştî û di heman demê de diruşmayek bingehîne. Hûn nikarin asteng bikin.” Erkdar zêde bûn. Axaftin û nîqaş zêde belav bûn. Ez, Heyder, Celal û Yûksel her yek j ime li aliyekê nîqaş dike. Yekê got;

“biryara komîteya amadekar heye, dê ji bilî diruşmayên hatine destnîşankirin, ti diruşmayên din neyên qêrîn. Ev şoreşgerên Kurdistanê jî ji kûr derketin. Hûnê li gorî pergala giştî bimeşin.”

Pir vekirî gef l ime kirin. Her çû nîqaş tûj bûn. Destpêkê polîsan lê temaşe kir. Di navberê de yên nas dikin hatin. Navê xwe didin dibêjin;

“Biryara giştî heye. Em neçar in sazûmaniya giştî biparêzin. Ev biryara rêxistinan a giştî ye. Hûn nikarin vîna rêxistinan tine bihesibînin.”

Min jî got; “ma emê vîna xwe li gorî pîvanê rêxistin û hûn didin îfade bikin? Çi eleqeya vê bi şoreşgeriyê re heye? Nabe ku helwesta şoreşgerên netewa bindest wisa be. Em erka pêk tînin. Beşdarî hemû diruşmayan dibin û diqêrin. Me diruşmaya “Tirkiya Serbixwe” qêriya. Lê hûn diruşmaya “Bimire Mêtîngerî” qedexe dikin. Li şûna ku hûn biqêrin, qedexe dikin. Her wiha jî gefan li me dikin û hewl didin li me bixin. Şovenîzm di nava hemû şaneyên we de digere.” Kesê ku beriya wê nîqaş kirî bi ser min de meşiya û qêrî.

“ Tu êdî pir zêde bûyî.”

Polîs têkil bû. Birayê min êdî ji ber van helwestan xwe negirt û di navbera me de liber hev xistinek çêbû. Min dîsa li dijî vê helwestê diruşmaya “Bimire Mêtîngerî” qêriya. Dengê duruşmê çû heta dawî. Komek nêzî pêncî-sed kesên din tevlî bûn. Me ji yê destwerdana me kirîn re got; “ hûn jî bêjin ‘Bimire Mêtîngerî’” û me bertek raber dikir. Min ji wan re got; “tişta hûn dikin kêrî polîsan tê, ji xwe şerim bikin.”

Zêde zora min çû. Min nedikariya qebûl bikim û ne dixwest bawer bikim. Pişt re di navbera xwe de hevûdû hedirandin. Dema qadroyên wan jî diruşma qêriyan xwe dan paş. Lê li dijî wan jî helwestên tund raber kirin. Bi gotinên weke “hûn çi dikin, rêxistinekê di nava rêxistinê de ava dikin” ve hewl didin wan bêdeng bikin. Hevalan ez hişyar kirim “ neyên tehrîkan, dibe ku ev provakasyonan pêş bixin.” Min jî got; “ çi dikin bila bikin, em nikarin destûrê ji wan bigirin û

wisa diruşmaya biqêrin. Evder ne di bin yekdestdariya ti kesî de ye. Şoreşger tenê dimeşin.” Kêfa min ji helwesta birayê min re hat. Em mil bi mil in. Bi dengê gur diruşmaya diqêrin.

Ez jî dibêjim; “ Şer em hîn zêdetir nêzî hev kirin.” Carê jî paş xwe dinêrim. Gelek kesên ku beşdarî diruşmaya Bimire Mêtîngerî bûna nasin. Yên weke Baqî, Haşim, Hesen Elî û her wiha ne. Kêfa min ji vê re hat. Zilaman bi destê xwe cihetî ava dikir. Hişê min nedigirt. Çawa dê diruşmaya “Bimire Mêtîngerî” neyê qêrîn! Ecêb, ma çi dihat kirin? Li hember diruşmaya “Divê Mîllet Azad û Yekîtiya Gelan Hebe” em jî dibêjin “Yekîtiya bi Dilxwazî.” Êdî êrîş nakin. Em jî di şêwazê tekrîkirinê de dirêj nakin.

Em ketin nava qada Cumhuriyetê. Derdora peykerê Atatûrk bi dovîzan dorpêçkirî bû. Axaftvanan dest bi axaftinê kirin. Di navbera axaftinan de jî diruşma diqêriyan. Me jî diruşmayên xwe diqêriyan. Carekê hevalê Celal bi dengek gur û Kurmancî diruşmaya “Bijî Têkoşîna Rizgariya Netewa Erître!” Qêriya. Axaftvan jî di wê kêliyê de behsa Erître kiribû. Celal jî berdewam kir. “Hûn çima Kurdistana li ber çavên xwe nabînin” û diqêriya.

Me jî bi diruşmaya “Bimire Şovenîzm, Şovenîzma Civakî!” Piştewaniya wî dikir. Ya me jî xwepêşandan û helwestek biçûk, lê şoreşgerî bû. Ber bi dawî ve ji rêveberiya komaleya HK’ê Haluk hat. Baqî jî li cem bû. Weke ku tiştek nebûye nêz bû. Ne dizaniya ku ji kur destpê bike. Got; “ ew bûyer ne xweş bû. Agahiya me tine bû. Hevalan hûn nas nekirine. Yên ji DDKD’ê jî beşdar nebûne. Heval wer hizirîne ku dixwazin provakasyonê ava bikin. Cara yekê ye diruşmayên bi vî rengî tên qêrîn. Rast e, dibe ku me hê diruşmaya “Bimire

Mêrîngerî” nekiriye bernameya xwe, lê em ji bona qêrîna wê jî bertekên heyî baş nabînin. Emê sibe li komaleyê li ser vê mijarê civîn lidar bixin. Emê li vir fermî lêborîna xwe bixwazin. Lê ez ji niha ve bi navê hevalan lêborînê dixwazim.”

Ev baş bû, em kêfxweş bûn. Jixwe helwesta şoreşgerî jî wisa dibû. Demek asayî bû, ji ber agahiya wan jî ji hev tinebû. Me jî got; “baş e bûyer mezin ne bûn.” Kêfa birayê min zêdetir ji helwestek wisa re hat. Me jî bi vî rengî mafê xwe di wê mîtîngê de îfadekirinê bidest xist.

Me got; “herî kêm dê were nîqaşkirin û baldarî pêş bikeve.”

Di nava meşê de jî zilamekê pirsa, “Ev Şoreşgerên Kurdistanê kî ne?” Kiribû. Ber bi şêwazek bertek pirsî bû.

Ya rastî herî zêde derizînin din ava wan de de ew didan tirsandin. Her çendî gotibûn divê mirov beramber wan rêzdar be, herî zêde jî ji qadroyên nava xwe yên ji Kurdistanê ditirsiyan ku, devrî biryarên wan ên rêxistinê derbikevin. Her çendî pirsgirêk diruşma jî be, helwestek cuda rêberkirin ji bona wan girîng bû. Ger şaş bû çima qêriyan, ji ber qêrîna wan dê helwestên li dijî wan jî bida pêşxistin. Bê biryara rêxistinê diruşma qêrîn, weke ‘di nava rêxistinê de avakirina rêxistinekê’ hatibû şîrovekirin. Bertekên wan vekirîbûn. Herî zêde jî ji wê aciz bûn. Çi nabe, ev jî pêşketinek bû. Baqî jî di ferqa cidiyeta rewşa heyî de bû. Herî zêde jî ji wî aciz bibûn. Çi nabe ev jî pêşketinek din bû. Ji ber nakokî dibûn sedem ku pirsgirêk zêdetir werin nîqaşkirin û lêgerîn zêde dikir. Dibe ku êdî helwesta Baqî jî zelal bibe.

Mîtîng belav bû. Min bi birayê xwe re cara daqî xwarin xwar. Celal û Heyderê ji Surucê jî li cem me bûn. Birayê min mijar ji nû ve vekir. Lê em vê carê nerimtir di-axivin. Diyardeyên weke şahnazî, hezkirin û yekbûn, bi vê axaftinê re zelaltir bûn.

Min her tişt vegot;

“ Min ne baş kir. Madem ez ji malê revîm, hewcebû ez biçûma cihek din. Ez hewl Didim ji têkîliyên kevneşop rizgar bibim. Lê mixabin ez ketim nava sazûmaniyek têkîliyek nû ku qet ji wê ne cuda ye. Her tiştên ber çav encama êş û giyana ku vê têkîliyê ava kiribû. Baqî di vê pêvajoya min a lêgerînê de qet alîkar nebû, berovajî xwest sûd werbigire. Mi ev rastî dît. Min xwest jê rizgar bibim, li ber xwe da, lê min nekarî bi tena serê xwe ji bin jê xilas bibim. Ji ber nêzîkbûna derdor bandor l imin dikir. Carina bê ku ez encam ber çav bigirim, min her tişt li dijî xwe radikir. Carina jî hestên min ez birêve dibirim. Ji ber di mijarên min şaş didît de ferzkirinên min û piştî ku min zerarê vê didît ji nû ve vedigeriyam, du encamên cuda derdiketin holê.

Ya destpêkê rast bû. Bê guman dibe ku di wê rêbazê de jî kêmasî hebin, hinek zerar jî derketibin holê. Lê bi zerara herî kêm ve rêya rast dîtin rêya herî aqilmendiye. Lê di ya duyan de windakirin û binkeftin neçar dibe. An jî berdêl giran dibin. Bi min re berdêl her tim giran tê dayîn. Ez jî bi rêbazên xwe ve giran dikim. Min dikariya werim cem we. Min dikariya li Enqereyê ferz bikim û li cem hevalan bimam. Dê wê demê jî ev qas tişt nehatibûya jiyîn.”

Em jî beramber hev ji bona hevûdû rast fêm bikin di nava hewldanê de ne. Birayê min diyar dike k udi vê mijarê de divê mirov rêzdar be, zehmetiyan ava neke, êdî divê Baqî jî duristî biryara xwe bide. Heyder axivî:

"Emê jî berfireh bi-axivin. Dê pirsgirêk çareser bibe. Divê em ew qasî mezin nekin."

Me wê şevê birayê min rê kir. Got dê biçe Enqere û ji wir jî derbasî Dêrsimê bibe. Soz da ku biçe cem hevalan. Dîsa got li malê jî derbarê vê mijarê de ji bona malbatê qane bike dê çi ji destê wî were bike. Demek qane bibû. Wê demê ti pirsgirêk tine bû. Êdî min dikariya ez biçim Dêrsimê jî. Min ji xwe re digot, ger birayê min fêm kiribe yekbûna şoreşgerî ne hêsane. Ger binesaziya wê ya madî tine be, di wir de hezkirin û şahnazî jî çênabe, ev j imin re bes e. Kêfa min jî tê. Hewce bike ezê bi her kesî re nîqaş bikim. Ji her kesî re vebêjim. Ji ber baweriya min a bi xwe zêdetir dibe.

Karê li Alsancakê ma. Min li cihek nêzîktir li ser rêya Bornova li kargeha tirî dest bikar kir. Nabe ku mirov bê kar bimîne. Yeser bandor li jiyanê dike. Carina quruşek namîne mirov bilêtek otobûsê jî bikire.

Roja paştir em çûn komaleya girêdayî Rizgariya Gel a li Kemeralti. Civînê destpê kir. Destpêkê yek bi navê Xalid daxwiyaniyek da ku 'dê civîn destpêkê derbarê rewşa derve, paşê jî derbarê rewşa navxweyî de be.' Pey re domand;

"weke ku heval dizanin ji bilî DDKD, Rizgarî, TKP, hemû rêxistin û fraksiyonên din ên beşdar bûne mîtîngek hat lidarxistin. Ev meşek ji hemû hêzên dijî faşîzmê re vekirî bû û meşek girseyî ya dirêj pêk hat. Ev xwepêşandenek dijî faşîzmê

ya bi hezaran kesî bû. Di heman demê de tehdîdek ji bo desthilatdariya faşîst bû. Kargeriya Dadgehên Ewlekariya Dewletê DGM eşkere bû. Bê guman di van dadgehan de dozên şoreşa gelê Tirk û Kurd û lawên wan dihat darezandin. Dewlet, li ser Kurdan zilmek mîllî dimeşîne. Nabe ku ti tevgerên şoreşger van baş çav bike û vê nexê nava bernameya xwe. Me jî weke Rizgariya Gel mijara mîllî girtiye nava bernameya xwe û me ji nîqaşek hûr û kûr re vekiriye. Dê demek nêz de nêrînên me hê bi ser hev komkirî were weşîn. Em dikarin di vê mijarê de bi hevalan re jî (ango behsa me dike) nîqaş bikin. Em dikarin li komaleyê bi şêwazek teng baştir nîqaş bikin. Komîteya amadekar a mîtîngê hebû. Ev jî ji nûnerên komên ku beşdar dibûn pêk dihat. Wê komîteyê nûnertiya her tevgerê dikir. Hinek diruşmayên ku hatibûn diyarkirin hebûn. Ew hevbeş hatin qêrîn. Her wiha koman jî diruşmayên xwe yên esasî qêriyan."

Di berdewamiya axaftina xwe de ne ku navê komê ne dizaniya, ji ber ne dixwest me weke tevger muxatap bibîne, bi gotina "hinek hevalên me yên Kurd" ve cewhera nêzîkbûnên xwe raxistibû ber çavan. Domand.

" Di wê navberê de hinek hevalên Kurd diruşmayên cuda qêriyan. Diruşmaya 'Bimire Mêtîngerî' ne şaş e. Diruşmayek giştî ye. Ger mirov vekirî bêje, hevalên me jî li Enqereyê ev diruşma qêriyane. Lê me hîna di vê mijarê de biryar negirtibû. Ji ber biryara navendî ne gihabû me, me jî ne qêriya.ji ber kargeriya rêxistinî tişta herî rast jî ev bû. Lê hinek heval di vê mijarê de hestiyar nêz bûn. Hema bêje din ava komê de kom avakirin. Emê rexneyên xwe yên ji bona van hevalan di zemînên cuda de diyar bikin. Her wiha helwestên pêwîst jî raber bikin.

Lê mixabin helwesta li dijî hevalên Kurd ne rast bû. Hevalên çavdêr ên xeta mîtîngê dişopandin dikariyan baldar nê bûna. Em di wê baweriyê de ne di nava komên bertek raber kirin de hinek hevalên ji komên din jî hebûn. Em bi navê hevalên xwe liborîna xwe ji wan dixwazin." Bi vî rengî rojeva civînê ji aliyê xwe ve destnîşan kirin.

Ji me jî em du heval axivîn. Me erka şoreşgerên netewa bindest anî bîra wan, her wiha bendewariyên me yên di vî warî de û daxwazên me yên piştewanî bilêv kir. Di heman demê de ji ber DDKD tevlî mîtîngek bi vî rengî jî ne bibû, me rexne kir. Me xisletên wan ên çînî jî destnîşan kir. Me diyar kir ku ne nûnerên şoreşa Kurdistanê ne û emê heta dawî bi xisletên wan ên netewperestiya burjuvaziya biçûk re têbikoşin. Di vir de rewşek neyênî derneket. Me di nava xwe de nirxand ku pêkhatina platformek wisa bi çi armancî dibe bila bibe, hesabên wan çi dibin bila bibin erênî bû. Bes helwestek ecêb jî Baqî kir û got:

"ez jî helwesta li dijî hevalên Netewparêz rexne dikim. Di vê manê de ev civîn erênî ye. Tiştek cuda lê zêde bikim tine ye. Ger ji bona helwesta me jî bêjim, raste, nêzîkbûna me bi temamî hestiyar bû. Di rastiyê de di nava komê de kom avakirin bû. Di vê pêvajoya ku mijara mîllî tê nîqaşkirin de, hê tevger di nava xwe de ti biryar negirtî, diruşmaya "Bimire Mêtîngerî" qêrîn dijî rêziknameyê ye. Ez bi xwe diruşmayê şaş nabînim. Lewma di wê baweriyê de me, dê di vê mijarê de biryarek rast derbikeve holê."

Gelo neçar bû daxwiyaniyek bi vî rengî bide? Jixwe di serî de hatibû gotin ku dê bi komê re cuda were axaftin. Gelo Baqî namûsa çi rizgar dikir? Di wê kêliyê de ev nêzîkbûna wî hêrsek

mezin b imin re da avakirin. Dixwest i bike. Ew çi gotinên, em hestiyar nêz bûn, me diruşma qêriyan bûn. Çi qas ecêb e! Gelo ev ew qasî bi rêziknameya rêxistinê ve girêdayî bûn? Gelo di siyasetê de exlaqbûn ev bû? Ji rastiya xwe ya gel dûr, pişta xwe dane wê diçin û ne diyare diçin kuderê jî. Ev jî dibe exlaq. Ev jî dibe şoreşgerî. Lê, di cih û dema tê xwestin de îfadekirina rastiyek pir mezin û xwedî lê derketin jî dibe bê exlaqî!

Di zemînê şovenîzma civakî de teşe girtina şoreşgerên netewa bindest, halê rihê wan û bertekên wan ti xaran naye pejirandin. Ma evê çi winda bikin? Ma dê kariyerê winda bikin? Na, tê dîtin, di vê mijarê de yên herî zêde weke hemalan kar dikin ew in. Yên bi herî zêde nêzîkbûnên berjewendî û bertekan tên bikaranîn, ên herî de çep û rast baz didin jî ew in, lê çavê wan jî ne li kariyerê ye! Wê demê çima ev qasî bindestî û çewsandin tê jiyîn û ev qas dudilî û guman tê jiyîn?

Em derketin. Êdî ti mane nemabû ku em zêdetir li wir bimînin û wan çeloxwariyan guhdar bikin. Berî em veqetin em bi Heyder wan re axivîn. Me pêşketin erênî nirxandin. Qet tiştek jî tine be nîqaş pêş diket û rojeva wan dihat guhertin. Ya rastî ev baş bû. Ji ber nakokî hebûn. Di navxweyî de nakokî zêde bûn. Ne dixwestin bidin der. Ev jî xwezayî bû. Bawer im Baqî wan jî li benda nêzîkbûna fermî ya ku ji bona mijara mîllî were weşan bûn. Bê ka çawa be.

Heyder got; “dibe ku qutbûnek komî ya mezin pêk were. Baqî zêde polîtîk nêz bû.”

Ez zêde tevlî vê nêrînê nebûm. Ji ber kêm jî be wî nas dikim. Lê dîsajî min got; “ em peywendiyên xwe yên bi wê komê re bidomînin.” Her çendî bixwazin li hevber derve

nakokiyên xwe veşêrin jî, dema nekarîn qane bikin, dê cardin pirsgirêk werin jiyîn. Ez carek din li hember Komînîstên Fransa rêz digirim û bibîr tînim. (Gipta ediyorum). Ji Ho Chî Mînch re dibêjin; "Biçin Şoreşa Vîetnamê Pêş Bixin." Ev jî bi hewldanên têkoşîna rizgariya netewî ya li mêtîngeriya Afrîka û şoreşgerên netewa bindest a Afrîka pêş dikeve. Qadroyên pêşeng piştewaniya giyanwerî digirin. Lewma ez bawer im ger Denîzan û Mahîran sax bûna, rewş wisa nedibû.

Li vir navberekê didim

Îro 8'ê Adarê ye! Ji êvarî ve baran dibare. Lutkeyên jorîn berf girtiye. Zivistana Zap'ê ecêb e. Me digot qey em vê salê zivistanê nabînin, ji nû ve hewa xirab bû. Dê heval 8'ê Adarê di hewayek tavê de pîroz nekin. Ev demeke amadekariyên pîrozbahiyê têne kirin. Ez nizanim naveroka wê çiye. Lê ya girîng di Têkoşîna Rizgariya Jinê de vekirina demek nû ye. Dema xwepêşandan, merasîm, pîrozbahî û her wiha naverokek ava kir, watedar dibe.

Weke tevger di asta Rêbertî de avakirina tevgera jinê, girêdana wê ya bi yekser şoreş û sosyalîzmê ve dema dawerivîne, wê demê tê wateya girêdana bi teorî, bîrdozî û her aliyê jiyanê ve, şêweyek jiyana ava kiriye. Lê hêjî ne di vê astê de ye. Bi tayber ji bi xwe şaş nêzî tevgera jina şoreşger bûye, hedefek wisa jî di nava xwe de kiriye dewsa armancê de. Li Kurdistanê jî ti tevgerek jinê ya xisletek çînek cuda digire, yan jî xebatek din pêş neketiye. Diyardeya jinê hatiye jibîrkirin û jin ketibû rewşek ku herî zêde xwe winda kirî. Lewma neçar bû ku di şêwazek şoreşgerî de pêş bikeve. Ya rastî ev xisletek Kurdistanê jî ya herî diyarker bû. Ev rastiya ku xwe di raveya

herî bi nirx a “Şoreşa Kurdistanê Şoreşa Jinê ye” diyar dike, di heman demê de pêşketinek mezin a azadiyê ye. Aliyê wê ya herî girîng û serkeftina wê ava bikeye.

Gelo îro çend hevalên jin van mijaran cidî û kûr dihizire? Mereq nakim, lê bi êş vê rastiyê ferq dikim û dizanim em hêjî pir dûrî wê ne. Civatek jin a qelebalix li çiya ne û di nava sazûmaniyek artêşê de ne. Ev jî mirovan şahnaz dike. Hêzek şer a çekdar, neçar e ku bi şerel wisa azadiya wê zehmete re ser bixe. Lê mixabin, ji xweseriya xwe jî dûrbûnek balkêş tê jiyîn. Di heman demê de di şêwazek azadî û rizgariyê di nava şervantiyek teng û çors de hepis dike û difetisîne heye. Pêşengî tine ye. Jinê hewl da xwe bi şibandina zilam ve vê bike lê nebû. Zerarên mezin dan. Niha jî ev artêş bi destwerdanên Rêbertiyê ve tê meşandin. Lê neçare baş bizane ku diçe kuderê û divê çawa bimeşe. Jinên di salên 1900’î de dijiyan rizgarî di têkoşîna hevbeş û giyana wê ya piştewaniya mezin de dîtin. Weke cinsê bindest, bi hev re şer esas girtin! Ger wateya vê baş neyê fêmkirin, zanîn, têgihiştin û girêdanek bi pêdiviyên wê re tine be, nikare 8’ Adar’ê pîroz bike. Ji ber xisleta 8’ê Adar’ê ya herî bingehîn û aliyê ku ew anî heta roja îro ev rastiye. Rêhevalên min civiyane. Qelebalixek pir bedew e. Lê belê, ji bona rizgariya jinê bedewiya giyana hevbeş û berpirsyariya wê tine ye. Ev hêjî zêde lewaz e. Bi giranî di vê mijarê de winda dike û em zerarê didin şerê xwe jî.

Me li ser hevala Bêrîtan, Azîme û gelek hevalan axivî. Me bi komek biçûk a hevalan re bibîr anîn. Ew çoş, çalakgerî, azwerî, hêrsa pêşketin û serxistinê ya bi hevala Bêrîtan re çi qas bedew bû. Li cihê ew lê hezkirin hebû. Aliyên hevbeş dikir yek, dixist tevgerê û xîtaba wê di pirek yekbûnê. Jîrbûn,

kêrhatî, ked, nirxandinên wê yên her tim pêşketina dişopîne, şîrove dike, hestên wê yên îfadeya cewheran bû, zîndewariya wê ya ne dihat girtin, dihişt ku were hezkirin. Ew keçek şoreşger û Bêrîtana hemû keç û şawên bedew bû.

Hevala Azîme, ango Mîhrîban Xoce, bi salan li çiyan, dibe ku dem bi dem tenê hat hiştin û xwe bi tenê hişt. Lê tevî hemî aliyên wê yên paşverû weke şerkerek jin û fermandarek jin ser piyan ma û şer kir. Mirovê rêxistinê bû. Gelek aliyên me yên bi hev re nakok hebûn. Lê min her demî li hember rêxistinî û şerkeriya wê ya mezin rêz girt û pê bawer bûm. Mirov bi hevalên wisa re dimeşe. Her çendî mirov di nava şer û pevçûnan de jî be, mirov berpirsyariya bi hev re rakirina barê dozê parve dike.

Min îro ji kesekê "qevdên Nêrgizan" hêvî nekir. Lê ez nêvengek gerim û bedew û yekbûnê geriyam. Min bêriya nêvengek wisa kiriye. Min giyana têkoşîn û yekîtiya 8'ê Adar'ê heta hemû şaneyên xwe hîs dikir. Min Clara û Roza bibîr anî. Min Leyla Qasim k udi jiyanê de bandor li min dike ji dil û can û bi agirê şer ve silav kir.

Berxwedaniya karkeran a yekem

Gireva birçîbûnê ya yekem û girtîgeha yekem

Belê, pevçûn û nakokiyên ku min li Îzmîrê jiyan kirin, ez hîn zêdetirzana û dijwar dikirim. Ez dibûm kesayetek wisa ku her çendî ji welat, rêxistinê dûr be, li ku derê, di kîjan mercan de dibe bila bibe, ya ku di asta xwe de wê diparêzê, bawer e ku parçeyek jê ye û wisa tevlî her tiştî dibe. Em bi qismek di nava HK "di nava gurubê de gurubê ava dikin re" li Încîralti, yan jî cihên guncav dihatin cem hev, me pirtûk dixwend û nîqaş dikir. Piraniya wan ji Dêrsimê bûn. Ji bona min jî dibû perwerdeya herî baş. Ew xwendin, lêkolîn û nîqaş dibû bingehek ku zanebûna teorik û bîrdozî di nava xwe de pergalekê saz bike û tevkar be. Lê dîsa jî têrê nedikir ku em wan bikin malê tevgerê û encama tê xwestin bigirin.

Şikir, a ku ev demeke propagandeya wê dihat kirin mijara netewî, di kovara Rizgariya Gel de derket. Berî wê biroşûrên wan ên îllegal Baqî dabûn min da ku e bixwînim. A ku di kovarê de derketî ji ya min xwendî tengtir bû. Lewma wê nîqaş jî zêde cuda pêşneketan. Lê dê rexne û nîqaş hîn zêdetir li ser bingehênz zelal pêş biketan. HK, dihizirî ku mijara netewî bi Referandumê çareser bike. Lê mixabin ne dikariya bi dahurîneke mirî ve bandorê ava bike, ev jî pir vekirî bû. Tene bi ser mînakên İsveç û Norveçê ve hêviya Kurdistaneke mirî kiribûn. Kürdistan'a fetva okumuştu. Ji gelek koletî weke çarenûsa xwe dîdiye, mafê vebijêrka cihebûn an nebûn, azadiya xwe nasîn, rastiyan çi qas belovajî dike.

Dile Sosyalîzmê dileriziya! Ji bona şoreşgertiya netewa bindest, bazbata şovenîzmê dihat dayîn. Ev li komaleyan-malan û kampûsan gelekî hatin nîqaşkirin. Baqî jî, div ê deme de helwestên namusa Kurdînî raber dikir. Nîqaş di navbera wan de jî berdewam dikir. "ji aliye samîmiyeta min a li hember yekîtiyê diceriband û digot, ez bawer im, emê bi peywendiyên nêz ve encaman hîn baştir bigirin". Wextê ku me destnîşan kiribû hîna temam ne bibû. Lê em dîsa jî li malekê hev civiyan. M. ELÎ, Apê min, Îbo û Meto hatin serdana me. Me li Îmîrê taxa Nêrgiz, du xorfeyên mala malbateke ji Ovacikê kire kir. Xorfeyek heman malê ya wan bû, lê me cihên din bi hev re bikar tanîn. Wisa ji kire tasarruf dibû. Ji ber malek cihe pir biha dibû. Di heman deme de wisa baş nedikişand. Nava wê ne dagirtî bû, lê maleke ji derve ve pir xemilî (lüks)dixwiya.

Du keçên ciwan ên bi navê Sakîne, Zahîde û birayeke wan biçûk hebû. Dê û bavê wan jî li Almanya diman. Zahîde şinga ku li Ovacikê ye ve dilxwazê (TÎKKO) bû. Lewma Îbo jî weke endamên eşîretê nêzî wan dibû. Keça ciwan a biçûk Sakîne, zêde eleqeder nedibû. Me demekê di kargeha tirî de bi wan re kar kir. Lê ev kar demek kin ajot. Zehmet bû ku em li cihê wî karî kare rêxistinkirinê bimeşînin. Cihê kar biçûk bû. Lê min kiribû sere xwe. Ezê karkeran birêxistin bikim û bixwe pêşengî ji wan re bikim. Lewma ez li cihê kar digeriyam. Ji bona min azwerî û hetecanek mezin bû.

Herî dawî min li ser rêya Bornova li kargehekê dest bi kar kir. Ez û Gulsima ji HK'ê bi hev re diçûn wir me kar dikir. Hinekê jî Baqî ev kar sazûman dikir. Wî dizaniya li kîjan kargehê karker tên girtin, li kîjanê derfetên kar heye. Ji bet hetî zêde jî ew kom eleqeder dibûn. Çêkirinek hevbeşiya Alman û

Tirk kargeha Slep bû. Di nava xwe de ji çend ûnîteyan saz divû. Kerkerên xwe pir bûn. Kargeheke ku personelên xwe pir taybet bûn. Ji deriye destpêkê heta ketina hundur tevahiyê formalite dihatin pêkan. Pergalek xebatê ya dihat venêrîn hebû. Di xorfeya cil li xwe kirinêji bona her kesê dolabênji pola hebûn. Her kesî pêşmalek û komên spî li xwe dikir û wisa derbasî hundur dibû. Rojê di navberê de çayê bîst deqe û wextê xwarina nîvro jî bşst î pênc deqe bû. Mirov bi bazdanê diçû diket rêzê û bi lezgînî xwerina dixwî-derdikevî. Lê mixabin ên ku li dawî diman ti caran xwarina xwe xilas nedikirin û têr nedibûn. Hemû personelan li heman xwaringehê xwarin dixwar. Li kargehên din ên min kar dikir, ne wisa bû. Me ne dizaniya bê ka karsaz (patron), an jî persinelê taybet çi û li ku derê xwarinê dixwe.

Gav bi gav em fêrî bûn kî, qadroyên kîjan komê ne. Qadroyên ji Partiya Komînîst a Tirkî (PKT-TKP), TÎKKO û herî zêde jî ji qadroyên HK hebûn. Jin û zilam têkilhev bûn. Diviyabû ji cihê kar yên din desr derxista. Me ev ji hev te jî digot. Ji ber pir hişk li ser her tiştê personele li vir radiwestiyan.

Min her sibeh ji mala me ya li Nêrgiz heta rêya giştî baz dida. Min ne dixwest ji wesayîta rêwiyan dereng bimînim. Ev xebat ji tevahî xebatên zêdetir zewq dida min. Em di vir de berxwedaniyê mîsoger hedef dikin. Bi karkerên şoreşger Umran, Gulistan, Mahmureû yên din re aliyên me yên hevbeş ev bû. Mahmure, penabera Bulgarê bû. Zerik û çavên wê şîn bû. Di heman deme de keçek bedew û balkêş bû. Weke din jî jêhatî bû. Ew ji zû ve din ava kar de bû. Bawerî dabû û bibû serbazê kar. Li kargehê avantajên buna serbazê kar hebû. Ger

hişyarî tevbigeriyan dikariyan demek dirêj bê ku eşkere bibin li ser kar bimînin. Peywendiyên vê komê bi Partiya Komînîst a Tirkî (TKP) ne başbûn. Nesrîna ku dilxwazê PKT bû ne radîqal bû. Feraseta wan a der barê têkoşîna sendika de, di nêzîkbûnên wê de jî diyar dibûn. Lê nêz nedibû. Weke ku xwe vedişar nêz dibû. Lê pirsgirka esasî mantiqê nêzîkbûna ji berxwedanê re bû.

Li beşa ku me lê kar dikir kumaş parçe parçe dihatin dirûtin û şêweya dawî derdiket. Paşê dihat pakêtkirin û amadekirin. Serbazeke her beşê hebû û vedinêrî. Jixwe pergalek wisa hatibû sazkirin, te nedikariya yek deqê vala bisekiniya. Rêza beriya te parçeyek didirût yekser dida yê pey xwe. Wisa li pey hev diçû ji yê din re heta parça esasî derdiket. Li gorî vê şêwazê jî her karkerî heqdestê xwe ya heşt demjimêran digirt. Yê ku ji wextê xwe zêdetir jî kar bikira, zêde pere jî digirt. Lê piştî demekê her karkerî bi qasî parçeyên ku derdixist pere girtin. Ev pergala kar reqabet jî zêde kir. Ji bona her karkerek hîn zêdetir parçe derbixe bi hêzek mezin kar dikir. Li kêleka vê qalîte jî pir girîng bû. Dema baş ne hatiban dirûtin yekser ji mafên karkeran qut dikirin. Pere jî heftiyê dihatin dayîn. Di navbera du sed û pêncî, du sed û sê sedan de dihat dayîn. Vê radeyê derbas ne dikir.

Karker, endamên sendikaya Teksîf a girêdayî Tirk-îş'ê bûn. Ji pereyên ku tên girtin, herî kêm heqê deh tiştan tê dyîn. Alınan paradan en az on yere kesinti yapılıyor. Dema heqê Sendîka, sîgorta û xwarinê tê dayîn pereyek gelekî kêm dimîne ji xwediyê wê re. Li vir karkerên deh-danzdeh salin kar dikin hene. Bi gelemperî hemû jî ji vê pêkanê tengav in. Weke din şertê kar jî zehmetiyan ava dike. Ji bona xwarinekê jî nîv

demjimêr naye dayîn. Liv û tevgerek heye, lê lê yên ku jê bidest dixin patronin. Carina ji bo bêdeng bimînin parek zêde ji serbazên kar re tê dayîn. Weke li cihên kar yên din, li vir jî rolên "patronên biçûk" an jî "patroniçe" dilîzin hene. Lê gelek serbazên kar ên demek dirêje li vir kar dikin û di heman deme de kare rêxistinkirinê dimeşînin hene. Em van jî di navbera çayê yan jî xwarinê de hîn bûn. Ên ku wan nas dikin, min bi wan didin naskirin.

Her çendî gelek ji karkeran di halê xwe de bin, piraniya wan ji polîtîzebûnê re vekirîne. Pirsgirêkan dibinin û ji berxwedaniya karkeran bandor dibin. Lewma di mijara peywendî û hevpeyvînê de zehmetî naye jiyîn. Her yeke me di demeke kin de derdorek berfereh çêkir. Tiştên ku bal dikişandin çibûn, me ew zêdekirin. Ji xeynî çend kesan, gelek ji wan navê Kurd û Kurdistanê nû dibîhistin.

Min ji qadroyên karên rêxistinkirinê dimeşandin re pir vekirî digot, ez weke şoreşgereke Kurdistanî kar dikim. Li her kargehê ji bo berxwedaniya karkeran çi pêwîst dike amademe bikim. Ez vê jî weke erk dibinim. Min li vir ji xwe re hedef danî, li şûna ku karkeran bi navê şoreşgerên Kurdistanê birêxistin bikim, li ser bingeha pirsgirêkên wan ên xweser birêxistinkirin, bi ser desthilatdarî ve çûyîn, rastiya ku gelê kurd dijî dana nasîn û wateya piştewaniya bi wan re dana fêmkirin, di van mijaran de hişyar û zana bikim. Lê ez dibêjim; "em van karan bi hev re, li ser vê bingehê, li derûdora bingeha van rêgezan bikin". Armanca min ew bû ku bandora şovenîzmê bişkînim û erken wan bînim bîra wan. Lê bele hemû jî nêrînên komên wan çawa ba, ew çerçeve esas digiritin. Lê nêzîkbûnên

min her tim ew şaş dikirin. Di heman deme de piştewaniyek erênî û piştewaniyek bi hev re karên hevbeş kirine pêş dixist.

Derfêtên birêxistinkirina Grevê çêbûne. Lewma rêvebirinek rast û bandora wê gelekî girîng e. Divê xebatek wisa be ku nûnertiya berjewendiya hemû karkeran bike û nîtelîkek hejmarek zêde qane bike derbikeve holê. Ji ber li hinek kargehan pir zû grev dihatin şikandin û bi rendî vî grev ne digiha armanca xwe ya siyasî. Di vir de jî bandora xisletên çînî ya van koman û nêrînên wan a ji têkoşîna sendîka û berxwedaniya karkeran re hebû.

Nakokiyên di navbera komên çepgir de, hevûdû neqebûlkirin, li şûna ku aliyên hevbeş bigerin, nêzîkbûnên hevûdû reşkirinê esas girtin, nakokiyan kûr dikin û helwestên ku cihetiyê kûr dike derxistina pêş, bi her awayî di nava kargehan de jî diyar dibû. Ev di heman demê de hêza karkeran ya hejmarî û nîtelîk jî parçe dikir û bêvawerî dida avakirin. Girse di pirsgirêkên cewherî de şiyarkirin, birêxistinkirin û tevgerkirinê zêdetir, xebatek tenê di çarçoveya hinek daxwazên aborî de dima û hedefên siyasî di asta diruşmaya de dima didan meşandin û di nava pêşbaziyek ecêb de hejmara seriyan digeriyan. Ev xisleta wan a herî diyarker bû. Ti wate nebû ku vê li dijî min bikin. Ji ber min ew derfet ji destê wan derxistibû. Min hê di destpêkê de piştewanî û têkoşîna yekbûyî esas girtibû. Min her tişta ku rast didît ji wan zêdetir bi xwestek û gerim pêk tanî û tevlî dibûm. Ev li pêşiya nêzîkbûnên wan ên tûj jî digirt û hez jî dikirin.

Carê em dawiya hefteyê diciviyan û nîqaş dikir. Her çendî ez yekser beşdarî civînên wan ên di navbera xwe çêdikirin ne dibûm, bi hema naverokê bi min re jî di-axivîn û nîqaş dikirin.

Heta ji bona tevlîbûna min a civînan re ti astengî ne dihat dîtin. Me xebatên kargehê dinirxand û me bernameyek hevbeş derxist. Xebata yekem pêkanîna qeyda sendîkaya tekstîl a girêdayî DÎSK'ê û avakirina derfetên nûnertiya xwe bi xwe hilbijartinê bû. Paşê me dest bi karên propaganda, nabiz yoklama, tespîtkirina meyla gişti kir. Ji ber di sendika de qadroyên ku girêdayî van koman kar dikin hene. Lewma em vî karî hinekê jî bi wan re bi şêwaza kordîne dimeşînin.

Di vê navberê de serdanek ku em ne li bendê bûn çêbû. Ez li bendê bûm ku heval bi min re pêwendiyê çêkin. Lê ez ne bendê bûm ku ji bona vî karî Şahîn Donmez were. Bi Heyderê ji Surucê re li ber kargehê li benda min bûn. Min tam di wê kêliyê de li ber derî ji qeyda tekstîlê îmze kom dikir. Karkerekê agahî da ku hinek hatine serdana min. Ne dûrbûn, min çavê xwe li wan gerand. Belê, Şahîn Donmez û Heyder bûn. Yekser min kelem û defter da destê hevalek din û ez çûm cem wan.

Kêfxweşiya min di her nêzîkbûna min de diyar dibû. Heval ji welat hatibûn. Ev di wateya sazkirina pêwendiyek manewî de bû. Em li otobûsekê siwar bûn û çûn mala li Nêrgiz'ê. Dema Şahîn ji derve de mal dît, got; "pir lûks e." Bes dema derbasî hundur bû, xeyalên wî tev vala derketin. Ez bawerim li benda avahiyek tam raxistî bû. Li erdê parçeyek merşa kevin heye. Cacaîmên me li ber vê pir lûks diman. Parçek merşa ku pirtikên wê jê daketîn û deqê şewatê lê hebûn. Çend dîwan û textek razanê ya bê qumaş hebû. Dema dît got; " tam weke mala karkeran û weke mala bekaran e." Ango gotina xwe ya destpêkê paşve kişand.

Heyder, ji peywendî û karê ku me dikir fêm kiribû. Şahîn jî di navberê de weke ku van ji berê ve dizane serê xwe dihejand. Ji me re hinek pêşketinên li welat ragihand. Got ku, tevlîbûn her roj zêdetir dibin. Dema got, heval li Dîlok, Riha, Mêrdîn, Dêrsim, Qers, Amed cihên weke van dera kar demişînin, ciwan lez ji komên din cihe dibin, ber bi refên me ve tên, min yekser behsa nakokiyên min got, ger bi wan re were axaftin, dê mîsoger ew derbasî nava refên me bibin û min navê Haşim û hinek din da.

Demîran qadroyên HK yên esasî bûn. Elîşan û Hisên behsa Demîr kirin. Min ew jî ji Kişla nas dikir. Min got; "ger Haşim derbasî milê me bibe, emê bikaribin wê malbatê bandor bikin." Min behsa xwîşka hevalê Mazlum a mamoste, Yûksel kir. Lê min behsa nakokiyên li malê nekir. Wî bi xwe pirsî; " Baqî, Brahîm çi kir? Ez bawerim tu hêjî dûvikê HK'ê yî?" Baqî jî di devê xwe de bir û anî got; " na, ez tevlî tewanbariya dûvikbûnê nabim. Em nîqaş dikin. Me bi Sakîne re pir nîqaş kir. Ya rastî gelek aliyên me yên hevbeş jî hene. Rêxistinbûna cuda ji vê re ne asteng e. Em dikarin hinek din nîqaş bikin."

Ez naxwazim ew mijar bikeve rojevê. Ji ber wê dîsa Baqî heman mijaran dubare bike. Dê Şahîn jî bêje, "em dikarin qezenc bikin" û bê ku cewhera pirsgirêkê bizane hinek gumanan bêde pêş. Paşê dema Şahîn got; " ez dixwazim berfireh bi-axivim" Baqî aciz bû. Dema me xwarin çêdikir Baqî got; " zêde kêfa min ji Şahîn re naye, axaftinên wî tehrîk dike, ji ber vê ez bawer nakim ku rast nêzî pirsgirêka navbera me de bibe. Hinekê jî em bi xwe bawerbin. Em bi xwe çareser bikin, kesek din têkil vê nekin, ji ber yekbûnê ava nakin." Min yekser bertek raber kir. Min jê re got, "tu nikarî bi guman nêzî

hevalên min bibî, te jî gelek hevalên xwe anî û me nîqaş kir. Ez dixwazim di vê mijarê de her tiştî bi hevalên xwe re nîqaş bikim. Bila bizanibin, pirsgirêkek me cuda tine ye û nabe jî!" Got; "tu dizanî." Diyar bi ku ne razî bû û hiş dijiya.

Ez bi Şahîn re cuda axivîm. Min pêvajo bi hemû ziraviyan ve vegot. Min ji Dêrsimê destpê kir. Carê jî destûrê didim ku ew jî li gorî xwe çawa dixwaze biguhere wisa şîroveyan bike. Min jê re got; " min guhdar bikin, ez dixwazim her tiştî vebêjim. Dixwazim heval bizanin ku min ev pêvajo çawa derbas kiriye. Baş bû ku hûn hatin. Biryara min vegera welat e. Ger hûn nehatiban jî, ezê bihatam. Lê ev karê kargehê heye. Heta min çenteyê xwe jî amade kiriye, tenê firsendekê digeriyam. Dê min hewl bide wextek guncav de werim. Lê min ne dizaniya pêşî biçim kuderê. Destpêkê min dixwaziya werim Enqere û bi rêya hevalên li wir derbasî welat bibim. Êdî bes e. Her carê li pey baweriya pirsgirêk çareser bûye, yan jî dê çareser bibe de, heman tişt rû didin. Ev jî ji nû ve jiyîn min ji hêz û dixe!"

Ew bi xwe jî mat dimîne. Got ku, hayê wî jî bi van nakokiyê ku ez dijîm û daxwaziya min a çûna welat tine ye. Helwestên min erênî dît. Lê dîsa jî digot; "em dikarin qezenc bikin." Pir bawer ev gotin nedikir. Weke ku bêje 'ez navbera van xirab nekim' bi zorakî got; "emê hêjî bi-axivin." Min fêm kir ku dê ev nêzîkbûnek talok-kirinê be. Hizirîm ku "gelo ji bona wî ne helwestek bi mantik bû?" Lê, hêncetên min ên cihebûnê pir vekirîbûn. Ango cudabûnek ji ber sedemên bîrdozî bû! Ez bawerim fêrî rewşek wisa nebûne.

Sibehê wextekê bi Bqî re jî axivî. Baqî jî gumanên xwe ji Şahîn re vedibêje. Şahîn jî dibêje; “ na, em kesekê ji hev cuda nakin. Heval bixwe jî li vir e. Dê emê biryara xwe bide. Em tam berovajî dixwazin qezenc bikin.” Dê wê şevê li Încîralti li ser mijara Emperyalîzma Civakî were nîqaşkirin. Ev dê di navbera Ciwanên Şoreşger (Dev-Genç) û HK de were nîqaşkirin. Komên din jî tev beşdar dibin. Berpirsê her koman jî ji Enqereyê hatine, dibêjin dê nîqaşek berfireh were kirin. Em jî wê şevê çûn. Şahîn nexwest ku ez biçim kargehê. Lê hişê min jî li kargehê ye. Berxwedaniyê jî destpê kiribû. Dibe ku mekîne ne rawestiyabûn, lê destpêkirinek hebû. Îmza tên komkirin, dê nûnerên wan werin hilbijartin û dê nûner li kargehê nûnertiya sendîka bikin, dê bibin nûnerên karkeran. Ya rastî xebatkar hebûn, dê wan kar bimeşanda. Bes ev jî dibû karek di nîvî de hiştin, an jî şêwazek dev ji berxwedanê berdan. Ez jî ji vê tengav dibûm. Gelo neçûna min dê bandorek çawa bike, nizanim. Lê aliyê wê yê exlaqî zêdetir bandor li min dike. Min ti wate neda nêzîkbûnên Şahîn ên wisa hêsan destûr neda ku ez biçim kargehê. Bes ez dizanim ne rast e. Lê di heman demê de naxwazim ji civîna wê şevê jî dimînim. Ji ber girîng bû.

Kampûsa Încîralti mezin bû. Tam dagitîbû. Civînê piştî nîvro katjimêr caran de destpê kir. Yekemîn ê ji Ciwanên Şoreşger axivî. Yê ji Ciwanên Şoreşger bû dirêj dirêj behsa revîzyonîzma nûjen kir. Behsa 17’Cotmehê, pêvajoya Stalîn, Brejnev, Kruşçev û her wiha pêvajoyên din kir. Tiştên ku hevalê Mazlum di pansiyona dibistana mamosteyan de j ime re vegotî hatin bîra min. Bingeha çînî ya revîzyonîzma nûjen pênase kiribû. Ne desthilatdariya çînekê, ancex ji Marksîzmê

rêderketin bû. Ev mijar pir ji hev cuda nedihatin pênasekirin. Lê pir berfireh, ji hinek cihan berhev kiribûn û pênase dikirin. Yê ji HK'ê jî, guhertina li Sovyetan weke emperyalîzma civakî pênase dikir. Di axaftina xwe de hem kesê beriya wî axivî rexne dikir û bi têbiniyên gitî ve bersiv dida, hem ji dahûrîna emperyalîzma civakî weke rasteqînî bide qanekirin, gelek mijarên ku berhev kiribûn dixwend. Her yekê ji nû ve mafê axaftinê digirt û wisa jî wext derbas bû.

Nîvê şevê derbas bibû. Nîqaşek pir gerim hebû û mafê axaftinê digirt pir bûn. Ez jî nota digirim. Li Şahîn temae dikim. Min ji xwe re digot, teqez ewê jî rabe û bi-axive. Mijar heta pirsgirêka Mîllî doma. Ew jî ket rojevê. Kêfa min ji vê re hat. Ew qas ciwan hebûn. Ji bona em bikaribin pirsgirêka Kurdistanê vekin û bîrdoziya xwe bidin nasîn derfetek mezin bû. Hevûdû tewanbar dikirin. Lê di cewher de jî ti cudahiya dahûrînên wan ji hev tinebû. Her du koman jî Mîsaq-î Mîllî rewa didît. Têgehên weke netewên bindest, gel û dewlet dihatin nîqaşkirin. Yê ji HK'ê digot, 'nîtelîkek netewek çar parçeyên cuda û her parçeyekê xisletek cuda bidest xistiye jî tineye, wê demê em dikarin behsa kîjan netewî bikin?' û 'ger her parçe bi netewa ku pê ve girêdayî ye re xwe birêxistin bike, têbikoşe, dê rizgariya xwe wisa bidest bixe.' Yê Ciwanê Şoreşger jî behsa mêtîngeriya nû dikir. Dibêje di serdema me de mêtîngeriya kevnar ne maye. Behsa burjuvaziya Kurd ên xwedî nîtelîkên kompradoriya Mîllî yên ku bi dewletê re bûne yek dike. Ango di encamê de pêşketina şoreşa li Kurdistanê tine dihesibîne û biçûk dibîne. Heman pê ve dike dibêje; " her çendî hinek komên biçûk ên burjuva dibêjin dê li Kurdistanê rêxistinek cuda were sazkirin, ev di ne gengaz e ku were pêkan. Dîsa jî

divê em bişopînin, li şûna ku em yekser helwest raber bikin, divê em xisletên wan ên netewperest teşîr bikin û wisa nêz bibin.”

Yê ji HK'ê xwe dispêre Lenîn û dibêje, “ger ew netewperest jî bin, mirov dikare piştewaniyê bike.” Ecêb e! Weke kul i ber hev re bavêjin, li dijî hev rik dikirin. Dibêje, “ger rêbertî burjuvaziya Mîllî jî be, dikare piştewanî bê kirin.” Lê rêbertiya proleter qet qabûl nake. Li xwe danaynin ku behs jî bikin. Ev çepgir pir ecêbin. Ji bona xwe mafdar diyar bikin Lenîn jî bikar tînin!

Min jî got tam wextê wê ye, “rabin bi-axivin, mafê axaftinê bigirin, van bi vî rengî pirsgirêka mîllî xilas kirin. Yên ku divê bi-axivin em in.” Şahîn qet bala xwe jî nade min. Ez mat dimînim û bawer nakim. Cardin got; “de rabin bi-axivin, tam wextê wê ye. Binêrin hinek li bendê ne ku kesên din bi-axivin. An jî hinek dibêjin xweziya ev zilam ne axivîbûna, jixwe me pirsgirêka mîllî çareser kir.” Ew jî vê dixwazin. Jixwe li gorî dilê wan e ku em ne axivin. Heyder jî mat dimîne. Ew jî tevlî min bû got; “rabin bi-axivin dê baştir be.” Lê Şahîn qet ne di xema wî de li ser kursî pal daye.

Di wê kêliyê de ji dilê min hat ku jê re bêjim, “xwedê bela xwe bide te.” Ez ji xwe re dibêjim, na na, nabe ku tenê ji bona îllegalîte vê nêzkbûnê dike. Dê kî di nava wê qelebalixê de tiştekê bike. Bila polîsên sivîl bin, an jî bila sîxûr bin qet ferq nake. Hedara min naye. Herî dawî ez rabûm û min mafê axaftinê girt. Destxwestin û rabûna min hev re bû yek. Weke ku hinek tişt hatine revandin û ez dixwazim wan bigirim rabûm ser piyan. Ez hinekê axivîm, lê min ne dizaniya ku çi dibêjim. Ji ber ji nişkê ve rabûm, her kesî mereq dikir, temaşe dikir dê

ev jin çi dibêje û bi-axive. Ez pir bi hêrsim, hem li dijî wan, ehm li dijî Şahîn. Bes herî zêde jî li hember Şahîn bi hêrs im. Ez jî bi wê hêrsê di-axivim. Dengê min jî pir bilind e.

Min diyar kir ku her du gurub jî rast nêzî pirsgirêka mîllî nabin, weke pirsgirêkek ji rêzê û xelek bernameyê li pirsgirêka mîllî dinêrin û di vê mijarê de nirxandinên ku Mîsak-î Mîllî derbas nake, wê rewa dike têne kirin. Ti eleqeya vê nêzîkbûnê bi erka şoreşgerî û enternasyonalîzmê re tineye, bi van re nakokî dijî. Bixwazî, nexwazî dê gelê Kurdistanê çarenûsa xwe bi xwe diyar bike, dê şoreşgerên Kurdistanê li ser bingeha mercên xweser ên Kurdistanê xwe birêxistin bikin û şoreşê pêş bixin.

Axaftina min zêde ne dirêj bû. Lê dîsa jî bi çend gotinên rasteqînî ve îfadekirin ji bona min pir girîng bû. Ez wê demê hedirîm. Şahîn mat mabû. Got:

“Ma hewce bû? Ez bi zanebûn ne axivîm. Dê tu bi van zilaman re çi bi-axivî, ev tiştekê fêm nakin. Çi nabe em biçin.”

Lê Heyder bi kêfxweşî li min dinêriya. Weke ku bêje te baş kir serê xwe dihejand. Dîsa jî bêhna min teng e. Her dihizirîm, qadroyê rêxistinê yê berpirsyar e, çima tevî ku hewce bû ne rabû û ne axivî? Ev pirs bi rojan di hişê min de ma. Ev bû sedem kul i dijî Şahîn sarbûnekê bijîm. Ew jî ji rabûna min ne kêfxweşbû. Weke bêje ew li wir amade bû, ez çima rabûme? Ez di serî de li ser vê hizirîm ku, “ ger Şahîn amade ye, emê çima rabin û bi-axivin?” Lê wî nexwest bi-axive.

Ger li cihekê erkek nayê pêkan, li benda hinek din mayîn, ew rewşa wî erêkirine. Di şoreşgeriyê de ev tişt tineye. Ji ber şoreşgerê Kurdistanê tiştên ku hinek din ne dikir, wan dikir. Çi

nabe, bila biçûk jî bibînin, an jî bila axaftina min cidî jî negirin. Li şûna ku ez li dijî şaşiyên wan bê helwest bimînim û bêdengiya xwe ve erê bikim, di asta herî xirab de jî bebi axaftinê helwestên xwe diyarkirin a herî rast bû.

Berbangê demjimêr çaran de civîn qediya. Nîqaş donzdeh demjimêran domiya. Dema çûn malê sibeh bû. Berî navberê du demjimêran du hevalên karker lez û bez hatibûn. Diyar kirin ku ger ez neçim kargehê dê bandor li ser berxwedaniyê bike, weke din jî karkeran ez nûnerê xwe hilbijartine, lewma divê teqez ez biçim. Ez jî neçar mam ku ji wan re bêjim ji ber nexweşbûme, ji ber vê neçûme. Min dizaniya ku neçûna min şaş bû. Bes dê min ji herduyan yek hilbijarta. Ez neçarbûm ku Şahîn Donmez guhdar bikim. Qadroyê tevgera me bû. Min ew weke rêxistin didît. Ya rast jî ev bû. Diviyabû ew bihiziriya. Ne dibû karker bi tenê werin hiştin! Ev derûnî b imin re hestek tewanbar dida avakirin. Kêmasiyek bû! Xweziya Şahîn an beriya wê, yan jî piştî wê bihata! Dê wê rojê em hemû li hev biciviyan. Emê li Încîralti, qiraxên behrê li cihek guncav biciviyan.

Dema em çûyîn civînê Şahîn bi destê xwe nîşan da got; "bila li vê derê be." Emê jî roja paştir biçûna wir. Min her du hevalên karker derbasî hundur kir û hinekê axivîn. Ew jî şoreşger bûn û berxwedanî birêxistin dikirin. Min bi xembar ji wan re got; "karek me lezgîn heye. Ezê herî dereng sibe werim." Wan jî got;

"karkeran ji me re gotin bi hev re werin. Her kes mereq dike. Me dizaniya ku hûn hatine girtin." Bi israr dixwestin ku ez jî li kargehê bim. Min cardin ji wan re got, pir xemgînim, ezê mîsoger werim. Min dixwest bi vê bawer bin. Hinekê xemgîn çûn. Ez jî tengav dibûm. Min Şahîn rexne kir; "ger hûn

nebûna ezê biçûma, karên me yên din jî neradiwestin. Dê me ew jî bi hev re bimeşandan. Ne baş e ku em di kêliya berxwedanê de neçin. Ji ber ez bi xwe din ava vî karî de bûm, divê ez baweriya wan neşikînim.” Lê ne di xema Şahîn de bû.

Got;”devjê bedre. Hem tu dibêjî ezê biçim welat. Bila hinek din girêva karkeran ve mijûl bibe.”

Em wê rojê çûn Încîralti. Me Yûksel bi xwe re bir. Em hemû heft kes bûn. Dema Şahîn dest bi axaftinê kir got; dijmin me parçe dike, her yeke me belavî cihekê dike. Bes binêrinem niha li vir heft kes li hev civiyane.” Li Îzmîrê civîna me ya yekemîn a fermî bi vî rengî çêbû. Em heft kes in û em hemû jî pir kêfxweş in. Tiştên kul i malê ji min re gotine hinek din berfireh vedibêje. “dê ji vir û şûn de jî li Îzmîr û metrepolên din xebatên me bimeşin. Derdorek berfireh a ciwanên Kurd heye. Divê em wan birêxistin bikin.”

Di vê navberê de hişê min jî li civîna ku şev hatibû lidarxistin bû. Min helwestên wî yên li wir hezim nekir. Min ji xwe re digot, ‘Ji ber navendek herî zêde dikariya ciwanan bandor bike bû. Gelo çima ji wir sûd negirt.’ Şerek bêdeng heye û li sedemê digeriyam. Hinek heval hene di kêliya mirov wan dibîne de xwîna mirov li wan dikele. Germin, duristbûnek ji dil heye, hezkirî û rêzdar in. Lê ti caran Şahîn ji min re gerim nehat û mirov jê direve. Paşê weke ku min tiştek şaş kiriye û sucek veşartî kiriye ji xwe şerim dikim. Ji xwe re dibêjim nabe ku mirov hevalbendiyê hez neke û ji dil nebe. Her çendî ne qane jî bim, ez wisa xwe bêdeng dikim.

Em pirsan dikin. Bi taybet em dizwazin bizanin ku dê helwesta me ya li dijî çepên Kurd çibe. Me peywendî û nîqaşên xwe yên bi DDKD'ê re ragihandin. Dîsa me pirsa peywendiyên me yên bi Rêya Azadî re kir. Ji ber di kovarên xwe de herî zêde, nirxandinên weke "li Kurdistanê Kapîtalîzm pêş dikeve, dê pêş bikeve" dinivîsandin. Me jî hewl dida ku em baş fêm bikin. Şahîn got dê hinek hevalên din jî werin. Got; "dema heval hatin van ji wan re jî ragihînin. Dê hevalê Heydr ê ji Surucê niha di asta nûnertû de birêve bibe. Bes ne fermî ye, dibe ku heval hinek hevalên din bişînin. Emê Heyder jî vekişînin. Ji ber Suruc ji bona me pir girîng e." Ji bona min jî got; "emê bi hevalan re bi-axivin û agahî bidin." Paşê ji Îzmîrê çû.

Baqî xeyîdî û bihêrs bû. Ne di-axivî. Paşê got:

"dibe ku Şahîn qadroyê we yê pêşeng be. Lê uslubê wî mirovan dide revandin. Pirsgirêka kor dike." Min jî hev karî û got:

"Êdî bes e. Hewce nake ku tu hinek din tewanbar bikî. Ger pirsgirêkek te heye wer b imin re nîqaş bike." Min diyar kir ku ti eleqeya biryara min bi hatina wî re tineye. Ew jî vê tiştê dizane. Di gumanên xwe de mafdar bû. Xwe sipartina rêxistinê û bi wan re çareserkirina pirsgirêkan cuda bû. Ji ber girêdana vê pir girîng bû û dizaniya ku ez di vê mijarê de çi qasî girêdayî me. Ji ber ger tevgerê j imin re bigota "bimire, ezê bimirim, îro derkeve were, ezê wê bikim." Rastî jî ev bû.

Ez li ser soza xwe sekinîm û roja paştir çûm kargehê. Baqî got; "eê jî werim." Hinekê dereng mabûm. Li kargehê jî hinek gengeşe hebû. Min bal kişandibû ser xwe. Baqî di rewşên wisa

de texmîn dikir ku dê helwestên dijmin çibin. Her çendî ne dixwest vê bi min bide hesîn, dîsa jî bi guman bû. Got:

“hişyar be. Bi xebatkarê li ber derî re nekeve nîqaşê. Tenê hewl bide bikeve hundur.”

Wî got dê li ber deriyê kargehê yê derve raweste. Ez derî re derbasbûm. Bekçî ez dam sekinandin. Çû odeya mudur. Di deriyê destpêkê de cihên ku xebatkar li disekinin hene. Li ber derî jî teqsiyek spî hebû. Piştî demekê bekçî ban min kir. Ez çûm cem karmendê ku karkeran digire. Her karmendek qelem û defterek li pêş wan bendê bûn. Min ji wan re got; “ev du rojin ez nexweşim. Nekarî bêm. Nexweşxanê ez dereng derxistim. Lewma dereng hatim kar.” Hê min gotinên xwe xilas nekirî gotin; “ temam hat fêmkirin. Êdî hun ne karkera me ne. Belgeya derxistina ji kar di destê me de ye. Ne hûn tenê ne. Hinek karkerên din jî hene. Pêwendiya we qut dibe. Fermo biçin.” Tevî van gotinan derî nîşa min dan. Min jî got;

“na, ev qas ne hêsane, hêcet çiye, dema em kar dikin em karker in, lê dema em nexweş dikevin em ne karker in. Karsaz kuderê ye, ez dixwaim bi wî re bi-axivim.” Bi vê gotina min re karsaz ket hundur. Ez bi qêrîn di-axivîm. Dengê min û mekîneyan têkil hev dibû. Karsaz bi dengek nerim got; “fermo jina rêzdar. Ma hûnê tiştekê bêjin?”

Min got; “belê, ev du roj in ez nexweşim û li nexweşxaneyê bûm. Hewce bike ezê belgeya xwe jî bînim. Lê ez ji bona kar têm kargehê, j imin re dibêjin derbikeve, sedem çiye, ez dixwazim bizanibim ku çima têm qewitandin. Hem heta ku hûn heqê min nedin min ez naçim ti cihan. Jixwe hûn her carê ji pereyên me digirin. Weke din jî wextê kum in kar

kirî heye. Heqê min nayê dayîn, ev tê çi wateyê.” Dîsa ez bi qîr di-axivîm.

Got; “bihedire. Hûn nikarin gefa li me bikin. Ti neçariya min tineye ku hêceta vê bêjim. Yê neyê kar dê ji kar were derxistin. Divê hûn vê bizanibin.”

Ez cardin bi dengek qîr axivîm. Hinekê jî dixwazim wext bidest bixim. Min ji wan re got; “divê ez hevalên xwe bibînim. Ezê li bendê bim û naçim ti cihan.” Cardin karsaz derket derve û hat. Ew rûdinişt. Paşê carekê got; yek xole kerem bike.” Paşê xwe da kêlekê.

Got; “Navê we Sakîne Polat e, ne wisa.”

“belê, navê min ew e.”

Her ku ew bêdeng di-axivî, min dengê xwe bilind dikir.

Got; “hûn ji Dêrsimê ne ne wisa?”

Min ji wê re jî got erê.

“ma we heta dibistana amadeyî xwendibû?”

Min got; “ez naxwazim van tiştan guhdar bikim. Hûn çima van pirsan dikin? Hemû di nasnameya min de diyar e. Dema hatim kar fîşek derxistin. Çi wateye ku hûn cardin dipirsin.”

Di navberê de di ber xwe de dikeniya û got;

“Armancek min xirab tine ye. Çima karker bit eve girêdayîne. Çima ev qas j ite hez dikin? Tu ji kurî, ew ji kur in.”

Her tişt dihat fêmkirin. Min dizaniya çima ji kar hatime derxistin. Ew zilamê ehmek weke ku ez nizanim nêzî min dibû. Paşê wî bi xwe jî got;

“Tu jinek bi aqil î. Jêhatiyî. Serbazên kar jî j ite razîne. Tu baş kar dikî. Tu çim adi karên din de naşixulî. Ma karê kargehê ne zehmet e?”

Min jî bersivand; “ew karê min e ez çi bikim. Ez dikarim derbarê jiyana xwe de biryarê bidim.”

Baş bû wext derbas dibû, ez jî di hundur de bûm. Katjimêra xwarinê nêzîk dibû. Min digot divê karker min bibînin, ger bibînin bes e. Yên li derve kar dikir qet l imin peyze ne dikirin. Li ber şibakeyan jî perde hene, lê binêrin jî tiştekê nabînin. Ez ji hêrsan pir aciz bûme. Zilam jî bi armancên cuda pirsan dike û ev jî min pir aciz dike. Texmîn dikim ku dê di dawî de çi bêje. Berdewam kir;

“guhdar bike, em jî naxwazin te ji kar derbixin. Em karê te biguherin. Te dibistana amadeyî xwendiye, tu dikarî sekreteriyê bikî.”

Hîna gotina xwe temam ne kirî min bersiv da û gef li wan barî; “temam hat fêmkirin. Hûn dixwazin min bikirin. Na. Ez karker im. Biçin ji xwe re cihek din sekreterekê peyda bikin û bikirin. Ez bi hevalên xwe yên karker re me. Hûn nikarin bi derxistina kar re pêşiya hinek tiştan bigirin. Sendîka û nûnertî mafê me yê herî xwezayî ye. Hûn nikarin vê asteng bikin. Gelek karker hene. Hemû jî dikarin nûnertiya xwe bikin. Hêza wan heye. Ger hûn min ji kar derbixin, dê nûnerên nû zêdetir bibin.”

Heta ji min karî qêriyam û derketim derve. Ber bi kargehê ve çûm. Sê-çar kesên îzbandot ez girtim. Heta hingê kes li wir tinebû. Gelo li kur disekinîn? Gotin; “em polîs in, ji kerema xwe re derbasî wesayîtê be.” Qêriyam; “patronê faşîst. Ma te ez

bi polîsan girtim kar ku niha tu min bi polîsan derdixîç min bedrin.” Min bi hemû hêza xwe ve xwe erdê ve girtibû. Ez di wê kêliyê de çi qas bi hêz bibûm. Ez jî mat mabûm. Piştî gengeşeyek mezin ez anîm cem wesayîtê. Min bi lingek xwe derî girt. Hêza xwe ji wir digirt. Bi destê xwe jî ew dehf dida. Yekê ji paş ve pakta min hişkayî girt. Piçik mabû situyê min bişke. Porê min paşve pêçayî bû, ew giloka pora min girt û kişand. Min digot dê situyê min bişke. Armancê wan dengê min birîn û ez bi wesayîtê birin bû. Wan jî dizaniya ku çend xole ji xwarina nîvro re maye. Min jî dixwest wext bidest bixim.

Min cara dawî bi hemû hêza xwe ve xwe li derî girt. Nikarin min bixin hundur. Ez jî di navberê de diqîrim; “ hûn faşîst in, ev ji we re namîne, min bedrin.” Di wê kêliyê de ji nişka ve karker derketin derve. Dema mine w dîtin, zêdetir qêriyam. Yê ez dîtim destpêkê mat diman û ne dizaniyan çi bikin, paşê ber b imin ve hatin. Nêzîkbûna karkeran polîs jî tengav kir. Min jî di wirde firsendek bidest xist û ji nava lepên wan derketim, ber bi karkeran ve beziyam.

Min ji xwe diruşma diqêriya; “polîs derbikevin! Polîsên faşîst! Hemû karkeran bi yek dengî diruşma diqêriyan. Li devrî kargehê jî komekê bi diruşmaya “polîsên faşîst” diqêriyan. Dema min temaşe kir, min Baqî dît. Ne çûbû. Dema pevçûna min û polîsan dibîne, çar-pênc hevalên xwe ji Zanîngeha Bornova tîne. Dîwarên hewşa kargehê bilind in, bi têlan hunandine. Li cihê ku ew lê ne jî, bataklik heye. Qenalek heye, rê nade. Dîsa jî piştewaniya wan moral dida me. Lê bê ku zêde bimînin çûn. Em hemû bi hev re çûn cihê xwarinê. Derketim li ser maseyekê û axivîm. Min behsa nêîkbûnên karsaz ên çawa

dixwaze min bikire kir. Hemû bi hev re li dijî wî qêriyan. Diruşma didomin û destên xwe li maseyan didan;

“bila karker bikevin rêveberiya sendîka”, “maf nayê dayîn tê sitandin”, “sendîka mafê me ye” li pey hev tên qêrîn. Her kesî lalîka xwe berovajî daniye ser masê, sirûdan dibêje. Diqêriyan; “heta ku polîs ji vê derê dernekevin, emê ji vir dernekevin.”

Bi vî rengî berxwedanî fermî destpê dikir.

Yên ji sendîka hatin. Hemû jî ji kesên dûvikên sendîkaya zer bûn. Yên girêdayî tekstîlê jî hebûn. Lê zimanê wan heman tişt digot! Behsa fedekariya karkerên Tirk dikirin. Behsa mafdariya girevê dikirin. Me dizaniya ku ji bona gireva heyî bişkînin hatibûn. Pir gerim jî di-axivîn. Behsa zanebûna çînî, şerê çînî dikirin û digotin tiştek ji xelekê proleterya windakirinê zêdetir tiştek din tineye. Pir giştî û dogmatîk di-axivîn. Her ku di serê her gotinê de “karkerên Tirk” diqêriyan, ez wer dihesiyam ku dûjînan hem li karker, hem li gelê Kurd û gelê Tirk dikirin. Axaftinên mirov tengav û hêrs dikir bûn. Mahmur eli kêleka min bû, lê vegeriyam û min got; “ma wê tu tiştekê ji van zilamên faşîst re nebêjî. Dema wext tê hûn dibêjin gelê Kurd bindeste. Divê niha jî ev mijar were vegotin. Divê erkên çîna karker rast werin pênasekirin. Erkek vê ya bingehîn heye ev jî: piştewaniya gelê Kurd a çarenûsa xwe bi xwe diyarkirinê kirin! Divê ev werin bikaranîn û şovenîzm were şikandin. Hûn bêdeng dimînin. Min ne xwest bi-axivim. Ev erka wê ye.” Mahmure piştî demekê axaftinek kin kir. Behsa rola pêşengiya çîna karker, piştewaniya enternasyonalîst û bi yek gotinî biratiya bi gelê Kurd ê bindest re kir. Min got; “ ev jî baş e.”

Em bi hev re derbasî hundur bûn. Me di hundur de berxwedaniya xwe domand. Mekîne rawestiyane. Em li ser wan rûniştine û bi hev re sirûdan dibêjin:

"di serî de karker tê

Kargeha ji kevir û çiyan,

Hey hey em li zincîran dixin û dişkînin!

Hey hey bi şikandina serê faşîstan re!"

"dema em dibêjin bi şikandina serê wî re" hinek jî bi hevsengî li maseyan didin. Ew deng hê zêdetir me gerim dikin. Paşê Sirûda 1'ê Gulanê hat gotin. Em di navberê de jî diruşmayan diqêrin.

Me ew roj tenê weke hişyariyekê nirxand. Rojek ku mercên girevê bi lez kiribû. Me ji karsaz re jî got. Wî em şiyar kirin. Dixwaze em bêdeng bin. Dibêje; "werin em bi-axivin." Navê min dide û dibêje; " bila were, nûnerê xwe bişînin em bi-axivin û çareser bikin." Min dîsa gotina ku sibehê gotî anî bîra wî.

"Hevalno, dê min bike sekreter. Ji bona e bêdeng bim û dev ji berxwedaniyê bedrim, xwest ez bibim sekreter." Li karsaz vegerîm û min got;

"tiştek em bi te re bi-axivin tine ye. Te xwest bi polîsan re çareser bikî. Te axaftina b ime re nepejirand." Lez û bez çû.

Heta êvarî wextê xilasbûna kar jî ev rewş domand. Carina jî em diciviyan û me nîqaş dikir bê ka emê ji vir û şûnde çi bikin. Di nava karkeran de yên ev rewş ne diecibandin jî hebûn. Li hinek ûnîteyên din ên kar dikirin hebûn. Ji bo êvarî wext hat dayîn. Emê di wê demjimêrê de li hev bicivin û nîqaş

bikin. Em belavbûn, me di civîna êvarî de biryar da; emê Girevê bidin destpêkirin! Dê destpêkê diruşma werin nivîsandin. Hinek ji bona nivîsandina wan hatin erkdarkirin. Emê jî, her yek ji me dê li wesayîta servîsê ya kul ê siwar dibe bi karkeran re bi-axive û hemû karkeran vexwîne girevê. Emê armanca girevê vebêjin. Lîsteyek ji heftî û pçnc kesan pêk tê hatiye amadekirin. Lîsteya karkerên ku bê tazmînat ji kar hatine derxistinbû. Ji min destpê kiribûn. Dê roja paştir ev lîste bi deriyê kargehê ve bixistan. Ji karkerên kevin, heta yên nû hemû amade bûn. Ya hatî destpêkirin, weke tevgerek paqijkirinê bû. Me her tişt dabû ber çavan.

Ez fermî ji kar hatibûm avêtin. Lê roja paştir servîsê siwarbûm. Çend endamên kargehê aciz bûn. Ji tirsa jî ne dikariyan destwerdin. Ez ne rûniştim. Min yekser li pişt ajoker, şipiya dest bi axaftinê kir. Min behsa şert û mercên xebatên kargehê, sendîka, ji kar avêtin, anîna polîsan tevan kir. Got; " dê îro em û sibe jî hinek din vê rewşç bijîn. Karsaz tenê li pey feydeya ku bidest bixê ye. Yek xoleyê jî vala derbas nake û me dide karkirin. Lê dema em hinek mafên xwe yên bingehîn dixin rojevê, me bi zora polîsan ji kar derdixe. Em nikarin vê qebûl bikin. Em ne kole ne, karker in. Hilbijartina sendîka mafê me ye. Di heman demê de nûnerên ku vîna me esas bigirin hilbijartin jî mafê me ye. Dirêjkirina wextê xwarinê ya ku bîst xoleke mafê mey ê xwezayî ye. Ji pereyên me dixwin. Gelek kêm didin me. Ev ne avans e, tenê pereyê ji bona têrkirina zike. Gelo pereyên din kî dibe? Gelek pirsgirêkên me hene. Emê bi xwe van pirsgirêkan çareser bikin û ew hêza me jî heye. Em îro diçin girevê." Çepka dan. Lê ne hemû bûn. Ne neçarbûn ku çepka jî bidin. Diyar bû bê daxwaz bûn, ti bersivek ne

dixwestin. Bêdeng diçûn karê xwe û dihatin. Ev girev jî ji kur derketibû. Lê meyla giştî girîng bû. Ya bawerî dida mirov jî ev bû.

Me biryar girtibû ku dê serwîs ne ketiba hundur. Karkerên destpêkê hatîn mil bi mil derî bigirtan. Me ji şofor re got rawest e. Em ji wesayîtê peya bûn, bes hinek daneketin. Hinek jî piştî peya bûn bi meş derbasî hundur bûn. Piraniya van karmend bûn. Pankart hatin daleqandin. Me bi diruşmayan serwîsên din pêşwazî kir. Demek kin de dihol û zirne hat. Zîndewariyek mezin ava kir. Hinek rabûn govend gerand. Serwîsek tije hat. Lê bi lez derbas bû. Li hundur daketin. Di nava wan de yên dixwestin tevlî me bibin hebûn, lê cesaret nedikirin werin.

Nîvê sêsed û pêncî karkeran di girevê de bûn. Yê din jî kadre bûn. Tevî ku roja destpêkê bû, ev hejmar ne kêm bû. Em dihizirîn ku yên nû jî tevlî bibin. Erênî nêz dibûn. Lê em texmîn dikin dibe ku berovajî l ime bizivire. Ger em hinek xebatkarên din jî tevlî xwe nekin, hinek xebatkarên di nava girevê de ne, lê dixwazin kar bikin dibe ku derikevin. Divê em xebatê bişehitînin. Ji ber karkirina hinek mekîneyan jî cesaret dida karsaz. Em dikarin çawa bandor bikin? Dema katjimêra xwarinê de karker diçûn xwarinê me diruşma diqêriya. Em di-axivîn û bang wan jî dikir.

Me cihek dûr bi koma Zanîngehê re hevdîtin pêk anî. Komek rewşa girevê diparasta. Demanceyên wan hebûn. Me mîsoger dizaniya ku dê polîs destwerdin. Lewma em bi komî tevdigeriyan. Ji ber qad zêde ne baş bû. Aliyek kargehê cok, aliyê din jî dîwarek bilind bû. Em li pêşiya dîwarê bilind bûn. Cihê ketina hundur bi qasî sed û pêncî- du sed metre bû. Hêsan dihat girtin. Ger polîs bihatan dikariyan pêşî bigirin. Me jî

xwarina xwe ya nîvro dixwar. Nan, zeytun û pîvaz anîbûn. Em kom bi kom rûniştine. Her kes bi komekê re di-axive. Me dixwest helwestên wan fêm bikin û hewl dida wateya girevê bi wan bidin fêmkirin.

Karkerên li xwaringehê bûn cardin derbasî kargehê bûn. Wê demê jî hinek j ime ket navberê û hewl da wan di mijara girevê de qane bike. Di navbera me de bi qasî pêncî metreyan navber heye û em jî bi qîr di-axivin. Her kes li ber deriyê hêsin ê ketina kargehê de li hem kom bûye. Tam di wê kêliyê de otobûsek tije polîs daketin qadê. Li pey wê jî dolmuş û taksî hebû. Polîsên bi mertal em dorpêç kirin. Yên sivîl derbasî hundur bûn. Em dişopandin. Karsaz û hinek personelên din em didan nîşan.

Ji hevalên karker ên bi tecrûbe hatin cem û em hişyar kirin. "hinekê xwe bidin hundur. Binêrin polîs we destnîşan dikin, dê ev polîs destpêkê we bigirin. Lê hûn bikevin nava me dê nekaribin hêsan we bigirin." Mafdar bûn. Lê di karên wisa de ger tu ne li pêş bî û hinek tiştan nedî ber çav nabe. Jixwe bi hatina polîsan re karker guman dijîn, vê carê jî tu xwe veşêrî, dê bê baweriyê ava bike. Lewma çi dibe bila bibe emê li berxwedanê xwedî derkevin û hewce bike emê bi polîsan re ling û dest şer bikin. Dê tirsên heyî jî wisa bişkin.

Me diruşmayên xwe berdewam kir. Em hemû li qadê komî civiyabûn. Ev jî ji xweber pêş ketibû. Hêjî me bi hevûdû dana nasînê berdewam dike. Polîsan ji nişkê ve êrîş kir. Yên sivîl di êrîşê de destpêkê ji jinan ez û ji zilaman jî Elî û Ekrem hedef girtin. Mahmure û Gulsim jî li pêş bûn. Lê dema berxwedanç destpê kir, Ûmran çûbû û carek din jî ne vegeriyabû. Min hinekê bi polîsên ku ez girtîm re şer kir. Hêza yên kêleka min jî

têra Ekrem nedikir. Dema ji yên ez girtibûm du kes ber bi wan ve çû alîkarî, min xwe ji nav destê yên din rizgar kir û bi hemû hêza xwe baz da. Min carekê de dît ku li pêşiya min hinek polîsên ku dane pey hevalan hene. Ji bona navbera min û yên li pey min ketin fireh bû, min ji xwe re got; "temam ez ji destên wan rizgar bûm." Tam di kêliya ezê koçeyê bizivirim de polîsên li pêşiyê ne ez girtim. Yê li paş digot; "hişk bigirin bernedên wê kaltaxê. Serkêşa wan e. Pehîn jî li me da, ezê niha nîşa te bikim" û bi ser min de dihat. Ew polîsê alçak pir hovane êrîş dikir. Duyan milên min, wî jî porê min re girtibû. Her kêliyê serê min paşve dikişand, situyê min pir dêşiya. Bi copan jî li lingê min dixistin. Min dizaniya tola pehîna ku mun li wan dayî digire.

Em hatin pêşiya otobûsê. Yê telsiz di dest de bû ji emniyetê bû. Got; "ma we anî. Temam. Bes e ji xwe hundur tije bûye." Dema porê min berda, min çend xolekan ne karî situyê xwe rast bikim. Yekê got; "derbasî hundur bibe." Polîsek weke îzbandotan tam di derî de aliyê hundur rawestiya bû. Min çawa lingê xwe avêt ser merdîwena otobûsê ji paşve çend darbeyên copên tund li pişta min ket. Ez di ya duyemîn de ketim. Yê li jor destwerda got; "bedre, êdî bes e." Polîs jî got; "rabe, were hundur." Min nedikariya rabim. Bi milên min girtin û ez ji erdê rakirim. Hundur li ser her kursî du kes hebû. Ji dev û lêvên hinekan xwîn dihat. Çavên hinekan werimî bûn. Ser û porê hinkan jî berbelav bibû. Dema me hevûdû di wî halî de dît em bi hev keniyan. Polîs got; "jixwe hûnê bikenin. Hûn bi halê xwe dikenin, binêrin hûn çi qas xweşik bûne" û wî jî kena xwe bi me dikir. Bi kenê me aczi dibû.

Em yekser birin qerekola Alsancak. Em nêzî bîst kesan bûn. Qerekol li qirexa behrê bû. Heta em çûn hewa pir sar bû. Wir jî sar e. Ji ber bazdan û şerê me yê bi polîsan re me xwêdan dabû. Lewma dema xwêdana me cemidî me jî seram girt. Em jin birin odeyekê û xort jî birin odeyek din. Heta demekê kes nehat cem me. Pankartên li cihê girevê jî girtibûn. Em di navbera xwe de di-axivîn ku emê bêjin; "hêcetên me yên girevê hebûn. Emê cardin wan dubare bikin. Weke din emê bersivê nedin ti pirsan." Em di wesayîtê de jî ji bo bersiva me bi dizîve axivîbûn. Jixwe polîsan jî em hilbijartibûn. Yên ku hatibûn girtin jî dikariyan helwest raber bikin. Asta wan baş bû. Di navbera me de hinek karkerên ku hêjî ne di ferqa pirsgirêkê de jî hebûn. Hemû jî mirovên zêde dirustbûn. Agahî ne didan polîsan. Herî dawî bang min kirin. Li du cihên cuda îfade dihat girtin. Destpêkê pankart dixwendin. Pirs dikirin 'ev tê çi wateyê.' Me jî digot; 'wateya wê pir vekiriye.' Pişt re yekê xwe kir ji Tuncelî! Got; 'ez jî ji Dêrsimê, Elewî me.' Nasnameyên me di destên wan de ne, ji kargehê girtibûn. Ji wir dixwendin. Digot; 'Gundê Tahtuhalîl nêze, ez bawerim ez wî gundî nas dikim.' Bi hîle weke ku dihizire û cih dizane bîne bîra xwe nêz dibû. Paşê yek din tund û bi dengek hişk got; "kî îfada xwe da got, serkêşa me Sakîne ye. Ev ji rûyê te jî diyar dibe. Ma qey dibe yek ji Dêrsimê be û ne komînîst be?"

Polîsê din ji navberê derdikeve. Ez jî bêdeng û weke bê xem disekinîm. Got; "çima hûn bê destûr û bê qanun gireveê dikin? We çima ev qas karker jî têkil kir. Ma ne heyfe, we risqê wan qut kir?" Bê naver di-axivî. Ez dihizirîm ku ger hinke pirsên rast bike ezê besivê bidimê. Dema li benda bersiva min dima, min jî bersiva xwe dida. Min kurtasî hemû daxwazên me

rêz kir. Bicihanîna van mafê karkeran ê herî xwezayî ye. Girêv jî di ravekirina van daxwazan de rêbazek bû. Min got, mafê me yê girevê jî heye. Min ji pirsa serkêşiyê re jî got; “ vîna her kesî heye, kes ji kesekê re serkêşiyê nake.” Mahmure beriya min ketibû nav kar. Di vê mijarê de em li dijî hev didan bikaranîn. Piştî min bangî wê kirin û gotibûn; “ sakîne gotiye tu serkêşê wan bûyî.” Ji ber Mahmure jî rewşê dizane dikene -jixwe kesek tim rûken bû- û dibêje; “li her kargehê girêv çêdibin. Nûnerên karkeran hene, berdevkên wan hene. Hûn jî van tiştan dizanin.”

Em wê şevê li qerekolê man. Em hemû sibehê hatin berdan û bi hev re çûn kargehê. Em tev ji kar hatibûn avêtin, lîsteya fermî jî bi derî ve kiribûn. Em ji wê derê çûn cihek ku em bikaribin hê rehetir bi-axivin. Hinek jî çûn malên xwe. Karên malê jî Mahmure birêxistin kir û me nîqaş kir. Divê em vê rewşê ji raya giştî re ragihînin. Em hemû hemfikir bûn. Heftî û pênc mirov bê tanzîmat ji kar hatibû derxistin. Ev ne rewşek biçûk bû. Ger li dijî vê helwest neyê raberkirin û ev rewş neyê eşkerekirin, dê ji kar derxistin zêde pêş bikevin. Dê rêxistinbûna karkeran jî xirab bandor biba. Di vir de pêşniyara gireva birçîbûnê çêbû. Em di navbera xwe de gihiştin encamekê. Piraniya ku tevlî civînê bûyîn ji gireva birçîbûnê re amade bûn. Her kesî xwe pêşniyar dikir. Di encamê de me biryar girt em çar jin û pênc zilam girevê destpê bikin.

Me di nava rojekê de amadekariyên xwe xilas kir û li Konak’ê, li ber peykera Hesen Tahsîn ber bi êvarî demjimêr pêncan de dest bi amadekariyên çalakiyê kir. Ev hem hinekê ji xweber, hem jî hinekê di encama nîqaşên me de derketin holê. Lê yên ji HK’ê bûn piranî bi rêvebirina rêxistinê ve dimeşiyan. Ger qadroyên wê biryar dabin û an jî pêş de hatibe hizirîn,

dikarin wê di asta biryarê de pêk bînin. Min rast didît. Min di nîqaşan de jî nêrîn û pêşniyarên xwe kirin. Ez jî li ser vî bingehî beşdar bûm. Gumana gelo dibe ku şaş be tineye. Me ne karî yekser yek du hevalan jî bibînim. Bûyer tev bi lez pêş ketin. Ez jî ji xwe re dibêjim; "rast e. Hewce ye û emê bikin." Di vê mijarê de bi xwe û hevalên komê bawer im. Helwestên giştî erênî ne. Piştewaniya berxwedaniyê dikin û bi birayr in. Jixwe Partiya Komînîst a Tirkî (TKP) û yên din tine ne. Di kêliya girevê de ji holê winda bûn. Xwedî ti pşêketinî derneketin.

Ez çûm malê. Westandina du sê rojan li ser min heye. Baqî û Yusuf Metîn hatin. Yusuf Metîn her bi dil germî û rû kenî dest bi axaftinê kir; "ma gelek cop l ite xistin. Derbasbûyî be." Lê diyar kir ku ew jî pêşketinên rû dane ji rêzê nabîne. Dema em destpêkê hatîn Îzmîrê me bi wî re qîr û qiyamet nîqaş dikir. Rewşa wan, asta wan a teorîk û tecrûbeyên van ve, di mijara rêxistinê û şoreşgeriyê de ecemîtiya min, bêtecrûbe û nezaniya min pir vekirî li holê bû. Lê tevî vê bi înat bûm. Min bi rastiya wê bawer kiribû û di her şert û mercî de diparast. Ne Kurdewariyek teng û çors bû. Cewherek şoreşgeriya welatparêz hebû. Ez ne xwedî wê hêz û jêhatiyê bûm ku di her astê de nûnertiya tevgerê bikim. Lê ez bi israr bûm ku di bin her şert û mercî de parazvantiyê bikim û her tişta erênî ya ku bandor dikir bikim. Ez li Îzmîrê bûm. Ez her gavê ne diçûm min Kurd birêxistin nedikir, an jî min peywendiyên xwe tenê bi wan re sînordar nedihişt. Berovajî vê min bi her derdorê re nîqaş dikir û li kargehan jî din ava berxwedaniya karkeran de bi wan re bûm.

Yusuf Metîn pir manîdar axivîbû. Keyfa wî jî ji helwestên min re hatibû. Di heman demê de biryara me ya gireva birçîbûnê jî erê dikir. Weke ku Yusuf Metîn din ava HK'ê de yeke cuda bû. Di pêvajoya pey re Yusuf Metîn jî weke Metîn Yildirimtûrk li mala rêxistinê fîşek li serê wî xistibûn û kuştibûn. Dema min ev agahî girt, ez pir xemgîn bûm.

Gelo kî di nava HK'ê de kî paqij dikir? Ev pirs ne nû ye, hê wê demê jî dihat kirin. Kesên ku gerim nêzî şoreşa Kurdistanê dibûn û kesên di vê mijarê de xwedî helwestên rast bûn, dihatin kuştin. Li Dîlokê jî Îlhan û Mehmet Elî bi heman şêwazî hetibûn kuştin. Ez di wê baweriyê de me gelek tiştên ku divê di dîroka şoreşa Tirkî de hesab were pirsîn heye. Divê teqez şoreşger hesabê vê bipirsin. Baqî xemgîn bû. Li gorî wî rewş xeternak bû. Êdî ez jî di her mijarê de bi xwe biryar Didim. Tenê agahiya encamê Didim wî. Ev alî jî bandor dikir. Yan din jî dema ez diketim xeteriyan bandor dikir. Hem kêfa wî dihat, hem şahnaz dibû û hem guman dijiya.

Her tişt têkilhev dibû, yan jî êdî "tîr ji kevanê derketibû." Ez ji bona têbikoşim ji malê derketibûm. Ne dibû ku ez xwe bi malek din ve girê bidim. Dibe ku gelek tişt ne dihat kirin. Lê dîsa jî bi her tiştî ve tevlî şer û jiyanê bûyîn cuda bû. Ger şaşî jî hebûna, dê bi demê re werin sererastkirin. Di vê mijarê de ti gumanên min ên mezin tine bûn. Ya rastî min dikariya tiştên cuda jî bikim. Ger pêwendiya min yekser bi hevalan re hebûya, dê min bikariya şaşiyê wê demê zûtir bidîta û derbas bikira. Zêdetir gumanê min ew bû ku ez li dijî tevgerê nêzîkbûnek şaş bikim. Min tiştê ku hîn bûme û pê bawer bûm ku aîdê me ye heta dawî diparast. Lê ger min di mijarek ne dizaniya, an jî şaş dizanî de, kêmasiyek bikira, dê çi biba? Gelek caran mijara ku

ez tengav dikirim ev bû. Ji ber hêza min a nirxandina bûyer, diyarde û xwe di navê de dîtin û nirxandin ev qas bû.

Meha Adar'ê ye. Me roja paştir li komaleyê pankart daleqandin. Li ser qartonan, "Bimire Şovenîzm, Şovenîzma Civakî! Bimire Mêtîngerî, Emperyalîzm û Her Cure Paşverûtî! Bijî Enternasyonalîzma Proleterya! Hatibûn nivîsandin. Weke din jî hinek diruşmayên ku daxwazên me rave dikin jî nivîsandibûn. Diruşmayên ku min destpêkê pêşniyar kiribûn, weke diruşmayên devrî daxwaz û armancên me nirxandin û dijî derketin. Lê dema min ferz kir nivîsandin.

Dê êvarî li meydana Konak demjimêr pêncan de yên ku derve de komên ku piştewaniya me bikin hebin. Ji ber karker û karmend di wan demjimêran de belav dibin. Di wê demjimêrê de meydana Konak pir qelebalix dibe. Weke din jî hem ali cem îskelê ye. Min û Gulsim weke jinên karker ên ji rêzê cil li ber xwe kirine. Me gomlek û etek û binde jî pantor li ber xwe kiriye. Li serê me jî şelpe heye. Me bi yazma derdora wê hunandî pêçaye. Mahmure û Esma asayî li ber xwe kirine. Her yek ji me di rêyên cuda de em ber bi Hasan Tahsîn ve diçin. Her kesî pankartên ku vekin jî bi xwe re biriye û her yek komek daxwiyanî jî girtiye cem xwe. Emê behsa hemû mijarên weke pêşketinên li kargehê, derxistinên ji kar, serdegirtina polîsan û binçavkirinê tevê bikin. Dê ji jinan ez, ji xortan jî Ekrem bi-axive. Em tam demjimêr pêncan li ber peykerê rawestiyan. Me ji bona pankartan sitûnê dar çêkirine. Rakirna wan çend xolek jî derbas nekir. Ji ber erd çîmen û axa nerim bû, me di çend xolekan de çikandin. Min yekser dest bi axaftinê kir.

Hê min hevoka xwe ya yekê xilas nekirî polîsan êrîş kir. Dema wan em dixirikand jî, me axaftina xwe berdewam dikir. Di wê navberê de ji nava koma qelebalix diruşma qêriyan. Polîsan êrîşî wan jî kir. Her kes û dolmuş jî rawestiyane. Carekê de rewşa meydanê hat guhertin. Mirovan bi mereq temaşe dikir. Yên ji bona fêm bikin çi dibe hevûdû dehf didan û xwe didan pêş hebûn. Polîsan di navbera me û qelebalixê de bendek ava kiribû. Em bi lêdanê derbasî dolmuşan kirin. Lê kêm zêde hat fêmkirin. Jixwe me li ser pankartan jî nivîsandibû, " me dest bi gireva birçîbûnê kiriye!" Yên xwedîn fêm kiribûn. Dema em jî hemû axivîn parçe parçe hat fêmkirin. Em cardin birin qerekola Alsancak. Heman polîsan em pêşwazî kirin. Yek bi yek îfada me girtin. Di nava pankartan de diruşmaya, " Bimire Şovenîzm, Şovenîzma Civakî" bala wan dikişîne. Herî zêde jî li ser wê rawestiyan. Gotin; "ev karê te ye." Lê duvikê her du 'ş'yan jî tine bû. Bi şêwaza "Sovenîzm û Sovenîzma Civakî" hatibû nivîsandin. Ji lezan ne hatibû temamkirin. Bi rastî bala me jî ne kişandibû.

Em gireva xwe ya birçîbûnê didomînin. Gireva birçîbûnê kirine serê xwe. Digotin; "me girev fêm kir, diruşma fêm kirin, lê ev gireva birçîbûnê çiye û ji kur derket. Hûn çima eziyetê li xwe dikin, hûnê xwarinê bixwin." Berî wê ji me re xwarin ne tanîn, niha jî ferz dikin û xwarin anîne. Tevî ku dizaniyan em naxwin anîbûn. Ew jî rêbazek çewsandinê bû!

Me yuekser parêzek girt. Em roja duyem êvarî hatin girtin û em şandin girtîgeha Bucak'ê. Weke ku dadgehê berê biryar dabû, yekser got; "hûn girtî ne."

Me wê demê bihîst ku li girtîgeha Buca jî hinek bûyer hatine jiyîn. Heta girtiyan îsyan kirine û agahiyên weke girtiyan girtîgeh şewitandine hatin. Dîsa dihat gortin ku êşkence li girtiyan kirine. Mînak dihat dayîn. Weke girtiyan dixin torbeyan û psîkek kovî jî li cem dixin torbe û devî girê didin. Her ku bi dar li wan didin, psîk jî bi lepên xwe girtî dimeritîne û di nava xwînê de dihêle. Nûçeyên bi wêne û serenavên weke " li Girtîgehan Îsyan" derketibûn. Me Buca bi vî rengî bihîst. Berî wê ez yek du caran li Dêrsimê çûbûm serdana Îbo wan. Weke din jî min qet ti girtîgeh ne dîtibû. Min di filman de dîtibû. Ew jî cihên girtiyê edlî bûn. Bi taybet di filman de rewşa odeyên jinan pir ecêb bû.

Wesayîta girtîgehê hawîrdor girtî, weke wesayîta cenazeyê bû. Me di rê de rawestan, hinek tiştên weke şîr û biskuvî kirîn. Me biryar da ku em gireva birçîbûnê bi encam bikin. Rewşek bi girêdayî girtîgehê nebû, gireva birçîbûnê gihabû armanca xwe. Jixwe roja duyem hemû rojnameyên xwecihî û hinek jî yên rojane kiribûn nûçeya serenav. Me hemû rojname jî kirîn. Hinek wêneyên me yên li me dixin hene.

Girtîgeh ji derve de dişibe kargehek mezin. Ji girtîgeha li Dêrsimê pir cuda ye. Em ji bloka destpêkê li çepê zivirîn. Kargeriyên derbarê me de hatin kirin. Gardiyan û leşker têkil hev bûn. Ewlekariya derve ya leşkerane, di nava hev de bi rêveberiya sivîl re dimeşînin. Dema sedema girtinê ya dadgehê dixwînin, hîn zêdetir rêzdar nêz dibin. Qet nebê tişta dixwiya ew bû! Serkêşa gardiyanan a qelev got; " ka em jî çav li rojnameyan bigerînin." Hevalan jî da. Em di navbera xwe de axivîn, gelo dê derfetên hevdîtinê çêbe an na. Em vê jî nizanin. Hevalên xort gotin; " em dikarin bi xizman û bi girtiyên ji

heman dozê hatine girtin re hevdîtinê bikin.” Her wiha gotin; “em dikarin vê saz bikin.” Tê zanîn ku di hundur de girtiyên siyasî hene. Lê ji ber zêde jin tine ne, lewma kes êde tiştekê nizane. Banî gardiyana jin kirin. Jinek qelew û rûyê wê qemirî hat. Ji me re got; “xwedê we xilas bike.” Paşê ket pêşiya me, em gelek dorîdoran re derbas bûn, bi dehan deriyên hesin ên mezin bi mifteyan hatin vekirin. Herî dawî em çûn cihê ku ‘beşa jinan’ li ser hatiye nivîsandin.

Dema derî vebû li qeta jêr dengê çepkan û kenên bilind hat. Me li rûyê hev nêrî. Weke ku em ji hev re bêjin; “evder kudere?” Gardiyana jin bi wê laşê xwe yê gir ve bazdanê daket û ew hişyar kirin got; “keçno, keçno, bêdeng bin ên siyasî hatin.” Jixwe kesî nidibihîst jî. Heta gardiyan bala wan kişand em daketin jî. Em li hember dîmenên me dît mat man. Hew me dît li ser masê jinek ku jor de tenê sûtyen li xwe kiriye, jêr de jî dawa wê aliyekê ve girêdayî, cilê wê yên binî dixwiyê û bi vî rengî lotekan tavêje. Yên li derdora wê jî xelekek ava kirine, hinek çepka didin, hinek jî dengên ecêb derdixin û stranan dibêjin.

Mahmure got; “ hevalno em hatine timarxaneyê.” Gardiyana jin cardin bi dengê bilind qêrî, di heman demê de qelebalixa heyî ji hev cihe kir û bi destê xwe dawa jina li ber masê girt û hejand. Dawa wê daxist, dixwest rawestîne. Yê em dîtin gotin; “ay, ay” û bêdeng dibûn. Ya li ber masê jî destpêkê bê xem nêz bû, paşê daket. Nêveng ji nişkê ve bêdeng bû. Her kes ji hev dipirse, “ev kî ne?” Yên hîn dibin dibêjin; “keçên siyasî ne.” Jixwe gotina siyasî bes bû. Em jî dibêjin “Şev baş” û li aliyekê rûdinin.

Qeta jêr hem weke xwaringeh û hem weke ode tê bikaranîn. Me rojname vekirin. Karê me yê destpêkê em şîroveyên heyî bixwînin. Nivîsên weke, “ karkerên kargehê di gireva birçîbûnê de ne.” Di wêneyan de hem polîs me dixirikînin, hem jî copên xwe rakirine l ime dixin. Li binya wê jî ev nîvis heye.

“heftî û pênc karker bê tazmînat ji kar hatine derxistin.” Nivîs dirêj berdewam dike.

Hemûyan jî şîroveyên erênî kirine. Me jî got; “gireva birçîbûnê giha ramnca xwe.” Ez jî em kêfxwe kirin. Lê girtina me her tişt xirab kir. Sê-çar ciwanên zanîngehê jî bi me re hatine girtin. Ew jî yên bi diruşmayên xwe ve piştewaniya me kiribûn. Em hemû donzdeh kes bûn.

Hat piştrastkirin ku li girtîgehê ‘îsyan’ rû daye. Berî demekê jina ku bi tena xwe girtiya siyasî ya di nava beşa jinan de bû, durgunî Manîsa kirin. Li beşa zilan jî Orhan Baqir heye. Bi destê gardiyan not şand ji me re. Pirsa pêdiviyên me dikir. Orhan Baqir kesek ji TÎKKO dihat nasîn. Eslê xwe Ermenî ye. Min navê wî beriya niha jî bihîstibû, ji Qerekoçanê ye. Nota wî ji bona bû moral. Roja paştir me hev dît. Êdî ew dibe kesê ku tê hevdîtina min. Pê hesiyaye ku ez ne ji HK’ê me. Jê re gotine, “Şoreşgera Kurdistanê ye” û mereq kiriye. Me di wê hevdîtina kin de mijara Mîllî nîqaş kir.

Beriya ez nas bikim, navê Orhan Bakir tim Îhtîlalcî tanî bîra min. Min mereq dikir û li hember rêz digirt. Min şoreşgerên bi vî rengî weke şopdarê kesayeta berxwedanvan a Brahîm Kaypakkaya didît. Tevî ku min sedema wê ne dizaniya, bes ji ber Ermenî bû ez hê zêdetir nêz dibûm. Dibe ku ji ber ew jî gelek bindest û hatibû qirkirin bû lewma ez nêz dibûm, mad ê cuda çibe?

Piraniya girtiyên jin, ji ber dizî, zina û kuştina zilaman girtîbûn. Pevçûnên qereçîyên "Boxçecî" yên roj qet xilas nedibû! Carina porên hev digirtin. Lalîk û beroş li hewa li hev diketin. Dûjînên ku mirov şerim dike bilêv bike ji hev re dikin, pey wê re jî rûdinîştin derdora heman sifrê û bi hev re xwarin dixwarin. Ev şebekeyên mezin bûn. Diziyên wisa ji rêzê nedikirin. Diziya van di astek wisa de ye, ku dema bêne girtin zêr, pere û avahiyên ku bikaribin demek dirêj hem wan û hem malbata wan xwedî bike ye. Lewma dema jinên wan hatin girtin, divê zilamên wan zêde xwarinê bînin girtîgehê. Sewze û fêkiyên demsalê yên herî nû, zêde mirîşk û goşt ji wan re tanîn. Lewma "axayên" odeyê bûn. Ji ber vê hem gardiyan û hem girtiyên ku rewşa wan a madî ne baş in, hewl didan bi wan re baş bijîn. Dest wernedidan şerê wan û bê helwest diman.

Yên ji ber zinayê hatine girtin, di nava komek din de bûn. Yên ji ber erazî û namûsê zilam kuştine, zêdetir hewl didan xwe nêzî me bikin. Di encamê de me bi hev re li cihekê jiyan dikir û em neçarbûn ku sazûmaniyekê ava bikin. Nexwe me nedikariya em katjimêrekê bi hev re bijîn. Piştî demekê Sema jî hat. Sema ji Edremîtê bû. Sema'ya ku me li kargeha Basmanê bi hev re kar dikir û bera me dayîn. Em çûbûn gundê wan. Ew, bira û jina birayê wê ji HK'ê ne. Mirovek cewherî û xisletên wê yên bedew hebûn. Kesek rêzdar, baldar e. Pey re Suna'ya ji Ciwanên Şoreşger hat. Em wisa bûn şeş kes. Her ku "girtiyên siyasî" zêde dibin, hewaya girtîgehê jî tê guhertin.

Komîna me ya hevbeş heye. Komîna me çend jinên ji ber kuştina zilaman girtî jî anî cem xwe. Me ji rabûna sibehê heta êvarî bername ji xwe re çêkir. Em sibehan werzîş dikin. Hevpar kar dikin. Pirtûkan dixwînin û nivîs dinivisînin. Ji TV nûçeyan

guhdar dikin. Dema em nûçeyan guhdar dikin, her kes mîsoger bêdeng dibe. Gelek caran hinek ji me kes naye serdana me. Jixwe komale pêdiviyan komî bi navê me tevan dişîne. Pereyan jî bi navê me tevan dişînin. Ez ji vê aciz nabim. Weke tişta hewce dibînim. Tenê ji rojnameyê re dinivisînin û dipirsin ezê jî îmze bikim an na. Dema dest bi nivîsê dikin jî, bi nêrîna mirov destpê dikin. Ez jî ji wan re dibêjim, ger hûn bûyeran weke heyî binicisînin ti pirsgirêk tineye. Ango li şûna ku bûyeran bi hejmarî rêz bikin, her çendî ez li wir yek kes jî bim, ger bi navê Şoreşgerê Kurdistanê were dayîn dibe, lê qet destûr nadim ku taybet navê min were dayîn. Ji ber tenê navek tiştekê rave nake. Ez ji wan re dibêjim ez çime û ez bi navê çi beşdarî vê berxwedanê bûm, divê ev were bikaranîn. Piştî ku nivîsên xwe diqedînin, ji min re dixwînin. E tevlî hinek mijaran nabim û rexneyên xwe jî dikim. Dibêjin, "emê sererast bikin." Li hinek cihan ji ber min pêşengî kiriye, ez derxistime pêş, behsa pêşengiya min kirine, lê ez bi kîjan giyana siyasî, kîjan navî, nasnameyê beşdar bûme, ev ne diyarin. Ez jî weke hevaleke wan dame nîşan. Ji bona rojnameya Rizgariya Gel a wan, ji min re dibêjin; "tu jî dikarî binivisînî, emê cuda di rojnameyê de weşînin." Min jî ji wan re got, ne hewce ye.

Paşê min dît ku di hejmara yanzdeh û danzdeh a Rizgariya Gel de hinek nivîsên navên min jî di navê de hatine weşandin. Weke ku min îmza daniye hatiye weşandin. Min hemû rojname xwestin. Ew rexne kirin. Ez bawer im di hejmara sêzdehan de rewş hinekê cuda diyar dikin. Didin diyarkirin ku ez Şoreşgera Kurd im û çalak tevlî dibim.

Em li heman komînê ne, lê tim jî nîqaş dikin. Dem bi dem nîqaşên hişk jî rû didin. Carina nîqaşên me heta asta xeberên siyasî jî dirêj dibin. Ew me weke netewperestên burjuvaziya biçûk tewanbar dikin, ez jî wan bi şovenîzma civakî ve tewanbar dikim. Nêzîkbûna min ne tewanbarî bû, bi rastî jî bandora şovenîzmek pir hişk dijiyan. Bi taybet Gulsima ji Manîsa ku nasnavê wê "keça reş" bû pir şoven bû. Mahmure û Esmehan hinek din nerim bûn, mirov dikariya bi wan re nîqaş bike. Nirxandinên di kovaran de derdiketin, dibûn sedem ku nîqaşên me tim bidomin.

Birayên min Meto û Heyder hatin serdana min. Ji xizmên min ên din Baqî û Îbo jî carê tên. Rojekê Çetîn Gûngor (Semîr) hat. Heman weke hatina Şahîn ez mat kirim, kêfxweş bûm û ez ji kêfa difirim. Girêdana rêxistinî pir cuda bû. Bi Heyderê ji Surucê re hatibû. Dîsa gelek pêşketin ragihandin. Şahîn xwesteka min a çûna welat ragihandibû wan. Min behsa pêvajo kir. Min ji wan re got min çenteyê xwe jî amade kiribû. "Lê ez çawa derbikevim ezê yekser werim. Êdî kes min nebê jî, ezê bi xwe li wesayîtekê siwar bim û bêm." Min hinekê behsa hundur ji wan re kir, ew jî keniyan. Rewşa min baş û bi moral dîtin. Dîsa min ji wan re got; "pêşketinek têkildarî dadgehê tineye. Em karker in. Ji bona em pirsgirêkan ragihînin raya giştî me çalakiya gireva birçîbûnê pêk anî û emê dîsa lê xwedî derkevin." Ji xeynî vê tiştek din ne hat gotin, bes Çetîn Gûngor got; "emê carê werin û biçin." Roja dadgehê diyar bû. Birayê min Heyder û Heyder'ê ji Surucê tevlî rûniştina destpêkê bûn.

Her ku dem diçû min ji birayê xwe Heyder êdetir hez dikir. Hişyariya wî, şopandina dadgehê pir baş bû. Piştî şerê me yê destpêkê doz dabû. Ev yekbûna me xweşik bû. Girêdana bi

sozê bû. Min ji xwe re digot; “bawer im êdî Heyder ji me venaqetê.”

Ez û Gulsim cardin bi şalvar û yazmeyên derdora wê pêçayî çûn dadgehê. Xil û bergên me yên li girtîgeh û yên li dadgehê ji hev cuda ne. Girtiyên din û personelên girtîgehê mat dimînin. Yên din wer dihizirin ku ez sembolîk cilên Kurdînî li ber xwe dikim. Çawa wesayîta girtîgehê diket rê me dest bi diruşma û sirûdan dikir. Me di rê de bala her kesî dikişand. HK’yan biryara komê girtibûn. Ji ber dê ji derve de jî ji bona şopandina dadgehê bihatan, dixwazin vegherînin qada xwepêşandana siyasî. Min jî ev rast nidirxand.

Em sirûdan bi hev re dibêjin. Wan diruşmayên xwe, min jî diruşmaya xwe diqêriya. Lê belê, bi tenêbûn, diruşmaya kesekê tenê baş nedibû. Dîsa jî min li cihên ku hewce didît diqêriya. Li pêşiya dadgehê qelebalix bû. Ew jî tevlî diruşmayên me dibûn. Min jî digot; “Bimire Mêtîngerî!” Yên bi dengek bilin pitewanîdan min çêbûn. Ez mat mam û min li wan temaşe kir. Hew min dît, birayê min Heyder û Heyder’ê ji Surucê û çend kesên din hene. Ez pir kêfxweş bûm. Min got êdî ez jî ne bi tenê me.

Beriya dadê em li qeta jêr rawestandin. Me li şûna diruşmayan sirûd gotin. Leşkeran tiştek ne got. Xebatkarên dadê û yên karên wan li dadê hene mereq dikirin, dixwestin dakevin heta qeta jêr û li me binêrin. Lê serbaz nehişt. Dad kin domand. Nasname hatin destnîşankirin û îfade hatin girtin. Piştî îddîaname hat xwendin dadgeh hat taloq-kirin. Daxwaza parêzeran a berdanê hat redkirin. Ji ber îdîayên xwepêşandanên bê destûr û li dijî polîsan mukavemet heye. Parêzeran got, girev bi zagonî ne, gireva birçîbûnê jî ji ber karker bê mafî ji kar têne

derxistin hatiye kirin. Armanc dengê xwe dana bihîstine. Ne weke îddîanamê destnîşan kiriye, berovajî polîs çewsîner nêz bûne, di laşê girtiyan de dewsa lêdanê heye. Tevî ku ew qas dem serve çûbû, hêjî dewsa lêdana wan hebû. Lê mixabin dadgehê qet bala xwe jî neda wan xalan. Helwestek polîtîk raber kir. Bi tayber li ser ên ji derve de beşdar bûne radiwest.

Ez cara yekê ye bi vî rengî derdikevim dadgehê. Li dadgehê "tewanbar" dîtin û "hatina darizandin." Gelo tişta dihat darizandin çibû? Gelo tişta ku divê bihata darizandin çibû? Min derbarê dadgehkirinên Denîz wan de hinek beş xwendibûn. Min hinek pirtûkên derbarê yên di 12'ê Adar'ê de hatibûn binçavkirin, êşkence dîtibûn û rewşên ku wan jiya ne xwendibû. Lê wê demê ew rastî tev ziwa diman. Tenê aliyên wê yên berxwedanî û lehengî bandor dikir. Weke din jî bandorek hestewarî li pêş bû. Hînbûna bi jiyînê re pir cuda bû. Di vir de dewlet, zagonên wî, serdozgerên wî û huquqa wî derdiket pêşberî te. Wateya nivîsa mezin a "Edalet Bingeha Milk e" û tiştên heyî tev ji bo berjewendiya wî kirinê zêdetir ne tiştek din bû. Hinekan serdozger dinasiya xw di rê de şîrove dikirin. Digotin; " kesek faşîst e." Gelo yên din ji wî cudatir bûn? Jiyanê ev cudatî zêdetir şanî me dikir.

Dema em ji dadgehê jî derketin me diruşma qêriyan. Ma Heyder wan ew qas ji dil diruşma diqêriyan, bandor li her kesî dikir. Ên ji girseyên din jî tevlî bûn hebûn. Belê, diruşmaya "Bimire Mêtîngerî" dihat qêrîn. Hem jî li Îzmîrê li pêşberî dadgehê. Keyfa min pir ji vê re hat. Ên din jî diruşmaya ku pê bawer bûn xwedî naverokek enternasyonalîstî ye diruşmaya " netew azad in û divê gel yek bin" diqêriyan. Me jî bi diruşmaya "yekîtiya bi dilxwazî" bersiv dida. Ya rastî ne di rewşek

pêşbaziya diruşmayan de bûn em. Dibe ku me heman diruşma ne diqêriyan. Em ji diruşmayên beramber hev aciz jî dibûn. Lê em beramber hev rêzdarbûn. Me aliyê bi nakokî ne dida der. Em ji helwestên ne di cih de direviyan. Helwestên me ew tehrîk ne dikir. Her çendî aliyên wan ên şoven hebûn jî, em di rewşên wisa de bi hedar nêz dibûn.

Dema em çûn girtîgehê, personelên girtîgehê bi tevdîr û rêzdar nêz dibûn. Gardiyanên ku bi me re hatibûn dadgehê, yekser ji hev re gotin. Behs dikirin em li wir çawa nêz bûne, girseya kom bûyî û helwestên pêş ketîn tev vedigotin. Gelek ji wan digot; "divê em ji wan bitirsin, li dadgehê jî diruşma diqêriyan." Lewma nêzîkbûnên wan hatibû guhertin. Li gorî wan me serî li dewletê rakiribû. Bes li gel vê tevdîrên xwe jî digirtin. Zêdetir baldar nêzî yên dihatin serdanê, tiştên ku tanîn û mijarên dihatin axaftin. Di rojên hevdîtinê de cihê hevdîtinan dibû gengeşe(curcuna). Ji ber cihê hevdîtinan camekanin, dengê xwe gihandina yê miqabilî xwe bi serê xwe pirsgirêk e. Mirov serê xwe radike ber kuleka jorîn heta dengê dawî diqîre û di-axive. Jixwe ew axaftin tev ji aliyê hemû gardiyanan ve tê bîhistin. Lewma tiştên veşartî û divê kes nebîse me li ser qaxedekê dinivîst û me bi hevûdû re dida xwendin.

Roj derbas dibin. 1'ê Gulanê nêz dibû. Me biryar girt ku em di hundur de jî pîroz bikin. Me nîqaş kir. Wê bi gelemperî di çarçoveyek bernameyek hevbeş de were pîrozkirin. A herî rast jî ev e. Tê gortin kul i derve amadekariyên pir berfireh hene. Dê Stanbul li meydana Taksîmê were pîrozkirin. Agahî hat ku dê hemû kom beşdarî vê pîrozbahiyê bibin. Ev agahî em pir kêfxweş kirin. Em bi mereq li bendê ne. Gelo dê li Kurdistanê çawa were pîrozkirin? Ji xwe re dibêjim, dê

mîsoger heval jî tevlî ya Taksîmê bibin. Bes dê destwerdana polîsan a li Kurdistanê gelek cuda be. Hisê min dibêje dê teqez pevçûn rû bidin.

Me 1'ê Gulanê cilên xwe yên herî paqij li ber xwe kir. Serdanên li derve qerenfîlên sor ji me re dişînin. Wan dixin qawenozan û datînin ser dolaban. Bi me tevan re zîndewariyek heye. Me ber bi demjimêr nehan ve "form" danî. Me di heman kêliyê de li cihê hewa girtinê rêzgirt û diruşma qêrîn. Li girtîgehê dengê diruşmayan bilind dibe. Tevî ku hejmara kêm e, dengê me baş derdikeve. Em Kurdî û Tirkî diqêrin.

"Bijî 1'ê Gulan!"

Em bi mereqek mezin li TV temaşe dikin. Dewlet jî piranî behsa tevdîrên xwe yên polîsan dike. Dîmen jî piranî derbarê vê de ne. Di navberê de jî carê dîmenên Taksîmê û girseya din ava kolanan de diherike didin. Kulmên xwe yên çepê dihejînin û diruşmaya diqêrin. Dîmenek bêhempa û rakêşwere. Mirov germahiya şoreşê dihesiya. Baweriya ku şoreş bi vê girseyê re dibe zêdetir pêş diket. Çoşa yên li kêleka min zêde bû û diqêriyan. Têkildarî her tiştî de jî şîrove dikirin. Bi rastî jî pir zîndî ne. Ez neheqiyê ti kesî nakim. Ez ji wan û ji her kesî zêdetir bi çoş bûm. Ji ber ev kêfxweşiyek pir mezin bû. B imin re baweriya beramber çîna karker, baweriya beramber gelê Tirk, di lutkeya herî jorîn de bû. Zêde hestewar im, dilê min nasekine. Kêm maye dê ji cihê xwe derbikeve.

Li gel vê jî beriya welat dikim. Ji wî alî ve jî dilê min şikestiye. Xemgîniyek heye. Gelo dê çawa derbas bibe? Ev jî weke pirsekê dimîne. Lê dîsa jî meydana Taksîm'ê zêde bala min dikişîne. Ev parezvaniya fraksiyonan çi qas xirab e. Carina

ji hev re tiştên ku qet ne hewce ye dibêje û heta dide şerkirin. Nakokiyên bi vî rengî encamê jî nadin. Lê wisa têkoşîna bi hev re xweşiktire. Li Rusya Menşevîk, Bolşevîk, Narodnîk, Anarşîst ne kêm bûn. Gelo di vê manê de divê ev komên li Tirkî tiştek xwezayî werin dîtin? Lê yên pêşengî bikin tinebûn. Her kes dibêje em "proleterên herî baş in."Bi hemûyan re jî di nêzîkbûnên ji pirsgirêkên şoreşê de, aliyên hevbeş ên xirab hene. Di mijarên Tirkî, Kurdistan û Sosyalîzmê de û dahûrandina têgehên têkildarî van de tiştên ji hev cuda nabêjin. Ger her kes li ser bingeha van nêzîkbûnên şaş 1'ê Gulanê pîroz bike, dê nakokiyên sûnî derbikevin. Medîha got; "ger PDA cardin provakasyonan neke dê baş be, ya rastî diviya destûr nedana ku ew beşdar bibin." Li Îzmîrê her tim PDA û HK li hev diketin. Koma herî zêde li dijî bertek hebûn.

TV nûçe dirêj dan. Her çendî di navberê de hinek bernameyên werin dayîn, giranî nûçeyên Taksîmê bûn. Karkerên bi pêşmalik, cilên kar ve û serên wan girtî, das û çakûçên temsîlî tev pir bandor dikin. Carina jî Serokê Giştî yê DÎSK'ê Abdullah Baştûrk û Serokê TÎP'ê Behîce Boran didin nîşan. Dema diruşmaya diqêrin ez baştir guh Didim wan. Ez dibêjim gelo dê diruşmaya Bimire Mêtingerî biqêrin. Çav li pankartan digerînim. Ez pankartên bi îmzeya Şoreşgerên Kurdistanê digerim.

Ji nişkê ve her der tevlîhev bû, ji ber weşana zindî bû, em bûyerên ku diqewimin yekser dibînin. Hinek jinên li kêleka me qîr dikin û ax û wax dikin hene. Her kes li ber tv civiya. Kes mane nade. Me jî tam fêm nekir. Tenê em dibêjin provakasyone. Pêşkêşvan tenê got; " ji derve de li ser banê otêla Sheraton'ê fîşek hatine reşandin." Bes daxwiyaniyek wisa

hat dayîn. Wer diyar kirin ku pevçûnek di navbera çepgiran de ye. Panzêr dadikevin qadan û mirovên li erdan diperçiqin hene. Tam qadek şer e! Panîk û tevlîhevî pir baş tê dîtin. Ji her derî ve li ser gel direşînin.

Her der tije pankart, al û qaxit bûne û hinek jî li hewa belav bûne. Dîmenek pir tirsnak heye: ew kêfxweşî û bendewariya mezin, vediguhere gumanan. Tam komkujiyeke. Girseyek ji pênc sed hezar kesî zêdetir li qadekê ye xw ew qad jî di bin reşandinê de ye. Panzêr avê diberdin. Duyê bombeyên mijê her der tarî kirine. Fîşek tên avêtin. Panzêr pir vekirî bi ser gel de diçe. Belê, tam komkujî ye. Tam provakasyon e.

Pêşkêşvan di navberê de hejmara kuştiyan dide. Dibêje, 'hejmara kuştiyan herî kêm bîst e, paşê hejmar dibe sih, herî dawî jî hejmara kuştiyan bû sih û şeş û hejmareke zêde birîndar hene." Jixwe yên hatine binçavkirin ne diyar in! Tespîtkirina yên hatine binçavkirin ku kî ne û çend kes in pir zehmet bû.

Me not şandin beşa zilaman. Me got em nikarin li hember vê rewşê bê helwest bimînin. Gelo ew çi dihizirin. Her dawî me biryar girt em girêva birçîbûnê ya sê rojan bidin destpêkirin û em bi daxwiyaniyên komî ve çalakiya protestokirinê bikin. Yanê armanca gireva birçîbûnê protestokirna komkujiyê bû. Me wê şevê daxwiyaniyên (dîlekçe) xwe amade kirin û em roja bê yekser destpê dikin. Em di hinek demjimêrên rojê yên diyar de hemû bi hev re diruşmayan diqîrin. Em dibêjin; " Bila ji faşîstên qatil hesab were pirsîn! Şehîdên Taksîmê Bêmirinin! Dê hesabê 1'ê Gulanê were pirsîn!" Me jî ji eniya xwe komkujiya 1'ê Gulanê wisa protesto kir.

Girtiyên din di vê demê de bêdeng bûn. Weke berê porê hev nedigirtin û xeber ji hev re nedikirin. Em dişopandin. Hewl didan fêm bikin bê ka gireva birçîbûnê çawa ye, dixwestin hîn bibin. Em bi gelemperî li derve, cihê hew girtinê dimînin. Li cem me tenê av û hinek şekir ji bo çêkirina şerberê heye. Em di hinek demjimêrên diyar de bi qedeha çayê şerbet digirin. Weke din jî cixare tê kêşan. Lewma yên din li derve xwarinê dixwin. Li cem me naxwin. Heta dema em diketin hundur ên tiştek bixwara hebûya ji şerma radikir, an jî vedişart. Çawa li cem yê rojî xwarin guneh bû, ev jî weke guneh dihesibandin. Dema bala wan bikişanda dihat rûdiniştin, pirs dikirin, me jî ji wan re vedigot. Lê piranî navenda baldariya wan cuda bû. Bi taybet çandek li girtîgehan ava dibe heye. Ev gelek caran li çapemeniya burjuva diyar dibû. Li girtîgehan, bazirganiya jinan piranî bi destê personelan pêk dihat. Bi gelemperî yên ji ber zinayê û pirsgirêkên exlaqî hatine girtin, bi hevkarên heman suc kirine re tanîn cem hev. Not û nameyên wan bi pereyan ji wan re dişandin. Hemû peywendî bi pereyan saz dibû. Heta esrar û hebên uyuşturucu, bi destê personelan derbasî hundur dibû.

Hinek di vê mijarê de hosta ne. Yê di vî karî de herî baş saz dikin gardiyanin. Deh qetê mûçeya ku dewlet dide wan, bi vê riyê digirin. Tam li vir şebekeyek ava dibe. Di hundur de axa û xanim axa ne. Xwarin û xizmetên wan ên din girtî pêk tînin. Ev şebeke ji gardiyan heta mudur û serdozger dirêj dibe. Ne zehmete ku di nava jinan de kesên bi vî rengî werin zelalkirin. Me zêdetir hewl da ew quralên jiyanê yên zêdetir di nava qada jiyana hevbeş de hatine destnîşankirin pêk bînin û em pirsgirêkên din pey wê re bigirin dest.

Her tişt bi qedexeyan û destwerdana yekser ve ne dihat astengkirinû û çareserkirin. Ev rêbaz bi girtiyan re rû bi rû tanî. Ev girseyek girîng bûn. Ji ber hemû kesên bi çanda civakê ya ketî, paşverû û gemariyan ve hatibûn mezinkirin û ev jî weke şêweya jiyanê diparistin bûn. Pirsgirêkên tavan jî hebûn. Carê hinekan hewl dida xwe bikuje.

Hisnê jî yek ji van jinan, keça yeke laz, zerik û bedew bû. Lê belê, li gundek quncika Behra Reş de bavê wê ew hê çarde salî firotibû bazirganek jinê. Zilam tevî ku bi jinek din re zewiciye, di bin navê zewacê de dikire. Tevî vê bi vê keçê re dizewice. Piştre jî vê jinê di mala xwe de difiroşe zilamên din. Jin jî, bi hewiya xwe pêk ve vî zilamî dikujin. Her du jî li girtîgehê girtîbûn. Navbera wan ne xweş bû. Gelek caran şer dikirin. Wê keçê digot; "min jî bikin şoreşger." Baldar bû. Ya wê jî lêgerînek bû. Ji ber vê gardiyan jî pê ve mijûl dibûn. Dixwestin bikar bînin. Jinek bedew û balkêş bû. Hinek zilam hebûn dixwestin bi wê re bizewicin. Ji ber di vî karî de pere hebûn, li derdora vê digeriyan.

Ji ber gelek bûyerên were vê zelal dihatin jiyîn, me di serî de gef li gariyanên jin kir, ew şiyar û teşîr kirin. Me gelek bûyerên ku ne dihatin zanîn eşkere kir. Êdî gardiyanên jin pir ditirsiyan û ev kar dizîve dikirin. Êdî Hisnê tişta ku kirî serê xwe û car bi car ceribandî, kuştina xwe pêk anîbû. Min piştî demekê bihîst ku gelek derman ser hev xwariye û xwe kuştiye. Dema min di rojnameyekê de ev xwend pir xemgîn bûm. Ji ber gelek Hisnê û Hisnê'yan hene.

Rojekê li Ensturiya Perwerdê ya Buca de bûyer rû dabûn. Şoreşger û faşîst bi kêr, zincîr û daran şer kiribûn. Me ev agahî di rojnameyekê de xwend. Roja duyem nîvê şevê sê keçên

xwendekar anîn. Di qoxuşa me de diman. Lê rûyê wan zêde ne dişibiya şoreşgeran. Min û Gulsim kesên bi vî rengî qet ne dîtibûn. Me got, ger şoreşger bûna dê me teqez ew li cihekê bidîtan. Gumanê me hebû ku ew faşîst bûn. Dema me ji wan pirsî, gotin; "em çepgirin." Lê rayedarên girtîgehê ji wan re gotibû xwe wisa bidin nasîn, "nexwe dê we bikujin." Wan jî ji tirsan xwe wisa dan nasîn. Tîpê wan dişibiya kesên diçin perwerdeya tekvando. Ji ber me dizaniya ku, keçên faşîst piranî diçûn perwerdeya xurtkirina laş. Me bi hev re henek kir. "ew nikarin ji me baştir qerete bilîzin." Her yek ji me ji xwe yeke li gorî xwe diyar kir. Me jî her sibe spor û qerete dikir. Mahmure di perwerdeya qerete de Kembera Reş girtibû. Hînî me jî dikir. Me xwe gelekî pêş xistibû.

Dema ez li mal bûm, baldariya birayê min a ji sporê re bandor li min dikir. Min xebatên wî tev dişopand. Guhertinên di çengên min de bala birayê min kişandibû. Ji ber vê aciz bû û got; "kirête, ne xweşe ku keç wisa kasan pêş bixe. Wî hesinî deyne." Piştî wê ez zêde mijûl nebûm. Dîsa jî ne xirab bû. Ev tişt zanîn û li girtîgehan bikaranîna derfetên wisa baş bû û ti zerara wê tinebû. Setetîka laş xirab nedibû, ji ber em baldar nêz dibûn.

Me ev zêde cidî girt. Min got; "ger ev keçên faşîst derve li şoreşgeran xistine û hatine, emê jî li wan bixin û bavêjin." Qebûl kirin. Lê me got wê ne lêdanek ji rêzê be. Me hesinên zirav û dirêj ên dîwanan derxistin. Me serê wan bi beton û keviran tûj kir. Me şîşên hunandinê guncav nedît. Ya rastî di nava wan de hesinên baş hene, lê zêde baweriya me bi wan naye. Lewma dibe ku em encama ku dixwazin bidest nexin.

Hesinên dîwanê baştirin. Qet nebe dema em li wan bixin emê encamê bigirin. Lê tûjkirina serê wan hem wext dixwest û hem jî bal dikişand. Em dixwazin bê ku ew tevdîr bigirin vî karî pêk bînin. Dê me bi hesinên dîwanê bi serê wan xista, lewma bi wê re mijûlbûn wext dida windakirin. Em hewl didin bala derdor nekişînin. Me dikariya bi kumlan, şîşên hunanê û hesinên dîwanan darbeyek giran li wan bida. Me got; "ger nemirin jî divê darbeyek baş bigirin û şopa wê bimîne."

Me dest bi kar kir. Tenê gardiyana jin a rûyê wê sor fenek e. Meyla wê jî li ser faşîstane. Kolana ku lê ye, kolana faşîstane. Dê mîsoger alîkariya wan bike. Birine dîwanên nêzî xwe dê li wir bide razan. Hersêyan bi hev re, bi gardiyana jin re dibin tuwaletê. Em ranazin, piranî caran dereng dirazin. Em di navbera xwe de nobetê digirin. Yên din zêde nizanin. Em naxwazin bizanin jî. Lê vê şevê ne girîng e. Em naxwazin vê firsendê ji dest berdin. Îhtîmalek mezin şik dibin û di tuwaletê de gihan encamekê. Gardiyana jin derket derve û piştî demek kin vegeriya. Hat cem hersêyan, bêdeng hinek tişt got, lez ew derxist derve. Her tişt di kêliyekê de çêbû. Me texmîn ne dikir ku dê wê nîvê şevê derbikevin. Em li ber ketin. Ew jina bi lenet her tişt carekê de qedandibû. Diviyabû me li şûna wan, ew bixeniqanda. Em hemû bi hêrs bûn ku me çawa ev firsend ji dest derxistibû!

Dema jinik vegeriya em her çar ser çûn û me gef lê xwar, jê re got; " tu faşîst î. Tu faşîsta diparêz î. Kanî tu gardiyanek tenê ser karê xwe disekinî? Wê tu ji vir şûnde bibînî?" Jinik tirsiya. Tika ji me kir got, ez naxwazim tiştek bibe, wan ferq kiriye, ji min re gotin me ji vir derbixe, ev Komînîst in dê êrîşî me bikin. Gulsim nas kirine. Şik birine, di tuwaletê de ji min re

gotin; “ me derbixe. Ez jî tirsiyam û min ew derxistin. Min şaş fêm nekin. Ez ne Komînîst im û ne jî faşîst im. Ez jinebiyek di temenê dayîka we de me.” Hewl dida ku me bide bawerkirin ti sucê wê tine ye. Em ji cem çûn. Em yek du rojan ji bo nekêrhatina xwe pir aciz bûn. Diyar bû ku em nikarin firsendan bikar bînin.

Roj lez derbas dibûn. Tevlîhev û rengînî bûn. Em zêde destûrê nadin yek rengiyê. Dema dîrok bû 13’ê Gulanê me Leyla Qasim bibîr anî. Ev pêşniyar jî min kir. Her kes tevlî bû. Wê rojê Orhan Baqir wêneyek ji ya roja Leyla Qasim hatî darvekirin ku hatibû kêşan daye çêkirin û li binê wê jî nivîsandiye, “Leyla Qasim Namire”, weke din jî nivîsek nivisiye û bi navê min şandiye. Ez zêde şahnaz bûm. Min ji wê wêneya Leyla Qasim li ser dîwarê dîwana xwe jî bi dest çêkiribû. Di wê dema destpêkê hevalan bi me re peywendî pêş xistin de gelek poster ji me re anîn. Me demek dirêj gelek posterên ku ew wêneya Leyla Qasim jî di navê de û hinek posterên bi nivîsên bedew û manîdar hatine amadekirin dîwarên malê ve hiştin. Wêneya darvekirina keçek Kurd bû. Ez cara yekê wê demê pê hesîbûm. Serî heta binî ez hejandibûm û êş da min. Di heman demê de onur û egîdiya jinekê ya di nava şer de dabû hînkirin. Gotinên ku ji celladan re gotî pir bi wate bûne û me hemûyan jiber kiribû.

Li hember daxwaza dijmin a, “Ger tu lêborîna xwe bixwazî, emê te efû bikin”, tifî rûyên wan dike û dibêje; “ Na! Ez ti caran efûyê ji we naxwazim, ger yek hebe mirov lêborîna xwe jê bixwaze ew jî Gelê Kurd e. Lê têra xwe ji bona wan têkoşîn neda.” Gotinên wê yên dawî di vê naverokê de ne. Leyla Qasim ji bon amin destanek û keçek leheng bû. Ew halê

wê yê bi çek û rext û ew sekna wê her tim bandor li min kir. “Jin û Çek! Jin û Şer! Jin û Şerê Di Rêya Rizgariya Netewî de! Jin û Mirin! Ev tev ne tiştên ji rêzê bûn. Dibe ku xisletên çîna hêzên di nava wan de dijiya û rewşa wê bi xwe ya lehengiya dijî dijberê hev bûn. Rewşek dijberê wê bû, lê di heman demê de rastiyek jî rave dikir. Dê jina Kurd di nava şer de koletiya xwe derbas bikira.

Ev di heman demê serhildanek li dijî hevkariyê jî bû. Lewma ne gengaz bû ku bandor neke. Her ku derbasî nava şer dibûm, girîngiya fêmkirina Leyla Qasim kûrtir dibû. Lêgerîna wê ya azadî, azadiya xwe di nava azadiya gelê xwe de dîtin, li dijî her cure binesaziyên paşverû û feodal û nêzîkbûnên wan ên ji jinê re, daxwaza wê ya di nava şer de cih girtin û şahadeta wê ya di vê rê de moralek bû û bandora wê ya giyanwerî zêde bû. Ma bi şoreşgerî Leyla xwedîderketin jî ne ev bû? Dê jin teqez di nava Rizgariya Netewî de cih bigire. Ancex dema jin bi çalak tevlî vê têkoşînê bibe, dikare bigihije azadiya xwe. Rêya rast a Rizgarî ev e. Wê demê divê Leyla’yan zêde bibin, vî şerî bijîn û bidin jiyîn.

Min wê rojê tiştên derbarê Leyla Qasim de dizaniya tev vegot. Pişt re min peyama hevalan xwend û hinek kilamên li ser bîranîna wê hatine gotin, me jî got. Bîranîna Şehîdan manîdar bû. Bi mirovan re girêdanê pêş dixe. Her wiha azameta domandina kevneşopiya têkoşînê pêş dixist. Her soza ji wê û wan re tê dayîn biryardarî ye. Dema mirov bibîr tîne, mirov agir diberde wan hestan tevan. Xwedîderketin pêş dikeve, dihêle ku mirov bi-axive. Her du hevûdû didin avakirin.

Çi qas meha Gulanê cuda bibû. 1'ê Gulanê, 13'ê Gulanê û 18'ê Gulanê. Vê carê jî di 18'ê Gulanê de Birahîm Kaypakkaya bibîr anî. Ma min ji kur dizaniya wê rojê, tam jî di wê rojê de mirovê mezin rêhevalê me yê bi qedir HAQÎ QARER hatiye kuştin! Ev bîranînên hevbeş baş bûn. Jixwe hewce bû em hevbeş xwedî li şehîdan derbikevin. Lê dema me bibîr tanîn min jî û wan jî rexneyên xwe digot. Me digot, TÎKKO û Yekîtiya Gel rast nêzî şehîdan nabin, weke ku şehîd Birahîm parve nakin nêz dibin.

Me got, Kaypakkaya jî di dema xwe de mijara Mîllî kiriye rojevê, şêwaza destnîşankirinê rastiya Mîsak-i Mîllî derbas nekiriye. Di demên pey wê re jî nêzîkbûnên ji vê paşverûtir hatine raberkirin. Me nivîsa Orhan Baqir şandî xwend. Li ser qapa wê wêneyê Birahîm Kaypakkaya ya bi şepqe ku min pir jê hez dikir hebû. Me ew roj jî bi sirûdan borand. Dîsa me derbarê rojê de bîranîn gotin. Bes gelek ji wan di asta hatî bihîstin de dimîne. Bi taybet em behsa birîndar ketina dest û helwesta wî ya egîdane li Amedê dijî êşkenceyan raber kirî dikin.

Şahadetên çêbûyîn vegera welat leztir kir

Berî Gulan xilas bibe, em cardin derketin dadgehê. Pêvajoya hilbijartina ye û parêzer hewl dide derdora CHP'ê ji bona vê dozê bikar bîne. Piştî ku derdora CHP ket navberê em bi kefalet hatin berdan. Ez wê rojê bi Heyderê ji Surucê, birayê min û bi yên din re bûm. Destpêkê em çûn Încîraltiyê. Dixwazin min bi hinek hevalên din bidin naskirin. Li ser beşek camekana mezin a deriyê ketina Kampûsê de posterên mezin

daliqandine. Hinek jî li ber civiyane û bi mereq lê dinêrin. Ez çawa ketim hundur min wêneyên Haqî Qarer û Aydin Gûler dît.

Li ser wêne "Enternasyonalîstê Mezin Heqî Qerer 1977" hatibû nivîsandin. Li bin wêne jî ev hatibûn nivîsandin.

"Tiştek Ji Azadî û Serxwebûnê Rûmetir Tine Ye!"

"lawê Gelê Tirk ê Egîd, Enternasyonalîstê mezin, Pêşengê Şoreşa Kurdistanê Rêheval Heqî Qerer, ji aliyê rêxistina sîxûr Stêrka Sor (Bêşparcacilar) ve di dîroka 18'ê Gulana 1977'an de, li Dîlokê hat qetilkirin. Bîranîna wî bêmirine!"

"Bimire Mêtîngerî, Emperyalîzm û Her Cure Paşverûtî"

"Bimire, Provakatorên Sîxûr!

"Bijî Enternasyonalîzma Proleterya!" Şoreşgerên Kurdistanê

Min ne karî pêşiya fêrmiskên xwe bigirim. Êdî min ne dikariya nivîsan bixwînim. Kulmên min hişk bibûn, zorê Didim xwe. Ayden Gul ji aliyê HK'an ve hatibû kutin. Min bi dengek bilind got; "hûn aşçak in." Şehîdê mey ê destpêkê ji aliyê HK'yan ve hatibû kuştin. Di heman demê de vê bi navê şoreşgerî dikin! Xwedêyo çawa dikarim vê rakim. Hevalan çawa ji min re negotibû? Ez jî bi yeke ji HK'ê re me. Ev jî suceke û ji xwe aciz dibim. Êdî ez nikarim saniyekê jî li van deran bimînim. Dixwaze bila kes erê jî neke, ezê dîsa biçim êdî nabe kul i bendê dimînim. Xwedê bela xwe bide vê girtîgehê, sê mehên min girtin. Sê meh jî ne hindik bû. Ez nivîsên li ser wêneyên Aydin Gul dixwînim.

"şervanê Egîd ê têkoşîna Rizgariya Netewî ya Kurdistanê, Aydin Gul."

Min wê kêliyê Aydin anî bîra xwe. Pir ciwan bû. Carê bi Meto re dihat malê û diçû. Hevalek pir kamil û bêdeng bû. Çawa çêbû? Nikarim hezim bikim. Li bin wêne jî,

"Warê Şêra ne, Rûvî Nikarin Bikevinê

Gula Dêrsimê ye Faşîst Nikarin bişkînin

Rêya Şoreşê Bi Wî Ve Girêdayî ye.

Şoreşgerên Kurdistanê 8'ê Adara 1977" nivîsandibû.

Êdî min ne dixwest ku Baqî bibînim. Ew jî bi halê min dihesiya, dûr disekinî û ne di-axivî. Tenê dişopand. Paşê me nîqaş kir. Dibêje "HK ne kiriye." Ew jî bawer nake dibêje emê "lêkolîn bikin." Her wiha peyva emê lêbikolin, lêbikolin bi min re tengezarî dide avakirin û bertekan pêş dixe. Dê çi lêbikolin? Şoreşgerek tê kuştin, ne tiştek dine. Ev di nava pirtûkan de nayê gerîn. Piçekê bi ser dil û mejiyê xwe de biçe û bi wijdan nêz bibe, hinekê hezkirina welat û gel hebe dê bes be. " Lêkolîna" ji bilî vê her tim berovajî dibin. Ev jî sextekariye. Ya van jî ev rastiye. Bi pîvanek burjuvaziya biçûk a teng ve bi hestên seresere û şêlo ve nêzî meseleyê dibin. "weke nakokiya di navbera şoreşgeran de digirin dest", lê naxwazin nêzîkbûnên bîrdozî, polîtîk û pratîkî bibînin. Di vir de înkar heye. Rastiya Kurdistanê red dikin. Li rêxistinek gelekê ya xwe li ser bingehê hêza xwe ya cewherî ava kiriye re dibêjin cihetî. Bertek raber dikin, tewanbariyên nijadî didin pêş. Propagandeya reşkirinê berfireh dikin. Di heman demê de tundiyê bikar tînin. Wê demê ev ne nakokiyên hêsan û ji rêzê bûn.

Ev pêşketinên ku rû dan biryar min a çûna welat leztir kir. Lê vê carê ne veşartî û bi rev bû. Ev qutbûn hewce bû. Ez bi Baqî re axivîm. "ger yekbûnek ku bingeha xwe ya bîrdozî û

rêxistinî nebe, nikare bimeşe. Me geekî nîqaş kir, lê me encamek negirt. Me nekarî em yekbûnê ava bikin û pêş bixin. Her wiha bi vî rengî jî pêş nakeve. Ev tevger ji her kesî re vekiriye. Ger tu bi rastî bawerî û dixwazî cih bigirî, tu dikarî cih bigirî. Kes nikare vê asteng bike. Lê dîsa jî em nikarin bi hev re bin. Te ev esas girt. Emê dîsa hev bibînin û nîqaş bikin. Tu dikarî hevalan bibînî û jixwe tu hinekan jî dinasî." Me xatirê xwe ji hev xwest û em ji wê mala li Çîxlî ya xizan veqetiyan.

Jina ku xwediyê malê bû matmayî em dişopandin. Min hem valîzê xwe amade dikir û hem em di-axiviyan. Baqî digiriya. Dema ez jî derketim giriyam. Heta ez daketim cadeya gîştî ez weke pir cemidî û westiyabûm. Bi tenê me. Ezê biçim navnîşan mala ku Konak'ê ye. Ezê biçim mala ku Cemal Qerekoçan û Bozo-Kemal Çoşkun lê dimînin. Dema valîzê min dîtin mat man. Dema min got Bozo; " em yekser îro biçin" wer dizaniya ku ez henekan dikim. Pirsî "hele rawest e, em nû hatin Îzmîrê. Ma çi bû, kanî Baqî?" Min jî got; "ma emê wî bibin kuderê. Bila li Îzmîrê bimîne da ku şoreşa Tirkî pêk bîne, ji ber ew nebe kes nabe." Zanîn ku tiştin bûne û gotin tu pir bi hêrsî. Min jî got; "na, ew nayê, ti dilsoziyek me bi hev re nema. Ya rastî jî ti girêdanek me hev re çênebû. Min kir, min ev bela da serê xwe. Heta ez jê xilas bûm, min têra xwe zehmetî jiya. Heyfa wî jî. Ew pir hestiyar e, ez bawerim ranake. Ya rastî min ew qane kir, em zêde xirab jihev ne veqetiyan."

Dikeniyan û gotin; "Yanê hûn medenî jihev cuda bûn." Ez ji êşa xwe dikeniyam. Lê yên me di ferqa cidiyeta mijarê de bûn. Weke pirsgirêkek hêsan lê dinêriyan. Bes ne hêsan bû. Ev pevçûn bi mehan domand. Şerek bi min re, şerek bi derdor re,

şerek bi malbat re, şerek bi bîrdozî-polîtîka re, ango şerek bi her tiştî re bû. Şert û mercên jiyanek hêsan û ji rêzê zêde bûn. Lê min ne dikariya jiyanek wisa bijîm û min ne radikir. Dê ezê bêzar bikiram. Ti nirxê wê tinebû û bê wate bû.

Tenê perê mey ê bîletê hebû. Me xwarin xwar û derketin. Ez û Bozo bi tenê çûn. Me bilêta xwe ji bona Enqereyê girt. Di rê de pir hizirîm. Bozo jî carê di navberê de henekî di-axivî û dixwest hişê min belav bike. Me di nava axaftinên xwe de behsa Dêrsimê jî kir. Bozo guhên muxtarekî jê kiribû û wisa bi nav û deng bibû. Ji ber ji wê demê ve eşkere bû, ne dikariya biçe Dêrsimê û lê digeriyan.

Di kursiyê pêşiya me de kesek weke karsazan hebû. Dişibiya wan. Bêhna zilam pir teng bû, ne rehet bû. Bes me dizaniya ji Bozo nerehete. Ji ber dest û lin gê Bozo ne disekiniyan. Her kêliyê bi hêcetekê destê xwe li yê pêşiya xwe dida. Weke ku ne di ferqê de ye jî, nêzîk dibû. Di van fenekan de zêde baş bû. Zilam ji nişkê ve ji cihê xwe rabû. Zimanê me cuda bû. Li gorî wî tîpê turîstan bi me re tinebû. Ancex tîpê Kurdekê bi me re hebe. Ger texmîna wî ev be baş e. Lê ger me 'terorîst' bihizire dê ew ne baş be. Di destê zilam de çenteyek James Bond hebû, hişkahî girtibû û tine pere bûn. Me ev jî di navberek rêwitiyê de fêm kir. Her kes ji otobûsê derket. Ji bona perê me tinebû em daneketin. Zilam wer dizaniya ku otobûs vala ye. Çente vekir, hem me dît tije qevdê pere ne. Bozo kir serê xwe. Digot em van pereyan jê bigirin û birevin. Tiştek din jî ne digot. Ya rastî nêrînek pir baş bû, bes emê biçûna kur. Emê bihatan girtin.

Bozo zêde anarşîst, bi kelecan, zînde û bi lez e. Paşê emê vî karî ser û çavên xwe bidin û ji bin dernekevin. Jixwe zilam çawa em dîtin rabû û çû. Bozo jî dibêje; “ çi nabe, emê çente bigirin, wesayîtê rawestînin, dakevin û bi wesayîtek din biçin.” Nêzîkbûnek bi macera, bê plan û di destê me de tiştek din tine ye. Min got, “hele bihedire, dibe ku heta Enqereyê bi me re be. Dibe ku em bikaribin li Enqereyê vî karî bikin.” Bozo, di cihê xwe de ne disekînî. Ev sekna wî bal dikişand. Zilam berî bigihe Enqerê, li Polatli daket. Bozo jî berdikeve.

Perê me tine ne em bi otobûsa şaredariyê biçin. Bozo ji xwe re pasoyek daye çêkirin. Bes ya min tine ye. Li çenteyê xwe baş geriyan dibe ku hinek pereyên hûr di quncikan de mabin. Lê mixabin quruşek jî tine bû. Bê dil jî be me teqsî girt û em çûn warê sîte. Me wesayît da rawestandin, ez yekser çûm min pere ji hevalên hundur girt û anî da şofêr. Ez li cihek navberê de bûm. Paşê pê hesiyam ku ewder yurda xortane.

Muzaffer Ayata hat. Bozo bi min da nasîn. Baqî Qarer jî heye. Em demek kin bi Muzaffer re man. Pişt re ez birim malekê. Medîha keça malê ya xwendekara zanîngehê ye û hevala me ye. Mal zêde qelebalixe, bûk, zava û xwesû tev bi hev re ne. Em wê şevê zêde ne axivîn. Ji ber rêwîtiyê pir westiyane. Roja paştir Baqî Qarer bi min re axivî. Bozo sedem û şêweya hatina min jê re vegotibû. Ji ber min jê re gotibû. Lê ji ber bi hemû ziraviyan ve ne dizaniya, dixwest hîn bibe. Dema pirsa rewşa min kir, min jî destpê kir.piştî ez guhdar kirim, bi şêweyek dilê min bişkîne rexne kir. “te ji zilam re derî vekirî hiştiye, te gotiye, ‘dema te xwest emê nîqaş bikin, em têkîliyên xwe bi temamî qut nakin’, ma wisa dibe.” Min ew mijar sererast kir. Min behsa têkîliyek hevpeyvîna dostanî kiriye. Ez ji vê re vekirîme. Lê dîsa jî qane nebû. Got; divê

mirov di van karan de zelal be û dema biryar dide lê poşman nebe." Min got; "ez di vê mijarê de ne dudilî me. Min biryara xwe daye û wisa hatime. Kesekê ez neçarî vê nekirim. Ger ez ne hatibam girtin, ezê zûtir bihatam. Min ev ji Şahîn re jî got. Agahiya wî heye."

Ez pir li ber qutbûna xwe ya bi vî rengî dikevim. Gelo Şahîn hinek tiştên cuda gotibûn. Ger ez beşdarî berxwedaniya li Kargehê nebûma, ezê hatibam. Lê min rast nedît. Berxwedanî destpê kiribû û pêşengên wê yek jê jî ez bûm. Min xwe di wê mijarê de qane nekiriye. Ez di baweriyê de me vebijêrka min a di wê demê de ya herî rast bû. Lê divê ez van hemûyan bidim fêmkirin. Kî çawa bihîstiye wisa fêm dike. Baqî domand û pirsî; "temam, gelo ev zilam her carê werê û me mijûl bike dê çi bibe?" Weke ku nas dikir dipirsî. Belê ev dibû, di vir de ne şaş bû. Min dizaniya Baqî nasekine, dê bigere û heta dibe ku bêje "ez jî bûm Netewparêz" û were. Lê jixwe min ne dikariya piştî vê qonaxê tiştek din jî bikim. Gelo beryarek hîn zêdetir zelal û tûj çawa dibû? Ji ber êdî ti dilsoziyek me bi hev re ne mabû.

Piştî demeke em kin em li malê man, em ketin ser rêya Nato. Kesîre ez ji wir girtim, birim mala xwe. Em di rê de axivîn, lê malê berfirehtir em axivîn. Behsa hevdîtîna me ya destpêkê kir. "tu ji nişkê ve ji holê winda bûyî, paşê em hîn bûn ku tu çûyî Îzmîrê. Em hê di navbera xwe de ne axivîbûn. Na me qet hêsan nedît. Lê me ne dikariya yekser di wê kêliyê de jî çareseriyekê bibînin. Jixwe tu jî ji nişkê ve winda bûyî." Dîsa di axaftinê wê de rexne hebûn. Min jî behsa çûna xwe ya Îzmîrê û pêvajoya ku hatî jiyîn kir. Min carina parçe parçe belav, carina jî bi hemû ziraviyan ve, carina jî tenê hinek mijar jê re got.

Bi vî rengî derfet çêbû ku ez jî ji nêz ve Kesîre binasim. Weke din jî Şenay hebû. Yeke kinik û biçûk dixwiya. Kesîre got ew "hevalek ji Yogoslavya ye" bi min da nasîn. Dê ew jî di nava çend rojan de ji Yurdê derbikeve. Emê mala li Etlîk'ê bi hev re bimînin. Hevalên xort li malê diman. Got; "Dema em bicih bibin ewê derkevin."

Her tiştê Kesîre ji bo min cuda dixwiya. Min bi hevalên jin ên Dêrsimê re anî beramber hev. Ji wan cuda bû. Weke ku mala wan jî ya rêxistinê bû! Dayîka wê weke arîstokratan, her tişt bi Kesîre dişêwirî û erêkirina wê esas digirt. Bavê wê zêdetir bêdeng li dikanê kar dikir. Ew jî bi Kesîre re fermî, ji bilî pêwendiyek keç û bav, sazûmaniya pêwendiyek cuda dijiya. Xweşkên wê yên li Zanîngeha Teknîk a Rojhilata Navîn (ODTÛ) dixwendin û birayê wê yê biçûk Elî Kemal cêwî bûn. Her kesî pêşî otoriteyek dinasiya. Ew jî Kesîre bû. Piştre otoriteya dê û bav pêk dihat. Derdora xizmê wan jî wisa bû. Em çûn mala xizmên wan ên taxek nêzî pişt Yurda Sîte. Wan jî zêde nirx didayê. Li derdora malbata wê otoriteya keçek ciwan bi min re heyranî ava dikir. Wan rojan xwîşka Şenay a mezin jî ji Yogoslavya hatibû serdanê. Bi armanca gerandinê em bi hev re diçûn mêvandariyan. Dema Kesîre jî wisa wextê xwe dida ji min re ecêb dihat.

M. Elî li min digeriya. Texmîn dikir ku ez li cem Kesîre wan im. Dixwest min bibîne. Digotin Baqî jî hatiye. Texmîna Baqî Qerer rast bû. M. Elî hat cem Kesîre. Wisa baştir jî bû. Min pêvajoya destpêkê li cem Kesîre bi hev re nîqaş kir. Min rexne kir. Min jê re got, ger dema ez ji Dêrsimê hatîm, hestiyar nêzî min nebûya, ez bihiştam li cem xwe, ez jî ne diçûm Îzmîrê û encamên bi vî şêwazî jî dernediketin. Min hinekê jî M. Elî ji

encama rû dayî berpirs girt. Ev jî pir ber dikeve. Lê di heman demê de jihev cudabûna me jî xemgîn dibe. Zêdetir bi tevdîr nêz dibe. Sekna Kesîre jî hesab dike û ji ber di nava vî karî de siyaset jî heye, nerim nêz dibe. Ji ber jihev cudabûna siyasî wî jî tengav dike. Lê her nîqaş û nakokiyên ku ew jî dibû şahid, hewcebû bi dawî bibin. Ji bilî vê ti wateya hevûdu êşandinê tinebû. Dibêje apê min pir bandor bûye. Me li Îzmîrê deşta Cuma gecekondoyek çêkiribû. Apê min jî hatibû alikariya me. Hêvî dikir ku emê li wê malê werin cem hev. Dema min nabîne yekser vedigere. Mehmet Elî jî dibêje; "çavek wî yekser pûç bû, nabîne, ji xemgînî wisa nexweş ket."

Bes ev ne tiştên wisa ji rêzê bûn. Ne ku bê xem nêzîk dibim. Ji bilî vê her tişt zêde bandor li ser min dike. Min xemgîn dike û heta ez gelek caran nikarim rakim. Her çendî ez di nîqaşan de wan tewanbar bikim jî, ez zêdetir xwe tewanbar dikim. Ji xwe aciz dibim. Carina xwe dixwim, di kêliyek ku dihizirim min her tişt bi encam kiriye, çareser kiriye de, pirsgirêkên zêdetir tevlîhev derdikevin holê. Ji xwe re dibêjim "ma ez ji van rizgar nabim. Min li kuderê çi şaş kir. Kêmasî di kurde bû? Min li gorî xwe her tişt baş û rast dikir. Dê apê min xemgîn bibe û hevjîna wî bigirî. Dê Baqî bêzar bibe û yê din jî bimire. Ev temam, ez van dibînim. Lê belê, wê çi ji min were?" Ji ber weke her kes bêje; "sedema her tiştî tu yî û tu çareser bike" nêzî min dibûn. Her sîtem û her rexne, ez dixistim nava êş û tengezariyek mezin. Pirsgirêkên tevlîhev û her tişt berovajî diçû. Niyet, daxwaz û hewldanên min cuda, lê encam jî zêde cuda bûn.

M. Elî çend caran nexweşiya apê min kir rojevê û çareseriyek digeriya. Ecêb bû. Ya wî jî şêwazek bû devjê bernedida. Hewl dida her kesî razî bike, lê nedibû. Êdî fedekariya di vê mijarê de ehmeqî bû. Kesîre jî net diyar kir. Got; "Nêzîkbûna we dişibe nêzîkbûnên ên xeyîdîne lihev tîne. Ev heval rewşê diyar dike û di serî de jî bi we re axiviye. Ya rastî herî zêde jî we dikariya alîkariyê bidinê. Hûn jî her tim Baqî hizirîne û we piştewaniya wî kiriye. Hûn niha jî ji bona berjewendiya endamên malbatê yên din çareseriyekê dixwazin. Em nikarin vê hevalê neçarî vê tiştê bikin. Hûn bavê xwe qane bikin. Bila êdî Baqî jî wisa her kêlî me mijûl neke. Wisa nabe." Ev axaftin ez pir rehet kirim. M. Elî hinekê qane bû. Hinekê jî aciz çû. Bê ku em navê wê bipirsin, em bi Şenay'a nasnavê wê Nadîre bû re li malê man. Êdî em bi hev re bûn.

Mal nêzî mala Kesîre bû. Hema li binya wan bû. Xwîşka Şenay a mezin jî demekê li cem me ma. Baş bû ma. Ji ber derdor jî zêde ji me guman nedikir. Carê hevalên xort jî dihatin. Her du rojên destpêkê Semîr dihat û diçû. Paşê her tim em her sê man. Piştî demekê xwîşka Şenay jî vegeriya Yogoslavya. Hevalek ji netewek cuda ye! Ez li hember van ne biyanî me. Hevaltiya bi her mirovê ji her netewî re bedew bû. Min di vê mijarê de zehmetî ne jiya. Di pêwendiyan de zû ahengê ava dikim, rehetim û xwezayî me. Ji bon amin pêvajoyek nû destpê dikir. Her ku behsa rewşa xwe jî dikirin, ji hêla fêmkirin û pênasekirina bûyeran de jî guhertin çêdibin. Ez di hinek mijaran de dibînim ku min şaş pênase kirihye. Lê di hinekan de jî tam qane dibim.

Tiştên hatîn jiyîn bandor li min kiribûn. Bi hinek hêlan ve jî hejandibûm. Rev, zewac, zindan, pevçûn, nêvengên nakokiyan û bi tena serê xwe biryara her tiştî dayîn. Dema ez van tevan dihizirim, ez ji xwe re dibêjim "min çi qas tişt kirine." Lê ez dîsa jî weke çarenûs nabînim. Di wateyekê de çarenûsa ku min bi destê xwe ava kiriye, xirab dikim. Ji xwe re dibêjim; "derketinek din jî çêbû!" Ev min dihedirîne. Di heman demê de zêdetir nêzî hevalan dibim.

E pirtûkan dixwînim û nîqaş dikin. Me piştî demekê xebatên perwerdeya şevê meşand. Me ev xebat li mala hevalek welatparêz ji Mêrdînê û du caran zewiciye dimeşand. Me pirtûkên weke Mafê Çarenûsa xwe Diyarkirina Netewan, Pirsgirêka Netewî û Pirsgirêka Mêtîngerî, Komînîzma Çepgir Nexweşiyek Zarokî ye û her wiha, digirt dest. Komek ji Kesîre, Şenay, min û çend hevalên xort pêk dihat. Kesîre birêve dibir. Lê di nîqaşan de jî herî kêm ew di-axivî. Di jiyana rojane de jî pir kêm di-axivî. Dema rojên ku Şenay ne dihat malê, ez li cem Kesîre wan dimam.

Di nava me de bi gelemperî li hember hevalên ku di nava tevgerê de cih digirin û hevalên yekser pêşengiya wê dikin, rêzdariyek heye. Gelo çawa îfade bikim? Mesafeyek heye. Lê hevalbendî her tiştî jî bi wê re dibîne, bi bawer, bi girêdanên herî bedew ve tê girêdan û weke nirxek berz dihat dîtin. Tişta ku hewce jî ev bû. Tişta dihat zanîn û divê di serî de were hînkirin jî ev bû. Lewma ji bona şopandin, guhdarkirin û baweriya beramber, nêzîkbûnek her tiştê wê rast û baş dîtin hebû. Dibe ku her kes wisa ne dihizirî. Aliyên wê yên çors, nebes û seresere jî hebûn. Lê eniya giyanwerî wisa gelekî bedew bû. Di heman demê de Kesîre hevala Rêberê me ya herî

nêz û dergistiya wî bû. Dema em vê dizanin giraniyek cudatir ava dikir. Rêberek bi kesek wisa re girêdanek ji rêzê û xweber ava nedikir. Dema ez xara yekê hatîm Enqereyê, gelo di nava koma li hewşa Siyasalê de Rêbertî hebû yan na, nizanim. Ger hebe jî ji ber berî wê min qet ne dîtibû û navê wî ne hatibû gotin min nas nedikir. Vê xarê li Kantîna Zanîngeha Hquqê de min di nava sohbetek nîqaşên ku Kesîre û hinek hevalên din jî amadene de nas kir.

Ez piştî bazdanek asî, lez û bez, bi hestên rik ve barkirî, dîsa gelek bûyerên şer û pevçûnên ne li bendê bûm ve tije derbas bû, cardin li Enqere'yê me. Vê carê jî yekser bi Rêbertî re me. Em li cem hev in. Nêzî hev in û di-axivin.

Yên devrî me navê "Apo'yî ne" bikar tanîn. Me de pêvajoya destpêkê li hember bi vî navî pênasekirina tevgera me bertek raber dikir. Me digot, tevgerek bi vî rengî binav kirin û eşkerekirin şaş bû. Me ne di-eciband ku me jî heman weke "Aktanci" an jî komên bi nav bikin. Min li xwe ranedigirt. Jixwe di encamê de navê Tevgerê ne girîng bû. Me serê xwe bi vê ne dêşand. Ew kesek bû, ew rêgezek bû. Ew şoreş bû. Ew enternasyonalîzm bû, ew welatparêzî bû. Ew bi her awayî şerel dijwar bû. Ew nûnerê hemû diyardeyên bedew bû. Hêzek wisa îlahî bû. Hêzek madî bû. Tişta k udi hişê me de cih digirt ev bû. Lewam em hişyar nêz dibûn ku li ser pênaseyên din qet nîqaş nekin.

Belê, em Apo'yî bûn! Ya rastî di cewher de xoşa me jî diçû û me dipejirand. Bi hêsan ne dihat bilêvkirin, lê balkêşbûna wê şahnazî û îlham dida me. Dema me Rêbertî ne didît jî bandorek wisa çêdibû. Lê dîtin û û bûna şahidê her xisletek wî cudatir bû.

Aliyê wî yê herî zêde bala min kişand, xisleta wî ya guhdarkirin û fêmkirina mirovan bû. Yekser ne diket nava mijaran. Tenê bi mijarekê, tenê bi kesyetekê û tenê bi bûyerekê ve girêdayî nedima. Lê dema di-axivî daxwaza bi te re û her tişta ku divê were vekirin tev bilêv dikir. Tu û yên din tev, bûyerên derdora mirov, pêşeroj, tiştên nû yên rû bidin, ango bi temamî jiyan, şer, tiştên ku kesan eleqeder dike û çi tiştên ku divê werin kirin çi hebe, ew îfade dikir. Asoyên mirov vedibûn.

Axaftinên wî ne weke yê hevalên din bûn. Hem zêde xwezayî, zêde sade, zêde bi naverok û hem jî li gorî wî xweser bû. Di wê demê de gelek hevalên ku hevpeyvînên me bi hev re çêbûn, zêdetir axaftinên xwe bi pirsgirêka reva min a ji malê û ji hev cudabûna min ve sînordar dihiştin. Lê Rêbertî ti caran ev mijar yekser ne kir babetek ji axaftinên me. Lê bersiva hemûyan jî dabû. Gelek babet di nava hev de girtibû dest û axivîbû. Di wê navberê de hinek kesên ji Ciwanên Şoreşger û ji Rizgarî jî hatin li derdora masê rûniştin. Bi wan re jî têkildarî hinek mijarên diyarker de hevpeyvîn kir.

Kantîna Zanîngeha (fakûlte) Huquqê, ew halê Rêbertî yê mirovê kamil, bi hedar, sade, balkêş dişopîne û fêm dike, bîranîna herî xweşik a rojên min ên li Enqereyê bû. Di heman demê de çavderiyên min jî berdewam dikir.

Xisleta min bi Kesîre re herî diyarker dît, pir giştî û di heman demê de zêde li gorî xwe bû. Ew bi xwe ne digihişt hinek tiştan. Hewldanek wê ya pir zelal di asta nêzîkbûn an jî axaftinê de jî tine bû. Berovajî vê seknek ku li bendê bû hinek xwe bigihîninê raber dikir. Her kes neçar bû xwe bigihanda wê. Dîmenek wisa dida diyarkirin..

Hinek gotinên ku Qiymet li Dêrsimê belav kirîn hebûn. Dihat gotin; “keça Elî Yildirim e. Zêde sar e. Xwe zêde di-ecibîne. Jixwe di serî de Rêbertî jî qebûl nekiriye.” Zêde baweriya min bi iştên ku belav kiribûn nedihat. Wê demê pêwendiya bav û keç çibû, di çi wateyê de hatibû gotin, ji bona ez ne hizirîbûm û min fêm nekiribû, min ti girêdana wan bi hev re çênedikir. Min niha zêdetir dişopand û tiştên min didît bandor li ser min dikir. Pişt re rewşa Kesîre ya di nava malê de û rêzdariya beramber wê zêdetir bandor li ser min kir. Ji ber bi bandor bû min kêfxweş dikir. Ger jinek şoreşger ev qas xwedî otorîte be û ev di nava malbatê de biser xistibe, tişta herî xweşike.

Her zêde jî Kesîre, bi keçên li Dêrsimê û Qiymet re tînim beramber hev. Otorîteya Qiymet xwe disparta pere û pîşeya wê. Bandora vî aliyê wê hebû. Lê ev pirsgirêka Kesîre tinebû. Malbata wê dewlemend bû. Qiymet xwe têkil her tiştî dikir. Destwerdida, zêde di-axivî, nîqaş dikir û giregir dikir. Şêwaza jiyana wê û kêşana cixareya wê jî cuda bû. Ji otoriteyek şoreşgerî ya xweseriya jinekê diparêze zêdetir, “keçek weke zilaman bû.” Di nêzîkbûnên wê de sînor û pîvan tinebû. Belê, bi vî rengî jî hem malbat, hem derdor û hem heval bandor dikir.

Gotinên derbarê Kesîre de, dihiş ku hê zêdetir bi baldarî were şopandin. Her nêzîkbûnek Kesîre weke ku pêş ve hatiye bernamekirin bû. Min hinek nêzîkbûnên Cemîle bi yên wê re tanî ber hev. Dîsa jî ji min re pir cuda dixwiya. Min hemû keçên ku ji çepên Tirkan nas dikir ber çavan re derbas kir. Ez jî ji xwe re dibêjim; “na, na, yên me pir cuda ne.” Di heman demê de bi wan şahnaz dibim.

Şenay yeke paspal bû. Bandora xwendekarî û şêwaza wê jiyanê zêde li ser hebû. Ji xwarinê heta razanê û paqijiyê her tişt têkilhev û ne diyar bxw çi çawa dike. Hinek tişt biçûk didît û girîng î ne dida wan. Ger ji wê re bima li gorî wê ne hewce bû em cihê kul ê dimînin jî paqij bikin. Weke karek zêdahî û ne hewce didît. Dîsa ji bona wê pantor û gomlekek li ber xwe kirin û bi mehan wisa mayîn jî asayî bû! Di pantorên wê de dewsa kabên wê derdiket û gomlekê wê jî qermiçî dima. Ew bi ser hev de anîn, pênc xoleyan ew utîkirin, ji bona wê wext windakirin bû. Lê mixabin wextê xwe zêdetir belav û bi tiştên vala re dadigirt. Ez jî her tim ji ber vê nakokiyê aciz dibûm.

Kesek li zanîngehê xwendekar, ronakbîr û ji vê tevgerê bû. Lê sekna wî ya jiyanê ji vê rastiyê dûr bû. Rewşa çepên Tirkan ên salên destpêkê dihat bîra min. Ez qet pantorê Îbo yê ji nişkê ve rengê xwe guhertî bîr nakim. Li gorî wan şoreşgerî qirêjî û gemarî bû. Lê me ti caran tiştên wisa qebûl nedikir. Dibe ku di gelek mijaran de kêmasî û tengezarî çêbûn, lê em hîn bibûn ku şoreşgerî rihê paqij, exlaqê paqij û jiyanek sazûmankiriye. Me ev didît û em dibûn şahidê vê.

Şenay, di pêvajoya wê malê de kêm be jî veguherîbû. Kesîre jî ev guhertina bi Şenay re bi min ve girê dida û dema me ev mijar di-axivî û nîqaş dikir maf dida min. Di peywendiyên min ên bi Kesîre re hem mesafeyek hebû, ev jî ji rêzdariyê çavkaniya xwe digirt, hem jî di xala ku her kes jê gazincên xwe hebû û sernedixist de ez nêzî wê bûm û min vekirinek dabû çêkirin. Kesîre carinan deriyê giyana xwe ya hundurîn, an jî xisletên kesayeta wê ya xwezayî ku di bin kesayeta hatiye bernamekirî de maye jî ji min re vedikir. Dibê

ku nêzîkbûnên min jî ji vê re rê vedikir. Mînak ew Kesîreya ku her kesî digot; “nakene, me nedîtiye dikene” min ew bi dengê bilind dabû kenandin.

Mala ku mel ê xebatên perwerdeyê dimeşanda, mala hevalek ji Mêrdînê bû. Hevjîna wî ya destpêkê jinek zêde bedew bû. Bejin dirêj û bedewek esmer bû. Dema cilên Mêrdînê jî li ber xwe dikir, hê zêdetir balkêş dibû. Rojekê dîsa cil û bergê xwe yê herî xweşik li ber xwe dike û bi tiyên xwe re diçe sûkê. Cilên wê jî bi giranî spî, dibiriqîne û bi qîmete, menteşên di destê wê de, poşiya spî ya li serê wê û bi zêran ve gelekî bal dikişîne. Lîleyên di gerdanê de, li pişta wê kembera zêr, qeydên destên wê heta nîvî bazinên zêr û guharên wê zêrbûn. Yên dîdît wer dianiya ku mankêne.

Di wan rojan de jî jinên Partiya Komînîst a Tirkî (TKP’yî) bi navê Komaleya Jinên Pêşverû li dijî tiştên biha û feydeya zêde (zam) mîtîng lidardixistin. Meşek bi beroşên vala û lalîkan bû! Dema dibîne ev diruşmayan diqîrin, ew jî bi Kurdî diruşmaya; “Bimire Koledarî” diqîre. Her kes li dinêre. Yên din ava kortejê de jî lê dinêrin. Hemû bal diçe ser wê. Panîk tiyên wê digirin. Wê şiyar dikin dibêjin; “dê polîs me bigirin”, ew jî bi destê xwe dibêje “rawest e, ma çima ew diruşmaya diqêrin, ezê jî biqêrim” û cardin diruşmayan didomîne. Di encamê de bi zorê qane dibe û lez ji wir dûrdikevin. Bûyer jî wisa pêş dikeve. Em jî hinekê dinepixînin û wisa vedibêjin, ku her kes bi dengê bilind dikene. Ji kena çavên Kesîre fêrmisk dibarin. Jinê jî dinase, aliyên wê yên ecêb ew jî dizane. Ji ber rojekê ew jî dibe şahid. Rojek bi çavên xwe dibîne li Enqereyê rojek serma bi cilên mil kin ve diçe sûkê ji dikanê tiştan dikire.

Mijara ku ev qasî em didan kenîn, ev aliyên jina Kurd a trajî-komîk a di temenek biçûk de hewiya wê çêbûye, li malê bi ti zilama re li heman sêniyê xwarinê naxwe bû. Dîsa jî hewce bû em pirsgirêkê ji aliyek din ve kûrtir bigirin dest. Me wê rojê tenê karî Kesîre bidin kenîn. Ji ber ev rewş bingehê tiştekê ava dikir, girîngiya wê hebû. Her wiha gelek bûyerên weke vê bi êş û trajî-komîk hebûn. Li Kurdistan û Metrepolan gelekî dihat jiyîn.

Li malê wêneyek Kesîre ya bedew ku hatibû mezinkirin hebû. Got; ev wêneyek dema ez mamoste bûm hatibû kêşan" û albûma xwe nîşa min kir. Yek bi yek her wêne bi min da nasîn. Tenê dayîka wê di nava hewaya bajarvaniya mezin de ne hatiye guhertin. Li Qerekoçanê jî arîstokratek berbiçav bû. Ew taybetmendiya wê yekser dihat dîtin. Min jî di navberê de gelek pirs dikir. Wê jî hemû dibersivand. Lê min jî her pirsek ji xweber nedikir. Mînak min têkildarî Rêbertî û peywendiyên wê yên bi wî re qet pirs nedikir.

Ya rastî min dixwest ku binasim. Ger min bipirsiya sê vekira. Lê mesafeyek heye û ez jî wê mesafeyê diparêzim. Bes rojekê cilên li ber xwe guhert. Bi gelemperî pantor û gomlek li ber xwe dikir. Wê rojê jî cardin pantorek qedîfeyek kehweyî û ser wî re jî gomlekek bi ser qehweyî ve diçû, zemînê wê hinekê gewr, kareyên wê biçûk li ber kir. Pir zindî bû. Dilşadiya wê heman weke ya zarokan bû. Li benda hinekan bû. Sibehê telefonek lêketibû. Zîndewariya wê jî piştî wê telefonê bû. Li malê jî kesek tine bû. Ango ne qelebalix bû. Ez di wê kêliyê de hizirîm ku "dê mîsoger Rêbertî were." Ji ber nêzîkbûnên wê hestek wisa bi min re da avakirin. Heta dema zengila derî lêket xwe hilavêşt û çû derî veke. Lê dema derî vekir, xembar bû. Wê rojê jî kesek din cuda ne hatibû malê.

Rojekê em bi hev re çûn Tuzluçayir'ê. Em li ser rêya Nato çûn çend cihan. Mala destpêkê em çûnê xebatên perwerdeyê dihat meşandin. Di pêvajoya pey wê re Dr. Elî Riza'yê ku zewicî, Bêzar, Gonul Atay û xwîşkên Şerîkan hebû. Berpirsê perwerdeyê Doxtor bû, wê birêve dibir. Gonul bi hemû nêzîkbûnên xwe ve bal kişandibû. Dema nîqaşn destpê kir dor ne dida kesî. Cara yekê li wê malê, di nava wextek xebata kin de min Gonul nas kir. Bala min kişand û ji bona min îtîcî dihat, min nedikariya gerim nêzî wê bibim. Dîsa Kesîre zêde ne axivî. Em piştî rûniştina demek kin derketin. Min di rê de jê re got; " pir ziman dirêje, nêzîkbûnên wê vala ne û xoşa min neçû." Kesîre li pey van gotinên min bi manîdar manîdar keniya. Paşê ji min re got; "te baş nas kir. Gonul e. Dergistiya Riza ye." Em çûn demekê li mala Riza jî man. Berî hingê jî çend rojan li vê malê mabûm. Ez ji vê malê çûm cem Kesîre wan. Piştî em çûn wê malê Bêzar û Gonul jî hatibûn.

Dayîka malê Xetîce zêde dilgerim û baldar bû. Hemû jî li hember Kesîre rêzdar bûn. Weke ku Rêbertî bibînin kêfxweş dibûn. Weke parçeyek jî wî dihat dîtin. Hemû nêzîkbûnên xwe guhertibûn û pir paqij nêz dibûn. Lê ya herî ji dil, xwezayî û gerim dayîk bû. Yên ne xwezayî Bêzar û herî zêde jî Gonul bû. Wê dem Bêzar li adliyê katip bû. Gonul jî di nava hewaya keçên xwendekarên zanîngehê de bû. Bêzar kesayetek wisa ku ji qalikê xwe derketiye, lê qalikê nû na-ecibîne bû. Dibe k udi nava perwerdeyê de hinek tişt hîn bibe, lê ne di nava yekbûna nêzîkbûn û fikir de bû. Tevî ku keça malê ya mezin û herî zêde kar dikir bû, zaroktî nêz dibû, delaliya xwe dikir, bê ar û qet bi me re eleqeder nebû.

Gonûl jî, di hewayek xwe ecibandinê de bû. Hê wê demê xwe weke “bûka malê” dida diyarkirin. Taybetmendiya malê ya herî berbiçav, baldariya wan a beramber biyaniyan bû. Gonul jî biyanî û Tirk bû. Malbatê ji ber Riza nirx dida wê. Nêzîkbûnên ecibandina biyaniyan û biyanîbûna Gonûl bi xwe bi hev re bibûn yek. Hê wê demê Gonûl xwe di nava me de biyanî didît. Xwe di-eciband, biyanîbûna xwe weke cudabûnê dîdît û dixwest li ser vî bingehî xwe bide ecibandin. Giyanek wê her tim bi vî rengî hebû. Belê, gumanên min ên wê demê nehatin guhertin û ez ne xapîm. Min herî zêde ew di nava pêvajoya girtîgehê de baş dît û nas kir. Em li wir dirêj bi hev re man. Di vê manê de divê hinekê jî Gonul pênase bikim. Şerên min ên bi wê re rastiyek derxistibû holê. Bi wê re hirsa jinê ya herî xirab, kaprîsa jinê ya herî zêde di kesayeta wê de kûr bûyî, kompleks û encamên ku derxistin holê, herî balkêş min dît.

Rojên Enqereyê pir rengiyek cuda derbas dibû. Firsendek girîng e: derfetên xwendin, nîqaş û perwerdeyê heye. Têgihiştina kesên li cem min pêşveçûyî ye. Gelek tiştên ku e ji wan hîn bibim û bigirim hene. Hêdî hêdî bandora tiştên ku min jiya ne derbas dikim. Sê-çar meh wisa derbas bûn. Paşê hat gorin ku emê derbasî welat bibin. Demekê dihizirîn ku min bişînin Riha’yê. Saîme Aşkin (Delal) li wir e. Hem mamoste bû û hem di nava xebatên rêxistinî de bû. Pirsgirêka wê ya ziman heye. Dibêjin Saîme li wir hînî zimanê Kurmancî bûye. Di vê mijarê de hedara min nayê. Ez ji xwe re dibêjim bila ez biçim welat, çi dibe bila bibe. Ji bona min ferq nake.

Kesîre jî di roja dawî de got dê ew jî were. Emê heta Elezîzê bi hev re biçin. Di kêliya destpêkê mat mam, paşê kêfxweşbûm. Ango bi hev re çûna welat balkêş bû! Min di vê

mijarê de pirs nekir. Ne diyar e ku emê di kîjan rojê û demjimêrê de biçin, an jî ez nizanim. Lê belê, baldariya rojên dawî, kombûna hemû ferdên malê, hewayek beriya veqetînê destnîşan dikir. Di heman rojan de Kesîre xebatek dirûnê jî kiribû. Ji bona dayîka xwe dawek (etek) dirûtibû. Bandor li ser min jî kir. Min got, divê şoreşgerek her tiştî bizane û di her mijarê de kêrhatî be. Di wê kêliyê de Kesîre ji bona min jinek pêşeng û hevalek bû! Di heman demê de keçek ku malê de dihat hezkirin, dilnivzek ku bikare ji dayîka xwe re dawekê bidûrû û keçek şoreşger bû. Ez her tiştê wê erênî şîrove dikim. Qusurê nagerim. Ger hebe jî nabînim. An jî naxwazim bibînim. Lê aliyên wê yên li her cihî diyar nake û nade der jî ez dibînim. Dema ez carina aliyên wê yên bi hev re nabin yek û bi nakok in dibînim, hinekê jî mat dibim. Lê ev jî bandor li nêrînên min ne dikir.

Wê şevê bavê wê pir bêdeng, xembar û bi girî bû. Lewma axaftinên wî qut qutî bûn. Dayîk zêdetir hestewar bû û digiriya. Dîsa xwîşk û Elî Kemal di heman rewşê de bûn. Hem kêfxweşiyek heye û wisa dixwiyê, hem jî xembariyek heye. Êdî ew kêlî hatibû û Kesîre ji malê cuda dibû. Ji Enqereyê derdiket. Min kêliyek ji hev veqetînê dîtibû. Dîsa min gelek dawet temaşe kiribû. Dema keç ji malê derdiket endamên malbatê digiriyan û xembariya ji hev veqetînê dijhat jiyîn. Min her kes yek bi yek dişopand û ez jî bandot bûm. Lê Kesîre sakîn bû. Bi wan re eleqeder dibû û ew dihedirandin. Bi heman rehetî û bê ku bi-axive ev tişt dikir. Bi awir û bêdengiya xwe ve bandor dikir. Carekê got; “emê bi telefonê bi-axivin. Ez li vir im. Mereq nekin.” Tenê çend gotin kir.

Min jî ji xwe dipirsî, gelo dizanin em diçin kuderê. Ne gengaz bû ku nezanin û fêm nekin. Ji ber vê ew qasî bandor dibûn. Keçên malê û Elî Kemal em bi wesayîta xwe birin heta rawestgeha wesayîtan. Me xatirê xwe ji hev xwest. Ez û Kesîre li otobûsê siwar bûn û rê ketin. Di rê de carina em bêdeng dibûn, carina jî em di-axivîn. Heta em helbestan jî dixwînin. Ez qet jibîr nakim Kesîre helbestek Nazim Hîkmet xwendibû. Dengê wê xweş bû. Min li mala wan jî dengê wê di qasetê de guhdar kiribû. Kilamek bi Kurdî gotibû. Ew helbesta Nazim hemû xwend:

“Hewa weke fîşekê girane
Hewa weke axê avise.
Qîr bi qîr diqêrim!
Bazdin bang dikim fîşekê bihelînin
Lê, ew ji min re dibêje:
Ger tu nesojî
Ez nesoj im
Em nesoj in
Wê çawa tarîtî ronî bibe”
("Hava kurşun gibi ağır
Hava toprak gibi gebe
Bağır bağır bağırıyorum!
Koşun kurşun eritmeye çağırıyorum
O diyor ki bana;
Sen yanmazsan,
Ben yanmazsam,
Biz yanmazsak.
Nasıl çıkar karanlıklar aydınlığa")

Min jî hinek beş xwendin. Lê wê hemû dizaniya û hêdîka ji min re dixwend. Sohbeta me li ser helbestan berdewam kir. Me helbesta Tevfîk Fîkret a bi navê "Mij" (Sîs) anî bîra hev.

Rêwîtiya me bi Kesîre re heta kolana Fewzî Çakmak doma. Ez bawerim Kesîre piştî Elezîzê derbasî Amedê bibû.

Dê hevdîtina me ya duyem jî di pêvajoya Kongreya 1. de ba.

Dema behsa jinên elezîzê dihat kirin dayîka zencefîl dihat hişê mirov

Rêwîtiya me heta Elezîzê berdewam kir. Em çûn mala Sarikaya ya li jorî coka Fewzî Çakmak. Ji ber her kesî Zencefîl dinasiya, bes bû ku mirov pirsa Zencefîl bikira. Ji ber dayîka Zencefîl jî yeke cuda bû. Rûyê wê her bi 'qurban-heyran'dagirtîbû. Lê jinek Elzîzê ya ku tiştên di dilê xwe de jî li pey mirov re digot.

Ji nû ve vegera Kurdistanê! Gelo serpêhatiya nêzî salakê xilas dibû. An jî nû destpê dikir?

Li Elezîzê kolana Fewzî Çakmak û malbata Sarikaya bin av û deng in. Berî ez bêm û binasim min dizaniya. Dihat gotin; "polîs nikare bikeve Fewzî Çakmak, şoreşger li wir bi çek û uziyan ve digerin." Ji ber her kesî behsa malbata Sarikaya jî dikir, dîtin û naskirin bi mirov re dibû mereq. Ji ber her kesî dizaniya ku hemû malbat her tiştê xwe ji partî re vedike. Bi taybet jî hevalan gelekî pesnê dayîka Zencefîl û keça wê Saniye didan.

Zencefîl reîsê malê bû. Bedena wê girs û bilind bû. (çalimli). Kurdî û Tirkî jî dizaniya. Malek ji axê yek qet, bes gelek odeyên wê hebûn. Hinek endamên malbatê li Ewrûpa karker bûn kar dikirin. Li pişt malê zaroyên malê yên din hebûn. Ew jî xizan bûn. Jiyanek wan a pir dilnivis hebû.

Dema behsa jina Elezîzê dihat kirin, dayîka Zencefîl dihat hişê mirov. Wê hemû xisletên xwe dida der. Mirov dikariya di kesayeta wê de hemû xisletên jina Elezîzê ya kevneşop bidîta. Hinek kolanên weke Yildiz Baxlari, Kirkdutlar, kolana Îstasyonê û her wiha piranî nîştecihên ji Dêrsimê hatîbûn. Jinan zêdetir şal li ber xwe dikir. Heta nîvê bedenê çarikên reş, an jî şûna çarikan xavik li ber xwe dikirin. Di lingê wan de terlik, pêlavên naylon û piranî çizlawat hebûn. Li kolanan herî zêde jin dihatin dîtin. Li malan av tinebû.

Di van kolanan de her tim pirsgirêka binesaziyan hebû. Gel ji hinek çeşmeyên di navbera kolanan de av digirt. Jixwe çûn û hatina avê bi serê xwe pirsgirêk bû. Jiyan hema bêje tenê bi wê ve hatibû girêdan. Ji ber bandor dikir. Jinê jî ev kar kiriye navenda jiyana xwe. Piraniya rojê di rêya avê û ber çeşmê derbas dibe. Pêşketin û guhertinên heyî li van deran tê bihîstin. Hemû nûçe û agahiyên, erênî-neyênî, ser ve zêdekirî, ecêb û bi guman ji van deran tê girtin û belav dibe. Jin di vê mijarê de weke çanda rêxistinkirî ya çeşmê ava kirine.

Dema ku berê fitne-fesadî, liber hevdan, derbarê xwarina malê de de wê çibe li ser van çeşmeyan dihat nîqaşkirin. Lê niha rojev her ku diçû li ser "siyaset, çepgirî û şoreşgeriyê" pêş diket. Sohbet û axaftinên veşartî yên di vê mijarê de girîng dihat dîtin. Weke rewşa koman û fraksiyonên din! Axaftinên têkildarî wan, kî kuderê, kîjan siyasetê diparêze, hêdî hêdî li vir

zelal dibû. Bes herî zêde jî li van deran agahiyên ecêb derdiketin. Di zimanê gel de dibêjin, “agahiyan ji zarokan bigirin.” Lê li Elezîzê gotina “agahiyan ji ser çeşmeyan bigire.” Derbasdar bû. Rastiyek wisa jî hebû.

Keça malê Saniye jî pir bi nav û deng bû. Hevalan gelek propagandeya wê ji hevalên keç ên Dêrsimê re kiribûn. Me digot qey ji ber xwe van tiştan dibêjin. Me wisa şîrove dikir. Digotin; “pir yeman e û leşkeriye.” Çalakgerî giyana komê ya cewherî bû. Jixwe têkoşîna bîrdozî û polîtîk çalakiya herî girîng û mezin bû. Lê çalakiyên şoreşgerî yên plankirî û birêxistinkirî û êrîşên pratîkî neçar dibûn. Ev di din ava hev de pêş diket. Li Elezîzê faşîst hebûn. Cihê herî zêde girseya MHP’ê lê evder bû. Qadroyên wan ên milîtan jî ji wir derdiketin. Ji ber nakokiyên çepgir û rastgiran bi xwezayî girse polîtîze dibû. ‘Têgeha dijmin’ ji bona çepgirên Elezîzê wateyek cuda dida. Li gorî wan dijmin tenê yên faşîst bûn. Teng digirtin dest. Ev jî sînorên Elezîzê derbas nedikir. Saziyên faşîst ên baskên dewletê bûn, ji dewletê û pêkanên din cuda dihatin dîtin. Ya rastî çepgiriya komên heyî li ser vî zemînî jiyana xwe ava dikirin. Lewma nêzîkbûna ji gel, dewlet, saziyên wê, ango hemû şoreşê re şêweyek wisa derdixist holê. Belê, lewma li Fewzî Çakmak bi çek gerîn, nobet girtin û mîtîng kirin, şoreşgeriya milîtanî dihat hesêbê. Ji bona komên din jî warê têkoşînê Fewzî Çakmak bû. Amûrên têkoşînê yên herî bi bandor mîtîng, firotina rojname û kovaran, daxwiyanî û propagandeyên li kehwexaneyan bû. Ev xet û ev amûr ji bona van koman her tişt bû.

Saniye keça malê ya bi tenê bû. Li malê ew tenê zaroka keç hebû. Ji ber hatin û çûnên malê yên hevalan bandor li ser wan jî

kiribû. Saniye jî bi giştî pirsgirêk fêm dikir, baldar bû û di-axivî. Ji ber li malê zaroka keçe w tenê bû, ti nêzîkbûnek çewsîner û feodal ne dihat raberkirin. Pir serbest bû. Me ji bona hinek cihan karê birina not û demanceyan bi wê dida kirin. Ev karên veşartî bûn û di heman demê de cesaret dixwest. Ev kar jî Samiye derxistibû pêş. Malbat jî ji hemû malbatên din cudatir, mala xwe ji hevalên herî veşartî re jî vekiribûn. Lê mixabin weke her cihî hevalên me li vir jî, bikaranîna malê de sînor derbas dikirin. Bi taybet qadroyên xwecihî û hemû hevalan ewder weke kehwexaneyê bikar tanîn.

Hinekê jî karê hêsan digeriyan. Malbat baş bû û ji her kesê ku diha û diçûn re xizmetek baş dikirin. Ji tiştekî re gotine na, nebû. Lê dîsa jî hatin-çûnên malê yên vala rê ji bertekan re vedikir. Lê ev vekirî ne digotin. Ji ber min ev di roja destpêkê de ferq kir, aciz bûm. Dema ji hinek hevalan re dihat gotin baldar nêz bibin, bertek raber dikirin. Digotin; “ ew malbat û dayîka Zencefîl ne weke tu nas dikiye. Te baş lê nenêriye.” Ya rastî nêzîkbûnên malbatê jî ji qadroyên xwecihî û qadroyên ji derve de dihatin re cuda bû. Di vê mijarê de nêzîkbûnek bê pîvan hebû. Weke din wan jî di vê pêvajoya pêwendiyan de, em nas kiribûn. Xisletên me ji nêz ve dişopandin û li gorî wê nêz dibûn. Hevalên ku ji derve de dihatin hê zêdetir hişyar tevdigeriyan. Ji ber dixwestin malê dem dirêj bikar bînin. Nêzîkbûna ku peywendî mayînde dikir jî ev bû.

Di binya vê malê de, malek du qet hebû. Qeta jorîn hevalan kirê kiribû. Her kes ne diçû wir. Zêde kes lê nedima. Malek mezin û hundurê wê vala bû. Soba wê tine, an jî bê dar bû. Zêdetir di hevdîtinên girîng de dihat bikaranîn. An jî hinek hevalên ku ji cihên cuda dihatin li wir diman. Mala yekem car

a komîn bû. Mala me ya rêxistinê bû. Destpêkê Dîlawer Yildirim lê dima. Jixwe ew di radeya yekem de berpirsê qadê bû. Saxir Metîn û Hamîlî jî hebûn. Hinek heval ne mayînde bûn. Di navbera herêman de digeriyan.

Dîsa tevî ku zêde nedihat bikaranîn jî malek din hebû. Mala Elî Dursun wan bû. Ev mal di navbera kolana Çandê û kolana Fewzî Çakmak de bû. Malbatek ji Bîrvanê bû. Jêr û jora malê hebû. Elî Dursun jî qadroyê xwecihî bû. Hevjîna wî mamoste Cemîle jî, ji heman gundî bû. Du keçên wan ên bi navê Roza û Hêlîn hebûn. Dayîk û bavê wan li qeta jorîn diman. Biçûkên wî Semra û Saîm jî dilsozên me bûn. Rewşa vê malbatê jî ne xirab bû. Halên wan baş bû. Hem mûçeyên wan hebû, hem jî ji gund hinek par digirtin. Ciwanên Şoreşge li gundê wan bandor bûn.

Ji wê derdorê Elî Dursun heye. Dikeve çav û bal ser xwe kom dike. Lewma dema neçar de ev mal tê bikaranîn. Piştî ku ez demekê li mala Sarikaya û malên din mam, ez derbasî mala Dursunan bûm. Piştî demekê Nurheyat jî ji Dêrsimê hat. Min hevalên ku li Elezîzê nas kirîn û me bi wan re perwerde daye destpêkirin bi wê Didim nasîn. Sakîne Kirmizitaş heye. Malbata wê têkilheve. Ew eslê xwe ji Dêrsim-Mazgirtê ne. Xwîşkek wan a mezin mamoste bû. Birayek wan ê mezin bi Stêrka-Sor re tevdigere. Ev di pêvajoya destpêkê de nedihat zanîn. Ji ber me zêde ew nas nedikir. Lê bi Alaattîn Kapan û jinek bi navê Gûlay re hatibû malê. Sakîne wan nas nake. Ji ber di van deman de Stêrka-Sor, an jî bi navê din Bêşparçeyî zêde ne dihat nasîn. Wan jî weke hevalên birayê xwe yên ji rêzê dihesibîne. Lê ew qatilek bû. Hem jî qatilê hevalê Heqî Qerer bû. Kiribûn mêvanê xwe. Lê em piştî demek dirêj bi vê hesiyan. Pişt re Sakîne got:

“ew hatin bûn mêvanê me. Ma dê min ji kur bizaniya?” Û gelekî xemgîn bibû û bêzariya vê rewşê dijiya. Gelo dibû ku ev rewş biba sedem li hember wan bê bawerî pêş biketa.? Gumanek wisa hebû. Me ev ji hevalê Cemîl Bayik re got. Jixwe zêde belav nebû.

Saniye, ji hêla siyasî ve teng, seresere û ne di cidiyeta kar de bû. Hêjî kûraniya wê fêm nekiribû. Hinekê jî keyfî bû. Sakîne jî tam berovajî kesayetek kamil, hewldanên xwe yên pêşketina teorî û bîrdozî hebûn. Zêdetir baldar nêzî mijara rêxistinê dibû. Fatma’ya ku xizmê hevalê Zekî Budak bû, dîsa keça apê Sarikaya Leyla û li wê derdorê çend keçên din ên dilsoz hebûn. Koma yekem a perwerdeyê ji van ava dibû. Me bi pirtûka Stalîn a Materyalîzma Diyalektîk û Dîrokî destpê kir. Hinek endamên koma perwerdeyê diçin dibistanê. Her yekê bi dureyekê qedexeya malbatê re rû bi rû ne. Lewma em di roj û demjimêrên heftê yên diyar de perwerdeyê dibînin. Sazûmaniya pêwendiyek nû ya ji bo vê xebatê hewce dike pêş dikeve. Ev jî ne hêsan in. Malbatên ku tengezariyê jî derdixin hene. Ev xebat ji sazûmaniya malbat û dibistanê cudatire. Her kes ne weke dayîka Zencefîl bû. Wê jî, heta ku xeternakî ne dîtiba, dengê xwe dernedixist. Weke din jî rolek malê hebû. Her çendî sazûmaniyek peywendiyên malê yên ji pêşî ve hatibin sazûmankirin nebe jî, di meriyetê de weke mala rêxistinê bû. Ev jî ew dida rawestandin. Nurheyat jî piştî min yek ji malê reviyabû. Bi henekî got; “ niha dê dayîka min biçe bela xwe li dayîka te Zeynep bixe û bêje, ‘ka keça min Nurê li kure?’ mîsoger keça te ew biriye û dê hesab jê pirse. Min jî heneka wê temam kir û got; “ dê dayîka Zeynep jî bêje, çi gunehê keça min heye? Her kes berpirsê zaroyê xwe ye. Keça

kî ji malê direve tê li deriyê min dixe. Ax Seko… Ax Seko… Te çi anî serê min.” Piştî van jî giriyaye. Dest bi bêdi-ayan kiriye. Min dizaniya kul i hember hinek din min diparêze. Lê piştî wê jî îsyan û bê dua kêm nedibû û ev jî xoyek wê bû.

Meto vegotibû; li wêneyên Marks, Engels, Lenîn, Stalîn û Mao yên li ser dîwaran nêrî bû, bi dorê navê wan gotiye û hêrsa xwe aniye ziman û stran jî li ser wan derxistiye. Dawî gotiye; “ hûn bûn sebeba keça min.” Ji xwe nekariya rasterast navê Stalîn, Lenîn û Mao jî bilêv bike. Ew jî bi vî halê xwe hem giriye û hem keniye. Welhasil dayîk ecêb e. Dayîka min Zeynep! Ez û Nurheyat di koma perwerdeya li Dêrsimê ya yekem de bihev re bûn. Hevaltiya me, parazvantiya me ya bîrdozî û naskirina me ya tevgerê di wan pêvajoyan de destpê kir. Weke din me li taxê ji dûr ve hev dinasiya.

Di serî de pêwendiya me bi xwîşka wê ya mezin re hebû. Min ew nas dikir. Ew jî beriya me bi TÎKKO re bû. Dema peywendiyên xwe bi me re pêş xist, xwe tam tevlî nekir. Pêwendiya bi TÎKKO re jî ji ber girêdanek dergistî didomiya. Tam ji wan qutnebû. Dergistiyê xwe yê ji TÎKKO bernedabû. Her îdîa dikir ku dê wî qezenc bike. Nurheyat ji wê çalaktir bû. Di nava koma yekem de ya herî zêde xwe ji hêla teorî û bîrdozî ve amade kirî ew bû. Lê pir hestewar bû. Ne şerker û hişk bû. Her tim rihek wê ya bêçare hebû. Ew sekna wê bandor li ser malbatê jî dikir. Bi wî rengî cidî jî nedigirtin. Sazûmaniya cihê lê dijiya çawa ba, ew qebûl dikir, serî ditewand û xwe ji însafa wir re dihişt. Ne xwedî hewldan û guhertin ava nedikir. Hêza wê ya rêvebirina bûyeran lewaz bû. Lê di nava xebatên perwerdeyê de baş di-axivî. Daxwaza wê ya tiştên ku girtine dayînê û vegotinê de hebû. Ji vê hêlê ve bi bandor bû.

Berî ez bêm Elezîzê pir behsa min kiribûn. Bi taybet reva min a ji malê, weke filmekê vegotibûn. Bes bû ku Sarikaya van bizanin. Ji ber wan agahiyên bi vî rengî û bûyer di demek herî kin de li hemû taxê belav dikir. Ew jêhatiya wan hebû. Min di danasîna destpêkê de navê xwe Fatma da nasîn. Lê Hamîlî yekser ket navberê û bi ken got; " çi Fatma, ev e Sakîne Cansiz." Pişt re li min vegerî û got; "berî tu werî me tu dayî nasîn. Heta me ji reva te, heta ji devjêberdana te tev vegotiye." Saxir Metîn xwe rast kir. Lê ez ji ber vê hinekê aciz bûm û mat mam.

Ya rastî weke kes ji bona min ti girîngiya vê tine bû. Ne pirsgirêk bû. Dîsa jî ji bona berî bêm ev qas berfireh danasîna wan ez aciz bûm. Min ji xwe re hêdîka got; "ji ber dikariya hem ji bo kar û hem ji bona pêwendiyan tengezarî ava bikira. Mirovên me dema dixwazin dikarin tişta herî asayî li gorî xwe şîrove û belav bikin. Dîsa dikariya tiştên ku bikaribin di pêwendiyan de bikar bînin derbixin holê. Ma çi hewce bû?" Jixwe navê Fatma jî nehat bikaranîn. Hineka digot Fatma, hinekan jî Sakîne bin av dikir. Hinekan jî her du nava weke du kesên cuda didan diyarkirin. Bi demê re ez jî fêrî her du navan bûm.

Baqî devji min bernedida. Vê carê jî hatibû Elezîzê. Ez diçûm kur, ew jî dihat wir. Heval didît û diçû cem wan. Bi wan re di-axivî, ji wan re gotiye nakokiyên di navbera me de nekûr in, ji hêla rêxistinbûna cuda de jî xwe qane kiriye, di vê mijarê de weke kesek bi vê bîrdoziyê xwe avakiriye dê bibîne, li şûna di bendewariya heman tiştan de be, dê wext binase, li her cihî derfetên têkoşîna hevbeş heye û dê ewê yekbûna rêxistinî ava bike. Nizanim çawa dîtibû, lê hatibû cem Sarikaya wan jî. Dîlawer jî bi axaftinên wî qane dibin. Vê carê jî hewl didan

min qane bikin. Kesekê nêzîkbûnên wî şaş ne didît. Heta digotin; “ev zilam hevalê me ye.” Çi feydeyek nebû ku ev pirsgirêk dirêj were vegotin.

Ger li gorî hinek hevalan veqetînk bîrdoziye, ‘ne tiştek din be’, wê demê wateya jihev veqetînê hebû? Dema wisa li pirsgirêkê dinêrin ez jî nikarim zêde nîqaş bikim. “Gelo, tiştek din heye?” Gelo tiştên din çibûn? Ma tiştek din hewce nedikir? Hevrebûnek bi vî rengî çawa hetibû avakirin, kesekê bal jî nedida ser vê mijarê. Dibêjin her tişt ji bona şoreşê ye. Ez ji malê derketim û di vê demê de min zewacek ku ti bingeha xwe tineye kir. Min çarenûsa vê jî bi yekbûna bîrdozî û rêxistinî ve girê da. Ger ev were sazkirin, ango yekbûna bîrdozî were sazkirin, ez dikarim domandina vê yekbûnê bidim ber çavan. Ya rastî di vir de bandora kevneşopiyan heye û dibe ku çewsandinên wê jî bidomin. Ji ber di rewşa heyî de ji bona bihevrebûnê hêmanek hezkirin û girêdanê ya zelal tineye. Ji ber hest, bertek, bêçaretî û lêgerînên têkilhev rê ji vê rewşê re vikiribû. Fikira ku dibêje, “yekbûna bîrdozî û rêxistinî nebe jî dikare naveroka vê têkîliyê were dagirtin”, an jî hêviyek wisa zêde ne rasteqînî ye.

Nêzîkbûnên Baqî yên têkîliya milkiyetê derbas nedikir, helwestên wî zewac girtina dest û helwest û pîvanên min ên di vê mijarê de bi rêgez dida diyarkirin ku dê ev rewş heta dawî neçe. Lê ji ber min hevrebûn û jihev qutbûn di nava şerek bi hedar, kamil û encamgir de nemeşand, nêzîkbûnên min ên lez, hestiya û lewaz bi xisletên min ên hêsan tên bikaranîn re bûn yek, tenê “çîrokek avînê” ya trajî-komîk derket holê. Di heman demê de bû pirsgirêkek ku bi demê re mijûl bike. Min ev di astek girîng de ferq kir û hewl da derbas bikim. Êşên vê pirsgirêkê dihişt ku ez hê zêdetir şer bikim.

Min pirsgirêk ji aliyê xwe ve çareser kiribû. Her çendî bandora tiştên ku hatin jiyîn hebin jî, min ji bona derbaskirina wan pêşketinek û aramiyek giyanî bidest xistibû. Lê mixabin tam di pêvajoyek wisa de "aştî" ji nû ve ket rojevê. Dema ji derve de lê dinêriyan pir hêsan bû. Dibe ku gelek hevalan jî dihizirî ku di zewacê de tiştên wisa asayî ne û di vê baweriyê de bûn. Yên ku wer dizaniyan ku e xeyîdîme û delaliya xwe dikim jî henek bi min dikirin. Digotin; "tu biçî ku derê ev zilam pêşiya te bernade." Li qadekê, an jî herêmekê şêwazek pispor karkirinê de ji bona jinekê zehmetî û bêderfetî jî gelek bûn.

Ji bona hevalan pirsgirêkek bi vî rengî tine bû. Li cihên ku dixwestin diman. Lê jinek ne dikariya li hr cihî bimîne. Dê heta çi demî li malên malbatê xwe biman. Gelo dê malbat çi qas ji vê re vekirîbûna? Mirov nedikariya demek dirêj li cem malbata herî baş jî bima. Pir zehmet bû ku mirov bi hevalên zilam re jî bimîne. Bandorek neyênî li derdor ava dikir. Ji ber nêzîkbûnên derdor hêjî paşvrû bûn. Em jî di vê mijarê de nûbûn. An me bi dîmenek 'xebatkarên mala xwendekaran' dida diyarkirin, an jî me dîmenek malbatî diyar dikir. Ev jî şert bû. Nexwe dê bal dikişand. Dibe ku heval ji ber van bê derfetiyan tişta hêsan dihilbijartin. Ji ber mantiqê "malek me din jî hebe baştire" pir zêde bû. Lêgerînek ku pirsgirêkê hîn ji kûranî û bi tenduristî çareserkirinê dûrbûnek hebû. Ev nêzîkbûn zêde lewaz bû.

Belê, dema ez ji Îzmîrê derketim min ji Baqî re "derî vekirî hiştibû." Ji ber weke qonaxên pir tûj û em carek din nikarin bihevrebin ne didît. Li gorî wî, çawa ku nakokiyên di navbera gel de bûhurdar bûn, nakokiyên di navbera şoreşgeran de jî dikariya lihev bikin. Rast bû, me hêjî dijberiyek tûj ne dijiya. Lê nakokiyên heyî jî ne di wê astê de bûn ku biçûk werin dîtin.

Hê di destpêka salên 77'an de bibû xwedî nîtelîkek pevçûn û şahadetên pir kûr. Jixwe Baqî ne tevgerek bû. Endam û qadroyek wê bû. Di heman demê de ez jî dilsozek tevgera xwe yek ji rêzê bûm. Lê xisleta têkoşînê û teşegirtina kesayetan pir girîng bû. Yekbûna bi her kesî re û jiyana tê xwestin esas girtin, li kêleka wê jî hinekê şoreşgerî kirin, ne şoreşgeriyek rasteqînî bû. Her kes dikare ya destpêkê bijî. Ji xwe re hilbijêre. Lê ya duyemîn barek wisa bû divê li Kurdistanê barê dozê rake, wê bi milîtanî bimeşîne û pêşengiyê bike. Ev şertê esasî yê nebê nabêye. Bûna şoreşgerek Kurdistanê hestek pir cuda bû: civak jihev dirûxiya, çîn ketibûn nava pêvajoya rûxandinê û kesayet jî weke kombûna hemûyan rûxandinek dijiya. Nakokî, ser û jêrbûn çêdibûn û lêgerîn zêdebûn. Lewma diviya destpêkê diyarde di hiş û giyanê de zelal bibûna û pişt re derbasî jiyanê bibûna. Ev pêvajo tev bi êş derbas dibûn. Giran bûn, lê bedew û manîdar bûn.

"Ji zilam zêdetir bawerî bi jinê tê"

Hat gotin divê ez biçim Çewlikê. Li wir pêdivî bi hevalên jin hebû û diviyabû ji min û Nurheyat yek ji me biçûya. Heval jî çûna min baştir dibînin. Lewma ez û hevalê Delîl Doxan pêk ve ber bi Çewlikê rê ketin. Delîl gelekî zindî ye. Di cihê xwe de nasekine. Bê navber daxive û bêdeng nabe. Hewl dide min jî bide axaftin û henekan dike da ku ez jî bikenim. Dem bi dem jî derûdor bi min dide nasîn. Lê, ji ber şeve ez tam navendên nişteciha nabînim. Tenê hînî navê wan dibim. Ez jî ji xwe re dibêjim; "ger roj bûya wê çi qas baş bûya. Ji ber ez Kurdistanê pir kêm dinasim." Ji ber vê ez ji guhertina cih û waran hez dikim. Ji bona min kîjan cih û war be ferq nake û xem nake. Rêxistin çi bêje û bişîne kur ezê biçim wir. Ez tenê her tim heyecan û kêfxweşiya wê dijîm. Delîl behsa binesaziya Çewlikê ya civakî û siyasî dike û dibêje; " 'bi gelemperî cihek yobaz û paşverû ye' bandora ol zêde ye, hemû jin carikan li ber xwe dikin û rûyê xwe dipêçin. Çi nabe wê tu jî li ber xwe bikî". Lê belê min dizaniya ji bilî vegotinên wî yên destpêkê, yên din hinekê dinepixandi û henek dikir. Jixwe wî jî bi rûkenî digot û dixwest bizane bê ka wê bertekên min çawa bin.

Yekser ez birim mala hevalê Mehmet Karasungur. Ji ber ew mamoste bû, li avahiyên dibistana amadeyî (lîse) dima. Dema em ketin hundur me hew dît hemû heval di civînê de ne. Nêzî panzdeh hevalan civiyabûn. Ez pir kêfxweşbûm. Hê di roja yekem de min hemû qadroyên me û hevalên li qadê kar dikirin piraniya wan dît û nas kir. Hevalê Mehmet Xoce, birayê wî Heyder hebûn. Her wiha Zekî, Abdullah Ekîncî, Resul Altinok (Dawut) û hevalên din jî pê re. Civîn gihabû astekê, lê piştî qediya em axivîn.

Mehmet Xoce nêzî min û Delîl bû hêdîka pirsiyar dikir. Dixwest navê min bizane û hîn bibe bê ka ez ji kur hatime. Di navberekê de Delîl got; ‘ hevalek ji Enqereyê hatiye’. Ez bawerim Xoce, di kêliya yekê de wer zanîbû ku, ez Kesîre me. Min jî got; ‘navê min Fatma ye’, lê Delîl ket navberê ez bi nasnameya min dam naskirin. Got; “ Sakîne Cansiz e”. Pir dereng bû. Xoce got; “ em xwîşka xwe bişînin cihek guncav. Vir ne baş e”. Her çendî hinekan got bila li vir bimîne jî, dema Xoce got; “ na, na. Ger cîran bibînin wê yekser bigihînin Medînayê. Ji ber vê wê ne baş be. Vê carê jî emê wê ve mijûl bibin”, min fêm kir ku ew zewiciye. Hevjîna wî Medîha û lawê wî Devrîm çûbûn bêhnvedanê.

Xoce li min vegerî, nêrî û bi mahçûp îzaha rewşê j imin re dike. “ez dizanim hûn westiyane. Lê nêz e. Hûnê biçin çem Bîbiya me. Keçên wê jî hene. Hûnê wan jî binasin. Bîbî ancex destûrê bide te, ji ber keçên xwe ji me diparêze”. Di vir de henek jî dikir. Lê dema ez çûm min Bîbî dît, mi zanî ku Xoce rast dibêje.

Ji ber em di katjimêrên şevê yên dereng de çûbûn, di pêşwazîkirina yekê de hinekê bandor kiribû. Heyder Qeresungur got; “ hevalek jin e, ji Enqereyê hatiye. Pê re eleqeder bibin, emê sibehê werin baxivin. Hûnê jî xwîşka me binasin û pê re bi-axivin.” Ji her alî ve eşkere diyar bû ku Bîbî pir ji Heyder hez dikir. Bi hezkirî li wî dinêriya. Bi henekên wî jî pir şad dibû û dikeniya. Pir zêde jî xwe tirş (somurtma) nekiribû. Yên razayîn jî dema bi hatina me hasiyan hêdî hedî rabûn. Mal tije keçên ciwan bûn. Çar keçên wan hebûn. Bavê wan jî çûbû Ewrûpayê. Ez vê jî di kêliya sohbetan de hesiyam. Hemû keçan dixwendin. Xwendekarên dibistanên navîn û

amadeyî bûn. Ji her alî ve diyar bû ku ti eleqeya wan bi siyasetê re tine ye. Li malê otorîteya dayîkê serwer bû. Min jî di dilê xwe de digot; 'hêvîdarim naşibe dayîka min'. Her tiştên min dişopandin.

Min ji wan re got; valîzê min li cihek din meye, pêdiviyên min jî li wir mane". Rast bû. Di valîzê min de gelek cilên ku bikaribim bi dem dirêjî pêdiviyên xwe pêşwazî bikim hebûn. Lê ne li cem min bûn. Hem ez ji Enqereyê dihatim û hem min ti pêdivî bi xwe re ne anibû. Ev nêzîkbûna min bê tevdîr jî dê bal bikişanda. Ji ber îmaja yekem mirov li malê diyar dike pir girîng e. Lê ez zêde baldar nêzî vê meseleyê ne bibûm. Dîsa jî, serê cilê min serhev de ne. Derbarê her tiştî de hişyar nêz dibim. Pir baqijim, baldar im û xwe qet weke mêvanekê nabînim. Lê ez dîsa jî hesaba bertekên wan ên her mijarê de dikim. Jina malê pir jîr e. Dema bi keçên xwe re jî tiştên ku şaş, an jî kêm dibîne, yekser bi çav û awirên xwe destwerdide. Diyare pir hişyar nêzî wan dibe û ew jî dixwazin xwe baş (îmaj) bidin diyarkirin. Ji bona hevalan gotine ji Enqereyê hatiye, hê zêdetir hişyar nêzî min dibin.

Keça navîn Aysun jî her ku firsendekê dibîne pirsan ji min dike. Çavên ayîka wan jî li ser wan e. Çavderiya wan dike. Ji ber naxwaze mijarên xeter werin vegotin, hişyar nêz dibû. Ev di rûyê (mîmîk) wê de jî diyar dibû. Qet hez nedikir ku pirsên ne di cih de werin pirsîn. Ji ber ger pêwîst ba wê Heyder ji wan re bigota. Lewma banî keçên xwe dikir digot; " bese, bes jê pirsan bikin, rehet bedrin, westiyaye ji rê hatiye, bihêlin bila raze." Diviyabû Bîbî biçûk nehata dîtin. Ji ber bidestxistina van keçan bi fetihkirina dilê Bîbî re derbas dibû. Em her du jî nerm nêzî hev dibûn. Ji ber tu her çi qas bi aqil û kamil nêzî wê bibûya, ew jî ew qas giranbiha û kamil nêz dibû.

Mêvandariya min a çend rojan li vê malê qediya. Hevalan ez birim mala Elî Gûngor ê li taxa Ûç Qatan (ûç katlar). Çûna min a mala Bîbî û eleqederbûna min a bi keçên wê re ji bo pêşxistina pêwendiyan bû. Girêdanek bi wan re avakirin hêsan bû. Lê dîsa jî ez bi çaveke mîsoger hatine qezenckirin lê dinêrim. Her çendî çavlêkirinên keçan hebe û haya wan ji Kurdinî, Kurdistanê tine jî be, e di wê baweriyê de bûm wê bihatan qezenckirin. Ma gelo dema me jî nû şoreşgerî nas kir, em jî ne wisa bûn? Na. Ez di vê mijarê de qet ne bê bawer im. Ez di pêwendiyan de qet zehmetiyan najîm. Belovajî bandorkerim. Bi wan re pirs û mereq Didim avakirin. Ji ber ger ji van aliyan ve peywendî pêş biketa, wê nîtelîka pêwendiyê jî çûda pêş biketa.

Elî Gûngor Nazmiye ango Dêrsimê ye. Hevjîna wî Fethiye jî ji Qerekoçanê ye. Ew bixwe li Bayindirê karmend bû. Fethiye jî mamosteya dibistana seretayî ye. Keça xwe ya biçûk Roza jî li cem malbata xwe hiştibûn. Mala wan ji hevalan re vekiriye. Ez Birahîm Gûngor li Dêrsimê dinasim. Weke din jî min xiamên wan li Almanya nas kiribûn. Malbata wan berfirehe. Lê min cara yekê bû Elî didîta. Ji ber min malbata Gûngoran ên li Almanya dinasiyan, min dikariya hêsan peywendî pêş bixim.

Dema ew diçûn kar mal ji min re dima. Heta demekê min ne dikariya derkevim ber derî û ne jî dikariya derkevim eywanê (balkon). Ji ber hem beramber û hem li qata jorî me mala polîsan hebû. Lewma pir hişyar nêzî çûn û hatinên malê dibûn. Em neçar bûn ku roj mîsoger weke ku kes li malê tine ye diyar bikin. Ev jî ji aliyekê ve bêhna me pir teng dikir. Lê dema min pêvajoyek dem dirêj difikirî, min dizaniya ku divê ez wisa tevbigerim. Min ne dixwest ku zû eşkere bibim.

Pêvajoya ceribandina komîtebûna ne. Xebatên şêweya nûnertiyê her ku du diçe bi şêwaza komîteyên jêr û jor xwe birêxistin dikirin. Berpirsê komîteyan jî piranî dibûn sekreterê komîteyan. Her komîte di nava xwe de weke bi navê komîteya leşkerî, komîteya jinê, komîteya ciwanan û komîteya karkeran cihe bûn. Xebatek li ser bingeha dabeşkirina kar bû. Bi pergal bû, hîna di nava xwe de cihebûnek tam saz nekiribû. Lê ev destpêkek bû. Şema zêde esas nedihat girtin. Qada min a xebatê jî hê zelal ne bibû. Lê dîsa jî qada kum in dikariya hêsanî biketam nav û peywendî pêş bixista, qadên jinan bû. Lê aliyê wê yê cihe û xweser tine bû. Ew jî di nava xebatên giştî de, girêdayî wê dihat meşandin. Hê di derbarê xebatên jinê de di asta fikir de jî pêşnûmeyek tine bû. Me bi nêrînên weke "wê jin, beşdarî Rizgariya Netewî bibe, dema xwe bigihîne, ku bikaribe li her qadê erk bigire, wê azad bibe û emê jî bigihin Rizgariya rasteqînî" ve, hewl dida rastiyên xwe yên giştî di qada pratîkê de bigihînin hemû jinan.

Ev qad, qada herî zêde bindest bû û qada herî zêde derfetên xwe yên şoreşgerî li pêş bû. Bawerî bi vê hebû. Hê di destpêka derketina komê de nêzîkbûna ji jinê re di asta girîngiyek mezin de derketibû holê. Dîsa gelemperî jî bandorek ji tevgrên jinê hebû. Ji ew di asta giyanwerî de hêz didan. Ji aliyê baweriyê ve jî tevkarî dikirin. Lê hêjî em ne daketibûn cewhera pirsgirêkê û di xwedîderketina me de kêmbûnên cidî hene. Ev pirsgirêk bi kûranî ji aliyê dîrokî, civakî û rojane ve nehatine lêkolînkirin û li Kurdistanê derbarê jin beşdarî şoreşê kirin, di vê manê de di şêwazek li gorî armancê wê gihandina hêzek bîrdozî-polîtîk û pratîkî de hedefek zelal tine ye. Pirsgirêk zêdetirîn di nava hedefên giştî de dihat destgirtin. Radeya wê ya gotûbêj, lêkolîn û lêgerînan teng û giştî dimîne.

Enstituya Perwerdê ya Çewlikê, xwedî xisleteke bûna dibistana mamosteyan a duyemîn a Dêrsimê bû. Li dibistanê nijadperest jî hebûn. Potansiyela ciwanan a vir hem zindî û hem ji rêxistinkirinê re vekiribû. Hevalê Mehmet Qarasungur mamosteyê dibistana amadeyî ye. Dibistana amadeyî jî di naa liv û tevgerê de bû. Bandora pêşketinên şoreşgerî yên li Enstituya Perwerdeyê zêde bû. Ji aliyê nijadperestan ve kuştina yek şoreşgerekê hişt ku bibe sedem her der bibe pêtên agir. Di heman demê de kesê ku hatî kuştin yeke 'Sunî' bû. Dijmin li vê qadê bi zanebûn nakokiyên mezheban gur dikir, bi hev didan kuştin. Em jî bi vê zanebûnê xwedî li cenaze derketin, me merasîmek cenaze ya veguhere xwepêşandanek girseyî pêk anî. Hemû koçe û kolanên Çewlikê bûn qada xwepêşandanê.

Çalakgeriya heval Mehmet Qarasungur,di nava çeperên herî pêş de bi zanebûn û pratîkek ku divê li dijî nijadperestan tundiya şoreşgerî li ku derê û çi demê were pêkanîn ve, pir zelal derket holê. Ev giyana APO'yî ya Xoce Qarasungur bandor li her kesî kiribû. Wê rojê ciwanê dîn ê Çewlikê Hemîd jî yeke nejadî xirikandibû li ber dîwarekê û dabû ber kêran. Dema kêr lê di gotina wî ya "ji Kurdan re", dema kêr dikişand û ji nava vî derdixist jî gotina wî ya "Azadî" vebûn û pêşketina Çewlikê destnîşan dikir. Li Çewlikê hewl dihat dayîn ku nakokiyên Elewî û Suniyan kûr bikin û bedrin hev. Lê merasîma cenazeyê rêya yekîtiyê vekiribû. Merasîma cenazeyê di însiyatifa me de destpê kir û qediya. Ev merasîm, ji hêla refên xwe zelal kirin, naskirina Şoreşgerên Kurdistanê û dîtina çalakgeriya wan mînakek balkêş bû. Wan ciwanan û gel ev rastî bi çavên xwe dîtibûn.

Her çawa dibû Dawut bi taybet di van deman deman de veşartî tevdigeriya (îllegalîte). Me tevan jî hê di wan rojan mane ne dida wan nêzîkbûnên wî yên xwe veşartinê. Lê belê gelek caran li parka Şalwariyan bû. Ev jî cihek pir eklere bû. Li wir her cure mirov diketin û derdiketin. Herî zêde li wir gotûbêj pêş diketin. Koman li wir hev dinasiyan û peywendî jî li wir pêş diketin. Tevî carinan bi biryarên ji nişkê ve xwe vedikişand û vedişart. Diket malê û dernediket. Her ku zengila derî lê dida, yekser derbasî xorfeyên din dibû û xwe vedişart. Ew rewşa wî jî di navbera me de dibû mijara pêkenokiyê. Ji ber li Mala Gûngoriyan her tim helwestên bi vî rengî raber dikir, li dijî wî bertek pêş diketin. Ez jî pê dikeniyan. Ji ber ji min re jî weke rewşek pêkenok dihat.

Rojekê dema zengila derî lê ket, yekser çû xorfeyekê û xwe di nava dolaban de veşart. Ji ber bedena wî pir girs û çûrs bû, ne di destê min de bû kenê min pê dihat. Ji ber ez pê keniyabûm. Hefteyekê ji min xeyîdî. Ev jî kompleksek wî bû.

Mala ku Dawut lê dima yek qet bû. Malek spî bû. Me jê re digot; "Qesra Spî". Weke din jî me navê weke "Kung fu" û "apo ango mam" lê kiribû. Ji ber wî jî carinan bi henek jî be digot; ' ez ji Rojhilatê Dûrim, ez ne Kurdim' û dixist rojevê. Ew li malê bi hinek hevalên cuda hev re diman. Herî kêm ew li mal dima, lê heyrana malên malbatî bû. Ji wan malên xwedî malbat dernediket. Her cure nêzîkbûn û xoyên wî yên weke rûniştin, rabûn, axaftin, vexwarina çayê heta xwarinê, tev kirêt bûn û bal dikişandin. Hinek heval hebûn bi rastî jî gelek aliyên wan ên çors hebûn. Misqalekê jî estetîk bi wan re tine bû. An jî girîngî ne didan vê mijarê. Lê ev rewşa wan a çors jî bedew derdiket holê. Her çendî aliyên wan ên dihatin hezkirin hebin

jî, “qehra” wan jî ne kêm bû! Lê mixabin ti aliyê Dawut ên were pejirandin û erêkirin tinebû. Bi rastî jî ez di gotina vê rastiyê de ti neheqiyê lê nakim.

Li Çewlikê jî belovajî Elezîzê komên netewperest ên burjuvaziya biçûk hebûn. Nexasim Rêya Azadî xwe bi sipartina hinek derdorên navenda bajar ve birêxistin dikirin. Ev jî xebatek li derdora komaleya TÖBDER’ê dihat meşandin. Xwe dispartin derdor û eşîretên zemîn ji xisletên wan ên çînayetî re ava dikirin. Vekirinek berfireh tine bû. Têkoşîn tine bû. Aliyekê komaleya nijadperestan, aliyê din ango beramber wan jî komaleya wan hebû. Weke “biraderan” lihevkirî dimeşiyan.

Têkoşîna beramber nijadperestan, li Çewlikê ji bona rêxistinkirinê zemînek pêşxistinek kûranî û berfireh diafirand. Di heman demê de herikandina ber bi welatparêziya şoreşgertiyê ve leztir dikir. Komên ku ji xwe re digotin “Saziyên Demokratîk” û hebûna xwe bi wan ve girê didan, nedikariyan xwe beramber van pêşketinan bigirin. Navendên ku di hedefa têkoşîna bîrdozî-polîtîk û tundiya şoreşgerî de bûn, ketibûn nava pêvajoya belavbûnê de. Di hundur de jî kesayet bi tevahî xisletên xwe ve derdiketin holê. Dawut, her tim dixwesta êrîşên hevalan ên li dijî navendên faşîstan bide rawestandin. Gelek caran ez di vê mijarê de bûm şahidê nîqaşên pir dijwar û hişk derbas bûne.

Me her tim ev helwestên Dawut rexne dikir, lê me ti encam jî nedigirt. Bi gelek hêcetan rexne vala derdixistin. Qaşo heval pir lez û bez dikin û bê planin rexne dikir. Bes di cewherê xwe de li dijî çalakgeriyê bû. Di nêvengên wisa de Selîm Çûrûkkaya jî her tim muxalîf bû! Lê belê, ev muxalîfbûna wî jî

pir ecêp bû. Ferdperest û li gorî xwe bû. Pêşxistina rexne û helwestên rast asteng dikir. Her tişt şêlo dikir. Selîm û Dawut her tim nîqaş dikirin. Hevûdu bi tirsonekî û donkîlotî ve tewambar dikirin. Nîqaşên li ber hev danê qet xilas nedibûn. Lê dihat zanîn ku ev qet pirsgirêkan çareser nakin. Tevî vê jî helwestek bandorker jî nedihat raberkirin.

Di vê pêvajoyê de pirsgirêkên malbata Qarasungur jî hene. Ji aliyekê ve êwazê Dawut zehmetî dida avakirin. Ji aliyê din ve tiştên ku Medîha ferz dikir hebûn. Medîha dixwest "hevjîna" wê rojane weke zilamê malê biçe malê û bê. Derbarê her karê ku dike de wê agahdar bike. Lê Xoce Qeresungur jî berovajî wê hê zêdetir beşdarî xebatan dibû. Êdî mamostetî jî karek şeklî bû. Ber bi qadên derdor ve vebûnek heye. Lewma rojeva sereke jî qadro ber bi wan qadan ve şandinbû.

Dawut, her tim a li cem Elî Gûngor wan, an jî li cem Xoce wan bû. Di nêzîkbûnên xwe de her tim jinên her du malan diberdan hev û dida şerkirin. Ew bi xwe her tim li cihê sabît bû. Berpirsyar bû, lê ne di nava kar de bû. Her tim hevalên qadro yên din kar dikirin. Her ku diçû ev heval dişandin gelek erkên cuda jî. Karên xeternak û zehmet bi wan dida kirin. Lewma li malê xeyalên wan ên burjuvajiya biçûk xerab dibûn. Jin hêrs bûne. Dawut ne dixwest bibe hedefa wan hêrsan û bertekan. Gelek caran di bin navê henekan, an jî di bin navê wekheviya jin û zilam de, destûr dida daxwazên wan. Li şûna ku hişyariya şoreşgerî saz bike, xisletên ku xizmetê ji yekîtiya rast re bike bide avakirin, di nêzîkbûnên xwe de cîhan û xeyalên wan rewa didît û dikir. Ev jî pir zelal diyar dibû. Bi gelemperî gelek pêşketinên ku bandora erênî li ser jinê bike hene. Lê belê, li gel vê hinek pirsgirêkên nû jî xwe ferz dikirin.

Hizra sereke derbarê vê xebatê de piranî di mijara xebatek mayînde û jin ber bi şoreşê ve kişandin, wê mercên vê çawa werin avakirin û dê me çawa dest bi kar bikira bû? Gelo dê bandora binesaziya civakî û siyasî ya li Çewlikê çawa ba? Me dizaniya ku divê em van tevan baş bihizirin û paşç tevbigerin. Di heman demê de diviyabû em bi tedbîrek mezin tevbigeriyan.

Ez demek dirêj roj neçûm ti deran. Di vir de bandora xwe veşartina Dwut jî pir zêde çêbû. Dikarim bêjim çar-pênc mehan roj zêde negeriyam. Lê ez şev ji malê derdiketim. Di bin navê dê "tu pir zû eşkere bibî û werî kifşkirin" de xebat di nava qad û demek teng de difetisand. Carina ez li wê malê rojan bi tena xwe dimam. Ez vê jî veşartîbûna di nava rêxistinbûnê ve girê didim. Min ji xwe re digot; " quralên rêxistinê, karek pir bihedar û veşartî" kirine. Bi taybet jî rêxistinkirina jinan û ew ji malê derxistin, karek hîn zêdetir baldarî û hostatî dixwest.

Divê ez xebatan bi sebrek mezin ve bimeşînim. Çewlik bajarek biçûk e. Di heman demê de wê xebatên di nava jinan de nû destpê bike. Zemînê herî baş Enstutiya Perwerdê û dibistanên dinin. Lê belê pêwendiya me ya bi wan re jî yekser tine ye. Em hevalê Hûsên Durmuş tenê dinasin. Ew jî li dibistana amadeyî dixwend. Di demên destpêkê de dihat mala ku ez lê dimam. Heta demekê jî min paşnavê wî nedizaniya. Min dizaniya ku birayê hevalê Xeyrî ye jî. Me pirsîn bi vî rengî yên nasînê ji hev nedikir. Di kêliya destpêkê de hewce nebû. Jixwe me bi demê re hevûdû nas dikir. Wî behsa hinek keçên ku eleqerder bûye, lê hê wisa baş birêxistin nekiriye kiribû.

Hevalên keç ên me destpêkê nas kirin Yildiz û Qedriye bûn. Yildiz ji siyasetê ne dûr bû. Baldar û dixwest hîn bibe. Hinek taybetmendiyên giştî girtibûn. Lê, Qedriye hêjî di bin

bandora ol de bû. Li malê li gorî quralên malbatê tevdigeriya, lê li dibistanê jî şerker bû. Li dijî faşîstan muşta bikar tanî û gelekî çavreş bû. Ez bawerim nava malbata ti kesî bi qasî nêvenga malbata min bi tengearî be. Ez jî, ji wan re behsa rewşa malbatên me û divê em çawa ji wan qutbûna şoreşgerî pêk bînin dikim. Bes ez ji wan re nabêjim "ji malê birevin". Ji ber ger wan rewşa min bizaniya, dibe ku jê bitirsiyan jî! Jixwe ne rast bû ez pirsgirêkê ji wir ve bigirim dest.

Qadriye materyalîzma diyalektîk dixwend, hem jî rojî digirtin. Bes Yildiz di mijarên kar de zêde jêhatî bû. Dikariya ji malê derbikeve û were kar. Me wê demê keçek bi navê Husnê ya malbata wê ji baskên Rêya Azadî jî girt nava koma xwe. Me bi rêya wê malbat jî nas kir. Qadriye û Husnê hevalên hev ên dibistanê ne. Husnê jî hinekê macerayan hez dike, hinekê jî ji nêzîkbûnên hevalan ên li dibistanê li dijî xwendekar û mamosteyên faşîst raber kirine bandor bûye. Di heman demê de ji Mehmet Xoce jî bandor bûye. Gelek ciwanan digot; "Mehmet Xoce alîgirê kîjan siyasetê be, ezê jî piştewaniya wê siyasetê bikim". Qadriye anarşîst e. Dema li dibistana amadeyî hêrsa xwe ji faşîstan nedigirt, diçe dibistana hunera keçan li wir mamosteyek faşîst dixe. Ev pevçûn her çendî weke lêdanên ji rêzê werin dîtin jî, di rastiyê de hedefek bû û ew giyana şerker a bi kesayet re derdixist holê. Ger ew di çarçoveyek zane û rêxistinkirî de xwe bigihîne, dê pir baş pêş bikeve.

Me bi sê kesan re dest bi xebatên perwerdeyê kir. Baldar nêz dibim ku mala ez lê dimînim, zêde bikar neyînim. Zêdetir dixwazim ev heval cih diyar bikin. Ev xebatek bû û girîng bû. Bê ku malbat, derdor û dijmin pê bihesin, li cihekê hatine cem hev û çend demjimêran hinek pirtûk xwendin, nîqaşkirin ne

hêsan e. Her cihê ku ez diçûmê yekser bal dikişand ku ez yeke xerîbim. Bi her malbata ku bi tenê diçim re peywendiyên min pir başin. Di nava malbata min de hinek nêzîkbûnên min ên ne pijiyayî hebûn. Lewma ez ji wan encam derdixim û wisa nêz dibim. Vê nêzîkbûnê ser hevalên din jî ferz dikim.

Malbata bi navê Şalwaran, malbatek berfireh û li Çewlikê malbatek dewlemend kut ê nasîne. Tenê parkek Çewlikê hebû, ew jî ya wan bû. Dîsa otêla wan hebû. Zilam tim ereq vedixwar û yeke qabadayî bû. Kurê wî yê mezin Mehmut mamoste bû û peywendiyên wî bi me re hebû. Yên din hinekê di rewşek dîno û har de bûn. Me ew mal demek dirêj ji bo xebatên perwerdeyê bikar anî. Heta dayîka wan dixwest ez jî li malê bimînim û digot; "tu jî bibe keça malê". Lewma Qedriye zêde zehmetî nedijiya. Nakokiyên ku dijiya jî her roj ronî û çareser dibûn. Di wan rojan de nakokiya baweriya bi xwedê, girêdana bi ol û materyalîzma diyalektîk mejiyê wê têkilhev kiribû. Keçek olperest quran du caran xitim kiribû. Niha jî hînî felsefeyê dibû.

Rojekê di kêliya xebatên perwerdeyê de nîqaşek pêş ket. Di nava vê nîqaşê de wê bi xwe li rewşa xwe mikur hat. Ango êdî qane bibû. Şevekê jî beriya raze, digot; "xwedayê min ger bi rastî jî heyî îşev were xewna min". Ji ber ger nebe wê Rêgezên Felsefeyê yên bingehîn hê baştir fêm bike. Bi biryar bû. Bi bawer bû û xisletên kesayeta wê bandorker bûn. Mirovan her tim bi kesayeta wê re giyanek şerker û çalakger didît. Belê, bandora şerên di nava malbatê de jî hebûn. Ji ber di malbatê de her kes pir hêsan bi hev re şer dikir. Malbatek pir ecêp bû. Her kes taybet bû. Her kesî taybetmendiyên xwe ferz dikir. Lê di heman demê de pir bi hev ve girêdayî bûn. Gazincê

wan herî zêde ji bavê wan hebû. Ji aliyekê ve ji ber mirovek ketiyê vexwarina îçkiyê bû jê şerim dikirin û hêrs dibûn, aliyê din de jî ji bona xwe mirovek esasî kup ê ve girêdayî didîtin.

Ketina nava cîhana malbatek wisa, yek-du ji endamê malbatê kirina şoreşger pir girîng bû. Derdora ku hevalan peywendî pêş dixistin, zêdetir zilam bûn. Lê li kêlekê, nêzî wan hemûyan keçên ciwan ên diiyabû bibin şoreşger, ji vê re vekirîne û berendamin hebûn. Mijûlbûna li vê qadê di asta giştî de dima. Tenê bindestiya wan tanîn bîra wan. Wekî din jî bawerî û girêdana wan di hinek karên veşartî de dihat bikaranîn. Ji wir û pê ve jî nediçû. Eleqederiyek ji dxwr ve û ji rêzê, veguhertin ava nedikir. Ji ber hinek ji wan hêjî di bin bandora nêrîna malbatê ya digotin; "siyaset ne karê jinê ye" de nêz dibûn û qet eleqeder nedibûn. Ji ber pir zehmet bû di malbatan de hejandinek şoreşgerî were avakirin, a hêsan kîjan bû ew dihat hilbijartin. Ji ber ya herî zehmet jin kirina şoreşger bû. Lê di heman demê de ev serxistin, malbat jî dixist nava şoreşê de.

Em xebatên perwerdeyê kêm nakin. Di vê mijarê de ya herî bi xwestek Yildiz bû. Dema ez piştî demekê çûm mala wan a du qet, 'min li wir derfeta naskirina endamên malbata Durmuşan dît. Apê Îsa wekî dedektîfane; dipirse mêvana me kî ye, çi ye, ji kur hatiye, armancê wê çiye, çi dixwaze. Tevan lêdikole, dipirse. Te qet rehet bernade. Lê divê tu derî ji apê Îsa re venekî. Ji ber dema dinase hê zêdetir eleqeder dibe. Dema zanî ku ez ji Dêrsimê me; 'têr nedibû ji vegotinên dema xelayê' û xelas nedikir. Bi taybet jî bûyerên dizên ji Dêrsimê li Çewlikê dikirin bi mînakên pir ecêp ve vedigot.

Rojekê xwestine merşa (pestîl)li ser banê malekê raxistî bidizin. Bes tevî ku xwediyên malê hemû li derûdora merşê bi şêwazê dorpêç razane, dizker tayek bi lingê pisîkê ve girê daye û ber bi merşa pestîl ve şandiye. Ji ber pisîk merşa pestîl bi neynokên lepên xwe diherişîne, hewl didin ta hêdîka ber bi xwe ve bikişînin da ku pestîl bigirin. Lê mixabin di vê kêliyê de xwediyê malê hişyar dibin. Xwediyê malê jî bi çiftê pey wan dikevin. Lewma çalakiya wan a diziyê ser nakeve.

Tepkiyên apê Îsa hêjî hebûn. Yên ji Dêrsimê zêde hez nedikir. Weke din jî digot; "ev Kurdewarî ji kûr derketiye" û pir aciz dibû. Ji ber gelekî xeter didît. Ji Dawut jî hez nedikir. Digot; "Dawut vê Kurdiniyê belav dike, ji bin serê wî derdikeve". Li parkê siyasetên heyî dihatin nirxandin û li ser kesayetên berpirsyar şîrove dihatin kirin. Di vê manê de yên diçûn parkê serwext dibûn. Apê Îsa li hember Qeresungur Xoce pir rêzdar bû. Digot; "maaşê wî heye, xwedî pîşe ye. Ger bixwaze wê wisa zêdetir sûd bide. Lê ev zilam zêde derdikeve pêş. Heyfe, wê rojekê polîs wî bigirin" û beramber heyran dima. Lê dema dor dihat Hisên û Yildizê, hê zêdetir aciz daxivî. Nedikariya li hember hevalê Xeyrî heman tiît bigota. Dûr disekinî. Tim bi rêzdarî bibîr tanî. Di nava acizbûnên wî de jî rêzdariyek hebû. Dibe ku her kes li gorî apê Îsa cahil bû, lê dema mijar dibû heval Xeyrî ew cuda bû. Zanyar bû, wî her tişt bi aqilmendî dikir. Her çendî siyaseta wî xeter didît, nêrîna wî di derheqê wî de ev bû. Her tim jî di vê mijarê de li xwe mikur dihat.

Bes, dayîka malê jî pir cuda bû. Nexweş bû. Ji ber vê pir tevnedigeriya. Li ser dîwana kul ê dima her tim serî bilind û jinek ji xwe bawer, bi onur bû. Her tim destwerdana apê Îsa dikir. Digot; “guhê xwe nedin vî dînî”.

Hatin-çûyîn ew hewaya nerehet a bi guman belav dikir. Her tişt erê nekiribin jî û her çendî şer û acizbûnên xwe bidomandin jî, ji dil pejirandin, meraq û girêdanek hebû. Jiyanek bû, nedikariyan xwe li hember vê jiyana ku pêş dikeve devre bihêlin, her tim dijî bin û her tim rewşa xwe ya kevnat biparêzn. Ji ber bixwain-nexwazin jiyanê bandor dikir. Hest û ramanên wan serûbin dikir. Qada wan a baldariyê diguhert. Dayîka Husnê ya pîr qet eleqeya xwe pê netanî. Bira û jina birayên wê alîgirê Azadîxwazan bû. Lewma me destpêkê ew dijî xwe girtin, ne jî em zêde ketin nava wan. Tenê me hewl dida kul i pêşiya Husnê nein asteng. Me digot; “ger Husnê hinekê pêş bikeve, were girêdan, wê bikaribe pir hêsan wê derdora xwe jî bandor bike”. Em neçar bûn ku hesabê her tiştî bikin. Ji bona me qezenckirina mirovekî/ê, bi taybet dema ev keçek ciwan be ku bixin nav şoreşê, hê zêdetir girîng bû.

Me bi demê re koma xwe ya xebatê berfireh kir. Ya rastî em bi şêwazê du koman birêxistin dikin. Me, çend hevalên din ji bo koma yekê girtin. Koma duyê jî ji serî ve destpê dikin. Me keçên Bîbî Fethiye û Medîha jî tevlê kirin. Me ji nêzî bîst-bîst û pênc hevalên keçên ciwan ên em bi wan re eleqeder bûne, bi wan re nîqaş kirine, di asta dilxwaz û aligiriyê de ne, komek ava bû. Ev xebat li derdor jî bal kişandibû. Êdî li diistanan, kolanan, di nîqaşan û helwestên li dijî hinek bûyeran de ev cudabûn pir hêsan dihat dîtin.

Di nava komên din de yek-du jî bin tevlîbûna hevalên jin hebû. Bi taybet yên ji pîşeya mamosteyan tevlî dibûn. An jî bi hinek qadroyên ku ji devre de hatine re ev xebata me weke xebatek alternatîf derdiket holê. Keyfa me jî ji vê re tê. Di nava komên cur be cur de cih girtina keç û jinan, ji dûrbûna wan a ji siyasetê baştir bû. Ez di wê baweriyê de me ku emê wê derdorê jî bandor bikin. Em diçûn nava semîner û civînên wan ên komên ku li malên cuda diman. Me hev nas dikir. Carina wan nîqaşan encamên erênî didan. Ji ber ku koman ji derdora xwe re propagandeya me reşkirinê dikirin û li dijî me xirab dikirin. Lewma, yekser bîrdoziya me derbasî nava wan kirin û israra di hewldanên me de bandor li ser wan keçan dikir. Dibû sedem ku ber bi me ve werin.

Carina mala ku ez lê dimam, qelebalix dibû. Ji gelek cihan heval dihatin û diçûn. Derfetên axaftin û nîqaşan pêş diket. Lê carinan jî demek dirêj bêdeng dima. Tenê Dawut ji vir kêm nedima! Min ti mane ne dida pevçûna wî ya jer tim bi Selîm re. Ber hev re tavêştin. Ev jî her tim bê encam dima û ji min re jî pir bê wate dihat. Selîm demagogek bû. Pir diaxivî. Carina mijarek bi katjimêran, an jî bi rojan nîqaş dikir. Dawut jî nedieciband. Şewaziyên wî dikir mijarên pêkenokiyê. Lê di cewhera xwe de jî ti rexneyên wî yên cidî tinebûn. Lewma ev bêariya wan her kes aciz dikir. Gelek heval jî ji vê rewşê aciz dibûn.

Dawut jî ew weke kesek bê pîvan û zêde daxive tewambar dikir. Ev tiştên ku tenê ji devre de dixwiyan bûn. Di navbeta hevalan de nîqaş û rexne asayî bûn. Lê li hember nêzîkbûnên ku asta asayî derbas dikin helwest kêm bûn. Ez jî tenê di asta bawerî û girêdana xwe ya bi tevgerê re tevdigerîm û nêzî

pirsgirêkan dibûm. Ev jî endamên tevgerê bûn. Hem jî di asta berpirsyarî de bûn. Min jî weke; “ev kesayet ji aliyê rêxistinê ve baş têne naskirin”nêzîkbûn raber dikir û dinirxand. Ev aliyek pirsgirêkê bû. Bêguman girîng bû. Ancex li dijî şaşiyên wan û taybetmendiyên wan ên kesayetî helwestên tûj dihat xwestin û di vê mijarê de şerek pêwîst pir girîng bû. Ne dibû ku dûrbûna ji bîrdozî-polîtîk û amatoriya heyî ve, di mijara rêxistinê de tengbûn, seresertî û rewşa nebûna şoreşger di her qadên jiyanê de serwer bibûya. Bi hinek xisletên giştî, xwezayî ve hinek taybetmendiyên têne xwestin pejirandin û ev têr dîtin nedibû. Bi van û niyetê ve tevger, hêza çareserkirina pirsgirêkan ava nedikir û bi encam nedikir. Bes, bingeha şerê çîna navxweyî ya bihêz jî, bi van xisletan ve nedibû.

Behsa jinek ku Selîm di pêvajoya xwe ya di dibistana mamosteyan de ji bona me qezenc kirî dikirin. Dem bi dem Dawut ev dikir mijara henekan. Sedema bertekên Selîm bi vê ve girê dida. Di heman demê de tekiliyên wî yên bi Aysel Oztûrk re dihat nîqaşkirin. Selîm fermî kiribû rojevê ku, Aysel ji malbata wê bixwaze. Li Dêrsimê hinek acizbûnên ku ji ber têkîliyên Selîm û Aysel pêş ketin jî hebûn. Di nava derdora malbata Aysel de gotinên bi vî rengî dihatin gotin. Heval jî ji vê rewşê aciz dibûn. Hevalan jî lêdikoliyan gelo rastiya van fitne-fesadiyan heye yan na. Yê herî zêde eleqeder dibû jî Dawut bû. Di heman demê de yê herî zêde bertek raber dikir jî dîsa Dawut bû.

Selîm di têkîliyan de ne bi pîvan û bi rêgez bû. Di bin navê pir rehet û demokratîk de, kesayetek pir qels û lewaz bû. Ev di jiyanê de pir baş dihat dîtin. Mirov her tim di jiyanê de dizaniya ku bi zilamek xwedî nêrînên zayendperest re rû bi rû

ye û ji vê aciz dibû. Ev nêzîkbûn jî bi wî re pir diyarker bû. Her çendî di nêzîkbûnê hinek hevalan de bandora xisletên feodal û burjuvaziya biçûk hebe jî, di rêhevaltî û xwezayîbûnê de sadebûnek hebû.

Lê, Selîm xas bû. Bi xebat û axaftinê xwe, bi hemû xoyên xwe ve, li her cihî li dijî her kesî muxalîf dixwiya. Ev nêzîkbûn jî asayî bibûn. Her kesî digot; " em çi bikin, Selîm e" û nêzî dibûn. Selîm li hember rexneyan bi mehan hêncet dida pêş, nîqaş dikir û ji bona vala derbixe çi hewce bûya ew dikir. Ji ber yê herî rast ew bû. Zilamê rêxistinê yê herî baş ew bû. Nêzîkbûnê wî yên ji wî re wisa bûn. Weke din jî li hember wî yeke ku lewaz û xwedî nebesiyan hebe, ev jî ji bona Selîm mertalê xwe parastinê bû. "bêziraviya Dawut" têra wî dikir.

Di nava me de bûna xwedî giyanek wêrek, giyanek şoreşgerî bû. Ji ber tevgera me wisa dihat nasîn. Wisa derdiket holê. Wisa pêş diket û kesayet jî wisa pêş dixist. Lê, ger mirov vekirî bêje, tûpên weke Dawut ne li gora vê rastiyê bûn. Ji mirovên herî ji rêzê heta qadroyan, ango her kesî ev rastiya wî dizaniya. Lê mixabin, wî ti qusur bi xwe re nedidît. Di vê mijarê de bi Selîm re dibû yek. Bi gelemperî hevalan re nêzîkbûnên ku şaşî û nebesiyên hev li dijî hev bikar bînin tinebû. Di heman demê de beramber hev ketina înadê, an jî tewambariyên ne di cih de pêş nediketin. Bi tayber ji vê nêzîkbûnê revek hebû. Her derê gerimbûn, rêzdarî û hezkirinek bi hev re ya rakirina barê dozê hebû.

Rêheval nirxê herî mezin bû. Di rêhevaltiyê de qurnazî, hîle û xwe cuda dana diyarkirin tine bû. Lewma di pratîkê de mînakên weke vê yên derdiketin ne dihatin pejirandin. Sedema vê jî ji ber daketina bingehek siyasî û dahûrînek kesayetî de

nebesî kûr bûn. Her çendî ji van re bandora xisletên çînayetî û taybetmendiyên kesayeta kevin bihata gotin jî, di naskirin û lêkolîn pirsgirêkan de seresertî hebû. Di heman demê de kêmasiyên ku rû didan jî tenê di asta xwe de destgirtinek hebû. Tenê bi bûyer an jî bi diyardeyekê ve bi sînor dihat girtin.

Dawiya 77'an bû. Di pêvajoya zivistanê de hevalan hê zêdetir komî ser hev dest bi xebatan kiribû. Hevalê Xeyrî jî hatibû. Weke din hinek hevalên din ên nû hatibûn qadê. Lê hêjî ez nizanim kî ne. Naye gotin, veşartî digrin. Ez wê rojê ji xebatên perwerdeyê vedigeriyam. Li malê Elî Gûngor heye. Bi wan demanceyên li ser masê ve mijûl dibe. Her sê demance li cem hev dîtin tiştek pir mezin bû. Mereq dikim. Min yekser hemûyan meyze kir. Min hemû parçe kirin û dîsa li hev dan. Ew jî zewqek cuda dida min. Min jî got; "çi heye, gelo çalakî heye". Bi dengek hêdîka got; "raste, wê destpêkê banka were şelandin". Paşê got ku henekan dike. Wê gavek din Fethiye jî were, wê heman henekê li wê jî bike. Lê got; "divê tu bi wê nedî hesandin ku heneke, bê ka wê çi bike û wê helwestê wê çi be". Min jî got; "temam", ji ber ji min re asayî hat.

Em jî di navbera xwe de dibêjin; "ya rastî mirov pir hêsan dikare li Çewlikê bankayan bişelîne. Mane şelandina bankayan ne tenê çalakiya bajarên mezine. Heta niha çalakiyek bi vî rengî li Çewlikê nehatiye kirin. Lewma bal jî nakişîne". Ez jî xwe têkil dikim û dibêjim; "ger ez jî tevlî bibim balê jî nakişîne, ma em ji Xoce re pêşniyar bikin nabe". Ew jî dibêje; "ma çima nabe, li gorî min jî dibe". Hê em di vê çarçovê de diaxiviyan Fethiye jî hat. Ew hê zêdetir şaş mabû. Yekser nêz bû lê temaşe bike, dest dida demanceyan. Hêdîka digot; "wê çi bibe". Elî jî hê zêdetir bi dengek nivis got; "hele bi sabir be. Wê çalakî were lidarxistin. Dê tu jî tevlî bibî. Em xwîşka

Sakîne re jî axivîn, jin balê nakişînin. Hûn her du û du hevalên zilam jî hene. Taksiyek me ya taybet jî heye. Ew jî hat. Huseynê ji Qerekoçanê ye. Hevaleke baş e. Emê proveyan bikin. Ne diyare, dibe ku yê din jî ez bim."

Peyre em rabûn me prova kir. Em demanceyan ve ketin hundur. Elî ji qaseya maseyê hinek tiştan derdixe dide me û paşê em bi şêwazeke parastinî derdikevin derve. Çalakî bi serkeftiye. Me çend caran xwe ceriband. Ev çalakiya xeyalî xoşa me tevan bû. Lê dibûya ku em bihatan girtin jî. Wê di rewşek wisa de helwesta me çi be? Em di nava xwe de nîqaş dikin, "ger pere li ciheke din bin, em tiştekê nagirin ser xwe. Lê ger pere bi me re werin girtin, emê bêjin em şoreşgerin û me bi navê gel desteser kirine". Weke din jî emê tiştekê nebêjin.

Emê navberê dibin û xwarinê bixwin. Lê Fethiye tam xwe bi vê meseleyê ve girê daye, xwarinê naxwe. Dibêje; "dev ji xwarinê bedrin". Kêliyekê keçên din, Roza wan hat bîra Elî. Dibêje; "ger tu hatî girtin, tu dikarî bigirî cem xwe. Wê baştir be". Li gorî xwe jî di wê kêliyê de hest û bertekên Fethiye dipîva. Lê her ku ev henek dirêj dibûn, tama wê jî nedima. Lewma min got; "birayê Elî em dev ji vê henekê bedrin. Fethiye tam bawer kir. Nexwe wê paşê şaş fêm bike. Wê bandor bibe, jê re bêjin". Got; "temam, ezê paşê bêjim". Em wê şevê heman malê bi hev re man. Berbanga sibehê em her sê bi hev re ji mal derketin. Her yek ji me re demanceyek heye. Divê em wan radestî Xoce wan bikin. Bangî min jî kirine ku ez biçim wê malê. Dê ew jî ji wir derbasî dibistan û avahiyê bibin. Lê hêjî Elî ne gotiye heneke. Ji ber vê heman heyecan didome. Min di rê de ji wan re got; "we baş nekiriye", bes e jî cesaret nakim ku bêjim ew hemû henek bûn. Ji ber Fethiye pir bandor bibû.

Em çûn cem Xoce wan. Xoce yekser em birin xorfeya pişte. Diyar bû ku li benda demanceyan bû. Li eywanê du heval hebûn. Min dt ku yek ji wan Dr. Elî ye. Lê min yê din zû nas nekir. Berçavkê wî jî hebû. Em bi lez derbas bûn. Li xorfa paş henek hêjî didomin. Xoce jî tevkî van henekan bû. Medîha jî bi mereqek mezin dişopîne. Dema gotin wê banka were şelandin û emê vî karî bikin, wê jî bi israr xwest ku ew jî tevlî me bibe. Em hemû weke zarokane. Min li saetê nêrî û yekser got; "hevalno dem nêz dibe, rastiyê bêjin, wisa nabe".

Xoce henek derbasî nava hevalên din jî kir. Medîha xwesteka xwe li wir jî diyar dike. Li cem hevalên ku nû hatine xwesteka xwe diyarkirinê ji xwe re weke firsendekê dibîne. Ne ku Medîha pir dixwest biçe vê çalakiya şelandinê. Ji ber ger wê Fethiye hebe, divê teqez ew jî hebe. Ango ji bon ali paş me nemîne, xwe dida nîşan. Wê kêliyê me silav da hevalên ku hatine. Ez yekser ji xwe aciz bûm ku min çawa destpêkê nas nekiriye. Dibe ku ber di kêlekê de rûniştibû ji ber wê min nas nekiriye. Belê, hevalê din jî Rêbertî bû. Teşqeleya wan demanceyan bala me tevan belav kiribû. Êdî diviyabû ev henek biqedeiya.

Ketim navberê min got; 'Xoce divê ev henek ew qas neyê berdewamkirin" û min jê re diyar kir ku ev henek çawa destpê kiriye. Lê Rêbertî mijar hêjî weke heneka destpêkê dinirxand. Digot; "erê erê jin pir baş dikarin bikin. Lê divê gurup baş were amadekirin". Dr. Elî jî got, ez biyanî me. Polîs min nas nakin. Ez dikarim hîn hêsantir bikim û wisa dixwaze xwe jî tevlî komê bike. Ev rewş her diçû cidî dibû. Êdî ez diketim nava nakokiyan, gelo ev rastî Elî weke henekan ji me re digot. Serê min tevlîhev dibû. Ev rewş her ku diçû bê tam bibû. Diviyabû

hevalan ev henek zêde dirêj nekiriban. Ya rast çi ye bila ew were gotin. Ji ber saet jî nêz dibû. Êdî me ev henek derbasî nav hevalên din jî kiribû. Hê min gotina xwe xilas nekirî, Rêbertî got;

"kî got heneke! Ma hûn karan wisa digirin dest?"

Fethiye yekser çenteyê xwe girt û bi girî derket devre û got;

"hat fêmkirin. Baweriya web i min tine ye. Hûn min diceribînin. Ma qey ez darê ceribandinê me." Elî ji ber gotinên weke "me henek kiriye û xwestiye em wê biceribînin" xeyîdibû. Medîha jî axaftinên ku wan berdê hev dikir û digot;

"jixwe ev tim wisa ne, ti caran bi me bawer nakin. Me tiştek nahesibînin."

Rêbertî destpêkê xwest rewşa heyî fêm bike. Ji ber dema mijarên cidî dibûn henek pir aciz dibû. Paşê got;

"ki bi jinê ne bawer e? Kî wê diceribîne? Ez ji we re bêjim di nava me de ji zilam zêdetir bi jinê bawerî heye. Jina Kurdistanê kirina şoreşger, kişandina nava şoreşê bûyerek gelekî girîng e! Ev kar bi henekan ve nabe! Wê demê cidî bin. De biçin, ger hûnê vî karî bikin, biçin bikin. Jin jî hem dikare bike û hem dikare serbixe."

Em hemû xirab bûn. Bi paqijkirina çekan ve heneka ku li malê destpêkirî, giha kîjan qonaxê. Min hewl da mijarê vebêjim, "min ji hevalê Elî re got zêde dirêj neke. Ji min re got jixwe sibehê rêya me wire derbas dibe, ezê jê re bêjim. Wisa nehişt ez jî bêjim. Ez di vê mijarê de xwe sucdar dibînim. Min dikariya tevî israra wî rastî jê re bigota. Lê ne rast bû ku Xoce jî li vê derê ev henek berdewam kir û heta giha hevalên din."

Xoce jî got ku nerast kiriye. Elî got; “ xetayê herî mezin min kiriye. E hinekê hestiyar nêz bûm. Jixwe Fethiye jî beramber xwe bêbawer e. Lewma wê bihizire ku em bi rastî jî dixwazin wê devrî kar bihêlin. Jixwe bi tepkî bû. Wê bi vî rengî ev tepkiyên wê hêjî zêde bibin. Ji ber vê ne baş bû" û çû kar.

Paşê Medîha çû sûkê hinek tişt bikire. Xoce û Dr. Elî jî ser piyane ku derbikevin. Çi dibû, min fêm nedikir. Ez û Rêbertî tenê diman. Li ber deriyê derve Xoce got; “tu bimîne, wê heval bi te re biaxive.” Min yekser got; “rexneyên heval di cih de bûn. Xweziya me ew henek nekiriban. Ne baş bû.” Xoce got; “wê Rêbert bi te re biaxive.” Ez di cihê xwe de veciniqîm. Min got; “tu rast dibêjî”. Lê vê carê jî ez ji heyecana nikarim bikevim hundur. Gelo wê piştî hevdîtinek wisa axaftin çawa derbas bibûya?

Ez pir mehcubim. Şerim dikim. Wisa çend xoleyan li holkê mam. Min nedikariya derî vekim û bikevim hundur. Paşê min xwe komî ser hev kir û ketim hundur. Rêbertî ser piyan dihat û diçû. Eywan mezin bû. Rêbertî pirsa xebatan kir.

“ Rewş çû ye, zehmetî hene yan na. Avaniya giştî çawa ye?” Min destpêkê xebatên ku piştî hatim Çewlikê kurtasî vegot. Rewşa hevalên jin jî bi giştî ji Rêbertî re diyar kir.

Rêbertî pirsî, "Çend hevalên jin hene.” Min jî bersivand, “di navbera bîst û pênc û sih kesan de ye” bi heyecan got;

“ne wisa, başe başe. Li cihek weke Çewlikê xwedî xisletên civakek paşverû de, ev qas keç anîna cem hev û perwerde kirin pir girîng e.”

Weke din jî rewşa wan a asta nîtelîk pirsî. "gelo hevalên ku bikaribin pêş bikevin kîne.” Min jî behsa Yildiz, Qadriye,

Dîlan û çend hevalên din kir. “ev dikarin pêş bikevin.” Rêbertî di vê mijarê de perspektîf da.

“wê tevlîbûna hevalên jin pêş bikeve. Wê li van qadan jî çêbe.” Paşê mijar zivirî ser rewşa min. Zewaca min a bi Baqî re nirxand.

“kes nikare tekîliyên koletî li ser me ferz bike. Rewşa min jî li holê ye. Hinek dibêjin ‘keça hevkara ye. Bavê wê kemalîst e.’ Em jî mîsoger naxin tengezariyê.” Di navberê de jî nêrînên min ên derbarê bavê Kesîre de dipirse.

“dibêjin keça malbatek hevkarê CHP’ê ye û sîxûra Elî Yildirim e. Gotinên bi vî rengî hene. Dibêjin ‘keça sîxûrekî ye.” Demekê tu jî pê re mayî, çavdêriya te çi bû. Tu çi dibêjî?”

Bê ku rawestim min ev pirs bersivand.

“li malê ya xwedî otorîte Kesîre bû. Malbat pir jê hez dike û li hember rêz digire. Dibe ku bavê wê Kemalîst be. Heta dibe ku sîxûr jî be. Lê keça wî şoreşger e.” Hê min gotina xwe xilas nekirî got; “ Belê! Wê bersiva herî baş a ji Kemalîzmê û hevkariyê re ev be. Keça wî kirina şoreşger û keça wî qezenckirin girîng e. Tekîliya din jî bi temamî li ser vî bingehî ye. Ez qetiyen nikarim tekîliyek zorê ferz bikim. Ez nikarim tekîliyek koletî û girêdanê bipejirînim. Divê tekîlî wekhev û azad bin. Heyderê me jî bi Cemîle re zewicî. Bawerim guncav e, ne wisa? Tu her duyan jî dinasî ne wisa, çawa ye?” Min jî got, ez bi vê agahiyê pir kêfxweş bûm, guncav e. Ango pir xwezayî pêşwazî dikim. Baweriya min a li hember Elî Heyder Qaytan, heman weke baweriya min a li hember xwedê bû. Hezkirin û rêzdariyek hebû. Lê hinekê derbarê Cemîle de dihizirim. Ew jî di nava hevalên jin ên Dêrsimê de di nava binyata pijiyayî û rêxistinî de xwedî cihek erênî û dikariya kar

bike bû. Di vê mijarê de bêbaweriyek tine ye, yan jî ev têkîlî li pêşiya têkoşînê weke astengiyek dîtin, an jî devrî jiyanê dîtin tine ye. Cuda naye şîrove namik û neyênî jî nabînim.

Aliyekê tekîliyek ku pêwîst e xirab bibe û were qutkirin, aliyek din ve jî, têkîliyek ku divê di têkoşînê de were sazkirin û ser bingehên têkûz were rûniştandin tê nîqaşkirin û nirxandin. Tiştek xerîb naye dîtin. Her çendî weke nakokiyekê were dîtin jî, rastiyek rave dikir û ez jî di nava vê rastiyê de bûm. Ji aliyekê ve vê rastiyê red dikim, ji aliyê din ve dibêjim ku ji vê qutbûnê re amade me. Lê belê, aliyek din ve jî, yekbûnek din erê dikim û kêfxweşiya wê dijîm. Dîsa jî axaftinên Rêbertî hêz dide min. Nabêje vê wisa bike, lê çarçoveya giştî destnîşa dike. Tim û tim di nava gotinên xwe de dibêje, "têkîliyek bi zorê nabe." Temam wê demê çima hevalên din ji Baqî bandor dibûn? Êdî serê xwe zêde pê naêşînim. Di nava xebatan c cih girtin û bi kar ve mijûlbûn têra min dikir. Baqî ji bona min ne asteng bû û ne dikariya bibe jî. Baweriya min b imin hebû ku ger hinek din mijûl bibûyajî, wê min bikariya vê meseleyê çareser bikim. Baweriya min bi min heye û pir rehet bibûm.

Rêbertî civîna xwe ya Çewlikê li wê mala kum e jê re digot "Qesra Spî" çêbû. Ez bi hevalê Qeresungur wan re derketim çûm. Medîha dizaniya ku wê civîn çêbe. Lewma ji Xoce re digot; "e jî bi we re werim." Xoce got; "nabe, karê heval heye, wê biçin cihek din" û dixwest xwe jê xilas bike. Lê Medîha pir dilê xwe girtibû. Fethiye jî bi heman şêwazî tepkî dijiya. Her duyan jî bandor li hev kiribûn. Di vir de jî bertekên xwe herî zêde jî li dijî min bikartanîn. Ji ber ez diçûm û ew diman. Pir teng mijarê dinêriyan, mijar tenê di asta baweriyê de digirtan dest.

Civîn jî ji ber heval bi komên biçûk û bi mesafe navber dihatin dereng destpê kiribû. Zivistan bû. Berf barîbû. Mal jî pir cemidî bû. Lê dîsa jî Rêbertî wê şevê bi demjimêran axivî. Derbarê mijarên pêşketinên siyasî, dîroka Kurdistanê, xeta me ya bîrdozî, xisletên şoreşa me, rewşa qadê ya xweser, rewşa komên çepgir ên Kurd û di babetên nêzîkbûnên ji wan re de berfireh axivî. Weke din jî derbarê gelemperiya xebatên me de gelek mijar nirxandin. Hemû qadroy û hevalên ku bawerî bi wan hebû beşdarî vê civînê bibûn. Hevala jin jî tenê ez hebûm. Rêbertî derbarê xebatên jinê de jî axivîbû. "Ger di van binesaziyan de jin bibe şoreşger wê rûxandina gelek tiştan zûtir bibe. Binesaziya feodal û paşverû ya Çewlikê li pêşiya xebatek wisa ne asteng e. Tenê sebir dixwaze, divê em hişyar bin û rast nêz bibin." Û şîrovyên xwe domandin.

Li cihên weke Qerekoçan û Dêrsimê jî civînên bi vî rengî hatibûn lidarxistin. Civîna li Dêrsimê li qeta herî binî ya avahiya em lê diman hatibû lidarxistin. Ew depoya ku me tiştên xeter lê veşartibûn. Çi xweş bû, niha jî bibû cihê civînê.

Ev civîn heval zînde kiribûn. Di heman demê de di xebatan de jî lezek dabû avakirin. Rêbertî behsa xisletên radîqal ên ciwanên şoreşger ên Çewlikê kiribû. Gotibû wê di têkoşîna li dijî navendên faşîstan û paşverûtiyan milîtanî pêş bikeve. Bi rastî jî di çalakiyên li dijî faşîstan de hem di hundur de milîtanî pêş dixist û hem zemînê rêxistinî saz dikir.

Li Çewlikê serkêşê rêxistina faşîst Hîkmet Tekîn bû. Wê demê serokê şaredariyê bû. Zilamê Tûrkeş bû. Qadroyên din ên li şaredariyê jî, qadroyên ciwan û taybet ên faşîst bûn. Ew bi xwe jî her tim diçû Almanya û dihat. Çûyîn û hatinên wî çi yên li Almanya û çi jî yên li Enqereyê, ji bona wan çavkaniya

piştewaniyek bîrdozî, moral û madî bû. Ji ber qadroyên xwecihî wisa ser piyan digirtin. Çalakiyên me yên li dijî faşîstên weke Ringo bi nav û deng in, pêşiya xebatên MHP'ê girtibû. Tundiya şoreşgerî darbeyek mezin li van navendan dabû. Êdî Çewlik ne Çewlika kevin bû. Êdî kesên weke Rîngo ne dikariyan weke berê rehet bigerin. Pêşiya êrîşên wan jî hatibû girtin.

Min di vê navberê de mala xwe guhert. Mala ku hevalê Zekî Yikdiz lê dimîne guncavtir hat dîtin. Bi xwe jî bi keçek gundiyê xwe re nû zewiciye. Keçek ji rêzê ya gundî ye. Li gorî gotina wî "yek ji çîna wî ye!" Mal qelebalixe, bes jinbaba wî ya ker û lal heye. Bavê wî di qezayek kar de wefat kiriye. Hevalê Zekî ji bavê xwe pir hez dikir. Tim bibîr taniya. Digot; "mirovek kedkar û proleter bû." Bi zarokên jinbaba xwe re tev deh kes di malê de diman. Lê xweaya malê, gerimbûna wan mirovan, bi taybet jî jidilbûna hevalê Zekî, hevalbendiya wî ya bedew, dihişt ku xebatên malê û jiyan hê zêdetir di nava gerimbûn û qelebalixiyê de werin meşandin.

Bi vî hevalî re aweriyek kar a pir bedew hebû. Hişyar û xwedî hestek dagirtîbû. Ev ji dekora xorfa ku ez lê dimam jî diyar dibû. Azwerê klamên Kurdî û b taybet jî yê Aram Tîgram bû. Hemû klamên ku di radyoya Erîvanê de derketibûn berhev kiribûn. Rêze qaset, rêze pirtûk û kovaran, baldariya wî ya li hember çand, huner, zanebûna zanistî û lêgerîna wî ya di vê mijarê de destnîşan dikir. Ji blî dîwaneke ji textê, li ser refan tenê pirtûk û qaset hebûn. Xorfeyek pir teng bû. Lê dewlemendiya wê ez bi xwe re dibirim her derî. Lewma min ji xorfê pir hez dikir.

Tevî ku dayîka wan ker û lal bû, pir hişyar bû. Dema derî lê diket yekser ferq dikir. Ji lêdana zengilê dizaniya ku kî hatiye. Di bihîstinê (duyu) de pir xurtbû. Me bi îşaretan hev fêm dikir. Îşaret û hinek deng cîhana wê dayîkê bû. Yê herî baş ev hevpeyvîn pêk tanî hevalê Zekî bû. Piştî keça Emoş ango bûka wan hetibû malê, êdî dayîk ne dayîka berê bû! Wer dihesiya ku êdî nirxa berê nadinê. Emoş bûkek hinekê lingê wê li hewa bû. Tevî ku keça ji gundan bû, xwe cuda dida nîşan, delalî dikir, giyaneke ku "nehatiye qehrê hineke din bikişîne" li ser diyar dibû! Ya rastî niyeta wê pir baş, jîr û ji guhertinê re vekirîbû. Aliyên wê yên xweş pêşdetir bû. Lê cîhana ku wê xeyal dikir cuda bû.

Zekî ji zilamên gund ên din cudatir bû. Dizaniya ku şoreşger e. Beramber wê rêzdar bû. Ne diçewisand, bi wê ve mijûl dibû û dixwest hîn bike, pêş bixe û bike welatparêz. Li gorî Zekî ew bi kesek ji çîna şoreşger re zewicî bû. Lewma diviya wî ew zewac welatparêz bikira. Hedefa wî ew bûç lê belê, Emoş ne di ferqa tiştekî de bû. Hinek tiştên xweşik ku dihatin vegotin hebûn. Bes li gorî Emoş ew xeyal bûn. Ji bilî wan jî tiştek ne dihizirî.

Hevalê Zekî jî pir teng û bi xapînok nêzî vê zewacê dibû. Ji ber vê hê di dema zewacê ya destpêkê de heyfa xwe tanî û dida diyarkirin ku wê zehmetiyan bijî. Ji ber ku diviyabû erkên xwe yên şoreşgerî jî bi cih bîne. Di heman demê de rastiyên ku têkoşînê ferz dikirin hebûn. Aliyek din jî, bendewariyên Emoş, peywendiyên di nava malbatê de û tiştên sazûmaniya jiyanê ferz dikir hebûn! Zekî jî hewl dida ku her duyan bi hev re bimeşîne. Lê belê, nedibû. Lewma di malê de tengezariya ji ber

vê rewşê derdiket min pir didît. Carina dayîkê jî ji ber vê rewşê îsyan dikir. Zekî di nava şerek pir tevlîhev de bû. Xwestek û niyet tiştek çareser nedikir.

Piştî mirina bavê xwe wî mal xwedî dikir û giraniya erka xwedîderketina malê û bandora wê rastiyê, dibû sedem ku rewşa wî ya di têkoşînê de jî li gorî vê were destgirtin. Li gel vê çalakgeriya wî asteng dikir. Gelek caran nêrînên xwe yên di vê derbarê de pir vekirî digot. Tim behsa bêşansiya xwe dikir. Ya rastî ew ji her tiştî re amade bû. Kîjan kar jê re bihata dayîn, pir hêsan û baş pêk tanî. Lê dema qadek din diket rojevê diviyabû rewşa wî ya heyî berçav were girtin. Her çendî hêncetên wî yên pir mafdar hebûn, lê ji bona wîxw di vê mijarê de nîqaş û pêşniyar kirin gelekî ehmet bû. Gurura wî dişkest, bêzar û mehçup dibû. Lê belê, biryardarî, rik û cewhera bi wî re bes bû û bawerî dida mirov. Tevî vê nêvenga malbata pevçûn û bi nakokî, bî wî re hêvî, zindîbûn û biryardarî hebû. Ma jixwe şoreşgerî jî ne têkoşînz bi zehmetiyan re bû? Wê demê divê bikaribe wan jî hemêz bike.

Rewşa xizaniya wê malê, rewşa ku gel'ekê dijiya bû

Me mal baş bikartanî. Piranî yên ji derve de dihatin li vê malê diman. Wê demê Baqî Qarer hatibû. Şevekê li wê malê ma û paşê em bi hev re çûn Agiriyê. Weke din Carlos jî hebû. Carlos hevalek bejin dirêj û girs bû. Navê ecêp bû bala min kişandibû. Carlosek terorîdtê nav-neteweyî hebû. Diyare ku bala hevalê me jî kişandiye. Bi xwe jî ecp û xerîb bû. Weke qabadayîyan dimeşiya. Gelek caran çakêtî (palto)wî yê dirêj li ser milê wî bû. Çûbû heta Bulanik, Patnos, Malazgîrt û Agiriyê. Hinek belge û demanceyek hebû, min jî ew rakiribûn.

Di rêyan de ser jinan zêde nedikgeriyan. Ev rewş pir kêm çêdibû. Ger îstîxbaretek taybet, an jî îxbarek hebe jinên polîs tînin û ser jinan digerin. Nexwe tenê nasnameya dihatin nêrîn. Lewma di nava me de karê kurye piranî hevalên jin dikir. Bi xatirê vê min jî gelek cihên welat yên din didît. Çûna aliyê Bakur, bi taybet Agirî, çiyayê Agirî yê efsanevî dîtin pir xweşbû. Min Çiyayên Qarliova, girava Axtamar a gola Wanê û lutkeyên Agirî jidil temaşe kir.

Bi bêrîkirinek mezin ve gav bi gav li hemû qadên Kurdistanê xweşikbûnên heyî gerîn û jiyîn, têgehên welat û netew hê zêdetir watedar dikir. Di nava şerek ku hinek din li welatê te xwedî derketine û her aliyê wê yê jiyanî ziwa kirine de, cih girtin, şahnaziyek mezin dida min û ez bi gurur bûm. Xizaniya li aliyê Bakur heyî, di her kêlî û aliyên jiyanê de diyar dibû. Bindestî, rebenî û perîşaniya heyî dihişt ku carinan rondik ji çavên min werin. Dilê min têşand. Xizaniya mala ku em li Malazgîrtê şevekê lê man, rastiya ku gele jiyan dikir bû. Ev jî parçeyek ji wê ya herî ji rêzê bû.

Li quncikek malê de çilekek, li quncika din jî em biçûk û jinên malê bi hev re razabûn. Naylon li pacê dabûn. Di nava bêhna tepikan û dengê çêlek û zarokan de jiyan çi qas bê wate bû. Ez heta sibehê bi kuştina kêçan ve mijûl bûm. Rûyê lihêfê yê spî di nava xwînê de mabû. Kuştina kêçan jî karek girîng bû! Di nava taştê de li kêleka çokelek, libek hêka ku li ser agirê tepikan hatibû çêkirin anîbûn. Hemû zarok dûr rawestiyabûn, sifre tenê ji min re hatibû raxistin. Diyar bû ew hêk tenê ji min re hatibû çêkirin. Ango ji mêvan re bû. Lê belê, çavên hemû zarokan li wê hêkê bûn. Ma qey ezê di wê rewşê de wê hêkê dixwim? Min nekarî wê toraqa ku min jê hez dikir jî bixwim.

Tiştên ku min jiyan dikir ne tiştên nû bûn û ez cara yekê nedibûm şahidê van rewşan. Lê dîsa jî bandor dibûm. Hestiyarî pir giranî pêş diket.

Tevî israra wan min nekarî ez wê hêka ku wan qeşartine û danîne ber min bixwim. Min got; “min têşîne lewma naxwim” û şûnde vegerand. Di tevahiya rê de her tiştê min xwarî bi min re dibû ziqum. Her ku ew awirên wan dihatin bîra min pariyên min xwarîn di qirika min de diman. Wê kêliyê zarokên Kurd ên ku me di fuara li Îzmîrê de hev nas kirî hatin bîra min. Dema em di wan rêyên Patnosê yên ax, zivronek û fitlonek re derbas dibûn, hemûyan simît difroştin. Temenê tevan neh-deh bû. Ji Mêrdîn û Sêrtê bûn. Dema min simît kirîn me hev nas kiribû. Hersê bi hev re hatibûn. Ji nava wan yek jê hemû dehf didan da ku simîtên xwe bifiroşe. Hersêyan jî dixwest bifiroşe. Di wê navberê de bi Kurdî dijîn ji hev re dikirin.

Dema min got; “bihedirin, ezê ji simîtên we tevan bikirim.”, destê wan li hewa mabû. Destpêkê fêm nekirin. Paşê dema hemû bi hev re axivîn hinekê fêm kirin. Ji nava wan yek jê ji Mêrdînê bû. Ji ber nêzîkbûnên jinbaba xwe ji malê reviyabû. Yê navê wî Omer jî, ji ber şerên bav û apên xwe ji mal reviyabû. Yê sêyemîn Elî jî, ji Sêrtê bû. Xizanên wî hene, hatiye kar bike. Ji ber mala wan pir qelebalixe hema bêhe avêtine kolanê. Îzmîrê li parkan dimînin, dîsa li cihê hinek kargehên biçûk û li ber dîwarên cihê ku lê kar dikin dimînin û dirazin.

Ferqa wan ji hev tinebû. Çi li mal û çi li kolanê ferq tinebû. Di nava xizaniyek kûr de mezin dibûn. Ew din ava hezaran, milyonan kesî de çend kes bûn. Jixwe ev aliyê pirsgirêkê bi xwe şoreş û têkoşîn bû. Jixwe min nedikariya bi kirîna simîtan

ve wan rizgar bikim. Lê em çima ew qas bi hev re kar kirin û xebata hevbeş de paşve diman. Çima em ji bona vê tim pev dikevin? Ev jî aliyek rastiya me ya civakî ya balkêş bû. Min ji wan re jî gotibû. Pirsgirêka tevan hevbeş bû. Ferqa wan ji hev tinebû.

Min bi zimaneke were fêmkirin ji wan re behsa Kurdistan, Kurd û têkoşînê kir. Min ji wan re got divê mîsoger derfetên bi hev re bikaribin kar bikin ava bikin. Paşê min her yekê heqê simîtekê da wan û simîta min girtî jî bi wan re weke "para biratî" parve kir û hev re xwar. Min ew çend car din ew li Fuarê dîtin. Wê carê jî hejmara wan bibû pênc û êdî bê şer karek hevbeş dimeşandin. Bi hev re simît difiroştin. Bi rûkenî digotin êdî bi hev re şer nakin. Ji min re gotin wer hizirîne ku ez her roj li Fuarê li wê bankê rûniştîme û têne serdana min da ku min bibînin.

Min ji wan re got ez vê derê tenê ji bona karê randevu bikar tînim. Lewma ji bilî van kêliyan nayêm vê derê. Dîsa jî gotin; "bilanê, emê dîsa her roj werin vir." Bi dilê xwe yê biçûk ve girêdana xwe ya bi bîranînek biçûk ve didan diyarkirin. Dema ez bi zarokan re êş, xizanî, bindestiyê dibînim hîn zêdetir bandor li min dike. Biçûkên Zekî jî wisa bûn. Li wê malê bavê wan miribû. Çar-pênc keçên biçûk ên dayka ker û lal li wan dinêriya hebû. Zekî navê xweş li wan kiribû. Berîvan, Zozan û Rojda bûn. Hemû jî navê Kurdinî bûn. Aliyek malê ya bal dikişand jî, ew zarok bûn. Wê di nava rastiyek şerek herî zehmet de mezin bibûna. Lê hayê wan ji vê tinebû.

Dibe ev tiştên gelek biçûk bûn. Lê belê, li Kurdistanê xizanî û êş şêweyek jiyanê bû. Bes mijar dibû zarok bandora vê zêdetir dibû. Lewma min ji xwe re digot; "ya herî baş tiştên din hizirandine."

Em piştî Malazgîrtê li Patnosê ne. Qadên mezin ên hatine ziwakirin, rastiya dijmin hê baştir diyar dikin. Li qadek Patnosê ya nêzî 3 kîlometreyan, jêr û jora rê qada leşkerî bû. Ecêb bû! Li qada daristana ku ji darên qaçê pêk tên, dijmin pir bi plan û berfireh xwe bicih kiribû. Li wê qadê jî her tiştî wî kesk bû! Her deh metreyan di bin axê de wesayîtek bi zirx pêçayî hebû. Îhtîmalek mezin ev tanq bûn. Têlên hunandîn, qerekol, kolik û garnîzon, malên serbazan, li cihên herî xweş bûn. Qadek leşkerî her cihê wê şîn bi her cure wesayîtan ve hatibû dorpêçkirin. Dewletek bû û pergala wê bû.

Aliyên din jî ziwa bûn. Mal weke mînakên (mînyatûr) Pîramîtên Misrê hatibûn çêkirin. Weke huniyan bûn. Şibakeyên wan biçûk ji tepikan hatibûn çêkirin. Malên ji ax û keviran jî hebûn. Li kêleka rê çalên avê yên biçûk çêbibûn. Ji xeynî vê avek wan a din jî tine bû. Diyar bû ku bê av bûn. Li cihekê dolmuş rawestiyabû, anos dikir "bila yên dixwazin avê vexwin dakevin." Yên daketin jî ji wê çalê av vexwarin. Aliyek çalê hêstir, golik, ker, çêlek, mirîşk avê vedixwin, aliyeke din zarok şiv di destê wan de bi avê dilîzin û aliyê din jî mirov ji vê çalê avê vedixwin.

Xwediyê eraziyek mezin e. Lê em dev ji motor, traktoran bedrin, gisên jî li vê axê neketibû. Baqî Qarer jî li hember van dîmenan bideng daxiviya. Hêrs dibû. Di vê kêliyê de nivîsa di kovarên Rizgarîvanan de ya bi navê "Li Kurdistanê Kapîtalîzma ku pêş ketî" hatiye nirxandin hat bîra me.

Rizgarîvanan di wê nivîsê de didan diyarkirin kul i Kurdistanê feodalîzm çawa rûxiya ye, pêşketina kapîtalîzmê şîrove dikir. Baqî Qarer jî dijîn ji wan re dikir û digot; "de bila werin bibînin. Belê, pir hêsane kul i cihek din rûnin û Kurdistanê dahûrînin. Li vir gisên jî tine ye. Ev çi Kapîtalîzm e wisa!"

Carlos zêde nediaxiviya. Dema em gihan Agiriyê sermaya wir zêdetir diyar dibû. Tevî ku dawiya Nîsanê bû, ev qas sar bû. Gelo ji ber lutkeya çiyayê Agirî ev serma dida hesandin? Ji ber Agiriya ku qet berf li ser kêm nedibû, ji her derî ve dihat dîtin. Agirî hişk û sar bû. Ev hewa, di xwezaya nîştecihên herêmê de jî binesaziyek hişk û haşîn dida avakirin.

Em çûbûn mala Selman Xoce. Ya rastî ew mal zêde ji bona ewlekarî ne başbû. Kifş bibû. Lewma çavên derdor li ser vê malê bû. Ji ber vê dema em çûn wê malê yekser bal kişand. Dibe ku ji ber panîka Baqî Qarer a zêde bal kişandibû. Her kêliyê digot; " dijmin bi me hesiyaye." Piştî çend demjimêran tevgerekê destpê kir. Me alavên heyî li malê veşartin. Têbiniyên nivîskî tev di nava empula mezin a cihê serşûştinê de hatin bicihkirin. Qaset hebû ew jî di wir de hat veşartin. Xwediyê malê jî hênaseyek rehet girtin. Hevjîna Xoxe mamosteya dibistana hunera keçan bû. Her tişt mereq dikir û dipirsiya. Nurheyat jî derbasî wê qadê bibû. Piştî ez derbasî Çewlikê bûme, ew jî derbasî Agirî dibe. Me nedikariya em hev bibînin. Baqî Qarer çûna me pir veşartî digirt. Roja paştir 1'ê Gulanê ye. Baqî got; " divê em yekser daxwiyaniyekê binivisînin."

Ji hevalan agahî hat ku wê xwepêşandanên qorsanî li Bazîdê werin kirin. Weke din li ser çalakiyan jî dihizirin. Divê daxwiyanî lezgîn werin zêdekirn û belavkirin. Baqî got; "zû

qelem û qaxit bigire destê xwe.” Me di wê navberê de sernivîsa daxwiyaniyê nîqaş kir. Me bi serenava “Ji Gelê me yê Egît re” dest bi nivîsê kir. Ew dibêje, ez jî dinivisînim. Di navberê de jî bi pirsên weke “ev hevok li ser ve bibe, yan jî wisa bê gotin wê baştir nebe?” Ve nêrînê min dipirse. Şev bi Xoce re axivî û agahî girtin. Em bi giştî sohbet dikin.

Di katjimêra xewê de Xoce hêdîka ji Baqî Qarer dipirse “emê çawa razin.” Ji ber me hevjîn dihesibînin. An jî em kî ne, çi ne, ango ez ji kur hatime? Asta peywendiyên me çi bû? Dema ez bi jina malê re di heman xorfê de razayîm wê jî bi heman mereqê pirsî bû. “me bi Xoce re nîqaş kir, texmînên min rast derketin. Hûn ne zewicîne.” Û ev bi şermok digot. Demek dirêj ez dam axaftin. Min gotibû ez ji Elezîzê me. Lê wê ji min re got devoka te naşibe ya Elezîziyan, zêdetir bi ser ya Dêrsimiyan ve diçe. Yekser ne pirsî bû ku bê ka ez ji Dêrsimê me. Paşê behsa xebatên Nurheyat kir. "pir balê dikişîne. Pir zû eşkere bû ku biyanî ye.”

Min jî jê re got divê ew jî bi çalak tevlî xebatê bibe, dikare di nava jinan de pir rehet kar bike, divê di ferqa pirsgirêkan de be, ji ber mamosteye jî dikare hîn baştir li ser xebat û kar serwer bibe û her kesê bandor bike. Peywendiyên wê bi hevalan re hebû. Weke din hevjînê wê jî heval bû. Ev jî karê wê hêsan dikir. Her wiha mirovê herêmê bû û her kes dinasiya. Min jê re got, ne raste ku pasîf bimîne. Hinekê ezîkbûnê dijî, lê zêde ne bi dile jî. Heta bandora wê li ser hevjîna wê jî heye. Ger jinên bi vî rengî ji aliyê erênî ve piştevaniyê bikin, dikarin hêz bidin. Lê piraniya wan ji aliyê neyênî ve bandorker dibin. Taybetmendiyên wan ên hevjînên xwe paşve dikişînin hene. Di ferqa pirsgirêkan de ye û ronakbîr e. Her wiha pirsgirêka wan a

aborî jî tine ye. Kar dikin. Her du jî dikarin xwe hîn çalakger tevlî bikin. Lê ji ber taybetmendiyên wan ên burjuvaziya biçûk dudilî dimînin. Jin wê cîhana xwe pir kûr dijî.

Hevjîna Dr. Elî yê li Elezîzê jî mamoste bû û xwedî heman taybetmendiyan bû. Ya rastî ger bixwesta dikariya xisletên milîtanî qezencbikira. Ji ber jîr û bandorker bû. Lê hem derdora wê zehmetî dida wê, hem jî ew bi xwe bê xwestek bû. Dema jiyana wan a burjuvaziya biçûk jî ser ve dibe, tiştek bandor nedikir. Li ser Dr. Elî jî bibandor bû. Her çendî yekser asteng nekiriba jî, girêdanên malbatî dibûn sedem ku sekna wî ya rêxistinî bixe nava zehmetiyan. Di vê pêvajoyê de malbatên bi van cureyan hebûn û hêjî ne diyar bû ku divê malbat bibin xwediyê taybetmendiyek çawa.

Ez ji xwe re dibêjim çi dibe bila bibe, divê ez biçim serdana hevalên girtîgehê. Di nava me de hevalên ku yekemîn ketibûn zindanê bûn. Di heman demê de mamosteyên min ên destpêkê bûn. Ew li girtîgehê dîtin wê ji bona min jî baş bûya. Min fikirê xwe got. Baqî jî got; "temam dibe. Jixwe wan jî bihistiye û xwestine hinek mijaran ragihînin. Gotine bila hevalek bawerî pê heye were."

Ji malbatê yek dan kêleka min û ez çûm girtîgehê. Li hewşê têlek du rêz heye. Di nava hev de şidayî hatiye hunandin û pir bilind e. Her kes hevûdû dibîne. Hevalên li girtîgehê yanzdeh kes in. Hema bêje hemû jî ji bona kuştina Mistefa Çamlibel ve eleqeder hatine girtin. Hevalan behsa vê bûyerê kiribû. Piştî ku dikujin diçin gundeke nêz û tevdîrên xwe jî nagirin. Dijmin jî ser gund de digire û wan hevalan dîl digire.

Heval derbarê bûyerê de dibêjin; “dijmin aliyê vê meseleyê yê siyasş lêdikole. Me jî weke dozek kesî girtiye ser xwe. Wê hevalên din derbikevin. Lê yê min jî ne diyare.” Dengê xwe jî hinek din kêm dike û dibêje. “emê birevin, lê evder ji bona revê ne guncav e. Me daxwaz kir me derbasî Bazîdê bikin. Ger em biçin wir hêsan e. Emê bikaribin hê hêsantir derbikevin. Cihek biçûk e, tevdîrên ewlekariyê jî lewaz in. Lê ger em li vir bimînin emê biceribînin. Bila agahiya hevalan hebe.” Weke din têbiniyek û hinek pere jî dan min. Di kêliyeke ku gardiyanan meyze nedikir de hevalê herî dirêj li ser têlan re ew koma pereyan ber bi min ve avêt. Min yekser girt ki berîka xwe. Dema ez derketim l imin negeriyan.

Piştî ku ez ji Dêrsimê reviyabûm heta niha min hinek heval nedîtibûn. Pirs wê pêvajoyê, zewacê dikin û bê ka min çi kiriye. Min jî hemû di yek hênaseyê de ji hevalan re vegot û hemûyan jî guhdar dikir. Bes ji ber wan jî hemû bûyer nedizaniyan bi mereq li min guhdar dikirin. Yên ez nas dikirim ji wan re ecêp dihat û dikeniyan.di nava salekê de gelek tişt hatibûn jiyîn. Zewac, cardin devjihev berdan, hevberdana me ya ku hêjî pirsgirêk e. Lê hêjî bi înat kar kirina min wan kêfxweş dike. Pir kêfxweş dibin ku êdî ez weke kesek profesyonel kar dikim û tevî her tiştî mijarên ku wan dilşad dikin zêdetirin. Wan gelek ked li ber min de dan. Bi min ve mijûl bibûn. Van hevalan ji me re rastiya me vegotibûn. Ez bawerim tişta ku herî êde şoreşgerekê şahnaz dike, dema kesên di ber wan de ked didin biryara xwe ya şoreşgeriyê didin û di vê rêyê de dimeşine. Hê meşek bi qasî ya zarokekê bû. Dibe ku meşek bi ketin û rabûnê bû, lê biryardariya di wir de pir girîng bû.

Dema min tiştên ku jiyan kirine ji hevalên li girtîgehê re digot, carinan hinek tişt di qirika min de dibû girêk. Bandora wan tiştan li ser min hebû. Aliyên min ên lewaz bûn û bê guman nebesiyên min bûn. Gelek tiştên ku ji min winda kiribûn hebûn. Bi taybet mijara zewacê ez pir xemgîn dikirim. Ji bona şoreşgeriyê tiştek ku neyê fedakirin tine ye. Lê dîsa jî bi wê şêwazê zewac û paşê devjê berdan zora min diçû.

Dema ez berfireh dihizirîm bandor li ser min nedikir. Min piranî nêrîna ku derdor, civak û heval çawa pêşwazî dikin dahûrandibûn û ev alî jî hêz dida min. Dibêjin "tu ji ku dera zerarê vegerî kar e" min jî wisa kiribû. Şert û mercên bihevrebûnê tinebûn, neçarî diviyabû min devjê berda. Di şoreşgertiyê de biryardarî, girêdana bi şoreşgertiyê ve manîdar dikir. Min ev di hinek astan de derxistibû zanebûnê û ez di nava aramiyê de bûm. Heta min xwe ji her demê zêdetir bi çoş û baweriyeke mezin ve tevlî dikir. Min şahnaziya rizgariya ji wê xeleka lingê xwe ve jiyan dikir. Lê dîsa jî min digot hinek tişt pir erzan û vala çûn. Di hundurê xwe de jî êşek dijiyam.

Min nedikariya xwe ji rewşa giyana xwe rizgar bikim. Di vê mijarê de li dijî hinek hevalan jî aciz bûm. Min ji wan re gotibû; " we rewş dizaniya, dema min xwest ji malê derbikevim jî zewac weke çareseriyekê danîn pêşiya min. Dema got haya wî ji pêşniyara ku Qiymet kiriye nîne, e pir aciz bûm. Ji ber Qiymet xwe pir bandor û rayedar dîdît, ti caran hewce ne dîdît ku nêrîn ti kesî bigire. Ez çi qasî saf im. Belê, Qiymet rêxistin bû, her tiştê ku digot pêk dihat! Ya rastî pêşniyara ku wê kiribû min bi tundî red kiribû û guhdar nekir. Lê di zemînek din de mijar nekiribû nîqaşê. Min bixwe ji xwe re çareserî danîbû. An jî biryara dawî min dabû. Lê divê ez xwe

ji vê rewşê rizgar bikim. Her kêliyê heman poşmanî jiyîn, li ber ketin, binde fetisîn, kerî tiştekê nedihat. Hevalan jî axaftinên ku hêz didin dikir. Digotin; "tişt nabe pirsgirêk çareser bûye."

Dibêje; "gelo malbatê çawa pêşwazî kir? Ez bawerim herî zêde jî wan zorî li ser te kirine ne wisa? Wê heval fêm bikin, a rastî ji bona hevalan jî pratîkek mînak a baş bû. Divê ev mijar pir vekirî were nîqaşkirin, mijarên nêzîkbûnên şaş û çeloxwarî werin derbaskirin." Di vê navberê de dibêje ji Medîne re jî nivîsandiye. Bi wê re jî vekirî axiviye. Daye diyarkirin ku ne mecbûre li bendê be, di wê nivîsê de gotiye dikare ji xwe re hilbijêre.

Medîne Vural! Dibistana amadeyî ya pîşeya keçan xilas kiriye. Niha jî mamoste bû. Pir hestiya bû û di vê mijarê de dîn û har bû. Lê ger bixwesta dikariya bibe şoreşger. Lê wê nedixwest zêde bikeve nava kar. Ango hezkirinek ji dûr ve û ji dûr ve girêdana bi şoreşê re bû ya wê! Wê ev bes didît. Di nêzîkbûna xwe ya di vê têkîliyê de jî wisa bû. Dibe ku hestiyariya wê ya zêde, nêzîkbûnên malbat û derdorê, bandora kevneşopiyan, biban sedem ku hinekê li bendê bima. Lê gelo paşê… li vir mirov nedikariya tiştek mîsoger bigota.

Di nava hestek kêfxweşî û hezîn di nava hev de me xatir ji hev xwest. Çavên min li têlên ku hatine hunandin man. Ez bi "bi hêviya we cardin di nava me de bibînim" ji wir derketim. Heta ez giham malê mijarên em axivîne tev di serê min de diçûn û tên. Ew mala li kolana çiyê, ew rojên xas ên bedew tînim bîra xwe. Ji Dêrsimê ber bi Agirî ve. Cih û warê şoreşgertiyê ya sabît tinebû. Ew derbasî her derî kirin tişta herî bedew bû.

Di vegerê de Baqî Qarer li Melezgîrtê ma. Ez jî di vegerê de bi Erhan re ji wir derbasî Çewlik, li dibistana mamosteyên Tuncelî ku li malên şevê dima bûm. Erhan hevalek pir diaxivî û zînde bû. Erhan got; “ ger di rê de kontrol hebe em hedûdû li Dêrsimê dibistanê de dinasin. Em mêvandarî diçin mala wan a li Melezgîrtê. Cardin em vedigerin Dêrsimê. Wê îfada me wisa ba. Me wisa biryar da. Di rê de tiştek çênebû. Piştî em vegeriyan Çewlikê, em li maleke nû geriyan.

Her ku têkoşîn pêş diket pirsgirêkên ku divê werin çareserkirin jî zêde dibûn

Di wan rojan de li ser hinek çalakiyan dihat hizirîn. Serokê şaredariyê Hîkmet Tekîn hedefek girîng bû. Ji ber wî bixwe faşîst birêxistin dikirin. Lewma ji bo velavkirina wan navendan diviyabû, li dijî hinek qadroyên taybet û çalakger êrîş bihatan kirin. Wê kuştina Hîkmet Tekîn mîsoger bandor bikira. Lê diviya çalakî baş bihata kirin û encam bihata girtin. Ji ber zilam xwe diparasta û hişyar nêz dibû. Em jî ji bona çavderiyê tam li hember mala wî ya Bahçelîevleran, li malekê digerin. Dawiyê me dît. Me weke du kesê nû zewicîne mal girt. Ez jî ji wan re dibêjim; “hê hevjînê min nehatiye, bi karê guhertina cih ve mijûl dibe.”

Mal li qeta çara ne. Serê kolanê mala Samiyê ji Rêya Azadî heye. Xwediyên malê gundiyên Zekî ne. Jixwe ji bo girtina malê ew dikeve navberê. Me weke xizmên hevalên xwe dide nasîn. Me ji bo malê hinek pêdivî jî kirîn. Derdor zêde bal nade ser kêmbûna tiştan û erzaniya wan. Em ji vê re jî gelek hêncetan dibînin. Em dibêjin, em her tim cih diguherin, ji ber

rewşa tayînê em naxwazin tiştên giran bikirin. Lê em ji hinekan re jî dibêjin me hê tiştên xwe yên esasî ne anîne. Dibe ku rewşa tayînê were rawestandin.

Dibe ku kes bi ev qas ziraviyan ve mijûl nedibû. Em ew qas bi guman nê dibûn. Rewşa malê, cidiyeta çalakiya ku were kirin, dibû sedem ku em pir hişyar tevbigerim. Ekî tevdîra her tiştî digirt û kar têkûz dimeşand. Ez jî hewl didim di peywendiyên xwe de hevsengiyekê ava bikim. Ne pir diçim nava cîranan û ne jî dûrî wan disekinim. Lê ez wisa dikim ku, derdor têkil her tiştê me nebe, her kes dema dixwaze neyê, an jî pirsan neke. Ango mesafeyek jî heye. Ji ber vê tiştên ku tên kirin pir cihe naxwiyên. Carekê ez ji malê ser hev derketim. Di hinek rojên diyar de yên dihatin hebûn. Dîsa carinan şevê hinek hevalên xort dihatin.

Li vê malê ji karên girîng ê sereke min dikir yek jê, çavdêriya mala Hîkmet Tekîn bû. Gelo, di kîjan demê, kîjan demjimêrê de, bi çi û çend kesan re tê malê, kîjan derî re dikeve malê? Min hewl dida van fêr bibim. Du derî û du hewşên malê hene. Carina Zekî jî dihat û dişopand.

Di vê navberê de xebatên perwerde û civînan jî didomin. Li gorî ast, an jî tevlîbûnên nû kom tên avakirin. Lê Medîha, Fethiye û keçên Bîbî ji çûn û hatinên Agirî û hinek valahiyên din sûd wergirtine û weke komek perwerdeyê ya cuda tên cem hev û weke xebatek cuda kar dikin. Hêceta wan jî qaşo nikarin bi her yê nû tevlî dibin re heman pirtûkan ji serî ve bixwînine û heman mijaran bigirin dest. Dibêjin ev rêbaz ne rast e. Me nîqaş kir. Dibêjin; “wisa baştire.” Lê ez dizanim rastî ne ew e, cuda ye.

Di vê navberê de ji bona demekê şandin qadek din. Çûn û hatinên wî Medîha tengav dikir. Ev jî dibû bertek ku komek wisa saz bikin. Medîha ev rewş hê mezintir kir. Hemû jî rewşa min kêm, zêde dizanin. Jixwe keçên Bîbî hê di şeva destpêkê ez hatîm de ji nasnameya min zanîn ku ez zewicîme. Dema ez li cem wan bûme, li nav çenteyê min geriyane. Wisa nasnameya min jî eşkere kirin. Di heman demê de hîn bûn ku em ji hev cihe jî bûne. Dem bi dem ev dihat nîqaşkirin jî.

Yek ji wan keçan dergistî bû, di wê pêvajoyê de zewiciye. Ne dixwesta her du karan ango hem mal, hem malbat û xebatek wisa bi hev re bimeşîne. Heta di vir de hevjînê xwe jî diceriband. Pir vekirîbû ku bertekên wan ên hevbeş dihat wateya xirabûna jiyana wan a kevin. Di vir de hevûdû nedipejirandin jî. Ji ber ji bilî min kes naçe civînê her kes dibe agir û xwê. Medîha bi rojan ev mijar bi Xoce re nîqaş kir. Dibêje; "we çima ez jî nebirim civîna Apo. Ma baweriya we bi min naye?" û bertekan raber dike. Di heman demê de gotiye; “ weke ku ji bilî Sakîne kes ne şoreşger e. Madem nêzîkbûn ev e, emê jî cuda kar bikin, em jî heman pirtûkan dixwînin, em jî hinek tiştan dizanin.” Dema ev nêzîkbûn û rewşên wan jî tê rexnekirin her yekê diteqin û dibêjin; “mala xwe xirab kir, dixwaze mala me jî xirab bike. Xoce berê ne wisa bû. Niha diçe kur, çi dike ne diyar e. Ti agahiya min çênabe. Sakîne aramiya me jî xirab kir.”

Her çendî Fethiye vekirî tiştekê nebêje jî, wê erê dike. Keçên Bîbî jî acizin. Her çendî ji bona gelek caran netevlîbûna xwe ya ji perwerde û civînên beriya niha re weke hêcet zextên malbatê, yan jî zexta dayîkê xwe destnîşan kiribin jî, nehatine xwe bê vê rewşê ve girê didan. Lê tevî vê hewldana wan a avakirina komek cuda her tişt zelal dikir.

Dawut jî ew gur dikirin. Vekirî ew erê dikir. Bertekên wan jî mafdar dida nîşan. Ez di vir de polîtîk nêz nebibûm. Ji ber ne diyar bû ku wê kesên bi vî rengî di kîjan mijaran de zehmetiyan ava bikin. Tevî min ev rastî dizaniya, min ew li dijî xwe girtibû. Min rastiyên ku ew jê aciz dibûn tev li rûyê wan dabû. Lê ger ez hinek din dor lêveger nêz bûbam û min firsendên bi vî rengî nedaba wan, dibe ku ev rewş derneketiban. Na, ez wisa jî nêz bûbam wê mîsoger wan tiştên din bikira hêcet û diyar bikiran. Ji ber xisletên hevbeş bûn û encama wan xisletan bûn. Lewma dê ev xislet jî mijûl bikira. Medîha, kurê xwe Devrîm jî pir xirab mezin kiribû. Ji hevalan dûr dixist. Ev pir diyarker bû. Li hember Xoce jî bêrêz bû. Di bin navê wekheviya jin û zilam de, wekheviya burjuvaziya biçûk pêk tanî. Dema diçû derekê bêberpirayar û keyfî bû. Lê dema Xoce dipirsiya dogot;

"ji te re çiye. Ma ez ji te pirs dikim, karê min heye ez diçim." Û helwestên xwe wisa diyar dikir. Her wiha gelek mînak hebûn. Xoce gelek caran digot; “ev jin bi gurura min a şoreşgerî dilîze. Ger ez hinek tiştan nehizirim û gurura min a şoreşgerî dest bide, ezê jê cihe bibim. Ma ez niha çi bikim? Ger ez devjê bedrim, wê bêjin APO’yî jinan didin berdan. Jixwe propagandayên bi vî rengî dikin. Rewşa xwîşka Sakîne bihîstine. Alîgirên Azadîxwazan bi zanebûn gotinên wisa belav dikin.” Û hêrs dibû.

Moralê min jî xerab dibû. Êdî min ne dixwest biçim wê malê. Jixwe wê jî nedixwest. Weke mayînek dîn bû. Dema li serê wê dida diçû cem derdora xwe ya kevin, derdora mamosteyên karmend. Dema serê wê lê dida jî dirûnişt û dixwend. Berovajî bû û pêşbirkek xirab dikir! Lê ev jî bi çi û kî re bû, nediyar bû. Xweziya di şêwazek rast de di nava

pêşbaziyê de bûya! Bi hesûdî nêzî meseleyan dibû. Ev jî pir dijber dikir. Kesek tiştek êde jê hêvî nedikir. Tişta li ber çav bû, jinek pir bixwestek bû, dixwest gelek tiştan hîn bibe û kar bike. Lê di vir de ne samîmî bû. Ne weke dixwiya bû. Tiştên digot, îdîa dikir û pratîka wê gelekî ji hev cuda bûn. Dijberê şoreşgertiyê bû. Kurdistan û Kurdînî ji wê re biyanî bûn. Dibe ku bandora çanda ku Laî ya cuda di navê de mezin bûye hebe. Lê sedema esasî tzybetmendiyên wê yên çînî bûn û nêrînên wê yên ji jiyanê re bûn. Xeyal, daxwaz û cîhana Medînayê cuda bûn. Me ji bona wê digot; "em bikaribin biçekê biguherin jî bes e." Lê ew qelp nêz dibû û ne ji dil bû. Xoce ji ber nêzîkbûnên wê yên beramber min êrîşkar jî pir xemgîn bibû. Hewl dida min tesellî bike.

Ne hêsan e ku mirov di nava jinan de kar bike. Ji aliyekê ve jinên dixwestin tevî zextan tevlî bibin, hîn bibin û di nava hewldana guhertinê de, ji aliyê din ve jî jinên di nava nêzîkbûnên çeloxwarî de hebûn. Ji hêlekê ve ev rastî xwezayî bûn. Ji ber li Kurdistanê cara yekê bû ku hejandinek dijiya. Heta niha di asta herî paşketî û paşverû de jî tevgerek jinê tinebû û nehatibû pêşxistin. Li gelek welatên cîhanê bi navê mafê jinê xebat pêş ketine. Dîsa di bin gelek navan de tevgerên jinan harine birêxistinkirin. Lê mixabin, hê haya jinên Kurdistanê ji jiyanê tine bû. Bi Rizgariya Netewî re pêvajoyek hişyariyê destpê kiribû. Jin, bê ku astek tevlîbûna zane û zanist bidest bixe, bi çarenûsa pejirandî ve dijî û dimeşe. Ji ber vê yên hinekê ronakbûr, xwedî xisletên xwendekarî girtin û tevlê kirin, bandor kirin, hê zêdetir encamgir bû. Tevlîbûnên ji bilî vê tev hinekê di astek çors û dilxwazî de diman.

Di Enstutiya Perwerdeyê de jî Tirkan, Sevîm, Ayten, Gonûl û gelek keçên din hebûn. Wê pişti dewreyên dem kin yekser bibûna mamoste. Pêkhateyek girîng bû. Lewma xwendekarên ji her alî ve hatine bi Bîrdoziya Rizgariya Netewî perwerdekirin û pêşxistin gelekî girîng bû. Baştir bû ku yên peywendiyên wan bi me re hene, li dibistanê bimînin û xebatan rasterast bimeşînin. Di vê manê de dibistan amûrek erênî bû. Hem jî nedibû ku em wan ji dibistanê bigirin. Lê çend kesan dikariya Çewlikê li malê bimînin. Ji bo vê jî yên ku eşkere nebûne guncav dihatin dîtin. Lê belê, yên ku ji Dêrsimê hatibûn hê di roja yekê de hem xwe û hem em eşkere kiribûn. Şahîn Donmez, bi Tirkan, Sevîm û Ayten re hatibûn malê. Di rê de nivîsek girîng jî dabûn wan. Lê heta ez hatim malê wan vekiribû û xwendibû. Pîvanek veşartinê hebû, lewma dema min ew di wî halî de dît, ez şaş mam û min yekser destwerda. Dema mine w nivîs xwend, min mijar hê baştir fêm kir. Şahîn çawa wisa ji rêzê nêz bibû? Ew helwestên min jî zora wan çûbû. Dema min ji wan re got; “kî daye we? Hûn çima nivîseke radestî we hatiye kirin bê destûr vedikin û dixwînin?", ji min re gotin Şahîn daye wan, bes behsa girîngiya nivîsê nekiriye.

Beşa destpêkê ya nivîsê derbarê pêşketinên siyasî de bûn. Lê pişt wê re nav, nasnav, şîfre û peywir hatibûn nivîsandin. Qad û nasnavên hemû hevalan hîn bibûn. Min taybetmendiyên Tirkan ên mereqa zêde û bê dîsîplîn dizaniya. Lê di nava me de tiştek were radestkirin parastin rêgez bû. Kesî nedikariya bê destûr dest bide. Bila bê gotin, bila neyê gotin ev rêgez esas bû. Her kes di vê mijarê de hişyar nêz dibû. Ji ber ev bawerî, terbiye, girêdan, venêrîn û ezmûn bû. Ango her tişt bû. Lê mixabin ji bona Tirkan zêde girîngiya van tiştan tine bû!

Taybetmendiyek wê ya dest dida her tiştî hebû. Ayten jî di vê mijarê de rengek weke wê ya di halê xwe de bû. Baldar nêz dibû. Lê ji bandorên hinek din re vekirîbû. Ji ber vê dikariya pir hêsan pîvana nas nekê. Sevîm ji aliyekê ve xwedî rêgez bû. Lê di dema xwe de dijî dernediket. Helwestên xeta navîn diparast. Di vê manê de rêgezên xwe jî erzan didan. Dibe ku vekirina têbiniyekê û xwendin mijarek pir erzan û asayî were dîtin, lê di heman demê de rastiya kesayet jî dida dest. Ez wê rojê ji hêrsan her di ber xwe de axivîm. Li ber çavan weke ku ev mijara cidî girtine xwiya dikir, lê di rastiyê de ne xema wan bû.

Dema Şahîn hat malê nivîsan bigire min ew rexne kir. Bi ser wî de teqiyam; dil dixwest jê re bêjim; “dema we nivîs da hevalan diviyabû te heval hişyar bikiran. Vekirine û xwendine. Ez vê rast nabînim. Hûn di vê mijarê de pir rehetin. An hûn pir bêxem in, an jî hûn ne baldar in” lê belê, nikarim bêjim. Tenê min got; "ger hûn wisa nêz bibin, dê heval jî cidî nêz nebin.” Şahîn ji ber van helwestên min aciz bû. Ne li bendê bû ku ez bertek û rexneyek wisa bikim. Dawut û hinek hevalên din hebûn. Qaşo heta radeyekê asta wî hebû, diviyabû min hedê xwe bizaniya! Lê piştî min got, ez bi aram bûm.

Civîna li Îmîr-Încîralti tê bîra min. Bi vê bûyerê re ev cara duyem bû baweriyê min ên derbarê wî de vala derdiket. Di hundurê xwe de jî bêbawerî dijîm. Bi her duyan re jî hişyariya rêxistinî tine bû. Helwestên wî lakaytbûn. Gelo bi zanebûn dikir? Ev nêzîkbûnên bê helwest ên beramber mijarên herî girîng, ez bêdeng didam hizirandin. Ez jî ji xwe re her dihizirim nêzîkbûnek li gorî rewşa xwe raber nake, gelo çima wisa nêz dibû? Gelo aqilê wî li ku re? Axaftin û nîqaşên wî, gelek dirêj nirxandinên siyasî pêşxistin ji min re pir bi wate

nedihat. Gelo ma ev ne nakokî bû? Ma ne diviya herî zêde ew di mijarên rêxistinî de baldar nêz bibe? Bi taybet dema xwe li ser kursî pehin kirî û dihejand digot; “ hewce nake tu veşatîbûnê hînî me bikî. Ne girîng e. Bila ew bixwe bifikiriyan, kesî ji wan re ne gotiye vekin û bixwînin.”, pir zora min çû. Li dijî hev bertekên me her duyan hebû. Çawa ku min ew weke hevalên din nêzî xwe û gerim nedidît, lewre min nedikariya nêzîkbûnek xwezayî raber bikim, ew jî wisa beramber min sar bû, ji min hez nedikir, bibertek bû û ez jî bi vê dihesiyam. Gelo ev nêzîkbûnên min bandora nêrînên birayê min Heyder ên derbarê wî de gotibûn?

Di salên destpêkê, hê dema tevgera me zêde neketibû her derê de di navbera birayê min û Şahîn de pevçûnek çêbibû. Xwîşka wî fahîşe bû. Ez bawerim di vê mijarê de nîqaşek wan çêbibû û li hev xistibûn. Gelo dibe ku di nêzîkbûnên Heyder de, bandora vê lihev xistinê hebe? Heyder bawerî bi Şahîn netaniya. Sedema vê jî Heyder piştî salên dirêj got. Di vê mijarê de durist bû. Nêzîkbûna te, ango tiştên ku kirne yek bi yek li qerekolê vegotibû. Ev komek bi hev re hatin binçavkirin. Sedem jî bûyera bombekirina qerekolê bû. Di nava wan de birayê min ê mezin û Şahîn jî hebû. Têra xwe lêdan xwaribûn. Lê belê, ji ber hema welê hatibûn girtin, di demek kin de hatin berdan. Heyder derbarê Şahîn de got;

“tirsonek bû. Bi navê biratî tika ji polîsan dikir, ji me cuda bû.”

Carek din ez van tînim bîra xwe. Li Şahîn dinêrim, êde na-axivim û bêdeng dimînim. Weke ku ferq kiriye ez bi hinek tiştan aciz bûme, vê carê jî ew di-axive û dixwaze min bide axaftin. Dawut li şûna wî ket navberê û dest bi axaftinê kir.

Başe ku zêde li malê neman û derketin çûn. Hat gotin wê tenê Ayen li malê bimîne, bes tam ne zelal e. Navê wê derbas debû digotin; “dikare bimîne.” Dema ku dibistan xilas bûn, wê ev hemû jî pispor kar bikin. Ne hewce bû ku her kes li Dêrsimê kom bibe. Di encamê de Ayten ma.

Ez û Ayten xebatên perwerdeyê bi hev re dimeşînin. Piştî demekê li ser esasê cardin vegere çû Dêrsimê. Barê wê zilamek ecêb bû. Kesyetek tam Kemalîst bû. Demekê ew jî hat li cem Mehmet Xoce wan ma. Çavderiya wî erênî bûn. Nirxandinên weke; "Netewparêzên li Çewlikê rêzdar, bi aqil, temenê wan kamil’in, lê belê, yên li Dêrsimê cahilin, ji gotinan fêm nakin û pir ciwan in” dikir. Zêde ne yekî saxlem bû. Li Sûmerbankê kar dikir. Yekî cedixwar û qumar dilîst. Dev ji Ayten jî bernedida. Sedema hatina wî ya Çewlikê jî, ji bo venêrîna Ayten bû. Ji bona wê ji siyasetê dûr bixe, tiştek ne dima nedikir.

Em bi xwîşka Zekî, Zozan re li malê dimînin. Nîvê şevê Baqî hat. Di pêvajoya destpêkê demek kin ma. Dersên wî hebûn, wê bidan. Dê vê carê jî bi temamî vegeriya Kurdistanê. Qaşo ji HK veqetiybû û bibû hevalê me. Destpêkê li Îzmîrê nameyek ecêb nivîsandibû. Digot ku di dayîna dersan de zehmetiyan dijî û dixwest ez demekê buharbar biçim Îzmîrê cem wî. Ango qaşo ger ez li cem bûma dikariya bi serkeftî be! Dema hêjî ez weke malê xwe didîtam û ji bona vê maf dixwest, ez ji qehra dîn dibûm. Weke din jî zarok dixwest. Digot ku bandora wê ya me bi heve bide girêdan heye. Xeyalê di serê wî de ev bû. Di nava xebatên rêxistinî de ne bi rêgez bû. Her tim mijûl dikir, li hember hevalan jî xwe cuda dida diyarkirin.

Lê mixabin, ferasetên wî yên jiyana burjuvaziya buçûk ên berbiçav hebûn. Ango mal, war, zarok, şêwaza jiyanek wisa û li kêleka vê jî şoreşgertî dihiziriya! Min name da Xoceyan û xwendin û di wir de baştir fêm kirin ku ew jî hatine xapandin. Ji xwe re heyf dibînin ku çawa hewl dane min qane bikin. Ango pirsgirêk ne îdare kirin, bi hedar tevgerîn, an jî bi hevrebûna zorakî nîne û ev mesele naye çareserkirin. Min di vir de weke kesayet bawer kir ku êdî bes e û lenetê bi nêzîkbûnên (tutarsiz) xwe tînim. Na, min nas dikir, lewma min wate nedida israra hevalan a qezenckirinê. Lê her ku wan dinasiya maf didan min. Lê belê, her carê jî min fedekariya bê wate dikir.

Min jî nameyek bersivdanê nivîsî û şand. Min got divê devji van nêzîkbûnên xwe yên durûtî, bêbiryarî û mantiqê nêzîkbûnê wî yên bihevrebûnê ku bi nameyan dinivîsîne berde. Bila devji nivîsandina ferasetên jiyana kesane yên burjuvaziya biçûk berde û careke din venegere vê qadê. Ya rastî ev ne çareserî bû, bertekek dubarebûnek heman rewşên heyî bû. Dê wî jî li hember vê helwestê pêxirtengiya xwe hê zêdetir ferz bikira. Ango te ji kîjan hêlê ve binêriya û te ji kur ve bigirta nedibû û belaya serî bû. Geleo ma gurura wî ya feodalî jî tine bû? Her ku min jê re digot; "biçe, heta dojehê rêya te heye, ez te naxwazim" ew bê ar dihat û ne diçû cihek din. Li HK'ê jî nedima. Tam şereke sinirê bû û tevî van tiştan hemûyan cardin hatibû, yekser jî hatibû malê.

Weke dîna bû. Rikên wî hebûn. Ew hesûdiya wî ya gemar çavên wî tarî kiribûn. Ez naxwazim bê malê, min jê re got; "tu bi çi mafî tî vir, tu heval jî bî mafê te tineye werî vir? Êdî min weke malê xwe nebîne. Tu êdî ne hevalî û nejî hevjîn, tu ne ti

tiştî. Tu her tim derewan dikî. Her tim durû nêzî dibî. Derdê te yê rixistinê tine ye. Derdik te yê têkoşînê tine ye!" Min tev li pey hev rêz kirin.

Zozan jî ji tirsan ketiye qoncikekê. Baqî jixwe guhdar jî nake. Malê kontrol dike. Li derdor tiştekê digere. Dema mine w di wî halî de dît, min ji xwe re got, 'ecêb, ev dîn bûye.'paşê got; "tu ji yeke din hez dikî. Teqez têkîliya te bi yeke din re heye, nexwe tu wisa nêz nedibû û tu ev qas ne dihatî guhertin. Ez jî şoreşgerim. Heta ez ji wan kesên tu ji wan re dibêjî heval zêdetir şoreşgerim. Ji te jî zêdetir şoreşgerim. Dema hûn tinebûn jî me ev kar dimeşanda. Wê demê pirsgirêk çi ye? Em ne neçarin di her mijarê de her tiştî weke hev biparêzin. Tiştek pir xwezayîye ku min xwest tu werî Îmîrê. Rast e, em şoreşgerin, lê em ne robot in. Zarokên şoreşgeran jî çêdibin." Her wiha gelek tiştên çeloxwarî dan pey hev.

Êdî min hev karî û min ji xwaringehê kêrek girt destê xwe. Kêr pir tûj bû. Me nû kirîbû. Ji xeynî vê li malê tiştek din tinebû. Ger demanceyek hebûya dê min li serê wî bixista, lê tinebû. Min pir dixwest di wê kêliyê de demanceyek li cem min hebûya. Min yekser kêr girt destê xwe û bi ser wî de çûm. Wet ne li benda vê bû. Cihê sekna min baş bû, lê ya wî na. Ez di devê derî de me. Li xorfê tiştek din jî tine ye. Got; "neke, Sakîne tika dikim! Min ji acizbûna xwe ev gotin. Ji ber ez pir ji te hez dikim min ev gotin. Ez dizanim min tu tehrîk kirî, neke."

Min di wê kêliyê de tiştek nedibîhîst. Mejiyê min lê dixist. Çawa cesareta tiştek wisa kiribû? Hemû hêrsa xwe bi vî rengî diyarkirin, ez pir hêrs kiribûm. Lewra min jî got; " alçak, biqele ji vir! Tu bi çi cesaretê van tiştan dibêjî?" Û min kêr bi ser wî de hejand. Carekê min got qey min kêr lê daye. Ji hêrsan çavên

min tiştekê nabînin. Paşê min anî ku balgihê li ser cih li ber xwe girtiye û xwe diparêze, lewma her ku ez kêrê ser ba Didim, kêr diçe li balgî dikeve. Ji ber balgî pir hişke lê nakeve. Balgiyek hik hatiye dagirtin û nayê bikaranîne. Lewra weke dîwarekê wî diparêze. Zozan jî qîr dikir; “ we nekin!” Û digirî. Em li qata herî jorin. Şerê me li her qatê û derdor tê bihîstin. Carekê dengê lingan hat.

Jina bi navê Zeytun, êdî nekarîbû û hatibû jor. Piştî ku hinekê li ber derî guhdar dike, paşê li zengila derî dixe. Belê, wê zengilê palnê min tev xirab kir. Vê nîvê şevê ev çi lêdana derî bû? Gelo hinek heval hatibûn? Min lêliyekê du dilî jiyan kir û hinekê sekinîm. Baqî tika dikir, “neke, ti xwe jî mehf dikî. Temam, lêborîna xwe dixwazim. Bi rastî jî diviyabû min ev negotibûna” û digiriya. Dîmên ku derdiket holê hê zêdetir kêrêt bû. Min jî di wê kêliyê de ji xwe digot; “ger hevalbin û li cem wan demance hebe, ezê vî bikujim.”

Ez bi derî ve çûm. Di wê kêliyê de Baqî jî baz da xorfa din û derî li ser girt. Min por û cilê xwe ser hev de anîn. Ji hêrsan direcifim. Bê xwestek derî vedikim. Ji nişkê ve jina bi navê Zeytun! Pirsî, “çi bû, ma tiştek heye, min hinek gengeşe bihîst.” Min jî got; “ na, tiştek nîne.” Ecêb li min temaşe kir û çû. Cardin derbasî hundur bûm. Ji hêrsan bi kolman li dîwaran dixim. Paşê min ji Baqî re got; “ zû biçe ji vê malê.” Got; “ temam.” Û valîzê xwe git û derket. Dema derket cîranê me yê kêlekê ew dît. Samî dizaniya ki di navbera me de nakokî hene. Me berê nîqaş kiribû. Di nîqaşa me her sêyan de cudatiya me ferq kiribû. Şevekê Kemal Burkay hatibû mala wan. Mîsoger Samî ji wî jî pirs kiribû. Dibe ku nasnameya me ya rastî jî hîn bûbe. Ji ber dayîka Samî pir ecêb li me dinêriya. Kûr diçû,

xemgîn bû û hewl dida me fêm bike. Sedema şerê me tam nedizaniya, lê texmîn dikir ku min Baqî ji malê qewitandiye. Bes cesaret nedikir ku tiştekê bipirse.

Zozan wê şevê li cem min dima û rojê diçû malê. Me sibehê derî girt û em bi hev re derketin. Min di wê kêliyê de pêdiviya xwe pir didît ku bi hevalan re bi-axifim. Ji ber bûyerên rû dayîn serê min têşiya. Westiyame û gavên min pêş de naçin. Tevahî laşê min giran bûye û nikarim bidim meşandin. Min bi zorakî xwe gihand mala Zekî. Dema ez dîtim hinekê şaş ma, bes hê ez ne-axivîm wî got; "hele were were min niha nû zanî çi bûye. Kêmek mabû ez wî bênamûsî bikujim. Bi rastî min demance derxist û gef li wî xwarin û wisa çû. Ez niha maf Didim xwîşka xwe. Ev zilam dîn e! Çi bela ye, bi wî re guru tine ye, tika dikir digot, 'bêjin Sakîne bila min şaş fêm neke. Ez her tiştî ji bona yekbûna me dikim. Ew di vê mijarê de pir bêpirsyar e, ne di xema wê de ye. Şoreşgeriyê dijberiya her tiştî dihesibîne. Ji aliyê lihevkirinê de ti hewldanê nake. Hûn bibin alîkar.'" Zekî jî li hember van nêzîkbûnên wî dibêje êdî bes e û çi tê ber devê wî dibêje;

"Sakîne mafdar e, ya rastî me di vê mijarê de qanekirinê de neheqî lê kir, wê ji me zêdetir tu nas dikir, em hestiya nêz bûn. Me got em te qezenc bikin, lê belê wer xwiyaye tu tam bela serî yî. Biqele ji vir, carek din jî ne wê hevalê û ne jî me aciz neke. Ger tu neçû ezê te bikujim." Vê carê jî Baqî cidiyeta vê meseleyê dihese û diçe. Lê ji Çewlikê dernakeve. Wer xwiyaye dê belaya wî bidome! Di vê de bi israr e. Çep û rast yên ji nû ve navbeynkariyê bike degere. Dixwaze bi-axive. Bes cara yekê me hemûyan bi hev re di vê mijarê de helwestek hevbeş raber dikir. Ev helwest ji ber xwe ve pêş ket. Ji ber her kesê

hemû rastî bi çavên xwe dîtin. Me digot; “hewce nake mirov bi yekê re ev qasî mijûl bibe. Ger bi faşîstekê re ew qas mijûlbûn çêbûya, dê bibûya heval.” Zekî jî di navberê de bela xwe li min dida û digot; “ger Kurdistan jî rizgar bibe, dê evê bela xwe ji te venekê.” Piştî demekê ji Çewlikê derket çû. Ez bi vê kêfxweşbûm. Lê ez ji derdor re nadim diyarkirin. Ji ber li Çewlikê mesekeyên zewacê dibin mijarên nîqaşên bihevrebûnê.

Li ser bingeha cudabûna raman bihevrebûn jî nedibû. Herî zêde jî pêwîst bû li ser vê mjarê nîqaş bihata kirin. Êdî nêrînên weke “ her yeke ji çînek ji rêê jî dikare bibe şoreşger û mirov dikare zewacek wisa veguherîne welatparêzî” tev ne nêzîkbûnên bi rêgez û rast bûn. Di heman demê de zewaca Husên Durmuş jî weke ya Zekî bi keçek gundiyê wî re di rojevê de bû. Zewacek di navbera malbatan de hatibû erêkirin bû. Dayîka malê neweş di nava cihan de bû. Diviyabû yek lê xwedî derketa. Yildiz dixwend wê şoreşger bxwua. Keçên din jî biçûk bûn. Lewma ancex bûkekê dikariya vî barî bigire! Dê bi vî rengî bertekên malbatê jî bihatan kêmkirin. Mantiqê nêzîkbûna ji vê mijarê re wisa bû. Lê rastiya zewaca Zekî pir ber bi çav li holê bû. Ji bilî zewacek kefneşop ti taybetmendiyek xwe tine bû. Tenê yek kes din li malê zêde bibû. Her wiha dema mesele dibû mijara namûsê neçar dima ku bipejiranda. Nîqaşên me somutbûn, lê me kes di vê mijarê de neçar nedikir. Bi gelemperî dihat gotin; “zewac li pêşiya şoreşgeriyê ne asteng e.” Dawut ji aliyekê ve ji vê meseleyê aciz bû û red dikir. Ji aliyek din ve her kes bi hev re dizewicand. An jî dixwazên bi vî rengî erê dikir.

Bi Dawut re çûm Dêrsimê. Her wiha divê em demanceyê jî bibin. Min ew girtiye cem xwe. Piştî me Kovanciyan derbas kir em bi taksiyek taybet çûn. Gotin hê zêdetir bi ewle ye. Em yekser çûn cem Peder wan. Min demance da Hamil'î. Li derdor bal kişand ku ew zilamê bi taksiya taybet hatiye malê kî ye? Zilam qelew û cuda ye. Di navbera heval û cîranan de de jî dihat axaftin ku "Apo hatiye cem Sakîne" û ev gotin digeriya. Baldariya hevalan û çûn û hatina hinek hevalên diyarker liv û tevgerek ava dikir. Demekê dayîka min jî wisa bawer kiribû û hizirîbû. Bes bi rastî jî hîsên jina bi navê Zeynep pir bihûz bûn. Dibêje; "na, nabe ku ev zilam Apo be", ango na-ecibîne, her tiştê wê ecêb bû. Ji rûniştin heta hênaseyên wê tev ecêb bûn. Lê dîsa jî dixwest fêm bike û pê bawer be.

Di firsenda destpêkê de ji min pirsî; "ev kî ye?" Min jî got; " hevaleke, tu çima ev qas li pey dikevî" û ez acizbûm. Paşê got; "zarok dibêjin Apo ye, lê ez bawer nakim. Tu vana gaye Qerso." Dimilkî ye, di maneya "mirov dibêje qey gayê Qersê ye." Ez ji vê jî pir aciz bûm, min xwest hişyar û rêzdar bi-axive. Lê ne li bendê bû ku ezê ew qasî aciz bibim. Vê carê jî ew aciz bû û got; " min tiştek xerab negot, bes tîpa wî peçekê cuda ye, min lewma wisa got."

Me roja paştir Dawut bir mala Merkît. Bi rastî jî weke ku hatibû gotin bû. Me Dawut pir baş diparast! Birina hinek malan û baldariya li hember wî ne kêm bû. Tiştên ku dihatin kirin erkên hevalbendiyê bûn. Her kes di vê mijarê de baldar û berpirsyar nêzîk dibû. Li qadê Elî Heyder Kaytan heye. Dawut ji min xwest ku ez bi Aysel Oztûrk re hevdîtinê bikim û rewşa wê zelal bikim. Ez Aysel nas nakim. Bes dizanim li dibistana mamosteyan xwendiye û ji HK'ê derbasî nava me bûye. Di vê

guhertinê de rola Selîm heye, ji ber girêdanek wan a bi hestiyar heye. Aysela ku di her kêliyê de pir dijwar êrîşî tevgera me dikir, bi bandora Selîm bibû UKO! Bes tevlîbûnên bi vî rengî dibûn mijarên nîqaşan û rê ji fesadiyan re vedikiribû. Dawut jî erka hînbûn û zelalkirina vê rewşê jî dabû min. Digot; "wê hê baştir xwe ji te re veke."

Ji ber xebatên min li cem Sevîm Kaya wan heye, ez jî diçim wê derê. Em ji wir jî çûn kolana bi navê Dax. Em di rê de ji xwe re di-axivin. Ji min re got ku beriya niha ji HK'ê bûye. Got; " piştî ku Netewparêz li dibistanê pêş ketin re, di pêvajoya wan pevçûnan de bi min re jî nakokî çêbûn. Me nîqaş dikir. Min destpêkê pir îmkar dikir. Lê bi taybet piştî ku ez bi Selîm re axivîm, baldariya min pêş ket. Ji ber ew her tim bi min re eleqeder dibû, nîqaşên me hişt ku em bi hev re eleqeder bibin. Me ev rewş ji hev re jî parve kir. Carinan em bi hev re diçûn malê yan jî dibistanê. Em çend caran bi hev re li qiraxê Munzurê rûniştin û axivîn. Asta têkîliya me jî ev e." Dema min got; "bes heval ji vê rewşê aciz, rexne dikin. Gotine ku we ev têkîlî di astek jor de pêş xistiye, ev jî bal dikişîne. Tu ji vê re çi dibêjî?", yekser tiştên ku hatine gotn red kir. Dawut dixwest ku ez van hîn bibin. Gelo di vê rewşê de têkîliyeke bi namûs, bi exlaq û astek têkîliya fermî derxistina holê çawa çêdibû? Ji ber tiştek din a somut tine bû. Min ancex dikariya ev qasê pirs bikim. Min ew guhdar kir û tiştên ku gotine bawer kir. Bi rastî jî dema me ev mijar nîqaş jî dikir ez tengav bûm. Ango ne li xoşa min bû. Di vê têkîliyê de aliyên wê yên çors gerîn, lêpirsîn, bênamûsî û exlaq ev qas tengkirin û girtina dest ecêb bû. Xoy û nêzîkbûnên Selîm ên li Çewlikê hatin bîra min.

Min Aysel ji wê bêhtir bi pîvan didît. Ji ber hê zêdetir vekirî di-axiviya. Lê cewhera vê meseleyê cudatirbû. Pîvanên wê yên şoreşgerî, asta îradeya wê ya azad, nêrînên wê yên derbarê hemû bûyerande ew dida dest. Dê ev jî hineke din di nava jiyan û qonaxên têkoşînê yên cuda de eşkere bibûna. Jixwe malbatê jî ev rewş dizaniya. Her duyan jî dixwest ev têkîliya wan fermî bibe. Dê Dawut, Aysel ji malbata wê bixwesta. Jixwe wê demê ew bixwe bi komek heval re çûbûn xwestibûn.

Di heman rojan de li gundê Cemîle civînek hat lidarxistin. Komek hevalên jin û zilam beşdar bibûn. Ez jî tevlî bûm. Dawut jî hebû, pêşketinên giştî hatin nîqaşkirin. Weke din jî hinek xisletên kesayetî hatin nîqaşkirin û rexnekirin. Ez bawerim hevalê Elî Heyder Kaytan di vê civînê de nirxandinek xwe ya derbarê Kiymet de, mînakek balkêş dabû û rexne kiribû. Gotibû; "li gundê Gûleçê gelek ciwan hene, heta gundek ku ciwanên xwe pir in. Lê, çepê Tirkan xwe li wir birêxistin kir. Bes, hevala me Kiymet ev çend sal in li wir mamostetiyê dike, tenê kesek qezenc kir, ew jî çû pê re zewicî."

Ew yek kes jî Zûlfî bû. Demek dema em diçûn gund ewê ku j ime re saz lê dixist bû. Ez hinekê şaş dimînim. Kiymet û Zûlfî! Ez ji ber rewşa wê Kiymet tînim ber çavên xwe. Ji ber Zûlfî dilxwazeke ji rêzê bû. Wî jî di nava giştî de ji bilî hinek qadroyan ti kes ne dieciband. Lewma hilbijartinek wisa ji min re ecêb dihat. Ez hinekê jî dişibînim zewaca keça xalê min Cemîle kul i gundê Çewlikê lê mamostetî dikir. Di nava wî gundê teng de yê dîtî yan jî liqayî kî hatiye, nêzî xwe dîtiye pê re zewicine. Gelo pîvanê wan ê ecibandinê çibû? Ji kîjan

pêdiviyan çavkaniya xwe digirt? Gelo taybetmendiyên wan hev dikişandin? Bes ji min re, her kesek ji hev pir cuda bû. Ew xisleta Kiymet a tim di radeya herî jor de red dikir, ji nişkê ve berovajî bibû. Min ne dikariya ez di navbera binyata wê ya biyolojî, nêzîkbûnên wê yên çors û zilamtî, ew gotinên wê yên şoregertiya dijwar re, li gund ciwanek ji rêzê hezkirinê girêdanekê çêbikim. Ez di hundurê xwe de jî hinekê kena xwe pê dikim. Eî Heyder Kaytan ev gotin vala nekiribû. Ya rastî rexneyek pir cidî bû.

Di sohbetên navbera civînê de li ser xisletên me yên kesane nîv cidî, nîv henek hinek pêkenok çêbûn. Ji bona Saîme Aşkin jî gotin; "Dêrsimperestî derbas nekiriye. Lê zanebûna wê ya teorî heye. Ango bi bîrdozî ye. Lê di rêxistinbûnê de lewaz e." Ji bona min jî gotin; "nan û xwêya Dêrsimê herambe. Ji aliyê bîrdozî ve ne kûr e, lê aliyê wê yê rêxistinî xurt e." Ji bona hevalê Fuat jî gotin; "bi wî re Dêrsimperestî pir kûr e." Ji bona Çetîn jî gotin hinekê heye.

Sohbet dirêj bû. Wê şevê hinek heval vegeriyan bajar. Hinek ji me jî li malbata Cemîle man. Sibehê Yildirim ez birim malê. Ecêb, dayîka min derketina min a ji malê pir dikir pirsgirêk, lê niha ji halê wê yê kevin tiştek nemaye. Tepkiya wê tenê weke; "me nedizaniya ku wê tu şev neyî malê" bû. Dayîka Zeynep hatibû guhetin. Êdî ez dikarim şev bi wê re biçim hinek malan. Behsa xwe ji min re dike; weke "ji hevalan hez dike, tên malê û diçin, pêdiviyên wan pêk tîne, her tim pirsan dikin û hw. Her wiha behs dike çawa tevlî mîtînga 1'ê Gulanê bûye. Behsa qelebalix û çoşa mîtîngê dike. Her wiha ser ve zêde dike, dibêje;

"xweziya tu jî li malê bûya. Keçên hinek din li malê şoreşgertiyê dikin. Binêre ez ne weke berê me. Ma bizaniya wisa ye, minê tu biçewsanda? Cahîltiye çi bikim. Ditirsiyam. Min digot, polîs te bigirin, wê tiştekê bînin serê te, wê demê ezê çi bikim. Min digot qey, tê hinek din baldar nêzîk bibî, rawestî, lê berovajî çêbû. Tu ji malê qut kirî. Keça min tika dikim were, li malê, Dêrsimê kar bike. Bawer bike ezê êdî tiştekê nebêjim."

Ez jî di vê mijarê de hewl Didim hê bi hedar qane bikim.

"ez têm Dêrsimê û diçim. Ji xwe girêdana min bi vir re heye, jê qut nebûme. Binêre ez têm malê jî. Ev bedew e. Me hêjî girêdana xwe ji hev qut nekiriye. Ew rev em cardin bi hev ve dan girêdan. Niha te jî batir fêm kiriye. Şoreşgertî ne tenê karê zilama ne. Ger birayê min şoreşgertî bikira tu ew qasî bi ser de diçû. Hêza te têra wî nedikir. Lê tu pir bi ser min de dihatî. Te ne baş kir. Nêzîkbûnên te ne rastbûn. Ez keçek mezin bûm. Te her cure dijîn û hakaret ji min re dikirin. Te li min dixist û tavêt kolanê. Ev mirovan têşîne. Lewma mirov nabêje dayîk e û guhdar jî nake. Mayîn û nemana li Dêrsimê ne girîng e. Lê ez nikarim bi tena serê xwe biryarê bidim. Ger rêxistin bêje bimîne, ezê bimînim. Lê hevalên keç li vir pir in. Hinek cihên din pêdivî heye. Wisa baştire." Ew çavên xwe yên çaqir berdane cihekê, kûr û xemgîn diçû. Dizane ku ez cihe jî bûme. Ez dixwazim bi awayek fermî jî kargeriyên xwe yên cudabûnê temam bikim. Hevalan jî bi rêya parezerekî doz vekirin. Ez naxwazim bi van karan re mijûl bibim. Lê dadgeh napejirîne. Divê ez jî amade bim. Ez çûm avahiya dozgeriyê, apê min jî li wir bû. Digiriya, tika dikir, dixwest ez devji vê dozê bedrim. Ez jî pê re axivîm. Dujîn ji Baqî re dikir, digot; "ker kurê

keran, ç idi vê HK'ê de dibîne? Min dizaniya dê wisa be, min ji wî re jî digot. Ez çi bikim, nikarim tiştekê bêjim. Xaltîka te jî nexweş e, dibêje ezê xwe daliqînim" û didomîne.

Bê navber ser ve zêde dike. "binêre çavên min jî çûne" bi girî di-axiviya û hewl dida min qane bike. Baqî ne hatibû. Lewma dê doz bihata dirêjkirin û talok-kirin, ez jî ji vê rewşê aciz dibûm. Her tiştî ez tengav dikirim. Gelo min çawa ji van tengezariyan re rê vekiribû? Em bêjin rec çi nedibû, zewaca hatî kirin û paşê ji bona tiştek çênebê mehra hatî kirin tev tengezarî bûn. Niha jî ez li dadgehan bi pirsgirêka devjihev berdanê ve mijûl dibim. Êdî min ji hevalan re digot; "kerema xwe r ma rêyek din a çareserkirina vê mijarê tine ye. Ez nebim nabe? Wan jî got; "nabe." Ji ber Baqî di nêrîna xwe ya destpêkê de li dijî divjihev berdanê derket. Bes soz dabû, gotibû; "temam, ezê zehmetiyan dernexim." Dîa kaypaklik kir. Hevalan jî got; "neke serê xwe, dê hinekê bidome,lê wê encam bibe. Ji bona vê jî dê hewce neke ku tu carek din taybet werî. Dema rêya li vir ket were." Û min dihedirînin. Bes dadgehê dîroka dema rûniştinê li gora min diyar nedikir! Husên dujîn ji Baqî re dikir. Digot; "emê vê carê biçin wî zorê ji gund bînin."

Ez vegeriyam Çewlikê. Piştî em demekê man cardin bi Hamilî re çûm Elezîzê. Rêbertî û çend hevalên din li "mala spî"ne. Civîn heye. Rêbertî wê şevê bi min re axivî. Li xorfeyek wê malê hinek alavên wke qenepeyek razanê heye. Xorfeyên din vala ne. Zivistan e û sar e. Ji ber xorfe vala bûn, deng zêdetir derdiket. Min pala xwe dabû dîwar û li ser piyan rawestiya bûm. Rêbertî jî diçû û dihat. Ew cara duyemîn bû bi min re li ser zewacê di-axivî. Têkîliyek zewacê ya cudabûn û bihevrebûna wê jî ecêb gelek dayî mijûlkirin, vê carê ji bingeh ve hatibû çareserkirin. Ez jî heval jî di vê mijarê de gihiştibûn

encamekê. Hem di dirêjkirin û hem jî her kêliyê bi şêwazek bê îstîkrar ketina rojevê de, bandora hem nêzîkbûnên min ên hestiyar û hem nêzîkbûnên hevalan ên ji bûyerê re hebûn.

Rêbertî di navberê de dikeniya. Her tim behsa, têkîliyên şoreşger, têkîliyên azad, nehêsanbûna bihevre bûnê, girêdana van mijaran bi têkoşîn û bi rêxistinê re dikir. Tengê wî bilind bû. Ji ber xorfe vala bûn deng vedida. Hevalên din jî li xorfeya din şaş diman. Digotin; "gelo çima Rêbertî ew qas bi ser Sakîne de diçe" û mereq dikirin.

Dema Rêbertî carina li dîwar dixist û şêwazê meşa wî bal dikişand. Hevalek hem ji bona hşyariya deng bike, hem jî ji bona fêm bike bê ka çi heye, hat got; "xorfe vala ye. Dibe ku deng biçe yên jêrê" û çû. Paşê armanca vê hişyariyê fêmkiribûn û keniyabûn. Ji hev re gotibûn; " min dît ku Rêbertî pir aramî ji xwe re diçe û tê û di-axive, ez rehet bûm. Min ji hevalan re got her tişt asayî ye." Dema ez piştî axaftinê derbasî xorfa wan bûm, li rûyê min nêrîn û keniyan. Gotin; "me jî got qey Rêbertî li te dixe" û henek bi min kirin. Ez jî bi vê meseleyê keniyabûm.

Belê, ew cara duyem li ser esasê di nava têkoşînê de merxên bihev re bûna şoreşgerî di nava me de çawa pêş dikeve û li ser vî bingehî avakirina yekbûnê bi serê xwe têkoşîneke di-axiviya. Digot ev mijar şereke û hesasiyeta xwe ya di vê mijarê de diyar dikir. Lê hevalên din zêde girîng î ne dabûn vê mijarê. Ji ber netenê pirsgirêka min bû. Ji serî ve min bi hevalan re nîqaş dikir û hewl dida çareser bikim. Lê di çareseriya pratîkî de bêrêbazî minre hatin jiyîn. Ew jî her tişt dikir du serî. Dihişt ku pirsgirêk ji demê re bimîne û ez jî ji çûn û hatinan rizgar nedibûm.

Min di nava salekê de çi qas tişt jiya bû

Ji nû ve hatina Elezîzê û li vir xebat domandin, ji bona min dihat wateya pêvajoyek nû. Elezîz, qadek ku têkoşîna me ji her alî ve dikare lê pêş bikevê ye. Di têkoşînê de meşa bê navber bi sanciyên dema zarokatiyê bi rojên xebatê yên coşên mezin, bedew û watedar ve wisa destpê dikir.

Elezîz tam hatiye guhertin. Bîrdoziya Rizgariya Netewî her kesî bandor dike. Binesaziya komên din yek bi yek dirûxin. Nakokiyên wan her ku diçû, rê ji qutbûn û cihetiyê re vedikir. Mercên vê ava dikir. Tam di wextek wisa de civînek di dema xwe û cih de hat lidarxistin. Dê Rêbertî bi-axive, lê kes vê nizane. Heta kêliya dawî veşartî tê girtin. Ya rastî di cihek weke Elezîzê de agahiyên bi vî rengî zû tên belavkirin. Tenê hinek hevalan dizaniya. Hinekan jî texmîn dikir. Lê tevî vê jî zû hat ferqkirin.

Em bi şêwazên guruban bi dolmuş û taksiyan diçin gundê Bîrvanê. Li gund endamên Ciwanên Şoreşger (Dev-Genç) jî hene. Lê piraniya wan di bin bandora me de ne. Civîn li dibistana seretayî hat lidarxistin. Hevalên me û endamên Ciwanên Şoreşger hatin. Xorfe dagirtî bû. Axaftina yekemîn Rêbertî kir. Axaftin di nîtelîka manîfestoyê de ye. Dahûrînek balkêş a dîroka ji civata mirov a destpêkê heta roja me ya îro kir. Kurd û Kurdistan bi her aliyê wê ve pir sade, zanistî û hemû rastiya wê ve danî holê. Naveroka têgehên weke sosyalîzm, şoreş, emperyalîzm, enternasyonalîzm û welatparêzî, wateya wan a tasteqînî li ser bingehên somut vegot û nirxand.

Her kes bi baldariyek mezin guhdar dike. Bulend'ê ji Ciwanên Şoreşger bû bê navber li ser lênûsa pêşiya xwe têbinî dinivîsand. Pirtûk û kovarên kom kiribûn li hev dixist. Hinek rûpel xêa dikir û dipêça. Xwe amade dikir. Hevalên me jî ji kêliya Rêbertî ketiye hundur ve, di nava kêfxweşî û çoşek watedar û bedew de ne. Îfadeya di rûyê wan de ye pir watedar e, çavên wan dibiriqe. Yên ne dizaniyan jî dema Rêbertî axivî pê dizane ku Rêbertî ye. Belê, li hember me Rêber APO hebû. Zindî di-axiviya. Li ser masê komek qaxidên spî hebûn. Qaxit vala bûn, lê yên ku ne dizaniyan wer dihizirîn ku Rêbertî li têbiniyên xwe dinêre. Di navberê de bi destê xwe wan qaxidan rast dike. Paçê li ser masê rast dike. Paşê serê xwe rakir û bi tiliya xwe berçavkê xwe bicih kir. Lêhûrbûnek kûr de bû. Pênaseyên wî zelal bûn. Rakêşwer û dihejandin. Ti şlêbûnek tine bû. Weke ku tiştek li hev hatiye pêşan û bûye girêk ji hev veke nêz dibû. Dil û mejî, hemû şaneyên te ser û jêr dibûn û tu rehet dibû. Ji her hênaseyek te re giyanek nû dida. Mirov ne dikariya di cihê xwe de raweste. Dilê te ne dikariya xwe di hundur de bigire. Mirov bi gurur dibû, baweriya te zêde dibû û mirov carek din digot, bijî ji min re ku ez nefereke Tevgerek wisa me.

Mirov cuda didît. Axaftin, xoy, heta fîzîka wî jî ji mirov re cuda dixwiya. Hemû rêheval nirx û bedew bûn, bawerî didan. Rêbertî pir cuda bû! Dema mirov Rêberan nebîne jî gelek xisletan xeyal dike. Weke kombûna hemû bedewî û erêniyan dibîne û fêm dike. Lê belê, Rêbertî bi her tiştê xwe ve li hemberê me bû! Dadiket kûraniya dîrokê, dadiket kûraniya civakê, heta dadiket kûraniya kes û çînayetî. Hê li wir tiştek somut jî tine bû. Hêjî gelek mirov tevgera me nas nakin û fêm

nakin. Lê di her dahûrînê û her nirxandin te jî digire nava xwe vedike, bal dikişîne, bawerî dide û girê dide. Di navberên civînê de ji hev re digotin; “evê di-axive APO ye, mîsoger ew e.” Carekê de her kes pê hesiya ku Rêbertî ye.

Axaftvanê duyemîn jî Bulentê ji Ciwanên Şoreşger bû. Têbiniyên lênûsan, kovar û pirtûk li ser masê tije bibûn. Ev nêzîkbûnek çepê Tirkan a giştî bû. Em şaş namînin. Demagojiya zêde û ji hostayan gelekê digirin û berhev dikin. Ev jî şablontî bû. Bulent ji bona bide ispat bike Kurdistan ne hatiye dagirkirin, ne welatek û netewek cuda ye, hema bêje nirxandinên ecêb a weke di nava tirbê de hestiyên hemû hostayan bihijîne dike. Devê wî xweş gotina vedibêje. Berhemdar û zana ye. Ji gotinên Rêbertiyê jî pir di-axiviya. Lê mixabin ji devrî rastiya Kurdistan û Tirkî di-axiviya. Digot, Kurdistan nû ketiye statuya dagerkerî, dagirkeriya kevnar hatiye rûxandin û di nêrîna roja me de dagirkeriya kevnar ne maye diparast. Ji bona Rizgariya Netewî ya din ava mercên Kurdistanê de derketiye holê û xweseriya wê red bike û tine bihesibîne çi jê dihat dikir. Demogogek xurt bû!

Rêbertî mafê xwe yê axaftinê ya dawî xest. Nêrînên ku Bulend diyar kirîn vala derxistin, nêzîkbûna qelp a ji pirsgirêkan re danî holê. Derbarê erkên girêdana şoreşa Kurdistan û Tirkî ya nêzî hev, têkoşîna hevbeş, avakirina mercên yekîtî û rast bikar anînê de ramanên balkêş diyar kir. Civînê bandor li her kesî kir. Dem rast hatibû bikar anîn û nexwestin ku dirêj bikin.

Hevalan ewlekariya derve baş bi sazûman kiribûn. Dîsa jî di kêliyên dawî de tevgerek çêbû. Ser esasê ku dijmin îxbar girtiye li gund civîn tê lidarxistin û dibe ku êrîş bike her kes wê şevê belav bû. Em yekser hatin navenda bajêr. Em çûn qeta

jêrîn a mala hevalan. Hevalan got ‘ew der guncavtire.” Me demek kin Rêbertî li malê bi tenê hişt. Divê ez û hevalek biçin cem Aytekîn wan. Riza li wir in, dê bi wan re hevdîtinek were kirin. Em ne hizirîn. Rêbertî jî got; “biçin tiştek nabe.” Cemîle û zarok jî çûn qeta jorîn. Mala bavê Elî jorê bû, qeta jêrê hê zidetir teng e. Du deriyên xanî hebûn. Yek li ser cadeyê ye, yê din jî deriyê hewşê ye li ser rêya piştê ye. Em van ji Rêbertî re jî dibêjin û me demanceya 14 xwar jê re hişt û em çûn. Rêbertî demance girt ber xwe û lê temaşe dike, paşê derdixe û datîne ser dîwanê. Perdeyên malê sitûr in. Şewq dernakevin derve. Heta ku ji nêz ve neyê temaşekirin, naye ferqkirin.

Em bi Elî re derketin, bes em ne rehet in. Em ji xwe re dibêjin; “ma dibe? Ma rast e Rêbertî bi tenê bimîne? Xweziya yek ji me bima.” Me fêm kir ku me di vir de şaşiyek kiriye. Dema em derketin Rêbertî ji me re gotibû; “zû biçin, xwe mijûl nekin û zû vegerin.” Me ji yê jor re jî got bila kes danekevê jêrê. Qaşo em hewl didin her kes bizane ku kes li malê tine ye. Em di rêde ber xwe de di-axivin û diçin û her dubare dikin ku me ne baş kiriye. Komek heval li cem Aytekîn wan hebû, qelebalix bû. Em bi Riza re axivîn. Riza carina di navberê de henek dikirin, me jî jê re got wextê me tineye. Me zanî kum e xwe pir mijûl kiriye, ji ber em lez ji wir derketin. Dema em derbasî malê bûn, kehrebeyên malê girtûbûn. Em di cihê xwe de cemidîn. Rêbertî bi rûkenî got:

“werin werin, hatina we ya zû wisa ye? Polîsan ser malê de girtin, ger ez binçav bikiran wê agahiya yek ji we nabûya. Dema min ferq kir polîs hatin min hemû lampe girtin, demance girt û ber bi deriyê piştê ve çûm. Lê daneketin jêr. Bi lez û bez ketin mala jor, piştî demek kin jî derketin. Çi nabe me vê carê jî derbas kir.”

Min û Elî li hev temaşe kir, din ava hestek sucdariyek mezin de dijîn. Me wê kêliyê ji xwe şerm kir. “jixwe destpêkê Rêbertî bi tenê hiştin şaş û suc bû. Li wê malê xwe mijûlkirin jî suc bû. Dibe ku ger em zû bihatan jî me nekaribiya tiştek bikin, polîs li malê bûn, dîsa jî diviyabû em zû bihatan.”

Li Bîrvanê civîn hatibû lidarxistin û Eliyê ji Bîrvanê dihat nasîn. Jixwe seqetbû ku me Rêbertî jî anîbû wê malê. Gelo ma cihek din dibû? Di wê kêliyê de ez û Elî bi deng dihizirîn. Gelo hinek din jêrtir nêzî sûkê kîjan mal hebûn? Ji ber ew der hê guncavtir bû. Malek heye. Keçên wan dilxwaên me ne, Elî jî çû wê malê. Bê ku dereng bimîne vegeriya got; “ew der guncav e.” Rêbertî rewşa malê pirsî; “çawa ye?” Elî jî bersivand; “xwediyên malê baş in, du deriyên malê hene.” Paşê em di navbera kolanan re derbasî wê malê bûn. Bi rastî jî mal pir guncav bû. Em got; “xweziya em ji destpêkê ve bihatan vê malê.” Xwediyên malê em bi rêzdar pêşwazî kirin. Tenê yek du keçên wan li malê. Rêbertî pirsî û got;

“ne tesaduf bu ku polîsan tam wê roja civînê bi ser gund de girtin. Gelo tesaduf bû, yan jî îxbar bû bi ser malê de girtin?” Me dibe civîn ev qas zû hatibe bihîstin! Belê dibe. Lê me dîsa jî ser xist. Çawa derbas bû, wê bandor bike gelo? Wê mîsoger hilweşînek çêbe û dê ev jî lêgerînan lez bike. Lewma divê hûn li ser vî bingehî têkoşîna bîrdozî kûr bikin. Elezîz jî, dikare rê ji derketinek mezin re veke.”

Bi rastî jî civînê bandor kiribû. Di nava demek kin de gelek qadro derbasî nava me bûn. Berfirehbûnek mezin heye. Diviyabû ev bi kûranî bihata birêxistinkirin. Fewzî Çakmak jî qeta jêrîn a avahiya yeke Pertek’î digire. Hevalan hinek alavên li mala Çewlikê derbasî wê malê kirin. Pirsgirêka alavan jî ji holê rabû. Perdeyên malê yên derve di şêwazek ewleya herî baş

de ne. Malên xwendekar an jî bekaran hê xizantirin. Bi dîmenên xwe ve bal dikişînin. Demek dirêj kes ji me tiştekê fêm nake. Min ji xwediyê malê re got; “ birayê min dixwîne, ez jî kar dikim.” Ez demekê bi hevalê Cemîl Bayik re mam. Ji ber vê dihatin malê û diçûn pir bûn. Hevalan weke mala Sarakaya wan dikir. Çek û pirtûkên me tev li wê malê ne. Uzî, çend demance û hinek pirtûkên me hene. Ew çek her carê diçin cihekê û tên, ango gerokin. Dibin heta Çewlik, Dêrsim û heta Enqereyê. Ji bona me pir bi nirx in, lê divê em malê jî pir baş bikar bînin, nexwe dê zû eşkere bibe.

Min hevalê Cemîl di sala 77'an de dîribû. Wê demê hê ciwantir bû. Min dît k udi nava salekê de pir hinciriye (yipranma). Di zimanê wî yê Tirkî de bandora devoka Elezîzê hebû. Herî zêde bi vê taybetmendiya xwe ve di bîra min de mabû. Em ne axivîbûn. Di hevdîtina destpêkê de hevpeyvîna me çênebû. Metînê Ker (Metîn Gûngor)jî bi me re dimîne. Carina ew jî tê malê û diçe.

Fewzî Çakmak weke qadek hatî rizgarkirin bû. Hevalan li hinek cihên serê kolanan nobet digirt. Bi taybet jî li xeta ku qerekol lê bû, nobet dihat girtin. Gelek caran hevalê Cemîl jî Uzî dida milê xwe di bin çakêtê xwe de vedişart û heta derengiya şevê nedihat malê. Mifteyek malê hebû. Piranî jî li cem min dima. Lewma ez piranî roj derdiketim. Komek hevalên jin hebûn me bi wan re xebatên perwerdeyê dimeşand. Di nava wan de yên ku min nas dikirin jî hebûn. Bi yên nû re hejmar zêde bibû. Ez civîneke ku hevalê Aytekîn li kolana Îstisyonê birêve dibir bûm. Me li wê derê jî komek hevalên jin nas kir. Hevalê Aytekîn perwerde dida. Di navberê de jî xebatên semîneran dihat kirin.

Divê hinek gurup ji nû ve werin vesazkirin. Min hinek hevalên xwe yên li dibistana amadeyî nas dikir li Sarikaya dîtin. Emê tenê rojên perwerdeya wan tespît bikin. Di nava wan de Nadîre Turgut jî heye. Hevalê Cemîl jî hat. Ew wer dihizire ku emê civînê lidar bixin. Li bendê ye ku berfireh were axaftin û nîqaşkirin. Ez jî dihizirîm ku ji bona ku ew hatiye dibe ku ew bixwaze bi-axive. Lê ne ew di-axivî û ne jî ez di-axivîm. Dema kêliyekê got; "de baxivin, hûn li benda çi ne" ez hem şaş mam, hem jî min şerim kir. Ez zêde ne axivîm, sor bûm, min xwêdan da û gotinên min tevlî hev bûn û dibêjim; "weke em beriya niha jî axivîm." Lê ew nizane û di heman demê de ez tam nizanim ku ezê çi bi-axivim.

Lewma min ne karî bi xesaret komî ser hev bi-axivim. Min bi zorakî rojên perwerdeyê destnîşan kir. Heval jî ji vî halê min şaş dimînin. Jixwe cardin ti wateya dubarekirina axaftinên beriya niha hatine kirin tine ye. Min bi vî rengî axaftinên xwe xilas kir. Ew jî ji bona biçin dibistanê rabûn û çûn. Hevalê Cemîl jî got ma ev qas bû. Zêde wate jî nedayê. Hêjî di ber xwe de hêdîka digot; "ev çi cure civîne." Bes di kêliya dawî de ew hinekê axivî. Ez ji bo vê jî hê zêdetir tengav bûm. Ji ber tiştek pir cuda negot. Mijarên hatin vegotin, tiştên ku me beriya niha nîqaşkirine hinek din berfirehtir bû. Bes min çima nekarî ez li wê derê bi-axivim? Ez di peywendiyên du kesî yên bi hevalê Cemîl re teng nedibûm. Lewma min şerim nedikir, hê rehetir di-axiviyam. Madem wisa, min çima nekarî bi-axivim? Ez ji xwe aciz dibûm. Diviyabû mirov ew qas nekêrhatî û şerimker bûya. Ew demekê axivî, lê hişê min li ser vê mijarê bû. Pir zêde dirêj nekir. Got; "hûnê bi heval re bi-axivin û nîqaş bikin." Her ku wî wisa digot, ez ji ber nêrîna min destpêkê diyar kirî xemgîn dibûm.

Ew çû û ji min re jî got; “tu serdana malê bike, lê wê derê lêgerîn heye, lewma divê tevdîr werin girtin û ew mal were paqijkirin.” Got; “me çekên li malê sewkî cihek din kirine. Dîsa jî kontrol bikin” û weke din deyn nekir. Ez jî bi lez çûm malê. Hinek nor hebûn, min ew di sobeyê de şewitandin. Min hinek biroşûrên bi navê ‘Em Rêya Rast Têbigihijin’ bi Kurdo (Mistefa Bayik) re di valahiya merdîwenan de veşartibû. Ji ber tarî bû min nekarî ez cihê wan cara dawî jî kontrol bikim. Nasname hebûn, min ew hiştin ji kêliya dawî re û hinek wêne jî şiwitand. Lê prtûk man. Ji ber kolan pir berfirehe lêgerîna dijmin wext digirt.

Mala em lê jî diman seriyek din ê kolanê bû. Hemû malên sê-çar avahî bûn. Lewra rewşa wir cuda bû bal nedikişand. Li malên aliyên rastê û avahiyên pêşiyê lêgerîn berdewam dikir. Dema polîs hê zêdetir nêz bûn êdî em zelal bûn ku dê lêgerînê bikin, min nasname jî avêtin sobeyê. Min yekser ji xwe re îfadeya ku bidim di hişê xwe de diyar kir, ku ezê bêjim; ‘ezê nasnameya xwe eşkere bêjim. Ez cihe bûme û li Elezîzê rûdinim. Malbata min alikariya madî dike. Pirtûkên heyî jî jixwe li sûkê têne firotin. Ez jî weke kesek ronakbîr ji xwendinê hez dikim. Kesek din li cem min namîne. Carina birayên min tên cem min dimînin. Ez ji xwe re dibêjim îfadeya herî bi mantiq ev e. Dema ez wisa dihizirîm, ji nişkê ve fermana tevji lêgerînê bedrin têdayîn. Leşkeran baz dida û diçûn û dihatin. Kêfa min hat. Bes min ew qas nasname vala şewitandibûn. Bi vî rengî bi dawîkirina lêgerînê ez kêfxweş kiribûm. Lê mirov nedikariya bi tesadufan jî bijî. Êdî diviya em bertekan pêş bixin.

Paşê me bi Kurdo re li tiştên k udi bin merdîwenan de veşartine temaşe kirin. Pir diyar dibûn, ji ber zemîn ax bû derizî bû. Dema yekser lê dinêriya mirov dizaniya ku tiştin li wê derê hatine veşartin. Ger bihatan malê, ji ber deriyê wir hebû wê mîsoger li wir binêriyan. Me roja paştir derxistin û lê nêrî, her tişt şil bibû. Her wiha bêhna qenela tuwaletê (laxim) ketibû pirtûkan û ev bêhn pir giran bû. Mirov nedikariya nêzî bibe. Me heta sibehê yek bi yek rûpelên wan ziwa kirin, hê baştir pêçan û radestî Kurdo kirin. Dê ew li ciheke din veşêre. Bi vî rengî limmalê tişteke xeternakiyê ava bike namîne û em jî rehet dibin. Dîsa jî gel şevê serdegirtinek çêbe, çek û uzîlî bi hevalan re hene. Em hêjî êrîşek di vê astê de hêvî nakin. Em hê nebûna hedef, dibe ku di lêgerînên giştî de tiştek bibe, nexwe polîs vê gavê bi taybet ser me ranawest in. Dîsa jî tevdîr girîng e.

Rêwîtiya min a Elezîz, Çewlik û cardin Elezîzê re pêvajoyek salekê derbas bû. Her tişt pir bi amatorî bû. Lê, cardin daxwaza xebatek hûr û kûr hebû û pêvajoyek hewldanek xurt bû. Em bi gelek hevalên cuda re tên cem hev û kar dikin. Em qadên nû, xislet û qonaxên ku têkoşîna di astên cuda de pêş dikeve dibînin û bandora van bi xwe dijîn. Di heman demê de bi xwe re navav lêpirsînê de me. Min di vê navberê de pêvajoyên ku jiyîne, pirsgirêkên ku rû bi rû hatime tev bi heval Cemîl re nîqaş kir. Her wiha encamên ku min hewl daye bi dest bixim bi hemû ziraviyan ve parve dikim. Ji ber min pêdiviya xwe bi vê didît.

Her çendî piştî Îmîrê gelek derfetên axaftin û nîqaşan çêbûn, gelek tişt di nava dema derbasbûyî de baştir hatin fêmkirin. Ez êdî, têgihiştina bûyeran û sedemên wan dîtinê de

zehmetiyan najîm. Dîsa jî weke kum in bixeniqînin derdiket holê. Bûyerên ku ez bê hesab ketim navê, di vê dema şoreşgertiya min a cahil de, ez pir tevgav kirim. Ecêb min din ava salekê de çi qas tişt jiyabû. Ez bixwe jî şaş dimam.

Min li Çewlikê carinan nîqaş dikir û li ser pirsirêkên ku ez aciz dikirim di-axiviyam. Lê ev bi sînor diman. Sazûmaniya kar û pirsgirêkên giştî, dihişt ku tu bi xwe re nîqaş bikî û ber bi çareseriyê ve biçî. Ya rast herî rast bihata kirin jî ev bû. Nêzîkbûna min ji pirsgirêkan re ne weke, 'ev pirsgirêkên min in' bû. Lewma min dixwest mijarek herî biçûk jî bi hevalan re nîqaş bikim û ji wan re ragihînim. Jixwe dema min derfetên vê nedidît ez aciz dibûm. Ev xislet jî weke hînbûnek jiyanê bi min re pêş ketibû. Temam, gelo vê teybetmendiyê her tişt çareser dikir? Bersiva min jî ji vê re na ye.

Min rewş dirêj dirêj ji hevalê Cemîl re vegot. Jixwe min bi şêwazek nirxandina pêvajoya navberê nivîsandibû û li cem xwe rakiribû. Ev hinekê jî çîroka tiştên ku min jiyan kiribû. Lê ji ber ku ne baş bû ez di rêyan de li ser xwe bigerînim, bê xwestek jî be mine w nivîs şewitandibûn. Lê ne zehmet bû ku ez tiştên min jiyan kirine vebêjim. Min sedema reva xwe ya ji malê, zewac û yekser devjihev berdana me, tev bi ziravî vegot. Gelek mijar pir trajîk, diqehirîne û êş didin. Min hêrs dike û qirika min tije girî dibû. Ez bandora tiştên ku hatine jiyîn ew qas kûr dijîm ku û wan weke hatiye jiyîn vedibêjim, heman weke şanoyekê ye. Her tişt pir vekirî di xoy, nêzîkbûn û axaftinê min de diyar dibe. Hest û bertekên min bê ku veşartî û nepenî xwe didin der. Ez di wê kêliyê de li hember xwe şaş mam. Min behsa hemû lewazî, bêçaretî, xemgînî û şerimbûnên xwe kir. Di heman demê de bi hejandinek giran ve digirîm. Tişta ku ez

didam giriyandin jî, ne şerimbûna tiştên ku hatibûn jiyîn, an jî “hêrsa min a li dijî çarenûsê” bû. Heta di wê kêliyê de min digot mijar ne ev e. Min ne dixwest ku şaş were fêmkirin û min got;

" Na, ez bi tişteke din digirîm. Ez niha ne bê çare me. Belovajî ez di wê baweriyê de me kum in gava çareseriyê avêtiye. Ez xwe hê bi hêztir dibînim. Tenê hêrs bûme. Dema paşerojê vedigerim û lê dinêrim, ez dihesim ku diviyabû min ev nejiyan. Ango ez li dijî lewaziyên ku çavkaniya xwe ji min digirin hêrs dibim. Ez li dijî her tiştê ku neyênî ne bi hêrsim. Jiyana şoreşgerekê jî dîrokeke. Gotina ‘ têkoşîne; dibe ku aliyên lewaz, binkeftî, têk çûyîn jî hebin!’ dibe ku ji aliyê teorîk ve rastiyê rave dikin. Lê dîsa jî mirov hinek tiştan ti caran napejirîne. Nikare dawerivîne. Jixwe divê mirov nepejirîne û ne dawerivîne. Deq, ne tenê tewanbariya mezin û rewşa îxanetê ye. Wê demê ma çima mirov nekaribe bibe xwedî jiyanek ‘bê deq’ ne wisa? Gelo ev dibe îdealîze kirina jiyanê? Na! Dibe ku carinan hinek tiştên ku şopan dihêlin jiyîn ji neçarî ye. Dibe ku carina tiştên ku êşên wan kûr in bi teqez werin jiyîn. Ma ne jiyan di yek xetê de nameşe.”

Ji nişkê ve hevalê Cemîl jî xemgîn bû û got; “girî nabe! Ev e te pirsgirêk çareser kiriye! Ma êdî tu çima digirî? Rast e, divê derbarê gavên ku tavêjê bizane, da kul i ser encamên wê jî baş bihizire. Nexwe dê encamên wê bi êş bin û dikare gelek tiştan jî bi xwe re winda bike. Çi nabe, hevalan derbarê te de hinek tişt vegotibûn, lê min nedizaniya di vê astê de ye. Baş bû, bi vê mebestê me jî mijar fêm kir. Bes divê êdî tu jî serê xwe pê ne êşînî.”

Dibe ku em ne di civînek fermî de bûn. Gelek heval jî nebûn. Lê min gelek bûyerên ku pêvajoyek ji her alî ve bandor kirine bi hemû ziraviyan ve weke ku ji nû ve dijîm vegot û min hewl da ku çareseriyê wan danim holê. Ji ber hevalê Cemîl ne tenê kesek bû. Nûnertiya rêxistinê dikir. Min di vir de xwe ji rêxistinê re vekiribû. Ango ev axaftin, ne tenê xwe vekirin û nîqaşek rehetbûnê bû. Ji ber wê peywendiyên me jî li ser vî bingehî nêzîkbûnek objektîf pêş biketa. Mirov bixwaze nexwaze tiştên dihatin gotin, nirxandinên kêm an jî zêde û şîrove pêş guman didan avakirin û bandor li ser pêwendiyan dikir.

Di nava pêvajoya me bi hevalê Cemîl hev re kar dikir de, peywendiyên me her tim di nava mesafeyekê de bûn. Belê, em li malekê, me kêleka hev kar dikir. Lê hevalbendiya wî rêzdar bû û ev mesafe diparast. Zêde axaftin û nîqaşên me çênedibûn. Heta li gorî hinek hevalan re hê zêdetir kêm û bi sînor bû. Me bi hevalên din re hê zêdetir nîqaş dikir û ev nehevsengiya di van nîqaşan de jî kêmasiyek bû. Ew dihat dîtin. Lê ne hatibû derbaskirin. Carina min ji xwe dipirsiya; "gelo çavkaniya xwe ji min digire?" Bêguman, aliyên ku çavkaniya xwe ji min jî digirt hebûn. Lê belê, jixwe hevalê Cemîl di zêde nîqaşên di mijarên teorîk û bîrdozî de nedikir. Zêdetir li ser pirsgirêkên rêxistinî, kargeriyên rojevê û rewşên somut ên derdiketin holê, radiwestiya û nîqaş dikir. Lê li gel vê aliyê wî yê sohbetkar jî hebû. Dema dixwest dirêj sohbet dikir. Hem jî di mijarên ku beriya wê dehên caran axiviye de. Ez alî zêde herikbar nebû. Heta gelek caran nedihat pejirandin. Lê aliyek din ve jî hêzek mezin a manevî bû. Li cihê ku ew lê bûya li wir bawerî hebû, cidiyeta rêxistinî hebû û duristbûn hebû. Mirov dikare bêje bi her hevalekê re ev giyan dabû avakirin.

Heman weke xeta kesk a beyrûdê bû…

Tevî ku li Elezîzê her tim meş û mîtîng çêdibûn, ev çalakî derbasî qada Fewzî Çakmak û derdorên wê nebûn. Ciwanên Şoreşger (Dev-Genç) li xwedî her cenazeyên her mirovê ku faşîstan dikuşt derdiketin. Ti eleqeya vê bi berpirsyariya şoreşgerî, yan jî xwedîderketinek rasteqînî ve nebû. Ango îfadeyek wê ya tolhildanê tinebû. Armanca sereke zêdetirîn girseya xwe bi van xwepêşandanan li ser piyan girtin û mantiqê sereke kar bi propagande-ajîteyê ve îdarekirin bû. Ango cenaze weke sermiyanekê bikaranîne! Ji ber cuda ti sermiyanek wan tine bû. Ger bi rêbazek rast xwedî li nirxên şoreşgerî û kevneşopiya şoreîgerî derkevin, Ciwanên Şoreşger bi giyana Mahîran were bilindkirin, wê li hember wan rêz bê girtin. Lê, ev tine ye! Berovajî ji wê dûrbûnek heye. Di heman demê de berovajî giyana wî çi hebe, ew derdiket holê.

Pirsgirêka girseyan a herî bingehîn, li şûna ku hedefên têkoşînê yên bingehîn çinin, dijmin kî ye, mirov çawa dikare serde biçe, kîjan amûr tên bikaranîn, ev hemû bi girseyê dana fêmkirin, ew di vê çarçoveyê de polîtîk kirin, derbasî tevgerê kirin, pir zêde hedefa xwe şaş dikirin. Wateya xwedîderketina şehîdan û bersiva vê, ne tenê pêşbirka diruşmayên weke "dijî olîgarşî" gotin pêşxistine.

Êdî di her mîtîngê de ti wateya Gawur Elî ya axaftina wî li ser dîrekan, li ser cihên bilind nemabû. Êdî naveroka axaftinên wî asayî bibûn û balkêş nedihat. Li van qadan belavbûna bîrdoziya me ya Rizgariya Netewî, bandor li ser her derdorê dikir, lewma tu bixwazî-nexwazî nîqaşan rojeva siyasî jî diguhert. Ciwanên Şoreşger di nava xwe de tengavî dijiyan. Ji

ber nedikariya tehlîlên afirîner ava bikin, ne dikariyan xwe ji qutbûnan rizgar bikin. Vê salê jî qutbûnên di nava çepên Tirkan û kevneşopiya parçebûn û bêbandorbûnê rû didan. Bêşbaziya kariyerê, nêrîna çîna teng pir diyarker bû. Bi gelemperî dema çalakgeriya şoreşgerî ya rast nedihat bidestxistin; di pêşengî û rêbertiyê de zelalî nebûya, rêxistin û pêşengên xwecihî derdiketin pêş. Ango ki her herêmê rêbaza rêxistinên li gorî kesan serwer dibû! Gawur Elî û Celalttîn tev qadroyên Elezîzê bûn. Her wiha Ciwanên Şoreşger bi van dihat bîranîn. Heta li Eleîzê dema Gawur Elî dihat gotin, dihat maneya Ciwanên Şoreşger.

Wê rojê faşîstan ji gel yeke din kuştibûn. Tam dema ji sûkê derdikeve ber bi Fewzî Çakmak ve diçe dikujin. Jixwe hemû kuştin jî di vê xetê de çêdibûn. Ew xet "heman weke xeta kesk a Beyrûdê bû." Bi taybet navenda bajêr û taxên weke kolanên Çandê di bin venêrîna faşîstan de bû. Ji ber komên çepgir xwe di hinek kolanan de hepis kiribûn, ev rewş jî dabeşbûna taxan rewa dikir.

Yê hatibû kuştin Kurd bû. Karker bû. Wê merasîma cenaze were kirin. Em jî tevlê dibin. Me bi girseyek qelebalix bir goristana gundeke jorî xeta Fewzî Çakmak bû. Me diruşmaya esasî weke "Şehîd Namirin" diqêriya. Weke din jî diruşmaya "Bimirin Faşîst!" Hevbeş tê qêrîn. Ji bilî van jî her gurup diruşmayên xwe diqêrin. Em jî diruşmaya "Bimire Dagirkerî!" Diqêrin. Piştî ku cenaze hat binaxkirin em bi komî hatin kolanê û belav bûn. Lê gurubên din meşa xwe heta kolana Kanalalti domandin. Bê ku wext ser ve biçe dengê çekan hat. Me wer zanî ku polîsan êrîş kiriye. Hinek ji me ji bona rewşa heyî hîn bibe ber bi cihê pevçûnê ve baz da.

Carekê de gotin Elî Riza Kaçar hatiye kuştin. Elî Riza Kaçarê ku ji pênçparçeyan ango ‘stêrka-sor’ hatiye kuştin! Tiştek ecêb e. Dihat gotin ku piştî Alaettîn Kapa Elî Riza Kaçar jî ji Beşparça’yan cihe bûye. Ev avabûna ku sîxûr bû darbe dixwar û tola Heqî Qarer hatibû girtin. Ev çalakî bû sedem ku Bêşparcecî belav bibin. Ji ber rewşa vê avabûnê hatibû eşkerekirin. Me li Elezîzê derbarê vê de daxwiyanî belav kiribûn. Wan jî piştî kuştina Alaattîn Kapan, bi îmzeya Bêşparceciyan li çend qehwexaneyan dizîve daxwiyanî belav kiribûn. Me jî di encama lêkolîna bê ka kî ev daxwiyanî belav kirine û li qadê kî xebatan dimeşînê de, hinek agahî bidestxistibû. Di vir de Elî Riza Kaçar dabû diyarkirin ku bi ti şêweyî ne ji Bêşparceciya ne, ti pêwendiya wî bi wan re nemaye û wê xwedî li vê dernekevê. Diyar bû hinek nakokî hebûn. Gelo ji nava xwe kuştibûn? Şîroveyên bi vî rengî jî dihatin kirin. Xweîna me jî ya destpêkê bi vî rengî bû. Lê dema me ji yên ku cihên bûyerê ber bi jor ve direviyan pirsî, gotin;

“Ne polîsan, Gawur Elî Elî Riza Kaçar kuşt” û heta yên ev bûyer dîtin jî hebûn. Ev gûyer tengezariyek ava kir. Weke pevçûn û kuştina di navbera guruban de hat fêmkirin. Girse jî li hember van bûyeran bêzar dibû û ev dibû sedem ku ji meşên vir û şûn de re tevlîbûn kêm çêbin.

Dema ez destpêkê hatim Elezîzê ji gurubên din xebatên jinan a diyarker tine bû. Yek du keçên hinek kar dikirin hebûn. Lê dema ez vê carê hatim di nava wan de jî guhertin çêbibûn. Hinek jinên qadro yên ji derve de hatîn hebûn. Keç jî diçûn komaleyan. Heman weke di kolanan de hejmara xwe zêde bikin pêşbaziyek hebû. Guhertina seresere ya li Dêrsimê derbasî vir jî bibû. Mirov çavlêkirinek cil û bergên çors pir zû

didît. Bi gelemperî jî ji şireşgertiyê bandor dibûn. Baldarî û dilxwazî hebû. Lewma guruban dixwaziya berî yê din zûtir ji vê rewşê sûd bigire. Em carinan li heman malan liqay hev dihatin. Keçên ku em bi wan re eleqeder dibûn û hewl dida bikin welatparêzên şoreşger, wan jî dest tavêt û peywendî pêş dixistin û hewl didan bandor bikin. Carina jî berovajî dibû. Carina jî li dijî vê derdora nêzî me helwest raber dikirin,qet ne diçûn cem wan û cuda didîtin.

Çek paşde pekî!

Derdora me berfireh dibû. Em diçûn her kolanê. Me hewl dida kêmasiyên ku komên din jiyîne, em nejîn, em teng ne diman û me giranî dida taxên din jî. Baldarî û tevlîbûna jinan zêde dibû. Me li her taxên cih digirt komên jinan ên perwerdeyê ava dikir. Li Fewzî Çakmak, Yildiz Baxlar, Kolana Îstasyonê, Kirkdut û heta 1800 Evleran, hema her cihî kom hebûn. Di heman demê de me bi dibistanan re peywendî pêş xistibû. Wan rojan yên di Dibistana Mamosteyan de cih digirtin hemû veguhezîn Mêrdînê. Bi hêceta ku dê vê derê veguherînin dibistana amadeyî ya Mamosteyan, gelek xwendekarên ku ji herêmên cuda hatin belavkirin. Lê beriya ku werin belavkirin me bi gelek xwendekarên keç re peywendî pêş xistibû û me bîrdoziya xwe ragihandibû hemûyan. Her çendî hîna pir kêm bû, di navbera me de girêdanek pêş ketibû. Bi taybet peywendiyên me yên bi van keçên ku ji nava Elezîz û gundên wê ne re pir girîng bû. Me ji bona Gûler Çelîk, dîsa Bîrvana ji Mîşelî û hinek keçan digot; “ev biçin ku derê dê her tim bi hevalan re di pêwendiyê de bin.” Di pêvajoyên pey wê re çûn û hatin Elezîzê re me fêmkir ku peywendiyên wan bi hevalên li Mêrdînê re hene.

Dema gotin dihat ser dibistana Mamosteyan a Elezîzê, yên li wê derê xwedîn, an jî ewder nas dikir yekser behsa Çetîn Gûngor (Semîr) dikirin. Nizanim ji çibû, lê yekser ew dihat bîra wan. Ew jî li Elezîzê diman. Pêwendiyê me bi wan re hebû. Em herî zêde bi xwîşka wî re eleqeder dibûn. Lê malbatê diçewsanda. Ji ber vê wê jî xwe zêde tevlî nedikir û dûr disekinî. Herî zêde jî keça xalê min Maqbûle behsa Çetîn Gûngor dikir. Dibistana Hunerê ya Keçan û Dibistana Mamosteyan li heman qadê, tenê bi yek cadeyê ji hev cuda dibûn.

Xwendekarên dibistana Yatili, ji ber bandora pergala qedexekirî ya li dibistanê, bala wan her tim li ser derve û cinsê beramber bû. Çewsandin gelek nêzîkbûnên çeloxwarî û ji hedê xwe zêdetir pêş dixist. Ji ber xwendekarê xort ê dibistana mamosteyan tenê Semîr bû, nêzîkbûnên li hember wî jî heta vê astê zêde dibûn. Semîr dibû xortek wisa ku keçan nedikariya di nava xwe de parve bikin. Dema min di nava komê de cara ew nas kir, ev mijar hat bîra min û ez hizirîm ku; "gelo dibe ku xwedî cinsek xirab be?" Ji ber carina Maqbûle û keçên din hem bi gotinên çeloxwarî, hem bi henek û hem bi tiştên ku dilê mirov jê bimîne behs dikir, tiştek wisa hetibû bîra min. Lê ew pir rehet bû. Dikare were gotin ê li cem keçan herî rehet û serkêş jî ew bû. Ew jî xisletek ji dibistanê girtibû û xwezayî bû.

Weke ku Semîr, ne ji malbata xwe bû. Pêvajoya dibistanê û pey wê re şoreşgertiya wî, girêdana wî ya bi malbatê re qut kiribû. Di vê pêvajoyê de pir digeriya. Zêdetir li qada Dêrsimê dima. Ji ber asta wî ya teorî baş bû gelek caran ew weke axaftvan diçû semîner û civînan. Bi vê xisletê ve dihat nasîn. Aliyê Semîr ê rêxistinkirin, avakirina rêxistin û hêza heyî

pêkanînê de xurt bû. Ji bilî vê jî aliyê xwe yê propaganda û ajîtê jî pêş xistibû. Ev xislet bi wî re nêzîkbûnek ku bikaribe xwe li gorî hewaya heyî bide diyarkirin jî ava kiribû.

Em her tim girîngiyê din peywendiyên xwe yê bi Dibistana Hunerê ya Keçan. Ji ber keçên ji her aliyê Kurdistanê tên li wir kom dibin. Weke din faşîst jî hene û xebat dimeşînin. Di bin navê ol de û bi piştewaniya vekirî û dizîve ya rêveberiya dibistanê ve ev xebat zêde berfireh kirine. Lewma li dibistanê avakirina zemînê xebatên şoreşgerî û ev xebat bi mirovên li wir re dana meşandin neçar bû. Me çend dilsoz keçên ku 'rojane' li Kirkdutlar û Yildiz Baxlarê dixwînin xwendekar dît. Em rewşa dibistanê ji wan hîn bûn û bi rêka wan ketin nava dibistanê. Her wiha li dibistanên weke Koleja Tenduristî, Dibistana Amadeyî ya Bazirganî û Zanîngeha Firatê qadroyên faşîst hem di hundur de hem ji dervî dibistanan, hewl didin ku van qadan bixin bin bandora xwe. Lewma divê em beriya her tiştî ji bona xebatên xwe lez dest bavêjin dibistanan. Ji ber ger em bizanibin baş bikar bînin cihên ku herî zêde em encam bigirin evderin.

Me li mala Sarikaya yên li kolana Fewzî Çakmak diman ji Dibistana Hunerê ya Keçan Cahîde Şener û ji qadên Çûngûş a ser bi Sîwerekê ve çend keçên din liqay hev hatin. Ji dema ez û Cemîl diçin wir ve, em wan dinasin. Ji ber Cahîde ji Sîwerekê, yên din jî ji Çermik û Çûngûşê bûn zêdetir bala me dikişand. Cahîde eslê xwe ji Qerekeçiyan, ango ji baskek Tirkan bû. Bavê wê ji vî baskê Tirkan, dayîka wê jî eslê xwe ji Ermeniyan bû. Cahîde ji herêmek Sîwerekê ya ku nakokiyên eşîran herî zêde lê dihat jiyîn bû. Lewma bal dikişand û girîngiya wê hebû. Jinek ku xwedî binesaziyek eşîretek feodal e, kirina şoreşger û birêxistinkirin, ji bona me gava pêşketinek zêde manîdar bû.

Ya ji Çûngûş'ê, xwe weke keça muftî da nasîn. Ji ber cil ûbergên wê diyar bû ku keça muftî ye, yan jî ji nêz ve eleqeder dibe. Lê me girîng î ne dida vê mijarê. Nîqaşên me yên bi wan re derbarê her tiştî de bû. Cahîde behsa Sîwerek, DDKD'yên li wê derê û rewşa dibistana xwe dikir. Ji ber baldariya wê ya li hember Kurdewarî, ew anîbû heta vê malê. Ti girêdana wê ya rêxistinî bi yên DDKD'ê re tineye. Meyla wê tenê ji şoreşgeriyê re û aliyê Kurdewarî re heye. Hewldana wê ya fêmkirina cewaziya di navbera komên Kurd de heye. Tenê em bihîstine. Bi taybet ji ber DDKD'ê em xirab dane nasîn û tevgera me hedef girtine, zêdetir bala wê kişandiye û bûye sedem ku b ime re pêwendiyê pêş bixe. Ew jî zêde di-axive û jîr dixwiyê. Li gorî wê gotî yên li dibistanê rêxistinbûna faşîstan dimeşînin ol bikar tînin û bi sedan keçên Kurdistanî kirine bin bandora xwe. Dema wê behs dikir ez û Cemîl di navberê de di-axivîn. Me pirsên cur be cur dikir. Ji vê pir kêfxweş dibû û figot; "min tişta lê digeriyam dît." Em jî kêfxweş bûn. Ji ber dibistan zêde girîng bûn. Potansiyelek ji pêşketinê re vekirî hebû. Ger xebatek bihata meşandin, me dikariya xwe bigihînin hemû qadên Kurdistanê. Em dikarin xwe bigihînin heta Maden, Keban, Çûngûş, Çermik, Sîwerek, Hazro, Genç û Hanî'yê.

Min got; "temam! Ger xebatên jinê pêş bikeve, dê xebat hêsantir bibe. Em dikarin bi rêka van keçan biçin heta wan deran." Me û Cahîde lehev kir. Dê her dawiya hefteyê were. Min got; "hûnê destpêkê bi çend kesên pê bawerî heye û ji pêşketinê re vekirîne re werin. Emê bikarin bi rêya we dibistanê birêxistin bikin." Got; "dibê" û ji me veqetiya.

Li Dibistan Amadeyî ya Atatûrk'ê Nadîre Turgut, Saniye, Leyla û hinek keçên din hene. Me guncav dît ku em di nava wan de Nadîre bikin berpirsyar xebatên li wir. Ne fermî jî be, me weke ceribandinekê ew kir berpirsyar. Li Koleja Tenduristî jî keçên ku rojê dixwînin hene. Em bi navbeynkariya Nesrîn û xwîşkên wê yên li Yildiz Baxlaran dirûnin bi wan re eleqeder dibin. Carê jî di bin navê serdanê de diçim. Keçên ji Erzîngan û Dêrsimê hene. Ez malbata hinekan ên ji Dêrsimê dinasim. Ev jî dibe sedem ku pir hêsan peywendî pêş bixim. Rêveberiya dibistanê li vir jî xelekek paşverû saz kiriye. Mamosteyên olperest û endamên MHP'ê yên esasî li vê dibistanê ne. Tevî ku Elewî ne, rojî û nimêjê bi zorî xwendekaran didin kirin. Yên ku bertek raber dikin jî, bi gefên dê refê de bihêlin wan ditirsînin. Dîsa nêzîkbûna mamosteyên zilam ji keçan re pir ecêbe. Keçên ku di-ecibînin dixin û nêzîkbûnên ku ji wan sûd werbigirin pir zêde ye. Mijara notên dersê dayînê de jî, weke çekekê li dijî wan tê bikaranîn.

Weke din jî meylên wekî xwendekarên dibistanê li dijî hev bikar anîn, bê bawerî, li cem rêveberiya dibistanê giliyê hev kirinê pêş dixin. Ev jî bi taybet yên ji çîna jêrin daye tirsandin. Ev zêdetir bi yên nû hatine re diyar dibe. Di çînên jor de zêdetir fenekî û hinekê jî li gorî pêşketina pergalê kesayet hene. Yên peywendiyên wan bi derve û derdora malbatê re hene, dikarin pêşketinan bişopînin û bi şêwaên cur be cur bandor dibin. Lê bi gelemperî yên li Dibistana Yatili ne girtî ne. Em di serdanan de derbarê gelek mijaran de di-axivin û nîqaş dikin. Qet nebe em hewl didin qadên wan ên balkêş biguherin û bikaribin derbarê hinek tiştên din de bihizirin ava bikin. Ev jî dibe destpêk.

Cahîde hefteya dawî bi Guler û Hewaya ji Çermîkê re hat. Min ew birin mala me ya qeta biniya avahiyê. Ji ber bêhvedana cejnê ye, karine ku destûra sê rojan ji dibistanê bigirin. Jiyan, axaftin, nîqaş û her tiştên ku dibînin bandor li wan dike. ‘şoreşgerê’ yekem ku her sêyan jî dîtine û kesayetên ku nas kirine, li qadên lê ne kesên ji Komaleya Çanda Şoşreşgerên Rojhilat (DDKD’ê) nas kirine. Her wiha ji komên çepên Kurd ên dinin. Her tim didin ber hev. Ne gengaz e ku peywendî û şêwaza jiyana me bandor li wan neke. Ew her tiştî ‘bê qusur’ dibînin. Ji tiştên ku tê axaftin û vegotin zêdetir, ji tiştên dihat dîtin bandor dibûn. Em bi wan re li ser şêweya xebatê û dê peywendî pey vê re çawa bin axivîn. 1’ê Gulanê nêz dibû, lewma me got divê li dibistanê zemînê pîrozbahiyê amade bikin.

Li gel rêxistinkirina bîrîmên biçûk, me diyar kir ku divê bi berfirehî her kesê ku dikarin bandor bikin ser rawestin û avakirina derdorek dilsoz ên berfireh esas bigirin. Em dixwazin bi kesên ku pir hişk nebûne re peywendî pêş bixin, welatparêzî bidin fêmkirin, li dijî yên din jî helwestên polîtîk û bikaranîna rêbazê tundiya şoreşgerî ve li dibistanê ref werin zelalkirin. Ji bo di kîjan aliyan de jî hişyar tev bigerin me hinek hişyarî kirin.

Cahîde bi baldarî guhdar dike, erê dike û ew jî di mijara rêbazan de nêrînê xwe dide û pêşniyaran dike. Yeke jîr e. Zû têdigihije. Aliyê wê yê rêxistinkirî baş e. Tevî ku dibistana yatili ye, di demek wisa kin de peywendiyên xwe pêşxistin, rêxistinkirina hatin û çûnên hene, baweriya me ya beramber pêşketina wê xurt dike. Bi notan û bi agahiyan peywendiyên xwe didomîne bi sazûmanî derbarê rewşa dibistanê de agahî dişand.

Ji bilî vê, ji ber ji asta jiyana me ya malê bandor dibe, ji dibistanê betanî, nevresîm, xwarin û alavan dişand. Dibe ku ev tiştên gelekî biçûk bûn, lê hizirîn û pêkanîn gelekî girîng bû. Hê ji niha ve bawerî dida ku emê bikaribin li dibistanê xebatek baş ava bikin. Ji ber vê xisletê derdora xwe jî bandor dikir. Xisletên wê yên hem bikaribe xwendekar, hem mamosteyan bandor bike heye. Kêrhatî ye. Ji ber li dibistan Hunera Keçan karên weke jêhatiyên destan, dirûn, neqiş kirin û mijarên wekî vê de kêrhatîbûn diyarkere. Ev dibin sedem ku bersiva erênî bigire. Mamoste pesnê wê didin û di heman demê de dibe xwedî derfetek ku hînî xwendekaran bike. Yeke ku hinek tiştan dide hînkirin, dikare di jiyana civakî û peywendiyên siyasî de jî birêxistin bike.

Xebatên dibistanê pêş dikevin. Demjimêrên etût û wextên xebata takekesî ji bona xebatên perwerde, nîqaş û eleqederbûnê bi kar tînin. Pîrozbahiyên 1'ê Gulanê refên her kesî hinek din ji hev cuda kir. Keçên ku Faşîstan ew bandor kiribûn jî ji wan veqetiyan. Di demek kin de derdorek mezin bi bandora şoreşgeriyê ve rû bi rû ma. Di vê navberê de Cahîde ber çav ket. Demekê di çavên mamosteyên xwe de jî bû. Lê cihetiya çepkir-rastgir, komên cur be cur, hejînên ku li dibistanê rû didin, rêveberî û mamosteyên dibistanê jî aciz dikir. Wê hişyar dikin. Di vê mijarê de derket holê ku divê hê zêdetir baldar nêz bibe.

Carê ez jî diçûm dibistanê. Çûna min jî wan pêk tanî. Em weke serdanê diçûn. Ji bona bal nekişîne, em bi şêwazê çend koman rûdiniştin. Bi her komê re derbarê hinek mijaran de di-axivîm û min bersiva pirsên wan dida. Lê me zêde nekarî em vê rewşê berdewam bikin. Ji ber bal dikişîne. Ancex min karî

çend caran biçim. Em herî zêde jî nêzîkbûna ku bikaribin di nava xwe de kar bikin, qadroyên cewherî derbixin holê û şêwazek kar ava bikin esas digirin. Ji ber ji devrede çûyîn baş nabe, em zû eşkere dibin.

Em bi rêya yên rojaneyî di her mijarê de agahiyan digirin, wan jî agahdar dikin û perspektîfan didin. Em di demek kin de li dibistanê bi bandor bûn. Otorîteya me hem ji aliyê hejmar û hem ji aliyê têrkariya siyasî ve heye. Dilsoz û aligirên me di nava hinek baskên kar ên dibistanê de hatin bicihkirin. Berpirsên xweringeh, pirtûkxane û etûtan ji bona feyde ne. Ji ber di demjimêrên etûtan de derfetên nîqaşên bi komî û xwendina daxwiyaniyan çêdibe. Di heman demê de em ji cihên weke xwaringehê demek dirêj sûd werdigirin. Êdî ji xwê heta sabûnê her tişt ji wir dihat. Di pêvajoyek herî zêde pêdiviyên me hene de ev bê pere pêkanîn ji bona me pir baş bû. Bi vî rengî jî barê madî yên malên me ji xwe re girtine jî sivik dibûn. Her weke çavkaniyên me yên debarê bûn.

Di vê navberê de ya ku di perwerdeya Mêrdînê de dixwend û dibistana xwe qedantî Meral Kirdir jî hat. Hevalê Cemîl rojekê bi Meral re hat û got; “ ha, min ji te re hevalek nû anî.” Me weke du hevalên hevûdû ji nêz ve demek dirêje dinasin hev hemêz kir. Dema Cemîl devji me berda û derket, em bi halê xwe keniyan. Me her duyan jî dixwest em fêm bikin, gelo ev nêzîkbûna zêde samîmî ji kûr derketibû. Ya rastî me ji dûrve hev dinasiya. Min ew ji keçên Mîşelî yên i dibistanê dixwendin bihîstibû. Wê demê Elîfa Tirk jî hatibû bêhnvedanê. Gotibûn; “hevalek me Tirk jî heye, navê wê Meral e.” Lê, ji ber nêzîkbûnan şopa ku Elîf bi min re hiştî ne erênî bû. Piştî ku hinekê li Sarikaya man, derbasî Mîşelî bûn. Piştî ku ew ji

Mîşelî vegeriyan jî têkildarî wan hinek tişt hatibûn gotin. Dema diçin Gola Kebanê bi cilên binî dikevin avê, gundî xirab dibînin.

Her çendî gundê Mîşelî girêdayî bajêr û asta xwe ya civakî ne paşde be, xwedî hinek pîvanan bû. Nêzîkbûna ji şoreşgeran re girîng bû. Ji ber hemû nêzîkbûnên şoreşgeran û hemû fêrbûnên wan ên jiyanê dihatin şopandin. Ne jiyanek asayî, ji rêzê ku her kesî dijiya. Gel jî ev dizaniya. Dema hatin navenda Elezîzê û derbasî Mêrdînê bûn, ew cara duyem bû didît. Min wê demê jî çavderiyên xwe gotibû. Min ev ji Meral re jî vegotin:

“ mirovek ne kamil e û nesekiniye. Zêde di-axive, ziman dirêj, nêzîkbûnên wî çeloxwarî û zêde bê pîvan bû.” Meral jî tevlî nêrînên min bû. Meral yeke hûrik û zindî bû. Heta hingê di xebatên bi hevalên xort re pirsgirêk tinebû.

Ango pirsgirêkek di asta ku xebatan asteng bike de ne hatibû jiyîn. Lê belê, bi hevalên jin re kar kirin û ji tenêbûnê derketin pir xweş bû û ez jî bi vê kêfxweş bûm. Meral jî digot, di pêvajoya xwe ya li Mêrdînê de zêde tengav û aciz bûye. Her wiha digot; “min ji xeynî rûniştin û xwendinê tiştek din nedikir.” Li Elzîzê kar pir bû. Qadek berfireh bû. Di her astê de derfetên meşandina kar hebû. Di heman demê de Sakîne Kirmizitaş jî hebû. Ji perwerdeya Mêrdînê vegeriyabû. Beriya hingê jî pêwendiya me bi wê re hebû. Hevalek xwedî hewldan û dexwesta kar bike. Lê ew zêde nema. Ji ber pêdivî hebû piştî demekê derbasî Mêrdînê bû.

Keçên ku berî vê ji Perwerdeya Mêrdînê vegeriyane û di nava pêwendiyê de ne jî beşdarî xebatên perwerdeyê bûn. Lewra kom û şêweya dayîna perwerdeyê jî xurt dibû. Nîqaşên dibistanan û çoşa wan gelekî cuda ye. Hema bêje hemû enstutiyên perwerdeyan bibûn dibistanên welatparêziyê. Hemû qadro ji van dibistanan derdiketin. An jî ew ji bona welatparêziya şoreşgerî derbasî derdorên din jî bikin dibûn pir. Di vê manê de dewletê ehmeqiyek mezin kiribû. Dixwesta mamosteyên ku Kemalîzmê bide nasîn pêş bixe! Qaşo hedef dikir ku bi enstutiyên perwerdeya hatî lezkirin ve ciwanan di demek kin de bi dewletê e bidin girêdan. Dê bi vî şêwazî hewl bida pêşketina têkoşîna şoreşgerî asteng bikira. Lê mixabin çek paşve pekî.

Serxwebûna yekemîn a bingehîn, ango manîfestoya me derket. Me destpêkê di nava xwe de girt dest. Her kes navê wê nizane. Em dipêçin, didin wan û dibêjin ‘bila neyê vekirin’ kes venake. Ji quralên exlaqê bingehîn yek jê jî ev bû. Bes bû ku bê gotin ‘venekin, hînî navê pirtûkê nebin.’ Lewma gotinên zêde û daxwiyaniyên dûv dirêj ne hewce bûn. Kesê ku digirt jî di berpirsyariya vê erka xwe didît, venedikir û hîn nedibû. Ez gelek hevalên hêja yên ku bi mehan ew pirtûk li cem wan mane, lê navê wan nizanin nas dikim. Bi vî rengî Serxwebûna bingehîn bû çavkaniya xebatên perwerdeya me.

Ji bona her hevalî/ê bi lêkolînek berfireh û dîrokî ve hînbûn û fêmkirina xeta bîrdozî û polîtîk û xisletên şoreşê erka herî bingehîn bû. Hînbûn, fêmkirin û têgihiştina kûr a şoreşgeriya Kurdistanê neçar dikir. Welatparêziya şoreşgerî jî vegera li cewher, kesayeta nû û kesayetek li ser bingehê zanebûnê xwe

ava dikir bû. Gelek têgehên pir kesan li ser lîstok kirine, li cem me naveroka wan dihat dagirtin û watedarkirin. Veguhertina zelal a bi kesayetan re, ancex wisa pêk dihat.

Dê kêliyek wisa were…

Li Serokê Şaradariya Çewlikê Hîkmet Tkîn xistibûn, lê ne miribû. Piştî ku ev agahî belav bû, dihat gotin ku birîndarî bi helîkopterê birine nexweşxaneya dewletê ya Elezîzê, lewma ger li vê derê derfetê êrîşê hebê, divê cardin êrîş bikin. Ev hemû di kêliyekê de pêk tên. Her der têkilhev dibe. Li derdora Fewzî Çakmak û Nexweşxaneyê liv û tevgerek çêdibe. Qelebalix zêdetir dibe. Êdî dolmuşên polîsan li kolanan digerin û dengê zengilê wan belav dibû. Êdî bazdan û dengê çekan têkilhev bibû. Dema helîkoptera Hîkmet Tekîn lê siwar kirîn dadikeve qada rast a jorî nexweşxaneyê, heval êrîş dikin. Agahiya çalakî kelecan û dilşadî ava kiribû. Berdewamiya çalakiya li Çewlikê, tişta ku li wir nehatibû serxistin, li Elezîzê serxistin, encamkirin û gelekî girîng bû. Ev di heman demê de îfadeya biryardarî û xisleta şoreşgerî ya komê bû: Ango di çalakiyekê de serkeftina teqez bû!

Her ku qelebalix belav dibû, di nava kolanan de cardin diciviyan. Ez çûm li malê nêrî. Pirtûk û hinek alav hebûn. Min destê xwe neda wan. Jixwe derfeta komkirin û veşartinê jî tinebû. Cardin min derî mifte kir û derketim. Her kesî bi baldarî li geliyê bi navê Geliyê Kumê ya ji goristanê wirdetir dinêriya. Êdî helîkopter jî digeriyan. Cara yekê bû ku dijmin ev qasî êrîş dikir. Gelo ji karê hevalan li Geliyê Kumê hebû? Gelo dibe ku hinek komên din hebon? Ez di nava van fikaran de mabûm. Lê heval jî li holê nebûn. Wan rojan heval Duran jî hatibû. Ez çûm cem Sarikaya wan. Li wir jî kes tinebû.

Xaltîka Zencefîl got; "Cemîl rêya xwe bi me xist û çû. Hevalan çalakî lidarxistine. Hinekan di navbera kolanan de şopa xwe winda kirine. Komek jî ber bi Geliyê Kumê ve baz dane. Polîs jî ketine pey wan. Ewder qet nebaş e. Dê ew kuçik wan zaroyan bigirin."

Demek rast bû! Ji bona ez bikaribim bûyerê ji nêz ve bişopînim ber bi kolana Esentepe ve çûm. Li cem min hevalek din jî heye. Polîsan her der girtibû.

Gelî direj bû. Ji bilî xîz û çeqil tiştek din weke kevir û tehtên mezin tine bû. Aliyê ku berê wê diket Esentepe yar şeklindedir. Derketin ji wê derê zehmet bû. Aliyê din jî eraziyek rast û zevî bû. Tenê li jorê rêya derketinê hebû. Wir jî ne guncav bû. Ewder jî weke gundê faşîstan dihat zanîn. Helîkopteran bê navber direşand. Polîsên serî heta dawiya Esentepe bi cih bûne jî bê navber direşandin. Ti tevgereke hevalan tinebû. Destpêkê li hinek kevirên erdm reşandine û min jî wer zanî ku ew heval in û mat mam. Mesafe dûr bû. Ne gengaz bû ku mirov tam zelal bike. Ez li dûrbûnê geriyam. Paşê hizirîm ku çi karê dûrbûnê livan malên xizan heye?

Keriyê gund di nava zeviyê serê dawî yê gelî de bû. Helîkopter û reşandina çekan kerî belav kiribû. Tarûmar bûne. Komek polîs li cihek stratejîk bi telsizê kordîna şer dikir. Me zarok şandin cihê ku ew lê û got; "binêrin tiştek heye an na û agahî bînin." Ev gengeşe û dengê fîşekan demek direj ajot. Ji ber tiştek ne diyar bû û agahî tinebûn, em pir bêhedar bûn. Ber bi êvarî ve hewa xirab bû. Ewr bi ser hev de hatin, êdî baranê destpê kir. Baş bû rewşa hewayê bandor li ser tevgera dijmin dikir. Lê bandorek çawa li ser hevalan dikir, em ji vê bê xeber bûn! Em bi mereq daketin jêrê. Me cardin ji Sarakaya wan

pirsî. Gotin ku ji qenalên televîzyonê dengê telsizan guhdar kirine, dijmin heta demekê komek şopandiye. Lê ji ber keriyên pez û paşê hewa tarî bûye şopên wan winda kirine. Em bi vê kêfxweş bûn. Ev jî dihat wateya ku kes şehîd neketiye. Lê di mijara ketina dest de ti agahî tinebû. Me hemûyan hevalê Duran hev pirsiya.

Em ji hev dipirsi gelo di kêliya çalakî û wê bazdanê de li kuderê bû û herî dawî li kuderê hatiye dîtin. Di vê mijarê de hat gotin ku; " dema li nexweşxaneyê çalakî hat lidarxistin ew li kolanê bûye." Weke din jî dema çalakiya li Geliyê Kumê ew jî hatiye dîtin. Bes, bi vê mat bûn. Me got; " ev çawa dibe?" Me di wê kêliyê de hizirî ku; "Fewzî Çakmak ne guncav e, dibe kul i vê derê jî bigerin." Hevalê Cemîl çûbû cihên aramî. Lê ti mantiqê bi tenê ya windabûna hevalê Duran tinebû. Qad jî zêde nas nedikir. Bi guman û acizbûnê ve gelek şîrove hatin kirin. Me heta derengiya şevê hewl da ku derbarê rewşa heyî de agahiyekê bigirin. Tam di wê kêliya bazdana derdor de, hevalê Duran ji nişkê ve hat.

Yek ku çar demjimêran ji destpêkê heta dawî pevçûna Geliyê Kum'ê şopandî û jiyabû hebû. Dema polîs dikevin pey wan heval jî bi armanca ku 'hîn bi ewleye' ber bi wî gelî ve diçin. Dema Duran vê rewşê dibîne ew jî ber bi wir ve diçe. Ya rastî cihek qet ne guncav e. Navê wê li ser e, ku Geliyê Kum'ê ye. Duran nagihe koma destpêkê jî. Dema her tişt tevlîhev dibe, ew jî xwe dixe nava tûmsekek biçûk û vedişêre. Cilek gewr û boz li ber e. Cihê ku xwe lê veşartiye hinekê li quntar e. Tesadûf polîs jî li ser wê tûmseka ku xwe lê veşartiye kordînê dikin. Ji ber bala wan hemû li ser hevalên dine, ferq nakin ku hema yek di binê wan re xwe veşartiye. Duran jî hemû axaftin

û pêşketinên ku rû didin kêlî bi kêlî dişopîne. Bi qasî hênaseyên wan bibihîse nêzî dijmin e. Ew jî vê rewşê di nava kelecanekê de vedibêje.

"Heta tarî bikeve erdê dê çar demjimêr derbas bibin. Min ji xwe pirsî gelo çar demjimêran bidim ber çavan, an jî çar salan, her dawî min di çar demjimêran de biryar da. Min xwe pir êşand, carina ne dikariya hênase jî bigirim. Lê piştî ku polîs ji wê derê çûn, min carekê de ew çar demjimêr ji bîr kir."

Hevalan jî hem bi kêfxweşî û hem mat mayî guhdar dikir.

Bela xwe li min didan, digotin; "ger tu bihata girtin dê cezayek giran bidan te. Bes, wextek çar sal jî ne hindike ha!" Kom giha Baskîl'ê. Baş bû ku baran dibariya, ji ber dijmin ne dikariya me bişopîne. Weke din jî bi saetan di heriyê de meş û bazdan pir zehmetî dida hevalan. Dema heval digihin Baskîl'ê, di lingê kesî de pêlav namîne. Herî zêde jî Hisên Taze bandot dibe. Binê lingên wî diteqin û di nava xwînê de dimîne. Li Baskîl'ê mamosteya gund Medîne Vural hevalan dibe mala xwe û tedawiya pêwîst dike. Beriya niha jî peywendiyên me bi Baskîl'ê re hebû. Malbar, xizim û derdora hinek hevalan welatparêz bû. Alîkarî dikin. Di malên xwe de hevalan diparêzin. Heman şevê bi rêya ajokerên gund re agahî şandin ji me re. Agahî dabûn ku çend kes in û tenê Saîm Dursun ji komê qut bûye. Demek Saîm Dursun hatibû girtin. Nagihe komê. Hinekê jî yeke bê xîret, ne sivik bû. Weke din jî di bêvila wî de goşt hebû. Ev jî bandor li meşa wî dikir.

Got; "qelebalix ber bi wir ve baz dida. Min jî li wan nêrî û baz da." Ew jî piştî ku demekê di bin çavan de hartibû hiştin, paşê hat girtin. Paşê jî bi kefalet hat berdan. Jixwe pê re ne belge, ne jî çek tinebû.

Yên Baskîlê jî bûn, piştî demekê hatin. Hisên demekê li malê bi derfetên me yên heyî ve hat tedawîkirin. Cara yekem bû ev qas ji nêz ve bi tedawiya hevalekê ve eleqeder dibûm û birîna wî girê dida. Dibe ku ne birîna fîşekê bû, lê bi qasî wê watedar bû. Hestiyar im. Dema min derman dikir, ez ji wî zêdetir bi êşa wî dihesiyam. Di nava têkoşînê de birîndarî, şahadet û girtina hevalan di gotinê de pir hesan bû. Di heman demê de ji neçarî çêdibû. Lê mixabin ez tehemûl nakim di pratîkê de bêvla hevalekê jî xwîn bibe. Ji min re zor e. Nikarim rakim. Na. Ez ne dixwazim şahadet, ne birîndarî û ne jî tiştek din bihizirim.

Hevalên ku bal dikişandin ser hestiyariya min û digotin; "Divê mirov ne hestiyar be, ma me hê çi ditiye! Dê hinke kêliyên wisa werin emê li ber cesedên hevalên xwe şer bikin. Emê çekên wan rakin û şer bidomînin", ne kêm bûn.

Tiştên ku tên gotin red nakim. Jixwe ev aliyên şer tim hene. Ma şoreşgerî jî ne ji van zehmetiyan û berdêlên giran re amadebûne? Ji ber divê em bikaribin her tiştên tên jiyîn hemêz bikin re êşa hinek tiştan hesîn û bi wê re hêz dîtin cuda bû. Ger êş bi kûranî neyên hîskirin, ma dibe ku me şahnazî û serkeftinên mezin û bedew bidest xista û bikira şêwaza jiyanê? Ger tiştek tê hezkirin, ya tê xwestin ew bi hemû kûranî û her tiştê wê ve hesîn e. Ma wateya hezkirin û girêdanê jî ne di vir de ye? Her carê bi kûraniya hest û dewlemendiya wê re "hestiyariya" ku ji nişkê ve derdiket holê, wê çawa ji hev bihata cudakirin? Yek dide şerkirin, ya din şer dijwar nake û nabe encamên serkeftî. Xwezaya şerê çînî nayê guhertin. Di wir de her diyarde di nava şer de ye. Rika çînî ya li dijî dijmin,

her tişt kirina nava gola xwînê, ne windakirina mirov bû. Lê di encamê de ji bona pêşeroja mezin û rizgariya mirovahî, windahî û mirina mirov, weke neçarî derdiket holê.

Ji ber bandorên tiştên ku hatine jiyîn bi xwe re di nava lêpirsînekê de me. Di encamê de li hember zehmetî û êşê li ber xwedan cuda ye. Lê xwestina êşê, jê kêfxweşbûn û hez jê girtin jî cuda ye. Weke din jî gelo kîjan êş dema mirov ji kûranî dihesê, mirov dide jiyîn û hêzdar dike; kîjan dihelîne, bê bandor dike û lewaz dixe? Ya girîng jî ji van mijarên bingehîn rêya xwe neşaşkirine. Bawerim dîsa jî dest nadim hestiyariya xwe. Fêmkirina van û ji hêla teorîk ve ji hev cudakirina van têrê nake. Şerek bi polîtîkbûn û hevsengiyek bi kûraniya wê re hewce dikir.

Xebatên me berfireh dibûn. Êdî tenê di nava ciwan û hinek derdorên ronakbîr de sînordar pêş nakeve. Derdorên ku hestên welatparêzî jî dijîn digire nava xwe. Çalakiyên li dijî hinek navendên dijmin sempatiya bermaber me zêde dikir. Derveyî qadên beriya niha me xebat lê dimeşandin, kolana Çandê, navend, qeza û hinek gund dibin qadên xebatê yên esasî. Di heman demê de civînên girse tên kirin. Komîteyên herêmî tên avakirin.

Bi taybet baxên Yildizê gelek derdor sempatî dijîn û dixwazin pêwendiyan pêş bixin. Em li van deran civînên şevê lidardixin, ku hê ji nêz ve binasin. Her ku diçû em li zemînê avakirina komîteyên cewherî bê ka dikarin di nava xwe de ava bikin an na digeriyan. Bi giranî faşîstan dixwest ku derdûdorên Palo birêxistin bikin. Bi gelemperî jî bandora MHP'ê hebû. Beşek giraniya dikandaran ji Sunî, zaza û wan derûdoran bûn.

Piranî ez û Elî Gûndûz xebatên Yildiz Baxlarê dimeşînin. Jin jî tevlî civînan dibin. Lewma em bi hev re tevlî civînan dibin. Ji ber wisa guncavtire.

Saxir Metîn, tevlî xebatên derdorên ciwan dibû. Hamîlî jî giranî dida çalakiyên leşkerî, ew birêxistin dikir. Lê ne bi şêwazê komîteyên hatibûn sazkirin bû, ev di encama dabeşkirina kar de dihat kirin. Ez bi hevalê Elî Gûndûz re diçûm hinek bajarokan jî. Me destpêkê cihên weke Qerekoçan û Hozatê esas digirt. Qerekoçan destpêkê bi Çewlikê ve girêdayî bû. Paşê bi Elezîzê ve hat girêdan. Gundên Kebanê baş bûn. Peywendiyên me bi gelekan re heye. Li Madenê çend dilxwazên me hene, lê hêjî zemînê rêxistinkirinê baş pêş neketiye. Li Hozatê hinek kom hatine avakirin. Xebat didomin.

Dema min li Hozatê pîrika mala ku em lê mayîn çîroka komkujiya Dêrsimê guhdar kir, ez pir bandor bûm. Gozeyên Hozatê ne weke gozeyên (gozeler) Dêrsimê ne. Gozeyên li qadek teng, bi hejmarek kêm û avên wan kêmtirbûn. Dema pîrkê ew goze şanî me dida, bere digiriya û behs dikir bê çawa dijmin di 38'an de du keçên ciwan birine wir û destavêtine wan dikir. Cardin weke ku ji nû ve bijî vedigot:

"hêjî qêrînên wan di guhê min de ye. Xwe di nava kîleyên (evîn kîlerîn) malekê de veşartibûn. Keçên pir bedewbûn. Lê leşker ketibûn hundur û ew dîtibûn. Weke heywanan êrîşî wan kiribûn. Dîn û îman bi wan re tinebû." Carina qut qutî û çavên xwe diberda cihekê û vedigot:

"organên wan jêkiribûn. Yek bi yek destavêtibûn wan. Ma qey ew qêrîn têne jibîrkirin?" Ne zehmet bû ku ji mirovên

komkujiya Dêrsimê ew qas zindî jiyane re, mirov behsa Kurdistan û di vê rê de hewcedariya têkoşînê bike.

Êdî Ciwanên Şoreşger (Dev-Genç) dixwestin li Hozatê, rêxistinek bi navê Çepê Şoreşger (Dev-Sol) ava bikin. Lê zêde bandora wan tinebû. Dîsa Artêşa Gundiyên Komînîst ên Karkerên Tirkiyê (TÎKKO) xebatên xwe dimeşand. Pêwendiya me jî bi hinek derdoran re çêbûye. Di asta nûnertî de xebat dihat meşandin. Cahît Xoce mamoste bû û derdor dihat hezkirin. Di vê pêvajoya destpêkê de ew hatibû erkdarkirin. Di pêvajoya em mayîn de me bi derdorên dilxwazên me re axaftin û civînên cur be cur pêk anîn. Li mala ku em lê diman çend xwîşkên ku ji heman fikirî hebûn. Tenê birayê wan dilxwazê me bû. Xwîşkek wan ji TÎKKO, ya din dilxwaza Çepê Şoreşgeran (Dev-Sol) bû. Me bi hinek keçên ku ji komên heyî bandor bûne, lê nêzî şoreşgeriyê ne re bi komî axivî. Hozat, bajerokek biçûk e. Bûyer û pêşketinên rû didin zû bandor dike. Her wiha keç û jinên wan jêhatî ne. Li Hozatê di salên nêz de hinek bûyer jî hatin jiyîn. Ji ber leşkerek Qerekola dijmin destavêtibû keçek ciwan, gel rabûbû serhildanê û îsyan kiribû. Yanê gel ne weke berê ye. Peywendiyên wan tim bi derve re jî hene. Her tim xebatkar, ango karkerên wan ên li Ewrûpa û metrepolan kar dikin hene. Asta rewşa wan a siyasî û civakî ne paş de ye.

Kontrolek çêbû, ev çûna me ji bona xebatên pey vê demê re bi armanca amadekarî ye. Çemîşgezek xwedî binesaziye cuda ye. Li wir rêxistinên Faşîst jî hene. Di salên 1938'an de Tirk li vê qadê tên bicihkirin. Lewma Pertek û Çemîşgezek têkilheve. MHP jî ji vê rewşê sûd werdigire û rêxistinên faşîst pêş dixe. Qerekoçan jî ji aliyê binesaziya siyasî û civakî ve

kozmopolît e. Tevlîbûna hevalê Mazlum û Delîl, qada heyî kirin emînek pir girîng. Heta Dibistana Razanê ya Herêma Qaza (Kaza Bolge Yatili Okulu) jî bandor bibû. Dihat nîqaşkirin kul i Qerekoçanê li dijî hinek kesên sîxûr çalakî werin lidarxistin. Di wan rojan de maşîna polîsan jî hatibû reşandin. Lewma li her derî tengezarî hebû, lêgerîn û kontrola nasnameyan pir çêdibû.

Ji ber îhtîmala serdegirtinên mala zêde bû, em her tim li malekê ne diman. Me çend cih diguhertin. Em çûn mala Mazlumê kurê apê ku ji Şavakê bû. Ew mamoste bû. Ji ber em li Dêrsimê cîranê hev bûn, me dizaniya ku şoreşger e. Wê de demê peywendiyên me bi wî re teng bûn. Lê niha em hevalê hev bûn û em çûn mala wan. Kêfa min ji vê rewşê re dihat. Du bira bi hev re zewicî bûn. Ji eşîreta xwe du keç bûk anîbûn. Hevjîna Mazlum ji wî mezintir dixwiya. Dema me destpêkê dît em mat amn. Hinekê jî dilê me pê êşiya. Jinek bêdeng û kamil bû, lê ji siyasetê jî dûr bû. Xizmetek pir rêzdar kir.

Pişt re em malek ku heval lê diman. Gelek heval hebûn. Havala Rehîme û Baqî Qehreman jî li wir bûn. Elî Gûndûz derheqê qadê de agahî girtin. Em her du jî guhdar dikin. Behsa asta pêşketina hevalan û rewşa destkeftiyan dikirin. Mala hevalê Mazkum Doxan vala bû. Dema em derbas bûna mala wan şanî me kirin. Malek yek qet û hewşek wê hebû. Weke din mala ku berê Kesîre jî lê dima şanî me kirin. Herî dawî em birin malek cihê wê bêdeng, nêzî Warê Xwedîkirinê (Yetîştîrme Yurdu). Ji ber devrî bajêr bû, hevalan hê zêdetir bi ewle dîtibû. Gotin ku ger rewşek awarte rû bide em dikarin pir bi lez derbikevin devrî qadê.

Mal ya Gonul Tepe wan e. Em bi vê serdanê kêfxweş bûn. Me rewşek mala xalên wê yên li navenda bajêr diman cudatir, li vir dît. Dayîka wan pir germe. Di axaftinê xwe de her dibêje ez "Qurban" bim. Keça malê ya mezin bêdenge. Gonul jî berovajî wê di cihê xwe de nasekine û zindî ye. Gelek biçûkên wan keç û xort hene. Mal qelebalixe. Malbat bi her tiştê xwe ve dilê wan zêde vekiriye! Em di gelek mijaran de nîqaş dikin. Gonul pirsan dike, beriya yek xilas bibe, derbasî pirsa din dibe. Behsa qadê, bajêr û hevalên xwe yên keçên ku pêwendiya wê bi wan re heye dike. Dixwest ji qadê derkeve û pisporî kar bike û têkildarî vê de pêşniyarek jî kir. Ya rastî bi înad ferz dikir. Ew jî eşkere bûye û hinekê jî "forsa" xalê wê heye. Lewma polîs nikare her tim êrîşan bike. Lê diyar dike ku her wiha zêde mayîna wê jî dê ne baş be û xeterî heye.

Ya rastî beriya niha jî dihat hizirîn. Hîna dibistan vekirî, rêxistinkirina derdora xwendekaran baştire. Ji ber tam wextê wê ye. Ji ber wê mîsoger piştî girtina dibistanan ev pêdivî derketa holê. Bi taybet rêxistinkirina jinan, ew tevlî nava refên Rizgariya Netewî kirinê de derfetên jinê hebûn. Bandor dikir. Me carê henek li hev dikir, digot; "tu xwedî ruhek anarşîstî." Em jî bi kêfa Gonûl bû û dikeniya. Xwîşka wê ya mein digot; "temam, e jî derbikevim." Her çendî dayîka wan tiştên ku dihat niqaşkirin cidî ne didît, dîsa jî rengê rûyê dihat guhertin. Wextek kin bêdeng dima û weke ku bêje; "gelo ev hatine keçên min ji malê derbixin?" Û dişopand. Ji bona wê bihedirînim min jî bi dengek bilind got;

"hewce nake her kes ji malê derkeve. Hûnê bi vî rengî jî karên xwe bikin.

Me wê şevê xwerinên dayîkê yên xweş xwar. Sohbeta me heta derengiya şevê doma. Ez li nav cihan jî bi Gonul re di-axivîm. Kesek pir gerim bû. Li Çewlikê Perwerdeyê de di pevçûnên li dijî faşîstan de serkêşiyê dike. Zêde ti feydeyek wê tinebû ku li malê bimîne. Lê belê, li Qerekoçanê yeke ku di nava jinan de kar dike û kesan birêxistin dike ji nav wan derxistin baş nedibû. Evê valahî ava bikira. Ew derdora dilxwaz û piştewan tenê hiştin, ne dibû. Diviya me di demek nêz de bal nekişandiba ser xwe. Bes, hevalek ku dikare pêş bikeve û gelek qadên din jî kar bike. Me ev jî not girt. Ez fikirîm ku piştî ez bi hevalê Cemîl re jî axivîm em dikarin vekişînin.

Ez bi Elî Gûndûz re vegeriyan. Li malê hinek nor û nivîsek biçûk a nav li ser niîsandî heye. Dema ez çûm Qerekoçanê hizra min tim li ser van bû. Ger lêgerînek hebûya dê baş nebûya. Min çawa tiştek wisa kir, min ti caran tiştek nivîsandî ne dihişt. Min tengaviya wê derbas nekir. Ji xwe re dibêjim; "hêvîdarim li malê ti lêgerîn çênebûye." Elî Gûndûz di vê mijarê de pir bi hedar bû. Dema em destpêkê li otobûsê siwar bûn, cih tinebû. Ciwanek rabû, ez li cem diya wî rûniştim. Ev jî pir başbû. Ji ber yekser piştî rêwitiyek kin di deriyê Kovanciyan de kontrol hebû. Leşkeran her wesayîta ku dihat diçû kontrol dikir. Dema me rewş dît, min û Elî îşaret da hev. Min jê re got em hev nas nakin û jina li kêleka xwe da nîşan ku ezê wê weke xizmê xwe bidim nasîn. Got; "temam." Ewê ciwan jî di vê mijarê de şiyar bû û xwe nêzî dayîka xwe kir. Bi kurmancî jê re got; " ev keça xwîşka te ye, wê tu bêjî Eyşê ye."

Dayîka wî di bin rûyê xwe yê pêçayî de weke bêje "temam" serê xwe hejand. Ew demek kin bû em li cem hev

rûniştibûn. Em çend caran axivîn. Kurmanciya wê û Dimilkiya min zêde lihev nedikir. Ez bi Tirkî axivîm. Hinekê fêm dikir. Hêj leşkeran wesayît ne dayî rawestîn jinê xwedî li min derket. Destê xwe danî ser milên min, çend caran bi porê min lîst. Rola xwe baş dilîst. Kêfa min jî ji vê re dihat. Baş bû ku rûyê wê jî pêçayîbû. Bal nedikişand. Dê zêdetir jê bawer bikiran.

Otobûs hat rawestandin. Leşkerên li derdor çekên wan di dest de amadeyî disekiniyan. Lûlka çekan ber bi me ve dirêj kiribûn. Her aliyên rê komên ewlekariyê hebûn. Serbazên wan got;

"hemû rêwî derkevin derve, kontrol heye. Bila ti kes xwe bi ti tiştî ve mijûl neke. Bila her kes di cihê xwe de bimîne."

Em tev daketin. Em her du tenê jinin. Em jî dawî daketin.

Got; "haaa! Ma jin jî hene. De ka rê bidin van jinan (hanimefendî)."

Jina ku li cem min e li pêşî rawestiya ye. Destê xwe danîne li ser milên min. Paşê destên min girt. Got; "keça xwîşka min e."

Min hewl da xwest weke ku çenteyê xwe vedikim bidim nîşan.

Serbaz got; "temam, hewce nake."

Pey re ji min pirsî:

"ma hûn karmend in?"

Min jî got; "rast e, ez karmend im."

Jor heta jêr çav li min gerand. Cilên min guncav bûn. Hewayek baş dida. Sipas kir û got;

"ji kerema xwe li me birorîne me hûn aciz kir hanimefendî."

Em ketin hundur. Paşê bi rêwiyên din re mijûl bû. Dema em hundur bûn çawûş cardin ket hundur û derdor kontrol kir. Jinik dîsa ket panîkê. Min jê re got hinekê bihedar be, çawûş ji bona xwe bide nîşan wisa dike. Bi rastî jî tiştek tine bû. Ji ber em jin bû li ber me ba dida. Ji ber karek cidî dikir. Piştî kontrol xilas bû, em rê ketin. Jinê dua dikir, kêfxweş dibû ku tiştek xirab rû neda. Min û wî ciwanî li hev nêrî û em keniyan. Ew jî Elî Gûndûz jî aramî bûn. Ne başbû ku em bê nasname digeriyan. Berê dema jinek bê nasname bûya zêde ne girîng bû. Nasname nedihat pirsîn. Lê êdî bal dikişand. Em vê carê tesadûf xilas bûn. Gotin ne hewceye ku nasname diyar bikin. Lewma divê ez carek din baldar nêz bibim.

Divê em jî li gorî êrîşên dijmin tevbigerin. Em zêde tevdîran nahizirin. Tevdîrên heyî jî dem kin û ji rêzê ne. Dema êrîşên dijmin ên yekser tinebin, sisitbûn çêdibe. An jî xeterî weke êrîş tê hesabê. Dema rewşên bi vî rengî derdikevin em kêmasiyên xwe dibînin. Jixwe bi gelemperî jî tê jiyîn. Divê ez ji xwe re nasnameyekê derxim. Dîsa notên kum in hiştibûn malê hatin bîra min. Zêde ne girîng bû, lê min tiştên wisa ne dikir. Lewma dema ez çûm malê min yekser ew not tine kirin.

'Gelo ev zilam kî ye?"

Rêbertî hat qeta binê malê ya em lê dimînin. Mal ji du ode, du eywanên teng û xwaringehekê pêk dihat. Nivis û nemlî bû. Dema demsala sar jî dihat lê nedihat jiyîn. Derfet nebûn ku em zivistanê sobeyan jî pêxin. Sobeyek me ji tenekeyek biçûk hebû. Me danibû odeya destpêkê. Lê ji ber darên me nebûn, zêde bi kêr jî ne dihat. Carê qaseyên ku me bi pereyan ji dikanê kirîbûn dişewitand. Ew gerimbûn jî zû derbas dibûn.

Alavên malê ji Çewlikê hatibûn şandin. Tişta herî bi xemil û şemal perde bûn. Başbû ku ji derve de mal xweşik dixwiya. Di hundur de jî pêdiviyên esasî bes bûn. Di odeya despêkê de yek dîwaneyek me hebû. Li odeya paş jî textek razanê ya weke dîwanê hebû.

Ji ber doşeka singer başbû, dema Rêbertî hat li ser wê raza. Perde, nevresîm û betaniyên me her tim paqij bûn. Me bi giştî jî mal paqij dihişt. Qet ji bîra min naçe ji bona gerim bibe û nem negire me, utu li nav paçekê pêçabû û kiribû nav cihan. Lê dîsa jî nema wê derbas nedibû. Di nava pêvajoya ku Rêbertî li malê bû, gelek caran ji ber xebatên me hebûn em sibehê diçûn û dereng dihatin. Rêbertî tenê li mal dima. Rojekê dema ez hatim malê, min dît ku Rêbertî desmala xwe li noka xwe pêçaye û malê paqij dike. Pir paqij bû. Li cihê ku ew lê ti caran belavbûn û qirêjî tinebû. Tişta wî ya herî balkêş sibehê di taştê de pîvaz dikir nava nan dipêça û dixwar.

Rêbertî baldarî nêzî her aliyê jiyanê dibû. Ji bo bigihije dijiya û ji bona jiyanê her tişta ku hewce bû re di nava şerekê de bû. Lewma her tim xwedî hêzek rakêşwer a guhertin û veguhertinê bû. Dema li Elezîzê dimîne çend cihan diguhere. Li mala apê min ên li pişt Sarikaya dimîne. Di vê navberê de bi her kesî re di-axive. Hevpeyvîn, pirs û axaftinên wî bandor li her kesî dike. Dema pişt re Memo pê dihese ku Rêbertî ye, tufanê radike. Ji ber her kes li malê cidî rûniştiye û rijnameyan dixwînê, Memo jî tê malê. Li hember wê hewaya malê mat dimîne. Çend caran bi zanebûn nesekinî ketiye hundur û xwestiye hewaya cidî ya heyî xirab bike. Ji bêdengî ew aciz kiribû. Lê tevî wê kesî dengê xwe nekiriye û hewaya xwe xirab nekiriye. Dema wate ne daye vê rewşê, ew jî rûniştiye û dest

avêtiye rojnamê û weke dixwîne lê dinêre. Ev jî ji ber çavên Rêbertî naçe. Dema rojnamê dixwîne, carê çav li wî digerîne. Ji bona bizanibe çi qas bi armanc û cidî rojnamê dixwîne jê, nûçeyên rojnameyên din ên girîng û şîroveyên hevbeş ên têkîldarî mijarên girîng de dipirse. Me dide axaftin.

Memo jî ji xwe re dibêje, "ev jî çiye û kî ye?" weke ku rojnameyê cidî dixwîne nêz dibe. Sernivîsên nûçeyan dixwîne. Zêde ne çûye dibistanê, ji xwendinê jî hez nake û weke pêdiviyekê jî nabîne. Memo çalakger e! Ji çek hez dike, kuştin û lêdanê hez dike. Ji vê hêlê ve yek alî û teng e. Lê ew vê rewşa xwe pir baş dibîne, yan jî vî mantikê xwe rewa dibîne û weke pesindanê digire dest. Memo ji acizbûnê rojnameyê di destê xwe de dibe û tîne. Ne di wê ferqê de ye ku pir deng derdixe. Rêbertî jê re dibêje:

“di wê rojnameyê de çi heye?” Serenavekê nîşê dide û cardin dibêje, “ di wan nivîsên jêr de çi hatiye nivîsandin? Memo ji ber vê pirsê tengav dibe. Lê dizane ku divê bersivê jî bide. Serenavan nîv bi nîv dubare dike. Rêbertî dibêje:

“de ka rast bixwîne vê rojnameyê, tu tenê serenavan dixwînî. Wisa nabe. Hûn hemû rojnameyan digirin û baş dişopînin, ne raste ku tu tenê wêne yan jî serenavan temaşe bikî.” Memo wê şevê bêdeng dibe û radiweste. Dema diçe li ber deriyê derve dibêje: “ecêb, gelo ev zilam kî ye, ez mehf kirim. Ê dixwîne yê bixwîne, yê nexwîne jî naxwîne, ew çima xwe têkil xwendina me ya rojnamê dike?”

Dîsa jî tevî hemû israran min ne got Rêber APO ye. Her çendî yê texmîn kirîn hebûn, min dîsa jî ji kesî re ne got Rêbertî ye. Belê, dema Rêbertî ji qadê derket Memo pê hesiya

ku Rêbertî ye. Dema pê hesî weke arokan lingê xwe li erdê dide û dibêje, "çawa dibe. We çima ji min re negot. Lê ezê teqez ji vir û şûnde rojname û pirtûkan bixwînim. Ezê ji xwendinê hez bikim." Dibe ku pir kêm xwend, lê soza xwe jî girtibû û girt.

Hevalê Cemîl ji me re got, divê em li ser pirtûka pêşnûmeya bernameya nû hatiye amadekirin, bi taybet dîroka partiyên komînîst bixwînin û li ser wan lêbikolin. Me dîroka Partiya Karkerên Vîetnam, dîroka Partiya Bolşevîk û yên weke Çînê xwendin û me ji wan not girtin. Heta me bi Meral re nivîsek amade kir. Bi vî rengî xwendin, lêhûrbûn, nîqaşkirin û xwe gihandina hinek encaman zêdetir sûd dida. Bes tiştên pir somut ne dihat bîra me. Zemînê ku tevger xwe bigihîne asta hêzek polîtîk kamil dibin. Tevger berfireh dibû. Divê her xebatkar û qadro xwe di her astê de têr bikin û bikaribin ji pêşketinan re bersivê bidin.

Her tim di vê mijarê de rêbaza xebata lêgerîn û lêkolîna Rêbertî mînak dihat dayîn. Ev jî weke xisletek tevgera me hatibû pejirandin. Ji pratîka her welatî ders girtin û xweseriya heyî jî bi vî rengî dewlendkirin balkêş bû! Em hemû mijarên weke Partî çiye, xebatên Partî xebatek çawa ye, pêşxistina Partî û rêxistinê li gorî mercên xweser çawa dibe? Nîqaş dikin. Em bi hevalên din re nîqaş dikin. Elî Gûndûz heye, Hisên Topgûder û Saxir Metîn heye. Hemû hevalên kar dikin lêgerîn û lêkolînên bi vî rengî dane destpêkirin.

Hisên Topgûder ji Palo ye. Ji KUK'ê cihe bûye û derbasî nava me bûye. Qadroyê KUK ê pêşeng e. Di navbera me û KUK de tengezarî hene. Bi taybet ji bon ali qada Mêrdînê hinek derdora wan heye, pirsgirêk hê zêdetir kûr dibe. Divê

taybetmendiyên komên nijadperestên burjuvaziya biçûk û xisletên çînî werin erkerekirin. Nexwe ewê di bin navê xwedîderketina Kurdistanê de pir qelp hinek astengiyan derxin. Tevî kul i dijî van têkoşînek bîrdozî esas tê girtin, cih bi cih me neçarî tundiyê jî dikin. Dijmin jî bi rêka gelek baksan êrîş dikir. Dema Bêşparcecî eşkere bûn, bi tayber li qadên Dêrsim û Dîlokê komek bi navê 'Têkoşîn' derxistin. Di nava KUK'ê de qutbûna koman ne hêsan bû. Bîrdozî û polîtîkayek zelal, zanist û rastiya Kurdistanê bi her awayî rave dike, bandor dibû û dihişt ki her derdor di nava xwe de ji hev cihe bibe.

Her mirovê durist ê di pêkana şoreşê de biryar girtiye, her şoreşgerê ku welatparêziya şoreşgerî di vê pîvanê de derxistiye zanebûnê, neçar bû ku di nava tevgerek wisa di rewşa biryardariya pêşengiya şoreşa Kurdistanê de cih bigire. Ev encamên jiyan û têkoşînê yên xwezayî bûn û girîng bûn. Di heman demê de pêşketinek ku rastiyek girîng derdixist holê bû.

Dibe ku hevalên ku ji komên din hatîn pir zêde zehmetî ne dijiyan, lê bi bandora hinek taybetmendî û fêrbûnên ku girtine ve dijiyan. Hisên giran tevdigeriya, bêdeng dixwiya, lê pir di-axivî û nîqaş dikir. Astek wî ya teorî û bîrdozî hebû. Ji rastiya rêxistinê ne biyanî bû. Pir dûr û biyanî jî ne disekinî. Lê dîsa jî bandora fêrbûnên nava KUK'ê kûrbûn û bertekên wî cuda bûn. Ji ber binesaziya kesayeta Şoreşgerên Kurdistanê cuda, şerker, di tevgerê de sivik, uslup û ravekirina bîrdozî û polîtîkayê de jî cuda ye. Di hundur de girêdanek bedew û hezkirin-rêzdarî heye. Ez Hisên cuda nabînim. Vê cudabûnê yan jî hinek tiştên din nadim pêş. Gerimbûn û hevalbendiyek ji xweber û xebatek xwezayî heye. Lê ji ber vê cudabûna heyî, biyanîbûnê jî digire nava xwe. Heyder Eroxlu hê zêdetit zindî, xwîngerim û weke

agir e. Li dibistana Amadeyî ya Atatûrk dixwîne û li dibistanê jî pêş e. Dilxwaz û piştewanên derdorên din jî ew birêve dibe. Nûnerê dibistanê ye, xîtabik wî ya rakêşwer heye û bandor dike.

Ji derdora weke Palo em bi rêya hevalan derbasî sûk û dikandarên navenda bajêr dibin. Piranî wan birêxistin dikin. Heta hinek dikan hene ku heval çekên xwe li wir vedişêrin û dikarin ji wir çalakî lidarbixin. Li dijî malên hinek sîxûran ango malên faşîstan çalakiyên bombekirinê hatine lidarxistin. Ev çalakî destpêkê li derdora Fewzî Çakmak hatin kirin. Ev jî bû sedem ku gelek faşîst mala xwe berdin û birevin. Ên me jî carê hinek parçeyên dînamîtê tavêştin van malên ku vala ne. Tevgeram me, tevgerek çalakger, bombavan dihat zanîn û şîrovekirin. Êdî dema behsa tundiyê dihat kirin, gava yekem de Şoreşgerên Kurdistanê dihat bîra her kesê. Hinekan digot 'ARN-UKO', hinekan jî digot 'Netewparêz'. Kesekê îmzeya bi navê Şoreşgerên Kurdistanê ya di bin nivîsên daxwiyaniyan de bikar ne tanî.

Elî Gûndûz ji hêla teorî û bîrdozî ve pêşketiye. Jêhatiya wî ya rêxistinkirinê jî heye. Dema destpêkê zêdetir bi derdora xwe ya zanîngehê re mijûl dibe. Paşê ev xebatên wî berfireh dibin. Ji Saxir Metînê bi bandortire. Asta Saxir Metîn a teorî û bîrdozî jî zêde jê necuda ye. Lê di pêwediyan de pir hişk, bi tepkî ye. Dibe bandora guhê wî yê nabihîsê jî hebe. Tiştên kut ê axaftin yekser fêm nake, dide dubarekirin, gelek caran li gorî xwe şîrove dikir û yê miqabilî xwe jî bandor dikir. Ji kehwexaneyan dernediket. Li Elezîzê, zêdetir li Fewzî Çakmak kehwexaneyan rola komaleyan dilîst. Em di vê demê de diçûn hemû komaleyên komên din jî. Ji ber nîqaşên ku li wan deran dihatin

meşandin bandor dikir. Lewma dixwestin bi rêbazên cur be cur çûna me ya komaleyan asteng bikin. Heta hewl didan me weke ku em bi polîtîkaya xwe re nakokiyê de ne bidin nasîn. Digotin;

"ev dilxwazin ARN-UKO ji aliyekê ve damezirandinên demokratîk û xebateên legal red dikin, ji aliyek din ve jî diçin kameleyan, heta komaleyan ava dikin, ev çi bê pîvanî ye." Ji ber li cihên komaleyan weke amûr û qadên têkoşînê yên bingehîn esas digirin û xwe bi wê ve girê didin, ji me re jî dibêjin; 'an werin hûn jî kamale esas bigirin, an jî hûn sûd jê nagirin!' û nêzîkbûnên çewt dikirin. Bes polîtîkaya me ya di vê mijarê de pir zelal bû. Dijmin li Kurdistanêti mafê demokratîk û derfera xebatek demokratîk ne hiştibû. Lewma wê behsa kîjan saiyên demokratîk bihata kirin?

Dema nîqaşên bi vî rengî diketin rojevê hevalan jî digot; " em nikarin li Kurdistanê Komaleya Parastina Çûkan jî vekin. Ma komaleyên we bi navê çi hatine vekirin. Van rastiyan baş bibînin." Komaleyên di bin navê weke Kalkindirma-Pêşxistina Çand de vekirine, weke mafek demokratîk dihat dîtin, ev jî rastî berovajîkirin bû. Em dijî ne ku weke amûr di bin hinek navan de komala vedikin. Bi van navan li çend cihan komale jî hatin vekirin. Lê ji ber ev ji laiyê dijmin ve hat ferqkirin û armancên wan jî hatin fêmkirin, zû hatin girtin. Ji ber dijmin destûr ne dida van xebatan. Yên Komalgerî weke rêbaza têkoşînê ya sereke û amûr didîtin, ne dixwestin vê rastiyê fêm bikin. Tevî her tiştî em diçûn komaleyên heyî, nîqaş û propagandyên hewce dihat kirin.

Hevdîtina dîrokî ya li gundê fîs

Lêhûrbûn, nîqaş û xebatê me yên partî û pratîbûnê di nava me de didomin. Hevalê Cemîl jî notên ku me derdixistin ber çavan re derbas dikir. Di hinek mijaran de nîqaş vedikir. Piranî nîqaşan derbarê di nava partiyên komînîst ên kevnar de, şêwaza kargeriya navendperestiya demokratîk dike û dibêje, divê di nava mercên niha de em jî navendperestî esas bigirin. Ji xisletên navendperestiya demokratîk pêwîstî bi hev hene zêdetir, her du rewş li gorî pêvajoyan ji hev cudakirinê de xwe xapandinek derketiye holê. Zêdetir me di vê mijarê de nîqaş kir.

Dida diyarkirin ku mercên Kurdistanê cuda ne, lewma şêweya pîvan û kargeriyên giştî, ji bona me pêdiviyan pêşwazî nakin. Me bi van nîqaşan ve di astekê de hinek tişt derxistibûn zanebûnê. Hevalê Cemîl, asta têkoşîna me girtiye û nîtelîkên pêşketina ku di civakê de ava kiriye dinirxîne. Pirsên cir be cur dikir û bi xwe jî dibersivand. Ya rastî ev amadekariyek bû. Lê me tam ne dizaniya ku amadekariya çi ye. Tenê me texmîn dikir ku wê di şêwaza rêxistinî de hinek guhertin werin kirin. Lê me di vê mijarê de jî pirs nedikir. Em ji bona pîvanê veşartin û dîsîplîna şoreşgertî ne diketin nava van mijaran. Ji bilî mereqa xwezayî, mereqek din pêş nediket.

Hevalê Cemîl roja dawî ji min re got; “xwe amade bike, emê biçin cihekê.” Hisên Topgûder jî bi me re hat. Elî Gûndûz jî bi gurubek din re rê ketiye. Dawiya mijdarê ye. Hewa sar e. Cil û bergek ku mirov bikaribe li gorî vê hewayê li ber xwe jî bike tineye. Ne baş bû ku ez bi wan cilên demek dirêj e li Elezîzê li ber xwe dikim ve derbikevim derve. Ez vê mijarê

bêhtir ji aliyê ewlekariyê ve dihizirim. Her wiha rê jî dûr bû. Ev hatibû gotin. Ez yekser çûm cem Cemîle. Ji ber ew mamoste bû, cilên wê yên zêde hebûn. Min çakêt û pêlav ji wê, pantor û qazax jî ji Semra girt. Cilên min temam bûn û em rê ketin.

Otobûsê navbera yekem li Madenê da. Mal û avahîsaziyên Madenê ecêb bûn. Li kendalê tehteke mezin weke ku mal li ser banê hev hatine bicihkirin. Jêra wê jî rûbar derbas dibû. Rê jî li vî aliyê wê bû. Mirov ji xwaringehê her aliyê Madenê didît. Jixwe cihek bi qasî qevdekê bû. Zê de ne mezin bû. Em ber bi êvarî ve gihan Amedê. Em çûn cihê ku randewu dabûn. Hisên li wir ji me veqetiya. Em bi hevalê Cemîl çûn avahiya Gûnaydin a li Baxlarê.

Heta hingê jî me ne dizaniya emê biçin ku derê, cem kî û çima em diçin. Ez qet pirs nakim jî. Saîme Aşkin derî li me vekir. Di hundur de Rêbertî hebû, me silav da hev. Li cihê ku rûniştibû çend pirtûk hebûn. Pirtûkên weke dîroka RSDÎP, Gavek Pêş de Du Gav Paşde, ya Lenîn a li ser rêxistinkirinê hebûn. Min hemû girtin dest û çav lê gerand. Rêbertî pirsiya:

"çawa çû, we karî hûn xebatên lêkolîn-lêgerînê bikin? We karî hûn lêhûr bibin?" Rêbertî bal dikişand ser hinek mijaran û bere jî lêhûrbûna xwe didomand. Di navberê de hinek pirsên cuda dikir, an jî wî bi xwe di hinek mijaran de nîqaş dikir. Ji ber mijara taybet li ser dihizirî cuda bû. Ji ber vê rewşa Rêbertî em jî hişyar û baldar nêzîk dibûn. Em naxwazin lêhûrbûnên wî belav bikin. Me rûpelên di destên xwe de hêdîka vedikirin.

Saîme jî pirtûk dixwend. Wê tenê got; “hûn bi xêr hatin” û me silav dabû hev. Weke din jî em ne axivîn. Lê di radyoya kêleka wê li ser dîwanê de muzikek nerim hebû. Weke bê xem bû. Min yek du caran ew şopand. Awirên min li ser xwendina wê ya pirtûkan heta rûniştin û guhdarkirina wê ya radyo bû. Min herî dawî ew li Dêrsimê dîtibû. Pir ji nêz ve nas nedikir. Wê di dibistana mamosteyan de dixwend. Di wê pêvajoyê de peywendiyên wê bi TÎKKO re hebûn. Di heman demê de li gorî min xisletên wê yên kesayetî kirêt (îtîcî) bûn. Ji ber li ser şêwaza jiyan û têkîliyên wê gotin hebûn, dibe ku bandora wê jî be. Lê bi temamî kesayetek sar bû. Lê dema ez hîn bûm bûye hevala me, ez pir kêfxweş bûm. Min ji xwe re gotibû; “ ma tevgera me kî tevlî xwe nake.” Asta wê ya kûrbûna teorîk ji ya me tevan pêşketîtir bû. Hêza wê ya xwedin û lêkolînê baş bû. Jixwe ji vî alî ve dihat nasîn. Bi jinan re pêşketina asta teorî û bîrdozî girîng bû. Ji ber jinek polîtîk bandorker û balkêş bû. Pêvajoya pey wê re derbasî araihayê bibû. Hem mamostetî dikir, hem jî xebatên rêxistinî dimeşand. Ji ber li mala ku lê dima Kemal Pîr hat girtin, li wê qadê nemabû û derbasî vî alî bibû. Belê, Kesîre li kur bû? Ya rastî ji mereqê zêdetir, ji ber min texmîn dikir wê li vir bûya, ji ber wê ez lê digeriyam. Xwarin hat. Sifre ji giyan hatiye xemilandin. Du cure xwarin hebûn. Hevalê Cemîl bi dengek hêdîka henek kir û got; “gelo ev malavanî (ziyafet) û ximet j ime re ye? Saîme jî bersivand û got; “na, sifreya me her demî wisa ye. Li vê derê pirsgirêkek wisa tine ye.”

Di vê navberê de hevalê Cemîl jî savar û meqerneya me eşkere kir. Ji ber li Elezîzê derfet kêmtir bûn. Hinekê jî em baldar nêzî xerckirinê dibûn. Ji ber vê navê me ‘dest girtî

(kund)’ derketibû. Lê belê, rastiya tama sorkirina bacanên reş û îsotên ku li qeta jêr hevalê Nûman bi Rêbertiyê re xwarîn jî ne hatibû jibîrkirin. Ez bawerim tama sîr û bexdanozan di devê wan de mabû!

Rêbertî, weke her car lez dixwar. Xwarina wî jî li gorî wî xweser bû. Yekem car dema em li Elezîzê ji mala spî derketin me li xwaringehekê xwarin xwarî ew şopandibû. Meşa wî jî cuda bû. Pir hişk û serwer bû. Tam dema me xwarin dixwar, Kesîre ket hundur û got; “silav.”

Ez hêdîka ji cihê xwe rabûm. Wer hêvî dikim ku bi dest silav bide. Lê dema ew derbas bû çû li ser dîwanê rûniştê, ez hinekê jî aciz bûm û min lê temaşe kir. Ji cihê serşûştinê hatibû. Bi me re xwarin ne xwar. Cardin derbasî xorfeyek din bû. Rêbertî got; “emê yekser piştî xwarinê derbikevin.”

Min fêm kir ku emê biçin cihek din. Yekser pirsa “ma mala ku Rêbertî lê dimîne ne ev e” hat hişê min. Lê ez naxwazim şîroveyên cuda bikim. Ez ji xwe re dibêjim; “jixwe dê her tişt were fêmkirin.” Sarbûna di nava malê de baş tê dîtin. Ez vê dihesim. Nexwe ev bêdengî ne ji bona ku Rêbertî li malê bû, lewra her kes bêdeng bû. Ez jî dişopînim, her çendî hinek xoyan li gorî xwe şîrove bikim jî, her tişt fêmkirin zehmet bû. Lê ez naxwazim di wê mijarê de jî zêde bihizirim. Rêbertî dema xwarin jî dixwar di navberê de çav li pirtûkan digerand. Pirs dikir. Di hinek mijaran de nirxandin dikir. Ango gelek kar bi hev re dikir. Wê kêliyê zengila derî lê ket, hat gotin ku; “maşîn amade ye.” Rêbertî bi tevgerek lez rabû ser piyan û got:

"de rabin em diçin!"

Rêbertî, hevalê Cemîl, Kesîre û ez li taksiyekê siwar bûn. Hevalê Cemîl li pêş, li paş Rêbertî, di nîvê de Kesîre û li çepê jî ez rûniştime. Şofor li hinek cihan lampeya hundur a maşînê digirt û maşîn pir hişyar dajot. Rêbertî navê her cihê ku em têre derbas dibûn dikir. Di-axiviya, lê Kesîre qet ne di-axivî. Min di wê kêliyê de cara yekê got; " çi qas sar e." Bes heta wê demê jî min berovajî her kesî digot û dihizirîm. Di heman demê de ew û Rêbertî weke du cîhanên cuda bûn. Gelo dibiya ku ez şaş bûm? Gelo çima Rêbertî û Kesîre bi hev re ne di-axiviyan? Min her tim ji bo nêzîkbûnên wê yên malê ji xwe re digot; "demek wisa tê xwestin." Ango; "divê mirov fêrmî nêzîk bibe!" Gelo ji ber kar zêde ye nêzîkbûnên wisa derdiketin? Na, mîsoger di navbera wan de tiştek heye. Ev pirs di hişê min de diçin û tên. Ev gotin nayên ser devê min ku ez vekirî van bêjim. Weke ku ez bêjim, ezê gunehekê bikime. Dema ez dihizirim jî xemgîn dibim. Şê, "tiştek hebû!" Ev jî ji kur derketibû? Kesîre jixwe jî zêde ne di-axivî. Ez dihizirim ku ez şaş bim, bes nabe.

Herî dawî em gihiştin gundê Fîs a bi ser Lîcê ve. Li kêleka her rêyan, rastê cadeyê gundek baxêeyên xwe zêde ye. Mala ku em biçinê ji derve de mezin dixwiyê. Weke qonaxa yeke dewlemend û xwedî kar dixwiyê. Em pir hişyar diçin.

Cara dawî derdor hat kontrolkirin. Mal li cihek bêdeng e. Gundiyên din zêde ferq nakin. Ji ber hewa jî tariye kes me nabîne. Em ketin nava mala ax. Eywanek û du odeyên wê hebûn. Li eywanê kuzîne pêxistîbû. Ango germ e. Xwediyên malê mal valakirine, ji bo demekê li malên din dimînin. Tenê xwarinê ji m re tînin. Bavê wan bejin dirêj, bi porê xwe yê spî ve bi her kesî re dikene. Dayîk hinek din bejin kin û dagirtiye.

Xavika xwe xweşik pêçabû. Carina hinek zaroyên biçûk tên û diçin. Lê yê tim ser piyan û diçe derve tê, hevalê Seyfettîn jî tim bera wan dide û wan paşve dişîne. Ji wan re digot divê mêvanan aciz nekin. Hinek beriya me hatibûn malê.

Me silav da yên yekser pey me re hatine. Bi navber ev hatin didomin. Heyecanek mezin heye. Her kes bêdeng e, lê kêfxweşiyek heye. Ez jî ji xwe re dibêjim; “ez bawerim civînek pir girîng e. Nexwe ev qas heval li hev ne dicivîn.”

Min gelek hevalên ku hatin dinasiya. Gelek ji wan min beriya niha dîtibû. Hevalê M. Xeyrî Durmuş, Mazlum Doğan, Duran Kalkan, Elî Heyder Kaytan, Baqî Qarer, Resûl Altinok, Şahîn Donmez, Elî Gûndûz û gelek hevalên din ên nas hatibûn. Min hinek jî nas nedikir. Hevalê Qarasungur tinebû. Min mereq kir gelo ew çima ne hatibû. Di navbereke sohbetê de Resûl got:

"ji ber ewlekarî ne hatiye. Ji bona hatina me bal nekişîne maye. Mizgîniya min bide. Medîha ji Çewlikê derket! Me ji bona çûna wê qurban jêkir.” Û pey re keniya.

Dema min pirsî; "ji bona min ferq nake, diçe kur bila biçe. We çima qurban jê kir?” Singa xwe daweşand û got:

"tu nizanî, ma çi nekir!" dedi.

Min jî got; "diyar bû ku Medîha pişt re bi ser her kesî ve çûye. Herî zêde we piştewaniya wê dikir. We tim bertekên wê yên wê demê bi henek hêcetan ve girê dida. Lê ez dizanim ew jin, dijî şoreş û şoreşgeriyê bû û xwedî bertek bû. Nexwe pirsgirêk ne ez, an jî yeke din bû. Bertekên diya min jî hebûn. Ji ber dijî şoreşgeriya min bû. Nedixwest. Ne ku ji min dihesidiya.”

Ji ber Resûl her carê gotinên bi henek ên weke "ez ji te dihesidim" digot. Ev jî henekek kirêt bû. Em aciz dikirin. Tevî ev dizaniya dîsa ew henek dikir. Gelo bi çiyê vê henekê kêfxweş dibû?

Wê şevê yên ku ne gihiştibûn hebûn. Hinek jî nîvê şevê hatin. Piranî ji ver rêwîtî westiyabûn. Civîn hiştin roja paştir. Dihat gotin ku; "dê sibe destpê bike." Weke din jî hişyarî hat kirin ku 'dê kes zêde neçê û neyê derve'. Lewma hinek heval ji bo pêdiviyan nîvê şevê çûn derve. Divê gundî min û Kesîre jî qet nebînin. Lewma em qet derneketin. Saet dereng bû. Diviyabû em razin. Odeyek ji bona min û Kesîre bû. Odeyek di dawiya malê de bû. Kuzîneya ku li eywanê pêdiket, germahî dida me jî. Weke din jî dawiya wê gov jî hebû, ji ber hê gerimtir bû. Lê odeya din pir sar bû. Ji ber binê wê jî beton bû, zêdetir sar bû. Hevalên xort jî li eywan û odeya din bicih bûn. Demekê Resûl got:

"Ev ode zêdayî we tenê ye. Qet nebe bila hevalê Abdullah were cem we!"

Kesîre jî bi dengek ku erza wî bide got:

"Na! Dê kesek neyê vê derê!

Ez destpêkê mat mam. Ya rastî diba ku bihata. Ji bona du kesan zêde bû. Rêbertî dikariya bimîne. "gelo çima red kir." Gelo li dijî Resûl wisa nêz bû. Ji ber wî jî pir çeloxwarî gotibû. Dibe ku Kesîre ji wî aciz bûbe? Paşê ez jî tevlî wî bûm. Min got wisa baştire. Ji bona xwediyê malê jî wisa baştire. Ez di vir de bi qane bûm. Lê pişt re mala li Amedê û rêwîtiya me hat bîra min. Kesîre xeyîdî û aciz bû. Berê jî zêde ne di-axivî. Lê ne ev qas bêdeng bû. Rû û halê wê yê giştî dida diyarkirin ku ne rehet e. Em her du jî li ser dîwanê razan. Dîwanek ji daran bû. Kesîre got:

"em bi hev re razin dê gerim be.” Carek din got baştire ku kesek din vê odê de tine ye.

Sibehê Kongreya Damezirandinê fermî destpê kir. Her çar aliyên odê dîwanên ji daran bû. Bi qasî têrê dikir heval bi cih bûn. Yên mayîn jî li erdê rûniştin. Maseyek biçûk danîbûn cihê ku hevalê Xeyrî û Rêbertî lê rûniştibûn. Hinek nivîs, not û pêşnûmeya bernamê ya ku li qadan xwendibû bi navê “em rêya rast têbigihijin” hebûn. Her wiha teybek biçûk û qasêt hebûn. Wê tiştên bên axaftin werin qeytkirin. Lê paşê ji bona ewlekarî her tişt ne hat girtin. Not jî berfireh nehatin girtin. Ji bona ewlekarî nêzîkbûnek baldar hebû. Rêbertî got hevaleke din civînê bi rêve bibe baştire. Got; “hevalê Xeyrî dibe.” Lewma hevalê Xeyrî civîn birêve bir. Rêbertî jî axaftina vekirinê kir.

Destpêkê li ser pêdivî û girîngiya civînek wisa dîrokî rawestiya. Mercên derketina Têkoşîna Rizgariya Netewî, pêşengiya bîrdozî-polîtîk, binesaziya me rêxistinî, sipartekên têkoşîna me û asta girtiye, rewşa qadro, dîsa rewşa ku dijmin dijî û êrîşên dijmin tev vegot. Rewşa herêm û nav-neteweyî, rewşa ku pergal dijî tev bi zelalî, şêwazek were fêmkirin de bi zimanek mîsoger, carina serê xwe radikir banê xanê dinêriya, carina jî yekser nava çavan dinêriya û wisa pênase dikir.

Pir caran jî bi tiliya xwe ya serî ve berçavka xwe rast dikir. Berê jî nexweşiya wî ya sûnîzît hebû. Li Elezîzê bala min kişandibû. Her tim bêvla wî diherikiya û dibêhnijiya. Ev jî ew aciz dikir. Ji ber dibûn êşa serî. Diyar bû rewşa hewayê zêde bandor li ser dikir. Dema hênase digirt û bêhla xwe dikişand bala min dikişand. Lê ji ber civîna fermî bû, me ne dihişt ku lêhûrbûnên wî xirab bibe. Ew bi xwe jî di vê mijarê de baldar û hişyar nêz dibû. Weke her car zêde bêvla xwe paqij nedikir.

Axaftin û nirxandinên dida fêmkirin, asoyan vedikir û her kes rehet dikir, di civînê de hewayek cidî ava kiribû. Rêbertî di civînên berê, yên di sefera Kurdistanê de jî rewşa siyasî dinirxand. Lê hemû vegotinên li vir kombûna hemû nirxandinan bû. Xwedî kûraniyek mezin bû. Xisletek ku guhertina nîtelîka rêxistinî, qadro bikaribin erk û berpirsyariyên xwe baştir pêk bîne û xebatek li gorî demê pêş bikeve, mezin derdixist pêş.

Di nava mercên Kurdistanê de avakirina rêxistinek Lenînîstî, saxlamkirin û ew bi hemû amûrên hewce ve temamkirin gelekî girîng û jiyanî bû. Divê yekîtiya rêxistinê bi her awayî li ser bingehek ramanên bîrdozî yên zanistî, zelal û mîsoger were rûniştin. Ji ber vîna hevbeş, din ava rastiya têkoşînê ya zelal û bi pêdiviyên wê ve ava dibû. Rastiya Rêbertî, xisletên wî û aliyên wî yên di her qada jiyanê de diyar dibû, baş dihatin dîtin. Pîvanên nêzîkbûnên ji pêşeng, rêxistin, qadro, gel û bi temamî ji têkoşînê re zelal dibûn. Mercên ku di navxweyî de ev jîndar dikir û aliyên ji xirabiyan re zemîn ava dikir, bi vî rengî derdiketin holê.

Rêbertî zêde hişyar, her kes bi baldarî dilopand û her tiştê ku dihat axaftin bi cidiyetek mezin guhdar dikir. Zanebûna xebatek wisa dîrokî û girîng, çalakiyek dîrokî, giraniya biryardariya dîrokî û hemû nêzîkbûnên xwe li gorî vê destnîşankirin, hewcedariya hevalbendî, hewcedariya şoreşgerî û hewcedariya welatparêziyê ye.

Di demjimêrên pêş ên civînê de hevalê Xeyrî pêşnûmeya bernameyê xwend. Rêziknameya ku bi hinek xalan hatiye amadekirin jî hat xwendin. Hinek guhertinên biçûk jî hatin kirin. Di vê mijarê de yê ku herî baldar dişopand hevalê

Mazlum bû. Piştî ku bername û rêzikname bi hinek guhertinan ve hat pejirandin, navber dan civînê. Dema navber danê, hat diyarkirin ku çima bi rêzgirtinê civîn destpê nekiriye. Paşê dîsa civîn berdewam kir. Dem pir girîng bû. Ji bo ewlekarî, kombûna ev qas hevalan xeter bû. Lewma xalên rojevê bi lezgînî hatin nîqaşkirin. Hevalê Xeyrî got ji ber hinek heval nikarin werin dê neyên. Navê hevalê Kemal Pîr û Qarasungur da. Ji ber hevalê Kemal Pîr di girtîgehê de bû, weke delegeyê civînê yê manewî (fahrî) hat qebûlkirin. Di heman demê de behsa girîngiya wî ya giyanwerî kir.

Rojevên heyî bi dorê hatin nîqaşkirin. Di dorê de raporên herêman hebûn. Nûnerên herêman ên ku hatine û hevalên din ên delege, raporên herêman bi devkî ragihandin. Ji herêmekê gelek heval axivîn. Axaftinên hevûdû temam dikin hatin kirin. Nirxandinên ku berî xwe rexne dike û cuda digire dest hatin kirin. Şahîn her carê destûra axaftinê digirt û dirêj di-axiviya. Her carê jî dubare dikir. Ew ji Rêbertî zêdetir di-axiviya. Êdî gihabû astek wisa ku her kes jê aciz bû. Dema wî mafê axaftinê digirt, aciziya her kesî ji çavên wan diyar dibû. Di raporên hinek herêman de behsa şêwaza xebata wî jî hat kirin. Min jî bi vê mebestê derbarê xebatên me yên Elezîzê de hinek nêrînê xwe vegot. Min zêdetir bal kişand ser nêzîkbûnên nebes ên giştî yên ji jinê re. Min diyar kir ku heval hewl nadin ku yên herî nêzî xwe, hevjîn, xwîşk û bira bikin şoreşger, li bendê ne ku teqez hevalên jin werin wan birêxistin bikin. Ev jî nêzîkbûn zêdetir bi hevalên qadro yên pêşeng re derdikevin pêş. Ev jî nêzîkbûnek şaş e.

Resûl bi axaftinên min dikeniya. Min zêde wate neda vê. Yan kêfa wî ji axaftinên min re hatibû, yan jî kena xwe bi min dikir. Ez ji ber vî nêzîkbûnê wî aciz bûm. Lewma min jî ji xwe re digot gelo min tiştek şaş gotiye? Jixwe axaftinek ku pêşde bi plan amade nekiribû. Ez her tim li benda axaftina Kesîre bûm. Ji ber ew ji hêla ast, danehev û zanebûnê de ji min pêşdetir bû. Li bendê bûm ku destpêkê ew bi-axive, lê mixabin ne axivî. Her ku ez ji ber rêzdariya xwe ya li hember wê li benda wê dimam ku bi-axive, nîqaş jî di çarçoveya mijarên hewce de derbas dibûn. Ji ber ev rewşa wê cesareta min jî ya axaftinê dişikand. Min bi xwe re nîqaş dikir.

Piraniya hevalên ku hatibûn qadroyên rêber û pêşeng bûn. Li ser nîqaşan zêdetir serwerbûn. Xwe weke wan nagirim dest, lewma min digot; "wan hevalan berpirsyariyên girîng girtine. Hemû pirsgirêkan dizanin. Nirxandinên wan jî li gorî wê berfireh û tije ne. Lewma tiştên ku ez bêjim dê diyarker nebe. Nexwe hewce nake ku ez bi-axivim." Lê ez pir baş guhdar dikim, dişopînim, her tişt bala min dikişîne. Ji ber hemû pirsgirêkên heyî yên me bûn. Min di vê mijarê de xwe jî berpirsyar didît. Min xwe dûrî van tiştan nedidît. Her çendî min di vegotin û pênasekirinê de zehmetî dijiya, min ji xwe re digot, axaftin, nêrîn û ramanên xwe diyarkirin baştir didît. Lewma min ji xwe re digot; "her çendî Resul bi min bikenê jî, bila be ne xema min e."

Min di rê de serma girtibû. Serê min têşa. Deng ji guhên min dihat. Bandora guhertina hewayê jî hebû. Ev jî dibû sedem ku ez baş nekaribim fikirê xwe komî ser hev bikim û baldar bişopînim. Giraniya civînê jî bandorek din bû.

Di demjimêrên pêş de çavên Rêbertî yekser bi Resul Altinok ket. Li cihê xwe rûniştî diraza û xurexur dikir. Rêbertî awirek weke birûskê lê nêrî. Awarên me tevan jî çû wir. Ev rewş hêrs û nerehetî ava kir. Rêbertî axaftinênxwe qut kir. Awirên xwe bi çend gorinan bilêv kir.

Got; "di platformek wisa girîng de ev qas bê cidiyetî nabê. Nay pejirandin ku dem adi kêliya tiştên ev qas girîng tê nîaşkirin de weke serseriyan razin! Ser xwe ve were û cidî be!

Me cara yekê bû Rêbertî ew qas aciz bûye. Pirsgirêk ne "xewek ji rêzê bû" û diviya wisa jî ne hatiba destgirtin. Bê guman ev nêzîkbûnek bû. Lê min dîsa ji xwe re digot; "xwezî Rêbertî ew gotina serserî bikar ne anîba." Ew jî ji nişkê ve ji dev deriketibû. Paşê bêdengiyek çêbû. Berî Rêbertî dest bi axaftina xwe bike hevalê Mazlûm mafê axaftinê girt. Her kesî bi matmayî û meraq lê temaşe dikir. Mazlum axivî:

"jixwe pir girîng e ku herkes bi berpirsyar û cidiyet beşdarî civînê bibe, divê em hemû baldar nêzî vê mijarê bibin. Di vê manê de hişyarî di cih de ye. Lê belê, ez uslubê hevalê Abdullah jî rexne dikim. Ger ew gorin bika ne anîba dê baştirba."

Em ji vê jî mat man. Nêzîkbûna hevalê Mazlum jî baldariyek bû. Ji ber berpirsyariya xwe û rêzdariya beramber Rêbertî ev rexne kiribû. Dîsa jî ez ecêb mam, bes ne rehet im. Min ji xwe re digot; "tamam, hewce bû" lê wî Rêbertî rexne kiribû. Min paşê ev mijar di vegera Elezîzê de bi hevalê Cemîl re parve kirin. Em axivîn. Her çendî weke nakokî dixwiya, rastiyek berbiçav hebû. Ew jî hevalê Mazlum li kur diba bila bibe, kî dibe bila bibe, di çarçoveya şoreşgeriyê de bi

hevalbendî tişta ku hewce bû were gotin, digot û tişta hewce bû were kirin dikir. Ew jî xisleta wî ya sereke bû. Xweseriya wî jî di vê mijarê de bû. Ev xweseriya wî ew û Rêbertî hê zêdetir bi hev ve dida girêdan. Dema xweseriya wî bi xweseriya Rêbertiyê re dibû yek, di navbera wan de yekbû saz dikir. Ji ber niçar bû şerkeriya Rêbertiyê, şêwazê çareserî û encam girtinê ya heyî, bi her kesî re kesayetek şerker a mezin bida avakirin. Ev di heman demê de xweseriya kesayetan jî derdixist holê.

Rêbertî bi baldarî û seknek kamil ve Mazlum guhdar kir. Paşê bi dilnivzî got:

"temam, rexneyên ji bona şêweya şiyarbûna min hatine kirin rast in. Ezê baldar nêz bibim." Pişt re derbasî mijara esasî bû.

Dema ez li Elezîzê bûn min bi hizra ku dibe civînek çêbe, hinek ramanên xwe nivîsandibûn da ku jibîr nekim. Hinek bandora tecrûbyên şoreşa Vîetnamê bû. Li wir behsa Yekîneyên Jinê tê kirin. Dîsa li Bulgarîstanê Yekîneyên Jinê tên avakirin. Me bi Meral re jî zêdetir li ser Tevgera Jinê nîqaş dikir. Me digot; "wê Yekîneyên Jinê di nava me de zûtir werin avakirin. Ji ber asta tevlîbûnê zêdtire." Heta me di vê mijarê de nivîsek derbarê di nava Têkoşîna Rigariya Netewî de Cih û Girîngiya jinê de nivîsandibû. Nîqaşên me yên di vê mijarê de hişt ku em pêşnûmeyekê amade bikin. Bes di nava vê de bertek jî hebû.

Bertekên di nava jiyan û peywendiyên Meral ên rojane de ji ber nebesiyên ku çavkaniyên xwe ji nêzîkbûnên hevalên zilam digirt, hinek helwest, an jî rexneyên tund, dibe ji vê hêlê ve erênî jî bûn. Lê cewhera vê nêzîkbûnê cuda bû. Li dijî van

nêzîkbûnên ku bi bandora ferasetên serdestiya zilam ve tên raberkirin, seriyek tûj de "parazvantiya jinê" zêde ne rast bû. Ya ku herî zêde di vê mijarê de xweseriya xwe ji bîr dikir jî, ew bi xwe bû! Di cewhera nêzîkbûnên wê yên ji cinsê wê re de hişk bûn hebû. Lewma nîqaşên me carinan li hev dikir, lê carinan jî ji ber vî aliyê wê qane nedibû û bê ku encam bibe me qut dikir. Li Elezîzê ji aliyê hejmar ve derdorek zêde ava kiribû. Dilxwaz û alîgirên ku em yekser bi wan re têkîldar û pêwendiyê de bûn, hema bêje sed derbas dikir. Her wiha gelek jinên ku bandor bûyîn jî hebûn. Jixwe jinên Elezîzê jî bi gelemperî şerker û îsyankar bûn.

Me got; "em dikarin van pir hêsaz bixin meriyetê." Bes her çendî bi henekî jî be Meral li beşa dawî ya 'Pêşnûmeya Yekîtiya Jinan' a di destê xwe de, 'Bimire Emperyalîzma zilaman' nivîsand. Ev bertekek bû. Dema hevalê Cemîl ew nivîs xwend mat ma. Dema got; "em westiyane, de ka çayekê çêkin em vexwin" ez bawerim wateya "de rabin hûn bi xwe çêkin jî baş fêm dikir." Ev jî nêzîkbûnên tûj bûn. Lê di van nîqaşên me de lêgerînek jî hebû. Di notên min xwe nivîsandî de, daxwiyaniya Yekîneyên Ajîte-Propagande û Yekîneyên Çalakiyan jî vekiribû. Min got; "dikare di nava xwe de xebatek hê berfirehtir a hevbeş were sazkirin." Nîqaş pêşve diçin, lê belê, ez dikim nakim ez nikarim vê mijarê vekim. Ez nikarim pêşniyarên xwe fireh diyar bikim. Dema navber danê ez derbasî odeya din bûm û min bang li Kesîre jî kir û min nivîs dirêjî wê kir û got;

"Ev pêşnûmeyeke ku min li Elezîzê nivîsandiye, pêşniyarên min hebûn, lê min ne karî ez vekim, lewra ez ne-axivîm. Bigirin ger hûn guncav bibînin ezê vekim."

Xwend û pişt re got:

“baş e, hizirandina te ya ser van mijaran baş e. Bes ji bona avakirina van yekîneyan hê ne zû ye? Ma hêzek di vê nîtelîkê de heye?” Min jî got; “heye. Dê pêş bikeve. Ne li her cihî jî be, li cihek weke Dêrsim, Elezîz û heta Çewlikê ku tevlîbûnên jinan zêdene de dibe. Ez cihên din nizanim. Lê bawerim li Amedê jî hene.”

Civînê destpê kir û ez jî dudilî mam. Ez bi peyva ‘gelo ne zûye ve asê mame”, cesaret nakim li ser vê mijarê bi-axivim. Lê Kesîre gotibû ‘mirov ikare bihizire.’ Ez jî ji xwe re dibêjim, ger ew bi xwe rabûya û bi-axiviya dê çi qas baş bûya. Bes qet devê xwe venekir. Ti mijarê de ne axivî. Carinan di navberê de bi hevalan re di-axive. Car bi car bi hevalê Mazlum re, hevalê Duran re, lê herî zêde jî bi Baqî Qerer re di-axiviya. Bes dîsa kêm û pir kêm bû!

Şahîn jî, bi haleke ku dixwaze bigihije tiştekê û ji bona vê firsendê ji dest bernedê her kêlî di-axive û şîroveyan dike. Di tevahî pêvajoya civînê de Kesîre li kêleka min rûniştibû û min bi dengek hêdî jê re digot; “ev çi qas zêde di-axive. Ma hewce nake em hişyar bikin?” Di nava hevalan de jî hêdîka ber xwe de axaftin hebû. Ya rastî her çendî kesî bi deng û fermî deng nekiribe jî, her kesî digot; “êdî bes e, em naxwazin te guhdar bikin.” Ji ber Şahîn her carê destûra axaftinê digirt û dirêz di-axiviya, nêrînên Rêbertiyê bi vegotinek cuda dubarekirin, her axaftinek cihekê ve kişandin, bi me hemûyan re acizbûn ava kiribû. Lê belê Rêbertî bertekên xwe yên di vî warî de weke me diyar nedikir. Pir bi hedar bû. Hewl dida ku vî halî û daxwaza wî ya nîqaşç fêm bike. Di rastiyê de pêşbirkek pir vekirî hebû. Ev halê wî liv û tevger û guman dida avakirin.

Dora hilbijartina rêveberiya navendî hat. Rêbertî weke Sekreterya Giştî ji aliyê hemû hevalan ve hat erêkirin. Rêbertî gelek ji bo rêveberiya navendî pêşniyar kir. Hevalên Mazlum, Xeyrî û Cemîl bi dilnivziyekek mezin red kirin. Xwe paşve kişandin. Dema ev nzîkbûn bi hinek hêcetan diyar kirin, bi taybet bal kişandin ser gotina; 'emê li hember pêşniyar û biryarên hevalan rêzdar bin'. Çend hevalên din pêşniyar kir. Helwestên wan jî heman tişt bû. Jixwe ger hevalê Mazlum û Xeyrî xwe vekişandan, dê yên din jî xwe vekişandan. Rêbertî carekm got:

"hevalê Hisên Topgûder tu çi dibêjî, tu dikarî bikî?"

Hisên hinekê jî bi mehcup got: "na. Ez di vê tevgerê de nû me. Divê hevalên din werin pêşniyarkirin."

Hevalê Cemîl ji pêşketinên ku li Dîlokê rû dayîn xwe berpirayr didît. Lewma xwe hêjayî vî karî ne dîdît. Dilnivziyek hebû, ev diyar dibû, lê diviyabû ne ew qas ba. Ev rêhevalên pêşeng, qadroyên bi wan dihat bawerkirin û hevalbendên zane bûn. Lê yek ji wan jî karê navendî qebûl nedikir. Xwe hêjayî vî karî nedidîtin. Pêşengî didan hinek din. Ev rewş hewayek bêdeng ava kir. Di encamê de Şhîn xwe pêşniyar kir. Karasungur jî hatibû pêşniyarkirin, lê ne di civînê de bû. Bi vî rengî navê ku hatin destnîşankirin, ji bona rêveberiyê hatin hilbijartin. Lê pêşniyar hebû ku hê zêdetir were berfirehkirin. Ev jî hat talok-kirin k udi civîna rêveberiya navendî de were hilbijartin.

Ji bona navê partî jî nêrîn pêş ketin. Pêşniyara navê PKK (Partiya Karkerên Kurdistan) ji aliyê hemû hevalan ve guncav hat dîtin. Weke din jî zêde pêşniyar çênebûn. Tenê li ser navên

weke ‘Partiya Komînîst a Kurdistanê’ dihat rawestîn. Ev piranî di nava komel hevalên hejmara wan teng de weke nêrîn dihat nîqaşkirin. Gotin; “dikare di civîna rêveberî ya navendî de were zelalkirin.” Ya rastî rojevek wisa kêfxweşiyek mezin jî dabû avakirin. Tu bixwaî nexwaî ew kêfxweşî û kelecan, di civînê de jî liv û tevgerek ava dikir. Şêweya alê jî bi hemû ziraviyan ve hat nîqaşkirin. Biryar hat girtin ku danasîna damezirandinê û îlana Partî bi hev re were kirin.

Di heman pêvajoyê de nijatperestên burjuvaziya biçûk jî di bin heman navî de li hev civiyan, kiribûn rojevê ku xwe weke partî îalan bikin. Ew jî dibûn PKK ango Partiya Komînîst a Kurdistanê. Navên mezin li xwe kirin ne girîng bû. Dîsa jî ji bona ku ev nav hêjayî xwe didîtin mirov hêrs dibû. Gelo li Kurdistanê çi ava kirin, çi pêşketin çêkirin û di civakê de nûnertiya çi kirin? Bersiva van pirsan jî li hol bû. Ma ev hemû hê ji niha ve li pêşiya pêşketina şoreşê ne asteng bûn?

Civîn du rojan domî. Heval cardin bi komî lez û bez belav bûn. Em jî dîsa bi Rêbertiyê re vegeriyan. Em hatin heman malê. Em diçin mala ku dema em ji Elezîzê hatibûn lê mayîn. Em wê şevê li wir man. Rêbertî bi hevalê Cemîl re derbasî odeya din bû. Zêde ne di-axivî, her kes westiya bû. Giraniya civînê westandinek ava kiribû. Şenay jî li wir bû. Min piştî Enqereyê cara yekem bû ew dîdît. Me hinekê sohbet kir. Min jê re got pir çilmisiye. Şenay jî hinek pirsgirêk jiya bû. Ji bona demekê xwe veşêre, bi hevalê Îsmet ê ji Çewlikê re mehra xwe kiribû. Li gorî zagonên KT fermî bû, lê di meriyetê de tiştek wisa nebû. Di serî de wisa meşiyaye. Paşê hevûdu tengav kirine. Tevî ki ew hevalek cewheriye, tenê ji bona vê têkîliyê rûdine mala xwe. Ango karek wisa ji bona xebatan weke amûr

tê hilbijartin; dibe ku ji bona Şenay'a ku ji Yogoslavya ye da ku li Tirkî bimîne derfet ava dike. Lê ji berk u dikeve nava sazûmaniya têkîliyek ku qet jê re ne amade ye, rolek zêde xirab dilîze. Ji ber di bingeha vê têkîliyê de yekîtiyek hezkirin û dilxwaziyek hevbeş tine ye. Yekbûnek neçariya ji ber xebatan e. Lê derdikeve holê ku her aliyan jî ev zemîn bi hêzek rast bikar ne anîne.

Kesîre demekê li ser dîwanê rûnişt. Bêdeng bû û dihizirî. Li erdê doşek raxistibûn. Ez, Şenay û Saîme razan. Kesîre herî dawî hat. Li cem min cih hebû, xwe li wir raza. Destên xwe di bin serê de li hev pêça. Demek dirêj li ser pişta xwe bi hizir û şiyar ma. Dema min got; "hûn çima narazin." Bersivand; "xewa min nayê." Dibe ku hinek din bûna ew qasî bala min ne kişandiba û bandor li min ne kiriba. Lê ji ber hevalê Rêbertî ya herî nêz e, mirov bixwaze nexwaze halê wê bal dikişîne û mirov dişopîne. Ji ber bandor dike. Pirs dikevin serê min û ez pir hêsan jî nagirim dest. Weke du mirovên cuda ne. Wê demê çi wateya bihevre bûnê hebû? Min nêzîkbûnên wê yên ev qasî fermî, bêdeng, şêweya hêjayî wî bûyîn tev dida ber hev li gorî kesayeta wê li hev nedikir. Xewa min jî diçû. Hişê min çû ser rewşa wê. Ez xemgîn kirim, lê nikarim çareser bikim.

Roja paştir ez û hevalê Cemîl bi hev re çûn Elezîzê. Di tevahiya dema rê de nebe jî, rêwîtiya me pir zindî derbas dibe û em di-axivin. Ez jî helwestên Şahîn dinirxînim. Tiştên ku ez di civînê de hizirîme, lê min negotîn ji hevalê Cemîl re dibêjim. Derbarê nêrînên birayê min Heyder ên derbarê wî de, helwestên wî yên li Îzmîr Încîralti û Çewlikê raber kirîn tev şîrove dikim û aliyên wî yên bandor li ser min kirine tev vedikim. Ew jî weke "karyerîstiyê" dinirxîne. Ji bo nêzîkbûnê

birayê min ên li qerekolê raber kirine re jî dibêje; “ma wisa çêbû? Û çend xoleyan bêdeng ma û hewl dida fêm bike. Min jê re got; “ez helwestê we jî rast nabînim, yek ji we pêşniyarên ji rêveberiya navendî nexwest û we xwe paşve kişand.” Weke din jî min xwest rewşa li Dîlokê hatiye jiyîn hê berfirehtir hîn bibim, wî jî vegot:

Ya rastî tiştek yekser bi min ve têkildar tine bû. Lê qadem di bin berpirsyariya min de bû. Ew her du kesên ku destê wan de kuştina Haqî de hebûn, paşê bi zanebûn gotinên weke du gurubên “Apo’yî, Heqî’yan” weke k udu pêşeng hene belav kirin. Rewşên weke gelek hevalên durist bûn parçeyek vê lîstokê û her wiha gelek tiştên din ên hatine jiyîn. Ya rastî di demek kin de her tişt hat fêmkirin, lê texrîbatên mezin avakirin. Jixwe her du kes jî hatin cezakirin. Hevalên ku ketibûn bin bandora wan de jî cardin hatin qezenckirin. Dîlok, qadek ku em dikarin gelek pêşketinan lê ava bikine. Banroda hevalê Heqî gelekî heye. Jixwe ne vala hedef girtin. Şahadeta wî pêşketinek cuda ava kir. Ger tevdîra van tevan di dema wê de bihata girtin, me dikariya em zûtir pêşî lê bigirin. Endamek rêxistinê divê li ser her pirsgirêkê serwer be. Nexwe dê ewlekariya rêxistinê i destê çend kesên wisa serserî xirab bibe. Dê ji vir û şûnde jî rewşên bi vî rengî rû bidin. Niha jî kesên ku di bin bandora wan de ne hene. Dibe ku dest bavêjin Dêrsim û Elezîzê jî. Hinek tîp hene, ew pir hêsan tên meşandin.”

Min hemû guhdar kir. Dema em li Çewlikê bûn, mijarên ku Ayten li mala Zekî axavî hatin bîra min. Li ser her kesê şik ava kiribû. Li Dêrsimê jî bûyer hê tevlîhevtir bûn. Gelek kes wê demê tevlî van tiştan bibû. Ayten û Resul jî yek ji wan bû.

Cardin got; “tenê Rêbertî heye, li Dêrsimê jî hevalê Elî Heyder Qaytan heye. Divê mirov bi wan bawer be. Hinek tişt hene.” Ne dixwest hinek tiştan bêje.

Min jî bi acizbûn got; tu çi dibêjî, vekirî bi-axive, çi bû, ma ev nêrînê hevalan ê fermî ye, ev jî ji kur derketin? Ez jî zêde ji Resul hez nakim, lê kesek ku Partiyê li qadê erkdar kiriye. Ger tiştek wisa hebe, dê tevger destwerdê. Ger tiştek hebe û pêwîst e ji min re jî were gotin, ji kerema xwe re bêje. Nexwe ne hewceye ku tu zêde zehmetiyê bidî xwe.” Ji ber Ayten pir baş dizaniya ku mijarên kesî eleqeder nakine. Sirên tevgerê li her derê ne dihat axaftin. Ger ew dizane, yan jî ji bilî wî her kes dizane, ti xeterî nebû ku j imin re jî bêje. Ne dibxû jî. Axaftinên xwe qut qutî dikir. Got;

“dibe ku Sevîm Kaya biçe Enqereyê. Wê Hamilî bibîne. Tu dizanî ew di girtîgehê de ye. Wê rewşên heyî ji wî re bêje û bizanibe helwestên wî çine. Tirkan jî çûye cem Elî Gûndûz wan. Ew jî li girtîgeha Dêrsimê ne. Wê li hinek cihên ku hatine destnîşankirin bi van hevalan re bi-axivin û nêrînên wan bigirin. Qaşo wê li gorî xwe rixistinê ji sîxûr û yên şik li ser wan hene rizgar bikin! Alîkariyê digerin. Tam ehmekiyeke (aptallik)! Kes ne di wê ferqê de ye ku çi qas dijî rêxistinê tevdigere. Ya herî girîng jî ne di wê zanebûnê de ku tên bikar anîn. Rast şaş gelek tiştan bi hev re girê didin, kes di derbarê bûyeran de dinirxînin û pênaseya dikin. Serê wan bi vî rengî hatiye şêlokirin. Ew bi xwe jî bi heman tiştan seriya şêlo dikin.

Guman ji Cemîle hebû. Digotin di girtina hevalê Elî Heyder de destê wê heye. Heta digotin hineka dîtiye ku Cemîle çûye qerekolê. Dîsa bûyera kuştina hevalê Heqî pir vedilêrin.

Digotin wê gotina ne ji hêla Stêrka Sor, ji ber sedema nakokiyên navxweyî hatiye kuştin, lêkolîn bikin. Ji bona ez tenê bi te bawer im j ite re dibêjim. Agahiya kesekê tineye ku ez van ji te re dibêjim. Zêde kes van bûyeran nizane."

Min wê şevê ev bûyer tev li cem xwe şîrove kirin. Min ji Ayten re jî got; "min tiştek ji gotinên te fêm nekir. Li gora te kes di tevgerê de nemaye. Ger ne henek bin, ev îdîayên cidî ne. Ji ber ez qet qane nebûm û baweriya min van tine ye. Ez tevlî nêrîn û nirxandinên tevgerê yên fermî dibim. Ezê baldar nêzî wan bibim. Dîsa jî ev mijarên pir ecêb in!"

Ji ber ji min re gotibû, ne rehet bû. Dibe ku ew li Dêrsimê hişyar kiribin. Me her tim ji bona bavê Ayten digot; "kesek ne baş e." Rastî jî wisa bû. Malbat û binesaziya derdora wî jî wisa bû. Heta ji bona aliyê dayîkê re digotin dînê xwe gunertine. Na gelo ev ji kur derketin. Ji bo hemû malbatê jî çi dibe bila bibe ne girîng bû. Lê dîsa jî gelek tişt gotibûn. Gelo dibe ku nêrînên wê bi xwe bin?

Paşê dema ez çûm Dêrsimê min ji hevalê Elî Heyder Kaytan re vegotibû. Me tesadufî hev dît. Dema ez çûm mala Qiymet tiştên ku min dîtin, dîsa dema ez çûyîm mala keç xala min Fadîme Yildirim tiştên ber çavên min ketin, nêzîkbûn, axaftin û helwestên çend hevalan ên weke wê, ez mat kiribûm. Ji bo li keçek faşîst dabûn polîs li wan digeriyan. Lewma demekê li mala Qiymet diman. Ji ber şêwaza jiyan û têkîliyên wê ew sermest kiribûn. Beriya wê tiştên gelekî pîroz û bi nirx dihatin dîtin, niha kena xwe bi wan dikirin û ser di-axivîn. Zewaca Qiymet, weke zewacek mînak, pir şoreşger û bêhempa îlan dikirin.

Gelo çi bibû, tişta ku mînak bihata girtin çi bû? Gelo ji bona ku sazûmaniya têkîliya civakê li hember hevjînê xwe berovajî nêzîkbûnên zilam ê kevneşop dimeşand ji ber wê bû? Min rojekê hinek tişt dîtin. Ji hevjînê xwe re; "Zilfo, zû rabe çayê çêke. Ew zarok çima digirî, te binê wî paqiş kiriye?" Ferman didan. Gelo ev bû jina azad, an jî zewaca şoreşgerî yekbûn? Ez bawerim van keçên me mejiyê xwe xwarine! Min ji Fadîme re got; "çi dibe, hûn pir hatine guhertin." Wê jî got; "rast e." Divê ez van mijaran tevan ji hevalan re ragihînim. Dihizirim biçim hevalê Elî Heyder Qeytan bibînim. Dema me ev mijar nîqaş dikir, hevalek hat got:

"De xwe amade bikin, li gund dawet heye. Wê heval jî li wê derê bicivin." Dema min jî yekser pirsî, "gelo kekê Heyder jî li wir e?" Bersivand, "nizanim!" Ez jî bi wan re li dolmuşê suwar bûm û çûm. Lê hê em ne gihabûn nîvê rê dolmuş dan rawestandin. Hevalê Elî Heyder jî hebû. Min çûn xwe ya vê carê de cara yekê bû ew didît.

Pirsî; "ma tu jî hatî dawetê?"

Min jî erê kir û jê re got ez li wî digerim, dixwazim bi-axivim. Weke ku karek pir lezgîn hebû di nava liv û tevgerê de bû. Di heman demê de hem pir bi hêrs û pir bê hedar dema got; " hinek tişt hene, em ji ona wê hatine. Emê dîsa vegerin. Tu jî were! Hinek lîstok dizivirin", min mijar hinek din vekir.

Min tiştên ku Ayten li Çewlikê gotîn û rewşa Fadîme ew di nav de dijîn tev jê re vegotin. Min got; "hema bêje xwe winda kirine." Got; "temam emê paşê berfireh bi-axivin." Em vegeriyan. Em çûn mala ku Elî Dexîrmencî lê diman. Salvegera şahadeta hevalê Heqî ya yekemîn bû. Daxwiyanî

hebûn. Diviya ew jî li derdorek berfireh bihatan belavkirin. Li dijî propagandeya reşkirinê ya dijmin bi riya hinek baskên xwe belav dikir, bi her awayî hêjayî kesayeta hevalê Heqî bîranîn gelekî girîng bû. Ez, Kazim Kulu û Gûlîstan bi hev re çûn. Em li gelek gundan geriyan. Em ji Millî çûn heta Gûleçê. Civîn jî li wir hat lidarxistin. Li vir gelek tişt zelal bûn.

Her çendî li Dêrsimê jî provakasyonek hizbî heman weke ya li Dîlokê hatî avakirin di asta xwe de hinek xirabî dabin çêkirin, bê ku xirabiyên cidî pêş bikevin pêşî lê hati girtin. Bes vê di heman demê de rastiyek jî diyar kiribû. Ji ber her ku dijmin di nava me de zemînê lewaz didît, bi vî rengî êrîş dikir. Lewm agirîngiya têkoşîna çînatî gelekî girîng bû. Hinek ma bû bi ji gotinekê, yan jî bi nirxandinekê hemû qadroyên tevgerê xayîn werin dîtin û şik li ser wan pêş bikeve. Xwe jî rizgarvan didan nîşan û pir hêsaz ji provakasyonan re dibûn amûr. Ev rewş jî hişt ku Tevger endamên xwe baştir binase, lewaziyan bibîne û li gorî vê tedbîran bigire. Bi rastî jî heta ku hinek tişt neyên jiyîn nayên fêmkirin û ferqkirin.

Dema hevalê Cemîl rewşa li Dîlokê vegot, min jî hewl da ku girêdana wê bi bûyerên li Dêrsimê rû dayîn ve çêkim. Demek tedbîr ne tenê li dijî derve girêdana bi rêgezên rêxistinê ve û parastina bîrdoziyê bû. Di heman demê de divê kesayetên navxweyî jî bên nasîn, xwe baş nasîn, hişyarî, her gotin bi çi armancî tê gotin û tê pêkan baş werin fêmkirin û şopandin. Mixabin em pirsgirêkan çi qas saf û bi niyeta paqij digirin dest.

Em ne büroya zewacê ne!

Piştî em ji kongreya damezirandinê vegeriyan ji bona me pêvajoyek nû destpê kir. Êdî em PKK'yî bûn. Partiya me hatibû damezirandin, bername û rêziknameya me ava bibû. Ez hîna di bin bandora tiştên ku jiyan kirî de bûm. Dema em li kongre bûn her tişt dihat nîqaşkirin. Lewma bandora wê zêde dernediket. Ya rastî min giranî û kûrbûna nû jiyan dikir. Min beşdarbûna xwe ya kongreye weke cewziyek ne didît. Heta her ku dihat bîra min, min didît ez di civînan de pirsgirêkan çawa digirim dest, asta nêzîkbûn û nirxandinên min, çi qas ji rêzê û paşverû ne, min şerim dikir û mehçup dimam. Lê di heman deme de ji bona min kêfxweşî û gurur bû. Ev giraniya xwe zêdetir derdixist pêş. Pirsgirêk, jiyan û pevçûn ji bona ne zehmet bûn. Ji bon amin jiyan wisa xwezayî, wisa balkêş, bedew bû, çoş dida, ez tiştek ku nekaribim bikim û nekarim derbas bikim ne dihizirîm.

Ji bona min ti aliyê jiyanê ne biyanî bû. Ger ez têra wê ne kiribam jî! Ez ne diperçiqîm. Hestek weke ku min jiyaneke din jiyan ne kiriye bi min re hebû. Bandora wan rojên tevlîhev, şopa wan hebe jî, tişta ku ez digirtim, dibiram, didam meşandin û dia jiyîn, xweşikbûna vê pevçûna şoreşgertî ya ku hêz dida bû. Min ti caran gumanên weke "ezê biçim kuderê, emê biçin kur, çi dibe, wê çi bibe" ne jiya û çênebû. Ji ber têkoşîn bi tiştên hewce û divê werin kirin ve dagirtî bû; ma her kêlî jî tişta ku dihat jiyîn ne ev bû? Piştî ku bawerî, girêdan û armanc heye, tiştên din ne girîng in û ne xeme.

Wê hevalê Cemîl li ser vesazî û peywirên hewce û nîtelîka dema nû rawest e û paşê biçûya. Ne zelal be jî, wisa dihat texmînkirin. Komîteya Herêma Elezîzê ji Elî Gunduz, Hisên Topgûder, Metîn Gûngoze, Hamilî Yildirim û ez pênc kesan ava dibû. Komîteyên jêrîn jî hebûn. Di civînê de hat nîqaşkirin ku kî peywir bigire. Qad berfireh dibû. Pertek, Çemîşgezek, Hozat, Qarakoçan û Meletî jî qadên me yên xebatê bûn. Destpêkê ji bo xebatên Meletî hevalê Silêman Aslan hizirîne. Heta demekê li wir kar jî kiriye. Paşê hevalê Aytekîn hat erkdarkirin. Beriya wê çend hevalên ku li wir kar dikirin hebûn. Ew jî ji bo xebatan hatin destgirtin. Ya rastî dikariya derketinek baş bihata kirin. Hevalan digot; "qadroyên hêza xwe ya rêxistinkirinê û li ser polîtîkayê serwer hebin, dê xebat zû pêş bikevin". Me li gel kesî behsa dameirandina partî û kongreye nekir. Ji ber heta demekê vaşartî bima. Lê dîsa jî zîndewariya di kar de û vesaziyên nû dida hîskirin ku hinek pêşketinên rêxistinî hene.

Hewl didan weke heman yên li Dîlok û Dêrsimê hatine ceribandin, li vir jî were kirin. Lê ev rêbaz negirt. Du kesên ku li Dîlokê hatibûn kuştin dixistin rojevê. Dîsa gotinên weke; "qadroyên xwecihî nayên pejirandin, her tim qadroyên biyanî li Elezîzê di asta hetî jor de kar erk girtin. Lê yên li Elezîzê kar dan destpêkirin qadroyên xwecihî bûn, yên ji derve de hatine li ser keda wan rûniştine, neheqî tê kirin" pêş diketin. Destpêkê dihat hizirîn ku ji ber nêzîkbûnên hevalan yên teng û vesaziyên peywiran baş ne dane fêmkirin lewma ev rewş derketine, li çend cihan bi hevalan re nîqaş çêbûn. Îkna kiribûn. Me tiştên wisa zêde cidî negirtin. Lewma paşê ev rewş giha halek wisa ku heta bû pirsgirêk. Hevalê Cemîl gotibû; "dibe ku dijmin yekser êrîş bike" û em div ê mijarê de hişyar kiribûn.

Me di navbera xwe de nîqaş dikir gelo dijmin wê çawa êrîş bike, wê bixwazibe çi bike. Me hinek nirxandinên weke; "dibe ku dijmin ji aliye fîzîkî ve jî yekser êrîşî hink qadroyan bike û tevlîheviyan derbixe" jî dikir. Lê me ne dikariya em tiştên hîn zelaltir vebêjin. Me nêrînên xwe bi hevalê Cemîl re jî parve kiribû. Lê wî digot; "dibe ku dijmin bêyî îmha bike jî êrîş bike".

Me vê carê pirsî; "gelo dibe ku bixe girtîgehan?" Wî jî got; " raste dibe. Lewma divê em ji her tiştî re amade bin".

Di nava me de gelek heval bi navber di hinek pêvajoyan de ketibûn girtîgehan û derketibûn. Lê hinek hê jî girtîbûn. Heval Elî Heyder Kaytan, hevalê Hamilî, Elî Gunduz wan, hevalê Kemal Pîr, Dîlawer, Kemal Çoşkun-Bozo hê jî girtîbûn û hinek nû derketibûn. Lê belê, yê yekemîn û demdirêj girtî mayîn D.A wan bûn. Bûyera kuştina Mistefa Çamlibel, bû sedem ku dehan zêdetir heval werin girtin. Ya rastî hevalan girêdana wê ya bi rêxistinê re qebûl nekiribûn. Darezîn weke dozek adlî berdewam dikir.

D.A. ji girtîgeha Agirî surgunî girtîgeha Nîxde bibû. Tevî ku hinek amadekarî kiribûn, dîsa jî nekarîbûn ji girtîgehê birevin. Gelo kêmasî di kur de bû? Peywendiyên me zêde bi wan re tinebûn. Carinan dinivîsandin. Me ji wir hinek agahî digirtin. Hevjîna wî jî nameyên wî berhev dikirin. D.A. yek du caran çûbû serdanê jî. D.A. di her nameya xwe de helbest nivîsandibûn. Hevjîna wî ji şerman sor dibû. Lê helbestên ji bona wê hatine nivîsandin jî ew kêfxweş dikir. Pir hestiyar bû, lê ti caran ne dixwest bi rêxistinê re bikeve girêdanekê çêbike. Hê jî wê dûrbûnê dijî. Ji hevalan hez dikir, alîkariya madî dikir, carinan tiştên ku dikariya bike dikir. Lê ti caran ji rewşa xwe ya xwîşk an jî hewayê keça ciwan dernediket.

Xwediyê mala ku em lê diman li qata jor dima. Em piranî bi keçên dervî taxê re mijûl dibûn. Ji ber diviyabû xebatên me bal ne kişandiban. Lê keça malxweyê me Xatun baldar nêz dibû. Ferq kiribû ku em şoreşger in. Ji bere w jî ji vê meseleye re vekirî bû, em jî pê re eleqeder bûn. Bavê keçe kemalîsteke ji Pertek-Tozkoparanê bû. Dayîk jinek bindest û xemgîn bû. Keça wan a mezin hîna li gund bûye, bi lawikek ku jê hez dike re direvê. Ya rastî lawik tê dixwaze, nadinê, ew jî dibêje; "em birevin". Diçe çiyayekê û dixwaze keçik jî biçe wir. Keçik jî diçe wir û bi hev re diaxivin. Keçik malbata xwe difikire. Dibêje ku wê ev rev baş neye şîrovekirin, rê fesadiyan re veke. Lewma di mijara zewacê de malbat qanekirin hîn baştire û di nêrînên xwe de israr dike. Lawik jî qane dibe û dibêje "temam". Roja paştir keçik cardin yekser vedigerê malê. Lawik jî diçe bajareke din. Lê vê pirsgirêkê çareser nake. Her tiştî hê zêdetir xirab dike. Fesadî din ava gund de belav dibe. Her kes dibêje; "lawik, keçik qirêj kiriye û reviye". Keçik bêzar dibe. Her tiştî ji dayîka xwe re dibêje. Tika ji bavê xwe dike. Dibêje; "ne rast e. Deste xwe nedaye min" û rewşa heyî bi temamî ji wan re dibêje. Lê mixabin kes jê bawer nake.

Yeter, keçek bakire bû û 'dest lê neketibû'. Lê ne malbat, ne jî gele gund bawer nedikir. Bav bêrehim bû. Digot; "te sere min tewandiye ber min" û cuda jî tiştek nedigot. Nikare xwe bigihîne lawik. Ger xwe bigahandayê wê destpêkê ew bikuşta. Li gorî wî ya herî baş keçik paqijkirin bû. Lewma her digot; "te namusa me kiriye pênc quruş xw qirêj kiriye" û ser de jî dikuje. Pey re bav xwe diparêze û dibêjin wê xwe kuştiye. Piştî ku dimêre keçê dibin kontrolê û dibinin ku xame, keçike. Vê carê jî malbet bêzar dibe. Bav jî ji ber ezaba wijdana xwe perişan

dibe. Dayîk jî ji ber tevî ku keça xwe bawer dike, lê ber tirsa hevjînê xwe denge xwe nake pir xembar e. Her mijar vedibû digot; "zilamo, hay li xwe hebe, ew keça me ye. Her tişt ji min re got. Ez dayîka wê me. Tiştekê j imin venaşêre. Ew qasî ser de nece", dile wê jî têşand, hakaret lê dikir û lê dida. Lewma ew jî tevkarê vî sucî bû. Xwe weke tevkarê q etla keça xwe didît. Tevî ku sal serde bihurîbûn, ew jin reben bû! Li hember hevjînê xwe jî sar bû.

Lewma nêzîkbûnên wan ji keça malê Xatun re hîn nerimtir bû. Tozkoparan jî di bin bandora komên din de mabû. Dilxwazê PDA bûn, lê diyar bû ku ji hevpeyvînên me jî bandor dibûn. Dixwest hîn bibe û ji pêşketinê re vekirîbû. Lewma me ew vala nedihişt. Di qeta binî ya avahiya miqabilî mala wan de, hinek ciwanên ku li anîngeha Firatê dixwedin hebûn. Ji cihên cuda hatibûn. Di nava wan de jî Eliyê ji Qersê hebû. Hevalê mebû. Ew demek bû li wê malê bûn, lê me ne dizaniya peywendiyên wan d içi astê de ne û çawa pêş ketiye. Lê bele, Eliyê ji Qersê gotiye ku ji Xatunê hez dike û pêşniyar kiriye wê ji malbatê bixwaze. Heval jî Xatunê nas dike. Ji ber dema dihat malê û diçû pirs dikir û dida axaftin. Wî jî digot; " divê em qezenc bikin, jîr e û jêhatî ye". Dema hevalê Elî rewş vekir, em bi hev re çûn mala Xatun. Destpêkê sohbeta peywendiyên me di asta xwediyê malê û kirêdarî de destpê kir. Paşê mijar heta "xwestina keçe" dirêj bû.

Jixwe zilam weke peyv jî li hember peyva Kurdistanê aciz e. Ji Osmaniyan digirt, heta Tirkan me çawan bi hev re jiyan kiriye pênase dikir. Heta digot di serî de baskên Tirkan çawa hatine helandin, di bin zexta Kurdan de çi êş kişandine. Tam feraseta dîroka Tirkên nijadperest û şoven bû! Zilamek pir

înkarcî bû. Em jî beramberî vê pir hêrs bûn. Lê bele em jî pir înatçî bûn. Heval jî carinan di navberê de hişk dibûn! Êdî zilam jî cidî digirt û guhdar dikir, di hinek xalan de jî maf dida hevalan. Paşê nerim dibû. Hevalan jî ji vî halê wî yê nerim sûd wergirt û nîqaş vekirin. Dema zilam zanî hevalê Elî ji Qersê û Sunî ye, vê carê jî nakokiya Elewî û Suniyan derxist holê. Her digot; "e keça xwe nadim Suniyan". Lê ji ber Elî zanîngeh xwedibû bala wan dikişand. Gotina wî ya; " yek du caran min jî dîtiye, dişibe miroveke rêzdar", nerimbûna wî dida diyarkirin. Me zêde dirêj nekir, ev tene ceribandinek bû. Bi armanca malbat bandor kirin û bi xwe ve girêdanê hatibû kirin. Ger keçik bi pîvan (tutarli)ba, wê şoreşgertiyê bike, dê israra wê ya di şoreşgertiyê de pirsgirêk jî çareser bikira. Lewma şi şûna k udi carekê de encamê bigirin, ji deme re hiştin baştir hat dîtin.

Ji bona keçek ji malê were veqetandin, yekîneyên bi vî rengî weke amûr dihatin dîtin. Lê dema nêzîkbûnên rast ne hatiban kirin, paşê jî dibûn pirsgirêkên mijûlkirinê. Di heman deme de pirsgirêka zewacê ya xwîşka Sakîne Kirmizitaş a mamoste bû jî ket rojevê. Alîgirê me bûn û beriya wê deme jî peywendiyên wan hebûn. Niha jî bi me dişêwirîn, dixwest zewacê pêk bîne. Lê dixwesta em erê bikin. Hevalê Cemîl jî nîv henek, nîv cidî got; " wisa biçe emê şîrketa zewacê ava bikin, ev çiye? Çi dixwazin bila bikin, ma em ne bîroya zewacê ne".

Êdî her kesê ku bi çi şêweyî dibe bila bibe girêdanê xwe hene û malbatan hemû pirsgirêkên xwe yên di her astê de ji partî re vedikirin. Dixwestan ku rêxistin çareser bike. Ya herî rast û xwezayî bihata kirin jî ev bû. Her ku tevger weke hêz

dîtin, pê bawer kirin, xwestek û mêhlên ku hewl dide li gorî wê teşe bide jiyana xwe pêş diket û ferz dibûn, peywendî jî berfireh dibûn. Dibe ku her pirsgirêk di heman kêliyê û di asta dihat xwestin de çareser nedibû. Lê bele, ev dibû sedem ku qadro xwe ji her alî ve pêş bixin, xwe ji asta teng a rêxistina hundurîn rizgar bikin. Di vê wateyê de ji pirsgirêkên jiyanî re buna bersiv, di kesan de jî taybetmendî û pîvan dida qezenckirin.

Êşên ku gel dijî hîskirin bi şoreşê ve dide girêdan

Ez çûm gereke ku tam liqayî wextê bêhnvedana Sömestre hat. Li dibistanên weke koleja keçan a hüner û tendirustiyê bi dehan keçên ciwan ên me peywendî bi wan re pêş xistîn hebûn. Dê biçûna qadên weke Sîwerek, Çermîk, Çûngûş, Maden û Kebanê. Heta beriya bêhnvedanê peywendiyên bi gelek hevalan re hêvî didan. Me gelek hevalên ku bikaribin derdora xwe birêxistin û bandor bike, herî kêm bikaribe navbeynkarî bike destnîşan kiribû. Ji bilî vê me li maleke Yildiz Baxlarê civîneke nêzî heştî keçên ciwan beşdar bûyîn lidar xistibû. Dibistanên nêz ên weke dibistanên keçan a hüner û mamostetiyê, dibistana amadeyi ya bazirganiyê Cahîde birêxistin kiribû. Bi çend hevalan re me ew keç bir ê û koçeyên cuda re ew heta Yildiz Baxlarê anîbûn. Dibistana amadeyi ya bi navê Ataturk û derdora wê ya nêz jî Nadîre birêxistin kiribû. Koleja tendirustî û derdora wê jî Maqbûle birêxistin kiribû. Ango pişti nîvro hemû keç hatibûn civînê.

Me guncav dît ku heval Cemîl di civînê de baxive. Lê wî qebul nekir. Jixwe dema me dît hejmar ew qas pir e, kesekê xwe neda ber ku baxivê. Ger pirsgirêka cih nebûya wê hejmar heta sedî jî derbas bikira. Herî dawî biryar hat girtin ku Elî Gunduz baxive. Wî jî vekirî got; “ez şerim dikim.”

Piştî nîaşa me ya li ser wî digot wê tu biçî, yê din digot tu, ez û Elî bi hev re çûn civînê. Dema em ji derî ve ketin hundur tevahî heval ber me ve rabûn. Ew dîmenên ciddiyet û bendêmayînek bi mereq pir xweş bû. Hinek heval li bende bûn ku hevalê Cemîl baxive. Lê weke nav ji bona wan zêde ferq nedikir ku kî baxive. Di vê hejmarê de hatine hevalan ya gel hev heyecan û kêfxweşî dida. Gelek hevalan cara yeke bû ku hevûdû didîtin. Her koma perwerde bi hev re didîtan, wer dihesibandan ku ji xeynî wan kes tine ye. Hesî wisa dizaniya. Bi taybet dibistan an jî taxên ku ji hev dürbün wisa dihizirîn. Elî, di çarçoveya me hevbeş destnîşan kirî de axivî. Destpêkê pêşketinên siyasî, taybetmendiya pêvajoya em di navê de dijîn vegot, pey re di civaka Kurdistanê de rola jin a din ava têkoşîna rizgariya netewî pênase kir. Di vê mijarê de astek lêgerîn û lêkolînek pir cidî nebe jî, ziman û uslubê wî yê propagan de û ajîtasyonê pir xurt bû. Bandorker bû. Di navberê de jî j imin û Meral dipirsî gelo tiştek kêm maye yan ne. Me jî li ser lênûsa li pêşiya wî mijarên hewce didît dinivîsand û wisa tanî bîra wî. Axaftinek pir dewlemend nebe jî, li gorî destpêk bû baş bû.

Hevalan hinek pirs jî kirin. Paşê civîn bi dawî bû. Dîsa bi heman sazûmaniyê her kes derbasî cihê xwe bû. Moralek pir balkêş hebû. Em jî şanaz bibûn. Ew qas hevalên jin ne kêm bûn. Civîna me li gelek kolanan dihat axaftin. Hejmar hîn zêdetir dinepixandin û agahî didan hev. Kolana ku me lê civîn

lidarxistibû herî kêm deh keçên ku civîn çêdikirin, an jî perwerdê de dîtibûn. Lewma hema beje hemû malbat der barê keçên xwe de bi guman bûn. Peywendiyên heyî pir xeter nebinin jî, din ava xwe de helwestên bi tirs, astengkirin û zehmetî derxistinê de hebûn. Dema ew qas keç li gel hev didîtan dizaniyan ku ya ku dixwaze şoreşgertiyê bike keça wan tenê nîne. Bi dehan keçên ciwan ên bedew, bi aqil û diçûn dibistanê hebûn. Mane her kes ne dîn bû. Aqilê xwe winda nekiribû.

Ger bi wan hevalan re piştî civînek wisa li cihê kul ê ne jî peywendiyên somut û nêz were sazkirin, dikariya veguhere peywendiyên mayînde û peywendiyên rêxistinî. Plansaziya min a gerê jî bi vê armancê bû. Hem ew ji nêz ve naskirin, derdora malbata wan û xisletên kesayetên wan naskirin, ên têkûz, dikare pêş bikeve, kapasîteya dikarin hinek tiştan bikin kirina nava tevgerê, bi yên din re jî bi şêweyên cur be cur girêdanek avakirin pêwîst bû. Ji ber ger şoreşgertiya jinê pêş biketa, ketina nava malbatan û bidestxistina derdor hêsan bû. Bi vî armancî min ev ger jî plan kiribû.

Me biryar da ku em di vegerê de serdana Madenê bikin. Cihê destpêkê em biçinê Sîwerek bû. Cahîde, Hawa û hîna gelek din di otobusê de hebûn. Hawa zeîf, bêdeng, girtî bû. Lê dilopand, guhdar dikir û hewl dida fêm bike. Cahîde hîna di rê de bû plansazî çêdikir. Hesab dikir bê ka em dikarin biçin kuderê. Bi Hawa re li ser navan nîqaş dikir. Dihizirîn ku heta dema ez bimînim dikarin çi bikin. Ez bi vê hizra vê kêfxweş dibûm. Jêhatî û rêxistinbûna wê hêvî dida. Hinekê behsa malbata xwe kiribû. Heta weke serpêhatiya xwe jî nivîsandibû.

Di rapora xwe de aliyên dayîk, bav û xwîşkên xwe yên mezin balkêş dabû nasîn. Bi taybet xwîşka xwe dirêj nivîsandibû. Min jî teşfîk dikir. Min digot; “bila her kes jinên herêmên xwe, taybetmendiyên wan şêwaza jiyana wan vebêje.” Li dibistanê çend nivîsên bi vî rengî jî pêş xistibûn. Min hewl dida rewşa her herêmê, rewşa jinê ya di herêmê û kesane fêm bikim. Lêkolînek wisa, ji bona min baş û hînker bû.

Bi Qerecedax, Harran re ew navçeya Riha ya bi navûdeng Sîwerek dîtin heyecanek mezin dida min. Sîwerek li naverastek rast û berfireh hatibû sazkirin. Pir zêde pêşketî nebe jî, navçeyek mezin bû.

Min ji Cahîde re got; “navçeya we ji Dêrsimê mezintire. Lê çiyayê me pir in, daristanên me pir in û xwezayek xwe ya harîka heye”. Wan jî dixwest Dêrsimê bibinin. Cahîde jî bi rûkenî got; “ez jî biçim Dêrsimê û li wir kar bikin”. Diyar dibû ku xwesetê xebatê heye. Xwe ji xebatek pispor re amade dikir. Ez hizirîm ku, “ger ev nêzîkbûn heye, wê pir zû pêş bikeve”.

Mal a wan bû. Piraniya malen li Sîverekê yek qatî bûn. Hewşên wan ên weke hewşên girtîgehan dîwarên pêşî bilind hebûn. Di kolanan de jinên bi çarik hebûn. Bilindbûna dîwaran pir bala min kişand. Dema min pirsî çima wisa ne, Cahîde yekser behsa binesaziya eşîretên Sîwerekê û dozên xwînê kir. Bele, dozên xwînê! Ji ber vê sedemê her kesî cihê lê dijiya kiribû weke girtîgehê. Ango bilindûna dîwaran bi armanca parastinê bû.

Mal qelebalix bû. Dayîk, xwîşkên mezin û biçûk, heman biçûkên din û hwd. Gelekî dihat û diçûn. Çavên jina bi navê Emîne dişibiya yên Ermeniyan. Çavên wê gir bûn. Derûdora

çavên wê reş û şîn bû. Xwîşkên wê yên mezin jî wisa bûn. Hemû jin dişibiyan hev. Piraniya wan qelewbûn. Yekser şêranî danîn ber me. Demek ji ber vê bû bi navê "Eliyê Koç ê tatlî firoş" an jî "tatlî firoş" dihatin binavkirin. Cahîde beriya hingê jî gotibû debara xwe bi firotina şêraniyan dikin. Bavê wan bê ked bû. Li malê jinan kar dikir. Di nava civakê de kêm caran dihat dîtin ku zilam bi keda jinê debara xwe dikin. Di heman demê de "ereq" vedixwar, qumar dilîst û bi jineke din re jî dijiya. Ev rewş ji aliye hemû endamên malbatê ve dihat zanîn. Jina malê Emîne ev rewş qet nedipejirand, tiştek jî ji dest ve nedihat. Xwîşkên mezin bi lawên bîbîyên wê re zeicîbûn, zaroên wê jî hebû. Lê Remezan keçek din jî anîbû. Ev jî bibû sedem ku ya din devjê berde. Tevî k udi serî de jinê bi xwe erê kiriye, paşê hewî hezim nekiriye. Tişta balkêş jî ev hemû weke rewşên asayî ne û hîn bûne. Belê, lewma tam div ê malê û navendê de şoreşgertiya jinê pêşxistin hewce dikir.

Min her tim ji xwe re digot; 'mîsoger divê çend ji van bibin militan'. Dihizirîm ku ger Cahîde pêşveçûnek ava bikira wê yên din jî li pey wê biherikiyan. Ji ber Cahîde li malê bibandor bû. Ji ber dixwenda beramber wê rêzdariyek jî hebû. Demek dirêj cihe maye, li dibistanên şeve maye û niha jî dip ola dawî de dixwend. Wê di demek nêz de biba mamoste. Ev hemû dibûn sedem ku hemû malbat li hember baldar û rêzdar be. Ev nêzîkbûn di tevahî karên wê yên weke karên malê, çûna sûkê, civînên me û gerên me de diyar dibûn.

Ez weke hevalê xwe yê dibistanê dam nasîn. Navê min jî Fatma bû. Lê cewaziya peywendiyên di navbera me de bala wan dikişand. Her tişt dişopandin. Ji ber peywendiyên asayî û ji rêzê yên bi hevalên wê yên din re pêş dixist, bi me re

dernediketin. Lewma yekser bala wan dikişand. Nevîn di heman şeve de çenteyê min li hev dixe û nasnameya min nas kiribû. Sibehê ji Cahîde re dibêje navê wê ne Fatma, Sakîne ye. Cahîde jî xwe pê re aciz dike û dibêje; "ma ne eybe tu çenteyê mêvanan tevlîhev dikî". Nevîn her tişt pir mereq dikir. Lê ev nêîkbûnê wê ez jî pir aciz kiribûm. Ne terbiyek baş bû. Xwarziyên Karasungur jî heman tişt kiribûn û hînî nasnameya min bibûn. Çi qas keçên bi mereq in!

Cahîde roja paştir hinek keçên ku dinase, dixwazin şoreşgertiyê bikin, an jî beriya wê demekê dilxwazê komên din bûne û bi wan re peywendî pêş xistine, lê pê bawer e werin qeenckirin anibû malê. Ji ber ji dûr ji bona bêhnvedana dibistanê hatiye malê, bi xwezayî hatin û çûnên malê, yanê serdan zêde dibûn. Hatina gelek kesan an jî vexwendin pir asayî bû. Di nava wan de keçek jî linge xwe kolek bû, bi daran digeriya. Dilxwazê Komaleya Çanda Şoreger a Rojhilat (DDKD) bû. Hinek tişt bihîstine, fêr bûye, lê ji ber cewhera pirsgirêkê tam fêm nekiriye û rastiya Kurdistanê baş nedizaniya, gelek ziwa, di hinek xalan de girtî bû û tehtîk dikir. Gelek peyvên ku jiber kirine, heta dibe ku ew bixwe jî wateya wan nedizaniya bikar tanî. Ne dihişt gotinek li ser KÇŞR (DDKD) were gotin.

Ji me re got; 'donkîşot, êrîşkar, maceravan" û her wiha ti nema ne got. Ev peyvên gelek komên ku ji bona me reş bikin û tehrîk bikin dihatin bikaranîn. Ez pir hêrs bûm. Em çend demjimêran axivîn, ên din hîn olgun nêz dibûn û hewl didan fêm bikin. Lê wê ji ber kompleksên xwe yên kesane ji bi me gelek gotinên ne guncav bikar anîn. Cahîde jî ji ber asta nîqaşê hatibû wê astê pir xemgîn bibû. Hewl dida min jî bihedirîne. Ez

ew qas hêrs bibûm min ji nişkê ve xwe winda kir. Jê re got; “biqele ji vir biçe. Tu bûyeran berovajî dikî. Axaftin û nîqaşan sabote dikî! Di heman deme de van tevan bi zanebûn dikî”. Kêmek mabû darê deste wê bigirim lê bixim.

Ji ber vê rewşê derketin çûn. Di rê de jî bi hev şer kirine. Yên din bi ser keça külek de çûne. Jêre gotine tu ne mafdarî. Bêhna min jî teng bibû. Ez bi wê hêrsê bi ser Cahîde de jî aciz bûm. Got; “tu çim abanî kesên bi vî rengî dikî?” Cahîde jî got; “bes ne wisa bû. Keçên ji guhertinê re vekirîne. Ew ne dizanebûna axaftinên xwe de ye. Ger hûn hinek din bêhnfereh buna ev encam dernediket. Hûn pir zû hêrs bûn”.

Rast bû. Ez div ê mijarê de zû teng û hêrs bûm. Cahîde bi rexneyên xwe hişê min anibû sere min. Min ji Cahîde pirsî; “gelo, dibe ku keçên din şaş fêm bikin”.

Got; “na! Mîsoger wê sibe ew kulek dîsa were, yan jî wê banî me bike. Wê niha biçe malê bifikire. Ya rastî pir hestiyar e. Ji ber gelek tiştan fêm nake, lewma wisa nêz bû. Weke din jî xwe pir diecibîne. Wer dihesibîne ku her tiştî baş dizane. Heta niha her tim bi yên asta wan weke me re axiviye û nîqaş kiriye. Cara yekeme we dibine. Ji ber hûn jî di kesayeta wê de bi ser KÇŞR (DDKD) de çûn, lewma dile xwe girt”. Diyar bû ku wê keça kulek baş nas dikir.

Diviyabû di nîqaşan de em neyên tehrîkan û zû hêrs nebûna. Ev jî j imin re bû dersek pir baş. Ya rastî me dikariya em van keçan pir hêsan bandor bikin. Ger şêwazek ku bala wan kişandiba hebûya, wê mîsoger bihatan qeenckirin. Min ev kêmasiya didît. Jixwe zû hêrsbûn jî qelsiyek cidî bû. Ev jî hewayek erênî ava nedikir. Ji ber wê emê liqayî gelek mirovên

din û yên weke vê re bihatan. Mane me nedikariya em bera wan bidin û bi ser wan de hêrs bibûna. Ez ji xwe re hizirîm ku, “divê ez herî zêde div an mijaran de baldar nêz bibim” û min soz da xwe êdî ezê zû hêrs nebûma.

Pir serve neçû ‘Naciya Kulek’ em vexwandin mala xwe. Ji ber texmînên Cahîde rast derketibûn, ez pir kêfxwe bibûm. Naciye ji ber nêzîkbûnên xwe yên şaş ku beriya niha derketibûn lêborîna xwe xwest. Paşê em dem dirêj axivîn. Piştî sohbete got; “êdî ti girêdana min a bi KÇŞR (DDKD) re nema”. Got ku wê hewl bide me weke tevger bi her awayî binase û hîn bibe. Nexasim div ê mijarê de ji me alîkarî jî xwest.

Me gera xwe ya li Sîwerekê domand. Cahîde ez birim gelek malen din. Em çûn cem mala bîbî jî. Bîbî xwîşka Eliyê Koç e. Hezkirî û jîr e. Mirovek xwedî taybetmendiyên Kurdînî û tevî temenê xwe zînde, li ser xwe û nêzî mijarên zanist û polîtîk bû. Heta ez fikirîm ku mîsoger Cahîde dişibe vê bîbiya xwe. Qarakeçîlî baskek Tirka ne. Lê demek dirêje bi çanda Kurdan re dijîn û wisa xemilîne. Cahîde digota; “pîrka min Ecem bû”. Malbatek têkilhev bû. Di nava malbatê de nasnavên weke kurê Ecem û keça Ecem hebûn. Li Sîwerekê peyva Ecem hema beje bi qasî nasnavê Koç Elî “Koço” nasnavên xwezayî bûn.

Bîbî dişibiya jineke mert. Wan jî debara xwe bi şêranî pêk tanîn. Lawên wê Remezan, M. Emîn, Şiyar û keçek wê hebû. Şiyar hîna biçûk bû. Li malê apê wan Şiyar û biçûkê wan ê birazî Şiyar hebû. Şiyarê birazî yê biçûk lawê Remezan bû. Tevî ku dayîka wî dev ji zilamê xwe berdabû, ew dîsa jî lawê her du aliyan bû! Bi hev re diman. Gelek caran çûn û hatinê

wan ê li cem hev hebû. Girêdana wan a xizimtî jî didoma. Ne wisa dijminê hev bûn. Lê dayîla Emîne ji Remezan hez nedikir. Dema Remezan dihat mala wan aciz dibû. Ji ber hewî anibû ser keça wê. Aciz bû û xeyîdî bû. Bîbî zêdetir ji ber vê rewşê pir xemgîn bû. Dile wê zêdetir dişewitiya, lê ne dida der. Peywendiyên xwe baş dimeşand.

Destpêkê zehmet bu ku mirov bê gengeşeyê fêm bike. Hinekê jî ecêp bû. Sazûmaniyek peywendiyên ew qas berovajî, ew qas bê wate û ew qas ketibû nav hev, ji mirov re xerîg dihat. Demek 'sazûmaniya malbata ku binesaziya civakî derxistî holê wisa bû'. Ev jî pir teng û pir rastiyên giştî ve dima. Mane di nava vê sazûmaniyê de çi hebû, çi tinebû?

Heta salên nêz jî malbat tev bi hev ji bona kare pembû diçûn Îmîr, Denîzlî, Aydin û Manîsa'yê. Bavê wê demek dirêj çawîstî kiriye. Li cem wan kargeriya demsalî ji zarokatî destpê dike. Ji Sîwerekê diçin heta Aydin û Manîsa. Li van deran kare pembû û çape kirin ne hêsan bû. Li mixabin li Kurdistanê jî aliyeke jiyanê ya din jî ev rastî bû. Jiyana gelek malbat û gelek qadan girêdayî vê bû.

Ez ji ber van rewşan pir hestiyar bibûm. Xizantiya gelê me, êş û jana heyî tev, dihişt ku ez hîn zêdetir bi têkoşînê ve werim girêdan. Pêdiviya herî sereke rêxistinkirin bû. Ji ber civak hatibû parçekirin, bi salan ketibû wê rewşê ne dikariyan li cem hev bimînin. Lewma kî çawa dixwest wisa dilîst û dagir dikir. Pêşiya vê jî girtin erka me ya sereke bû.

Min ev malbat jî bi tiştên ku dijiyan ve zêdetir hez dikir. Tevî hemû gengeşeyan, beramber bûyeran hêrs nedibûm, dihizirîm ku; "çi xweşe, jiyan bi hemû zehmetiyên wê ve

dîtine, jiyane, lewma wê şoreş û şoreşgertiyê jî herî zêde ev bixwazin". Bîbî jî dikariya weke milîtanekê kar bikira. Me ji wê re behsa dayîka Gorkî kir. Lê, na na! Wê li Kurdistanê dayîkên hîn zêdetir yaman derbiketan. Ez bi kûraniya dile xwe ve bi vê bawer bûm.

Peywendiyên malbatê zêde bi Koço re tinebûn. Weke mêvanekê li malê dima. Malbat jî fêrî tinebûna wî bibû. Ji ber her cara ew dihat keda wan desteser dikir, pere wan dibir. Ev jî bi malbatê re zêdetir bertek ava dikir. Gelek caran digotin; "xweziya biçûya û nehatiba". Lê dîsa jî Koço ji wan qut nebibû û nedixwesta qut jî bibe. Ji ber li wir pere hebûn. Xala ku herî zêde pê bandor dibûn jî, dema bavê wan ereq vedixwar li cihê xwe dima û diqêriya. Lewma gelek caran dema diket wî rewşî digotin; "xweziya bimira an jî em lê bixin û bikujin". Ji ber wî rewşê wî gelek caran şerm dikirin. Jina malê Emîne jî gelek caran ji ber vê rewşê şerm dikir û hêrs dibû. Şerimbûn û hêrsa wan beramber çarenûsa wan bû. Lê her tim jî ji xwe re weke mêrekê dîtibû û devjê neberda bû. Gotibû; ya herî baş ez muhtacê wî nebim, ezê zarokên xwe xwedî bikim" û dest bi kare şêranî kiribû. Ev jî pîşeya (meslek) wê bû. Li Sîwerekê şêraniya herî xwe wan çêdikir. Bi rastî jî şêraniya wan xweş bû. Dema roja yekem ez çûyîm sêniyek mezin danîbûn pêşiya me.

Min bi Cahîde re ev rewş tevahî bi hemû ziraviyan ve nîqaş kiribû. Ji bona fêm bike derketina ji wê jiyanê, pêwîstiya şoreşgertiyê û çi qas girîngiyek jiyanî ye, çi ji deste min dihat min dikir. Ji ber xwesteka bi wê re jî hêviyek mezin dida min. Min Cahîde bi çend hevalên ku li Sîwerekê kar dikin re da nasîn. Min got; "wê tu heta dema bêhnvedanê derdorek xurt

ava bikî". Ji ber di rewşa heyî de gelek peywendî hebûn. Ger bi yê nas dikir, biguherin û pêş bikevin re peywendiyên xwe çêkira, wê ti pirsgirêk nemaban. Min jê re got; "têrbûn an jî kêmbûna teoriya bîrdozî ne asteng e ku mirov kar bike. Wê tu hem xwe pê bixî, hem wan. Hemû xebatkarên vê tevgerê wisa fêr bûn. Em jî hîn dibin. Em her ku bi we re mijûl dibin, hîn dibin. Heta niha jî em hînî mijarên bingehîn ne bûne. Şoreşgertî ne hêsan e. Her tiştî jiyan fêr dike. Bes tu bixwaze. Biryardar be û durist be". Cahîde her tiştê ku dihat gotin pir baldar guhdar dikir. Bandora Elezîzê pir ser hebû. Digot; "jiyana we gelek tişt fêrî min kir".

Ezê ji wir derbasî Çermîk û çûngûşê bûbam. Cahîde jî xwest b imin re were. Ya rastî neçar bû ew jî bê. Ji ber ew, Gullu û Serap bi malbatî hevûdû dinasîn. Di heman dibistanê de bûn û derdorên çûda jî dinasiyan. Ger Sîwerekê biman dikariyan xwextê xwe hîn baştir bikar baniyan. Lê, hewcebû ku b imin re jî bihata. Serap, Gullu û hinek keçên din jî hêvî didan. Gullu ji Çermmikê bû; beriya hingê malbat, derdor û birayên wê yên mezin dilxwazê KÇŞR (DDKD) BÛN. Peywendiyên me bi wan re jî hebûn. Heval bi wan re eleqeder dibûn. Ji ber hevalê Hisên Durmuş jî li wan deran bû. Li wir derfetê hevdîtina bi wî hevalî re jî çêbû. Ji ber min careke din dît ez pir kêfxwe bûm.

Piştî hevnasîna Hisên a bi keçên wir re ji min re got; "ji bona me baş e. Em dikarin wan malan bikar bînin. Heval dikarin bi me re bibin alîkar. Wisa bala kesê jî naçe ser me".

Me malbata Gullu nas dikir. Dayîk û biçûka wê hatibû Elezîzê. Piştî ku Gullu ameliyat bû demek dirêj li mala me ma. Ez û hevalê Cemîl tenê bûn. Min hevalê Cemîl weke birayê

xwe dabû nasîn. Baldariya me ya li hember Gullu bandor li malbatê kiribû. Malbatek pir berfireh bû. Dayîk jî ji Elezîzê bandor bibû û her kêlî behsa wir dikir. Me bi yê malê re nîqaş dikir. Me xêra Gullu li Çermîkê civînek lidar xist.

Em paşê derbasî Çûngûşê bûn. Bavê Serap miftî bû. Xwîşka wê ya din jî li heman dibistanê bû. Di nava malbata wan de jî dayîk Tirk, bav Kurd bû. Li Çûngûşê xebatên komên din jî hebûn. Kesîmên mamoste û birokrat piranî yên ji derdora wan bûn. Li her du cihan jî derfetên rêxistinkirinê hebûn. Ger qadroyên xwecihî hebûyan, wê pêşveçûn jî zû çêbûya. Ji ber asta baldarî û nîqaşan pir bilind bû. Astek ciwanên dixwîne, lêkolîn dike yên ronakbîr hebû. Di saziyên dewletê de jî jig elek herêman mirov hebûn. Ger rêxistinbûnek baş bihata kirin, êdî dewletê ne dikariya kar bike. Kêr nedihat. Me dikariya em bi hêsanî hemû amûr û qadên xebatê bikin bin xizmeta têkoşînê.

Piştî em demeke din man me gera xwe zû qedant û vegeriyan Elezîzê. Ez li Madenê ne mam. Min ewder û cihên din hişt ji carek din re. Ya rastî xwendekarên ji Hanî-Qulp-Lîcê jî hebûn. Dihizirîm ku destpêkê biçim Hanî. Di nava bernama min de hebû. Lê wext têrê nekir. Ji vebûna dibistanan re kêm mabû. Di bêhnvedana havînê de hatina van deran baştir bû.

Elî Gunduz diçû Meletî û dihat. Em destpêkê bi Aytekîn re li Elezîzê di asta herêmê de din ava xebatên propagande û ajîtasyonê de bi hev re dixebitîn. Lê paşê çûna wî ya Meletî baştir hat dîtin. Zemînek nûz bû. Derfetên kar hebûn.

Çalakiyên ku li elezîzê hatin kirin

Ji mereşê re bersivek baş bû

Komkujiya Mereşê ya ku di 19-26'ê Kanuna 1978'an de pêk hat, ji her alî ve ji bona ve hîşyarî dida. Dijmin, dijminatiya Kurdan a herî hovane raber kiribû. Li hember nêzîkbûnên weke, " Kurd nikare şiyar bibe, nikare rêxistina xwe ya cewherî ava bike, nikare xwe bigihîne hêz û vîna têkoşînê", li ser bingeha şîdeta şoreşgerî şert û mercên pêşketina têkoşîn, kirina malê girse û milîtaniya di şer de pêş diket. Ango, Têkoşîna me ya Rizgariya Netewî pêş diket û bingeha xwe ava dikir. Di şoreşê de ref zelal dibûn, diyar bû bi kîjan çîn û kîjan hêzan re heta ku dere were meşîn. Ev pir girîng bûn. Êrîşên dijmin jî dibûn sedem ku ev rewş tev zelal bibin.

Dewletê, planê xwe bikaranîna qadek ku nakokiyên xwe yên mezhebi hene re, kiribû meriyete. Ev nakokiyên sunî kûr dikir û bin re di çarçoveya plana komkujiya Kurdan de êrîş dikir. Paşê sikiyonetîma pêş ketî û tekser êrîşkirin gava taktîkî û tevdîra yekem bû. Dijmin ketibû ferqa pêşketinan. Dizaniya k udi vê mijarê de pêşî lê negire wê çi çêbin, pêş bikevin û rê j içi re vekin. Ev tev hesab kiribûn.

Têkoşîna Rizgariya Netewî ya Kurdistanê, mercên ku hem civaka Kirdistanê û hem civaka Tirkî ji têkoşîna şoreşgerî re amade bike bi lez amade dikir. Di demek kin de li gelek qadan hêzek ku bixe malê gel, rêbertî û zemînê pêşengiya xwe saz kiriye, bi îstkrar û biryardar ava kiribû. Û bi komkujiya Mereşê re jî diyar bû ku; ev tevger wisa hêsan têk naçe û naye tinekirin. Gelê Kurdistanê rêya vejînê dîtibû. Agirê azadiyê

ketibû li ser van axan. Vê carê ‘kunêra ku hatibû kunkirin, di nava xwe de teqiyabû!” Ew birîn ji nû ve bi xwîn bibin jî, berxwedanî û şerek domdar hatibû destpê kirin.

Dijmin yekser êrîş kiribû. Gelo div ê mijarê de helwesta me çi bû û diviyabû me çi bikira? Me li ser vê hur û kûr nîqaş dikir. Encama ku derket holê jî ev bû; rêya yekemîn a parastina binesaziya rêxistinî şîdeta şoreşgerî bû. Li gel vê têkoşînek dem dirêj dana meşandin bû. Ma şêwaza rêbertiya vê tevgerê jî ne ev bû? Ji aliye komek qadro ve, gav bi gav ketina Kurdistanê, bi temamî li navendek dijber, tevî hemû bê derfetiyan xwe li ser piyan girtin, bîrdozî û polîtîka div ê astê de kirina malê gel, şêwazê sazkirina serkeftinek bingehîn bû. Komkujiya Mereşê rastiya dijmin pir baş derketibû holê. Dijmin ji bona têkoşîna me asteng bike hê ji niha ve dest bi komkujiya kiribû. Ev jî dihişt ku tevgera me xwe li hember êrîşên dijmin hê bi hêztir amade bike.

Bele, bûyerên ku dihatin jiyîn wê tenê bi Mereşê ve sînordar nemaban. Ger ser biketa wê li qadên din jî biceribandan. Lê, bi ser neket. Gelek qadroyên nijadperest hatin kuştin. Bi gel re bertekek mezin pêş ket. Ji qadroyên nijadperest ên ji Elezîzê derbasî Mereşê bûne, gelek ji wan mirin û birîndar bûn. Kargeha Fero Krom a Elezîzê û gelek cihên cuda yên etîketkirî, weke navendên tedaviye hatin bikar anîn. Lê çalakiyên li Elezîzê li ser hev hatîn kirin, ji bona Mereşê bibûn bersivek gelekî baş. Di nava çend rojan de yazdeh nijadperest hatin cezakirin. Ev li Elezîzê moral û bi xwe bawerbûnek mezin dabû avakirin. Jixwe diviyabû bersivdan wisa ban. Cihên birîndar lê û nijadperest dihatin tedavîkirin hatin serdegirtin. Di bîldîriyên bi îmzayên

şoreşgerên Kurdistanê de helwesta dihat gotin ku wê ev çalaki bidomin û hesabê komkujiya Mereşê werê pirsin, pir zelal diyar dibû û xwedî li çalakiya derdiket.

Komên çepên Tirkan jî ji çalakiyên ku me lidar dixist aciz dibûn. Li şuna ku beramber êrîşên weke sikiyonetîm helwest raber bikin, êrîşên şoreşgerî xeter didîtin û propagandeya reşkirinê pêş dixistin. Li gel vê em û çalakiyên me sedema sikiyonetîm û çewsandinê destnîşan dikirin. Ji ber komaleyên wan ji dest wan derdiketin. Êdî ne dikariyan bi diruşma û lafazantiyê bi xwepêşandanên kolanan ve girseya gel bixapînin. Helbet, şoreşgertiya rehet û bê hedef wisa bê amadekarî were girtin.

Gelek ji wan çawa denge sikiyonetîmê bihîstin bere xwe dan cihên cuda. Yên ku ji bona xwe biparêzên revîn gund û malen xwe, heta yên revîn Ewrûpa jî ne kêm bûn. Li şuna ku çalakiyan bi kêfxweşî pêşwazî bikin, erê bikin, hêz û moral jê bigirin, di şêwazek ku dewletê mafdar derbixin de propaganda reşkirinê dikirin. Êrîşên dewletê jî di şêwazek erê bikin de weke "dewlet e dibe bikin" diyar dikirin û her tişt rewa destnîşan dikirin. Bele ev jî rûyê wan ê rastî baş derdixist holê. Bi taybet li Kurdistanê her ku diçû girseya wan zêdetir diheliya. Ji ber gel didît ku kî têdikoşe, kî rastiyan dibêje û vê dixe meriyete.

Di kongreya MHP'ê ya Elezîzê de hinek ciwanên Kurd gotibûn; "em ne netewperestên Tirk, netewperestên Kurd in". Bi gelemperî têkoşîna me, bi taybet jî komkujiya li Mereşê û êalakiyên li Elezîzê bandora xwe li gelek cihan dikir. Paşê bi wan ciwanên ji derdûra Palo bûn re peywendî pêş ketin. Danasîna wan bi xwe jî derketibû. Ji bo kuştina vê koma ku

cihe bûne û serkêşê vê komê sere Reşo, 200 hezar kuruş hatibû diyar kirin. Reşo bi demanca xwe ve cihe bibû. Dema cara yekem liqay hatim şaş mam. Ji ber nijadperestek bibû heval. Dijmin di bin navê MHP'ê de ciwanên Kurd jehir dikir. Her ku têkoşîn pêş diket girseya wan qadan jî bandor dibûn. Pêşketinên bi vî rengî yên Eleîzê, li Erzirom û Çewlikê jî pêş ketibûn. Bi ser heftî komî re cihe bibûn û tevlî refên me bibûn. Ev bûyereke harîka bû! Hevalê Hisên ê ji Paloyê bi Reşo û koma wî re eleqeder dibû.

Her ku tevlîbûn û çalaki zêde dibûn, derdora ku ji têkoşînê jî bandor dibû, zêde dibû. Li her cihê weke mal û kehwexaneyan mijara dihat axaftin em bûn. Çalakiyên ku dihatin lidarxistin, wisa dihatin nepixandin heta agahî cardin ji me re dihat. Axaftinên weke "helal be ji wan re. Çûne nava sûkê de lê xistine" dihat kirin. Êdî bibûn mijarê sohbetên rojane.

Êdî piştî kongreya damezirandinê komite fermî bibû û dest bi avakirina hêmanên xwe yên jêrîn kiribû. Li Elezîzê hejmarek zêde ya qadroyan hebû. Lewma me li ser vê rewşê dest bi nîqaşên dûzenlemeyan kir. Ew li gorî jêhatiyên wan bicihkirin gelekî girîng bû. Gelek ji wan li kolan, dibistan û taxên ku li diman erk girtibûn û kar kiribûn. Wê li herêmên girêdayî Elezîzê di asta nûnertî de heval bihatan atamakirin. Ev ne pirsgirêkek cidî bû. Lê navend pir girîng bû. Ji ber vê sedemê ji komîteyên herêman heta hucreyên binî me şemayek êêkir, me rojan li ser mijarên weke çi qas heval ji wan re pêwîst in, emê kî li ku dere bicih bikin nîqaş kir.

Elî Gunduz sekreter bû. Di asta kordîneya giştî de erk dimeşand. Hamili berpirsê komîteya leşkeri, Metînê Ker ji komîteya ciwanan, Hisên Topguder jî ji komîteya karker, gundî û esnafan berpirsyar bûn. Min jî berxwirsyariya komîteya jnê û di heman deme de ya çapemenî weşan, propagande û ajîtasyonê girtibû. Piştî demekê Hesen Şerik hat. Biryara çapkirin û belavkirina bîldîrî û broşûran li Elezîzê were kirin hatibû girtin. Lê der barê emê bi Hesen re çawa destpê bikin de zêde tiştek ne hatibû gotin. Tene hatibû gotin; "hûnê bi hev re kar bikin". Ango ew derbasî şuna Aytekîn dibû.

Me xebata yekem bi hev re bi îmzeya 'PKK-KN" ji bo navxweyî bi talimata yekem re destpê kir. Me her duyan jî ne dizaniya dakdîlo baş bikar bînin. Me bi du tiliyan dinivîst. Wî j imin re digot 'tu binivisîne', min jî jê re heman tişt digot. Paşê ser diket min dinivîsand. Dê wî bixwenda, min jî li ser qaxida mumkirî binivîsanda û wê bibira zêde bikira. Me piranî kare zêdekirinê li gundê Mîşelî dikir. Em beriya hingê jî bi Kurdo re çûbûn û bîldîrî zêde kiribûn. Kurdo div an karan de jêhatî bû.

Dema Hesen j imin re xwendî bala wî îmeya 'PKK-KN' kişandibû. Mereq dikir çi bûye û hewl dida fêm bike. Dema wateya jî ne didît ne dixwest pirs jî bike. Ya rastî ji ber gurura xwe ne dipirsî. (piştî salan li xwe mikur hat. Di kongreya 5. De, di bîranînek min a dînîtî de tene ji bona min bide kenandin an jî li gorî xwe moral bide min behsa vê bûyerê kiribû. Ya rastî ez dabûm kenandin. "got; gurura min a feodali dest neda ez bipirsim". Lê fêmkiribû k udi binesaziya rêxistinî de hinek guhertin hatine kirin.)

Lê Hesen zêde nema. Bi bihurdar derbasî Dîlokê bû, yan jî dê xebatên xwe li wir bidomanda. Di avakirina komîteyên jêrîn de dîsa Metînê Ker li gorî xwe dinirxand û şîrove dikirin. Kesek ne dieciband. Kî ji bo komîteyên jêrîn ên girêdayî dihatin pêşniyarkirin mîsoger qusurek jê re dîdît û digot ne guncav e. Ji ber vê sedemê gelek caran di navbera me de nîqaş derdiket. Ji ber vê em neçar mabûn hinek hevalan biguherin. Lê ji ber her carê wî ya xwe ferz dikir û ev kiribû şêwazek, em gihiştibûn wê qeneetê ku diviyabû em destur nedinê.

Elî ew di civînekê de hişk rexne kiribû. Lê têrê nekir. Ev nêîkbûnên bi vî rengî jî li hember xwe weke bertekên kesane fêm dikir. Yan jî dixwest wisa bide diyarkirin daku vala derbixe û pêşî lê bigire. Vê carê dema me hemûyan di heman mijarê de ew rexne kir, neçar ma bêdeng bimîne û gav şûnde bavêje.

Bi jinê bawer im

Li Dêrsimê di rojevê de pevçûnên bi HK re hebûn. Heval Mahîr Cn jî li Qersê şehîd kiribûn. Li Dîlokê jî HK û HB hevbeş êrîş dikirin. Li Dêrsimê piştî qetilkirina Aydin Gul, vê carê Metîn Turgut qetil kiribûn. Ev nüce li Elezîzê weke bombeyekê deng vedabû.

Hamili û çend heval lez û bez çeken li Elezîzê girtin û yekser derbasî wê qadê bûn. Bi taybet sekna HK pir vekirîbû. Hinek qadroyên wan ên rêveber, endamên MÎT'ê bûn û ev bûyerên kur û didan pir vekirî wan birêve dibirin. Mudurê dibistana Mamosteyên Tuncelî Hesen Aydin pêşengiya van buyeran dikir. Endamên qadro Ozden Mizrak û yên din esas

hatibûn girtin. Nexwe, ne gengaz bû ku li cihek weke Dêrsimê Şoreşgerên Kurdistanê ew qas giran werin hedefkirin û qetilkirin.

Dijwarbûna têkoşîna bîrdozî li holê bû û hewce bû. Lê mixabin, di mijara pirsgirêka Kurdistanê de, pêşketina nêzîkbûn û şêwazek şoreşgerî ya rast zehmet bû. Bandora Kemalîzmê ya hişk, polîtîkayên tevahî koman a derbarê mijara Kurdistanê de xemilandibû. (şekîllendîrme). Şovenîzma civakî din ava her komê de bi şêweyên cuda hebûna xwe didomand. Bi her komê re jî têkoşîna bîrdozî cuda dihat meşandin. Lê bele, ji serî ve HK di hewldanê xwe ji bona vê belovajî bike, rolek girîng lîst. Lewma, diviyabû mîsoger bersivek ji wan re were dayîn û rûyê wan ê rastî derbiketa holê.

Di vê mijarê de em tev gelekî hestiya nêz dibûn. Me jî yekser got; “em jî li Elezîzê êrîş bikin û bê helwest neminin”. Bertekên me yên destpêkê ev bûn. Yek bi yek rêhevalên me yên herî biryardar û bi rûmet qetil dikirin. Lewma, ev jî ancex dikariya bi şîdeta şoreşgerî û bersivdanê ve bihatan rawestandin. Lê weke din din ava gel de propagandaya reşkirinê jî hatibû pêşxistin. Digotin; “ şoreşger li hev ketine, hevûdû dikujin”. Dîsa rewşên ku dihatin jiyîn, weke pevçûnek navxweyî ya çepgiran dihar destnîşankirin. Ev propaganda jî ji aliyekê ve çepên Tirkan û ji aliyekê ve dijmin dikir.

Rastiya ku hatiye belovajîkirin jî dana fêmkirin, erka me bû. Diviyabû me ji gel re bi danasîn, civîn û semîneran bida diyarkirin ku, HK û komên din ên weke wê bi navê şoreşgerî xwîna şoreşgeran dirijînin, di vir de kîjan hêmanan bikar tînin û xwe dispêrin kuderê. Bes ya girîng jî baldarî nêzî provakasyonan bûyîn û dûr sekin bû. Axaftin û daxwiyaniyên

me yên bi naveroka nîtelîkek, qadroyên rêveber di asta sîxûrên provakator de kar dikin, lewma divê taban nekeve van lîstokan û bê helwest nemine, bi gelemperî der barê têgihiştina pirsgirêkê de rê ji fêmkirinek erênî re vedikir.

Lê bele HK, ev jî beramberî me bikar tanî. Danasînên dijber ên bi nirxandinên weke "provakatoriya sîxûrtî" ji bona reşkirina şoreşgeran hatiye kirin diweşandin. Lê beramber vê hevalan her tim hîşyarî dida. Di gotûbêjên navbera me dî jî her tim pêdiviya hîşyarî û tevdîran dihat bilêvkirin. Ji bona pirsgirêk mayînde û demdirêj were çareserkirin, em tim bi heval û welatparêzan re diaxiviyan ku divê çi bê kirin. Li her cihê û her koçeyê bi HK'yan re ketina nava pevçûnê ne rast bû. Dikir. Ev eniya dijber a ku dijmin birêve dibe tengkirin, bi sînor kirin û têkoşînek bîrdozî-polîtîk bi hostane ferzkirin gelekî girîng bû. Nexwe wê gelek mirovên ku sucê xwe tine û rastiya van bûyeran nizanin, zerar jê bidîtan.

HK, li hember vê tabana xwe jî bikartanî. Gelek mirov ne di ferqa pirsgirêkê de bûn. Lê li hember tanîn bikaranîn. Lewma tevahî nakokî, baş û rast di cih de çareserkirin, li gorî berjewendiyên têkoşînê veguhertin û encam avakirin gelekî girîng bû. Diviyabû li hember êrîşek wisa, bi helwestek her awayî û her milî ve bersiv bihata datîn.

Di vê pêvajoyê de Meral çû derbasî Dêrsimê bûbû. Ew bixwe ne bi xwestek bû. Gotibû; "ez naxwazim ji we, ji vê navenda zêde kar lê heye veqetim. Lê ez çi bikim erk e, divê ez biçim". Di vê pêvajoyê de Dêrsim jî pir girîng bû. Ji ber pirsgirêkên dihatin jiyîn avaniya jinê rewşa xwe ya çalakgeriya têrkar winda kiribû. Kiymet wan tam weke girêkek pirsgirêkan bûn. Ne ji sînorkirina pêwendiyan tiştek fêm dikir, ne jî ji

tecrîdê. Hîna di hewayek serdestiya her tiştî de bû. Weke ku erk û yetkî kiribû tapuya xwe. Yên din jî ketibûn bin bandora wê. Pir kêm heval ketibûn ferqa pirsgirêk û rewşa heyî û fêmkiribûn.

Kıymet, avaniya me pir bê bandor hiştibû! Di vê manê de çûna Meral gelekî baş bû. Atamayek pir di cih de bû. Asta Meral a teoriya bîrsozî, fêmkirin û têgihiştina pirsgirêkan de, wê pêşiya Kiymet bigirta. Nexwe wê Kiymet her kesê ku biçûya pir hêsan bê bandor bihişta, bertekên beramberî wê jî zû birêxistin bikira. Di vir de Meral nexwest bide diyarkirin ku ji çûna xwe pir bandor bûye. Lê, paşê di helbestek xwe ya li Dêrsimê nivîsandî de behsa vê "veqetînê" dikir. Dema ew helbest ji min re xwend çavên wê tije rondik bûn. Helbestek xweş bû, ez jî pir hestiyar bûm.

Bele. Me li Elezîzê pêvajoyekê bi hev re kar kir. Ji her alî ve ne pir baş be jî, tevî hemû nebesî, ecemî û aliyên wê yên seresere, rastiyek xebatê ya erênî, aheng û rêzdar pêş ketibû. Nêzîkbûnên me yên ji hev re li ser bingeha hezkirin, rêzdarî û alîkariya hevaltî bû. Piştewaniya hev kirin bû. Lewma min jî demekê valahiya Meral jiya. Aliyên wê yên rêxistinkirin, bi kesayet re kûranî dawerivandin lewaz bû, lê asta teoriya bîrdozî û propaganda de pir baş bû û div ê mijarê de bandorker bû.

Heval Cemîl jî her tim digot, divê tevgera jinê were avakirin. Ji bona di gelemperiya Kurdistanê de zemînê xebatek wisa berfireh were pêşxistin, di serî de divê jin, naveroka pirsgirêka jinê ya dîrokî, civakî ya teoriya bîrdozî lêkolîn bike, her ku biçe vê din ava xebatên rêxistinkirina pratîkî de veguherîne. Digot; rêbertî gotiye, Navenda Partî xebatek bi vî rengî guncav dîtiye, divê lez were destpêkirin. Di vê manê de

diyar kir ku ez, Ayten û Meral dikarin weke komîteyekê bi hev re kar bikin. Jixwe ev agahî kêfxweşiyek mezin ava kir. Heyecan dida. Bi min re hêviyek mezin ava dikir. Ango tiştek weke, pêşxistina xebatên Tevgera Jinê! Gelo ev bandora axaftinê min û Kesîre yê me li Kongreya dameirandinê de kiribû? Ji ber hevalê Cemîl navê pirtûkên ku Kesîre gotibûn jî dabû. Gotibû; "dikarin ji Huquqa Roma destpê bikin, gelek pirtûk û çavkanî werin lêkolînkirin".

Min yekser da diyarkirin ku em dikarin bi rêya hevalên me yên zanîngehê van pirtûkan bibînin. Ayten jî kêfxweş bû. Wê bi vê mebestê derfetên gera li Kurdistanê jî çêbûya. Ji ber bi gelemperî tevgera jinê lêkolîn kirin, ji her alî ve hêmanên wê yên dîrokî, civakî û rojane, pêvajoyên wê yên têkoşîna pratîkî zanîn, ji encamên wan ders derxistin û li ser vî bingehî xweseriya wê fêmkirin ne hêsan bû. Pir giran û zor bû. Lê diyar bû ku wê xebatek pir xweşik, bêhempa û mirov bi şer ve gire bida. Giranî û zehmetiya wê ti caran b imin re tirs ava nedikir. Pirsen weke; "gelo ezê ser bixim, an jî wê asteng derbikevin", ji aliye hest û raman ve jî qet ne dihatin bîra min.

Xebata ku pêwîst e bihata kirin û dikariya were kirin ya herî ji dil bû. Kêfxweşiya vê xebatê ji dil û giyan ve dida me hebû. Ez pir bê sebir bûm. Min dixwest lez û bez dest bi xebatê bikim. Kêm be jî, ji bona vê xebatê gera min a li hinek cihan baş bû. Binesaziya civakî û din ava wê de rewşa jinê bi çavên xwe dîtin û jiyîn, ji bo pêkanîna vê xebatê pêşiya me ronî dikir. Min der barê vê mijarê de pêşnûmeya bernameyek bi serenavan derxist. Weke din jî min rewşa xebatên jinê yên qadên din jî ji her kesê dîtî, pirsyar kir.

Di vê pêvajoya komîtebûna xebatan de Dêrsim, Elezîz û Çewlik, hîn baştir zelal bibûn. Hêvî dida mirov. Dikariya evder mînak bihatan dîtin. Dîsa dikariyan jinên qadro yên li vir hatine perwerdekirin derbasî qadên din bikin, da ku heman pêşketinan ava bikin. Dibe ku ez hinekê xeyalperest bûm. Lewma Ayten digot; "tu pir lez diçî". Ew jî mafdar bû, lê bê xeyal jî nedibû. Di heman deme de min ji pêşketina vê xebatê pir bawer dikir. Bes ger em rast li erken xwe xwedî derketan. Ev hest û hêviyek balkêş b imin re ava dikir. Bele, di rewşa heyî de jî em ji aliye wê yên kur dürbün. Jixwe ji serî ve nêzîkbûn û baweriya Rêbertî yên ji jinê re, hêzek mezin dida me. Nirxandinên wî yên; "ez bi jina Kurd bawer im. Ger vê bindestiya kûr tê jiyîn berovajî bike û veguherîne buna şoreşgertiyê wê pir balkêş be.", bi mirov re hêza cewherî, baweriya cewherî û daxwaza têkoşînê pêş dixist.

Min bi hevalê Cemîl re rewşa Celal Aydin nîqaş kir. Heta wê deme agahî û raporên zelal ketibûn deste me. Rojnivîs û têbiniyên wî hebûn. Ji wan hinek bidest xistin û wisa çûna encamê, her tişt baştir hêsan dikir. Pêwendiya xwe bi Têkoşîn re hebû. Weke din jî xebatên wî yên li Meletî pir ecêb bûn! Ji ber hevalên ku ji pêşketinê re vekirîbûn hetibûn astengkirin û xeyîdandibûn. Bi ti awayî guh nedane wan. Dîsa şêwaza jiyana wî, bi ti awayî pîvanên me re nabe yek. Ji gelek aliyan ve ne diyar bû ku çi dike û çawa dijî. Her wiha li hember jinên ku beramberî partî baldarin û dixwazin peywendî pêş bixin (zaaf) ketîbû. Nêzîkbûnên li gorî xwe dikir. Di vê mijarê de mînakên şênber jî didan.

Der barê wî de gelek agahî û belse hebûn. Nexasim çûna wî ya Sîşokê û bi hinek kesan re hevdîtina wî. Dîsa li Meletiyê hevdîtinên wî yên veşartî, tev di têbiniyên wî se derketibûn holê. Tîpek xeternak bû! Bi awayek objektif xebatên sîxûrtî dikir. Heval Cemîl got, wê vê bûyerê hîn baştir lêbikole û agahî bide partî.

Piştî demek kin heval Cemîl ji Elezîzê derket. Şahîn Donmez hat şuna wî. Me dizaniya ku Şahîn di rêveberiya navendî de ye. Wê xebatên piştî kongreye li her cihî bişopanda, li qadan bigeriya, pirsgirêk tespit bikiran û binirxanda.

Şahîn, li mala ku Hamilî li Rizaiyê lê dima b imin re axivî. Peywira ku hevalê Cemîl di mijara pirsgirêka Jinê de kiribû wî jî got. Li gel vê tenê bi min re axivî. Lê vê carê hinek din naveroka wê ya teorik vekir. Bi hewayeke ji xwe razî û zane qelebalixa gotinan (laf kalabalixi) ve her tişt vedigot. Di navberê de weke behsa hevalê Cemîl bikim, min got; “ heval bi şêwazek berfireh ragihandiye”. Hinekê ji vê jî aciz bû û got; “dibe, lê ez niha fermî radigihînim” û yekser mijar girt.

Serdegirtinên dewletê yên zû em şiyar kiribûn

Adar’a sala 1979’an bû. Em dema Newrozê de bûn. Heval û çeken çûbûn Dêrsimê, cardin vegeriyabûn Elezîzê. Hamîlî jî din ava wan de bû. Di vê roja ku ji bo tevahî gele me pir girîng bû, hinek yiştên cuda pêşxistin bendewariya her kesê bû. Bi vî armancî gelek reze çalaki hatibûn plankirin. Hamîlî jî, di radeya yekemîn de ji destnîşankirina hedef, li gorî berfirehî û nîtelîka hedefan erkdarkirina hevalan berpirsyar bû. Zekî di komîteya xwecihî ya herêmê de Zeki B. Yerel komitede,

Hamîlî rêxistinkirina xwe zêdetir bi wî re çêdikir. Me di vê deme de danesîna Newrozê jî amade kir. Beriya hingê ferman hatibû dayîn ku wê xebatên çapemenî û weşanê li Elezîzê bi navendî were meşandin. Lewma em jî hizirîn ku divê danasîn û nivîsên her wiha li vê dere werin nivisîn û li gorî wê amadekarî kirin. Me danasîn dinivîsand, zêde dikir û rêdikir herêman. Me kare zêdekirinê jî di mekîneya me ya zêdekirinê ya li Mîşel'ê çêdikir. Tam div ê navberê de danesînek bi îmzeya Komîteya Navendî hat. Me yekser bi rêya kuryeyan belavkirina danasînên ku me şandine da rawestandin. Tevî ku ti cewaziya naveroka wan ji hev tinebû, em neçar man vê bikin. Lê dema me pir teng bû. Me danasîn şandibû hinek cihan û me gotibû bila li qadên xwe zêde bikin. Lewma danasîna bi îmzeya Komîteya Navendî ne gihabû hinek qadan. Li wan deran jî danasîna ku me nivîsandî hatibû belavkirin. Bi vê buyerê re derket holê ku divê em bizanibin û hîn bibin ' emê xebatên çapemenî, weşan, propaganda, ajitasyon çawa bimeşînin, di kîjan çarçoveyan de bigirin dest û di vê mijarê de însiyatîfa herêmê çiye?' û div ê çarçoveyê de kar bikin.

Şeva Newrozê yazdeh cihan çalaki hatin lidarxistin. Li hedefên weke xaniyê MİSK'ê ya li sûkê, kehwexane û komaleyên ku her tim nijatperest bikar tînin, qereqola polîsan, hinek kargehên aîdê nijadperestan, hemwext çalaki hatibûn lidarxistin. Cara yekem bû di vê astê de giran û bihêz ev çalakiyên bi şêwazê weke dînamît, teqandina narîncok, reşandina çekan ve li Elezîzê pêk dihatin. Di heman deme de cara yekem bû Newroz bi vî rengî li Elezîzê di vê astê de dihat pîrozkirin. Hevalan çalakiyên xwe bi serkeftî lidarxistibûn. Em hemû pir kêfxweş bûn. Ew şeva bêhempa ne hiştibû em razin.

Di vê navberê de malen me yên ku zêde aşkere nebibûn jî eşkere bûn. Ew jî ji ber heval piştî çalakiyên hatibûn wan malên me yên herî bawerî pê dihatin.

Li şûna Aytekîn, Bozo-Silêman Aslan şandibûn Meletî. Di vê deme de Şahîn jî çûbû heta Agirî û vegeriya bû. Tam di wan rojan de jî komek heval hetibûn girtin. Dema Elî û Hamilî di qata jêr a kehwexanê de rûniştîne, polîsên sivîl tên kontrola nasnameya dikin û Elî digirin. Lê tiştekê ji Hamilî re nabêjin. Dîsa komek Aytekîn, Riza, Huseyn Taze, Zeki Budak jî di nav de tene girtin. Çawa agahî ji me re hat, me yekser mal paqiş kir. Wan rojan jî li malê komên afiş, bîldîrî û broşûran hebû. Yên ku diviyabû biçûba herêmên din me lez û bez şandin.

Em din ava dimanan de mabûn. Vêca ev girtin ji ku derketin? Li holê ti buyer tinebûn. Gelo îxbar hebû. Rojek beriya wê lîsteyek ketibû deste me. Ew jî lîsteya ku polis li wan digeriya bû. Navê min, ê Metînê Ker, Elî û çend kesên din hebûn. Diyar bû êdî em eşkere bibûn. Lê başbû mal an jî cihê ku em lê diman ne dihat zelalkirin. Em hişyar nêzî çûnûhatinên xwe yên malên nû dibûn. Arkadaşların daha çok kahve ve yakınlarında olmaları iyi değildi. Di deme dawî de hişyariyên cidî hatibûn kirin. Di dema komkujiya Mereşê de hevalê Cemîl her kes pir cidî hişyar kiribû. Gotibû; “ dibe ki dijmin yekser êrîş bike, bigire, lewma divê her kes hişyar tevbigere”. Weke din pirsî; “ gelo divê li hember rewşên bi vî rengî tevdîrên çawa werin girtin?” Û derferên gotûbêjan vekiribû. Lê me tevdît çawa girtibûn? Me polis gelek biçûk didît. Me qehwexane ji demen bere zêdetir û baştir bikar tanîn. Êdî diviyabû em randeviyên qehwexaneyan bi sînor bikin. Tevî ku ev dihat zanîn bi komî çûna qehwexaneyan wê berdêlên giran bidan avakirin.

Nekarîn Newrozê êrîş bikin. Çalaki bi serkeftî derbas bûn. Ew girtinên di dema 18'ê Gulanê de ne vala bûn. Dijmin bi plan tevdigeriya. Girtina Rizayê ji Elezîzê pir xeter bû. Diyar bû wê mîsoger ev buyer berfireh bûba, wê bi yê hatine girtin ve sînordar ne maba.

Me rewşa ku hatiye jiyîn bi Şahîn re nîqaş kir. Got; "çi nabe, ne hewce ye ku hûn telaşe bijîn". Me jî biryar da ku em ji mala kul ê ne derbikevin. Tiştên zêde piranî hatin kişandin. Danasîn û afîşên ku mayîn jî em şev çûn me din ava tewana malê de veşartin. Şemala avahiyê ji vê re guncav bû. Du avahî li kêleka hev bûn. Lewma mirov dikariya ji tevana avahiyekê yekser derbas ya din bibe. Me her tim digot; "ger rewşek awarte derbikeve, emê serbanê avahiyê re re birevin".

Navbera min û cîranan baş bû. Ji min hez dikirin. Nêzîkbûnên me yên bal bikişîne, şikan ava bike derneketibûn. Mala me li qeta 4 bû. Çûn û hatin jî pir baldarî ne hatiban şopandin ne dihat ferqkirin. Carê cîranên me jî dihatin serdana me. Dayîka Gullu û Cahîde hatibûn. Me nêrînek weke malbatek ji rêzê ku girêdanên xwe bi malbatên xwe re hene dabû nişan.

Lê Şahîn pir rehet bû. Ger ew nebûya dê me tevdîrên baştir bigirta. Me digot; "ger êrîşek pêş bikeve, emê derbasî çolterê bibin". Hevalî Cemîl jî ev destnîşan kiribû. Lê bele Şahîn her tim digot; "tiştek tine ye".

Em rojekê li mala Silêman Aslan bûn. Me cardin ev mijar vekir û nîqaş kir. Metînê Ker pir aciz û ne rehet bû. Li hember rehetiya Şahîn jî gelekî tengav dibû. Ji ber pir bêxem nêz dibû. Me jî cidî ne digirt. Keftulefa wî ya wê şefe pir bala min kişandibû.

Roja paştir ji me re got, divê amadekariyên civînê werin kirin. Vê carê jî ez pir aciz bûm. Heval hatibûn girtin, ne diyar bû wê çi bibe, Şahîn jî digot; “ezê civîn çêbikim”. Hisên Taze hatibû berdan. Yekser çûm cem wî. Pir bandor bibû, bêdeng û ne rehet bû. Lê ji me re got; “kes ne axiviye. Elî Gunduz û Aytekîn jî li ber xwe didin”. Riza jî bi wesayîta polîsan anîne mala wan a Esentepe. Di vir de Riza lewaz ketibû. Polis herî zêde li ser xalên çek û cebilxaneyê rawestiya ye. Ji bo Riza jî cih şanî wan bike anîne. Lê baş bû ti çek û cebilxane radestî Riza nehatibû kirin. Li gorî tê gotin 1800 Evleran îşkence pir tê kirin. Hisên got nexasim îşkendeya herî zêde li Elî Gunduz hatiye kirin. Me ev agahî ji Şahîn re şand û diyar kir Hisên hatiye berdan.

Roja pey re civîn hat lidarxistin. Gelek hevalên k udi civînê de amade bûn, div ê pêvajoyê de pêkhatina vê civînê bê wate didîtin. Yekser ne gotibin jî, bi bertekên cur be cur diyar kiribûn. Şahîn bi saetan axivî. Axaftinên wî kongreya damezirandinê tanî bîra min. Her ku zêde daxiviya bertekên min zêde dibûn. Ez ne rehetbûm û mejiyê min li gel yên girtîbûn. Li wê mala ku Hamilî lê diman gelek têbiniyên bi nivîskî hebûn. Me ew jî bi şêweyek guncav lez û bez veşartibûn.

Me wê şeve ji bo hevdîtinê randewu da Hamilî. Têbiniyek danîbû mala Dr. Elî. Wê me mala ku em lê diman hev bidîta. Dixwest em biçin wê derê. Em difikirîn gelo tevî ku ev mal qet ne guncav e, çima xwetibû em biçin wê derê. Ez bi xwe re diaxiviyam û min ji xwe re digot; “ ev heval tene tiştên bêhna me teng bikin dikin”. 17’ê Gulanê bû. Lewma bi gumana dibe ku roja paştir tevdîrên polîsan zêde bibin, diviya wê şevê kare

belavkirina afiş û danasîna bihata kirin. Danasîn û afiş dabûn koman. Wê her kesê li kolan û taxan de belav bikira. Lê cihên ku pêve bikiran hatibû diyarkirin. Hamili piştî ev kar qedandin nû hat malê. Mixabin em bi demjimêran li benda wî man. Ez û Ayten bi hev re çûbûn malê. Ew çend roj bû em pir westiyayî û bê xew bûn. Di vê navberê de dema em li benda Hamilî bûn, em xewve çûn. Lê bi rastî xewa mine w qas ne giran bû. Lê lenet bê, wê şeve êşek pir xirb ketibû sere min. Min sere xwe bi desmalekê girêda bû. Di heman kêliyê de wisa li ser qenepeyê xewve çûme.

Dema Hamilî tê li zengilê dide, lê em pê nahesin. Ew jî şaş maye. Ji ber dibûne şewqa malê vekiriye, dizane emê li malê li benda wî bin, tevî vê dere naye vekirin, ew jî didulî dijî û tengav dibe. Rewşên bi vî rengî qet ne jiya ye. Gelek tişt hatine bîra wî. Ji xwe re gotiye ji xeynî wan dibe ku kî li malê be. Tişta yekem tê bîra wî, şibaka jorî derî vekirin û di wir re ketina hundur e. Di cihek şibakê ya şikestî re deste xwe dirêj dike bizmaran sist dike, mecuna şibakê ve jê dike û tevahî camê derdixe. Heta noqê dikeve hundur. Dema wî hewl dida bikeve hundur, ez yekser bi dengen derketin şiyar bûm.

Dema ez lezgîn ji cihê xwe rabûm li derî nêrî, beramber dîmenên ku dîtin ez şok bûm. Wê kêliyê cemidîm. Min tene karî bejim; “ew çi hale!” Ez fikirîm çi ji Hamilî hatiye, çima wisa derbasî malê dibe. Ma dîne? Min Ayten jî şiyar kir. Ew jî şaş mabû. Şaş mayîna me çend deqeyan berdewam kir. Paşê ji nişka ve em bi hev re keniyan. Lê dîsa em di ser wî de, ew jî bi ser me de aciz dibû. Li şuna ku em derî vekin û wî derbasî malê bikin, em li wir rawestiyabûn û me nîqaş dikir. Em aciz dibûn me digot; “te çima ev qas saet dane sekinandin, em li

benda te pir man.” Wî jî, digot; “we çim adi wextê de derî j imin re venekir” û aciz dibûya. Ji ber em li benda hev mabûn û gelekî aciz bibûn, me jî acizbûnê xwe di sere hev de vala dikir. Paşê me derî vekir û ew derbasî malê kir.

Piştî em derbasî hundur bûn, ji me re hewldana xwe ya derbasbûna di şibakeyê re vegot. Em jî ji ber me denge zengilê ne bihîstibû xemgîn bûn. Lê êdî tiştek ji dest ne dihat. Me jî hêcetên xwe vegotin. Di vê navberê de me nîqaşa ku em li vê malê bimînin, an neminin kir. Hinekê behsa rewşa derve kir. Ji ber şewqa xorfeyê girtîbû, carê me di şibakeyê re derve jî kontrol dikir. Li kolanan vize vize dolmuşên polîsan bû. Hamîlî digot, “ez pir hişyar hatime malê”.

Min jî jê re got; “bele, madem wisa ye te çima cihê randewuyê ev mal diyar kir? Me li cihek din hev bidîta”. Bersiva wî; “temam, tu çim adi wextê xwe de nehatî cihê randewuya destpêkê” bû.

Ya rastî em di heman demjimêrê de li cem Dr. Elî wan bûn. Ne gengaz bû ku mirov gergîntî û axaftinên Hamilî yên tewambar dike li xwe ragire. Lewma destpêkê fikirîm ku rabim biçim. Paşê min dev ji vê fikirê berda. Min di vê mijarê de bê biryariyek cidî jiyan kir. Di navberekê me tevayî şewq girtin û di şibakê re derûdor kontrol kir. Di nava me de bê aramiyek mezin hebû. Em ne rehet bûn. Dema em ne li mal bûn, nava rojê Cahîde hatibûn malê, hinek xwarin çêkiribûn û çûbûn. Gonûl jî serdana malê kiribû. Li malê dolme habûn. Lê mixabin ji ber vê rewşa me ya ne aramî dile kesî ne diçû xwarinê. Me dizaniya k udi vê wexta şeve de derketin jî pir xeter e. Bi me re nasnameyek guncav jî tine bû. Li ser esasê ku em berbangê ji malê derbikevin, biryar da ku em şev li malê bimînin.

Elî di komîteya herêmê de bû. Di heman demê de li vê malê dima. Agahî dihat ku heta wê rojê ne axivîne û tiştek ne gotine. Lê dîsa jî li heman malê mana me xeter bû. Ango, em bi qumarê dilîstin! Beriya em razin min carek din derûdor kontrol kir. Hinek têbiniyên bi nivîs hebûn. Min ew din ava çermê kursiyan de veşart. Lê bele, li malê daqdîlo, qaxedên pelür, mumkirî û alavên mekîneya zêdekirinê hebû. Min ne dikariya wan wê şeve rakim. Jixwe zêdahiyên danasîn û afîşan di tevana avahiyê de hatibûn veşartin. Pirtûkek jî tene ya Dîroka Partiya Bolşevîkan hebû. Pirtûkek ne pirsgirêk bû, lê dile min dîsa jî ne rehet bû.

Ez tevahiya şeve din ava cihên xwe de hedara min nehat. Êşa sere min jî didomand. Weke din jî nêzîkbûnên Şahîn ên ew qas rehet ez tengav kiribûm. Li gel vê min hê wate ne dida nêzîkbûnên Hamilî yên derxistina şibaka derî û şêwazê ketina hundur. Li ser Elî Gunduz û Aytekîn dihizirîm. Hisên Taze gotibû; “ pir îşkence tê kirin”.

Gelo dibûya ku Riza Sarikaya ketiba rewşek hê xirabtir? Yek yê mal nas dikir jî ew bû. Bele, wî jî ev mal nas dikir. Lê baş bu ku mala ku Hamilî lê diman nas nedikir. Gelo, me belge û afiş ji wir derxistan? Temam de em derbixin, emê bibin kur veşêrin? Di mejiyê min de pirs xilas nedibûn.

Di demjimêrên şeve yên destpêkê de xewek giran ser me bû. Lewma me denge zengila derî jî ne bihîstibû. Niha jî nîvê şeve bû, hema beje berbang e û qet xewa min naye. Ez rabûma jî min ne dikariya tiştekê bikim. Ji ber hîna her der reştarî bû. Carekê ez fikirîm rabim hinekê li eywanê ji xwe re bigerim. Ev jî elimandinek min bû. Gelek caran ez şev derdiketim li cihên

tenha digeriyam. Kesekê zêde ferq nedikir. Dema hevalan jî didît ez volta diğerim, gotin weke; “ ma qey tu îro kêm geriyayî” ber min re davetin.

Her ku saet derbas dibû li derdor denge sîren û wesayîtan jî hêdî hêdî zêde û nêz dibûn. Di navberekê de çend caran denge deriye maşînan yê vebûn û hatin girtin. Min xîret bi xwe re nedît rabim lê binerim. Lê ger ez di wê kêliyê de rabûma û min lê binêriya mîsoger wê min hinek tişt ferq bikira. Di heman kêliyê de wê me bikariya du deqan de derbasî banê avahiya miqabil bibûna. Lê min ji kur dizaniya ku polis in. Ji nişka ve bi qontaxê çekan li derî xistin. Vê carê tirsa me hatibû sere me. Ev lêdana derî ne asayî bû. Min ji nişkê ve got “ev polis in” û rabûm ser xwe. Li ber min cilên şeve hebûn. Min pantolek ji rêzê li xwe kir. Di wê navberê de her der kontrol kir. Daqdîlo û mekîneya zêdekirinê (teksir) û hinek alav kirin torbeyek naylon. Hinek têbinî jî di serşûştinê de şewitand. Serşûştin jî miqabilî derî bû. Paşê min Hamilî û Ayten şiyar kir.

Min got; “rabin polis” hat.

Ew jî yekser bi şaşbûnekê ve şiyar bûn. Hamili bêdeng got;

“na tu rastî dibêjî”.

Min ew xorfe jî kontrol kir. Di çanteyê me de kêrek sustali jî hebû. Tenê min dest neda pirtûkê. Min yê din hemû kirin kîsek naylon û şibakaya xwaringehê re avêt valahiya navberê. Me texteyek ji şibaka xwaringeha xwe heta şibaka xwaringeha beramberî ya xwe bicih kiribû. Em difikirîn k udi rewşek awarte de wir re derbas bibin. Ev jî ceribandinek bû. Me gotibû emê paşê asê bikin. Dema min texte kontrol kir, min dît ku pir zirav e û ne gengaz e ku em sere derbas bibin. Di vê navberê de polîsan jî li derî dixist.

Polîsan jî bê navber bang dikirin; “derî vekin, nexwe emê derî bişkînin!”. Min jî bi dengek weke ku ez nû ji xewê rabûme bersivand; “ew kî ye!” Gotin “derî veke polîs e!”

Min got; “Temam, yek deqê ez cilên xwe biguherim!”

Ya rastî em tevahiya şeve du dil bûn. Lê me tevdîr ne girtibû û dijmin jî li ber derî bû. Min hewl dida ku di dengê min de bandora vê diyar nebe. Rewşa me jiyan kirî pir aptalî bû. Li vir kanî hişyariya şoreşgerî, kanî tevdîr, kanî pêş de hesîn, kanî pêşbînî? Lenet be. Bes dîsa jî min hewl dida bi aramî tevbigetim. Min ji Ayten û Hamilî re got:

“ez we li Dêrsimê dinasim. Te Ayten ji bona kontrola wê ya du canî aniye nexweşxaneyê. Hûn nû zewêcîne. Te beriya wê revandiye. Jixwe dema ji malbatê pirs bikin wê zelal bibe. Ne girîng e. Ez jî cihe bûme û bi tene dijîm. Carinan xwuşk û birayên min tên û diçin.”

Li malê hinek cilên zilaman hebûn. Bi vî rengî gotin hîn zêdetir bi mantiq bû. Di vê navberê de min ji nişkave pantorê ku li xwe kiribû nû ferq kir. Li ser canê min fireh disekinî û hinek cihên wê dirûnên wê vebibûn. Wê demê ez xemgîn bûm, hayif lê wext nebû ku ez biguherim. Di wê kêliyê de dema Hamilî xwe ji şibakê diberda de polîsek di şibakê re kete hundur.

Yekser min got; “ rawestin ez derî vekim! Çi bûye, hûn çi dikin? Cilên me ne guncav bûn. Ma emê cilên xwe yên şeve ve derkevin li hembet we! Yek deqê ezê derî vekim!”

Cara dawî min ji wan re got:

“ temam ma tiştek ma. Em tiştekê na-axivin. Hûn nû hatine û mêvanin. Em ji vê cudatir hev nas nakin.” Û min derî vekir.

Yekser weke keriyan ketin hundur. Her yekê aliyek tevlîhev dikir:

Min got; “yek deqê, li cem be bigerin.”

Daqdîlo, Dîroka Partiya Bolşevîkan û hinek qaxit hemû komî cem hev kirin. Di nava qaxidan de çend qaxidên karbon jî derketin. Dîsa qaxidek cuda ku çend rêz nivîsek bi serenavê “ji gele me yê Egît re” jî derket. Çi bidîtan weke hêmana suc dihat dîtin û digirtin. Min ji bona daqdîlo got:

“hûn çima wê dibin? Pirtûk jî li sûkê tene firotin. Ne qedexe ye, mane her kes pirtûkan dixwîne! Hûn çima wê dibin?”

Bele, ti wateya axaftinê min tine bû. Min dizaniya ku axaftinên min encamê jî naguherîne. Bes dîsa jî min dixwest wan ji aliyê derûnî ve bandor bikim. Ne baş bû ku em wisa bêdeng, cemidî û bitirs rawestiyan. Ez bê navber diaxivîm û destwerdana hinek tiştan dikir:

Min her carê tiştên weke; “baldar nêz bibin, her derî qirêj nekin, we her tişt tevlîhev kir! Mane usule lêgerînê jî heye!” Digot, dixwest bertekên wan fêm bikim. Bixwazî nexwazî bandor dibûn. Di wê navberê de min pirsî:

“Gelo belgeya we ya lêgerînê heye? E dixwazim bibinim.”

Hinek ji wan bi kirêtî bi vê pirsa min keniyan. Yê ku telsiz didest de got:

“Bele heye. Fermo em dakevin.”

Hinek ji wan polîsan qet ne xerîb bûn. Mîsoger me li taxan hevûdu dîtibû. Paşê em li maşînê siwar bûn. Em hersê li paşiya teqsiyê siwar kiribûn. Yê ku telsiz di dest de bû li pêş siwar

bibû. Her der bêdeng bû. Tenê dema em ji jor merdîwenan daketin xwediyê malê em dîtin. Çavên wê yekser vebûn, hema li me temale dikir. Paşê pirs kir:

"Ew cîranên me yê herî baş in. Kirêdarê me ne. Polîsê birêz hûn wê belangazê dibin ku dere?"

Di teqsiyê de cara dawî bi dengek niviz min got;

"Hûn mêvanin, we Ayten aniye nexweşxaneyê, weke din ti îfade tine ye. Em bi hedar bin, tiştek nabe!"

Di navberekê de taksiya li pişt me bala min kişand. Dawiya taksi yê di nîvê de rûniştî Riza bû. Lewma min jî bêdeng jê re got; "alçak!" Lê baş bû weke din kesê mal nas nedikir. Nexwe wê deme Elî jî axivî bûçozûlme. Lê Riza ji aqilê min dernediket. Min ji xwe re digot; "jixwe tu diyar bûyî, ti çiyî". Wesayîta em lê sûwarbûyîn jî ber bi 1800 Evleran ve diçûya. Ez, Hamilî û Ayten bi awiran li hev temaşe dikin. Em bi awirên xwe bi hev re diaxiviyan. Ew rûyê Hamilî yê reş û zer, zêdetir reş bibû. Lêvên wî kêmekê spî bibûn ceynikê şakaklari hizla atiyorwî ser hev tavêtin. Di awirên xwe de weke ku bêje; " ger em wê şevê ne hatiban wê malê, wisa jî ne dibû" dinêriya. Lê mixabin wê şevê ew bi xwe bibû bela.

Sibat, Adar, Nîsan

'96 Zap



RÊHEVALÊ KEMAL PÎR